**Pirtûka Sêyemîn**

**CERIBANDINEK LI SER SOSYOLOJIYA AZADIYÊ**

**NAVEROK**

**1-PÊŞGOTIN**

**2-DESTPÊK**

**3-HIN PIRSGIRÊKÊN RÊBAZÎ**

**4-PIRSGIRÊKA AZADIYÊ**

**5-HÊZA AQILÊ CIVAKÎ**

**6-DERKETINA PISRGIRÊKA CIVAKÎ**

**A-PÊNASEKIRINA PIRSGIRÊKA CIVAKA-DÎROKÎ**

**B-PIRSGIRÊKÊN CIVAKÎ**

**1.** Pirsgirêka Desthlatî û Dewletê

**2.** Pirsgirêka Civakê ya Exlaq û Polîtîka

**3.** Pirsgirêkên Civakê yên Heşmendî

**4.** Pirsgirêkên Civakê yên Aborî

**5.** Pirsgirêka Civakê ya Sanayîgerî/Endustriyalîzm

**6.** Pirsgirêka Civakê ya Ekolojî

**7.** Pirsgirêkên Civakê yên Zayendperestî, Malbat, Jin û Şênî

**8.** Pirsgirêka Civakê ya Bajarbûn

**9.** Pirsgirêka Civakê ya Çînî û Burokrasî

**10.** Pirsgirêka Civakê ya Perwerdeyî û Tendurustî

**11.** Pirsgirêka Civakê ya Mîlîtarîzm

**12.** Pirsgirêka Civakê ya Aştî û Demokrasî

**7- HIZIRÎNA LI SER SÎSTEMA ŞARİSTANIYA DEMOKRATÎK**

Pênaseya Şaristaniya Demokratîk

Nêzîkatiya Rêbazî bo Şaristaniya Demokratîk

Pêşnûmaya Dîroka Şaristaniya Demokratîk

Hêmanên Şaristaniya Demokratîk

a- Klan

b- Malbat

c- Qebîlê û Eşîret

d- Qewm û Netew

e- Hêmanên wê yên Gund û Bajar

f- Hêmanên wê yên Heşmendî û Aborî

g- Hêmanên wê yên Siyaseta Demokratîk û Parastina Cewherîn

**8- MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK LI HEMBERÎ MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST**

Jihevqetîna Kapîtaîzm û Modernîte

Rehenda Modernîte ya Sanayîgerî û Modernîteya Demokratîk

Dewlet-Netew û Konfederalîzma Demokratîk

Bîrdoziya Cihûtiyê, Kapîtalîzm û Modernîtê

Rehendên Modernîteya Demokratîk

Rehenda Wê ya Civaka Exlaqî û Polîtîk (Civaka Demokratîk)

Rehenda Wê ya Civaka Ekolojîk û Sanayî

Rehenda Wê ya Civaka Konfederalîst a Demokratîk

**9- PIRSGIRÊKÊN JI NÛ VE AVAKIRINA MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK**

Pirsgirêka Şaristanî, Modernîte û Qeyranê

Rewşa Hêzên Dijberî Sîstemê

Mîrasa Sosyalîzma Pêkhatî

Ji Nû ve Nirxandina Anarşîzmê

Femînîzm: Serhildana Mêtingeha Herî Kevn

Ekolojî: Serhildana Jîngehê

Tevgerên Çandî: Tolhildana Kevneşopê Ji Dewlet-Netewê

Tevgerên Etnîsîte û Netewên Demokratîk

Zindîbûna Kevneşopa Olî

Tevgerên Xweserî yên Bajarî, Navçeyî û Herêmî

**10 -ERKÊN JI NÛ VE AVAKIRINA MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK**

Erkên Rewşenbîrî

Erkên Exlaqî

Erkên Polîtîk

**11- ENCAM**

## CERIBANDINEK LI SER SOSYOLOJIYA AZADIYÊ

### 1-PÊŞGOTIN

Vê sêyemîn beşa mezin a parêznameya min a giştî, ku ez hewl didim wê amade bikim li ser pêvajoya biryara 'ji nû ve darizandinê', ku DMME (Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpa) di derbarê min de girtiye, berdewama herdu beşên pêşî ne û wê di wesfa temamkirina wan de be. Armanca herdu beşên pêşî ew e ku desthilatî û modernîteya kapîtalîst bi gelemperî zelal bike. Têgîna desthilatî weke 'emrazên zorê' yên damezrandî li ser hewldana mirov û di cewher de avakirî bi armanca çirpandina derfetên nirx û berhem a bermayî, pênase dike. Emrazên desthilatî, ku bi awayekî pir-cûre û wergirî hatinê avakirin, di tehlila dawî de mekanîzmayên zordestiyê ne, ku li ser keda mirovan hatine sazkirin. Lê serdema modernîte, ku weke 'sîstema kapîtalîst'tê têgînkirin, civakê bi awayên herî pêşketî yên van lêlatan rûbirû hêştiye. Sîstema kapîtalîst a di mercên roja me ya îro de, ku jê re tê gotin kûrêwîbûn jî, di nava modêla me de ku em dixwazin wê pêş bixin, qonaxeke gelemperî ya xweser a 'yan sîstema cîhanî ya desthilatî, yan jî demokrasî' pêk tîne.

Dikare were pirsîn bê ka çi cûre pêwendî heye di navbera wesfa saziyane ya DMME, weke meqameke ser-netewan, ku mafê takekesî yê serlêdanê, tenê weke hemwelatek dide mirovan, û parêznameyek bi vî rengî ya kesekî bi navê Evdela Ocalan de ku wê pêşkêş dike? Pêwendî di navbera wan de heye û hem jî bi rengekî kartêker heye. Ya girîngtir jî ew e ku heya sîstema şaristaniya ku navendperestiya Ewrûpa ji xwe re esas digire neyê tehlîlkirin, wê nikaribe sîstema bîrdozî, siyasî û huqûqî ya Ewrûpa, ku weke 'hêza nerm' tê binavkirin were tehlîlkirin; ev hêza nerm tenê dema şaristaniya bi navenda Ewrûpa were tehlîlkirin, wê karibe bi awayekî xurttir were şîrovekirin. Di heman demê de divê bi berdewamî li ber çavan were girtin ku sîstema şaristanî ya Ewrûpa, weke ji hemû zemanên cîhanê bêhtir, bûye 'sîstemeke şaristanî ya cîhanî', her wisa ev şaristanî xwedî wê taybetmendiyê ye ku, weke yek ji rehendên xwe yên herî girîng, hemwelatiya takekesî pêk tîne. Takekes, xweperestî û hemwelatî di ti serdemên dîrokê de di nava civakê de ewqas wate wernegirtine. Em bi rastiya serdemek wisa (modernîteya kapîtalîst) re rûbirû mane ku civak di nava takekes de û takekes jî di nava 'civaka hêmayî'de di mezintirîn pîvanan de hatine helandin.

Lewre, rastiyek e ku nikare were înkarkirin ku 'gûmandariya min a mezin', a ku ez ketmê di mijara nasnameya xwe ya avakirî de, weke hemwelatê Komara Tirkiyê (endamê Komara Tirkiyê), ya pêvajoyeke pirr dijwar (ne bêîmkan) a rizgarbûna ji vê rastiya serdemê, di bingeh de min bi sîstema darizandin û cezakirina herî giran a dîrokê re rûbirû hêşt. Ji ber ku Komara Tirkiyê weke welatek ku Hevpeymana Mafên Mirovan a Ewrûpa (HMME) îmze kiriye, biryara 'ji nû ve darizandinê' ku DMME di derbarê min de girt nepejirand, her wisa Konseya Ewrûpa guhdariya vê kir û dosyeya min li DMME vegerand, vê yekê bû binpêkirin û sosreteke tam a huqûqî. Pirraniya welatên piçûk li xwe mikur hatibûn ku di pêvajoya lêvegerandinê de ji ber zordestiyên DYE ketine ketine nava vê helwestê. Binpêkirinekê wisa mijara gotinê bû ku bi teoriyên hêza nerm re bi rengekî eşkere binakok bû. Ji ber vê yekê, ev tam deh sal in ku ez hatime xistin rewşa 'mirovê ku nikare were darizandin'. Ez hîn jî di Girtîgeha Îmralî ya Bûrsayê de, ku girtîgeheke hucre ya yek-kesî ye, (girtîgeheke giravî ye li Deryaya Marmara, ku têde weke kevneşopî girtiyên giran û navdar terkî mirinê têne kirin), vê rewşa xwe ya 'kesê ku nikare bi dadwerî were darizandin' didomînim.

Ez weke kes qet neketim gûmanê ku tevahiya vê pêvajoyê, ku bi gavavêtîna min a Ewrûpa re destpê kir û heya Îmralî hate jiyîn, bi hevkariya DYE û YE hatiye pêkanîn. Dîsa, ez neketim gûmanê ku rola ji KT re hate dayîn, gardiyanî bû. Dema ku rastiya tazî ev e, çima ewqas rêyên fetlanokî têne ceribandin? Belkî hin kes hebin ku vê daraza min giran bibînin. Lê, wê bi têra xwe îqnaker be, eger ez diyar bikim ku tevahiya balafirgehên Ewrûpa bi fermana taybet a Rêxistina Peymana Atlantîka Bakûr (RPABP/NATO) roja 2 yê Sibata 1999 hatin girtin ji daketina balafira ez têde bûm (ev bûbû mijara nûçeya rojnameyên wê demê). Ji xwe bi têra xwe raveker e diyarkirina bi rengekî fermî ji alî General Galtîerî ve, nûnerê Bîll Clînton Serokê DYE yê wê demê, revandina min a bo Kenyayê, her wisa girtina min a bin kontrola tund (tevahiya name û kasetên min li balafirgehê hatin desteserkirin) û îadebûyîna min a bo Tirkiyê. Lê ez ê pêwist nebînim qala xiyanetên ku nakevin heşê mirov, ên meqamên Yunanistanê (di serî de erkdarên hejmar yek ên Wezareta Karê Derve, Îstixbarata Netewî û Sefaretxanê), bikim. Ji ber ku van mijaran eşkere ne.

Madem sûdwergirtina min ji huqûqa Ewrûpa di wateya takekesî de mafêkî ye, wê demê çima serî li van tevahiya rêyên veşartî, tarî û bihîlê hatin dayîn? Çi cûre bazarî di nava vî karî de hebûn? Kî di berhemberiya çi de hatin xistin ser dika bazariyê? Ceribandina min belkî jî di okyanûsê de dilopek e di nava tabloyên herî xwînî yên dîrokê de, ji şerên bixof ên mêtingeriyê bigire heya şewitandina cadûyan, ji şerên mezheban bigire heya şerên netewî û ji pevçûnên çînî bigire heya pêvajoyên têkoşîna bîrdozî, ku di dîrokên desthilatî yên Ewrûpa û DYE de hatine jiyîn. Lê dîsa jî girîng e û pêwîst dike ku were vegotin.

Berî her tiştî divê ez diyar bikim ku ez red dikim wê feraseta ku takekes ji nasnameya wê/wî ya civakî razber dike. Ew mafê ‘serlêdana takekesî’ ku bi pêdagerî/israr tê ferzkirin, qet ne xwedî wateya ku tê gotin e. Ji ber ku sêwirana takekes a/ê razberkirî ji nasnameya civakê, dereweke epistemolojiya fêrmî ya bi navenda Ewrûupa ye ku xwe pirr zanyar nîşan dide. Bi ser de, sultanên kerr jî bihîstine û dizanin ku ez tême darizandim bi navê Kurdan, ku di rewşa gelê herî trajîk ê cîhanê de ne.

Van sedemên ku min pirr bi kurtî anî ziman, di mijara wergiriya doza min de bi têra xwe raman didin mirov. Eşkere ye ku ez nikarim bême xistin nava rewşa kesekî kujerê wî ne-diyar. Ev rastî nikare were înkarkirin ku hêza sîstema şaristaniya navendî (ya di bin serokatiya serwerî ya DYE û YE de) çi dibe bila bibe, di doza min, girtina min û darizandina min de, tevahiya hêzên sîstemê, bi awayekî ku nikaribe were redkirin, roleke çalak leyistine. Wekî din, gelê min di vê pêvajoyê de li hemberî vê leyîstokê bi awayekî sertaserî bi berdewamî rabû ser piyan; şermezar kir, bi sedan şehîd da û bi hezaran jî hatin girtin. Gelê min pêwendiya doza min bi trajediya xwe ya dîrokî re pirr baş têgihîşt û, bi zanebûna ku rizgariya wî di xirakirina vê trajediyê re derbas dibe, xwedî lê derket; û erka birûmet a vegotina vê yekê jî kete ser milê min.

Eşkere ye ku heya ez ronî nekim nasnameya xwe ya civakî, ku şêwe dide rastiya me ya gel, ku bi dirêjiya dîrokê rastî zordestî û mêtina belkî jî ya herî mezin a sîstema şaristaniya navendî ya herî kêm pênc hezar salî hatiye, nikare were kirin mijara gotinê ku ez mijara doza xwe ronî bikim. Pîvangên jêveneger ên bidestgirtina parêznameya min di vê wergiriyê de, di van rastiyan de veşartî ne. Divê ez bêjeyeke xwe ya pirrî caran dubare dikim, dîsa bêjim: “Kêliyên wisa çêdibin ku dîrok di kesek de û kes jî di dîrokê de veşartî ye.” Nikare were înkarkirin ku min rûmeta vê kesayetiyê, her çend pirr biêş jî derbas bû, bi qismî parve kir. Lê cewaziya min ew e ku ji ber min xwest ez ji bûyîna

‘qurbanekî qederê’ ya vê dîroka trajîk wêdetir rol bilîzm, loma ez pirr baş dizanim ku van dik û dolaban anîn serê min. Ji ber vê yekê min dîrûşma vê dozê bi vî rengî destnîşan kir: **“Wê azadî bi serkeve!”**

Xirakirina qederê, ku di lîstokên trajediyan de hertim tê dubarekirin, bi sûda azadiyê, têrê dike ku mirov xwe li hemberî her cûre êşan ragire. Bi doza min û hevalên min ên dozê re, di lîstina lîstokek de, ku vê carê navê wê rastî bi xwe ye, tişta dibe para qederê têkçûn e.

Ji ber van sedeman, têgihîner e ku ez navê Sosyolojiya Azadiyê li vê beşa parêznameya xwe bikim. Her gavek ji bo azadiyê dikare ancax bibe cerbandînek. Lewre ‘**Ceribandinek li ser Sosyolojiya Azadiyê’**, binavkirinekê di cî de ye.

Bê gûman, şaristaniya Erûpa ya serweriya navendî, nûneriya tenê aliyekî madalyonê dike. Ev şaristanî, bêhtir tê wateya emrazên desthilatî yên damezrandî li ser nirxa bermayî. Lê aliyê din, rûyê demokratîk ê şaristaniyê ye. Ramanên ku dibin hîmên vê parêznameyê mîrasa şaristaniya demoratîk esas digirin. Em ji Sokrates bigirin heya doza min, ez bi dildariyeke mezin dilsozî têkoşerên ramanî û exlaqî, her wisa şervanên gel û komun ên bêhejmar im. Tişta ez karibim bikim ew e ku ez karibim tevkariyek weke çilkek di deryayê de li vê mîrasê pêşkêş bikim. Beşa sereke ya çavkaniya min, van bîrdarî/abîdeyên mirovahiyê ne. Lê belê helwestên demokratîk û pirzaniya bi kevneşopa Rojhilat a pênc hezar salî, ku di bingha wan de jî rol dilîzin, zemînê wê yê bingehîn ê dîrokî ye. Eger ev zemîn neyê hizirîn, çawa ku nikare dîroka gerdûnî ya mirovahiyê were nivîsandin, her wisa nikare nirxandineke watedar a roja me ya îro jî were kirin.

Ramana sereke ya parêznameya min ew e ku meşa dîrokî-civakî di sîstema şaristaniya demokratîk de azadtir pêş dikeve û jiyana ku çavkaniyên xwe ji hîmên rast bigire, ji alî takekesan ve baştir û xweştir tê jiyîn.

Her wisa wê ronîker û bexşîner be ku ez di mijara teknîka nivîsê de jî hin xalan diyar bikim. Destûra tenê yek pirtûk, yek kovar û yek rojname di mercên hucreyê de heye. Loma gengaz nebû ku min jibergirtin û nîşeyan bigirta. Rêbaza min a bingehîn ew bû ku her mijarên min girîng didît, min wan li bîrewerî/hafizeya xwe qeyd kir û bi kesayetiya xwe da hezmkirin. Min stûyê xwe bi kolewarî netewand li hemberî her qedexeyan. Bersiva ku min da van qedexeyan ew bû ku ez bîrewerî/hafizeya xwe, ku depoya zanînê ya gerdûnê ye, herku biçe zelal bîkim û ramanên ku girîngiya wan a destnîşankar hebin, deynim rêza pêş.

Lê belê lewaziya herî mezin a vê rêbazê ew e ku mrov ji bîr dike. Bênîşeyî di vî milî de rola astengker leyîst. Dema min xwe amade dikir ji bo nivîsandina vê beşê, qedexeya pênûsê jî hat. Lê, dema ev qedexe di roja dehemîn a cezaya hucreyê de rabû, min yekser dest bi nivîsê kir. J ber herku diçû ez dereng dimam û min nedikarî ez soza xwe pêk bînim. Bersiva ku min da qedexeya pênûsê, ew bû ku min xwe li ser pêşnumaya sereke zêdetir kûr kir.

Herdu beşên piştî vê, yên parêznameya min, têne sêwirîn, wek cûreyek pêkanîna li qadên şênber a ramanên min ên sereke, bi navên ‘Demokratîkkirina Çanda Rojhilata Navîn’ û ‘Çareseriya Şaristaniya Demokratîk Li Kurdistanê.’ Diyar e wê demeke dirêj bigire ji bo ez karibim van beşan derbasî nivîsê bikim, ku her rewşenbîrek xwedî pêş-amadekariya diyar, dikare vana pêk bîne. Lê, gotûbêjkirina rojaneyê di ronahiya tehlîlkirina civaka-dîrokî li Rojhilata Navîn ku dikele û li

Kurdistanê ku bûye dilê wê, xeylî heyecan dide mirov û mirov dike berpirsyar. Çareserkirina vê kêliyê, ku ya ku paşeroj-niha-pêşeroj e, hema hema Girêkek nû ya Gordiyon pêk tîne, bi lêdana antî-Îskender (hêza ku weke Îskender lê dide, lê aliyê wê yê fizîkî hindik e û, tenê dema pêwîst bike, wê bikar tîne; lê wate, aliyê wê yê destnîşankar pêk tîne), dibe ya herî pîroz û sereke ya erkan.

## 2- DESTPÊK

Pekhateya zanînê ya sîstema cîhana kaptalîst, herî kêm bi qasî emrazên desthilat, berhem û danehevê, di nava qeyranê de ye. Ji ber ku pêkhateyên zanînê, li gorî pêdiviya xwezaya xwe, bêhtir meyldar in ji bo gotûbêja azad, vê yekê derfetên berfireh pêşkêş dike li ser rehendên qeyrana zanistî. Rola zanînê ya di pêkhateyên civak û desthilatî de, di rehendên ku bi ti serdeman re neyên berawirkirin de, dikare wate wergire. Emrazên jiyana civakî yên zanîn û pevnasîn, şoreşeke dîrokî dijîn. Pêvajoyên şoreşgerane, weke qeyran, di cewher de rola gerîna li heqîqetên rejîmê jî dilîzin. Serwerî, ne tenê xwe di qadên danehev, berhem û desthilatiyê de bicî dike; her wisa mirov di qada zanebûnê de jî dibe şahîdê têkoşînên dijwar ên ji bo serweriyê. Ti pêkhateyekê berhem-danehev-desthilatî, ku di warê zanebûnê de rewatiya xwe misoger neke, nikare hebûna xwe demeke dirêj bike mayînde.

Zelal dibe û tê gotûbêjkirin ku zanistên pozîtîv, ku heya dema nêzîk serweriyên xwe didin berdewamkirin, qet ne bi perspektîva dij-metafizîk û dij-ol în, weke têne nîşandan; lê herî kêm bi qasî metafizîk û olê, rehendeke metafizîkî olî di xwe de werdigirin. Serkeftina zanistên xwezayê, ku têne kirin malê civaka Yunan a berê û Ewrûpa ya serdema Ronakbîriyê, di singê zanistên xwezayê bi xwe de, derbeyên girîng dixwin. Feraseta pêşveber û rastbêj a berdewamî, aliyê herî lewaz ê van zanistên pozîtîv pêk tîne. Ji ber ku nikare were tespîtkirin pekhate û armancek wisa ya gerdûnê. Hem cîhana jêr-atomî û hem gerdûna kozmolojîk nikarin xwe ji dubendiya çavdêr û çavdêrbûyî rizgar bikin. Ji ber ku bîreweriya mirov jî di wergiriya vê pêvajoyê de ye. Nikare were texmînkirin ka wê çawa rola ser-wergiriyê li xwe bike. Potansiyela cewazbûna bêsînor bi xwe pêwîst dike ku şîroveyên nû çêbibin. Sosyolojî, ku pêkhateyeke zanînê ya binavenda Ewrûpa ye, di rastî de çawa ku hewesvanên zanista pozîtîv di fizîk, kîmya û biyoloji de dikin, ew jî civakê weke diyardeyeke dirûv dihesibîne û ji îdeaya ravekirina civakê bi heman nêzîkatiyan wêdetir naçe. Rastiya ku lê hatiye cesaretkirin ku civaka mirov, ku xwedî xwezayeke pirr cewaz e, were objektîvkirin, ev ne rê li ber ronakbîriyê, lê berevajiyê tê texmînkirin, nekariye xwe rizgar bike ku rê li ber pûtbûneke reqtir veneke. Gotûbêjên zanistî yên roja me ya îro, bi têra xwe digihînin zelaliyê ku her yek ji vebûnên felsefe yên bîrdozgerên Alman, zanista aborî û siyasî ya bîrdozgerên Îngilîs û sosyolojiyên fîlozofên Frensî, ku hatin bezandin nava kar ji bo ji dewlet-netewên xwe re pêkhateyên zanînê pêşkêş bikin, navgînên rewakirina emrazên danehev ên desthilatî û sermaye ne. Felsefeya Alman, siyaseta aborî ya Îngilîs û sosyolojiya Frensî, di tehlîla dawî de nekarîne xwe rizgar bikin ji bûyîna zemînê netewperestiya dewlet-netewê, ku hildihat. Em dikarin bi hêsanî bêjin ku van sosyolojiyan, ku navenda wan Ewrûpa ye, bi tevahî pêkhateyên zanînê yên sîstema cîhanê ya kapîtalîst in, ku navenda wê Ewrûpa ye.

Lê, gotina van tiştan pirsgirêkê çareser nake. Bi têra xwe gihîştiye zelaliyê ku sosyalizm jî, yan jî sosyolojiya Marks û Engels, ku weke nêrîna dijber derket holê, şîroveyeke herî çors a li ser civakê ye. Em dikarin ji bizav, tevger û sîstem ên dewletan, ên sosyalîzma pêkhatî, demokrasiya

sosyal û rizgariya netewî, bi têra xwe têbigihîjin ku, tevî hemû îdeayên wan ên dijberiyê, nekarîne xwe rizgar bikin ji xizmetkirina ji kapîtalîzmê re, zêdetir ji lîberalîzmê, ku bîrdoziya fermî ya kapîtalîzmê ye. Ketina wan a nava vê rewşê, hem jî bi navê çîn û netewên bindest, tevî kevneşopiyên wan ên pîroz ên têkoşînê, girêdayî ye ji nêz ve bi pêkhateyên wan ên zanînê ve. Pêkhateyên zanînê ku xwe spartinê, bi aliyên xwe yên erênî û neyînî ve, bi giştî encamên dijberî yên dihate arzûkirin, hilberandine. Eger di paradîgma û pêkhatêyên wan ên bingehîn de zincîrekê cidî ya şaşîtî û kêmasiyan nebûya, wê van encaman wisa bi hêsanî derneketana holê.

Teoriyên dîmanetiya pirole jî, ku xwe weke bizaveke din a dijber ferz dikin, em li milekî bihêlin xwe rizgarkirina wan a ji bûyîna pêkhateyên zanînê yên sîstema cîhanê ya kapîtalîst, lê ji ber takekesbûnên xwe yên pirole, belkî jî dikarin bêjin ku xwe gihandine şayaniya xizmetkirina herî zêde ji xweperestiya kapîtalîzmê re. Nêzîkatiyên anarşîst jî di nava vê de ne. Mirov kapîtalîzmê rexne bike û bi berdewamî bêje ‘ez pirr li dijî kapÎtalîzmê me’; ev, weke pirrî caran tê dîtin, dibe rêya herî bandorker a xizmetkirina ji wê re. Di vê yekê de jî di bingeh de nêrîna wan a paradîgmatîk û nebesî û şaşîtiyên di pêkhateyên wan ên zanînê de rol dilîzin.

Zanistên fizîkê, ne, girêdana wan, bi qasî ku tê gotin, tenê bi xwezaya fizîkî re (kîmya û biyolojî jî têde) heye û ne jî wêje, dîrok, felsefe, siyaseta aborî û sosyolojî, ku ji wan re tê gotin zanistên beşerî, tenê bi xwezaya civakî re pêwendîdar in. Gengaz e mirov têgîna zanista civakî weke xala hevbirrê ya herdu zanistan, bi wateya wê ya fireh, bi rengekî erênî pêşwazî bike. Ji ber ku divê her zanist civakî be.

Bi lihevkirina di pênaseya zanista civakî de, pirsgirêk çareser nabe. Ya girîng ew e bê ka wê çi weke modêla bingehîn were pejirandin; bi gotineke din, ka wê kîjan yeke di tehlîlkirina civakê de esas were girtin. Zêde wateya wê tine ye ku mirov ji bo zanista civakî bêje “yekeya bingehîn, bi tevahî xwezaya civakî ye”. Bijareya ku pêwîst e beriya peşî were kirin, ew e ku mirov di nava pêwendiyên bêhejmar ên civakê de yên ku girîngiya wan a destnîşankar heye, bibijêre ji bo nêzîkatiyeke teorîk a watedar. Yekeya civakî ya were bijartin, di rêjeya ku gelemperiyê rave bike de, wê watedar were dîtin.

Tê zanîn ku modêlên cûrbecûr di derbarê qada civakî de têne pêşxistin. Nêzîkatiyên ku dewletê bi giştî û dewlet-netewê bi taybetî esas digirin, weke yekeya ku tê zanîn û herî zêde tê bikaranîn, bêhtir xwe dispêrin perspektîva çîna navîn a burjuwa. Dîrok û civak têne lêkolîn di van nezîkatiyan de li derdora pirsgirêkên avabûn, rûxîn û dabeşbûna dewletan. Ev meyl, ku yek ji modêlên nêzîkatiya herî req e di rastiya civaka dîrokî de, ji bûyîna feraseta perwerdeya fermî ya dewletan wêdetir rol nalîze. Armanca wê ya bingehîn ew e ku rola bîrdoziya rewakirina dewletê bilîze. Bêhtir ji bûyîna ronakbîriyê, ji nuxaftina pirsgirêkên girîft ên dîrok û civakê re xizmet dike. Di şûngeh/pozîsyona nêzîkatiya sosyolojiya herî bêrûmet de ye.

Nêzîkatiya Marksîst, ku çîn û aboriyê weke yekeya bingehîn ji xwe re bijart, xwest xwe weke modêla alternatîv li hemberî yekeya dewletê formule bike. Bijartina çîna karker û aboriya kapîtalîst weke modêla bingehîn a lêkolîna civakî, her çend di warên pêkhate û girîngiya wan a aborî û çînî de tevkarî kiribe li ravekirina dîrok û civakê, qisûrên pirr girîng di xwe de wergirtiye. Ji ber ku ev nêzîkatî saziyên dewletê û seresaziyên din weke berhemên binesaziyê hesiband û vana weke teyisanên basit nirxand, bû sedem ku bişemite nava daxistkariya ku jê re tê gotin ‘ekonomîzm’. Daxistkariya aborî jî, heman weke daxistkariya dewletê, nekarî xwe rizgar bikira ji qisûra nuxaftina

rastiya civaka-dirokî, ku xwedî yekpareya  pêwendiyên pirr girîft e. Bi taybetî, nebesiya tehlîla li ser desthilatî û dewletê, bû sedem ku gel û çîn ên karker ên bindest, ku îdea dikir bi navê wan tevdigere, nekaribin xwe bigihînin rapêçana bîrdozî û siyasî. Feraseta hilweşandin û avakirina deshilatî û dewletê bi têkoşîneke teng a aborî, bi awayê komplogeriya dewletê ya keysbaz, ji kapîtalîzmê re xizmet kir, herî kêm bi qasî lîberalîzmê ku birdoziya wê ya xas e. Rastiyên Çîn û Rûsya vê mijarê pîr baş ronî dikin.

Her wisa mirov bi pirranî rastî ferasetên wisa jî tê, ku dixwazin civak û dîrokê tenê weke hêz û erka desthilatiyê şîrove bikin. Lê van nêzikatiyan jî bi qasî bijareya dewletê biqisûr in. Her çiqas desthilatî yekeya  lekolîneke wergirtir e jî,  bi serê xwe bêpar e ji ravekirina xwezaya civakî. Ji  ber ku desthilatiya civakî mijareke pirr girîng a lekolînê ye, xwedî aliyên raveker e. Lê daxistkariya desthilatî jî xwedî qisûran e ku çavdêriya wan di her cûre ferasetên daxistkar de têne kirin.

Her wisa lêkolînkirina civakê bi awayê pêşketînên pêwendiyane yên tekaner ên bêdawî û bêpar ji rêsayan,  cûre nêzîkatiyek e ku pirrî caran derdikeve pêşiya me. Van nêzîkatiyên dîmanewer ên pirolê, ku em dikarin wan weke modêla nêzîkatiya wêjeyî ya şayeskar jî biwesfînin, tenê mirov di nava daristanên civakî de wenda dikin. Lê modêlên nêzîkatiya pirolê ya  gerdûnewer, ku weke berevajiya wan dixuyin, lê di cewher de heman rolê dilîzin, hewl didin civakê di nava reseniya wê ya fizîkî de bi çend zagonan ve pênase bikin. Reng e ev be ew nezîkatiya ku li pêşberî cîherengiya zengîn a civakê, herî zêde ji korbûnê re xizmet dike. Hêjayî bîranînê ye ew feraseta pozîtîvîst a li ser civakê, weke modêla herî çors, ku hem dîmaneweriya pirole û hem gerdûneweriya pirole di xwe de werdigire.

Lîberalîzm, weke bîrdoziya fermî ya çîna navîn a burjuwa, xwe bi awayê bijareyeke eklektîk ji van hemû modêlan pêşkêş dike. Bi vî rengî, di dîmen de, weke ku xwediyê aliyên rast ên her modêlan be,  xwe dike sîstem. Lê di cewher de aliyên herî biqisûr ên hemû modêlan bi hin rastiyan re têkel dike û bi vî rengî awayekî herî xeter ê eklektîzmê, weke modêla herdemî ya lêkolînê pêşkêşî civakê dike; weke feraseta fermî, bîreweriya kolektîv a civakê dike mêtingeh û wê dagir dike û bi vî rengî serweriya xwe ya bîrdozî misoger dike.

Ez neçar mam ku xebata xwe ya bi navê **‘Ji Dewleta Keşîş A Sumer Ber Bi Şaristaniya Demokratîk Ve’** pêşkêş bikim, bêyî ku ez wê zêde bikim modêla xebatê, heta bêyî ku ez di ferqa wê de bim jî. Min wê parêznameya xwe pirr bi lezgînî amade kiribû, bêyî ku ez zêde derfeta lêkolînê bibinim. Her wisa îdeayeke min a wisa jî tinebû ku ez modêlek pêş bixim. Min di derbarê rastiya civakî de şêwazek, ku ez ji ber xwe ve xwediyê wê bûm, anîbû ziman. Lê demên piştre derfeta min çêbû ku ez modêlên nêzîkatiya hin  sosyologên navdar, di serî de Murray Bookchîn, Îmmanuel Wallersteîn û Fernand Braudel,  lêbikolim. Wekî din min di cewher de Nietzshce, Mîchel Foucault û hin fîlozofên din jî têdigihîşt. Ê herî girîng di nava vana de Andre Gunter Frank bû, ku nêrînên gelek ramannasan di berhema xwe ya bi navê Sîstema Cîhanê de berhev dike û pêşkêş dike. Ez dereng nemam ku berheva vî ramannasî, ku min tew navê wî jî nedizanî, bikim parêzvana herî biîdea ya parêznameya xwe. Ji ber ku gelek ramannas di vê dema dawî de di hin lêkolînên xwe de nêzîkatiyên dirûv pêşkêş dikin, vê yekê dehf da min ku ez li ser xebata xwe ya modêlê bêhtirlêhûrbûnê bikim.

Hem analîza I. Wallersteîn a sîstema-cîhanê ya kapîtalîst û hem analîzên yekparegir ên Fernand Braudel ên ‘demajoya dîrokî’, ji xwe di parêznameya min de sertayên girîng  di xwe de werdigirtin. Her wisa tevkarî pêşkêş dikirin li hewldana min a dema dirêj a revekirina sosyalîzma

pêkhatî bi nêzîkatiyên dirûv. Wekî din, çawa ku min zoriyê nekişand ku ez şîroveyên Nîetzsche û Mîchel Foucault, ên di derbarê modernîte û desthilatî de, têbigihîjim; bi ser de, min wan xeylî nêzî meylên xwe yên bingehîn didît. Her wisa berhema Gordon Chîlde, ku bêyî bîranîna navê wî ez ê nikaribim derbas bibim, a bi navê 'Gelo di dîrokê de çi rû dan/qewimîn?', ku li ser bingeha xebatên arkeolojîk ên li Mezopotamya nivîsandiye, asoveker bû. Ez neçar mam bijareyek bikim, bi rêya girtina dest û lêkolîna pirr zêdetir xebatên fîlozofî, her yek ji wan hema hema di wesfa raporan de, bêyî ku yekeya xwe ya modêlê îdea bikim. Divê şaş neyê têgihîştin ku ez rêbaza analîza pêşvebirîtir a vê parêznameya xwe ya mezin, hema weke ku modêlek be, pêşkêş bikim. Hemû derdê min ew bû ku ez bijareya xwe bikim ji bo yekeya analîzeke yekparegir û destnîşankar a dîrokî-civakî. Tevahiya modêlên heyî, weke ku min bi kinahî qala wan kir, her çend gelek aliyên rast di xwe de werdigirin jî, xwedî qisûr û şaşîtiyan in jî, ku mirov nikare wan bide ber çavan. Min di hemûyan de kêmasiyên hevbeş tespit dikir.

Ji min re wisa xuya kir ku 'Sîstema Cîhanê' jî, ya Andre Gunter Frank, ku modêla ez herî zêde nêzî wê bûm, qisûreke pirr cidî di xwe de werdigire. Eşkere bû ku civaka Sumer, ku em sîstema cîhanê dispêrinê, yekemîn daneheva sermaye pêk aniye. Her wisa ez nêzîkatiye wî ya daneheveke lodane (kumulatîv), weke şaristaniya çemê dayîk ji civaka Sumer heya roja me ya îro, ta radeya dawî rast dibînim. Ez tevlî wê yekê jî dibim ku danehev, bi awayê serwerî-hemberî, navend-derdor û nizmbûn-bilindbûnê, xwedî domdariyeke dîrokî ye. Rehendên aborî, siyasî û bîrdozî-exlaqî weke sêlingeya distane ku têde danehev pêk tê, mijarên watebar bûn. Dîsa, girîngiya şêwazên danehevê bêhtir ji şêwaza hilberînê, di vê wergiriyê de ye ku derbaseyên serwerî ji derbaseyên şêwaza hilberînê zêdetir encamên girîng diafirînin. Di cî de bû ku Frank rexne girtiba li analîza I. Wallersteîn a sîstema cîhanê ya kapîtalîst a bi navenda Ewrûpa, ku kapîtalîzmê weke tekane sîstema ku di asta cîhanê de pêk hatibe pêşkêş dike. Îstîsnaîbûna şaristaniya Ewrûpa, nêzîkatiyeke pirr nitrandî bû. Ew bi xwe, belkî jî weke şaristaniyêke nûk, dikarîbû weke marjinal jî bihata hesibandin. Dîsa, nirxandina têgînên bingehîn ên civak-şêwe, herwekî sosyalîzm, kapîtalîzm, koledarî û feodalîzm, weke rastiyên bîrdozî, nêzîkatiyeke zêdetir nêzî rastiyê bû. Her wisa xizmetkirina van têgînan ji nuxaftina rastiya civakî re, behtir ji ravekirina wê re, ramanek wisa bû ku diviyabû mirov wê di pişt guhê xwe re neavêta û hêja bû ku li ser wê bihata rawestîn. Gerîna wî ya li 'yekîtî di nava cewazî de' dikarîbû tevkarî li çareseriyê pêşkêş bikira, lê têrê nedikir. Dîsa, eşkere bû ku tevkariyeke zengîntir li tehlîla li ser 'civaka-dîrokî' pêşkêş dikir. Lê dîsa jî divê ez para wî ya şelipînê jî weke analîzeke sîstemê binirxînim ji bo jiyaneke civakî ya baştir û xweştir. Lê belê, qisûra wî ya bingehîn ew bû ku xeteriya pêşkêşkirina çerxeke çemberdar a girtî di xwe de werdigirt, weke ku nekarîbûya bihata derbaskirin. Li sîstemên desthilatiya serwerî, weke ku qeder bin, dihate nêrîn. Ji wê jî rasttir, çareserî weke diyalektîk nedihate nîşandan.

Esasgirtina analîza I. Wallersteîn a sîstema-cîhanê ya kapîtalîst, weke demajoyeke pêncsed salî, têrê nedikir. Eşkere bû ku eger tehlîlên xwe spartiba demajoyeke pênc hezar salî, wê bêhtir berdar bûya. Me sertayên vê yekê di nirxandinên gelek ramannasan de, yên li ser sîstema-cîhanê, dît. Aliyê wê yê raser ew e ku I. Wallersteîn kariye analîza derketina ji sîstema-cîhanê bi rengekî xurttir bike. Nêzîkatiyên wî di wesfa pêşkêşvaniya tevkariyê de bûn.

Pêşkêşkirina Fernand Braudel hem tehlîla xwe ya li ser kapîtalîzmê û hem jî feraseta xwe ya yekparegir a li ser civakê, bi awayê 'demajoyên dîrokî, bi rastî jî di wesfa asoveker de ye. Girîng e ta radeya dawî ku dijberiya kapîtalîzmê bi taybetî li hemberî bazarê destnîşan dike û dikirpîne ku

yekdestiyên desthilatî û yekdestiyên aborî xwedî taybetmendiyên dirûv ên danehevê ne. Hevokek wî ya ku herî zêde kêfa min jê re tê, ev bû: “Desthilatî hertim sermiyan (kapîtal) avzê dikin.” Dîsa, gotina wî ya “Desthilatî jî weke pere tê berhevkirin”, destnîşankirinên wisa ne ku, ji bo kesên ku tebigihîjin, nirxa wan a fêrkariyê bilind in. Vê yekê jî xeylî destnîşankar û fêrkar e ku hem I. Wallersteîn û hem jî Fernand Braudel serneketina şoreşên sosyalîst, li milekî bi nekarîna wan a derbaskirina modernîteya kapîtalîst ve gire didin. Lê ez jî tevlî wê yekê dibim ku pêwîst e ev herdu ramannasên navdar di mijara ‘daxistkariya aborî’de, ku ew bi xwe qala wê dikin, werin jêpirsîn.

Divê ez careke din diyar bikim ku nêzîkatiya min a zanista civakî, her çend ji van ramannasên girîng, ku min qala wan bi rengekî pirr sînordar jî be kir, bandor girtibe û ji ramannasên din ên bi hejmareke pirr zêde, ku min qala wan nekir, bandorên dirûv girtibe jî, rehendên xweser di xwe de werdigire. Ez di wê baweriyê de me ku min zêdetir kûr kir û sîstematîze kir wan mijarên ku min di duyemîn parêznameya xwe ya mezin a bi navê **‘Parastina Gelekî’**de rave kiribû. Di bingeha baweriya min de ev mijar heye: li gorî min epîstemolojî (pêkhateyên zanînê) yên heyî nekarîne xwe rizgar bikin ji bûyîna perçeyek ji emrazên desthilatiyê. Vê yekê, tevî vîna wan, wisa ye. Qet gûman jê nîne ku kesekî xwedî nêzîkatiya herî zanistî weke Karl Marks, kesekî wisa ye ku rûyê rasteqîn ê kapîtalîzmê bi awayekî herî xurt dîtiye. Lê vê taybetmendiya wî ya pirr girîng têrê nekiriye ku wî ji modernîteya kapîtalîst qut bike. Pêkhateyên zanînê ku Marks xwe dispart wan û jiyana wî, bi hezaran pabendan girêdayî modernîteyê bûn. Ez vana diyar dikim, ne ji bo tewanbarkirinê, lê ji bo ku rastiya wî were têgihîştin. Pirsgirêkên dirûv ji bo Lenîn û Mao jî derbasdar in. Sîstema ku dihizirîn, bi gelek pêşaneyan (di serî de pêkhateyên zanînê û ferasetên jiyana nûjen), girêdayî jiyana modernîte (modernîteya kapîtalîst) bû. Ji bo mînak, dihizirîn ku wê mijarên dêwane, yên weke sanayîgerî û dewlet-netew, bi naverokekê sosyalîst feth bikin. Lê di rastî de van qalibên bingehîn ên modernîteyê, weke şêwe û naverok, berê xwe dabûn daneheva sermayeyê. Ya ku wê wan esas girtiba, çiqas dijberê wê bûya jî, wê nekarîbûya xwe ji zayandina kapîtalîzmê rizgar bikira. Rexneyên min ên li ser sosyalîzma pêkhatî di van hemû mijaran de pirr zelal bûbûn. Lê rexne têrê nake. Divê ez çi deynim şûna wê? Pirsa girîng ev bû. Dîsa, pirsa ez tim li ser lêhûrbûm jî ev bû.

Ji bo min pirr pêwîst û çareserker dixuye ku bijareya şaristaniya demokratîk, tevî ku di dîmen de pirr basît bixuye jî, weke modêleke nêzîkatiya sîstematîk di bin vî navî de were pêşkêşkirin, heya ku binavkirineke nû guncav were dîtin. Berî her tiştî ev bijare sîstemeke alternatîv li hemberî sîstema navendî ya cîhanê peşniyar dike. Şaristaniya demokratîk, ne tenê ji bo roja me ya îro û pêşerojê utopyayek e, lê di heman demê de ji bo şîroveya şênbertir a li ser civaka-dîrokî jî ta radeya dawî pêwîst û raveker dixuye. Pêdiviya xwezaya civakî ye ku di her mercên dem û cî de, ku têde danehevên sermaye û emrazên desthilatî yên rê li ber wan vedikin hebin, li wê derê berxwedanek û alternatîvek hebe. Civak di ti cî û dem de li hemberî danehevên sermaye û emrazên desthilatiyê bêberxwedan û bêalternatîv tevnegeriyane. Divê sedemên ku bi pirranî têk çûne, ne di nebûna berxwedan û alternativê de, lê di mercên dîtir de were gerîn.

Eger em çîrokên danehevên sermaye û desthilatî, ku nakevin heşê mirov, pirr baş hezm nekin, em ê zoriyê bikişînin ku têgîna şaristaniya demokratîk watedar bikin. Pêkhateyên zanînê di vê mijarê de her tim di nava du şaşitiyan de çûne û hatine: yan di nava pêkhateyên zanîn û desthilatiyê de bi tevahî heliyane, yan jî bi awayên mezhebên sekter (bêyî ku karibin zanistên xwe, bijareyên xwe yên siyasî û helwestên xwe yên exlaqî bi rengekî serbixwe bibijêrin), nekarîne xwe ji bicûrkbûyînê yan jî ji bûcirkmayînê rizgar bikin. Bê gûman di vê yekê de pêwîst e mirov bi

berdewamî rola zorê û sermaye, ku mirov ji serî derdixin, li ber çavan bigire. Ta ku van herdu ferasetên pêkhateyên zanînê neyên mehkûmkirin, mirov nikare bijareya şaristaniya demokratîk bide xuyanîkirin. Tişta ku divê were jêpirsîn, ne hebûna rastiya şaristaniya demokratîk e, lê mezhebgeriya jirêderketî û pêkhateyên zanîn û desthilatiyê ne, ku ji dîtina wê aciz hatine hêştin. Van rastiyan, ku nikarin tenê bi kêmasî û şaşîtiyên vegotinên li ser civaka dîrokî bêne ravekirin, dikarin ancax bi 'destpêkêke zanistî', anku bi şoreşek di zanistên civakî de werin veguherandin.

Pêkhateyên desthilatî û dewletê, sazbûyî li ser danehevên sermaye yên pênc hezar salî, bi ezmûnên xwe yên rojane gelek baş dizanîbûn ku, eger pêkhateyên bîrdozî û zanînê yên di mezintirîn pîvanan de birêxistin nekirana, wê nekarîbûna rejîmên xwe bidana berdewamkirin. Divê were zanîn ku heya mirov weke hêmana bingehîn a çavdêriyê nebîne ku emrazên desthilatiya serwer berhema-bermayî û nirxa-bermayî, ku di heman demê de herduyên din ên sêwîkên wê ne, û navgînên rewakirinê bi berdewami kom dikin, wê zanistên civakî nikaribin bibin rejîmên heqîqetê yên watedar. Ta ku neyê têgihîştin ku pêkhateyên mîtolojî, ol, felsefe û zanista pozîtîv bi dîroka daneheva sermaye û desthilatî re di nava hev de ne û yekîneyên xwe yên berjewendiyê raçav dikin, wê nikaribe gengaz bibe ku di zanîstên civakî de şoreş çêbibe.

Duyemîn mijara girîng ku mirov ji têgîna şaristaniya demokratîk derxîne ew e ku di zanistên civakî de zemînê herî berfireh ji şoreşê re pêşkêş dike. Em vê yekê weke îdea (em dikarin jê re bêjin angaşt/tez jî) ya bingehîn çavdêriya wê dikin: mirov îdea bike ku tevahiya 'barbar', koçerên qewman, qebîle, komun, mezhebên jirêderketî, cadû, bekar û hejar ên dîrokê bêpar in bi berdewamî ji tevger û sîstemên watedar û ev qedera wan e, eşkere ye ku wê were wateya ku mirov bi navê berjewendiyên xwediyên daneheva sermaye û desthilatî pêkhateyên mîtolojî, ol, felsefe û zanistê hilberrine û emrazên daneheva zanînê çêbikê. Di dîrokê de, ne tenê serweriya sermaye û desthilatî heye; lê di heman demê de mekanîzma û serweriyên zanînê (yên mîtolojî, olî, felsefefî û zanistî) jî, bi van serweriyan re di nava hev de herdem di nava yekîtiya berjewendiyê de bûne û di nava hev de bûne mijara gotinê. Sedema serneketina pêkhateyên sereke yên zanistên civakî yên dijber, di serî de zanistên civakî yên Marksîst, ew e ku şoreşên xwe yên zanista civakî li ser bingeha tevahiya dîroka daneheva sermaye û destilatiyê negirtine dest û nekarîne wan bi sîstemeke şaristaniya alternatîv re di nava hev de peş bixin. Bê gûman gelek mijarên ku qala wan hate kirin, di rexneyên berfireh de hatine derbaskirin, lê nekarîne zêdetir bêne pêşvebirin û li çarçoveyekê yekeya vegotina ku tevahiya dîrokê wergire nava xwe, bêne rûniştandin. Her wisa nekarîne feraseta xwe ya sîstema cîhanê çêbikin û pêşî lê bigirin da ku nebin ceribandinên perçe-wesle.

Hêmana sêyemîn di sîstema şaristaniya demokratîk de ew e ku hêmanên bajêr û sanayî, ku ji şoreşa çandinî û pê ve pêş ketin, xwedî hêza pêşxistinê ne, bêyî ku firset bidin danehevên pirole yên sermaye, desthilatî û dewletê, spartî bi çînîbûna navîn û ku herdem rola şanika qansêrê di nava civakê de dilîzin.

Anku, ji bajêr û sanayî re tê gotin 'belê'; lê ji şanikên qansêrbûnê re, yên di bûnyeya wan de, tê gotin 'na'. Eger em çavdêriya şebekeyên bajar-sanayî-desthilatî û ragihanê yên roja me ya îro, ku bûne dêw, bikin û wekî din em wan bi van çavdêriyan re di nava hev de bidin rûniştandin ku rûxana jîngehê, statuya heyî ya jinê, her wisa hejarî û bêkarî di rehendên felaketê de pirsgirêkan pêk tînin, wê pirr baş wate wergire ku gotina qansêrbûnê ya di pekhateyên civakî de di cî de ye. Bi taybetî feryadên zanyarên civakî yên sereke yên roja me ya îro, di serî de yên I. Wallersteîn, wekî din yên

utopyageran, anarşîstan, herî dawî, yên femînîstan û tevgerên jîngehparêz; her wisa êrîşên qaşo ‘barbaran’(têgîna barbariyê wê ji nû ve were gotûbêjkirin), jirêderketîbûnên mezheban û serhildanên gundiyan, dikarin wateyek yekparegir wergirin li hemberî gefa qansêrbûnê ku di bûnyeya civakî de pirr wehîm bûye. Ti civak nikare xwe demeke dirêjtir ragire li hemberî wan danehevên heyî yên ku di emrazên bajar, çîna navîn, sermaye, desthilatî, dewlet û ragihanê de hene. Tevî ku civak, ku bi awayekî şipşidandî hatiye girtin nava qefesa ji hesin, nikaribe feryadên xwe biguhêze asteke encamgir, lê rastiya ku ekolojî bi awayekî rojane nîşaneyên hawarê (S.O.S) dide, pirr baş vedibêje ku sedema pirsgirêkan û rewşên qeyran û aloziyê sîstema şaristaniya navendî ya heyî ye; her wisa em îdea dikin ku, ji bo derketina ji aloziyê, ancax ronakkirinek, ku bi çavkaniyên bikok ên dîrokî û civakî ve hatibe girêdan û rojaneyê weke rewşa heyî ya van çavkaniyan tehlîl bike, pêwîst dike û pêşeroj jî dikare ancax li ser vê bingehê, bi Sîstema Şaristaniya Demokratîk a Cîhanî ya Navendî ve, were bidestxistin.

Parêznameya min wê li derdora ronîkirina vê teza sereke di rehendên cûrbecûr de lê hûr bibe. Hewldana min a têgihîştina dîrokê di rehendên gerdûnî de bê gûman girêdayî wê nêrînê ye ku eger dîroka gerdûnî nebe, dîrokên navçeyî nikarin wate wergirin, ku ez bawer dikim nirxeke rêgezî di xwe de werdigire. Bê gûman e ku dîroka civakên herî jêbirî jî dikare di ronahiya dîroka gerdûnî de were ronîkirin. Wekî din, ez di asta rêgezî de nirx didimê ku rojaneyî (rewşa nihayî) dîrok e û dîrok jî niha ye. Lê divê ez, bi rêya lêzêdekirina vê mijara girîng jî, dubare bikim ku ez van herdu rêgezên girîng ên dîrokî parve dikim: rewşa niha ya navçeyî, ne tenê weke dubareyek û weke kevneşopek, dîrokê dubare dike; lê teqez CEWAZÎ Û XWESERİYÊN XWE yên tevkariyê lê zêde dike û bi vî rengî di daneheva dîrokî de rola girîng dilîze. Anku dîrok ne tenê dubareyek e, lê tevkariya her cî û deman berhev dike û bi vî awayî xwe dubare dike.

Eger li cewaziyên, ne tenê di parêznameyên ên berî vê de, lê li yên di tevahiya axaftinên min ên nivîskî û dêvkî de di çarçoveya van rêgezan de were mêzekirin, ez gûman nakim ku wê vê nêzîkatiya min bi têgihîştî were pêşwazîkirin. Eşkere ye ku pêwîst e nêrînên min weke dubareyeke zuwa, yan jî laderiyeke bikok neyên şîrovekirin. Ji bo yên ku zanibin çavdêrî bikin eşkere ye ku pêşketin cewazbûn e û tekane rêgeza gerdûnê ew e ku mirov ancax bi rêya cewazbûnê guherînê pêktîne. Dema yek dike dudu, ne tenê daneheveke basît a çendanî çêdibe, lê bi vê re, weke cewaziya dudu her dem ji yekê pêk tê.

Di beşa piştî qismê pêşgotin û destpêka vê parêznameya min de, wê hin pirsgirêkên rêbazî bêne gotûbêjkirin. Wê were kirpandin ku perçebûna pirole ya di zanistan de tê wateya qeyrana zanistî û pêwendiya vê yekê bi qeyrana sîstemê re heye. Her wisa wê li ser wateya nêzîkatiya yekparegir a ji zanistê re were rawestîn.

Weke mijareke din a rêbazî, wê xwezayên cewaz, bi taybetî wê cewaziya xwezaya civakî were kirpandin. Wê di heman demê de di nava girêdana wê ya bi pirsgirêka jinê re were vekolîn ku vegera li xwezayê (Xwezaya Yekemîn), nêzikatiyên bikok pêwist dikin.

Wê ji veqetîna subje û obje re bi wurya nêzîkatî çêbibe, her wisa wê pirsgirêkên ku bûye sedema wan û rêyên derbaskirina wan were guftûgokirin. Dîsa, wê pêwendiya wê ya bi sîstema danehev a sermaye re were nîşandan û pêdiviya derbaskirina wê were kirpandin.

Her wisa pêwis te mirov zelal be di dubendiyên girîng ên rêbazî de yên weke gerdûnewerî-dîmanewerî, çerxanetî-xêzikîtî û kûrewîtî-navçeyîtî. Wekî din pêwist dike ku rêbaza diyalektîtî ji nû ve were şîrovekirin.

Zelaliya di têgînên rêbazî de dikare vegotina mijarên din hêsan bike. Ji ber vê yekê pêwîstî pê hat dîtin ku weke mijarek were rêkûpêkkirin.

Navê sernivîsa beşa çaremîn ev e: Nêzikatiyeke Felsefî ji Azadiyê re. Girîng dibe ku ev mijar were ronîkirin, ji ber ku girêdana sîstema şaristaniya demokratîk ji nêz ve bi azadiyê re heye. Wesfa zordar a sîstema şaristaniya navendî, karakterê şaristaniya demokratîk ê azadiyê dike sereke. Wê di vê beşê de pêwendiya xurt a wekhevî bi azadiyê re were tehlîlkirin. A girîngtir jî wê li ser wê yekê were rawestîn ku têgîna wekhevî ku têgîneke rasteqîn e, li ser bingeha ku cewaziyan raçav bike, were şîrovekirin. Wê di derbarê teza me ya sereke de vebêjer be ku li ber çavan were girtin ku têgînên wekhevî û azadî, ku di nava pêwendiya wan a bi sîsteman re nehatine  tehlîlkirin, di zanistên civakî de rê li ber pirsgirêkên girîng vekirine, ji nû ve bêne şîrovekirin.

Beşa pêncemîn rexneya li aqil a di cûreya mirov de dike mijara xwe. Dema hewl were dayîn ku aqilê civakî bê pênasekirin, wê hewl bê dayîn ku sazbariya wê di rehendên teorîk-pratîk û analîtîk-hestî de were ronîkirin. Gelo bikaranîna aqil ji aliyê sîstemên cîhanê ve, dikare rê li ber çi vebike? Gelo, hene sînorên aqil weke navgîna careserî û pirsgirêkan? Em dikarin çawa Emmanuel Kant bikin rojaneyî? Pirsên bi vî rengî mirov hişyarker dikin di mijara ku aqilê me bi xwe, ku em wî weke navgîna çareseriyê bi kar tînin, dikare rê li ber pirsgirêkên girîng veke.

Di beşa şeşemîn de zayîn û pêşketina pirsgirêka civakî tên lêkolînkirin. Wê hewl were dayîn ku bi awayê demajoyên dîrokî çavdêriya wê bê kirin ku sîstema şaristaniya navendî çavakaniya bingehîn a pirsgirêkan e. Sedema ku her diçe pirsgirêkên civakî ew qas li her alî zêde dibin, ji ber cewhera sîstemê ye. Lewre emrazên danehevê yên sermaye û desthilatî pirsgirêk bi xwe ne. Wê cûreyek dîroka pirsgirêkan were sêwirandin.

Di beşa heftemîn de sîstema şaristaniya demokratîk weke navgîna çareserker a pirsgirêkan tê pêşniyarkirin. Kîjan wateyan di xwe de werdigire ji nû ve sêwirîna dîrokê weke dîroka civakî? Her wisa têkiliya nequtbûyî ya di navbera civaka demokratîk û dîrokê de tê kirpandin.

Beşa heştemîn, weke dewama beşa heftemîn, hewl dide modernîteya demokratîk weke alternatîva modernîteya kapîtalîst pênase bike. Bi pîvana ku gengaz be, di ronahiya waneyên sotîner de tê vekolîn ka çima feraseta herdu modernîteyan pêwîst e. Bi taybetî têkçûna şoreşên hemdem di vê wateyê de dîsa di ber çavan re tê derbaskirin.

Beşên nehemîn û dehemîn hewl didin aloziya sîstemî ya kapîtalîzmê û derfetên çareseriyê tehlîl bikin. Gelo, dema ku modernîteya kapîtalîst weke awayê rojane yê sîstema şaristanî ya cîhanê ji hev dikeve, çi dikarin bibin alternatîvên wê? Em dikarin çawa modernîteya demokartîk ava bikin? Astengî û derfet çi pêşkêş dikin? Van pirsên ta radeya dawî sotîner, bê gûman bersivên xwe jî di nava xwe de werdigirin.

Beşa dehemîn weke encam tê hizirîn. Bîlançoya ceribandinê ji gelek aliyan ve tê raxistin ber çavan. Dîrok ne di xeteke rast a qedergerî de dimeşe û ne jî bi serê xwe ber bi armanca tê payîn ve pêş ve diçe. Ne bi serê xwe çavkaniya xirabiyê ye û ne jî zû ya dereng pêşkêşvana qenciyê ye.

Civakîbûna mirov dikare jiyîna xweşik gengaz bike. Civak bi xwe çavkaniyeke mezintirîn a çareseriyê ye. Tenê bes e ku em zanibin wê ji cûreyên nexweşiyên kujende, ji yên cûreyên qansêr jî tê de, biparêzin û em cîhana xwe, ku bihuşteke biheybet gengaz kiriye, têbigihîjin û bi vî rengî em bibijêrin ku bi awayekî xweşik bijîn!

**3- HIN PIRSGIRÊKÊN RÊBAZÎ**

Rêbaz, ku tê wateya rê ya ku mirov bi awayekî herî kurtebir digihîne armancê, ne têgîneke ji navenda Rojava ye. Ji serdemên herî kevn ve di bizavên pirzaniyê de tê ceribandin. Rêyên xwe gihandina zanînê her tim hatine ceribandin. Ên herî encamgir ên ji nava wan weke rêbaza bingehîn hatine bijartin. Şêwazeke ji edetê ye ku mantiqek, lewre rêbazek ji têgînên ku di dibistanên ramanî de li ser wan herî pirr tê ponijîn, were pêşxistin. Dema ku navenda serwerî ya sîstema şaristaniya cîhanî derbasî Ewrûpa bû, pêşketinên ku di gelek qadan de raserî pêk tînin, di mijara rêbazê de jî xwe dan xuyakirin. Derketina holê ya Descartes û Galileo di sedsalên 16. û 17. de bi nêzîkatiyên xwe yên girîng ên rêbazê (metod), girêdana wê ji nêz ve bi wê yekê heye ku sîstema serwerî derbasî Ewrûpa dibe.

Pêşketina veqetîna subje-obje, ku ji têgînên herî girîng ên rêbazî ne, têkildar e bi hikumkirina li ser xwezayê. Emrazên nû yên danehevê yên sermaye û desthilatî, herku giraniya xwe dan ser çavkaniyên hem fizîkî û biyolojîk û hem ên xwezaya civakî, dereng neman ku têbigihîjin ka van çavkaniyan çiqas raser in. Herku çavkaniya van herdu xwezayan dihatin objekirin, vana tevkariyên zêdebûyî li daneheva sermaye û desthilatî li pey hev pêşkêş dikirin. Beranberiya vê pêşketina daringî di ramanê veqetîna subje û obje ye. Ev rewş li cem Bacon bi rengê veqetîna objektîv-subjektîv xwe diteyisîne û li cem Descartes bi awayê dualîtiya tûj a giyan-beden, diteyise. Li cem Galileo matematîk weke zimanê xwezayê mîna pîvaneke herî pêşketî ya obje xwe datîne holê. Pêşketineke dirûvê pêşketina ku rêwîtiya dirêj a dîrokê bo Mezopotamya li Yunanîstana Çaxa Kevn rê li ber vekir, vê carê tevlî cewaziyên xwe yên xweser li Rojavayê Ewrûpa dubare dibe. Civaka Sumer jî di rastiyê de wan pratîkên jiyanê yên Mezopotamyaya Jorîn, ku di parzûna bi hezar salan de derbas bûbû, guhastibû Mezopotamyaya Jêrîn, cewaziyên xwe yên xweser jî tevlî wan kiribû û bi vî rengî awayê xwe yê resen afirandibû.

Çavkaniya subje di sîstemên şaristaniya navendî her dem sermaye û desthilatî ye; zanebûnê, gotinê û vîna azad dinimîne. Carna takekes e, carna jî sazî ye, lê her tim heye. Ya ku dibe para obje jî her tim barbar, gel û jin ên li derveyê desthilatiyê ne. Tenê dema ku wekî xwezayê ji subje re xizmeta çavkaniyê bikin, bibîr tên. Wekî pêdiviya xwezaya wan, nikare were hizirîn ku wateyên wan ên bi cûreyeke dîtir hebe. Çîrokên di mîtolojiya Sumerê de, ku mirov weke bende ji terxê xwedayan û jin jî ji hestiyên parsû yên zilaman têne afirandin, rehendên objekirinê di kûraniyên dîrokê de diteyisînin. Guhesîna vê nêzîkatiya obje û subje bo ramana Ewrûpa, bê gûman piştî veguheranên girîng gengaz bûye. Lê nikare were înkarkirin ku zincîra pêşketina wê di vê rasterê de bûye.

Jêbirîbûna veqetina subje-obje a di roja me ya îro de bi serekîniya kapîtalê ya fînansê re girêdayî ye. Serweriya hêmayî ya kapîtala fînans di şaristaniya navendî de tevahiya awayên kevn ên subje-obje ji hev xistiye. Her kes, li gorî ku pêwist be, xwe dixe şûna subje yan jî obje; sedema vê yekê bi rengêkî şidandî bi şêweyên nû yên daneheva sermaye û desthilatiyê ve girêdayî ye. Civak, bi emrazên sermaye û desthilatî (ku çavkaniyên wan netewperestî, olperestî, zayendperestî û

zanistperestî ne), ku di rehendên hem rastîn û hem ferazî de wekî aşûtê têne pirkirin, mîsala extapot hatiye pêçandin. Di van mercan de her kes û her sazî dikarin bi têra xwe, xwe di şûna subje û obje de bibînin. Dema ku erkeya xwedayên di civaka Sumer de emrazên bîrdozî dewr digirin, veguherana veqetîna subje-obje dibe tiştekî jêveneger, her wisa serweriyên xwedayan jî, bi taybetmendiyên xwe yên nû yên hêmayî, elbet wê veqetîna heyî nepêwîst bikin.

Herku diçe perçebûna zanînan û wendakirina wan a pîroziyên xwe bi dirêjiya dîroka şaristaniya navendî xwedî çîrokeke dirûv e. Vê yekê mijareke wisa ye ku di dîrokê de çavdêriya wê baş tê kirin ku emrazên sermaye û desthilatî çiqas pirr bibin, zanîn jî ew qas perçe dibin. Zanist di tevahiya civakên klan û qebîleyan de jî yekpareyî ye. Nûnerên wê weke pîroz têne hesibandin. Zanist weke bexşa xweda tê dîtin û li her kesî, di rêjeya arzû û hewldanên wan de, tê belavkirin. Dema ku van nêzikatiyan di mîtolojiyan de bi tevahî, û di ol û felsefeyê de jî di pîvanên serekîn de bi vî rengî bûn, perçebûna yekemîn, bêhtir di zanistên xwezayê û pêkhateya zanistî ya Ewrûpaya Rojava de tê dîtin. Rêxistinên nû yên zanînê (akademî û zanîngeh), ku herku çû ji civakê qut bûn û bi têra xwe hatin bezandin  ji bo xizmet bikin ji elîtên sermaye û desthilatî re, xwe bi rengekî eşkere di payeya saziyên guzîde ya dewleta nû (Levîathan) de dibînin. Pêvajoya sermayebûn û desthilatîbûna zanistê di heman demê de bûye pêvajoya biyanîbûna ji civakê. Biryargeh û perestgeh ên ku pirsgirêkan çareser dikirin, êdî veguherîne navendên afirandina pirsgirêkan, biyanîkirinê û serweriya bîrdozî. Çiqas çavkaniyên xweza û civakê hebin, ew qas beşên zanistê hatine dariştin. Ev rastî tenê bi serê xwe jî têrî dike ku mirov navheviya zanist-sermaye-desthilatî îspat bike. Qada zanistê, weke pîroziya tevahiya civakê, heta jê tê ji xizmetkirinê dûr ketiye. Navendên zanistê bûne pîşeyên pere, heta bûne sermaye bi xwe û ketine nava hemtewaniya herî xeternak a desthilatiyê. Em baş dizanin ku her cûre çekên rûxandinê, di serî de çekên nuklearî, her wisa wan pêşketinên ku di rehendên ku jîngehê birûxînin de xeteriyê pêk tînin, çavkaniyên xwe ji navendên zanistê digirin. Li şûna endîşeya heqîqetê (wijdana kolektîf a civakê) esas bigirin, hatine terfîkirin bo aqilmendiya hilberandina sermaye û desthilatiya herî berdar.

Dema di roja me ya îro de tê gotin ‘zanist’, yekemîn tiştê ku tê heşê mirov ev pirs e: “Gelo çi qas pere tîne?” Lê di rastiyê de tiştê ku civak ji zanistê dipê ew e ku bersiv bide endîşeyên wê yên bingehîn. Civak, ji ber endîşeyên xwe yên daringî/madî û arişî/manewî, zanistê di nava yekparetiya wê de weke pîşeya xwedatiyê hesibandiye û wê wisa pejirandiye. Dejenerebûna akademî û zanîngehan bi van mercan ve girêdayî ye. Qeyrana zanistî çavkaniyên xwe ji van mercan digire. Dîroka zanînê, girêdayî bi dîroka şaristaniyê di veguheranê re derbas bûye û nekariye xwe rizgar bike ji girtina para xwe di heman pîvanê de ji aloziya giştî ya sîstemê jî. Gotiye ku wê bibe navgîna çareseriyê, lê ew bi xwe bûye navgîna herî girîng a pirsgirêkan. Encam perçebûna zanistî, her wisa alozî û belavî ye.

Pêwîst dike ku pirsgirêka xwezayên cewaz, bi gotineke din, pirsgirêka xwezayên yekemîn, duyemîn û sêyemîn were têgihîştin. Tevahiya xwezaya ji bilî civaka mirov, bi awayê Xwezaya Yekemîn tê veqetandin. Ev têgîneke wisa ye ku di nava xwe de bi nakok e. Berî her tiştî dikare were hizirîn ku veqetînên di pirrengiya bêdawî de, her wekî zîndewer-nezîndewer, nebat-lawir, heta fizîk-kîmya, gavek wêdetir daringa dîbar-nedîbar û enerjî-daring, dikarin bêne pêşxistin. Her wisa em dikarin qala wê yekê bikin ku her veqetîn li gorî xwe xwedî civakek e. Dema em hîn ji nêztir ve li pirsgirêka xwezayan binêrin, em ê bibînin ku bandorên kûr ên veqetîna subje-obje di xwe de

werdigirin. Dikare were kirpandin ku vê yekê, ne veqetîneke bijûndar e û herî kêm bi mercdarî pêdivî bi kirina van veqetînan heye.

Civaka mirov, weke Xwezaya Duyemîn, bê gûman qonexeke pirr girîng a pêşketineke xwezayî ye ku subjeyên wê hene. Di şûna xwezayeke cuda de, wê zêdetir watedar be ku weke qonaxa xwezayeke cewaz were wesfandin. Taybetmendiya herî veqetîner a girîng a xwezaya civakê ew e ku kapasîteya wê ya mejî bilind e, nerme ye û hêza xweavakirinê ye. Di Xwezaya Yekemîn de jî bê gûman mejî, nermeyîtî û hêza xwe avakirinê heye. Lê li gorî xwezaya civakê, xwedî sazbariyeke giran, sext û hêdî ye.  Pirr girîng e ku mirov xwezaya civakê weke xetek bike teorîk. Her çend sosyologên yekemîn pêşikiyê di rêza sereke de dabin vê mijarê, ber bi roja me ya îro ve analîzên wan ên perçe û pêkhate zêdetir derketine pêş, heman weke ku di analîzên din ên li ser xwezayê de çavdêriya wan tê kirin. Wekî din veqetandina xwezaya civakê bi wayê seresazî û binesaziyan, her wisa dabeşkirina wê bi şêweyên aborî-siyasî-desthilatî û bi rengê tebeqe û qonaxên mîna komuna seretayî, koledarî, feodalîzm, kapîtalîzm û sosyalîzm-komunîzm, dikare tenê li ser bingeha nêzîkatiyeke pirr bidîqet a ‘CEWAZÎ’ encamên watedar biafirîne. Ti tebeqe, perçe û analîza pêkhate nikarin ciyê nêzikatiya yekparegir a teorîk bigirin. Dikare were gotin ku ti fîlozof û civaknas nekarîne di vê mijarê de nêzikatiyên yekparegir ên Eflatûn û Arîsto derbas bikin. Heta şîroveyên yekparegir ên pirzan û pêxember ên ku binekoka wan Rojhilata Navîn e û bi gelemperî Rojhiat e, li gorî fîlozof û civaknas ên modernîteya kapîtalîst, bêhtir fêrkar in û civakî ne. Tên wateya nirxeke nêzikatiya hin pêşvetir û pêşketîtir. Divê bi girîngî were kirpandin ku rola herî girîng a di bêbandorkirina vê nêzîkatiya yekparegir a teorîk de emrazên daneheva sermaye û desthilatî dilîzin.

Ji nû ve û bi rengekî kûr pêdivî bilezgînî bi metoda nêzikatiya teorîk li ser civaka mirov heye. Pêwîst e bi girîngî were têgihîştin ku wan rêbazên sosyolojî yên fetisî di nava geremoliya hejmaran de, bêhtir ji ronîkirina rastiyê, wê dinuxêvin. Divê weke nitraneke neyê dîtin ku ez dibêjim sosyolojiyên heyî ji mîtolojiyan zêdetir ser rastiyê dinuxêvin. Heta hîskirina rastiyê ya di mîtolojiyan de, li gorî wate ya di sosyolojiyên modernîteya kapîtalîst de, ta radeya dawîn zêdetir mirovane ne û nêzî heqîqetê ne.

Bê gûman zanista civakî girîng e, lê zor e ku mirov ji awayên wê yên heyî re bibêje ‘zanist’. Wan gotinên sosyolojî yên li naverastê, ji ravekirina modernîteya fermî wêdetir, zêde wateyeke wan nîn e. Di vê mijarê de pêdivî, bi rengêkî bikok, bi şoreşeke zanistî û derketineke rêbazî heye.

Qonaxa ku tê xwestin bi Xwezaya Sêyemîn were watedarkirin, dikare ancax bi vê şoreşa zanistî û rêbazî gengaz bibe. Xwezaya Sêyemîn weke têgîn tê wateya ji nû ve hemahengiya Xwezaya Yekemîn û Xwezaya Duyemîn di qonaxeke jor de. Sentezeke xwezaya civakî di asta jor de bi Xwezaya Yekemîn re, bi qasî paradîgmayek teorîk a şoreşger, şoreşeke bikok a pratîk pêwîst dike. Destnîşankar e ku bi taybetî sîstema cîhanê ya kapîtalîst, anku modernîteya wê, ku qonaxa sîstema şaristaniya navendî ya roja me ya îro ye, were derbaskirin. Gavên ku pêwîst in ji bo vê yekê bi serkeftî bên avêtin ew in ku avabûnên şaristaniya demokratîk di asta hindiktirîn de pêş bikevin, weke mijarên hîn veqetîner di karakterê civaka ekolojîk û femînîst de pêşketin çêbibe, hunerê siyaseta demokratîk sazbar bibe û avabûnên civaka sivîl a demokratîk pêk werin.

Xwezaya Sêyemîn ne sozeke nû ya bihuşt yan utopya ye; lê ew e ku mirov cewaziya xwe ya hêza zanabûnê ku li ser xwezayan zêde dibe biparêze û bi vî rengî TEVLÊBÛNA XWE  ji ahengiya mezin re çêbike. Ev ne tenê bêriyek, armancek û sozek ji bo utopyayan e, lê hunerê jiyaneke baş û

xweş e, ku wateya wê ya pratîk a rojaneyî heye. Ez qala biyolojîzmê nakim. Ez xeteriya vê nêzikatiyê dizanim. Her wisa ez qala utopyayên bihuşta 'Xwedatî'yên danevehên sermaye û desthilatiyê jî nakim. Ez dikarim texmîn bikim ka ev nêzîkatî jî di kûranî da tê çi wateyê û armancên wê yên xeter û rûxîner çi ne. Ez dikarim diyar bikim ku soza çors a Materyalîzmê jî ji bo komunîzm û bihuştê kûvî ye û sazbar nîn e, her wisa cûreyek peydeya nûk a lîberalîzmê ye. Jixwe ji ezmûnên me yên rojane yên jiyanê, tê têgihîştin ku bêhna dojehê ji her cûre sozên lîberalîzmê tê.

Pêkhatina Xwezaya Sêyemîn 'demajo'yeke dirêj pêwîst dike. Sîstema demokratîk, weke rejîma Xwezayên Yekemîn û Duyemîn a wate û pêkhatinên wekhevî û azadî di qonexeke jor de li ser bingeha cewaziyan, bi wê yekê gengaz dibe ku têde taybetmendiyên civaka ekolojîk û femenîn pêş bikevin. Xwezaya mirov a civakê dînamîkên pêkhatina vê qonaxê di xwe de werdigire. Dema mirov li mijara xwezayên cewaz, ku pêwîst e li ser were ponijîn, bi vê rêbazê nêzîk bibe, vê yekê dikare mirov bibe ber pêkanînên zêdetir watedar ên teorîk û pratîk.

Pirsgirêkek girîng a rêbazê di van demên dawîn de di çarçoveya gerdûneweri-dîmaneweri de tê gotûbêjkirin. Şîrovekirina 'wate'yê jî bi awayê gerdûnîtiya wê û cûzîtiya wê, tê wateya heman naverokê. Li vê derê em bi pirsgirêkek rêbazî re rûbirû ne, ku pêwîst e bi dîqet were tehlîlkirin. Em dikarin vê pirsgirêkê weke qonexeke nû jî, ya ku veqetîna subje-obje hatiyê, pênase bikin. Sedema ku ji van nêzikatiyên tund re, ên di emrazên sermaye û desthilatî de, bi pirranî tê gotin 'zagon', ji ber mercên daringî yên li ser bingeha ev cûre pirsgirêkên rêbazî ne. Lêdana etîketa 'gerdûnîtî'li nêzikatiya zagonperest, ji nêz ve girêdayî ye bi navgîniya rewakirina bîrdozî. Ew bêjeya 'zagon hesin dibirre'ji vê derê tê. Pêwîst e baş were têgihîştin ku zagon dariştineke desthilatdariyê ye. Em ji bîr nekin ku desthilatî tê wateya sermaye. Serweriya desthilatî di heman demê de tê wateya 'zagon'. Zagon jî di pîvana ku 'gerdûnî'be de xurt e û dijrabûna wê tê negengazkirin. Avakeriya xweda ji hêmaya mirov, wisa dest pê dike. Mirov ê xwedî desthilatî bi rêya xwedakirina dîktaya xwe ku nikare bi rengekî eşkere wê bîne ziman, û bi rêya afirandina bi vî awayî navgîneke dahiyane ya rewakirinê, disêwirîne ku wê karibe desthilatiya xwe hêsantir bidomîne. Pêwîst e mirov baş têbigihîjê ku hewldanên bi vî rengî ji koka hemû gerdûnîtiyan re jî – her çend bi tevahî nebe jî – di rêjeya girîng de dibin çavkanî.

Dîmaneweri jî, her çiqas weke cemseriyeke dijber were teyisandin, di cewher de fikareyeke dirûv di xwe de werdigire. Tê wateya awayê mirov ê piçûkkirî yê dûrxistî bi tevahî ji rêsa, rê û rêbazan. Derî vekirî dihêle ji feraseta nûk a "çi qas mirov hebin ew qas jî rê û rêbaz hene". Li gorî ku vê yekê di pratîkê de ne gengaz e, di encam de dibe tiştekî jêveneger ku dîl bikeve destê zagonên gerdûnîtiyê. Herdu feraset jî para zeka ya di civaka mirov de, yan bi rêya pirr nitrandinê, anku guhastina asta 'zagona gerdûnî', yan jî bi rêya piçûkkirin û daxistina awayê "her kes xwedî zagoneke e", wê ji rê derdixin. Lê gengaz e ku mirov zekaya civakî bi rengekî rasteqîntir şîrove bike. Dikare rê li ber gotineke berdartir veke, ku mirov wan weke du awayên navhevî yên rastiya xwezayî bike têgîn, bêyî ku mirov şêweyên li ser rêsa û dîmaneweriya gerdûnî veguhêzîne asta cemserên dijber. Rêsageriya neguherbar a gerdûnî mirov digîne pêşveçûneriya xêzikî ya dûz, lê eger dawiya vêya di gerdûnê de hebûya, diviyabû em heya niha gihîştibanê. Qusûrekî wisa ya pêşveçûneriyê heye. Eger vê yekê rast bûya ku gerdûn ber bi armancek ve bi berdewamî pêş ve diçe, wê demê li gorî pêdiviya 'mêjînerî'ku bêdawîtiyê di xwe werdigire, diviyabû ji mêj ve gihîştiba vê armanca xwe. Dîmaneweri ku berevajî wê ye, têgîna 'çerxîtiya bêdawî'di xwe de werdigire, lê eger ev rastbûya, diviyabû wan guherîn û pêşketinên heyî yên gerdûnî nehitabana jiyîn û çênebana. Ji ber

van sedeman pêşveçûnerî û çembergerî lêgerînên rêbazî yên bêpar in ji ravekirina pêşketina gerdûnî, ku di cewher de bi rêya yekbûn û guherînê cewaz dibe. Rêbazên wisa ne ku qusûrên wan hene. Baweriya min ew e ku pêwîst e rêbaza bêhtir nêzî rastiyê, bi awayekî wisa were pênasekirin ku pêkhateyek be ‘ku bi rêya cewazbûnê guherînê gengaz bike, her wisa bi qasî ku kêliyî û nihayî be, bêdawîtiyê jî di xwe de wergire’. Ji bo ku rejîma heqîqetê were damezirandin, wê vê yekê perspektîveke rêbazî ya bêhtir raveker û vebêjer pêşkêş bike ku bi qasî ku pêşveçûn çerxî be û çerxîtî pêşveçûn be, bêdawîtî di kêliyê de veşartî be û hundirîn (içkin) be.

Girîng e ku mirov di mijara rêbaza diyalektîk de jî qala hin mijaran bike. Bê gûman vedîtina rêbaza diyalektîkî mezintirîn destketiyek e. Bi çavdêriyên kûr her kêlî tê vedîtin ku gerdûn karaktera diyalektîkî di xwe de werdigire. Lê mijara ku li vê derê pirsgirêk pêk tîne, di derbarê wê yekê de ye bê ka wê diyalektîk çawa were pênasekirin. Di mijara diyalektêkê de cewaziya di navbera şîroveyên Hegel û Marks de tê zanîn. Rûxînên ku bûne sedemên wan, ji bo herdu şîroveyan jî dilxweşker nîn e. Ji ber ku şîroveya Hegelyen bû sedema avabûna dewleta netewperest a Alman, encamên xwe yên sawdar, bi pêkanîna faşîzmê re nîşan daye. Tê zanîn ku encamên pratîkbûnên peyhatiyên Marks ên sosyalîsta pêkhatî ya çînîparêz cuda bin jî, rê li ber gelek neyîniyan vekirin. Li vê derê di şûna ku mirov qusûrê di Marks yan jî di Hegel de bibîne, wê bibe nêzikatiyeke hîn rasttir ku mirov qusûrê di yên ku diyalektîkê bi têra xwe şaş şirove kirine de bibîne. Bi ser re, ne tiştekî rast e ku mirov nêzikatiya diyalektîkî bike malê Hegel û Marks; dîsa, ne tespîteke tam di cî de ye ku mirov wê bike malê ramana Yunan a Çaxa Kevn jî. Di pirzaniya Rojhilat de mirov rastî gelek şîroveyên diyalektîkî dibe. Di vê mijarê de bê gûman li Yunanîstana Çaxa Kevn û Ewrûpaya Ronakbîrî destketiyên girîng hatine bidestxistin.

Divê mirov diyalektîkê ne weke yekîtiya rûxîner a dijberan û ne jî guherînê weke bêdij û bi awayê çêbûnewerî û afirana keliyê, şîrove bike. Feraseta yekemîn digihîje meyleke herî çors û cemseran her tim dike dijminên hevdu; lê mirov ji dîtina gerdûnê bêpar ji rêsayan û her tim ji awayê aloziyê wêdetir nabe ti encamek. Û feraseta duyemîn mirov dibe encamek wisa ku pêşketinê bêrakişîn, bêpar ji dijberan, her wisa weke ku ne xwedî dînamîka xwe be û her tim li pêdiviya hêzeke biyanî bigere, dibîne; lê gengaz xuya nake ku vê yekê were piştrastkirin. Û tê zanîn ku mirov ji vî deriyî xwe digihîne metafizîkê.

Wê demê, pirr girîng e ku mirov diyalektîkê ji van herdu şîroveyên pirole rizgar bike û pak bike. Diyalektîkek ne rûxîner, lê avaker, ji xwe mijareke wisa ye ku di pêşketinan de çavdêriya wê tê kirin. Ji bo mînak, mirov bi xwe pêşketineke diyalektîkî belkî jî bi qasî temenê gerdûnê, ku bi texmînî te hesabkirin, di xwe de werdigire. Mirov xwedî atom û molekulên herî pêşketî yên ji livikên jêr-atomî ye, her wisa hemû qonaxên biyolojîk jî di nava xwe de dihewîne. Ev pêşketina biheybet diyalektîkî ye. Lê di zelaliya ku nikaribe were înkarkirin de ye ku diyalektîkek pêkhateyî û pêşvebir diteyisîne. Bê gûman nakokiyên çînî (gengaz e yên kabîleyî, etnîkî, netewî û sîstemî jî li vana bêne zêdekirin), ku pirr têne gotûbêjkirin, dijminahiyên diyar di xwe de werdigirin. Lê, eger em hêza mezintirîn a nermeyî ya aqilê civakê ji bîr nekin, mirov dikare van nakokiyan guncav li gel giyana diyalektîkê çareser bike, bêyî ku mirov xwe bigihîne nijadkujiyan,. Bi ser de, xwezaya civakê bi mînakên bêhejmar ên ev cûre çareseriyan tijî ye. Dema bîrdozger gotine ku wê pêşketinê bi awayekî çêtir vebêjin, lê belkî jî li derveyê vînên xwe, nekarîne xwe rizgar bikin ji ketina nava encamên berevaj. Ketina wan a pirrî caran nava van rewşan, herî kêm nîşan dide ku şîrovekirina diyalektîkê jî hîn girîngiya xwe diparêze.

Ji bo ku di mijara diyalektîkê de rê li ber şaşîtiyek neyê vekirin, pêwîst e berawiriya wî bi metafizîkê re jî bi kurtî were şîrovekirin. Ji ber ku metafizîk çêbûnê li derve û di afirînerek de dibîne, bê gûman ev bûye nêzikatiya herî bêberdar a dîrokê. Felsefe, ol û zanistperestiyên pozîtîv, ku vê nezikatiyê rê li ber wan vekiriye, sîstemeke tam a 'mêtingeriya mejî'afirandine. Belkî pêdiviya xwezayê bi afirînerek ji derve nîn e; yan jî, eger hebe jî, ev afirîner dikare ancax ji hundir ve be. Lê mirov dikare pirr bi hêsanî îdea bike ku metafizîk li ser zekaya xwezaya civakî, heman weke afirînerek ji derve, 'rejîmên mejî yên mêtinger'bi cî kiriye. Di vê wateyê de, pirr girîng e ku mirov metafizîkê rexne bike û wê derbas bike.

Lê ew mijara ku ez dixwazim di derbarê metafizîkê de vekim, bi aliyekî wê yê din ve pêwendîdar e. Ez qala wê yekê dikim ku mirov nikare bê metafizîk bijî. Ew metafizîka mijara gotinê, afiranên çandî yên civaka mirov in. Li gel mîtolojî, ol, felsefe û zanistan, her cûre teknîkên hilberînê, polîtîka û huner jî di nava vê de ne. Beranberiya fizîkî ya hestên başî û xweşikiyê nîn e. Vana nirxên xweser bo mirov in. Bi taybetî exlaq û huner nirxên metafizîkî ne. Li vê derê mijara ku pêwîst e were ronîkirin, ne dubendiya metafizîk û diyalektîkê ye, lê veqetînên di navbera afiranên metafizîkên baş û xweş û metafizîkên xirab û kirêt de ne. Dîsa, ne dubendiyên ol-bêolî û felsefe-zanist, lê bawerî, heqîqet û rastiyên olî, felsefî û zanistî ne, ku jiyanê bêhtir rakêşer û dilkêş dikin.

Pêwîst e neyê jibîrkirin ku xweza ji bo jiyana mirov lîstokek, ku mezinahî û cîherengiya wê pirr e, daniye ser dikê. Nabe ku rola mirov a li ser vê dikê, bibe heman a xwezayê. Ew li ser vê dikê, dikare ancax bi lîstokên ku wê/wî bi xwe ava kiriye, jiyana xwe rêkûpêk bike. Pênaseya şanoyê weke teyisîna jiyanê, çavkaniyên xwe ji vê rastiya kûr digire. Ya girîng ew e ku aliyên xirab û kirêt û şaşîtiyên vê jiyana li dikê bêne daxistin asta herî kêm û rastî, başî û xweşikiyên wê bêne rakirin asta herî zêde. Dema ku em qala metafizîka baş, xweş û rast dikin, em balê dikişînin ser vê taybetmendiya wê ya kûr a mirovî. Nexwe, ez qala metafizîka kor, kerr û sehekkar nakim. Ez di wê baweriyê de me ku van destnîşankirinan pirr girîng in dema mirov di derbarê rêbazê de berawiriya diyalektîk û metafizîkê bike.

**4- PIRSGIRÊKA AZADIYÊ**

Ji min tê û ez dikim bêjim ku azadî hema hema armanca gerdûnê ye. Min pirrî caran ji xwe pirsiye bê ka gerdûn bi rastî jî li pey azadiyê digere. Binavkirina azadiyê tenê weke lêgerîneke kûr di nava civaka mirov de, ji min re her tim kêm xuya kiriye û ez wisa hizirî me ku teqez aliyekî wê yê pêwendîdar bi gerdûnê re heye. Dema em dubendiya livik-enerjî wekî kevirên bingehîn ên gerdûnê bihizirin, ez bêhtirs dikirpînim ku enerjî tê wateya azadiyê. Ez bawer dikim ku livika daringî jî pakêtçeya enerjiyê ye ku bi awayê mehkûm e. Tîrêj awayekî enerjiyê ye. Ma dikare were înkarkirin ku tîrêj xwedî herikîneke çiqas azad e? Her wisa em tevlî watedarkirina kuantayan, weke awayên enerjiyê yên livika herî piçûk têne pênasekirin, weke bandora ku di roja me ya îro de hema hema tevahiya cîherengiyê rave dike, bibin. Belê, tevgera kuantûmî hêza afirîner a tevahiya cîherengiyê ye. Ez nikarim xwe  jê bidim alî ku nebêjim ka ev e ew Xwedayê ku her tim lê tê gerîn. Her wisa dema ku tê gotin ku ser-gerdûnî jî heman weke di karakterêke kuantûmê de ye, dîsa heyecan tê min û ez dibêjim 'dibe ku wisa be'. Dîsa, ez nikarim xwe jê bidim alî ku nebêjim ka ew afirîneriya ji derve ya Xweda, ji vê re tê gotin.

Li gorî min girîng e ku mirov di mijara azadiyê de xweperest nebe û nekeve daxistkariya mirov. Ma perpitîna mezin a lawirek di qefesê de ya ji bo azadiyê dikare were înkarkirin? Dema ku

strîna bilbil senfoniya herî bijarte li dû xwe dihêle, em dikarin vê rastiyê bi kîjan têgîn, ji bilî azadiyê, rave bikin? Eger em hîn pêşdetir biçin, ma hemû deng û rengên gerdûnê azadiyê nahînin bîra mirov? Hemû perpitînên jinan, weke yekemîn û dawîn koleyên herî bindest ên civaka mirov, dikare bi kîjan têgîn, ji bilî gerîna wan a li azadiyê, were ravekirin? Şirovekirina fîlozofên herî kûr, ji bo mînak Spînoza, azadî wekî hêza wate û xwe rizgarkirina ji nezaniyê, ma nayê heman wateyê?

Ez naxwazim pirsgirêkê di nava naveroka wê ya bêdawî de bifetisînim. Her wisa ez naxwazim wê weke rewşa xwe ya ‘mahkûmiyet’a zayî ji dayikê jî bînim ziman. Delîla wê ew e ku min ji bo bîranîna Prometheus nivîsandina helbestê, ku cûreyek gerîna li azadiyê ye jî, ji bilî çend hevokan, qet neceriband. Tê zanîn ku ew jî, ji bilî hêmayîtî, ti wateya wê nîn e. Lê, ma dikare were piştgokirin ku ez mezintirîn şopînerê wateya azadiyê me?

Dema em azadiya civakî dikin pirsgirêk, vê destpêka me ya kurt ji bo wê yekê ye ku mirov di meseleya kûraniya mijarê de hişyarker bike. Pênaseya civakê, weke xwezaya ku kûraniya wê ya zekayê ya herî pêşketî ye, di mijara tehlîla azadiya de jî ronakker e. Qadên kûr ên zekayê, ew qad in ku ji azadiyê re hestiyar in. Gotina di cî de ye ku mirov bibêje ku her kîjan civak be, hêza zeka, çand û aqilê xwe çi qas kûr kiribe, xwe ew qas ji azadiyê re meyldar kiriye. Dîsa, ev bêje jî gotineke rast e ku civakek xwe çi qas ji van nirxên çandî, zeka û aqil bêpar hiştibe, yan jî ji wan bêpar hatibe hêştin, ew qas koletiyê dijî.

Dema ez di mijara qebîleya Îbranî de diponijim, her tim du taybetmeniyên wan ên bingehîn tên bîra min. A yekemîn, pisporiya wan a di mijara pere de ye. Her tim serweriya pere di destên xwe de digirin. Hem di aliyê teorîk de û hem jî di aliyê pratîk de dizanin ku wê bi vê yekê karibin cîhanê bi xwe ve girê bidin û heta têxin bin serweriya xwe. Em dikarin ji vê re bibêjin serweriya cîhanî jî. Li gorî min, a girîngtir ew e ku ya duyemîn, anku serweriya arişî, hîn baştir bi ser dixin. Cihûyan pêşî bi pêxemberên xwe; paşê bi nivîskarên xwe û di modernîteya kapîtalîst de jî bi her cûre fîlozof, zanyar û mêr û jinên xwe yên hunerî ve, serweriyeke çandî ya arişî, hema hema bi dîrokê re hemsal, damezirandine. Lewre tespîteke ta radeya dawîn rast e ku mirov bibêje ku ti qebîle nîn e ku bi qasî qebîleya Îbranî zengîn û azad be. Eger mirov di derbarê serdema me de çend mînakan bide, wê ev rastî bi zêdeyî piştrast bibe: Koka hêza pirraniya serwerên rasteqîn ên kapîlatala fînans, ku li ser aboriya kûrewî zal in, Îbranî ye, anku Cihû ye. Eger mirov qala navê Spinoza di derketina felsefeya hemdem de, yê Marks di sosyolojyê de, yê Freud di psîkolojiyê de û yê Einstein di zanista fizîkê de bike; her wisa mirov bi sedan mirovên teorîsyen ên hunerî, zanistî û siyasî li vana zêde bike, dibe ku vê yekê mirov di derbarê hêza rewşenbîrî ya Cihû de bi têra xwe bike xwedî raman. Ma dikare were înkarkirin serweriyên Cihûyan ên di cîhana rewşenbîriyê de?

Lê li rûyê din ê madalyonê, yên din û yên dîtir ên cîhanê hene. Serwerî, hêz û zengînî ya daringî û arişî ya aliyekî, bi buhaya hejarî, bêhêzî û kerîbûna yên dîtir pêk tên. Lewre ev gotin, anku bêjeya navdar ku Marks ji bo proletarya gotiye: “Eger proletarya bixwaze xwe azad (bi gotineke din rizgar) bike, ti çareya wê nîn e, ji bilî azadkirina tevahiya civakê”, ji bo Cihûyan jî derbasdar e. Marks wekî ku Cihûyan hizirî be û vê bêjeyê gotibe. Eger Cihû dixwazin ji azadiya xwe û ji hêzên xwe yên zengînî, zeka û wate ewle bibin, neçar in ku civakên cîhanê jî bi şêweyeke dirûv zengîn bikin û wan di alî arişî de xurt bikin; wekî din tu rêya wan nîn e. Nexwe dibe ku her kêliyek Hîtlerên nû li ser wan peyda bibin. Di vê wateyê de rizgarî, anku azadiya Cihûyan gengaz dibe, tenê dema ku bi rizgarî û azadiya civakên cîhanê re di nava hev de were hizirîn. Divê jê gûman neyê kirin ku erka

herî birûmet ji bo Cihûyan, ku ji bo mirovahiyê gelek tiştan bi ser xistine, ev e. Wê demê mirov dikare ji nijadkujiya bixof a Cihûyan jî tê bigihîje ku zengînî û rûmetên arişî yên damezirandî li ser hejarî û nezaniya yên dîtir, nirxeke rasteqîn a azadiyê di xwe de wernagirin. Wateya rasteqîn a azadiyê di karakterêk wisa de ye ku veqetîna em û yên dîtir derbas bike û ji aliyê her kesî ve bê parvekirin.

Eger em sîstema şaristaniya navendî li ser bingeha pirsgirêka azadiyê binirxînin, em ê çavdêrî bikin ku bi koletiyek, ku herku çûye qatqatî bûye, hatiye barkirin. Koletî di sê rehendan de jî bi awayekî xurt tê jiyandin: Pêşî, koletiya bîrdozî tê avakirin. Avakirina ji mîtolojiyan Xwedayên tirsîner û serwer, bi taybetî di civaka Sumerê de, pirr balkêş û têgihîner e. Qata jorîn a Zîguratê, weke ciyê Xwedayê ku li ser mejiyan zal e, tê hizirîn. Qatên ortê biryargehên rêveberiya siyasî ya keşîşan e. Qata herî binî jî weke qata xebatkarên zenaetkar û çandyar, ku ji her cûre hilberînê re têne bezandin, hatiye amadekirin. Ev modêl heya roja me ya îro di cewher de neguheriye, lê tenê gihîştiye rewşeke mezintirîn a vebûn û belavbûnê. Ev çîroka sîstema şaristaniya navendî ya pênc hezar salî, pevbestîna dîrokê ya herî nêzî rastiyê ye. Hîn rasttir, rastiyek e ku weke ampîrîk çavdêriya wê tê kirin. Tehlîlkirina Zîguratê tê wateya tehlîlkirina sîstema şaristaniya navendî; lewre tê wateya ku mirov sîstema cîhanê ya kapîlatlîst a roja me ya îro, li hîmê wê yê rasteqîn bide rûniştandin û wê tehlîl bike. Dema ku pêşketina berdewamî ya sermaye û desthilatî weke kumulatîv (danehev) rûyêkî madalyonê ye, lê  li rûyê din bi awayekî bixof koletî, birçîtî, hejarî û kerîbûn heye.

Em baştir têdigihîjin bê ka pirsgirêka azadiyê çawa kûr bûye. Sîstematîka şaristaniya navendî, eger herku biçe bêparkirina civakê ji azadiyê û xistina wê  ya asta civaka kerî misoger neke, nikare xwe bide berdewamkirin û hebûna xwe biparêze. Çareseriya di mantiqê sîstemê de ew e ku zêdetir sermaye û emrazên desthilatiyê çêbike. Lê ev jî tê wateya zêdetir hejarbûn û kerîbûnê. Sedema ku pirsgirêka azadiyê ew qas pirr mezin bûye û bûye pirsgirêka bingehîn a her serdeman, ji ber dubendiya di xwezaya sîstemê de ye. Me rewşa mînak a qebîleya Cihû tewş pêşkêş nekir. Ta radeya dawî fêrkar e. Ji ber vê sedemê, bi dirêjiya serdeman, ji girîngiya xwe tu tiştek wenda nekiriye, ku mirov hem koletiyê  û hem azadiyê bi rêya Cihûtiyê bixwîne.

Her wisa em dikarin wê gotûbêja kevneşopî ya di derbarê ‘gelo, kîjan ji vana zêdetir azadiyê tîne, pere yan zanebûn?’, di ronahiya vê vegotinê de baştir têbigihîjin. Heta ku pere weke navgîneke danehev a sermaye, anku weke xespa berhem û nirxa bermayî rol bilîze, wê her tim bibe navgîna koletiyê. Vexwendina wî ya ji xwediyê xwe re her tim komkujî, gelek baş rave dike ku pere nikare ji bo azadiyê bibe navgîneke pêewle. Pere di rola livika daring de ye, ku dijraberê enerjiyê ye. Dikare were gotin ku zanebûn her dem zêdetir nêzî azadiyê ye. Zanebûna li ser bingeha rastiyê, ji azadiyê re her tim asoyê vedike. Û ji ber vê sedemê ye ku zanebûn her tim wekî herikîna enerjiyê tê pênasekirin.

Mirov azadiyê weke pirrbûn, cûrebûn û cewazbûna di gerdûnê de pênase bike, wê vê yekê di ravekirina exlaqê civakî de jî ji mirov re hêsayî çêbike. Pirrbûn, cûrebûn û cewazbûn, bi rengekî sergırtî be jî, bi mirov dide hizirîn ku şiyana hebûneke her tim jîr heye ku di cewhera wan de bijareya xwe bike. Lêkolînên zanistî jî piştrast dikin ku zekayek heye ku nebatan arasteyî cîherengiyê dike. Heya niha ti destê fabrîqeyan ê derketî ji destê mirov, nekariye wan çêbûnên ku di şanika zîndewerek de hene pêk bîne. Belkî em bi qasî Hegel nikaribin qala zekaya gerdûnî (geist) bikin. Lê dîsa jî, nikare bi tevahî weke tewşikî were darizandin ku mirov bibêje di gerdûnê de

hebûneke dirûvê zekayê heye. Em nikarin cewazbûnê, ji bilî hebûna zekayê, bi vegotineke cuda bînin ziman. Sedema ku pirrbûn û ciyêbûn her tim azadiyê tînin bîra mirov, reng e ji ber çirûskên zekayê yên di bingehên wan de bin. Gengaz e ku mirov, bi qasî ku tê zanîn, weke hebûna herî jîr a gerdûnê were pênasekirin. Ê baş e, ma mirov vê zekaya xwe çawa bidestxistiye? Min mirov di aliyê zanistî (fizîkî, biyolojîk, psîkolojîk û sosyolojîk) de, weke kurtasiya dîroka gerdûnê jî pênase kiribû. Di vê pênaseyê de mirov weke daneheva zekaya gerdûnî tê pênasekirin. Ji ber vê sedemê ye jî ku di gelek bizavên felsefî de mirov weke maketek gerdûnê tê pêşkêşkirin.

Asta zeka û nermeyî ya di cavaka mirov de hîmen rasteqîn ên avabûna civakê pêk tînin. Her wisa di cî de ye ku mirov azadiyê di vê wateyê de weke hêza avakirina civakî jî pênase bike. Em dizanin ku ji yekemîn komcivakên mirov û vir ve, ji vê re tê gotin helwesta exlaqî. We çaxê exlaqê civakî ancax bi azadiyê gengaz dibe. Hîn rasttir, azadî çavkaniya exlaq e. Em dikarin ji exlaq re her wisa bêjin kevneşop, rêsa, yan jî awayê kûrbûyî yê azadiyê. Eger çavkaniya bijareya exlaqî azadî ye, dema pêwendiya azadî bi zeka, zanebûn û aqil re were girtin ber çavan, çêtir dibe têgihîner ku mirov ji exlaq re bêje zanebûn (wijdan) a kolektîv a civakê. Binavkirina exlaqê teorîk weke etîk jî dikare ancax di vê çarçoveyê de wateya xwe bibîne. Em nikarin qala ti etîkek bikin, ji bilî hîmên exlaqî yên civakê. Bê gûman mirov dikare ji ezmûnên exlaqî felsefeyek, anku etîkek xurttir a exlaq derîne. Lê etîka sexte nabe. Têgihîner ku E. Kant ji aqilê pratîk re dibêje etîk. Di heman demê de şîrovekirina wî ya exlaq weke bijare û derfetek azadî, nêrînekê wisa ye ku ji bo roja me ya îro jî derbasdariya xwe diparêze.

Pêwendiya polîtîkaya civakî û zadî jî rewşekê xuya ye. Qada polîtîk qadeke wisa ye ku aqilên dûrbîner têde herî zêde pevdiçin, diponijin û hewl didin jê encam bigirin. Gengaz e ku mirov di wateyek de wê weke qadekê wisa jî pênase bike ku têde subje xwe bi navgîniya hunerê polîtîk azad dikin. Her civaka ku nikaribe polîtîkaya civakî pêş bixe, pêwîst e zanibe ku wê beranberiya vê yekê weke bêpariya ji azadiyê lê bizivire û berdêla wê lê were fatûrekirin. Pîroziya hunerê polîtîk di vê wateyê de derdikeve pêşberî me. Her civaka (klan, qebîle, qewm, netew, çîn, heta emrazên dewlet û destilatî) ku nikaribe polîtîkaya xwe pêş bixe, mehkûmê wendakirinê ye. Ji xwe eger mirov nikaribe polîtîka pêş bixe, tê wateya ku mirov wijdana xwe, berjewendiyên xwe yên jiyanî û nasnameya xwe ya xweser nas nake. Ji bo her kîjan civak be, ketin û wendakirina ji vê xirabtir nikare bibe mijara gotinê. Daxwaziya azadiyê ji bo civakên bi vî rengî, ancax dema ku ji bo berjewendî, nasname û wijdanên xwe yên kolektîv ên xweser rabin ser piyan, bi gotineke din, dema têkevin nava têkoşîna polîtîk, dikare bibe mijara gotinê. Daxwaziyên ji bo azadî yên bêpolîtîka, şaşîtiyeke wehîm e.

Ji bo ku têkiliya di navbera polîtîka û azadî de neyê çewtkirin, pêwîst e cewaziya di navbera wan û polîtîka (di rastî de hîn rasttir e ku mirov jê re bêje bêpolîtîkayî) yên desthilatî û dewletê de bi bayex werê xêzkirin. Dibe ku emrazên desthilatî û dewletê ji bo karên xwe stratejî û taktîkên wan hebin, lê di wateya rasteqîn de polîtikayên wan nabin. Ji xwe desthilatî û dewlet bi xwe, di qonaxa ku înkara polîtîkaya civakî tê pêkanîn de, şêwe digirin. Li ciyê ku polîtîka biqede, li we derê pêkhateyên desthilatî û dewletê têne ser kar. Desthilatî û dewlet ew cî ne ku têde gotina polîtîk, lewre azadî, diqede. Li wê derê tenê rêvebirin, guhdarîkirina gotinê û girtin û dayîna fermanan mijara gotinê ye; her wisa zagon û rêzikname hene. Her desthilatî û dewlet tê wateya aqilê qeşagirtî. Hêzên xwe jî û bêhêziyên xwe jî ji van taybetmendiyên xwe digirin. Wê demê qadên dewlet û desthilatî nikarin bibin wan qadên ku têde li azadiyê were gerîn û bidestxistin. Hegel dewletê weke

qada rasteqîn a bidestxistina azadiyê pêşkêş dike û ev jî bingeha tevahiya nêrîn û pêkhateyên zal pêk tîne. Wisa ye ku faşîzma Hîtler yek ji wan mînakên sereke ye ku vedibêje ka ev nêrîn dikare rê lî ber çi veke. Heta di feraseta sosyalîzma zanistî de, ku Marks û Engels pêşengiya wê kirin, dewlet û desthilatî weke navgînên bingehîn ên avakirina sosyalîst hatine pêşdîtin û ev jî, bêyî ku di ferqa wê de bin, bûye derbeya herî wehîm ku li azadiyê, lewre li wekheviyê, hatiye xistin. Lîberalan çêtir ferq kirine wê bêjeya "çiqas pirr dewlet, ewqas hindik azadî." Serpêhatiyên xwe jî deyndarê van pêşbîniyên xwe ne.

Dewlet û desthilatî weke emrazên zaliyê, ti wateya wan tine ye, ji bilî cûreyek guhartî ya berhem û nirxên bermayî, anku serweriya yekûn, ên desteserkirî bi zorê, li gorî pêdiviya cewherên xwe. Sermaye dewletê çêdike û dewlet jî sermayeyê çêdike. Heman mijar ji bo her cûre emrazên desthilatî jî derbasdar e. Qada polîtîk a civakî çiqas zayînera azadiyê be, qadên desthilatî û dewletê jî ewqas qadên wendakirina azadiyê ne. Dibe ku pêkhateyên desthilatî û dewletê gelek kes, kom û netewan pirr zengîn bikin û wan azad bikin. Lê me di mînaka Cihûyan de dît ku vê yekê ancax bi bûhaya hejarî û koletiya civakên dîtir gengaz dibe û dawiya vê, ji nijadkujiyan heya şeran, her cûre rûxandin e. Polîtîka di sîstema cîhanî ya kapîtalîst de wendakirina xwe ya herî mezin jiyaye. Di vê qonaxê de, ku sîstema şaristaniya navendî bi dirêjiya dîrokê gihîştiye lûtke, gengaz e ku mirov qala mirina rasteqîn a polîtîkayê bike. Lewre di serdema roja me ya îro de mezixîna polîtikayê tê jiyîn, di pîvanên ku mirov nikare bi ti serdeman re berawir bike. Çawa ku mezixîna exlaq, weke qadeke azadiyê, bûyereke roja me ya îro ye, ji wî jî zêdetir mezixîna qada polîtîkayê mijara gotinê ye. Lewre eger em azadiyê dixwazin, diyar e weki din çareya me tine ye ji bilî ku em di serî de exlaq, ku wijdana kolektîv a civakê ye, û polîtîka, weke aqilê hevbeş, bi hemû aliyên wan û bi hêza xwe ya rewşenbîrî, rakin ser piyan û wan bikin sazbar.

Pêwendiyên di navbera azadî û demokrasiyê de zêdetir girîft in. Herdem bi nakok e ka kîjan ji wan çavkaniya xwe ji kîjan digire. Lê em dikarin bi hêsanî diyar bikin ku kûraniya herdu pêwendiyan jî hevdu xwedî dikin. Bi qasî ku em polîtîkaya civakê têkildarî azadiyê dihizirin, em dikarin wê bi demokrasiyê re jî têkildar bikin. Awayê herî şênber ê polîtîkaya civakî, siyaseta demokratîk e. Lewre siyaseta demokratîk dikare wekî hunerê rasteqîn ê azadbûnê jî were pênasekirin. Bêyî meşandina siyaseta demokratîk, gengaz nabe ku civak bi gelemperî û her gel û komcivak bi taybetî, ne bibin polîtîk û ne jî bi rêya polîtîkayê azad bibin. Siyasetên demokratîk dibistanên rasteqîn in ku têde azadî tê fêrbûyîn û jiyîn. Karên polîtîkayê çiqas subjeyên demokratîk biafirînin, siyaseta demokratîk jî ew qas civakê dike polîtîk, lewre wê azad dike. Eger em polîtîkbûnê weke awayê sereke yê azadbûnê bipejirînin, divê em zanibin ku herku em civakê bikin polîtîk, em ê karibin wê azad bikin; weke berevaj jî, herku em civakê azad bikin, em wê zêdetir dikin polîtîk. Bê gûman gelek qadên civakî di serî de çavkaniyên bîrdozî, hene ku azadî û polîtîkayê xwedî dikin. Lê di rastiyê de herdu çavkaniyên bingehîn ku hevdu dizayînin û xwedî dikin polîtîka û azdiya civakî ne.

Pêwendiya wekhevî û azadî bi pirranî tê têkelkirin. Lê di rastiyê de herî kêm bi qasî pêwendiyên wan bi demokrasiyê re, pêwendiyên di navbera herduyan de jî girîft û bi pirsgirêk in. Em dibînin ku wekheviya tam, bi beramberiya ku azadî carina berdêl bide, tê bidestxistin. Pirrî caran tê kirpandin ku herdu nikarin bi hev re bin û pêwist e yek ji wana tawîz bide. Tê diyarkirin ku azadî jî carina pêwîst dike ku mirov, weke berdêl, ji wekheviyê tawîz bide.

Ji bo ku pirsgirêk bi awayekî rast bê destnîşankirin, pêwîst e cudahiya di navbera xwezaya herdu têgîn, anku herdu rastiyan (fenomen) de were vegotin. Wekhevî bêhtir têgîneke huqûqî ye. Pêşbînî dike ku di navbera kes û komcivakan de cewazî neyê kirin û heman maf bêne parvekirin. Lê belê cewazî taybetmendiyeke bingehîn a hem gerdûnê ye û hem jî ya civakê ye. Cewazî têgîneke girtî ye ji parvekarina heman cûre mafan re. Wekhevî tenê dema ku cewaziyên esas bigire, dikare watedar bibe. Sedema herî girîng a ku feraseta Sosyalîst a wekhevî nekarî xwe rabigirta, ew bû ku cewaziyê neda ber çavan. Ev jî yek ji sedemên herî girîng a wê yekê ye ku dawî lê hat. Dadweriya rasteqîn dikare ancax di nava feraseteke wekhevî ya ku cewaziyan esas bigire de pêk were. Dema em destnîşan bikin ku azadî pirr têkildarî têgîna cewazbûnê ye, tenê dema ku wekhevî bi cewazbûnê re were têkildarkirin, dikare pêwendiyeke wê ya watedar bi azadiyê re were danîn. Yek ji armancên polîtîkaya civakî ew e ku azadî û wekheviyê bi hev re têkildar bike.

Bêyî ku em qala gotûbêjên li ser di navbera têgînên azadiya takekesî û kolektîv de bikin, em nikarin vê mijarê derbas bikin. Ravekarina pêwendiya di navbera herdu kategoriyan de, ku tê xwestin ku wekî azadiya erênî û neyînî jî were pênasekirin, hin jî girîngiya xwe diparêze. Modernîteya kapîtalîst ku azadiya takekesî (azadiya neyînî) rakiriye pêdarê, bê gûman vê yekê bi buhaya rûxandina mezin a kolektîvîteya civakê pêk anî. Pirr girîng e mirov destnîşan bike ku azadiya takekesî di roja me ya îro de polîtîkaya civakî, herî kêm bi qasî diyardeya desthilatiyê, mezaxtiye. Pirsgirêka jiyanî ya gotûbêjên li ser azadiyê ew e ku rola xweperestî ya di rûxîneriya civakê de, bi taybetî rola wê ya di înkarkirina exlaq û polîtîkayê de were ronîkirin. Dema em bibêjin ku civaka ku bi xweperestiyê hatiye perçe (atomîze) kirin, li hemberî ti emrazên sermaye û desthilatî, hêza wê ya berxwedanê nemaye, em ê karibin rîska qansêrbûna pirsgirêka civakî baştir têbigihîjin. Destnîşankirina xweperestiya lîberal weke çavkaniya bingehîn a ku polîtîka û azadiya civakî dimezixîne, dibe ku ji pêngaveke watedar re zemîn pêşkêş bike. Bê gûman em li vê derê takekesiyê nakin mijara gotinê û em pêwistiya takekesiyê gotûbêj nakin. A ku tê gotûbêjkirin xweperestiya bîrdozî ye, anku lîberalîzm e, ku bi rêya îdealîzekirinê, polîtîka û azadiya civakê dimezixîne.

Ji xwe me azadiya kolektîv gotûbêj kir. Divê em bi girîngî diyar bikin ku azadiya rasteqîn ew e ku nasnameyên her cûre komcivakan (qebîle, qewm, netew, çîn, pîşe û wekî vana), bi qasî takekesî, werin destnîşankirin, berjewendiyên wan werin misogerkirin û ewlekariyên wan werin parastin; her wisa azadiya rasteqîn dikare ancax li ser van bingehan wate werbigire. Dema ku azadiyên takekesî û kolektîv li ser van bingehan bi hevdu re hemaheng bibin, hingê em ê karibin qala pergaleke optîmal a serkeftî ya civaka azad bikin. Derketiye holê, ji ber ezmûnên sedsala 20., ku di navbera azadiya ku lîberalîzm di wateya xweperestî de ew rakiriye pêdarê û azadiya ku Sosyalîzma Pêkhatî bi navê kolektîvîzmê ew rakiriye pêdarê de, her çend weke cemserên dijber jî bêne pênasekirin, dirûviyeke tund heye. Herdu jî bijareyên lîberalîzmê ne. Dema em çavdêrî bikin ka wan lîstokên dewletperestî û arizîkirinê çawa ji aliyê heman dest ve têne pêkanîn, wê mijarên ku tên xwestin bêne gotin, çêtir werin têgihîştin.

Piştî ceribandina modêlên sedsala 20. ên xweperestî (Lîberalîzma hov) û kolektîvîst (Sosyalîzma Fîrewnan), ku bûn sedema rûxanên mezin, bi têra xwe diyar bûye ku civaka demokratîk di warê hemahengkirina azadiyên takekesî û azadiyên kolektîv de zemînê herî berdar e. Mirov dikare diyar bike ku civaka demokratîk di aliyê hevsengkirina azadiyên takekesî û kolektîv de, her

wisa di warê pêkhanîna feraseta wekheviya ku cewaziyan esas bigire de rejîma herî guncav a polîtîk a civakî ye.

### 5- HÊZA AQILÊ CIVAKÎ

Heya ku hêza asta zekayê ya di cûreya mirov de û pêwendiya wê ya xweser bi pêvajoya civakî re neyê têgihîştin, ti derfetên çareserî yên ji bo pirsgirêkên di derbarê civakê de nikarin bi şayanî werin nirxandin. Pîvandina potansiyel a asta zekayê ya di qonaxa mirov de wekî cûre, dibe ku weke destpêk mijareke supekulativ be û ev gengaz jî nebe. Lê bi diyardeya şer a di dîroka mirovahiyê de ku di mercên roja me ya îro de jîngehê aniye ber şêmûga tunekirineke tam, bi têra xwe diyar bûye ku em bi zekayeke pirr cewaz re rûbirû ne. Tê têgihîştin û heta weke ku hatibe îspatkirin ku tenê bi tehlîlên çînî, bi reçeteyên aborî, bi tedbîrên siyasî û bi danehevên herî zêde yên desthilatî û dewletê, mirov nikare pêşî li rûxanên ekolojîk û civakî bigire. Eşkere ye ku pêdivî bi wê yekê heye ku pirsgirêk hîn bi koktir were girtin dest.

Bê gûman bi dirêjiya çaxan li ser hêza aqil hatiye rawestîn. Ez tiştekî pirr nû nabêjim. Ez dixwazim diyar bikim ku ji her demê bêhtir girîng bûye ku mirov balê bikişîne ser aliyekî cewaz ê aqil. Pêwendiya aqil bi civakê re eşkere ye. Mijarek e ku her çavdêrek ji rêzê ya/yê dîrokê dikare tê derxe ku eger civak pêş nekeve, aqil jî pêş nakeve. Ya ku pêwîst e were têgihîştin ev pirs e: Gelo hebûna civakî bi kîjan mercan rewatiyê dide aqil? Bi ti mercên rewatiya civakî nikare were têgihîştin wan rûxanên jîngeh û civakê, ku moderníteya kapîtalîst, bi taybetî serweriya kûrewî ya fînans-sermaye ya dema nêzîk, bi rêya 'aqilê hêmayî', mzintirîn karan bi dest xist û bû sedema wan. Vê yekê eşkere ye ku ti awayê civaka biexlaq, biazadî û siyasî lêxistin (spekulasyon) a 'aqilê hêmayî'pesend nake. Ê baş e, bendavên rewatiya civakî çawa û ji aliyê kê, kîjan hişmendî û navgînan ve hate parçe weslekirin? Kî ne yên xwedî rola avakirin, restorekirin û bijûndarkirinê li hemberî hêza aqil? Bi kîjan rêsa û navgînan berpirsyar in ji pêkanîna vê rolê? Van pirsgirêkan jiyanî ne û teqez wê bersivên xwe bixwazin.

Ez pirr girîng dibînim ku I. Wallerstein bi girîngiyeke mezin radiweste li ser derketina pergala ku navê 'sîstema cîhanî ya kapîtalîst'lê datîne. Wekî din, ez hewldana Fernand Braudel jî, ku mijarê bi rêya hema hema rokirin û pîvanê tehlîl dike, pirr asoveker dibînim. Her wisa fêrkariya qismî ya tehlîlên Samir Amin ên li ser kapîtalîzmê jî heye, ku mijarê bi taybetî têkildarî rûxîna şaristaniyên Îslamî yên Rojhilata Navîn digire dest. Gelek ramannas bi hestiyarî nêzîkê vê mijarê dibin. Encamên hevbeş ên ku xwe gihandinê, dizivirin li derdora lewaziya kevneşopa Ewrûpa ya dewletê, jihevketina dêrê û tarûmarkirina şaristaniya Îslamê  ya ji aliyê Moxolên Cengiz Xan ve. Kapîtalîzm, ku tê dirûvandin weke şêrekî di qefesê de, di encama pêşketinên ku bi dest dixe, di bin van mercan de bi rêya sûdwergirtina ji vebûna derî, pêşî li Ewrûpaya Rojava zal bûye û paşê êrîşên xwe li hemberî tevahiya Ewrûpa, Emerîkaya Bakûr û, ber bi roja me ya îro ve, li hemberî tevahiya cîhanê bi serkeftî temam kiriye. Ew hêza ku berê di qefesê de dihate ragirtin, hatiye ser serweriya cîhanê. Û serwerên berê jî hatine girtin nava qefesa ji hesin. Girtina civakê nava qefesa hesin ji aliyê Leviathan ve bi awayê sinêdetî tê ziman. Girtina civakê ji aliyê moderníteya kapîtalîst û birokrasiya wê ve nava qefesa ji hesin -bêjeya navdar a Max Weber- tê kirin mijara gotinê. Bi vî rengî tê pêşkêşkirin ew tabloya wehîm a civakî, ku tevahiya sosyologên navdar, pirr vekirî jî nebe, hinekî jî bi psîkolojiya tewanbariyê, bi tirsonekî û bi pistepistê dixwazin wê bînin ziman.

Ez bi xwe bi awayekî berfirehtir û girêdayî bi sîstema şaristaniya navendî li vê pirsgirêkê dinêrim. Heta ez dihizirim ku pêwîst e pirsgirêkhinekî jî bi dîroka pêşketina aqilê hêmayî, analîtîk, ve were têkildarkirin. Ew gava ku aqilê analîtîk di sîstema şaristaniya navendî de avêtiye, bê gûman di wesfa dêwane de ye. Lê hemû pêkateyên şaristaniyê bandoreke dirûv derdixînin holê. Bandoreke din a girîng, were destnîşankirin weke gihîştina aqilê mirov bo şiyana çareseriya analîtîk, bi rêya bidestxistina taybetmendiya hêmayî, bi qasî pêkera şaristaniyê girîngiya wê heye. Ji ber ku yê derî ji pêkera şaristaniyê re vekiriye, aqilê analîtîk e.

Hemû zîndewer heya mirov, bi rêgezên şaşnebar ên aqil dixebitin. Ev şêwaza aqil, ku em dikarin jê re bibêjin aqilê xwezayî yan jî hestî, meyldarê navajoyî ye. Bandorbûyîn bi dayîna bertekên pirr ji nîşka ve, tê karakterîzekirin. Bandor-bertek a di nebat û lawiran de di vê mijarê de pirr fêrkar e. Jiyana xwe, ku ji xwezêdekirin, xweparastin û xwe-xwedîkirinê pêk tê, bi aqilê navajoyî bi şêwazeke pirr fêrbûyî didin meşandin. Para şaşîtiyê ew qas hindik e, bi qasî ku mirov dikare bibêje tine ye. Ez alîgirê wê yekê me ku ev mijar were veguhastin qada hebûnên ne-zîndewer jî. Ji bo mînak, eger em erdkêşiya cîhana me weke aqilekî navajoyî bihizirin (ez wisa dihizirim), her objeya wê, heta her piçika wê, bandora wê yê dehf û kêşanê di rêjeya hêza xwe de dijî. Reva ji bandorê pirr sînordar e. Tenê dibe ku di hêza tîrêjê de ji vê bandorê rev çêbibin. Di vê wateyê de ji min re zêde têrker xuya nakin wan felsefeyên ku gerdûnê bêrêgez û serberdayî dihesibînin. Pêwîst e pirr were rawestîn li ser wê nêrîna ku dibêje ‘gerdûn bi zekayeke diyar tevdigere.’

Meteliya di zekaya mirov de şiyana wê/yî ya binpêkirina vê zekaya gerdûnî ye. Belkî ev awayê zekayê (zekaya analîtîk) bi mînaka tîrêjê ji bo mirov weke raseriyek jî were şîrovekirin. Lê em ê çawa tehlîl bikin bi nakokbûna wê ya bi pirraniya raser a şêwaza aqilê gerdûnî re? Belkî ‘teorema kaosê’mijarê bi qismî rave bike. Weke tê zanîn, di teoriya kaosê de di nava bêpergaliya mezin de li pergalê tê gerîn. Pergala bê kaos ne gengaz e. Aliyên mafdarî û rastî yên di vê nêzîkatiyê de nikare were înkarkirin. Lê pirsgirêka li vê derê ev e bê ka wê jiyana mirov a di bin bandora vê kaosa (alozî û qeyran jî tê de) civakî de karibe çi qas dem û di nava ciyekî çawa de were dewamkirin. Ji ber ku dem û ciyê civakê yê xweragirtina li hemberî pêvajoyên kaotîk sînordar e. Eger demajo pirr dirêj bibe û cî (jîngeha ekolojîk) bi rengekî pirole were rûxandin, dibe ku vê yekê dawî li civakan bîne. Em çavdêrî dikin ku di dîrokê de gelek civak ketine nava van rewşan. Dema em dizanin ku mirovan bi dirêjiya demajoya dirêj (zemanê %98’ê jiyana wan), ku bi awayê komcivakên hema hema hoveber hebûna xwe didan berdewamkirin, di vê dorhêla kaotîk de dijiyan. Zemanê jiyana ku di bin pergalên neolîtîk û şaristaniyê de derbas bûye di bin %2 de ye. Bi kurtasî, eger zemanê kaotîk dirêj bibe, vê yekê belkî jî bi tevahî dawî li jiyanê nehîne. Lê vê carê xeterî hîn cewaztir e. Di navbera pêvajoya kaotîk a berî û piştî şaristaniyê de cewaziyeke eşkere heye. Şaristanî jîngehê, ne tenê ji bo civaka mirov, lê ji bo tevahiya zîndeweran jî kişandiye nava sînorên xeteriyê. Ya xirabtir jî ew e ku sermaye û desthilatî, ku di singê civakan de ne, weke şêwaza qansêr (bi awayekî pirole bajarbûn, çînbûna navîn,bêkar mayîn, netewperestbûn, zayendbûn û zêdebûna şênî, ku nikare pêşî lê bê girtin) her saet xwe belav dikin. Dewamkirina vê mezinbûna şêwaza qansêr a bi awayê heyî bi serê xwe, wê wisa bike ku mirov bi findê li klana beriya şaristaniyê bigere. Pêvajoya kaotîk ku bi qansêrê ve hatiye, dibe ku bêhtir ji pergalên nû, bi mirina civakê jî bi dawî bibe. Em darazeke nitrandî nakin. Mirov û zanyarên ku xwe berpirsyar dibînin di vê mijarê de her roj darazên hîn girantir dikin.

Dikare were pirsîn bê ka pêwendiya pêşketinên kanserolojîk ên civakî, bi aqilê analîtîk re heye. Wê demê, em vî aqilî ji nêztir ve nas bikin. Aqilê hêmayî rola pêşeng leyîstiye. Em dîmena herî eşkere ya vê yekê di bihurana ji zimanê nîşaneyî (bi giranî livên bedenî ye) bo zimanê hêmayî de dibînin. Êdî gengaz dibe ku di şûna livên bedenî de bi hin komikên dengan (ên ti pêwendiyeke wan a fizîkî û biyolojîk bi yên destnîşankirî re tune ye), ku li ser wan lihevkirin çêdibe, pêwendiyên watedar deynin. Ji bo mînak em 'çav'bigirin dest: Tevî ku ti pêwendiyeke fizîkî ya komika deng bi çav re tine ye, her kes ên li ser vê pênaseyê li hev bikin, wê ji dengê 'çav', di aqilê xwe de çav zindî bikin. Avabûna zimanê hêmayî wisa ye. Her çend xebatên antropolojîk destpêka vî zimanî têkildar kiribin bi komên Homo Sapiens (nêzîkî 50-60 hezar sal berê) ku pêla dawî ya ku koka wê Efrîkaya Rojhilat e pêk anîn, lê hemfikir in ku peqîna xwe ya rastîn di erdnîgariya Rojhilata Navîn de pêk anî. Bi taybetî komên ziman ên Aryen û Semîtîk vê tezê xurt dikin.

Bandoreke mezintirîn a pêkateya zimanê hêmayî li ser raman çêbûye. Belkî jî ya yekem a ji şoreşên herî mezin ên hişmendiyê ye ku mirov ji zimanê bedenê rizgar bibe û di şûna wî de bi peyvan bihizire. Vê yekê li milekî qutbûna cûreya mirov ji cîhana lawiran bi lez dike; li milê din jî livîneke mezin dide qezenckirin ji bo ku civak li derdora avabûnên zimanê hemêyî kom bibin. Ji ber ku yên heman pergalên dengan diaxivin, herku diçe hem weke hîn cewazbûyîtir û hem jî weke bidestxistina hêza zeka, yekîneyên xwe pêş dixin. Êdî zimanên hêmayî, nasnameyên civakan diyar dikin. Şoreşa neolîtîk bi tevkariyên girîng ên vî zimanî pêk hatiye. Zor e ku mirov bi zimanê nîşaneyê xwe bigihînê vê qonaxa şoreşane. Ji ber ku pirr li ser hatiye rawestîn ka mirov paşê çawa derbasî şaristaniyê bûye, ez ê dubare nekim. Lê bikêrhatî ye ku mirov bi têra xwe baş zanibe ku quntarên sîstema çiyayên Zagros û Toros ku jê re tê gotin 'Kevana Berdar'û deştên Mezopotamya rola dergûşa dayikê ya pêşketinan leyistine.

Yên tên vegotin bandora erênî ya aqilê hêmayî radixin ber çavan. Lê fikareya wî jî pêwîst e mirov di wê yekê de bibîne ku qutbûna ji jîngehê dide destpêkirin. Civakên berî vê, civakên jîngehî yên xwezayî ne. Ew jî di hembêza xwezayê de ne, heman weke ku di têkiliya dayik û zarok de tê dîtin. Lê hêza ramana hêmayî vê pêdiviya jiyana bi vê şêwazê lewaz kiriye. Ji ber ku civaka nû, bi zimanê xwe yê nû jîngehê binav dike, lewre rêya bikaranîna nû jî vedike. Ev rê, rêya serweriyeke mezin e li ser cîhana nebat û lawiran. Şêwazên raman ên berê zimanê hêmayî, her tim bi aqilê hestî dihatin pêkanîn. Taybetmendiya herî bingehîn a aqilê hestî ew e ku weke hêmanên jêveneger ên di bandor û bertek a wî de bi hestên xwe dihizire. Ji dil e, bê derew e û ji hîleyan dûr e. Wisa bi hêsanî nikare were nîşandan ku dayikek li beramberî zarokên xwe, ji bilî jidiliyê, bi rengekî derewçîn û bi hîle tevgeriya be. Aqilê di cîhana nebat û lawiran de jî bi vî awayî dixebite. Em her tim dibînin ku dema şêr tê dîtin, aqilê di lawirên nêçîrê de heman weke xwe li hestên wan diteyîse. Di herduyan de jî hîle tine ye. Lê yek dikare di zimanê hemayî yê mirov de hezar û yek ramanên bihîle, biderew û yên nejidil (yên hestîtî di xwe de wernagirin) bixwîne. Xeteriya mezin a vê şêwaza raman, wê rûxana xwe ya mezin a rastîn bi bihurana bo şaristaniyê nîşan bide.

Ramana analîtîk ku bi navgîniya zimanê hêmayî pêk tê, di daneheva sermaye û desthilatî de rola destnîşankar dileyîze. Ev raman, di serî de bi rêya bikaranîna hêza xwe ya ku xwe dispêre derewan, bi hîle ye û ne ji dil e, di warê dîlgirtin û mêtina civakê de şiyaneke mezin qezenc dike. Weke tê zanîn, lobên pêş ên rast û çepê yên di mêjiyê mirov de, di mijara van herdu zekayan de sazbarî qezenc kirine. Ew loba ku têde ramana analîtîk pêk tê, beşa herî dawî ye ku pêş ketiye. Wekî din hemû beşên din ên bedenê şopên zekaya hestî di xwe de werdigirin. Dema ku beşa ramana

analîtîk raserî qezenc dike, bandora xwe çêdike li ser ramana ku şopên tevahiya bedenê di xwe de werdigire. Û ev pêşketin her diçe ji nû ve şêwe dide tevahiya karakterên mirov. Ev pêşketineke seyr e. Eger di aliyê erênî de were bikaranîn, dikare cîhanê ji bo cûreya mirov veguherîne ciyekî 'cejna herheyî'. Lê eger di aliyê neyînî de were xebatinadin, dikare cîhanê li hemberî pirraniya raser û zîndewerên jîngehê veguherîne dojehê jî. Heman weke hêza nukleârî ye. Bikaranîna vê enerjiyê di xizmeta civakê de, bi şertê ku pirr baş were kontrolkirin, wê gelek feydeyan pêşkêş bike. Lê dema neyê kontrolkirin, tê zanîn ka di mînakek piçûk a Çernobîlê de (lê ya herî tirsnak, a bikarhatî ya di şer de ye) rê li ber çi cûre encaman vedike. Ez di aqilê analîtîk de hinekî xeteriya teqîna nuklear a bêkontrol dibînim. Ez di wê baweriyê de me ku, ji xeteriyê jî wêdetir, civakê û jîngehê bi xwe herku diçe dide ber bombardûmana nukleârî. Bombeyên aqilê analîtîk ê di destê û bin fermana sîstema cîhanî ya kapîtalîst de, bêyî ku pêdivî bi bombeya nukleârî ya cuda hebe, civakê û jîngehê ji niha ve guhastine ber perava rewşa nêjînbariyê.

Bê gûman zimanê hêmayî û ramana analîtîk bi serê xwe tiştên neyînî di xwe de wernagirin, lê tenê mercên guncav ji neyîniyê re pêşkêş dikin. A ku zincîra rastîn a neyîniya dide destpêkirin, pêşketina di emrazên sermaye û desthilatiyê de ye. Sîstema daneheva sermaye û desthilatiyê, ku em wê weke 'şaristanî' dikin têgîn, ji ber sedema karakterê hebûna di cewhera xwe de, neçar e ku derewçîn û bihîle be, her wisa bêpariya ji zekaya hestî di xwe de werbigire. Emrazên zordarî û mêtingeriyê li ser xurek û ewlehiyên kesên din têne damezirandin. Lê pêdiviya xwezaya jiyanê ye ku wê vana bê bertek neyên pêşwazîkirin. Domandina wan, ancax bi du rêyan gengaz dibe; yan bi hêza nerm a pêkanîner a rewatî ya bîrdoziyê, yan jî bi hêza zora tazî ya desthilatiyê. Rastiyeke dîrokî ye ku kontrol bi pirranî bi van herdu rêyan tê pêkanîn. Sermaye û desthilatî hebûnên wisa ne ku tenê tema serî li hîle, derew û zorê were dayîn, dikarin bêne pêşxistin. Beşa sereke ya mêjî tam jî di vê qonaxê de merca guncav jê re pêşkêş dike. Em dikarin ji vê re bibêjin bandora şewişîn û paşevejkirinê jî.

Dema em bi vê paradîgmayê li dîroka şaristaniyê binêrin, em ê bibînin ku zêdebûnên çîn, bajar û desthilatî pêkhateyeke mezintirîn a ramana analîtîk çêkirine. Di pêvajoyên şaristaniyê de çend rawestgehên mezin hene. Pêvajoyên şaristaniyê ku di navbera salên 4000-3000 B.Z. de destpê kirin, di nava civakên Sumer û Misirê de, ku şaristaniyên resen in, pêkateyên mezin ên hişmendiya analîtîk ava kirine, ku bandorên xwe yên efsûnker îro jî didomînin. Mirov dikare hemû şopên pêkateyên hişmendiyê, ku bi dirêjiya dîroka şaristaniyê hatine pêşxistin, di van şaristaniyan de bibîne. Em hemû mînakên xwepêşandanên civakî dibînin, bi awayên wan ên avakirî li vê derê bi şêweya resen, ku ji matematîk heya biyolojî, ji nivîsê heya felsefeyê û ji olê heya hunerê mora şaristaniyê di xwe de werdigirin. Qanaxa Greko-Romen vê pêvajoya avakirinê hîn zêdetir zengîn kiriye û kariye jîriya di pêkateya xwe ya analîtîk de pêş ve bibe. Pêvajoyên Ronesans, Reform û Ronakbîrî, ku piştî bengava kurt a di Ronesansa Îslamî de pêk hatin, ramana analîtîk guhastine xala lutkeyê.

Elbet divê tevkariyên şaristaniyên din jî, di serî de yên şaristaniyên Çîn û Hindê, di van hemû pêvajoyên dîrokî de werin girtin ber çavan. Ev şaristaniya pênc hezar salî dikare were nirxandin weke yekûna qalibên metafizîkê jî ku mezin dibe weke qansêreke dêw, ku li gorî mantiqê xwe ji diyalektîka jiyanê qut dibe. Em weke 'dîrok'dixwînin wan pêşketinên ku daneheva sermaye û desthilatiyê di rehendên dêwane de diteyisînin di tevahiya pêkhateyên hunerî, felsefî, olî û zanistî de ku ji mîmariyê heya muzîk û wêjeyê, ji fizîkê heya sosyolojiyê û ji mîtolojiyê heya ol û felsefeyê.

Şer, weke êrîşên bixof ên talanê, qata zemîn a vê şaristaniyê ne. Ew aqilê ku li ser vî zemînî bilind dibe di wateya xwe ya rastîn de bêaqiliya herî mezin e. Sazbariyeke din a serweriya bîrdozî jî ew e ku vê bêaqiliyê, vî aqilê sûç, vî aqilê şer, vî aqilê bihîle û derewan, bi kurtasî vî aqilê daneheva sermaye û desthilatî, dapêçe, wî bi rêya berevajîkirinê nîşan bide, her wisa wî pîroz bike û wî bike Xweda. Dema em hemû bawerî û huneran û qalibên ramana analîtîk, ên bi dîroka şaristaniyê re di nava hev de pêş ketine, ji nêz ve lê bikolin, wê zor nebe ku bêne tespîtkirin, rastiyên ku em wan di rexneyan re derbas dikin.

Em dikarin tenê di ronahiya van rastiyên dîrokî de wate bidinê bê ka cinawirê kapîtalîst (Levîathanê Hobbes) çawa ji qefesê derketiye. Ez bi girîngî dikirpînim ku ev cinawir, ne tenê bi rêya sûdwerirtina ji lewaziyên sedsala 16., reva ji qefesê pêk aniye.

Ez dixwazim mînaka jinê ji ber vê mijarê tehlîl bikim û bi vî rengî dawî li vê beşê bînim. Bê gûman lêkolînên femînîst bi pêşketinên hê nû, tevkariya girîng dikin ji bo ku rastiya jinê ronî bibe. Lê baweriya min ew e ku van xebatan di rêjeya mezin de di mercên serweriya aqilê zilam de têne meşandin. Bi zêdeyî reformîst in. Lê di girîngiya jiyanî de ye ku di nava tevahiya hîmiya wê de nêzîkatî ji vê mijarê re were nîşandan.

Lêkolînên biyolojîk di cûreya mirov de rola kok a jinê ronî dikin. Ê ku di rastiyê de ji gewdeyê qut bûye ne jin e, lê mêr e. Hestîtiya jinê, ji ber wê yekê ye ku ji diyalektîka çêbûna gerdûnî bi rengekî pirole ji rê derneketiye. Bi taybetî hêştina wê ya di serdema şaristaniyê de di asta ya herî binî de, bandora xwe kiriye ku vê rewşa xwe bigihîne heya roja îro. Aqilê jinê yê dagirtî bi hestan, ji alî aqilê mêr ve her tim tê xwestin weke 'kêm'û weke karaktera jinê bi xwe were teyîsandin. Aqilê mêr çend operasyonên mezin li ser jinê daye meşandin û dide meşandin:

A yekemîn ew e ku jin hatiye kirin yekemîn koleya malê. Ev pêvajo bi qurufandin, zordarî, tecawuz, heqaret û komkujiyên tirsnak barkirî ye. Rola ku jê re hatiye dayîn ew e ku ji pergala bimulk re, bi qasî ku pêwîst be, 'haveyn'hilberîne. Bîrdoziya xanedaniyê pirr girêdayê vê haveynê ye. Jin di nava vê statuyê de mulka teqez e. Ew qas mal û namûsa xwediyê xwe ye ku nikare tew rûyê xwe jî nîşanî kesekî din bide.

Ya duyemîn ew e ku navgîna seksê ye. Seks di tevahiya xwezayê de bi xwezêdekirinê ve têkildar e. Armanca seksê ew e ku jiyan were berdewamkirin. Rola rastîn di însanê mêr de, bi taybetî li gel dîliya jinê û bi giranî di pêvajoya şaristaniyê de, ji seksê re, ji teqîna arzûya seksî re û ji pêşketina wê ya şewş re hatiye dayîn. Heyamên ganê yên di lawiran de, ku pirr sînordar in (bi pirranî salane ne), di însanê mêr de tê xwestin were zêdekirin hema hema heya bîst û çar saetan. Jin, ber bi roja me ya îro ve navgîneke wisa ye ku seks, desthilatî, arzûya seksê timî li ser wê tê ceribandin. Êdî cudatiyên di navbera malên taybet û kerxaneyan de wateya xwe wenda kirine. Ji ber ku her der û her jin weke mal û jina giştî û taybet têne hesibandin.

A sêyemîn ew e ku kedkara bêmize û bê bergîdan e. Hemû dijwariyên karan, bi wê têne kirin. Lê gerewa wan ew e ku hinekî dîtir neçarî 'kêm'bûyînê bibe. Ew qas hatiye piçûkxistin ku bi rastî jî dipejirîne ku li gorî mêr pirr 'kêm'maye û heya jê tê xwe bi destê mêr û serweriya wî re ber dide.

Ya çaremîn ew e ku metaya herî zirav e. Marks ji bo pere dibêje ‘banûya metayan’. Di rastiyê de ev rol bêhtir a jinê ye. Banûya rasteqîn a metayan, jin e. Ti têkilî nîn e ku jin têde neyê pêşkêşkirin. Her wisa ti qad nîn e ku jin têde neyê bikaranîn. Lê bi yek cewaziyek: her çend gereweke pejirandî ya her netewek hebe jî, ev bergîdan di jinê de ji bêrûmetiyeke qirase pêk tê, em ji rûreşiyeke qirase ya ‘evîn’ê bigirin heya forta “keda dayikan nayê sencandin”.

Piştî ku aqilê mêr (aqilê hezar û yek cûre hîle û derewan, ê cinawiriya şer, ê şewşiya bîrdozî, bi kurtasî aqilê ku civak û jîngehê dirûxîne, her wisa aqilê analîtîk, ku ji bilî dengê vingî-vala, ti deng dernaxe.), ku şaristaniyê ew kiriye cinawir, vê kiryarê rewa dibîne li jinê, ku nikare bê wê bijî, ma wê çi nehîne serê civaka mirov û jîngeha wê?! Rawestandina vî aqilî, ancax bi wê yekê gengaz dibe ku mirov exlaqê civakî û palîtîkaya civakî, ku ji aliyê wî ve hatine rûxandin, berî her tiştî deyne şûna wan a resen. Hîn rasttir, mirov dikare ancax li ser wê bingehê destpêkek bike. Tenê ji ber sedema rola ku aqilê analîtîk di rehendên ku gihîştiyê de di tevahiya neyîniyan de dilîze, girîngiya pêşxistina şaristaniya demokratîk li hemberî sîstema şaristaniyê, careke din bi hemû sotîneriya xwe weke erkek li pêşiya me ye. Ya rastîn ew e ku mirov nirxeke mezin bide aqil. Aqilê civakî rastiyek e. Civak bi xwe ew qad e ku têde aqil kom dibe. Qet wateya wê nîn e ku mirov bêhêvî be. Dengekî din jî heye ku ji hemû pîroziyan diherike û dibêje: “Me aqil da we. Tenê bes e ku hûn wî ne di rêya şer de, lê di rêya xêrê de bi kar bînin. Wê demê hûn ê her tiştên ji bo we pêwîst bi dest bixin!” Divê bi rastî jî em vî dengî bibihîzin û jê fêm bikin. Her wisa dengê wijdanê, anku dengê jêneger ê exlaqî jî, ku jê re tê gotin; ‘aqlê selîm’, vê yekê dibêje. Dîsa ew dengê ku dixwaze pêdiviya pêhesandina hunerê azadiyê, ku jê re tê gotin polîtîkaya civakî, bi cî bîne vê yekê dibêje. Xebatên ji bo civaka demokratîk, pratîka vî dengî ne. Û sîstema şaristaniya demokratîk, teoriya vî dengî ye.

Wê armanca beşên piştî vê ew be ku bêhtir dakevin nava çavkaniyên şênber ên van dengan (dengên ku ji pevretiya aqilên analîtîk û hesti derdikevin) û rêyên çareseriyê ku nîşan didin, ronî bikin.

### 6- DERETINA PIRSGIRÊKA CIVAKÎ

Kêliyên pirsgirêkan di diyalektîka xwezayan de, wekî pêvajoyên hilpekîna çawaniya danehevên çendanî, têne pênasekirin. Kêliyên veguheranê di teoriyên pergal û pêşveçûnê de weke navberên pirr kin têne pênasekirin; lê di teoriyên kaosê (alozî) de tê kirpandin ku ya bingehîn rewşa aloz (kaotîk) e, her wisa pergal û pêşveçûn weke kêliyên sînordar dimînin. Ramanên pêşveber a hertimî jî, bi qasî ramanên aloziya (kaotîka) hertimî, aqilê mirov pirr mijûl kirine. Bê gûman, ên ku aqilê mirov weke awêne ya teyisînê şîrove dikin hene, her wisa ramanên ku bingeha her aqilî di mirov de jî dibînin, ne kêm in.

Ne zor e ku mirov di van raman de şîroveyên gerdûnewer û dîmanewer bixwîne. Ji ber ku ez hîn şênbertir nêzî mijarên bi vî rengî bibim, min pêwîst dît ez li ser mijara aqilê civakî rawestim û wî pênase bikim. Lewre wateya pêşkêşiyên ku min heya niha kir ew e ku ez bi amadekariyeke asta wê ya têgihîştinê ya pêşketî, derbasî çavnakiya pirsgirêkên civakî bibim. Tevahiya derketinên girîng ên ramanî bi dirêjiya dîrokê, weke berhemên du serdeman dixuyin: A yekemîn, serdemên ku pergal bi rêk û pêk e, geşdariya civakî têrker e û pirsgirêkên mezin nayên jiyîn. Her wisa pêşketinên xwe di aliyê ramanê de bi şêweyekî dirûv diteyisînin. Ramanên pêşveber in, geşdariyê dibexşînin û pirsgirêkên wan hindik in. Baweriyê didin mirov. Her tim qala mayîndetiyê dikin. Pirsgirêkan weke

arizî û demî dihesibînin. Bi pirranî li ser Xwezaya Yekemîn radiwestin. Naxwazin ku Xwezaya Civakî bikin mijara gotûbêjê.

Ya duyemîn; di serdemên ku di pergalê de xitimîn têne jiyîn û mirov nikare weke berê bijî, her wisa raman bi pirsgirêkan dagirtî ne. Bêhtir li ser Xwezaya Duyemîn radiwestin. Van heyaman serdemên wisa ne ku te de lêgerînên nû yên olî û felsefî bilez dibin. Derketina ji pirsgirêkan di ramanan û lêgerînên nû yên olî û felsefî de tê gerîn.

Mirov dikare herikîna ramanî ya van serdemên geşdarî û pirsgirêkan, ku di dîrokê de pengavên mezin ê ramanî têde hatine jiyîn, di tevahiya şaristaniyan de bişopîne. Em dibin şahidên derketineke muhteşem a ramana mîtolojîk di serdema geşdariya mezin a civaka Sumer de, ku bandora xwe li tevahiya olan, felsefeyan, zanistan û bizavên hunerî dike. Ti ferasetên olî û felsefî, her wisa yên hunerî û zanistî yên mezin tne ne ku ji vê derketina ramanê ya Sumerî bandor negirtibin. Derketina ramanê ya di Yunanîstana Çaxa Kevn de jî, bi civaka geşdariya destpêkê ve têkildar e. Dema ku di Sumeriyan de erdnîgariya berdar a Mezopotamyayê dibe çavkaniya vê geşdariyê; ev geşdarî û berdarî li Yunanîstanê, li herdu peravên Egeyê hatine bidestxistin. Li beranberî mîtolojiya di nava Sumeriyan de, ramana felsefî li İyonyayê derketiye pêş. Pêşketin di zanist û hunerê de di rehendên şoreşane de ne. Ewrûpaya Rojava jî wê derketina xwe ya mezin a ramanî, bi peqîneke dirûv a geşdariyê, ji sedsala 16. û pê ve di asta cîhanî de bandorker bike.

Mijara ku balê dikişine ew e ku wan şoreşên ramanî yên di hersê ceribandinên geşdarî de, girêdayî bi Xwezaya Yekemîn dest pê dikin. Lê dema ku lezayiya geşdariyê tê birrîn û alozî dipeqin, wê demê li ser Xwezaya Duyemîn gotûbêj zêde dibin û ramanên nû bi lêgerînên nû dagirtî dibin. Hin cûre raman, barkirî bi bîranînên serdema berê ya geşdarî û pergalê, her tim li paşerojê digerin; lê nûjenîxwaz gazinc ji xirabûna pergalê û giraniya aloziyê dikin, loma ramanên utopîk diafirînin. Pirr qala şêweyên nû yên civakî tê kirin. Gelek civak di encama van lêgerînan de çê dibin. Em ji komcivakên olî û mezhebî bigirin heya piraştina binemalên nû yên qebîleyan; heta, heya çêbûnên netewan ku em di mînaka Ewrûpa de dibînin, şêwegirtinên civakî pêk tên.

Dema em dîrokê di rehenda diroka ramanê de vekolin, wê vê yekê me bi pirsgirêkên civakî re bide nasandin; Her wisa dema em civaka roja me ya îro vekolin, ne gengaz e ku em giraniya dêwane ya rehenda pirsgirêkê nebînin.

Ez hewl didim bihizirim, bêyî ku girêdayî bimînim bi zanista civakî ya ku navenda wê Ewrûpa ye. Haya min jê heye ku ev şêwaz pirr pêwîst e. Bê gûman dibe ku hin kes vê ramîna bi vê şêwazê weke sivik û jirêderketina ji zanistên civakî darizînin. Lê wê vê darazê qet ne xema min be. Bi rastî jî bêhna serweriyê tê ji zanista civakî ya ku navenda wê Ewrûpa ye. Yan mirov dike serwer, yan jî mirov dajo bin serweriyê. Lê ya pêwîst ji bo me ew e ku mirov bibe subjeya/yê demokartîk û bi dadwerane parve bike. Zanista civakî ya Ewrûpa di cewher de lîberalizm e û bîrdoziyek e. Lê vê rastiya xwe ew qas veşartiye ku kariye wê hêzê di xwe de bibîne ku ramanên rexnegir ên mezin ên dijber jî hezm bike. Dema vê yekê kiriye, şiyana xwe ya raser a eklektîzmê raxistiye ber çavan. Ez dizanim ku, ji bo ez xwe nekim qurbanê vê eklektîzmê, ji bilî pêşxistina cewaziya hêza xwe ya tehlîlê, ti çareya min tine ye. Lê ev helwest ne dij-Ewrûpagerî ye. Dij-êwrûpagerî jî perçeyek e ji ramana ku navenda wê Ewrûpa ye. Ez bi tevgerîna ku Ewrûpa li Rojhilat e û Rojhilat ji li Ewrûpa ye û bi zanebûna ka kîjan nirxên me gerdûnî ne, helwesta xwe pêş dixin. Gelek nirxên Ewrûpa îroyîna nirxên me bi xwe ne û awayê wan ê pêşvebirî ne. Divê em vê mijarê baş zanibin ku pirraniya yên ku

xwe herî dij-Ewrûpager nîşan didin, di encamê de bûne alîgirên herî paşmayî yên lîberalîzma Ewrûpa. Pratîkên rizgariyên netewî û yên Sosyalîzma Pêkhatî, bi van mînakan dagirtî ne.

Ceribandinên Marks û Engels ên li ser Sosyalîzma zanistî, weke çareserî ji pirsgrêkên civakî yên serdema xwe re hatibûn pêşxistin. Ji dil û can ji vê yekê bawer kiribûn. Pênasekirina wan a pirsgirêkê, kirina wan a vê yekê bi rêya têgînkirina kapîtalîzmê bi awayê sîstemê û baweriya wan a derbarê ka wê mirov jê re bibe çareseriyeke çawa, dema dor bê ser sîstema Sosyalîst, temam bû. Wisa bû ku 'Sosyalîzma Zanistî', ku di bin destên wan de hate pêşxistin, garantiya vê yekê bû. Lê dîrok bi cûreyeke din pêş ket. Utopyagerên din jî xwediyê bendewariyên dirûv bûn. Bendewariyên Lenîn ji Şoreşa Rûs cewaz bûn. Hêviyên gelek şoreşgerên Frensî jî bi şkestinên mezin re rûbirû mabûn. Şoreşê gelek keç û kurên xwe xwaribûn. Kûraniyên dîrokê bi mînakên dirûv tijî ne. Lê tehlîlkerên pirsgirêkê hem pirr bawermend bûn û hem jî bi zanebûn tevdigeriyan.

Wateya wê ew e ku di pênasekirinên wan ên pirsgirêka civakî û ceribandina wan a tehlîla wê de hin tiştên kêm û şaş hene. Loma çewtiyên mezin, heta pêşketinên berevaj têne jiyîn.

Wekî gelek cararan hate kirpandin, pirsgirêk ne hindik hewldan, serhildan û şer e. Belê, vana hene û belkî jî pirr zêde ne. Ev cûre bahane min neçar dihêlin ku ez di mijara pênaseya pirsgirêka civakî û çaresereya wê de pirr wurya bim. Eger em zanibin ji tecrûbeyan ders derxin û ji bîranînên lehengiyên mezin re rêzdar bin, hingî devê gavên ku em biavêjin, bi dersan barkirî bin û bi rêzgirtinê dagirtî bin.

## PÊNASEKIRINA PIRSGIRÊKA CIVAKA-DÎROKÎ

Min herdu beşen mezin ên pêşîn ên parêznameya xwe, le ser desthilatî bi gelemperî û li ser yekdestiya desthilatiya kapîtalîst bi taybetî, kûr kiribû. Her çend gelek nebesiyan di xwe de wergirin jî, ez di wê baweriyê de me ku sîstema şaristaniya navendî, weke xet, baş diteyisînin. A girîng, pêşkêşiya xelekên wê yên sereke yên pêşketinê bû. Hem mijar hatibûn pênasekirin û hem jî hatibûn pêşkêşkirin, weke pêşketina zincîrane ya danehevên desthilatiyê, ku daneheva sermayeyê jî weke kumulatîv (lodane) di xwe de werdigirin. Dema min van herdu beşan dinivîsand, min berheviya Andre Gunder Frank a bi navê **Sîstema Cîhanê** jî nexwendibû. Ya ku min pêşkêş kir, hem veguhêziyeke guherde ya vê berheviyê bû û hem jî weke zêdeyî, di nava wê meylê de bû ku çareseriyê jî bi sîstematîkek ve, anku bi şaristaniya demokratîk ve girêbide. Eger min niha wê nivîsandiba, belkî dikarîbû zêdetir bihata xurtkirin. Lê li gorî pêdiviya rêza ji dîrokê re, hêjatir e ku weke xwe bimîne.

Mijara pirsgirêka civakî, sernivîseke cewaz e. Ne armanca wê ew e ku dîroka disthilatî-yekdestiyê pêşkêş bike û ne jî çaresesirya demokratîk gotûbêj dike. Ya ku tê xwestin were ceribandin, pêşkêşiyek pirsirêka civakî di nava jiyînbûyiya wê ya teorîk û pratîk de ye. Ez bawer dikim ku wê vêya tevkarî li çareseriya pirsgirêkê bike. Ez nabêjim ku min heya niha qet qala vê mijarê nekir. Ji berk u perçe bi perçe pirr hat vekolîn. Lê mirov wê bi awayê yekpareyî pêşkêş bike, wê gelek fêrkar be. Ew pirsa "divê mirov pirsgirêka civakî çawa pênasa bike?", mirov dide hizirîn. Hin cûre raman hejariya civakî, hinekîn wan bêdewletiyê, beşeke din lewaziya leşkerî, hinekîn dîtir şaşîtiyên sîstema polîtîk û hinek jî aboriyê û ketibûna exlaqî weke pirsgirêk dihesibînin. Belkî jî tew yek qadeke civakî jî namîne ku weke pirsgirêk neyê hesibandin. Dibe ku di van hemû nêrînan de

aliyên rast hebin. Lê ji teyisandina cewhera pirsgrêkê dûr in. Ji bo min hîn watedartir xuya dike ku mirov pirsgirêka civakî weke binpêkirina dînamîkên bingehîn ên civakê pêşkêş bike.

Ez wisa dihizirim ku pêwîst e mirov, derxistina civakê ji civakbûyînê, bike pirsgirêka bingehîn. Mijara yekemîn li vê derê, hebûna nirxan e, ku civakek diyar dikin. Her wisa hebûna civakî ava dikin û pevbestina wê çêdikin. Ez qala wê mijarê dikim, ku ez jê re dibêjin hebûn bi xwe. Ya duyemîn, ez qala wan pêşketinan dikim ku, vê xwebûn û hebûnê ji bûyîna wê derdixin û bingeha hebûna wê ji holê radikin. Dema ev herdu mijar di nava hev de bên jiyîn, ev tê wateya ku pirsgirêka civakî heye û mezin e. Ji bo mînak, eger di sedema klanî de heyameke qeşabûnê tevahiya klanan ji holê rake, em nikarin jê re bibêjin ‘pirsgirêk’. Ji ber ku felaketa xwezayî, li derveyî vîna me ye. Ji bo karibe bibe ‘pirsgirêk’, pêwîst e bi destê mirov were afirandin. Pirsgirêka ekolojîk bi xwe, ancax dema bi destê mirov çêbû, weke ‘pirsgirêk’ hatiye pênasekirin. Wê çaxê dema em sedema pirsgirêkên bingehîn ên civakî bi wan hêzên ku civakê ji hîmên wê ve dirûxînin û wê ji hev dixin ve girê bidin, wê vê yekê me bibe pênaseyeke rast.

Ez yekdestiya sermaye û desthilatiyê weke serekeya van hêzan dibînim. Ji ber ku ev herdu jî di cewher de weke xespa nirxa bermayî, civakê ji hîmê wê ve dikolin. Ez ê ji niha û pê ve, ji yekdestiya sermaye û desthilatî re, bi hev re bêjim ‘yekdestî’. Ji bo ku di mijarê de zêdetir zelalî çêbibe, mirov awayê xwezayî, asayî û bêpirsgirêk ê civakê jî pênase bike, wê tevkarî pêşkêş bike. Eger civakek, di kîjan ast û şêweya komcivakek de dijî bila bijî, karibe polîtîkaya xwe û pêkhataya xwe ya exlaqî bi rengekî azad çêbike, em dikarin ji awayê wê civakê re bêjin civaka asayî, yan jî xwezayî. Her wisa mirov dikare jê re bêje civaka vekirî, yan ji demokartîk. Ji ber ku em ê di beşên pêş de li ser pirr rawestin, ez ê çareseriyê bi kurtasî weke civaka tam ‘lîberal, sosyalîst, a dewlet-netew a geşdarî, a mezaxê, a sanayî û ya xizmetê’pêşkêş nekim. Ji ber ku binavkirinên bi vî rengî di rêjeya mezin de spekulatîv in. Pênaseyên wisa ne ku di civaka rasteqîn de beranberiya wan nîn e. Wê rasttir be ku mirov ji wan re bêje hin rengdêr.

Wê demê em dikarin hêştina civaka azad a polîtîk û exlaq, bêpar ji van wesfên wê yên bingehîn, weke destpêka pirsirêkê bihesibînin. Û hêza ku pirsirêkê dide destpêkirin yekdestî ye. Divê em wergiriya yekdestiyê jî pênase bikin. Eger nirxên bermayî, dixwazî bi destê dewletê, yan jî bi yê taybet bi rêyên çandinî, bazirganî û sanayî hatibin berhevkirin cemhev, ev tê wateya ku yekdesti çêbûye. Bê gûman keşîş+zilamê bihêz+şêx, weke sêmendiya destpêkê, di nava koma yekdestî de, xerarşîk in. Di rêjeya hêzên xwe de ji yekdestiyê sûd werdigirin. Wê vê yekdestiya sêmendî, bi dirêjiya dîrokê debaşî gelek cûre saziyan bibe. Dîsa, wê her sazi jî di nava xwe de dabeş bibin, lê di cewher de wê bandorên xwe yên zincîrane zêde bikin û bi vî rengî xwe bigihînin heya roja me ya îro.

Pêwîst e mirov karakterê lodane û zincîrane ya herikîna dîrokê ya yekdestiyê hertim bigire ber çavan. Şaristaniya navendî hem encam û hem sedema pêşketina zincîrane ya yekdestiyê ye. Ez ê bi pêdagerî vê mijarê bikirpînim. Ramana modernîteyê di roja me ya îro de tengaviyeke bixof a zeman li mirov ferz dike. Her tişt bi ‘niha’ya tengavkirî ve tê fetisandin. Lê di rastî de ‘niha’dîrok e û pêşeroj e. Modernîte bi vê ferzkirina raman, ne ku komkujeriya dîrokê bi tewşî dike. Ji ber ku ji bo wê pirr hêsan e ku civaka qutbûyî ji kevneşopiyê, li gorî kêfa dilê xwe rêve bibe. Ti dîrok bi qasî dîroka yekdestiyê sifte û zincîrane nebûye, her wisa nebûye xwedî şansê ku bi rêya mezinbûnê pê de were. Dema ku yekdestî xwe bi vî awayî dike dîrok, girîngiya mezin dide wê yekê ku tavahiya

komcivakên civakan bêdîrok bihêle, hîn rasttir, wan di nava xwe de bihelîne û wan bike mêtingeh. Bi vê armancê pêkhateyên mîtolojî, olî, felsefî û zanistî çêdike. Heman hewldanê, dema ku komcivakan dixe nava rewşek wisa ku di alî exlaq de ketî bin û nikaribin polîtîka bikin jî, pêş dixe.

Em jibîr nekin ku dema em yekdestiyê weke têgîn pirrî caran bikar tînin, em vê yekê di wergiriya aborî, leşkerî, siyasî, bîrdozî û bazirganî de dikin. Ji ber ku wê van koman nirxa-bermayî di navbera xwe de bi vî yan bi wî rengî parve bikin. Şêwe û rêje ya parvekirinê çawa û çi dibe bila bibe, wê cewher neguhere. Carna yên ku berdariya aborî pêk tînin, carna leşker û yên dîtir -çîna siyasî, taxima bîrdozî û civata bazirganî- wê di rêjeya girîngiya xwe de di para xwe de bibin xwedî gotin. Dibe ku têgînên tevdeyî, yên weke çîn û dewlet, bibin sedema şolîtiyê. Lê yekdestî weke hevpariyeke vekirîtir a mêtingerî û zordariyê rol dilîze. Çêbûnên çîn û dewlet ên li pey wê di nirxa piraştinê de ne û zayandinên di rêza duyemîn de ne.

Avabûna bajêr di zayandinên yekdestî de rêza duyemîn digire. Bajar, weke biryargeha zordestî û mêtingeriya yekdestiyê, serê xwe radike. Wekî din, sedema ku bi perestgehê re ketiye nava hev, ji ber grîngiya gerîna li rewatiya bîrdozî ye. Wê çaxê bajar bi awayê xwe yê pêkhatî di dîrokê de berî her tişştî weke perestgeh, biryargeha leşkerî û dendika avahiyên rûniştinê (seray) yên burjuwa (di wateya bajarî de, em dikarin ji tevahiya beşên mêtinger re bêjin burjuwa), derdikeve ser dikê. Qelebalixa li derdora wan, weke xeleka duyemîn a li derdora dendika di qeleyan de, rola bendeyên xizmetkar dileyîzin. Dikare ji wan re bê gotin çîna kole jî.

Rastiyên qele û bedenan, ku di dîrokê de hertim derdikevin pêşiya me, delîlên herî eşkere yên avahiyên bajêr û yekdestiyê ne. Bi vî rengî em wan bandorên ku pirsgirêka civakî diafirînin zelal dikin: anku pêkhateyên bajar, çîn û dewletê, ku li derdora cewhera yekdestiyê çêbûne. Dîroka şaristaniyê di wateyek de belavbûna vê çêbûna sê-alî ya di nava dem û cî de ye. Mantiqê wê hêsan e: herku derfetên nirxa-bermayî zêde bibin, wê destilatî jî pirr bibin û avahiyên nû yên bajar, çîn û dewlet wê li pey hev werin avakirin. Van avahiyên bingehîn di heman demê de kevneopên pirr tund çêdikin. Çîrokên bajaran, kevneşopên dewletan û dîrokên xanedanan mijarên bêpayan û bêdawî yên vegotinê ne. Hemû kesên ku mejiyên wan bixebitin û zimanbaz bin, wê weke artêşa zanyaran rewatiya rojane ya bîrdozî pêk bînin. Hema hema ti çîrok û xebroşk namînin ku li hev nehînin. Ji avakirinên xwedayan (xwedayên bajêr û xwedayên şer) heya afiranên cin û şeytanan û ji tabloyên bihuşt-dojeh heya destanên wêjeyan, ti qada ku li hev neanîbin nahêlin. Avahiyên bixof ên mezelan, serayan, perestgehan, şanoyan û stadyûman, ku ji bermayiya keda mirovan têne çekirin, weke pêşandana hêzê ya yekdestiyê ne. Şerên di heman xofiyê de tevahiya şêniya gel, qebîle, her wisa ya bajar û gundan, hemû bi hev re, ji bilî dîlên kêrhatî, tune dikin û ve yekê jî ji kevneşopên yekdestiyê ne. Ji xwe her tiştê ku were wateya nirxa aborî, weke xenîmeta şerê pîroz, ciyê xwe ji mêj ve di pirtûka pîroz a yekdestiyê de girtiye.

Gotûbêjeke girîng di derketina pirsgirêka civakî de, piştî şoreşa çandini, pêwendîdar e bi şêwaza şaristanî ya yekdestî, lewre ya piraştina sê-alî (bajêr, çîn û dewlet). Bi gotineke din, gelo neçariyek bû wê qonaxa şaristaniyê (qonaxên pêşketina ku weke civaka koledar, feodal û kapîtalîst jî têne binavkirin) bi şêwaza xwe ya heyî, piştî civaka neolîtîk? Gelo derfetên civaka neolîtik hebûn ku, bêyî bajarbûna biçîn û bidewlet, xwe hilpekanda qonaxeke jor a cewaz? Eger hebûbe, çima nekarî pêşketin bidest bixista? her çend vana weke pirsên spekulativ jî bêne nirxandin, balê dikişînin ser mijarên girîng. Ji ber ku wê vê mijarê di sîstema şaristaniya demokratîk de bi berfirehî were

gotûbêjkirin, bersiva ku ez ê bi kurtî bidim, dikare girêdayî bi şêwaza me ya lêkolîna xwezaya civakî were dayîn. Pêşketin, li gorî paradîgmaya şaristaniya zal, pêwîst e heman li gorî xwe bin, guncav li gel xeta qederê. Her tişt ji alî mûcîbê qederê ve çêdibe. Di bextê mirov de her çi hebûbe, ew pêk hatiye. Hemû pevbestînin metafizîkî vê yekê îdea dikin.

Lê şîroveyên di analîza şaristaniya demokratîk de, hem ên li ser şaristaniyê û şêweyên civakî yên di singa wê de, hem jî nêzîkatiyên wê yên di derbarê berdewamî û veguherana civaka neolîtîk de cewaz in. Bi kurtasî, rastiya civakî, ne weke wê yekê ye ku zanista civakî ya binavenda Ewrûpa wê rave dike. Şîroveyên zêdetir nêzî heqîqetê jî gengaz in.  Civak bi rengekî cewaz çêdibe ji ya ku tê xwestin were vegotin. Pirr girîng e ku mirov cewaziya di navbera gotinan û rastiyê de bibîne û wekî din mirov têkiliya di navbera gotinan û şaristaniya navendî ya zal de têderîne. Gelek nirxandinên kategorîk ên bi navê zanista civakî têne pêşkêşkirin û weke rastiyên bêgotûbêj didin pejjirandin, bi giranî propaganda ne. Armanca wan ew e ku rastiyê binuxêvin. Gelek bizavên zanîna civakî, yên pêşkêşkirî bi navê sosyalîzma zanistî jî têde, di bin bandora giran a lîberalîzmê de ne. Ta ku van mijaran di pîvana herî kêm de neyên ronîkirin, wê para şaşîtiyan a bersivên ku bêne dayîn, zêde be.

Dema bi vî rengî bêne pênasekirin pirsgrêken civakî di derketinên wan ên resen de, wê vê yekê bihêle ku mirov pêvajoyên wan ên pêşketinê bi awayekî rasteqîntir şîrove bike. Pêşkêşiyên pirsgirêkan bi awayê qonaxên sereke zêdetir fêrkar in, ji ber ku pirsgirêkan di nava yekparetiya wan de nîşan didin, bêyî ku bi awayê kategoriyên bingehîn bêne dabeşkirin.

**a-** Mirov dikare yekemîn qonaxa pirsgirêkên mezin ên yekdestiya şaristaniyê, li navbera salên (nêzîkî) 3000 B.Z.. û 500 P.Z. bide rûniştandin. Yekdestî rêxistineke wisa ye ku nirxa bermayî ya mezin di mercên cewaz ên dem û cî de bi rêbazên cûrbecûr ji civakê didize. Mezintirîn berhema-bermayî di çandniyê de bidest dixe di civakên Sumer, Misir û Harapa de ji salên 3000 B.Z.. û pê ve, bi rêbazên rêxistî ku em ê karibin jê re bêjin ‘sosyalîzma fîrewnan’. Yekemîn modêla mezin a sermayeyê ye. Berdariyeke tirsnak li gorî civaka neolîtîk hatiye bidestxistin. Ev berdarî bi xwe re bajêr, çîn û dewletê zayandiye. Yekemîn çaxa mêtingeriya mezin vedibe, yan bi rêbazên zorê, yan jî bi rêya yekdestiyên bazirganî, li ser derfetên berhema-bermayî, ku di civaka neolîtîk de jî ji mêj ve destpê kiribûn. Bê gûman di sosyalîzma fîrewnan de mêtina bendeyan esas e, ku, heman weke cûreyek guherde ya lawiran, bi nanoziko dihatin xebitandin. Bi kinahî, yekemîn xeleka resen a mêtingeriya navend-derdor a roja me ya îro, bi vî awayî hatiye danîn. Mirov dikare pêşketinên bi vî rengî di nava civaka Sumer de jî di nava hemû tazîtî û perdeya wan de di ronahiya belgeyên di dest de bibîne.

Bê gûman xespa bi vê şêwazê ya hilberîn û berhema bermayî, wekî ji cûreyek xencera çikilî li sînga civakê, rê li ber pirsgirêkên giran vekiriye. Dîrokên mîtolojî û olan bi çîrokên li ser van pirsgirêkan dagirtî ne. Ji bo em mînak bidin; dema yekemîn destana Girgamêş, Tofana Nuh, Efsaneyên Hewa-Adem û Habîl-Qabîl, pevbestîna buhuşt-dojeh, pevçûna Xwedavend Înana û Xweda Enkî û nakokiyên şivan û cotkar bi awayê vegotinê têne pêşkêşkirin, eşkere ye ku di cewher de tê xwestin were teyisandin xencerkirinên ku yekdestî bûye sedem, anku xespa berhema bermayî ya ku bi rêya desteserkirina bi zorê û dayîna xebitandina mîna lawiran hatiye pêkanîn.

Çîrokên bêhejmar ên dirûvên vana, dema em qala talan û dayîna xebitandin ên sawnak dikin, elbet wê zimanekî nuxaftî bikarbînin. Pêwîst e mirov pirr baş zanibe ku di vê heyamê de serweriya bîrdozî, herî kêm bi qasî serweriya fizîkî, bibandor e. Birastî jî, eger dîrok bi zimanê bindestan û yên

talanbûyî jî hatiba nivîsandin, nikare gûman jê were kirin ku diyar e em ê bi paşerojeke pirr cewaztir, ji ya pêşkêşkirî ji me re, rûbirû bimana.

Tenê hejmara koleyên ku di pîramîdên Fîrewn (vana mezelên wan in;  gelo serayên wan çawa bûn?)ên Misirê de dihatin xebitandin, milyonan derbas dike. Vana li ciyekî mîna zeviya lawiran bi awayekî kombûyî dihatin ragirtin û bêyî ku zikên wan biqasî yên lawiran jî hatiba têrkirin, di çêkirina wan avahiyên bixof de bi qamçiyên mirinane dihatin bikaranîn. Dema ku koleyên lawir weke mulkên wan bi vî awayî dihatin xebitandin, şaxa leşkerî ya yekdestiyê jî êrîşan dibir ser komcivakên derve û, ne tenê têkber û axên ku ji aliyên van komcivakan ve dihatin bikaranîn xesp dikirin, lê di heman demê de tevahiya komcivaka ku ji bo xwe kêrhatî didîtin, ji bilî kuştiyan, dîl digirtin. Wan avahiyên tirsnak ên qele, beden, mezel, arena, saray û perestgehan, ku di roja îro de jî yên wan dibînin di nava matmayînê de dihêlin, bi dîlên bi vî rengî dihatin avakirin. Eger bi milyonan kesên ji wana di çandîniya avî de ku bi navgîniya yekemîn cokên avdanê hatibûn çêkirin nehatibana xebitandin, diyar e wê nekarîbûya ewqas berhema bermayî bihata bidestxstin û wê gengaz nebûya ku van avahiyên dêwane yên kevirîn bihatana avakirin. Her wisa wê nekarîbûya jîna buhuştwarî ya yekdestiyê bihata girtin bin garantiyê.

Wan vegotinên (mîtolojî, olî, felsefî û bizavên cûrbecûr ên hunerî û zanistî) ku koka wan şaristaniya navendî ne (pêvajoya ji şaristaniya serwer a Sumer a Mezopotamya heya şaristaniya serwer a DYE), bi armanca ku vê pêvajoya bixof bi rengekî cewaz bidin teyisandin, gelek saziyên seresaziyane, di serî de bîrdoziyên di heman tirsnakiyan de, pêşxistine. Bi taybetî aqilê analîtîk gihiştiye qonaxa xwe ya herî berdar. Di bin serokatiya yekdestiya keşîşan de, ji utupyayên mîtolojî heya tabloyên buhuşt- dojeh; dema vana têrê nekirine, ji raveyên felsefî heya zanistî, her wisa heya zanîn û pirzaniyên ku çêtir bersiv bidin xuyanekên xwezayê, bersivan pêşxistine. Ji bo hîn hêsantir rêve bibin, gavên pêşîn avêtine bo nivîsê, matamatîk, stronomî û biyolojiyê. Ji lêgerînên nedîtî yên li dermanan ji bo rehetiya tebeqeya yekdestiyê, bingeha zanista bijîşkî hatiye danîn. Gerîna Girgamêş a li ‘giyayê nemiriyê’ beşa herî bi heyecan a destanê ye. Mîmariya avahiya ji kevir teknîka çêkirina avahiyên nemiriyê ji bo ‘nemiran’ pêşxistiye. Dema ku mîtolojî têrê nekiriye, pêvajoya olên dogmatîk ên sexttir hatiye destpêkirin. Ji bo teselîkirina mirovên ku hatibûn xistin nava rewşên bixof, xwedayên ku hêmaya qral-xwedayan  diteyisandin, hatine avakirin. Aqilê analîtîk belkî jî berhema xwe ya herî mezin, di dema derbaseya bo van olên yek-xwedayî de pêşkêş kiriye.

Ne tenê rê li ber pirsgirêka civakî hatiye vekirin, lê di heman demê de pirsgirêk bi şêweya wê ya herî bixof hatiye zayandin. Weke kabûsek xwe avêtiye ser hemû çanda daringî û arişî ya civakê. Peyva ’amargî’di zimanê Sumer de, hîn di wê demê de wateya ‘veger li dayîk û xwezaya pîroz’, di xwe de wergirtiye. Mirovahî, ku hatiye xistin, wer lê hatiye kirin ku bi mûmê li paşeroja xwe bigere. Hatiye kirin awayekî bîrdozî ku mirov kêliyekê zûtir bimire û xwe bigihîne buhuştê. Jiyana buhuştwarî  ya li rûyê erdê, ku di serdema Neolîtîk de mîna ku carna were jiyîn dihate xeyalkirin, êdî hatiye kirin mijara utopya û cîhanên dîtir. Feraseta sekular, anku dunyawî, ciyê xwe terikandiye ji wan ferasetan re ku ji bilî axretê nikarin tiştekî din bihizirin. Cîhan li hemberî vê pirsgirêka bixof cîherengiya xwe ya di nava hemû zengîniya xwe de wenda kiriye û wisa lê hatiya kirin ku weke ciyekî ezabê were sêwirîn.

Exlaq û polîtîkaya civakî yekemîn derbeyên mirinane bi vê pirsgirêka yekdestiyê xwarine. Dema qadên exlaq û polîtîka ku hîmên avahiyên civaka komînal in hatine tarûmarkirin; li jor exlaq

(di rastî de bê exlaqî) ê serwer, xweser bo komcivakên teng ên endamên yekdestiyê, û polîtîka (dewleta xwedayî) hatine zalkirin. Misoger e ku exlaq û polîtîkaya civakî hîn bêyî ku pêşbikevin hatine pûçkirin. Lê li şûna wan, harîtiyên serweran ên jiyanê û îdayên wan yên xwedatiyê, weke pergala xwedayî hatine danîn. Ji civakê re tenê ew maf hatiye dayîn ku van vegotinan weke 'baweriyên pîroz' pesend bike.

Tê dîtin ku, ne tenê pirsgirêka civakî hatiye zayandin, lê ji vê jî wêdetir, civak ji xwebûna xwe hatiye derxistin û hatiye veguherandin zeviya lawiran a yekdestiyê. Wisa hatiye kirin ku bendetî û koletî weke rêjîmeke xwezayî werin pejirandin. Û koletiya jinê ku kokên wê dirêj dibin heya dema kevntir, anku heya serdema xerarşîk a hoveber, bûye mijara herî berfireh a jiyanê. Pergalên bixweda yên serwer ên zilam ên cuda, mîna ku tola xwe hilînin ji civaka dayik a pîroz û dêxwaz a neolîtîkê, hatine avakirin. Dema ku xwedavendiya jinê hêdî hêdî şopa xwe wenda kiriye, çaxa serweriya biheybet a xwedayên bi hêmaya zilam, hatiye destpêkirin. Jin hîn wê demê hem di hemû perestgehan de û hem jî di kerxaneyên ketûber de neçarî fehîşetiyê hatiye kirin û li wan deran hatiye ragirtin.

Hatiye çavdêrîkirin ku ev serdema berdar a bi teknolojiyên xwe yên heyî yên avdaniyê, di dawiyên salên 2000 B.Z. de ketiye nava aloziyekê giran. Her wisa hem zuwayî û hem jî şorbûna axê bandora xwe li vê pêvajoyê kirine. Lê di bingeh de xwezayî ye ku hîmên damezranê, ji ber sedema bandora pratîka civakî bi xwe qirçiyabin. Harappa ji mêj ve belav bûye û bêdeng maye; Misir bi nakokiyên kûr ketiye nava rewşa ku nikare were domandin; Sumerî jî weke koma etnîkî ya zal, ji mêj ve ciyê xwe ji şaristaniyên koka wan jî etnîkên dîtir bûn re hêştine.

Sîstema şaristaniya navendî ya vê heyamê, ji bo çareserkirina pirsgirêkên giran ku bû sedema wan, du riyên girîng ceribandiye. Ya yekemîn, xwe belavkirina ber bi derve ye. Pêvejoya mîtingehkirin û emperyalîsbûnê, ku pişt re wê pirrî caran derkeve pêşiya me, ji pirsgirêkên giran re ancax çareseriyê demî tîne. Lê nikare xwe rizgar bike ku nebe sedema pirsgirêkên nû. Pirsgirêk nehatine çareserkirin; berevajî, hîn zêdetir belav bûne û kur bûne. Derxistina derve ya pirsgirêkên ku li navendê û metrepolan kom bûne, piştî rehetbûneke qismî, wê belavbûna wê qat bi qat bibin û lê bizîvirin. Ev çerx, wê bi cî guherandina herdemî ya navend û derdor di dîrokê de timî derkeve pêşiya me.

Metrolpola Sumer (navend), li gorî baweriya min ji sê aliyan ve, heta eger em deryayê jî lê zêdê bikin, ji çar aliyan ve, xwe derdixe derve. Berhema yekemîn a ber bi Rojava ve, Misira Nîlê ye. Di nava şîmaneyê de ye ku Misir pêşî weke kolonî û paşî jî bi rêya serxwebûnê pêşketibe. Pêşketina şaristaniya cûreya Misirê li erdnîgariyek ku çar aliyên wê girtî ne, eger desteka derve nebe, şîmaneyêke zor e. Belavbûna Sumeriyan jî ber bi Rojhilat ve, li peravên Sîndê Harappayê zayandiye. Heman nêzîkatiya me ji bo Harappa jî derbasdare. Eger desteka derve nebûya, Harappa dikarîbû ancax li çolê bibûya mucîzeyek. Her wisa bêhtir guncav e li aqilê mirov ku zayîna yekemîn a qraliyetê jî bi nêzîkatiyeke dirûv were ravekirin. Di pêkannîna şaristaniyê de hîn di zayîna wê ya pêşîn de têkiliya navend-derdor taybetmendiyeke sereke ye. Qadeke girîng a belavbûna ber bi Rojhilat ve, şaristaniya Elem–Sûs a li Sûsîana bû ku li Îrana roja îro cîranê Sumeriyan bû. Belavbûnên ber bi Bakûr ve, ewên ku bi rêya Babîl û Asûrê, ku ji navendê zêde ne dûr in, hatine pêkanîn ji alî Hûriyên Aryanî ve, ku komcivakên resen ên Mezopotamyaya Jorîn in û hêza bingehîn a avaker a şoreşa neolîtîkê ne.

Hûriyan, ku ji alî Sumer, Akad (serdema koma etnîk ku koka wê Semîtîk e), Babîl û Asûr ve timî hewl hatiye dayîn ku bêne kolonîkirin û mêtingehkirin, belkî jî berxwedanên xwe yên yekemîn û herî mezin ên dîrokê, li hemberî vê şaristaniya resen a navendî kirine. Mirov dikare ji kevalên Sumerî, vê pêvajoyê têderxe. Destana Girgamêş jî bi eşkereyî dibêje ku yekemîn êrîş ber bi daristanên Bakûr ve hatine kirin. Ji xwe Îraq-Ûrûk a hemdem ku hîn jî dibilqe dewama vê rastiyê û kevneşopê bi rengekî kartêker diteyîsîne. Nakokiyên Kurdan, ku koka wan Hûriye, û yên Ereban, ku koka wan Semîtîk e, taybetmendiyên xwe yên ku ji ’Nuh û Nebî’ mane, hîn jî didin axaftin. Yekane tiştê ku guheriye navend-derdor, serwer û cewaziya teknîk e.

Hurî, ji ber ku qebîleyên resen ên Kevana Berdar bûn û şoreşa çandiniyê bi kûranî dijiyan, xwedî wê potansiyêlê bûn ku hem li ber xwe bidin û hem jî şaristaniya xwe cewherîn pêşbixin. Gelek daneyên Arkeolojîk derketin rûyê erdê di derbarê wê yekê de ku yekemîn navenda xwe ya bajêr di salên 3000 B.Z. de, bêyî ku pêdiviya wan bi navenda Sumer hebe, damezrandine. Bi taybetî bîrdariyên mezin ên kevirîn (Gobeklîtepe, 10.000- 8.000 B.Z.), ku berî şoreşa Neolîtîkê li nêzî Rihayê hatine çikalandin, di warê teyisandina kokên şaristaniya vê herêmê de, rê li ber dengvedanên mezin vekirine, ku bandora wan di cîhana zanistî de hîn jî berdewam dike. Texmîna min a kesî ew e ku Sumerî, ew kolonî ne ku koka wan Hûrî ku yekemîn nişteciyên Mezopotamyaya Jêrîn in. Lewra ev mijar têghîner e ku hem Hîtîtî û hem Mîtanî, ku koka wan Hurî ye, ji salên 1600 B.Z. û pê ve, li Anatolya Navîn û li Rojhilatê Başûr împaratoriyan ava kirine. Li van qadan, ew derfet heye ku pêşketinên din ên şaristanî çêbûbin. Eger bîrdariyên Gobeklitepe bêne tehlîlkirin, dibe ku vê yekê di mijara şartistaniyê de rê li ber nêrînên cewaz veke. Belavbûna Sumeriyan bi rêya deryayê, bûye sedem ku li Uman û Yemen ên roja me ya îro heta li Hebeşistanê, koloniyên şaristaniyê çêbibin. Tê zanîn ku bajarekî mezin li Umanê, biqasî herî kêm ê li Harappayê, hebûye.

Duyemîn rêya derbaskirina aloziyê, ji aliyê Babîlî û Asûriyan ve hatiye ceribandin. Babîliyan bi rêya pêşxistina sanayî û zanistê û Asûriyan jî bi rêya damezrandina yekdestiya bazirganî, hewldanên xwe bêqutbûn berdewam kirine, ji bo ku şaristaniya Sumer ji wan pirsgirên giran ku dijiya, rizgar bikin û wan belavbikin. Babîl di warên zanist û sanayî de London, Parîs, Amsterdam û Venedîk a rasteqîn a wê heyamê ye. Heta di dema xwe ya hilhatinê de ji New Yorka roja me ya îro hezar qat zêdetir xwedî şan û şohret bû. Îskander bi xwe, tewş nefesa xwe ya dawî li Babîlê temirî nedaye. Sedam jî, belkî jî qurbanê dawî yê trajîk ê evîna ji bo Babîlê bû. Bihezarên wan hene ku di nivîsê de hilnayên. Dema ez hewl didim yekdestiya bazirganî ya Asûrê tehlîl bikim, yekser yekdestiyên bazirganî yên Venedîk, Holanda û Înglîs tên hişê min. Bi rastî jî yekdestiyên bazirganî yên Asûrî, belkî jî bi qasî yên Fenîkiyan, şirketên herî jêhatî û afirîner ên dîrokê bûn. Bêgotûbêj e ku ji Asya Navîn (mirov dikare bêje ku li Çînê jî xuya kirine) heya Anatolyaya Rojava û Erebistanê û heya peravên Derya Reş şebekeyên bazirganiyê (Karûmên Navdar, anku ciyên karê, yan jî karxaneyan) pêşxistine. Misoger e ku yekemîn împaratoriya mezin a bazirganî damezirandine. Ev extapot a bazirganî ku xwe bi awayê sê heyaman (2000-1600 B.Z., 1600- 1300 B.Z. û 1300-600 B.Z.) nîşan dide, bi vê wateya xwe yekemînek e. Lê bazirganî jî, ti nirxeke wê ya çareserkeriyê nîne, ji bilî belavkirin û kûrkirina sînordar a şaristaniya navendî ya Sumer. Ji xwe yekdestiya bazirganî her dem hevpara yekdestiya sereke ya keşîş+leşker+rêvebir e. Nelihevkirinên di navbera wan de ji pevçûnên li ser paran wêdetir naçin. Lê qet nikare were piçûkkirin ku Asûr, şaristaniya navendiya Sumerê bi dirêjiya nêzî hezar û pêncsed salan bi navgîniya xwe guhastiye. Yek ji xelekên herî bihêz ên zincîra şaristaniyê ye.

Harappa, Ûman, Hîtîtî, Mîtanî û Misir, ji ber ku nekarîn heman serkeftinê nîşan bidin, di nava xwe de bi hêsanî ji hev ketine. Asûriyan, bi rêya Fenîke, Med-Persan û serdema dereng a Hîtîtiyan, bandora xwe li şaristaniya Grek kirin û ev yek bi rêya bazirganiya pêk hat; her wisa nikare were înkarkirin ku di dewamkirina bêqûtbûn a şaristaniya navendî de rola herî destnîşankar leyîstine. Yekdestiya bazirganî pirsgirêkan çareser nake. Lê bi rêya belavkirina li her alî gelek berhemên pêşveber (raman û bawerî jî tê de) ên şaristaniyê dabîn dike da ku vana pêşbikevin û demekê dirêj li piyan bimînin. Nexwe wê bihata ketin nava rewşa Harappa û wê dîrok dubareyên çendîn salî jiyaba. Lê dîsa jî pêwîst e mirov zanibe ku yekdestiya bazirganî yekdestiya herî stemkar a daneheva sermayê ye û nêrînên wê yên siyasî, weke me di mînaka Asûr de çavdêriya wan kir, qet natirsin ku têkevin nava pêkanîn herî stemkar (çêkirina qele û bedenan ji qoqên mirovan). Hîn bêhtir ev mijar jî tê zanîn ku yên cewaziya buhayê, anku cewaziya malan a di nirxa bûyîna mal de, bikar tînin û bi vî awayî qezenca bi keda herî kêm bidest dixin, yekdestiyên bazirganî ne.

Li vê derê em qala danûstendin û bazirganiya meta (malê bazirganî) nakin, ku ne bi armanca karê ye, lê bi armanca mezaxê ye. Lê divê daîmî li ber çavan bê girtin ku em qala bazirganiya yekdestîperest a bi armanca karê dikin. Şîmaneyêke mezin e ku Harappa, ji ber ku nekarî xwe ber bi derve belav bike û bazirganiyê pêşnexist, hilweşiya. Tê zanîn ku Xanedaniya Nû ya Misirê jî (1600-1000 B.Z.), nekarî şiyaneke serkeftiyane ya vebûna ber bi derve û damezrandina yekdestiya bazirganî bidest bixe, bi pevçûnên navxweyî û êrîşên derveyîn ve, vemiriye. Eger bi qasî Sumeriyan belav bûbûya wê cîhana me cewaztir bûbûya. Lê, Çînê pêwîst nedît ku bifûre; belkî jî ew bi têra xwe fireh bû. Eşkere ye ku yekemîn pêqîna şaristaniya navendî, bi rêya belavkirina li cîhanê wan pirsgirêkên ku bûn sedem, kariye xwe bigihîne qonaxeke cewaz.

Hin ramannas hene ferz dikin ku di dîrokê de di heyama 1600-1200 B.Z. de şaristaniyên Anatolya, Mezopotamya û Misirê bêhtir ketine nava hev û bi vî rengî yekem car karakterêke navendî ya serwer wergirtine. Her çend jê re neyê gotin serdema zêrîn a bajarbûn, bazirganî û Arîstokrasî jî, lê, eşkere ye ku hilpekînek hatiye çêkirin. Dîsa eşkere ye ku berfirehbûna pirsgirêkê tevkarî lê kiriye ku serweriya navendî gelek caran cî biguherîne û temenê sîstemê dirêj bibe. Hevpeymana Kadeş a navdar (salên 1280 B.Z.), rastiya vê heyamê diteyisîne.

Aloziya ku şaristaniya navendî di navbera salên 1200-800 B.Z.de dijiya, ancax dema ku teknîka hesin (3000-1000 B.Z.) ket pêşiya tunc, sivik bûye. Pêşketinên di teknîkên hilberîn û şeran de hertim cewaziyên heyamên xwe diafirînin. Bê gûman, a destnîşankar pêşketina civakî ye. Lê ev pêşketin, ji nêzîk ve bi teknîkê re têkildar e. Navenda serwer yekem car derdikeve derveyî Mezopotamya. Yekemîn pêngavên çerixîna ber bi Rojava, anku Ewrûpa ve tên avêtîn. Qonaxa derbase ya di vê de, wê ji alî Împaratoriya Med-Pers ve (600-300B.Z.) bi rêya bejayî û ji alî Fenîkeyiyan ve (1200-330 B.Z.) bi rêya deryayî were pêkanîn. Wê Ûrartû jî (850-600 B.Z.) roleke dirûv bileyîzin. Aloziya civakî, her çend nekariye tam were derbaskirin bi navgîniya teknolojiya hesin û bi rêyên bazirganî, ku berfireh dibe û tê xistin bin ewlehiyê, lê sivik bûye û kariye were domandin. Rêyên bazirganî yên bejayî yên Împaratorî (serwerî) ya Med-Pers û pêngava ku Fenîkeyî bi rêya bazirganiya Derya Spî avêtin, girîng in. Grekî, demekê dirêj bi awayê mêtingeha, anku koloniya, van herdu şaristaniyan jiyane. Her çiqas dîrok (dîroka bi navenda Rojava), şaristaniya Grek-İyon resen dihesibîne jî, lêkolînên rasteqîn nîşan didin ku her tiştên xwe ji belavbûna van herdu şaristaniyan girtine. Dema em li bandora Med-Pers û Fenîke, bandora Misir, Babîl û Girîtê

zêde bikin, dibe rastiyek ku nikaribe were înkarkirin ku şaristaniya navdar a Grek, di rêjeya mezin de malê derve (îthal) ye.

Bê gûman senteza Grek-Îon nikare were piçûkdîtin. Lê pirr eşkere ye ku resen nîne. Ji xwe ti şaristanî resen nîne. Hemûyên wan, li ser berhevkirin û civandina nirxên civaka Neolîtîk, ku yan bi rêya xespê, yan jî bi rêya yekdestiya bazirganî û bi pirran jî bi rêya bikaranîna herdu rêbazan di nava hev de, hatine damezrandin. Dibe ku wan di guheranê de derbaskiribin û ji wan sentezên nû afirandibin. Lê, weke Gordon Chîlde jî diyar dike, wan nûvedanên teknîkî ku ji alî civaka Neolîtîkê ve di heyama 6000-4000 B.Z. de di kevana Toros- Zagros de hatin afirandin, di giraniyeke wisa de ne ku mirovdikare ancax wan bi nûvedanên piştî sedsala 16. ên Ewrûpa re berawir (muqayese) bike. Pêşî, bi bilindbûna bajarê Urukê re, ji salên 4000 B.Z. û pê ve, dest bi avakirina şaristaniya navendî hatiye kirin. Mijara herî bingehîn a pevçûna ku xwedavenda Înana bi xwedayê Enkî re kiriye, li ser ‘Me’yan e (‘Me’tê wateya nûvedana teknîkî û teknolojiya Neolîtîkê ku li derdora jinê çêbû), ku Enkî jê diziye. Li vê derê, têkiliya di navbera serweriya li ser teknolojiyê bi serdestiya zilam ve, ku bi şaristaniyê re pêşdikeve, tê kirpandin. Ev mînak bi xwe, bi mirov nîşan dide bê ka nirxa fêrker a mîtolojiya Sûmerê çiqas bilind e. Ji xwe zimanê wê demê bi mîtolojiyê ye barkirî ye. Ne wisa ye ku mîna zimanê roja me ya îro were bikaranîn.

Şaristaniya Grek- Îon 1600-300B.Z. ku li herdu peravên Ege bilind dibe, bê gûman di zincîra dîrokî de xelekekê girîng e. Di pêşketina civakî de pêngaveke mezin e. Hem di warê hişmendî û hem di yê teknîkî- piratîkî de xwedî tevkariyên mezin e. Mîrasa guhezkarî ya deryayî ku ji Fenîkeyiyan girt, pirr pêşxistiye. Koloniyên berfireh li peravên Ewrûpayê ava kiriye. Teknîka nivîsê dîsa bi rêya mîrasa Fenîkê pêşxistiye û di çêbûna alfabeya roja me ya îro de bûye xwedî para girîng. Pêşketinên şoreşane di hemû zanistên wê serdemê yên tên zanîn de bidest xistiye. Di felsefeyê de tam şoreşek hatiye jiyîn. Bi xwedayên Olymposê, xala dawî daniye li serdema xwedayên Sumerî. Bi Homeros, kevneşopa Destana Girgamêş guhastiye lûtkeyê. Pêşveçûnên dirûv ên şoreşane di şano, avasazî (mîmarî) û mûzîkê de hatine bidestxistin. Bajarên bi heybet hatine avakirin. Guheranên ku di herikînên perestgeh, seray, şano, stadyom û avahiya meclisan de çêkir, nirxên xwe yên kevnare (klasîk) hîn jî diparêzin. Pêngava wê ya hilberîn û bazirganî nikare were piçûk dîtin. Pêşketinên sanayîgerî jî girîng in. Di warê polîtîk de mînakên demokrasiyê, ku bûne malê dîrokê, pêşkêş kiriye. Îspat kiriye ku demokrasî, di çarçovaya şaristaniyê de be jî, ji awayên din ên rêvebiriyê rasertir e. Lê, van hemû destnîşankirinan, wê rastiyê naguherîn, ku qonaxa şaristanî ya Grek-Îon xelekekê şaristaniya navendî ye, ku bi Sumeriyan destpê kir.

Di alî mijara me de, dema ku rola şaristaniya Grek a di çareserkirina pirsgirêka civakî de, hîn rastir, para wê ya di pêşketina pirsgirêkê de were nirxandin, dikare pirr bi hêsanî were diyarkirin ku ti cewaziyeke wê ya bi kok ji şaristaniyên dîtir nîne. Hemû pêşketinên ku bidest xistine, di serî de demokrasiya Atîna, nîşan dane ku, em çareserkirina wana a pirsgirêkên şaristaniya navendî li milekî bihêlin, berevajî, hîn zêdetir wan girankirine.Eger em vana rêz bikin;

Dîliya jinê bê ser û bin hatiye kûrkirin. Jin, ne tenê hatiye binbarkirin ku li malê zarokan çêke û weke koleyek herî giran ji zilam re xizmetê bike, lê di heman demê de beşdariya wê ya nava polîtîka, spor, zanist û rêvebiriyê jî qedexe ye. Hatiye bezandin bo hemû karên giran ên hilberînê. Eflatûn di wê nêrînê de ye ku jiyîna zilam bi jinê re, wê zadeganî (esalet) ya wî bihincirîne. Homoseks ji ber vê sedemê berfireh bûye. Koletî, ji bilî jinê jî, mîna aşûtek mezin bûye. Yekem car

girseyên koleyên bêkar bi hejmarên mezin derketine holê. Saziya leşkerî ya diravî (bi pere) hatiye nûvandin (îcadkirin). Ne tenê mal, lê kole jî hatine derbirin (îxrackirin). Li beramberî vê, çîneke herî kurltêlxur (asalak) a efendiyan hatiye dariştin. Têgîna 'arîstokrasî'hatiye peydakirin. Qada civakî bi hêmanên kultêrlxur ên civakî tijî bûye. Beşên herî nêzî çîna burjuwa, berhema şaristaniya Grekî ye. Bi kurtasî, çawa ku li wan pirsgirêkên di qada civakî de yên nû hatine veserkirin (zêdekirin), pirsgirêkên berê jî giran bûne û dewam kirine.

Di pêşketina bajêr de heybet (îhtîşam) hatiye bidestxistin û bajar pêkhatiyeke organîk wergirtiye. Lê, van pêşketinan, bi buhaya girankirina pirsgirêka civakî hatine bidestxistin. Avahiyên zîgûrat û pîramîdan, hema hema mîna ku hatibin dabeşkirina bo perçeyan û di rehendên dêwane de hatibin dubarekirin. Çawa ku yekemîn qonaxa bajêr ji avahiya perestgehê bi xwe û ji pêvek ên wê pêk hatiye, qonaxa duyemîn bi bedenên yekemîn û duyemîn ên di qeleya hundirîn û di quntarên wê de tê nimandin, di qonaxa sêyemîn de, bi rêya rakirina van cudatiyan û lêkirina pêvekên nû, zengînî û heybetiya mekan hatiye bidestxistin. Pêşketineke paralel li gel mezinbûna yekdestiyê mijara gotinê ye. Bi vê yekê ve pirsgirêk nayên çareserkirin, lê zêdetir tên mezin kirin. Artêşa koleyan a berê qatbiqat derbas kiriye. Wekî din koleyên bêkar çêbûne. Cara yekem mirovan xwe di nava rewşa herî bêkêr de dîtine. Ne gengaz e ku pirsgirêka civakî ya ji vê girantir hebe. Sîstema ku bêkaran biafirîne sîstema herî stemkar e.

Mirov dikare di emrazên desthilatî û dewletê de jî çavdêriya mezinbûnên dirûv bike. Desthilatî ji qatên jorîn ber bi qatên jêrîn ve dagiriya xwe mezin kiriye. Serweriya dewletê li ser civakê, bi rêya fetisandina polîtîkayê zêde bûye. Burokrasiya dewletê çêbûye. Çîna leşkerî îmtiyaza xwe zexm kiriye. Bi gelemperî di binyata civakî de di otoriteya desthilatiyê ya li ser jinan, zarokan, ciwanan, koleyan, gundiyan û zenatkaran de zêdebûn hatiye dîtin. Aliyê herî trajîk ê demokrasiya Atînayê ew e ku mezixîna polîtîkayê li beramberî dewletê bi hemû tazîtiya xwe raxistiye ber çavan. Kevneşopa demokratîk a civakî di mînaka Atîna de bi destên arîstokratan hema mîna ku nefesa xwe ya dawî dabe. Belkî jî waneya herî girîng ku divê em ji demokrasiya Atîna derxin, ev be.

Yekdestiya şaristaniya Roma (750 B.Z.-500 P.Z.) berdewama kevneşopa Grek-Îon e û di çarçoveya yekparetiya wê ya hundirîn de ye. Hema weke ku mînakên veguhastî ji nîv giraveke bo ya dîtir bin. Mijara herî girîng ku mirov karibe bêje ew e ku, eger Grekî heyama zaroktî û ciwantî ya vê şaristaniyê bin, Roma jî heyama gihîştîtî û kalîtiya wê ye. Yekem car, bi ser ketine ku wan tiştên ji Rojhilat girtin, bi şêwazek ku li hemberî Rojhilat raserî bi dest bixin, hezim bikin û senteza wan çêbikin. Serkeftina Roma ew e ku beşek ji Ewrûpa, bi buhaya dagirkirin û kolanîkirina stemkarane, tevlî şaristaniyê kiriye. Ji bilî vê, Roma ji her milî ve awayê pirole mezinbûyî yê krîterên Grek e. Di warên bajar, çîn û desthilatî de rehendên dêwane wergirtiye. Ji qraliyetê derbasî komara arîstokratîk bûye û ji wê derê xwe gihandiye împaratoriya herî bi hêz û fireh a dîrokê. Jiyana bi şêwaza Roma, li her alî bûye moda. Arîstokrasî weke modernîteya (burjuwaziya) roja me ya îro, hêza destnîşankar a hemdemiyê ye. Arîstokratiya kurtêlxur (asalak) û proletaryaya sûtal, hêmayên (sembolên) pirsgirêkên harbûyî yên Roma ne.

Dikare were gotin ku serdema Roma, lûtkeya pirsgirêka civakî ye. Ti aliyê ku mirov di vê yekê de lê şaşwaz bimîne, nîne. Pêwendiya di navbera yekdestiya şaristanî, ku bi awayekî lodane (kumulatîv) mezin dibe, û mezinbûna pirsgirêka binyewî de ku ew dibe sedema wê, rasterast (dîrekt) e. Nîşana herî zelal a vê yekê ew e ku qebîleyên barbar û Partiya Xirîstyanî, weke partiya hejaran,

tevî cezakirinên sawnak ên Roma (rakişîna mirovan li çarmîxê, dayîna perçekirina mirovan bi şêran, hatina tarûmarkirin weke mînaka Kartaca û wekî vana), weke lehiyê herikîn ser Romayê; ev tê wateya peqîna pirsgirêkan (di cewher de peqînên giyana azadiyê ne), weke hêzeke fîzîkî. Eşkere ye ku barbarê rasteqîn Roma ye û sedema hilweşîna wê pirsgirêkên dêwane yên civakî ne, ku hem li hundir û hem jî li derve wan mezin kir. Bi hilweşîna Roma re, ne tenê bajarê Roma, desthilatdariya wê û arîstokratiya wê hilweşiyane; lê di heman demê de sîstema cîhanê ya serpêhatî (macera) ya şaristaniyê, ku bi çîroka bajarê Ûrûkê destpê dike, bi pêkhateya xwe ya karakterîstîk a navend-derdor, hemberî (reqabet)-serwerî (hegomonya) û bilindbûn- nizmbûnê ve hilweşiyaye; her wisa dijberiya sîstemê ya civakê bi pirsgirêkan ve û bi berxwedanên dijber ên hundirîn û derveyîn ve, ku di kesayetî û rûyê Roma de bû sedema wan, yek ji serdemên xwe yên herî barbar girtiye.

**b-** Duyemîn qonaxa mezin a di pirsgirêka civakî de, dikare were rûniştandin li navbera zemanê ku ji hilweşîna Roma heya hilhatina Amsterdamê berdewam kir: anku heyama li derdora 500-1500 P.Z. Taybetmendiya wê ya destnîşankar ew e ku olên Îbrahîmî, ku weke peyamên çareseriya pirsgirêkan derketin holê, mora xwe li vê serdemê xistin. Olên Îbrahîmî, dema gotine ku wê bibin çare, lê zêdetir rê li ber pirsgirêkên civakî vekirine; ji ber vê yekê pêwîst dike ku mirov bi girîngî li ser wan raweste.

Dema ez lêhûrbûnan dikim ji bo ez peyama civakî ya olên Îbrahîmî tehlîl bikim, ev peyam li cem min wateyeke wisa werdigire ku pêkhateya sîstema şaristaniya navendî ya bi pirsgirêka daringî (madî), vediguhere bo pêkhateya bi pirsgirêka arîşî (manewî). Bi gotineke din, pirsgirêkên wê yên çanda daringî bi awayê pirsgirêkên çanda arîşî deng vedidin. Di pirtûkên pîroz de bi rengekî eşkere tê diyar kirin ku Hz. Îbrahîm, ji zordariya Nemrûd (rêvebirê bajêr), nûnerê Babilê yê li Rihayê, anku ji ber pirsgirêkên giran ku dibe sedema wan, direve yan jî koç dike. Heta weke mûcîzeyên xwedayî tê vegotin bê ka çawa ji xeteriya şewitînê difilite. Sedema wê weke nîşandereke bingehîn tê pêşkêşkirin ku di nava gerîna li xwedayê nû de ye. Mirov dikare gerîna wî ya li xweda, weke gerîna wî ya li rêvebiriya nû jî wergerîne. Vegotin wekî din gelek taybetmendiyên dîtir ên pêkhatiya bi pirsgirêk a wê demê pêşkêş dike. Tê texmînkirin ku dîrok li derdora salên1700 B.Z. ye. Îbrahîm ji şaristaniya koka wê Mezopotamya, koçî şaristaniya kokê wê Misir dike. Wate ku di navbera herduyan de rê hatiye vekirin. Belkî jî ji xwe re li stare û hevalbendên nû digere. Ji ber ku jiyana wî ya li diyarên Kenan (Îsraîl û Filistîna roja îro), vê tezê pişt rast dike. Ji qebîleyek piçûk, weke malbat vediqete û li Kenan dibe qebîleyek nû.

Neviyê wî Wusiv, weke kole tê firotin Misirê. Şiyanên Wusiv, wî di seraya fîrewn de bilind dikin qata wezîriyê. Divê yekê de rola jinên sarayê girîng e. Jin di dîroka Îbraniyan de her tim rolên girîng dileyîzin. Li Misirê jî qebîleyek Îbranî çêdibe. Lê, di rewşa nîv-kole de ne. Ji vê yekê pirr nerihet in. Ciyê Nemrûd, hema hema fîrewn girtiye. Dixwazin ji wî jî rizgar bikin. Vê carê wê Mûsa serokatiya koçberiyê bike. Dîrok li derdora nêzî 1300 B.Z. ye. Derketin [ji Misirê], di pirtûka pîroz de weke bi mûcîzeyan berkirî derbas dibe. Didirûve derketina Îbrahîm. Veger dîsa bo diyarên Kenan e. Kenan, dema bi Misirê re were berawirkirin (muqeyesekirin), 'buhişta sozdayî'ye. Xweda, yê ku li çiyayê Sîna lêdigerin, bi Deh Fermanan, ên zelaltir û misogertir, bang li qebîleyê dike. Deh Ferman di rastî de rêgezên rêxistinî û bernameya siyasî yên qebîleyê ne, ku piştî ezmûnên dirêj wan bi dest dixe. Tiştekî wisa mijara gotinê ye ku qebîle olên Nemrûd û Fîrewn misoger diterikîne û ola xwe ya etnîkî (nêrîna xwe ya li ser cîhanê û bernameya xwe) dadimezrîne. Pirtûka Pîroz, pêvajoyên

paşê, bi dengê xwedayî dirêj dirêj vedibêje. Li pêşberî me, êdî ne çîrokên mîtolojîk weke li Sûmer û Misirê, lê rêsayên olî yên ku misoger rast (Ortodoks ) in, hene.

Di dîroka olan de ev rewş tê wateya şoreşeke mezin. Her wisa tê wateya şoreşa ramanî ya wê demê. Lêkolîn nîşan didin ku kevneşopa Îbranî yek ji çavkaniyên herî pêşketî yên hafîzaya Rojhilata Navîn e. Baweriya min weke kes, li ser wê bingehê ye ku Îbranî, di cewher de mîtolojiyên Sûmer û Misirê bi awayê ol veguherandine gotinê (retorîk). Bi dirêjiya pêvajoya dîrokî li vê gotinê ji çavkaniyên Zerdeşt, Babîl (bi taybetî di heyama sirgûna 596 B.Z. de), Fenîke, Hûrî û Grek lêkdanan jî kirine û bi vî rengî Pirtûka Pîroz tim pêşxistine. Divê neyê ji bîrkirin ku yekemîn berheviya Pirtûka Pîroz di heyama 700- 600 B.Z. de hatiye çêkirin. Berî wê, ti çavkanyeke nivîskî tine ye.

Divê ez bi girîngî vê mijarê diyar bikim: Cihû bi dirêjiya dîrokê ne tenê SERMAYE û PERE berhev dikin, lê di heman demê de bi awayê herî yeman BÎRDOZÎ û ZANIST-ZANÎNÊ jî berhev dikin. Bêhêziya xwe ya hejmarî bi van herdu danehevên stratejîk di asta cîhanî de vediguherînin hêzê. Etnîsîte (pêşî qebîle û di roja me ya îro de netew) ya Cihû, bi saya van herdu danehevan, bi ser ketine ku bi dirêjiya dîrokê, hertim di peravên desthilatî û şûnên wê yên stratejîk de, xwe bi asta jiyaneke gelek raser rabigirin. Lê wan felaketan û pirsgirêkên bixof  ku hatine serê wan, ji nêz ve bi van rastiyan ve girêdayî ne. Bê gûman, dema em di xwendina dîrok û rojaneyî de herdem ji xwe re bikin rêbaz.ku sermaye û zanîn hêz û deshlatî ye û desthilat jî sermaye û yekdestiya zanînê ye, hingê wê pirsgirêka civakî pirr zelaltir û rasteqîntir were têgihîştin. Ji ber ku emê bêhtir di beşa Şaristaniya Demokratîk de lêbikolin ka olên Îbrahîmî di çareseriya pirsgirêkên dêwane yên civaka-dîrokî de çiqas çareserker in, li vê derê bi kurtasî vedikolim ka çawa hîn zêdetir rê li ber pirsgirêkên girîft ên dîrokî-civakî vekirine.

Hevpeymana Kevn/Ahdî Atîk (navê din ê Pirtûka Pîroz) heyamên piştî Mûsa bi awayê serokan, keşîşan (Leviyiyayan), serwerên pêxember, pêxemberan û nivîskaran rêz dike û pê de diçe. Mirov dikare beşên rewşenbîr û zanayan jî li heyama piştî vê (bi navê dirûv) veser (zêde) bike. Wer tê têgihîştin ku tê gotin pêxemberî ji tevahiya pirzaniyên (nûvedaniyên/îcadên keşîşan) ku çavkaniyên wan mîtolojiyên Sûmer û Misir in. Hevpeyman Kevn/Ahdî Atîk wisa şîrov dike. Erka bingehîn a pêxemberan ew e ku bibin çare ji pirsgirêkên civakî yên nedîtî re, ku yekdestiya şaristaniyê dibe sedema wan. Dema herdem bê girtin ber çavan ku daneheva berhema-bermayî û sermaye bi xebitandina bi zorê û bi rêya leşkerî li ser bingeha kolekirinê tê bindestxistin, wê daneheva dêwane ya pirsgirêkan jî çêtir were têgihîştin. Pêxembertî dengvedana vê rastiyê ye li ser beşên civakî yên pirsgirêkên giran dijîn. Dema em wesfa wê ya saziyanê bi vî awayî têbigihîn, wê xwendinên me yên li ser dîrokê, zêdetir bibin têgihîner.

Em dibînin ku bernameya bîrdozî û siyasî ya Mûsa, nêzîkî sêsed sal piştî mirina wî, li derdora salên 1000B.Z., di bin serweriya pêxemberên SAÛL-DAWID-SILÊMAN de, dewleteke piçûk dizayîne. Çareseriya ku peyda dikin, piştî ewqas têkoşîn, ji pirsgirêkên giran ên civakî re ku dijîn, ew e ku xwe bigihînin amûreke desthilatî- dewlet a girêdayî xwe. Pirr eşkere ye ku ev dewlet, bi qasî ya Atînayê demokratîk nîne. Dîsa eşkere ye ku pirr lewaz û bêçare ye, li gorî kevneşopên dewletê yên Misir û Babîl-Asûr, ku Cihû demajoyeke dirêj di nava wan de jiyan. Wê demê, çima di kevneşopa Îbrahîmî de li ser dewletê pirr tê rawestîn? Ji ber ku nûvedana  pêxember e, loma. Ji endamên xwe re, weke buhuşta sozdayî, axan dibexşîne.

Tê zanîn ku yekemîn dewleta Cihû, piştî demeke kurt, piştî pevçûnên li ser desthilatiyê û dagiriyan ên dirûv (pevçûnên kur û neviyên Dawid û Silêman û gefên Asûr û dagiriya wê), hilweşiya. Xeylî didirûve  Îsraîla ku piştî sê hezar salan li heman cî hate damezrandin. Lê dîsa jî, pêwîst e mirov girîngî bide vê avakariya pêxemberan. Bandora wê, bi dirêjiya dîrokê, li ser desthilatiyên şaristaniya navendî qet kêm nebûye. Bi taybetî bi rêya sermayeya bîrdozî û diravî, pirr bandorker bûye.

Kevneşopa Hz. Îsa dibe duyemîn ola girîng a Îbrahîmî. Pêşkêşiya peyameke e ji girêkên pirsgirêkan re, ku rûxandinên dagiriya Roma bûn sedema wan. Navê din ê Îsa, Mesîh (Rizgarvan) e. Di cî de ye ku ev tevger, ku zayînê (mîladê), anku dîrokê ji xwe ve dide destpêkirin, were wesfandin weke yekemîn partiya ekumenîk (gerdûnî) a beşên hejar û proletarên sûtal ên Romayê. Dûr e ji karakterê mîlîtan ê Tevgera Mûsa. Dikare were diyarkirin ku ji beşa jêrîn a qebîleya Îbranî derketina xwe çêkiriye. Berhema wan mercan (dorhêla objektîf) e, ku rêxistingeriya qebîleyê şiyana xwe ya çareseriyê bi têra xwe hunda kiriye û çînbûn, bajarbûn û desthilatîbûn nirxên komunal bi têra xwe mehandine. Wesfa xwe ya gerdûnî û çînî ji van mercan digire. Di wê demê de jihevketinên dirûv ên qebîleyî û qewmî li Rojhilatê Deryaya Spî bilez dibin. Tevgerên kolonî (mêtingerî) yên Grek, Asûr-Babîl û herî dawî Roma bi lodan (gelek) girseyên bêqebîle, bêkar û hejar birçî û li naverastê dihêlin. Gerînên li xwedî û rizgarvan pirr zêde ne. Eşkere ye ku tevgera Îsa derbirrana/îfadeya kolektîv a van lêgerînan e. Ji xwe, ji xwe re dibêje ‘peyam’. Hevpeymana Kevn/Ahdî Atîk, weke Hevpeymana Nû /Ahdî-Cedîd (Încîl) tê nûkirin. Çanda û zimanê şaristaniya wê demê Asûr-Aramî, Babîl-Keldanî, Grek-Helenî û Cihû-Îbranî ne. Roma-Latînî hîn nû çêdibe. Tê gotin ku zimanê ku Îsa pê diaxive, Aramî bûye. Zimanê Helenî  di heyama Helenîstîk de li herêmê bi têra xwe belav bûye. Zimanê Aramî, hezar sal e ku zimanê bazirganî û çandî yê herêmê ye. Zimanê Helenî jî paşê van taybetmendiyan werdigire. Lê zimanê Îbranî, wer tê têgihîştin ku zimanê metnên pîroz e. Zimanê Latînî, bêhtir weke zimanê nû yê rêvebiriyê, ji xwe re cî dibîne.

Mirov hîn rastî şopên Erebî nayê. Tê çavdêrîkirin ku di nava qebîleyên çolê de pêşketî ye û, li gel bajarbûna li nîv-girava Erebistanê, destpê kiriye ku bibe zimanê şaristaniyê. Dagirkirina wê ya herêmê,  wê bi şoreşa Îslamî pêk were. Tevî ku mirov rastî şopên zaravayên Farisî tê, lê vana pêkhatiyên xwe yên pêşketî di sîstemên çiyayî yên Zagros-Toros û navenda şaristanî ya Pers-Sasanî de dijîn. Wekî din, gelek çand û ziman, di serî de Sumerî û Qiptî yê Misirê, mijara gotinê ne ku ji ber bandora şaristaniya navendî ji hev dikevin û ji holê radibin. Zimanê Ermenî jî her diçe bandora xwe li herêmê dike.

Berberiya du desthilatdarên serwer, ku wê xwe bêhtir weke bi çavkaniyên Rojhilat û Rojava, derbibirrin,, zaliya xwe li herêmê bi hemû lezayiya xwe didomîne: Împaratoriya bi navenda Îtalya-Roma û Împaratorya Sasanî  bi navenda Îran-Kafkasya. Yekemîn car e ku şaristaniya sê hezar salî ya bi navenda  Mezopotamya, şemitiye derveyî herêmê û, weke parvekirî di  navbera du şaristaniyên mezin ên serwer de, mîrasa xwe didomîne.

Şerên di navbera wan de, di cewher de li ser mîrasa şaristanî ya Mezopotamya ne û pirr dijwar in. Belkî jî têkoşîna ji bo seweriyê ya herdemî û herî kûr a dîrokê, di vê serdemê de hatiye jiyîn. Mirov dikare  dema Îskender û piştî wî, weke yekemîn raûnda vê pevçûnê şîrove bike. Hîn gelek dem heye ku navenda şaristaniyê bişemite Rojava. Lê dîsa jî, eşkere ye ku yekemîn pêngavên wê hatine avêtin.

Tê çavdêrîkirin ku felsefeya Grek li Împaratoriya Roma û doktrîna Zerdeşt (bêhtir sekular û exlaqî) li Împaratoriya Pers-Sasanî, nekarîne bibin çare ji pirsgirêkên ku çavkaniya xwe ji van herdu yekdestiyên şaristaniyê digirtin. Rastiya şer, di rastî de, neçareseriyê dikirpîne. Derfetên nirxa-zêdemayî ku sînordar dimînin, şer di navbera yekdestiyan de, ku di alî hejmar û wesfî de mezin dibin û pirr dibin, dike rêbaza herî gûzîde ya danehevê. Şer di dîroka şaristaniyê de cureyek emrazên daneheva sermaye û desthilatî ne. Wate (anku) ti pêwendiya wan bi çîrokên qehremanî yên efsanebûyî re tine ye. Eşkere ye ku şer, ên roja me ya îro jî tê de, di tehlîla dawî de bi pênaseya herî watedar navgînên destguher ên sermayê û desthilatiyê ne. Lewra, di dema xwendina li ser dîrokê de pêwîst e herdem were girtin ber çavan ku di navenda hêz û pêwendiyên herî bingehîn ên hilberînê de rol dileyîzin. Lê armanca şerên parastinê ew e ku axên di destên xwe de, hêz û pêwendiyên din ên hilberînê, azadiyê, bi kurt û cewherî, nasnameya civakê, ji bo vê, pêkhatiya wê ya exlaqî û polîtîk û rrrrrrrrrrrrrrrrrrrrrrrrrrrrr,xsd eger hebe, demokrasiya wê biparêzin. Rewatiya xwe ji vê rastiyê digirin.

Pirrî caran tê qalkirin ku şerên ji bo yekdestiyê di dîroka şaristaniyê de erka motorê pêk tînin. Ev di alî wê yekê de rast e, ji ber ku rê li ber nûjeniyên xurttir ên teknolojîk, rêxistinî û çalakbazî vedikin. Lê, pêwîst e mirov zanibe ku di cewher de herî derveyî civakê ne, heta derveyî xwezayê ne û fenomen (bûyer) ên ji hovîtiyê jî wêdetir in. Lê dîsa jî, ji ber ku navgîneke yekdestiyê bûnê, çavkaniya wan civak e. Lê, ji bo ku civakê ji civakbûnê derxînin, van çavkaniyan dimezixînin.

Ew biwêja"eger li rûçikekî te bidin, rûçikê xwe yê din bizîvirîne" ku tê gotin a Hz. Îsa ye, bê gûman, gerîna mezin a li aştiyê ya wê demê derdibirre. Bi zanebûna ku bêkarî û hejariya mezin a wê demê, çavkaniya xwe ji şerên bêpayan ku naqedin digirin, loma aştî mora xwe bi kûranî li Tevgera Îsawî dide. Tê ferqkirin ku şer çiqas hundabûna hilberînê be, aştî jî ewqas tê wateya hilberînê. Wê vê tevgerê van wesfên xwe bi dirêjiya sêsed salan biparêze. Wê xwe biçirpîne her derên ku Roma û heta Sasanî lingên xwe lê danîbin. Wê li Çînê û Hindê biteyise. Pêwîst e mirov Tevgera Manîst jî bi girîngî bi bîr bîne, ku di vê demê de bi karakterêkî dirûv çêdibe, lê navenda wê bêhtir Sasanî ye. Hz. Manî bi xwe dibêje "ez ê heya Roma biçim û bi Sasaniyan re aştiyê pêk bînim." Eger vê doktirîna wî ya têkel ji Zerdeştî û Îsawîtî û ku wesfên kûr di xwe de werdigire, ji alî serwerên zordar ên Sasanî ve nehatiba perçiqandin, belkî jî dikarîbû rê li ber Ronesanseke nû ya Rojhilata Navîn vekiriba.

Xirîstyanî (wê rasttir be ku jê re bê gotin mezhebekê vî navê giştîbûyî), ku di avakirina Konstantînopolîsê (Îstembol) de payeya ola fermî jê re tê dayîn, piştî vê dîrokê (325 P.Z), tavilê dibe bîrdoziya fermî ya tevahiya Romaya Rojhilat û Rojava. Dîroka Xirîstyaniyê ne mijara me ye. Aliyê wê wê yê pêwendîdar bi mijara bi me re, têkiliya wê ya bi pirsgirêka civakî û yekdestiyên desthilatiyê re ye. Eşkere ye ku, çawa ku reseniya Tevgera Mûsawî bi dewletê bi dawî bûye, Tevgera Îsawî jî ku duyemîn versiyona wê ye, herî kêm pirraniya bizava wê, bi desthilatî û dewletê bi dawî bûye. Ne tenê bîrdoziya fermî ya Bîzansê ye; lê di heman demê de di salên 1000 P.Z. de li Romayê dewletek xurt bi xwe ye. Ji vê jî zêdetir, yekûna bi hezaran emrazên desthilatî ye, ku çavkaniya wan civakî ye û pirr firehtir û xurtir in. Dewlet belkî jî dibe derbirrana/îfadeya wê ya herî hêmayî (sembolîk) û fermî.

Berberiyên navxweyî yên Xirîstyaniyê, pevçûnên Katolotîk-Ortadoks û mezhebbûnên wê yên dîtir ên navdar, di hêla mijara me de ancax wê wateyê derdibirrrin bê ka çiqas pirr bi pirsgirêk in. Dema armanca wê ew bû ku bibûya ola aştiyê, lê ewqas bû şerker bi qasî ku mirovan di agir de

bişewitîne; ev jî delîla wê yekê ye ka çiqas mora şaristaniya navendî di xwe de werdigire. Heta mirov dikare çawa rave bike ku reng e ji bîrdoziyên şer ên bi koka mîtolojîk zêdetir bû sedema şeran? Xirîstyanî, bi rola xwe ya di şerên Xaçperestan li hemberî Îslamê li Rojhilat; şerên li Ewrûpa, pêşî yên li hemberî olên qebîleyî û caduyan, paşê yên tirsnak ên mezhebî di nava xwe de û şerên mêtingeriyê li Emerîka, Efrîka, Awustralya û Rojhilatê Asya, nekariya xwe ji bûyîna derketina tam derveyî armanca xwe, bide alî. Asûrî, Ermenî, Keldanî û Helenên Anatolya jî, ku yekemîn qewm in ku bûn Xirîstyan, bûne qurbanên têkildariya vê olê bi şaristaniya nevendî re, ku wê hembêz kirin, weke çare ji pirsgirêkên xwe yên giran ên civakî re, ku dijiyan. Xirîstyanî, ku wê ji xwe re weke cureyek netewperestî şîrove kirin, wan bilez bi yekdestiyên desthilatî yên qewmên dîtir re rûbirû hêştiye. Dema ku Xirîstyaniya Rojava dibe desthilatdar û bi ser dikeve (bi bûhaya wendakirina peyama di cewhera xwe de), lê, Xirîstyaniya Rohilat û ya Anatolya dîsa ji alî cûreyek netewperestiyan (Ereb, Tirk, Kurd) ve, hem jî di bin maskeya versiyona yekemîn (Mûsawî) û sêyemîn (Îslamî) de, tesfiyeyên mezin hatiye serê wan. Li vê derê di derbarê ka pirsgirêkên civakê çawa hatine mezinkirin de, em bi nimûneyên kartêker re rûbirû ne.

Divê ez carekê dîn teza xwe dubare bikim: kevneşopa Îbrahîmî, di vê navberê Xirîstiyanî, tên wateya nimandina çanda arîşî (manewî), ku çanda daringî (madî) ya şaristaniya navendî diteyisîne. Hîn rasttir e, li gorî xuya dike armanca wan ew e ku pirsgirêkên giran ên civakî ku ev çanda daringî (madî), anku ev yekdestî dibe sedema wan, çareser bikin: heman weke ku sosyalîzma pêkhatî (sosyalîzma zanistî) dibe xwezyara çareserkirina pirsgirêkên ku çavkaniya wan kapîtalîzm e. Lê, ji ber ku zêde nikarin derbas bikin wan qalibên çax-modernîte yên derbarê zanistê û qalibên jiyanê ku bikartînin, di encam de nikarin xwe rizgar bikin ji bûyîna awayê versyoneke nû ya şaristaniya navendî; anku yan serwerekî wê yan jî hêzeke wê ya lewaz a rajêr. Ên ku pêdagirî (israr) jî dikin ku di doza xwe de radîkal bin û heya dawî durust bimînin, her çend mînakeke girîng hêştibin jî, nikarin xwe ji tesfiyebûnê rizgar bikin. Ji ber vê sedemê, ez kevneşopa Îbrahîmî didirûvînim tevgera demokrasiya sosyal a serdema me. Çawa ku demokrasiya sosyal neçûye wêdetir ji bûyîna reçeteya pansumanê ji pirsgirêkên giran ên girîng re, ku şaristaniya kapîtalîst bûye sedema wan, rolên olên Îbrahîmî jî, di pêvejoyên bêhtir gerdûnî û dirêj ên dîrokî de, nekarîne wêdetir biçin ji bûyîna hin hewldanên kirina reforman, weke çareserî ji pirsgirêkên şaristaniya navendî re, ku pirr êş didin mirov, her wisa mirov birçî û bêkar dihêlin. Di encam de ew bi xwe nekarîne xwe rizgar bikin ji bûyîna pirsgirêkan. Pêwîst e mirov xeta kevneşopa Îbrahîmî, weke bernameyeke bîrdozî û siyasî, pirr baş tehlîl bike. Ev hewldan pirr girîng e, ji bo ku mirov tevahiya sîstema cîhanê ya kapîtalîst têbigihîje. Her wisa nirxa mezin a van hewldanên çareseriyê hene, ji bo ku hem Sîstema-Cîhanê ya I.Wellersteîn bi sîstema şaristaniya navendî ya pênc hezar salî ve were girêdan û hem jî hilweşîna navxweyî ya Sosyalîzma Pêkhatî were têgihîştin.

Dema em Îslamê, ku sêyemîn versiyona girîng a kevneşopa Îbrahîmî ye, weke ol tehlîl bikin, wê cewhera di bunyeya wê de çêtir bê têgihîştin. Îslamiyet di hêla xeta bîrdozî-siyasî de têrkertir e. Dema ez li ser Hz. Mihemed diponijim, hertim hewl didim wî şîrove bikim, weke nûnerê herî mezin e nifşa dawî ya keşîşên Sûmerî, ku yekemîn têgînên mezin ên xwedayî ava kirine. Dema ku keşîşên Sûmerî, ji têgînên herî pêşketî yên mîtolojîk ên wê demê, xweda avadikin, li pey wan kevneşopên herî pêşketî yên olî û mîtolojîk ên wê demê hene. Pêwîst e baş were zanîn ku Hz. Mihemed agahiyên mîtolojîk û olî, heta yên felsefî û zanistî yên di dem û ciyê xwe de, bi awayekî sînordar be jî hezm dike. Ji teyisînên Împaratoriyên Bîzans û Sasanî, ku li ber wî du serwerên kûrewî ne, şaristaniyê jî,

bi qasî sîstemên qebîleyan, nas dike. Teşxîs kiriye ku civak pirsgirêkên giran, ên çavkaniya xwe ji herdu sîsteman digirin, dijî.

Bandora pêkhateya zordest û mêtinger a yekdestiyên desthilatî yên Bîzansî û Sasanî, ku civakê ji hev dixe û wê pêş naxe, bi qasî bandora rizîner a qebîlegeriya Ereb li ser civakê, ji nêz ve jiyaye. Têghîner e ku berê xwe dabe qutbûneke radîkal ji herdu sîsteman. Ew jî weke Îsa, bêhtir nêzî tebeqeyên jêrîn e. Diwêre koleyan û jinan nêzî xwe bihesibîne. Tevî ku dikeve bin bandora komcivakên Mûsawî û Sûmerî, ku li ber wî ne, şahîdê wê yekê ye ku nekarîne ji pirsgirêkên civaka tê de dijîn re, çareserî peyda bikin. Olên pagan (pûtên li Mekeyê) jî, dinirxîne weke kevneşopên dere-demî  ku heyama xwe ji mêj ve temam kirine. Lê, peyama'pêxemberê dawî'ya di kevneşopa Îbrahîmî de, xeylî bala wî kişandiye. Di vê rewşê de, ya zêdetirîna ku karîbûye bike, kiriye û bi vî rengî wêriyaye ku sêyemîn reform (her wisa dikare were gotîn şoreş) a mezin di kevneşopê de pêkbîne.

Helwesta Marks û Engels a li hemberî Utopyageran û helwesta Mihemed a li hemberî Mûsawiyan û Îslamiyan, heta Sabiyan (komeke dîtir a xwedî baweriya yek-xwedayî), didirûvin hev. Ew sosyalîzma rasteqîn ji sosyalîzma utopîk vedibijêrin, Mihemed jî,  kevneşopên Îbrahîmî, ku dema wan bihurî bûn, kiriye rojaneyî û bi vî rengî wan kiriye heqîqet. Bi gotineke din, şîroveya xwe ya hîn rasteqîntir a olî kiriye. Quran û hedîs di dest de ne. Bi qasî bernameyeke bîrdozî-siyasî, ji bo exlaqê nû jî bi kûranî waez didin. Rêgezên aborî jî hene, heta zagonên şer jî ji nû ve hatine rêkûpêkirin. Ez ê vê rêbazê, ku em ê karibin jê re bêjin şêwaza pêxemberî, di beşa derbarê zanistê de, hîn firehtir telîlbikim. Ji bo niha, ez tenê diyar dikim ku kevneşopeke baş e.

Dikare pirr bi hêsayî were gotin ku Îslam, ji Xirîstyaniyê û ji nêrînên resen ên Mûsawîtiyê zêdetir şaristanîperest e. Bi ser ketiye ku hîn di yekemên dehsalên derketina xwe de bibe mîrasvana tevahiya şaristaniyên kevn ên Rojhilata Navîn. Îslam bi ser ketiye ku sîsetema herî xurt a desthilatiya serwer a herêmê, di salên 650 P.Z de damezrîne. Ji ber ku ne pêdiviya mijara me ye ku em çîroka wê vebêjin, em ê bêhtir di alî pirsgirêkên civakî yên herêmê, heta yên cîhanê de (ji ber ku mizgîniya xwe  ji hemûyê rûyê erdê re dide), vekolîna xwe li ser wê berdewam bikin.

Em bawer in ku têgîna xweda ya li cem Hz. Mihemed, razberkirineke di asta herî jor a civakê de ye û derbirrana/îfadeya wê ya nasnameyî ye. Li gorî min, teolojiya Îslamê di vê mijarê de pirr tiral e û bi serneketiye ku bibe şayanî Hz. Mihemed. Ew zengînî û peresana teolojiya li ser Xirîstyaniyê, di Îslamê de hema hema hatiye cemidandin. Ez diyar dikim ku ez ê paşê li ser vê mijarê jî rawestim, loma ez ê niha wê venekim. GirÎngiya xwe hîn jî diparêze ku were têgihîştin bê ka çima Hz. Mihemed li ser xweda ewqas kûr û barkirî bi pîroziyê rawestiye. Li gorî min, Hz. Mihemed, li ser hebûna xweda, jî gotûbêjeke teorîk bêhtir, bi cewhera Wî ya civakî re mijûl bûye. Di vî milî de gelek hewldananan kiriye. Dema ayet tên, di nava xweydan û xwînê de maye  û ji xwe ve çûye; divê ev jî, ji van hewldanan bêne hesibandin. Divê em bişên ku bigirin cidiyê. Wesfandina wî ya 99 navan di derbarê xweda de ji utopyayên herî pêşketî yên civakî zêdetir utopya û bernameyek berfireh a civakî ye. Hem jî xeylî rasteqîn e û bi berpirsyarî pê re dilsoz dimîne. Lê bêbextî piştî Mihemed hem nezanî ye û  hem jî xwe avêtina bilez nava şehwetperestiya desthilatiyê ye.

Îslam weke şoreş belkî jî di vî milî de di serê wan şoreşan de  tê ku herî zêde xiyanet li wê hatiye kirin. Em li milekî bihêlin pêkanîna aso, bername û şêwaza jiyanê ya Hz. Mihemed ji alî yên ku piştî wî hatin, xelîfe jî di nava wan de, têgihîştina wan jî nekariye were bi serxistin û di pêkanînê de

xiyanet li wan hatiye kirin. Ji ber ku hewldananên Hz. Elî nekarîn bi serbikevin, em nikarin pêşbînî bikin ka wê pêkanînek çiqas têgihîner bibûya. Hewldanên şîrove û sepanên tevahiya mezheban, dûr in ji bûyîna Mihemedî. Û wan kevneşopên seltenatê (desthilatiyê) ku bi Emewiyan destpê kirin, bi gotina her çors nirxên wan nîne, ji bilî bûyîna yekdestiya desthilatiyê, xirabtir ji yên berê. Ez bawer im ku Îslamgiriya Radîkal, nexweşiyeke deshilatî ye. Em li milekî bihêlin ku Îslamê zindî bike, lê bi qasî ku qet heq nake, wê dinoqînin. Li van Îslamgirên nezan tê ku mirov ancax ji wan re bêje Îslama provokatîv. Eger ji Îslamê peyamek bê girtin, dikare ancax di bin navê û şêweya dîtir de watedar be. Ez vê mijarê jî ji bo paşê dihêlim.

Ez yekdestiya rasteqîn a desthilatî ya di bin navê Îslamê de girîng dibînim. Lê ne weke Îslam; ji ber ku di vê yekdestiya desthilatî de ti tiştek bi navê Îslamê tine ye. Li holê ti tiştek nîne, ji bilî hêmayên dewlet û desthilatiyan, ku di xeta Asûr, Pers, Roma û Bîzansê de dimeşin. Ez derbarê Îslamê de, weke deshilatî, vêya diyar dikim. Elbet weke hêmana çanda arîşî, mijarên ku tê de bibandor e, hene. Di vê wateyê de divê ez mijareke girîng diyar bikim ku ez wan binavkirinên civakan ên têkildar bi bîrdoziyê re, rast nabînim. Ji bo mînak; ji ber ku binavkirinên weke Civaka Xirîstyanî, Civaka Îslamî û Civaka Hindî, civakan dadixin nava olan, rê li ber gelek nebesî û şaşitiyan vedikin. Van têgînan perde davêjin ser têgihîştina xwezaya civakan. Heman mijar ji bo têgînên civaka kapîtalîst û civaka sosyalîst jî derbas dar  in. Ez ez bikêrhatî dibînim ku paşê vê mijarê jî vekim. Dema mirov binavkirina herî rast, weke Civaka Şaristaniya Demokratîk û Civaka Şaristaniya Yekdestîperest destnîşan bike, dibe ku bêhtir watedar be, ji ber ku vêya yekparetiya civakî dide xuyakirin.

Rojhelata Navîn, ku di navbera sedsalên 5-15.P.Z de, bi giranî desthilatyên Îslamê li ser wê serweriya xwe didin meşandin, xwedî raseriya serwer a sîstemên şaristaniya navendî ye. Desthlatiyên Îslamî, li ser wê mîrasa desthilatiyê ku ji alî Bîzans û Sasaniyan ve hate dewrkirin, zêdetir berfireh bûne û kûr bûne. Civak neçar maye ku desthilatiyan bi rengekî kûrtir bijî. Her wisa hejmarên qewm, xanedan û dewletan jî, ku desthilatî wan digirin nava xwe, zêde bûne. Bi vê ve girêdayî, di lezayiya şerên desthilatî de kêmbûn çênebûye, lê zêdebûn berdewam kiriye. Giraniya rastîn, di yekdestiya leşkerî de bûye. Di yekdestiya bazirganî de jî pêşketin hatine bidestxistin. Îslam, bi giranî, bîrdoziyeke yekdestiya leşkerî û bazirganî ye. Bajar mezin bûne. Pêşketin di çandinî û sanayî de pirr zêde sînordar in. Her wisa pêşketinên di huner de jî sînordar in. Nikare were gotin ku Grekiyan jî derbas kirine.

Serdema Îslamî ya desthilatî û dewletan, serdema dawî ya Rojhilata Navîn a desthilatiya serwer e. Wê navenda serwer a şaristaniya navendî,  li gel qedîna sedsala 15. P.Z, bi rêya Venedîkê, bişemite Amsterdam û Londonê, anku Ewrûpayê. Rojhilata Navîn ji tevahiya serdema neolîtîkê re (10.000 -7.000 B. Z.) û ji serdema çar hezar û pêncsed salî (3000 B. Z.-1500 P. Z.) ya şaristaniya navendî re navendîtî kiriye. Piştî vê dîrokê, di bin pirsgirêkên dêwane de ku şaristanî bûye sedama wan, perritiye, kor bûye, ji xwe nûkirinê westiyaye û hema hema veguheriye bo kavil (enqaz) ên civakan.

Dema em rola kevneşopa Îbrahîmî ya di sîstema şaristaniya navendî de, di alî pirsgirêkan de jî binirxînin, em ê bibînin ku, ya yekemîn ew e ku desthilatiyê sînordar nekiriye, lê berevajî, wê bêhtir zêde kiriye. Dewlet di hêla hejmar û mezinahî de zêde bûye. Lewre, pirsgirêkên ku çavkaniya xwe ji yekdestiya desthilatî û dewletê digirin, qat bi qat zêde bûne. Bi vê ve girêdayî, şer bi zêdeyî dewam kirine ku bibin navgînên damezrandina yekdestiyê. Nasdarî bi têgînên demokrasî û komarê re çênebûye. Bi giranî serweryên mîna xanedaniya kevneşopî, bi rêya pirrbûnê, berdewam kirine.

A duyemîn ew e ku giraniya civakê li beramberî dewlet û destilatiyê kêm bûye. Exlaqê û polîtîkaya civakî, bêserûbin teng bûne. Mezheb, li hemberî vê tengbûne, bêhtir bertek in. Serweriya zilam a li ser jinan û zarokan hîn bêhtir zêde bûye û dewam kiriye. Tevî ku koletiya bi awayê herî kevn a Fîrewnî hatiye derbaskirin, şêweyên nû yên koletiyê (bi taybetî yên berhevkirî) ji Efrîkayiyan û Slavên li bakûr) ji lezayiya xwe ti tiştek wenda nekiriye.

Her çend bajar û bazirginîbûn pêşketibin jî, pirr li pey heybetên xwe yên kevn mane. Qet nekariye  were gihandin asta jiyana bajêrî û bazirganî ya Greko-Romen. Wekî din zêde tevkarî nehatiye kirin li çandinî û sanayiyê.

Weke sêyemîn, belkî jî bandora wê ya herî neyînî, ew pirsgirêk in ku, dema bi serdestbûyîna netewperestiya qebileyî û qewmî ya di kevneşopa Îbrahîmî  de, hatin jiyîn û gihîştin rehenda nîjadakujiyê.

Bêjeya ‘bende û qewmên bijarte yên xweda’, koka vê netewperestiyê ye. Pêşî, Îbranî weke ‘qewmê bijarte yê xweda’, hatine hesibanadin; paşê, Ereb, navnasê ‘qewmê necîb’ji xwe re şayan dîtine. Binemalên tirk, di bin cengaweriya Îslamê de, gaveke din pêş ve çûne û Îslamiyetê jî xwe re kirine nasnmeyekê bikok. Asûrî, weke yekemîn qewmê ku Îsawîtiyê pesend kirine, xwe homandin; pişt re Grek û Ermenî di alî hatina hesibandina yekemîn qwmên pîroz de xwe nedane paş. Rola belavbûna Xirîstyaniyê li Ewrûpa ya di peşketina netewperestiyê de girîng e. Dikare were gotin ku ji ekumenî (gerdûnîtî) yê bêhtir, netewperestiyê bilez kiriye. Netewperestiya Rûs jî di wateyek de berhema Xirîstyaniya Ortodoks e.

Kevneşopa Îbrahîmî, bi vê bandora xwe ya li ser qewmiyetgeriyê, bi taybetî li ser qewmên kevnare yên Rojhelata Navîn, ne tenê pirsgirêkan, lê felaketên trajîk jî barandiye. Xirîstyanên Asûrî, Ermenî, Pontûsî û İyonî, ku ji qewmên herî kevnare ne, ji alî desthilatdarên Ereb, Tirk û Kurd ve, ku bûne Îslamî, hatine anîn hema hema ber şêmûga tesfiyeya civakî. Rola Cihûtiyê jî, ya di vê de, nikare were piçûkdîtin. Tesfiyebûna Asûriyan, İyoniyan, Pontûsiyan, Êzîdiyan û gel û çand ên dirûv, ku ne Misiliman in, bûye sedem ku Rojhelata Navîn bi gîştî û Anatolya jî bi taybetî, bibin çola çandî. Ev herêm, ku bêpar ma ji gelên ku çandên herî kevnare di xwe de werdigirin, neçarî paşketineke mezin bûye. Ev, ji bo hemû gelên Rojhelata Navîn wendabûneke trajîk e. Ne tenê pirsgirêka civakî giran kiriye, lê hêza wan a çareseriyê jî di rêjeya mezin de lewaz kiriye. Mayîna bêpar  ji van gelan û çandan, ku ji gelek huner û zanistan re pêşengî kirine,  tê wateya wendabûna hafize û tîwanîsta hunerî û zanistî ya civaka herêmê.

Trajediyên dirûv, di bin bandora Xirîstyaniyê de, li ser Çermsoran, Aztekan û Înkayan li Emerîka, her wisa li ser cihnişînên Awustralya û Eskîmoyan jî hatine jiyîn. Rejîmên ku bi desthilatiyê ve hatibin şerbetkirin û şehewîkirin, tevî ku ew ol bin jî, ti xirabî nîne ku nekin, her wisa ti pirsgirêk û trajêdî nîne ku rê li ber wan venekin. Divê ez dubare diyar bikim ku aso, bername û

jiyan a pratîkî ya kevneşopa olî ya Îbrahîmî, ku di bin bandora giran a çanda daringî (madî) ya şaristaniya navendî de ye, ji wê yekê pêk tê ku, bêhtir ji derbaskirina vê şaristaniyê, wê hinekî din nerm bike û bike dadwer. Anku, reforma girtina para xwe ji nirxa-bermayî ye û mafê tevlîbûna nava yekdestiyê ye. Dema ku ew ji bo vê yekê bîrdozî pêşkêş dikirin û bi vî rengî ji bo desthilatiyê qada rewatiyê bidest dixistin, ji desthilatdaran jî para xwe dixwestin. Dema nedikarîn wê bigirtana, diketin nava berxwedanê, lê dema para xwe digirtin, xwe kerr dikirin. em ê heman çîrokê di sosyalîzma Ewrûpa de jî bixwînin. Ji xwe em ê bibînin ku herdu jî dewama hevdu ne. Bê gûman di berdewamkirin û gerdûnîbûna şaristaniya kevnare de rola wan a mezin, lewre cî û dema wan jî hebûye. Lê ev rol, pirsgirêka kevnare ya civakê, ya mêtingerî û zordestî kêm nekiriye, berevajî, hîn bêhtir wê zêde kiriye û wê kiriye berdewamî.

**c-** Heyama dawî ya giranbûna di pirsgirêka civakî de, qonaxa desthilatiya serwerî ya şaristaniya bi navenda Ewrûpa ye, ku hiltê. Hatiye kirin awayekî rêbazê ku were gotin 'Kapîtalîst' ji şaristaniya Ewrûpa re, ku ji salên 1500 P.Z. û pê ve di asta cîhanî de dest bi hilhatinê dike. Wekî din, hatiye îdeakirin ku yekta ye û dirûvê wê nîne. Her wisa bi girîngî tê diyarkirin ku gelek bêhempayiyan (dewlet-netew, sanayî, înformatîk) jî dijî. Îdeayên navendperest ên zanista civakî ya Ewrûpa, ji ber sedema serweriya rewşenbîrî, weke rastiyên pozîtîv (êrênî) têne pêşkêşkirin. Van rastiyên pozîtîv, ku tê xwestin bêne pejrandin weke rastiyên misogertir ji dogmayên olî, di rastî de dogmayên modernîteya nû ne.

Bê gûman, nikare were înkarkirin ku şaristaniya Ewrûpa pêkhateyek veguherandî ya şaristaniya navendî ye û ku cewaziya wê heye. Lê, şaristaniya navendî bi dirêjiya dîrokê pêş ketiye û gelek cî û dem nas kiriye. Heman şêwe herdem nehatine dubarekirin. Cewazîtiyên wan herdem çêbûne. Ji xwe li gorî pêdiviya herikîna gerdûnî, divê wisa pêş bikeve. Û îdeaya 'bêhempatî'pirole ye, lê taybetmendiyên bingehîn ên şaristaniya navendî, ku ji serî heta dawî mora xwe lê dane û karakterê wê destnîşan kirine, bi dirêjiya dîrokê di cewher de neguherîne. Dibe ku di rêje û teknîkê de cewazî hebin, lê di cewher de neguherîne. Her wisa dibe ku rêxistiniya wê, berdariya wê, bîrdoziya wê û rêveberiya wê şêweyên cûrbecûr bigirin. Lê taybetmendiya wê ku xwe di bin van hemû cewaziyan û şêweyan de dide berdewamkirin, serweriya yekdestî  ya li ser NIRXA-BERMAYÎ ye. Dibe ku naveroka yekdestiyê biguhere, lê ew bi xwe naguhere. Sêmendiya keşîş+leşker+ rêveber herdem heye. Dibe ku giraniya wan li gorî dem û cî biguhere. Lê divê yekdestî, van beşan bi berdewamî raçav bike. Her wisa dibe ku rêbazên bidestxistina berhem yan jî nirxên- bermayî jî cewaz bin, lê ew bi xwe naguhere. Nirxa-bermayî, bi saya yan zêdebûna berdariya di çandinî û sanayî de, yan bazirganî, yan jî dagiriya leşkerî tê berhevkirin. Dibe ku hinek ji van rêyan giranî wergirin. Lê dîsa jî, danehev encama yekûna van rêbazan e.

Divê em gelek bayex pê bidin ku yekdestiyê têbigihîjin. Ew ne tenê sermaye û desthilatî ye. Her wisa, ne tenê di qadên bazirganî, leşkerî û rêvebirî de çêdibe. Lê derbirrana/îfadeya yekbûyî ya van hemû nirx û qadan e. Di rastî de yekdestî, tew aborî jî nîne. Lê hêz û şîrket e ku li ser qada aborî, bi rêya zorê, teknîkê û rêxistingeriyên di destê xwe de, xespê pêk tîne. Lê, ne ew şîrket e ku em dizanin. Di tehlîla dawî de hevpariya berhevî ya sermaye ye. Carna xwe weke emraza desthilatî ya nedewletbûyî û carna jî xwe weke dewletê derdixe pêşberî me. Di roja me ya îro de navê 'hevpariya (şîrketa) aborî'pirr bikar tîne. Weke min qal kir, hîn rasttir e ku mirov, ji bûyîna aborî bêhtir, jê re bêje 'hevpariya xespa aboriyê'. Her wisa dibe ku xwe carna weke artêş û li gelek deran weke yekîneya bazirganan û yekdestiya sanayî biteyisîne. Dibe ku gelek şaxên yekdestiyê, weke heştpî

(extapot), hebin. Dibe ku carna, weke bandora yekbûyî ya gelek hêz û potansiyelên cewaz, derkeve holê. Di hemûyan de, ya girîng ew e ku nirxa- bermayî ya civakî, weke sermaye, di destên wan de kom bibe. Rastiya wê ya bingehîn ev e, ku ev pênc hezar sal in naguhere, bi awayekî bêqutbûn didome û bi rengê kumulatîv (lodane) mezin dibe. Sedema ku di cî û demên cewaz de hemberî-serwerî, nizmbûn-bilindbûn û navend-derdorê çêdike, ji bo ku vê rastiya neguherbar bê domandin û bi awayê xelekên zincîrane, bê qutbûn were meşandin.

Divê haya mirov jê hebe ku peyvên ‘kapîtalîzm’û ‘sîstema kapîtalîst’weke têgînên bi armanca propagandayê têne bikaranîn. Mirov dikare, beranberiyên diyar ên van têgînan wek naverok destnîşan bike. Lê, eger bêne şîrovekirin weke sîstematîka diyarde, bûyer û pêwendiyên ku heqîqetê tam derdibirrrin, têgînên wisa ne ku rêjeya wan a şewşandina xwezaya civakî û pirsgirêkên wê bilind e. Lê, herikîna jiyana civakî cewaz e. Ji rehendên pirsgirêkên ku dijî jî gelek zelal tê têgihîştin ku ziman û zanisteke nû jê re pêwîst dike.

Eger tê îdeakirin ku kapîtalîzm sîstemeke daneheva sermaye ye, lê hatiye hatiye îspatkirin ku yekemîn pêkhatinên berfireh ên vê yekê di dewletên bajar ên Sumer de hatine bidestxistin. Bi rengekî hoveber (kovî ) be jî, hevpariyên wan ên sermaye, pereyên wan, embarên (depoyên) wan, rêxistina wan, û rêveberiya wan hene û vana bingehên van dewletçeyên bajêr in. Bajêr, belkî jî, yekemîn hevparî, anku yekdestiya sermaye bi xwe ye. Koleyên karker û rêveberên keşîş, tevlî artêşa xwe ya bazirganî, leşkerî, zanistî û hunerî ve, hîn di wê demê de çînên bingehîn ên civakî ne. Perestgeh (Zîgûrat) di heman demê de navenda karxane (fabrîka), koleyên karker, sitirîn (hewîn), fermandarê rêveber-leşkerî û rêveberiya keşîş, bû. Qata herî jorîn jî elbet ciyê raçavî û kontrola xwedayan bû. Hemû di nava hev de û bi awayekî biheybet hatibûn rêkûpêkkirin. Ez vê mînakê pirr xweşik (nûwaze) dibînim. Ez wê dinirxînim weke ‘malzaroka’şaristaniya me ku bi hemû pêkhateya xwe ya dewlet, çîn û bajêr şêwe girtiye. Çîroka pênc hezar salî ya şaristaniya navendî, ne tiştekî din e, ji bilî vê rastiya wê ya perestgehê, ku li dem û cî vebûye û belav bûye.

Ez bawer nakim ku mirov karibe ji vê rêxistingeriyê temamtir û resentir yekdestî, dam û dezgeh û hevparî yên kapîtalîst biafirîne. Çawa ku çavkaniya sereke ya tevahiya şanikan (hucreyan), şanikên sereke ne; şanika sereke ya tevahiya pêkhate (ya rêveberî, leşkerî, aborî, bazirganî, zanistî û hunerî) yên yekdestiyê jî vê rastiya perestgehê ye. Hemû kolanên arkeolojîk vê rastiyê piştrast dikin. Bilind e şîmaneya (îhtîmala ) ku wan nimûneyên kevirên çikilandî yên Gobeklîtepe ya Rihayê (10000- 8000 B.Z.), ku herî dawî hatine vedîtin (keşfkirin) û weke ‘supernova’(super- pirr nû) ya dîrokê jî têne binavkirin, bi qasî ku heya niha hatine naskirin, perestgeh (a komcivakên nêçîrvan û komkerên berî neolîtîkê) a herî kevn bin. Nêrînên arkeologên naskirî bi vî rengî ne. Bi her yek nimûneya xwe hema hema di her vekolanê de xwe bi rengekî dipdiyar piştrast dike ku yekemîn danehevên sermaye yên berî dîrokê bi vî awayî destpê kirine.

Nikare were înkarkirin ku ‘kapîtal’a bi navenda Ewrûpa, awayê herî dawî û lûtkeyî ya yekdestiyê dinimîne. Her wisa, eşkere ye ku ji şêwaza danehev û hilberînê heya pêkhateya rêxistinî û rêvebiriyê û ji rêxistina leşkerî heya yekdestiya huner, teknîk û zanistê cewaziyan pêk aniye. Lê, îdeaya ku ‘bêhempa’ ye, nitraneke mezin e. Ya eşkere ew e ku ev propagandaya bi navenda Ewrûpa ye, bi gotineke din, îdeayên keşîşên çîna nû yên bi dilqên nûjen ên perestgeha Ewrûpa ne (artêşa zanîngehan û zanist û hunera akademîk). Mirov dikare pirr bi hêsanî destnîşan bike ku vana ji dêra Xirîstyaniyê zêdetir xizmeta rewatiyê ji ‘sîstema nû ya kapîtalîst’re dikin.

Ne mijara me ye ku em dîroka hilatina şaristaniya Ewrûpa ya li ser bingeha 'sîstema kapîtalîst', binivîsînin. Lê, ji mijarên herî baş tên zanîn ên dîroka nêzîk in ku ev şaristanî li ser şopa şêwaza teolojîk, bazirganî, zanistî, teknîk û rêveberiya Xirîstyaniya sedsalên 5. û 6. P.Z. û ya Îslama sedsalên 9. û 10. (bi taybetî bi rêya nîvgiravên Îberî, Îtalî û Balkanî) hilhatiye. Hemû dîroknas hemraman in ku şemitînek di navenda şarîstaniya serwer de 'ji salên 1250 û pê ve hate jiyîn; navendên şarîstaniyê ku li Rojhelat daketine, li Ewrûpa dest bi hilhatinê kirine. Wekî din, ji vê sedsalê (sedsala 13.) re her wisa tê gotin Sedsala Şoreşa Bazirganî. Vana rastiyên dîrokî ne ku baş têne zanîn ku, bi taybetî di bin pêşengiya Venedîkî, Cenovayî û Floransayiyan de, ji sedsala 11. heya dawiyên sedsala 15. ji Rojhelat, bi hemû giraniyên wê, ne tenê mal hatine guhastin; her wisa hemû keveşopên bi hezaran salan ên şaristanî; raman û teknîk; şêwaz û rêbaz; bi kûrtasî tevahiya nirxên civakê yên bikêrhatî hatine guhastin. Eşkere ye ku nevenda şaristaniyê li ser vê bingehê hatiye veguhastin. Her wisa vana jî rastiyên dîrokî ne, ku nikarin bên înkarkirin ku şaristaniya Xirîstyaniyê, heta ya Greko-Romen û ji vê wêdetir Şoreşa Neolîtîk (5000-4000 B.Z.), ji Rojhilat hatine guhastin bo Ewrûpa. Weke kes, baweriya min di wê rasterê de ye ku nîv-girava Ewrûpa, ji wan çandên guhastî yên civakî yên panzdeh hezar salî, yên ji parzemîna Asya û bi taybetî yên ji Asyaya Rojhilata nêzîk, senteza herî biheybet a pêncsed salên dawî çêkiriye. Şîroveya min a li ser dîrokê, bi yek hevokek, ev e!

Derdê min ne ew e ku ez ne Rojhilatgerî û ne jî Rojavageriyê bikim. Endîşeya min, armanca min û hewldana min ew e e ku ez yekparetiya civaka-dîrokî, bênavberiya wê û cewaziyên wê yên dombariyê di nava yekîtiyê de di şîroveyeke rast de derbas bikim.

Bê gûman, ên hatinê guhastin, ne tênê rêbaz û pêkhateyên bingehîn ên şaristaniya nevendî ne. Her wisa pirsgirêkên civakê jî bi carî (mîslî) hatine guhastin. Bi vegotineke pirr kurt hatibû kirin qala yên ku ji alî Xirîstyaniyê ve hatine guhastin. Nirxên şaristaniya daringî (bazirganî, hilberîn, pere û dewlet) yên Rojhilat, herî kêm bi qasî nirxên wê yên arişî (Xirîstyanî, zanist) bipirsgirêk bûn. Ewrûpa di wateyek de li pirsgirêkan jî hatibi xiniqandin. Mirov dikare texmîn bike wan erdhejên ku guhesîna xwezaya civakî ya Rojhilat, a binakok û jêtêgihîştina wê zor, bo civaka çandiniya neolîtîk a Ewrûpa ku hîn zêde xira nebûbû û ciwan mabû, bibe sedem. Elbet rûxanên vêya ku li Ewrûpa bibûna sedem, ku hatibû girtin bi bêamadekarî (xebatên pêş-amadekarî yên Xirîstyaniyê têrê nedikirin) li vê hemberiya rahêştina yekdestiyê, ku bûye sedem ku Rojhilat bi dirêjiya bi hezaran salan li ser şer bike, wê zêdetir fecî û rûxîner bibûna. Pevçûnên navxweyî yên sîstemê, ku ji sedala 16. û pê ve pêt girtin, şopên mîrasa bi hezaran salan a Rojhilat di xwe de werdigirin. Pevçûnên ku ji Roma û vir ve jî têne jiyîn şopên heman çandê di xwe de werdigirin. Ez dikarim bênitran diyar bikim ku ne tenê nirxên erênî yên daringî (madî) û arişî (manewî) yên şaristaniya nevendî hatin guhastin bo Ewrûpa; di heman demê de nakokî, pirsgirêk, pevçûn û şer ên giran jî hatin guhastin. Heta şopên nijadkujiyên trajîk jî, di kevneşopiya şaristaniya Rojhilat de bi zêdeyî hene. Qralên Asûrî pesnê xwe didan bi çêkirina qele û bedenan ji qaqotên mirovan. Hemû zordar (despot) ên Rojhilatî bi pesn û fortan qal dikin bê ka çiqas civakên qebîleyan, gundan û bajaran tine kirine û mirovên wan weke dîl bi xwe re birine. Hem jî qala vêya dikin weke 'çîrokên qehremaniyê'!

Zanyarên civakî yên Ewrûpî, tewş neketine pey şopa Rojhilat. Ez van hewldanên wan hêja dibînim. Lê, Rojhilatnasiya (Oryantalîzm) di dest de pirr dûr e ji vegotina rastiyê. Lê dîsa jî, divê ez diyar bikim ku, li gori mejiyên Rojhilatiyan ku hişkobiringo bûne, em deyndarê wan ê malavayiyê (spasî) ne. Tevî ku van hewldanên wan niyetên pêş-mêtinger di xwe de wergirin jî, wê derbirraneke

rasttir be ku mirov diyar bike ku armanca wan a rastîn ne ev e, lê têgihîştina çîroka şaristaniya Ewrûpa ye. Ji ber ku rêya têgihîştina Ewrûpa bi nakokî, pirsgirêk û şerên wê,di tehlîlkirina bi taybetî Rojhilata Nêzîk re derbas dibe. Armanceke dîtir jî ya vê hewldana min, divê bê têgihîştin weke pêşkêşkirina tevkariyek zelane (mutewazî) di vê mijarê de, anku di mijara rê û rêbaz de.

Gelek mirovên Rojhilatî wer dizanin ku Ewrûpî, mirovên bixwebawer û pirr jîr in. Lê dema rastî wan têm, ez her yek Ewrûpî, bi qasî ku nikaribin di çanda Rojhilat de bijîn, pirr naşîn, nazenîn (narîn), dilsaf û nerapêçayî dihesibînim!

Ez di wê baweriyê de me ku bandoreke mezin a kevneşopa civaka neolîtîk a Ewrûpa li ser şaristanîbûna wê ya piştî sedsala 16. çêbûye. Mirovê kevneşopî ye Ewrûpî, heya sedsala 16., wan şoreşên bajêr ên piştî sedsala 10. jî tê de, Xirîstyaniyê pesend kir; lê tavilê şîroveya xwe ya teolojîk jî pêş xist. Wê vêya wê/wî bibira Ronesans, Reform û Ronakbîriyê, anku şoreşa zanistî û felsefeyê. Rojhilat, li beramberî belavbûna Îslam, weke kevneşopa dawî ya şaritaniya Rojhilata Nêzîk, nekarî pêşketinek dirûvê civaka neolîtîk nîşan bida. Bê gûman gelek şîroveger û mirovên zanist û hûnerê yên bi eslê xwe Tirk, Fars û Kurd, gihîştin. Ronesansek (sedsalên 8.-12. P.Z.) hate jiyîn. Lê, zordestiya (despotîzma) kevneşopî ya Rojhilat, bi pêkhateya xwe ya hişkobiringo, wê dereng nemana ku birserketa xwe li tevahiya çavîkên civakê zal (hakîm) bikira. Yek ji sedemên pirr girîng jî, yên pevçûnên navxweyî yên Îslamê, ev bû. Elbet sedema rastîn, ew bû ku yekdestî bihata rahêştin. Wekî din, kevneşopa Rojhilat a civaka neolîtîk, di bin zextên zordarî (despotîk) yên yekdestiyê de bi dirêjiya nêzîkî pênchezar salan, pirr westiyayî, ji pertavketî (jihalketî), nezan û bêçare hatibû hêştin. Li beramberî vê, kevneşopa neolîtîka Ewrûpa zindî, azad û bêhtir afîrîner bû. Ji ber ku zordestiyeke(despotîzmeke) pênc hezar salî, weke Rojhilatiyan, li ser wan nehatibû sepandin. Wekî din, weke qala wê hate kirin, birserketîbû ku aliyên erênî yên ezmûna mezin a Rojhilat bigirta. Van herdu mijarên bingehîn, di girîngiya kilît de ne, ji bo ku mirov hilatina dîrokî ya Ewrûpa têbigihîje.

Van ravekirinan bi têra xwe ronî dikin ku wan tehlîlên 'sîstema-cîhanê ya kapîtalîst,' ên I. Wallerstein û komên zanista civakî yên nêzîkî wî, ku ji sedsala 16. û pê ve hatin destpêkirin, xebatên qutbûyî ne ji bingeha dîrokî û ji rastiya bûyîna sermaye/kapîtal nûvedan(îcad)eke pirr kevn; herî kêm di vî milî de kêmasiyên mezin di xwe de werdigirin. Ji xwe, şêwaza ravekirina daneheva sermayeya kapîtalîst jî, ku di sêgoşeyâ Venedîk, Amsterdam û Londonê de kom bû, dîsa heman kemasiyan di xwe de werdigire. Eger zextên Qarlosê V. û kurê wî Felîpe yê Î., ên bi dirêjiya sedsala 16. li ser Îtalya, Holanda (Welatên Jêrîn) û girava Îngilîstanê nebûna, gelo dikarîbû gengaz bibûya ku pere û sermaye di wê kûraniyê de hatiba razandin bo hilberîna manîfakturel û çandîniyê? Ma Amsterdama Holanda (Welatên Jêrîn), ku pêşketinê û serhildana netêwî, yên ku Îtalya nekarî wan di kesayetiya Venedîk de bi ser bixe, da destpêkirin, û Londona Îngilîstanê, ku wan gihand serkeftinê, van serkeftinên xwe, li hemberî ya hundirîn bi xwe, bidest nexistibûn? Bersivên ku ji van herdu pirsan re bêne dayîn, wê gotina Fernand Braudel piştrast bikin: " Desthilatî û dewlet ên kûr bibin û kirpanê wergirin, kapîtalîzmê(sermayeyê) avzê dikin." Baweriya min, hîn wêdetir e; anku di wê rasterê de ye ku desthilatî û dewlet yekdestî û sermaye bi xwe ne. Ji xwe, eger vana yekdestiya sermaye nebûna, wê gengaz nebûya ku sermayeyê avzê bikirana. Eger em bi dirûvandinek derbibirrin; çawa ku mirov nikare ji nêriyan şîr bidoşe, ji emrazên dewlet û desthilatî jî, ku yekdestî nebîn, nikare sermaye were dotin.

Hem zordestiya derveyîn a desthilatî û dewletê û hem berxwedana hundirin a dewletê, pêkar (faktor)ên rasteqîn in ku rastiya Holand û Îngilîstanê afirandine Împaratoriya bi navenda Îspanya, ji ber xeteriya ku wê bihata serê wê baş dît, loma, destpêkê, piştî ku pêngavên bajarên Îtalî çewisand (wê Mîr/Prensê Machiavellî nikaribe li hember derketinê bi ser bixe), bi hemû hêza xwe berê xwe da eyaleta Holanda û pêkhateya nû ya yekdestîgir-a netewparêz a li girava Îngilîstanê. Eger nekaribûya bi serketa, wê hilweşiyaba û çûba. Berxwedana Holanda û Îngilîstan berfireh e û demdirêj e. Berxwedanek mezintirîn ji gelek eniyan ve, di aliyên dîplomasî, aborî, leşkerî, bazirganî, zanistî û felsefî, heta olî (tevgera Protestaniyê) hatiye pêşxistin. Pirr baş tê zanîn ku di encame vê berxwedana stratejîk de, ku hate meşandin bi awayekî pirr berfireh, em ji rêxistingeriyên leşkerî, teknolojî, stratejî û taktîkî bigirin heya şîroveya herî radîkal a Xirîstyanî ya Protestanî (Kalvînîzm û Anglîkanîzm); heya rêxistinkirin û rapêçana teknîkî ya aboriya ku berdariya herî zêde pêk bîne; heya xebatên dîplomatîk bi qasî hizirîna çêkirina peymanek bi Osmaniyan re: her wisa heya kişandina cem xwe Dewleta Prûsya ya Almanya, ne tenê serkeftinê pê da qezenckirin, lê di heman demê de hêşt ku navendên nû yên serwerî yên şaristaniyê, bibin Amsterdam û London.

Tê zanîn ku di vê navberê de xebatên sermayeyê pirr zêde bûn; pere-sermaye di dîrokê de yekemîn car e ku dest bi leyîstina rola sereke kirin (tê zanîn ku bandora pirrbûna zêr û zîv, wisa kir ku pere di asta cîhanî de bibe hêza komûta); gelek malbatên xwedî pere (bi taybetî hêja ye ku mirov navên ên ku koka wan Cihû ye bide), bi rêya deyndarkirina dewletan, sermayeyên mezin kom kirin; pêşketinên bi vî rengî rola destnîşankar leyistin di xwe rêxistinkirina burjuwazî de, weke çîn. Her wisa, nikare were paşçavkirin ku tebeqeyeke nû ya civakî, wek cûreyek çîna karker, di ve pêvajoya berxwedana mezin a netewî de çêbû. Ez nabêjim ku vê pêvajoyê bi tevahî ew çêkir, lê girîngiya tevkariya wê, nikare were înkarkirin. Dîsa nikare were înkarkirin ku ew rastiya ku tegîna aborî rê li ber avabûna Kumpanya (yekdesteyên dewletê, dewlet bi xwe) yên bi navûdeng ên Hîdna Rojhilat û Rojava vekir, ji nava agirê van pêşketinan za. Ez naxwazim vê nîqaşê bikim: gelo kîjan ji vana pêşikî ye: bingeha aborî (binesazî), yan pêkhateyên leşkerî û siyasî (seresazî)? Ez bawer nakim ku vêya nîqaşeke watedar be. Ramanên ekonomî-polîtîk ên burjuwa (Kapîtala Marks jî tê de), ku bêhna propagandayê ji wan tê, ji raverkirina rastiyê bêhtir, perde davêjin ser wê. Ji mêj ve dema wê hatiye ku êdî mirov nebe aletê vê yekê!

Eşkere ye ku pêngava sedsala 16. di dîroka şaristaniyê de sîstemî û serwerî ye. Dîsa, eşkere ye ku navend, di ser bajarê Venedîk re (hemû bajarên Îtalî, her wisa Lîzbon û Anvers jî tê de) şemitiye Amsterdam û Londonê û yekemîn modêlên dewlet-netew di bin pêşengiya Îngilîstan û Holanda de hatine pêşxistin. Ev, bê nîqaş e: şaristaniya ku hilhat, ji hemûyên berya xwe cawaztir e û veguheraneke mezin di xwe de werdigire. Lê eger em tevahiya van pêşketinan ji meşa pênchezar salî ya şaristaniya navendî qut bikin, ji bo mînak eger, em Akadiyan ji Sumeriyan, Asûrî û Babîliyan ji Akadiyan; Med û Persan ji Asûriyan; Misirî, Hûrî û Hîtîtiyan ji şaristaniya Mezopotamya; her wisa şaristaniya Greko-Romen ji van pêşketinên yekûn û olên Îbrahîmî jî ji van hemûyan qut bikin, wê demê, gelo em dikarin qala şaristaniya Ewrûpa bikin? Tenê eger ew guhastina ku bajarên Îtalî jê re pêşengî kirin (1000-1300 P.Z.), nebûya û ev guhastin ji Îtalya heya qeraxên Ewrûpaya Rojava berdewam nekira (1300-1600 P.Z), gelo wan mucîzeyên Amsterdam û London dîkarîbûn pêk bihatana?

Vegotinên li ser civaka-dîrokî, her wisa analîz û teoriyên li ser zanista civakî, eger yekpareyî û domdariya sîstema şaristanî ya cîhanê tênegihîjin, nikarin xwe rizgar bikin ji wergirtina para

mezin a şaşîtî û kêmasiyan. Dema ku tew ji bo xwezaya yekemîn jî, vegotinên yekparegir ên dîrokî pêwîst dikin, di girîngiya rêbazane ya jêveneger de ye ku Xwezaya Civakî ku bi awayê xelekên sereke yên zincîrane ketiye nava hev, ji alî dîrokî, felsefî û zanistî ve, di nava yekpaneyiyeke pirr tundtir de were tehlîlkirin. Serweriya zanista civakî ya Ewrûpa, bi rêya înkarkirina vê rastiyê demek dirêj bi metafîzîka sext a pozîtîvîst, belkî ji serweriya şaristaniyê re xizmet kiriye. Lê di zanista civakî de jî rê li ber geremolê vekiriye. Tehlîlên ‘Kapîtal’ bi mezintirîn awayî berpirsyar in ji vê yekê. Ji ber girseya pirsgirêkên heyî, nikare bê înkarkirin ku beşeke mezin ên [di ‘Kapîtal de] têne vegotin, wêdetir ji ravekirina kapîtalê (sermayeyê) tevlî sîstema wê ve, ji perdekirina wê re xizmet dike!

Hemramanî heye di mijara ku yekdestiyên şaristaniyê, ku ji xwe bi dirêjiya dîrokê bi serwerî, bi alozî û bi navendî bi rê ve çûn, di pêvajoya Ewrûpa de, weke navend li Venedîkê di sedsala 15. de, li Amsterdama Holandayê di sedsalên 16. û 17. de, û bi giranî li Londona Îngilîstanê bi dirêjiya sedsalên 18. û 19, ketine nava aloziyê. Wan şerên ji bo rahêştina serweriyê (xeyala bûyîna Romaya nû), ku yekdestiya şaristaniya Frensî, bi dirêjiya sedsalên 15. û 18. li hemberî Îspanya Holanda û Îngilîstanê da meşandin, bi serneketîbûnê bi dawî bûn. Pêngava şaristaniyane ya ku ji alî Almanya ve di dawiyên sedsala 19. de hat pêşxistin, di 1945 de bi têkçûneke tam, ketiye nava kabûsê. Tê çavdêrîkirin ku sedsala 20. bûyê şahîde hilhatina DYE, piştî 1945 raseriya xwe zexm kiriye û di roja me ya îro de (piştî salên 2000) dest bi qirçînê kiriye. Ceribandina serwerî ya Rûsyaya Sowyet a di navbera salên 1945-1990 de zêde bi ser neketiye. Îdeaya bûyina navenda nû ya serwerî, ku di derbarê Çînê de ji bo dema pêş qala wê tê kirin, ji bo niha spekulatîv e. Dibe ku pêşvajoyên serweriyek pir-navendî, weke di dîrokê de jî mînaka wê pirrî caran tê dîtin, dema pêşiya me destnîşan bike. Dibe ku DYE, YE, Federasyona Rûsya, Çîn û Japonya bibin navendên bi îdea. Lê dikare bi hêsanî were diyarkirin ku ji bo niha, DYE hêza super a serwer e.

Bi taybetî min bi kurtî qala şîroveyên Antony Giddens, zanyarê civakî yê Îngilîs, kiribû, yên bêhempatiya derbarê modernîte (her wisa dikare bê gotin şaristanî) ya Ewrûpa de. Her çand min di bin sernivîsên pirsgirêkan de bi rêzê qal kiribe jî, divê ez di bin nêrîna tomerî de diyar bikim ku ev îdea pirr zêdetir bi navenda Ewrûpa ye û ji dîrokê qut e. Nirxandinên Giddens, ku pêwîst e em wan weke şîroveyên li ser modernîteya kapîtalîst diyar bikin, kapîtalîzmê sîstemeke Ewrûpayî û sanayiyê pirr zêdetir şoreşeke Ewrûpî dihesibînin; her wisa dewlet-netewê, weke sêyemîn lingê sîstemê, bi awayê pergal û ceribandineke nipînû pêşkêş dikin. Dubare be jî, divê ez diyar bikim ku kapîtalîzm di hemû şaristaniyan de hatiye çavdêrîkirin. Di her şaristanîde kêm-zêde pêşketinên sanayîgerî û şoreş hene. Lê mirov dikare dewlet-netewê, weke awayê dewletên xanedanî û qewmî di civaka-netew de diyar bike û pênase bike. Ji bo ku mirov Xwezaya Civakî têbigihîje, bi şertê ku mirov pirr nenitrîne, dibe ku bikaranînên watedartir ên vê kategoriyê çêbibin.

Pirsgirêkên civakî yên şaristaniya Ewrûpa, hîn rasttir qonaxa wê ya şaristaniyê, ku xwe bi awayê nakokî, pevçûn û şeran, heta komkujiyan, ên mezin didin teyisandin, weke di hemû qadên din ên pêşketinê de, gihîştine lûtkeyê. Rehendên dêwane yên pirsgirêkên heşmendî, birdozî, siyasî, aborî, leşkerî, demografî, zayendperestî, netewperestî, olperestî û ekolojî, mijarên bingehîn ên tevahiya zanistên civakî ne. Çar sed salên dawî yên Ewrûpa, ji yekûna dîrokê zêdetir şer jiyane. Hemû cûreyên şeran hatine jiyîn. Cûreyên şer, her wekî olî, etnîkî, aborî, bazirganî, leşkerî, medenî(sîvîl), netewî, çînî, blokî, cîhanî û hwd…, hema hema yên nehatibin ceribandın, nemane. Di

hemûyan de jî rekor hatine şikandin. Lê, bi mirinên xwe ve, bi êşen xwe ve û bi hundabûnen xwe yên daringî(madî) ve!

Van rastiyan, bê gûman, nikarin bibin berhema van çar sed salên dawî, ku di meşa dirêj a dîrokê de demekê (zemanekî) kin e. Ji xwe, lêkolîna me ya kurt nîşan daye ku nikarin bibin. Eger mirov bêje ku van şeran belkî jî teqîna pirsgirêkên panzdeh hezar salî ku di serdema civaka Neolîtîk û ya şaristaniyê de kom bûn, di serê civaka nîv-girava Ewrûpa de ne, wê bibe şîroveyeke rast û xweşbîner (qedirşînas). Civaka Ewrûpa li hemberî grekên pirsgirêkan, ên ji civaka kevn mayî, tam bi serkeftî nebe jî, bi hunerwerî şer kiriye. Bi serketiye ku bi feraseteke mezin lêbikole û şerê xwe hîn watedartir meşandiye. Ji bo vê, pêvajoyên Ronesans, Reform û Ronakbîriyê afirandiye, mezintirîn nûvedanên zanistî çêkiriye, tevgerên felsefî pêşxistiye û pêvajoyên destûra bingehîn ên demokratîk jiyaye. Qraliyetan damezrandiye û wan hilweşandiye, her wisa komaran ava kiriye. Sîstemên aborî di berdariya nedîtî de birêxistin kiriye û şoreşa herî mezin a sanayiyê çêkiriye. Di huner û modayê de hember(raqîb)an nas nekiriye. Bajarên biheybet ava kiriye. Hêlînên [xaniyên] biheybet ên zanist û tendurustiyê damezrandiye. Sîstema şaristaniyê li tevahiya cîhanê belav kiriye. Sîstema cîhanê ya herî berfireh a dîrokê ava kiriye.

Lê, tew di pirsgirêkên herî serkî de jî, di serî de di pirsgirêkên herî bingehîn ên roja me ya îro yên di asta cîhanê de, her wekî bêkarî, pevçûn û rûxana ekolojîk, xwe didin xuyakirin ku van pêşketinên dêwane, ji çareserkirina pirsgirêka civakî bêhtir, wê zêdetir girtîft kirine. Sedema bingehîn ew e ku pirsgirêk, ji koka şaristaniya pêne hezar salî ne û şaristanî bi xwe girêkekê mezin a pirsgirêkê ye. Li gorî min, tevkariya herî mezin a Ewrûpa ew e ku neynika(eyne) zanistê daye ber pirsgirêkên dêwane yan şaristaniyê. Her çend jêçûyî be û bixape jî, derfet çêbûye ku mirov ji vê neynikê, pirsgirêkan baştir bibîne. Tevkariyên mezin ên şervanên egîd jî (tevî ku bîrdozî çiqas xapînok bin jî) di vê de, qet nikarin werin paşçavkirin. Bi taybetî lehengên şerên ku bi navê wekherî, azadî û biratî hatine meşandin, xwediyên rasteqîn ên tevkariyê ne.

Divê em tespîtkirina pirsgirêka bingehîn a civakî, qet piçûk nebînin. Bi dirêjiya dîrokê, civakan bi hezaran salan şer kirin û hatin şerkirin. Lê, pirr biêş e ku van civakan nedizanîn bê ka ji bo kê şer dikirin. Ji alî zordar û mêtirngerên xwe ve, ne tenê dihatin xebitandin, lê di heman demê de di şerên bêhejmar de dihatin tunekirin.

Pirzaniya Rojhilat, bê gûman di ferqa pirsgirêka civakî de bû. Ji ber vê yekê doktrîn, sîstemên exlaqî, her wisa ol û mezheb ên mezin pêşxistibûn. Di şûna ku bibin dewlet û şaristanî, demek dirêj jiyana eşîret û qebîlê dibijartin. Civaka Rojhilat bi gewdeya xwe ya hîmî, ji dewlet û şaristaniyê biyan maye. Di navbera wan de beden) û qeleyên dêwane hatine çikilandin. Newa û destanên Rojhilat, van rastiyan, bi hemû kîbariya hunermendî vegotine. Mirovê Rojhilat, ji cîhana şaristaniyê ewqas biyan û bêhêvî bûbû ku rizgariyê di cîhanên dîtir de didît. Mezinahiya civaka Ewrûpa ew bû ku, bêyî ku ewqas bikeve, li milekî hêmanên erênî hezm kir, li milê din li hemberî hêmanên biyanker, li ber xwe da. Pirsgirêka civakî çareser nekir, lê firset jî nedayê ku ji alî wê ve were têkbirin û bêçarekirin.

Eger li van pirsgirêkên derbarê vê şaxa çemê dayîk ê şaristaniyê, pirsgirêkên civakên hem ên roja me ya îro, hem jî yên kevneşopî yên Çîn, Hînd, Emerikaya Başûr û heta Efrîka, bêne zêdekirin, wê vê yekê cewherên wan neguherine. Hin vegotinên kartêker ên şêweyî li ser pirsgirêkan, dikarin ancax vegotinê bihêz bikin. Ji xwe, sîstema cîhanê ya roja me ya îro (sîstema bi pir-navend û bi

DYE ya serwera super), pirsgirêkên tevahiya civaka cîhanê jî, weke xwe, kiriye sîstem û wan kiriye yekpare.

Kurtekirina pirsgirêkên civakî bi awayê sernivîsên sereke yên rojaneyîbûyî, ku min hewl da ez wan pêşkêş bikim, wê bike ku mijar temam bibe û zêdetir şênber bibe.

## B- PIRSGIRÊKÊN CIVAKÎ

### 1. Pirsgirêka Desthilatî û Dewletê

Ez neçar im timî bikirpînim ku çawa ku dîrok 'niha'ye, her yek hêmana niha jî dîrok e. Sedema hêştina qutbûneke mezin di navbera dîrok û niha de, encama propagandeyên misogerkirina rewatiyê ne, ku yekemîn karê ku her hilhatineke nû ya şaristaniyane dike ev e û bi vê ve, dixwaze xwe bike 'ezel û ebed'. Lê di jiyana rasteqîn a civakê de, qutbûnên wisan nînin. Mijara din a tê kirpandin, ew e ku heta dîrok neyê kirin gerdûnî, wê avakirineke dîroka navçeyî yan jî yekanî, nikaribe wate derbibirre. Lewra pirsgirêka desthilatî û dewletê, bi yekemîn awayên xwe yên avakirî, bi cewaziyeke pirr hindik, pirsgirêka roja me ya îro ye jî. Û cewaziya di navbera wan de jî, ew parên ku mercên dem û cî lê zêde kirine. Dema em vê wateyê bar bikin li têgînên cewazî û veguheranê, eşkere ye ku wê para heqîqetê ya şîroveyên me, zêde bibin. Her wisa pêwîst e mirov piçûkdîtin yan jî ne girîngkirina cewaziyê, veguheranê û pêşketinê jî di nava heman xeteriyan de bibîne. Çawa ku bêpariya ji dîroka gerdûnî mirov dicivitîne (pûç dike); dîsa, eger mirov pêşketina dîrokî, weke ku herdem ji dubarekirinê pêk hatibe, her wisa, wê ji cewazî û veguherînê bêpar bihesîıne, ew jî biqasî wê, perde davêje ser rastiyê. Pirr girîng e ku mirov nekeve nava van herdu awayên daxistkariyê, jî.

Yekemîn tespîta ku mirov di roja me ya îro de karibe di mijara desthilat û dewletê de bike, ew e ku li ser û nava civakê, qebareyeke awarte wergirtine. Serwerî, heya sadsala 16., bêhtir li derveyî civakê, hem jî bi awayê rakêşer û tirsnak, dihat avakirin. Şaristanî, bi dirêjiya çaxan, şahîdê awayên pirr kartêker ên bi vî rengî ye. Dewlet weke derbirrana/îfadeya fermî ya desthilatiyê, xetên xwe yên sînor bi bayex xêz dikir. Cewaziya dewlet û civakê çiqas tûj bihata xêzkirin, ewqas sûd dihat payîn. Tew di desthilatiyê de jî, weke diyardeyên bêhtir nava civakê, xet eşkere û zelal bûn. Xetên rawestê yên jinê li beramberî zilam, ên ciwanan li beramberî kalan, ên endamên ji rêzê yên eşîretan li beramberî serokeşîran û yên civata bawermendan li beramberî nûnerên mezheb û olan, bi rêsa û adab (rê û dirb) ên pirr zelal hatibûn destnîşankirin. Otorîteya desthilatiyê û mijara yên têne rêvebirin, ji lerzeya dengên wan, heya meş û rûniştina wan, xwedî rêsayên bi detay bûn, bê gûman di alî xwe pejinandina (xwedana hîskirina) desthilatî û dewlet de, ku hindiktir in, avabûna bi vî rengî ya otorîteya wan, têgihîner e. Emrazên rewatî, perwerde û, li gorî vê, xizmetê pêşkêş dikirin.

Cewaziya veguherana bi kok a di şaristaniya Ewrûpa de, ya ku di otorîteyên desthilatî û dewletê de pêk hat, ew e ku vana, herku çûye bi awayekî lezgîntir pêwîst dîtine ku xwe biçirpînin nava tevahiya çavikên civakê. Di vê de, mirov dikare qala du pêkerên bingehîn bike: Ya yekemîn mezinbûna girseya ku tê mêtin e. Eger rêveberî nehatiba mezinkirin, nedikarî mêtin pêk bihata. Çawa ku pêdiviya keriya ku mezin dibe, bi pirr şivanan heye; nepixîna burokrasiya dewletê, delîla eşkere ya vê diyardeyê ye. Pêwîst e mirov, li vê yekê, para parastina derveyîn, mezinbûyî bi

awayekî dêwane, ya rêveberî ya çewsandina civaka hundirîn,  lê zêde bike. Şeran herdem burokrasiyê bi xwe re zayandine. Artêş bi xwe, rêxistina herî mezin a burokrasiyê ye. Pêkera duyemîn, zanebûn û berxwedana zêdebûyî ya civakê ye. Ji ber ku civaka Ewrûpa hem mêtinê bi rengekî kûr nejiyaye û hem jî timî li ber xwe daye; vê yekê neçar  kiriye ku avabûnên desthilatî û dewletan bi qebare bin. Têkoşîna burjuwazî li hemberî arîstokrasî  û ya çîna karker li hemberî herduyan, neçar kiriye ku avabûna desthilatî û dewletan kûr bibin li Ewrûpa. Ji ber ku burjuwazî (çîna navîn), belkî jî yekem car di dîrokê de, weke çîneke navîn bû dewlet, vê yekê  guherana mezin di awayê desthilatî û dewletê de çêkiriye. Dewletbûna girseyek, zayî ji nava civakê, û bûyera desthilatî ya zêdebûyî, wê naçar kiriye ku xwe di nava civakê de birêxistin bike.

Burjuwazî çînbûneke mezin a wisa ye ku xwe ji derve li ser desthilatî û dewletê nake serwer. Eşkere ye ku herku xwe bike dewlet, wê di hundir de têkeve nava pevçûna civakî. Ew diyardeya ku jê re tê gotin ‘pevçûna çînî’,  vê rastiyê rave dike. Lîberalîzm, weke bîrdoziya burjuwa, ji bo ku çare ji vê pirsgirêkê re bibîne, ji hezar rûbaran av tîne. Lê, ya di pêvajoya bihûrî de hat jiyîn, zêdetir mezûnbûna desthilatî û dewletê ye û qansêrbûna burokratîk e. Dewlet û desthilatî çiqas di nava civakê de mezin bibin, tê wateya ku ewqas şerê navxweyî heye. Pirsgirêka herî bingehîn a di civaka Ewrûpa de pêşket, ji destpêkê ve di vê wesfê de bûye. Têkoşînên mezin ên ji bo destûra bingehîn, demokrasî, komar, sosyalîzm û anarşîzmê, ji nêz ve têkildar in bi şêwaza çêbûna desthilatî û dewletê. Çareya herî herî guzîde ku ber bi roja me ya îro ve hatiye dîtin, demokrasî, raseriya huqûqê û mafên mirovan ên bingehîn in, ku bi rêsayên misoger ên destûra bingehîn ve hatine girêdan. Bêhtir ji çareseriyeke mayînde, hewl didin neçar bikin ku dewlet û civakê li ser desthilatiyê li hev bikin û bi vî rengî heyama berê ya bi pevçûna mezin derbas bikin. Pirsgirêka desthilatî û dewletê nehatiye çareserkirin, lê hatiye guhastin bo rewşeke dombar.

Dema mirov ji nêz ve lê binêre; hewl tê dayîn ku dewlet-netew were domandin, bi rêya pêşxistina navheviya civak û desthilatî û dewletê bi netewperestî, zayendperestî, olperestî û cûre zanistperestiyan; anku bi rêya kişandina nava paradîgmaya “herkes hem desthilatî ye, hem civak e; hem dewlet e, hem civak e”. Bi vî rengî, şerê çînî li hundir tê çewsandin, pozîsyona parastinê li hemberî derve hertim vekirî tê hêştin û wisa tê ferzkirin ku çareseriya dewlet-netewê hatiye dîtin. A sereke ya rêbaza çewsandina pirsgirêkê, bêhtir ji çareserkirina wê, ku di asta cihanê de hatiye ceribandin, ev e. Ji ber ku dewlet-netew bi xwe bû mezintirîn dewlet û desthilatî, çavdêriya wesfa wê ya faşîzmê, bi awayê herî eşkere di faşîzma Alman de hate kirin.

Yekemîn mînaka dewlet-netew, di pêvajoya berxwedana Holanda û Îngilistanê de li hemberî Împaratoriya Îspanya, xwe da xuyakirin. Dewlet-netew, tevahiya civakê li hemberî hêza derve seferber dike û bi vî rengî bahaneya xwe ya rewa peyda dike. Di rasterêya bûyîna civaka netewî de, destpêkê, hêmanên erênî yên rêjeyî di xwe de werdigirt. Lê, eşkere bû ku hîn di dema zayîna xwe de erka wê perdekirina mêtin û zordariyê bû. Dewlet-netew, misoger etîketa çîna burjuwa di xwe de werdigire. Modêla dewlet a  wê  çînê ye. Paşê, seferên Napolyon, vê modêle li Fransa zêdetir xurt kirin û bûn sedem ku di asta Ewrûpa de berfireh bibe. Ji ber ku burjuwaziyên Alman û Îtalî paşmayî bûn û di mijara yekîtiyê de di nava tengezariyan de bûn; ev bû sedem ku polîtîkayên zêdetir netewperest pêş bikevin. Dagiriya ji derve û berxwedanên ku ji hundir ve, ji alî arîstokrasî û çîna karker ve hatin pêşxistin, burjuwaziyê neçarî  modêla dewleta şoven û netewperest a pirole kirin. Têkçûn û alozî, gelek welatan, di serî de Almanya û Îtalya, kişandin nava dubendiya ‘yan şoreşa civakî yan jî faşîzm’. A ku bi serket, modêla dewleta faşîst bû. Belkî Hîtler, Mûsolînî û hempayên

wan têk çûn, lê sîstemên wan bi ser ketin. Dewlet-netew, di cewher de, dikare were pênasekirin weke wekhevbûna dewlet bi civakê re û civak bi dewletê re, ku pênaseya faşîzmê jî ev e. Weke xwezayî, ne dewlet dibe civak û ne jî civak dikare bibe dewlet. Eger bibe, ancax îdeayên bîrdoziyên topyekûnperest (totolîter), dikarin bi vî rengî bibin. Wesfa faşîst a van dîrûşman tê zanîn. Faşîzm, weke awayekî dewletê, her dem di koşeyê sereke yê lîberalîzma burjuwa de xwedî ciyekî ye. Awayê rêveberî yê heyamên aloziyê ye. Ji ber ku alozî bûnyewî ye, şêweya rêveberî jî bûnyewî ye. Navê wê, rêveberiya dewlet-netew e. .Tê wateya ku aloziya çaxa kapîtala fînans gihîştiye lûtkeyê. Dewleta yekdestî ya kapîtalîst jî, ku di roja me ya îro de gihîştiye lûtkeya kûrewî, di heyama xwe ya herî paşverû ya zordar de, bi gelemperî faşîst e. Her çiqas qala hilweşîna dewlet-netewê tê kirin jî, lê eger mirov îdea bike ku wê ya di şûna wê de were avakirin demokrasî be, wê vê yekê bibe dilsafî. Belkî jî çêbûnên siyasî yên faşîst ên hem kûrewî yên makro (herî mezin) û hem jî yên herêmî yên mîkro (herî piçûk), di rojevê de ne. Yên li Rojhilata Navîn, Balkanan, Asya Navîn û Kafkasya diqewimin, balkêş in. Emerîkaya Latîn û Efrîka di erefeya ezmûnên nû de ne. Ewrûpa li pey wê yekê ye ku bi rêya peresanê ji faşîzma dewlet-netewê derkeve. Ne diyar e bê ka wê çi bi Rûsya û Çînê were. DYE, ku serwera super e, bi her awayê dewletan re di nava danûstendinan de ye.

Eşkere ye ku pirsgirêka desthilatî û dewlet yek ji heyama xwe ya herî giran a dîtir jî dijî. Dubendiya ‘yan şoreşa demokratîk, an faşîzm’, di rojevê de girîngiya xwe ya herî jiyanî diparêze. Tevahiya rêxistinên sîstemê yên herêmî û navendî (Neteweyên Yekbûyî), nikarin bibin sazbar. Dema ku kapîtala-fînans di heyam a herî kûrewî ya dîrokê de gihîştiye lûtkeyê, di rola wê beşa sermayeyê de ye ku aloziyê herî zêde har kiriye. Beramberiya siyasî û leşkerî ya yekdestiya sermayeya-fînans, şerê kûrkirî yê li hemberî civakê ye. Rastiya ku di gelek eniyên cîhanê de tê jiyîn, ev e. Mijara ka wê kîjan çêbûnên siyasî û aborî ji aloziya pêkhateyî ya sîstema cîhanê derkevin, dikarê were destnîşankirin, ne bi kehanete, lê bi asta xebatên rewşenbîrî, siyasî û exlaqî.

Civak di serdema kapîtal a-fînans de, weke yekdestiya herî ferazî ya modernîteya kapîtalîst, bi qasî ku di ti demên dîrokê de nebûye, bi belavbûnê re rûbirû ye. Tevna civakê ya polîtîk û exlaqî hatiye perçeweslekirin. A tê jiyîn, ‘qira civakê’ye, ku diyardeyeke civakî ya ji nijadkujiyê jî girantir e. Serweriya medya ya sermayeya ferazî, weke çekek e ku civakkujiyeke girantir ji duyemîn Şerê Cîhanî dide meşandin. Gelo mirov çawa dikare civakê biparêze li hemberî çeka medya, ku gogên netewperestî, olperestî, zayendperestî û hunerperestî (spor, rêzefîlm û weke vana), bi dirêjiya bîst û çar saetan, weke ku pê bide vereşandin, li civakê dide?

Medya jî, weke cûreyek duyemîn aqilê analîtîk, li ser civakê sazbar e. Çawa ku aqilê analîtk bi tena serê xwe ne baş e û ne jî xirab e, medya jî bi tena serê xwe navgîneke nêtar (notr) e. Weke her çek, a/ê ku rola wê bikar bîne, wê destnîşan dike. Hêzên serwer, çawa ku herdem xwedî çekên herî bibandor in, her wisa hêza zal a çekên medya ne jî. Ji ber ku medyayê weke duyemîn aqilê analîtîk bikar tînin, di warê bêbandorkirina hêza berxwedana civakê de jî pirr bandorker in. Civaka ferazî, bi vê çekê ve, tê avakirin. Civaka ferazî, awayekî dîtir ê civakkujî ye. Gengaz dibe ku mirov dewlet-netewê jî weke yek ji şêweyên civakkujiyê bihesibîne. Bi herdu şêweyan jî, civak ji xwebûnê tê derxistin û tê veguherandin bo navgîneke yekdestiyê, ku wê araste dike. Çawa ku eger mirov xwezaya civakî besît bibîne, pirr xeternak e; dema ew ji xwebûna xwe were derxistin jî, tê wateya ku vekirî tê hêştin ji xeteriyên ku sînoerên wan ne diyar in. Çaxa yekdestiya ferazî jî, heman weke sermayeya-fînans, dikare ancax bi civaka ji xwe derketî, hebe. Derketina holê ya herduyan di heman demê de, ne rasthatinî (tesadufî) ye, lê bi hev re têkildar in. Civaka dewlet-netewê, ya ji xwe

derketî (ya ku xwe dewlet-netew dihesibîne), û civaka ku ji alî medya ve ji serî (rê) hatiye derxistin, bi wateya xwe ya tam, civaka têkçûyî ye û ji kavil (enqaz)ên wê, tiştên dîtir têne avakirin. Mirov nikare jê gûman bike ku em çaxeke civakî ya wisa dijîn.

Em ne tenê civaka herî bipirsgirêk dijîn, her wisa em di civakek wisa de dijîn ku ti tişt nade takekesê xwe. Civakên em têde dijîn, ne tenê tevnên xwe yên exlaqî û polîtîk wenda kirine, lê, hebûnên wan jî di bin gefan de ne. Ne pirsgirêk, lê, xeteriya qirbûnê dijîn. Eger di roja me ya îro de, tevî hemû hêza zanistî, pirsgirêk bi berdewamî mezin dibin û dibin qansêr, wê çaxê, ev tê wateya ku qirkirina civakê, ne tenê feraziyek e, lê xeteriyeke rasteqîn e. Û ew îdeaya 'desthilatiya dewlet-netewê civakê diparêze', xapîna herî mezin diafirîne û bi vî rengî, xeteriyê gav bi gav dike rastîn. Civak ne tenê bi pirsgirêkan re, lê di heman demê de, bi qirbûnan re jî rûbirû ye.

## 2. **Pirsgirêka Civakê ya Exlaq û Polîtîka**

Ez di ferqa fikareyên dabeşkirina pirsgirêkan de me. Nikare were paşçavkirin ku ev rêbaz, ku zanista bi navenda Ewrûpa aqilê analîtîk bê hed û hesab bikar aniye û bi vî rengî ew pêşxistiye, her çend di dîmen de hin destketiyên wê hebin jî, xeteriya hundakirina yekparetiya heqîqetê jî di xwe de werdigire. Ez ê bikaranîna rêbazê bidomînim, bi şertê li ber çavgirtina berdewamî ya aliyên ku dibin fikare yên vê xeteriyê, bi zanebûna ku wê rîskê di xwe de werdigire ku pirsgirêka civakî, weke 'pirsgirêkan'were dabeşkirin. Ez ê hewl bidim ku di beşa Epîstemolojî de nêzîkatiyên cewaz guftûgo bikim.

Me desthilatî û dewletê tewş li yekemîn beşa pirsgirêkên civakî bi cî nekir. Sedema vê ya bingehîn ew e ku çavkaniya sereke ya pirsgirêkan pêk tînin. Erka bingehîn a pêwendî û emraz ên desthilatî û dewletê, ku pêşî, bi hemû giraniya xwe li ser civakê û li gel sedsala 16., bi rengekî kûr di nava civakê de, binkeya xwe çêkirin, ew e ku civakê bêhêz û bêparastin bihêlin û bi vî rengî wê amade bi kin ji bo mêtina yekdestiyê. Pirr girîng e ku mirov rola desthilatî û dewltê bi vî rengî pênase bike. Eger desthilatî û dewlet, tenê weke yekûna emraza zorê û pêwendiyên wê were binavkirin, wê kêmasiyên cidî di xwe de wergire. Ez di wê baweriyê de me ku rola wan a herî girîng ew e ku civak bêhêz û bêparastin were hêştin. Û vê rola xwe pêktînin, bê rêya lewazkirina berdewamî ya tevnbûna polîtîk a civakê, ku navgînên wê yên 'heyînê'ne, û bi vî rengî wan dixin nava rewşa ku nikaribin kar bikin û rola xwe bilîzin. Civak, eger herdu qadên ku em ji wan re dibêjin 'exlaq û polîtîka'çêneke, nikare hebûna xwe bidomîne.

Rola bingehîn a exlaq ew e ku civak bibe xwedî hêz û sepana rêsayên ku xwe bide berdewamkirin û li ser piyan bimîne. Civakek ku rêsayên xwe yên hebûnê û hêza xwe ya sepandinê wenda kiribe, tê wateya ku veguheriye komcivakên lawiran, ku di rewşek wisa de, bi qasî ku bê xwestin, dikare were bikaranîn û mêtin. Rola polîtîkayê jî di cewher de ew e ku rêsayên pêwîst ên exlaqî ji civakê re peyda bike û li gel vê, rê û rêbazên dabînkrina pêdiviyên bingehîn ên daringî û zihnî, bi berdewamî guftûgo bike û wana bike biryar. Polîtîkaya civakî, hêza gotûbêj û biryaran bi berdewamî pêşdixe û civakê, li ser bingeha van rastiyan, zindî dike û wê dike xwedî nêrîna zelal; her wisa wê digihîne şiyana ku karibe xwe rêve bibe û karên xwe çareser bike û bi vî rengî qada herî bingehîn a hebûna wê çê dike. Civaka bêpolîtîka, ew civak e ku, mîna mirîşka serjêkirî, hîn berî ku can bide, dipirpite . Rêya herî bibandor a hêştina civakek bêsazbar û bêhêz ew e ku ew civak were

hêştin bêPOLÎTÎKA (bêsiyaset, bi gotina Îslamî bêşerîet), weke organa neçar a gotûbêj û biryaran ji bo hebûna wê ya cewherîn û pêdiviyên wê yên bingehîn ên daringî û arişî. Ti rê, ji bilî vê, nikare ewqas fikaredar be.

Ji ber van sedeman e ku emraz û têkiliyên desthilatî û dewletê bi dirêjiya dîrokê di serî de saziyên bi navê 'huqûq'li şûna exlaqê civakê û 'dewlet'li şûna polîtîkaya wê, bi cî dikin . Erkên bingehîn ên desthilatî û dewletê, yên her serdemê, ew in ku civakê dûr bixin ji hêza wê ya exlaq û polîtîka, ku rola du stratejiyên bingehîn ên hebûnê dileyîzin; û li şûna wê, rêveberiya huqûq û serweriyê deynin. Eger ev herdu erk nebin, daneheva sermaye û yekdestiyên mêtinê jî nabin. Tevahiya rûpelên dîroka şaristanî ya pênc hezar salî tijî ne bi şikandina hêza civakê ya exlaq û polîtîka û bi danîna li şûna wê hêzê huqûq û îdareya yekdestiyên sermayayê. Dîroka şaristaniyê bi sedemên xwe yên tazî û rastîn, wisa ye û nivîsandina wê ya rast, dikare ancax bi van sedeman wate derbibirre. Her wisa di cewhera tevahiya pevçûnên civakî yên dîrokê de jî ev rstî veşartî ye. Gelo, wê civak, ji alî exlaq û polîtîkaya xwe ve bijî, yan wê di rasterêya huqûq û rêveberiya yekdestiyên har ên mêtinê de, weke keriyek bê jiyandin? Ez dixwazim vê rastiyê derbibirrim, dema ez dibêjim ku çavkaniya sereke ya pirsgirêkan, 'mezinbûna kanserolojîk e', ku nakeve heşê mirov, a huqûq û rêveberî ya desthilatî û dewletê ye.

Wê bikêrhatî be ku mijareke din jî were ravekirin. Dema yekemîn xerarşî tê damezrandin û di rewşên ku 'ezmûn'û 'pisporî'ji bo civakê girîng dibin de, 'bikêrîtî'bi navê civakê jê tê payîn, ferq nake ku dewlet be yan jî otorîte be, navê wê çi dibe bila bibe. Eger civak dewlet û otorîteyê (desthilatiyê) ji binî ve neyînî nekiriye, ji ber vê bendewariya wê ya van herdu bikêrîtiyan e. Anku ji delwet û otorîteyê ezmûn û pisporî dipê û bi vî rengî, wer dizane ku wê karên wê hêsan bikin. Sedemên herî girîng ên xwe ragirtina wê, ev herdu pêker in. Ezmûn bi herkesî re nîne û pisporî jî nikare bibe karê herkesî. Lê, otorîte û dewlet van herdu bendewariyên mafdar bi dirêjiya dîrokê îstîsmar kirin û bi vî rengî, wan kirin qada dek (entrîka) di şûna huqûq de  û beredayîtî di şûna ezmûn de, ya bêkêrên herî bê ezmûn û bêpar ji pisporiyê. Dejenerebûn û felaketên mezin, ji nêzîk ve têkildar in bi vê jirêderxistin û berevajîkirina mezin re.

Di dîrokê de bi taybetî burjuwazî, ku tê wateya pêşketina kanserolojîk a çîna navîn, li ciyê navîn ê civakê, anku li navika wê rûniştiyê û bi vî rengî berjewendiyên xwe yên herî xweperest weke 'huqûq'û rêveberiya xe ya herî bênijad jî weke 'îdareya destûra bingehînî'pêşkêş kiriye û bi vê armancê desthilatî û dewletê dabeş kiriye li qadên sînornenas ên 'emraz' û qaşo 'pisporî' û bi vî awayî wan pirr kiriye; vê yekê bûye tam felaketek. Dema civakê gotiye "ez ji baranê rizgar bibim, rastî 'gijlokê' hatiye. Gotûbêjên sînornenas ên li ser 'Komar', 'demokrasî', 'destûra bingehîn', 'piçûkkirina rêveberî'û 'sînordarkirina dewlet û desthilatî', yên lîberalîzmê, ku ziraviya aqil a burjuwazî ye, hem perde davêjin ser rastiyê, hem jî divê weke wateyên barkirî bi derbirranên berevaj, bêne nirxandin. Şiyana çîna navîn a burjuwa, ya destûra bingehîn, komar, demokrasî, piçûkkirina rêveberî û sînordarkirina dewlet û desthilatî, tew bi qasî çaxa kevn jî nîne. Ji ber ku ya/yê van têgînên torîn (pîroz) aniye rewşa nêsazbar, pêkhateya daringî ya çîna navîn e, anku şêwaza hebûna wê ye. Dema ku civak xwe bi zorê radigirt li hemberî xanedaniyek û qralekî çaxên destpêkê, ma wê çawa xwe ragire li hembêrî emraz û xanedaniyên burjuwa, ku bûne awayekî bêsînor? Ez bi zanebûn têgînên 'xanedan û malbata burjuwa'bikar tînim. Ji ber ku ji heman çavkaniyê tên. Tevahiya hunerê reveberî û rêsayan, ji hêzên arîstokrasî û qral ên torînên mezin ên berya xwe çirpandiye. Şiyana wê ya afirana cewherîn nîne. Pêkera kanserolojîk a pêwendiyên

dewlet û û desthilatî ya di nava civakê de, çavkaniya xwe ji vê xwezaya wê ya civakî digire. Xwezaya çîna navîn, bi faşîzmê barkirî ye.

Lewre tevnên civakê yên exlaqî û siyasî (polîtîk) hatine kudkirin (seqetkirin) û bi vî rengî nikare kar bike; ev dibe ya sereke ya pirsgirêkên herî bingehîn. Bê gûman, tevn û qadên exlaq û polîtîka, nikare bi tevahî bêne tunekirin. Ta ku civak hebe, wê exlaq û polîtîka jî hebin. Lê ji bêr ku desthilatî û dewlet derketin, û hatin derxistin, ji bûyîna qadeke pisporî û ezmûnê, nikarin şiyanên xwe yên afirîner û sazbar bi cî bînin. Pirr eşkere ye ku civak di roja me ya îro de, bi rêya çirpîna emraz û têkiliyên desthilatî û dewletê (medya, her cûre îstîxbarat, yekîneyên taybetkirî yên operasyonan, doktrînên bîrdozî û wekî vana) heya çavikên wê yên herî zirav, hatiye xistin nava rewşekê wisa ku bênefes maye, xwe nas nake, nikare ti rêgeza xwe ya exlaqî bisepîne, her wisa nikare gotûbêjên polîtîk ji bo pêdiviyên xwe yên herî bingehîn bike û biryaran bigire (siyaseta demokratîk ava bike). Dîsa, 'hevparî (şîrket) yên kûrewî', anku yekdestiyên 'ezel-ebed', ên roja me ya îro, ku pirr têne gotûbêjkirin û hêzên rasteqîn ên serwer in, peqîna herî mezin a sermaye ya dîrokê di vê demê de pêk anîne û ev jî ji nêz ve bi xistina civakê nava vê rewşê ve girêdayî ye. Eger civak nehatiba xistin û belavkirin, wê nekarîbûya, bi rêya ewqas ferazî, anku bêyî destdana ti navgîneke hilberînê, qezenckirina pere ji pere bihata pêkanîn. Ên ku yekdestiyan bi dirêjiya tevahiya dîrokê qezenc kirine û van destketiyên wan ên ji hewayê, yên herî bi qebare (hacîm) yên roja me ya îro, li ser bingeha valakirina ji hebûna civakê, ji pişta wê û ji mejiyê wê têne pêkanîn. Ji ber ku "li hewayê pere tine ye!"

Divê ez dubare bikim ku ne tenê emraz û pêwendiyên pirkirî bi rengekî bêsînor ên desthilatî û dewletê civakê dixin vê rewşê, lê di heman demê de bi navgîna medya, ku çavkaniyeke dîtir a sereke ya serweriyê ye ku herî kêm bi qasî vê bandorker e, fetha bîrdozî ya civakê tê pêkanîn. Eger civak bi jirêderxistinên netewperestî, olperestî, zayendperestî, zanistperestî û hunerperestiyê (sanayîbûna huner, bi taybetî ya spor) ve neyê gêjkirin, nikare ewqas were xistin tenê bi emraz û pêwendiyên desthilatî û dewletê; herwisa hevparî (şîrket) yên kûrewî yên ferazî (anku kapîtala-fînans û pere-sermaye), û yekdestiyên dîrokî nikarin civakê ji xwebûna wê derxin û wê di mêtineke ewqas sînornenas de derbas bikin, mîna ku qiracivakê pêk bînin.

### 3. Pirsgirêkên Civakê yên Heşmendî

Bê gûman, eger bêpariya ji exlaq û polîtîka, ku yek ji mercên yekemîn e ji bo ku civakek ji mêtinê re vekirî were hêştin, û rûxîna heşmendiya civakî, ku hîmê ramanî ya van herdu tevnan e, neyên misogerkirin, ev bêparî nikare were pêkanîn. Ji ber vê sedemê, serwer û yekdestiyên mêtinger, ji bo armancên xwe, bi dirêjiya dîrokê weke yekemîn kar, 'serweriya heşmendiyê' ava dikin. Keşîşên Sumerî ji bo ku civaka Sumer ji berdariyê re, lewre ji mêtinê re, vekin, weke yekemîn kar, perestgeh (Zîgurat) ava kirine; ev jî, vê rastiyê bi şêweyeke pirr eşkere îspat dike. Perestgeha Sumer pirr girîng e, ji ber ku çavkaniya resen (orjînal) a dîrokê ya ji rêderxistin û fethkirina zihnê civakî ye, ku tê zanîn û bandora wê hîn jî didome.

Min hewl da bi girîngî diyar bikim ku xwezaya civakî, ji pêkhateyên herî nerm ên zihnî çêdibe. Ta ku baş neyê têgihîştin ku civak xwezaya herî bi zeka ye, nikare sosyolojiyeke watedar were pêşxistin. Lewre zordar, serwer û fenek, ku weke çavkaniya mêtinê çavên wan li civakê birriye, ji xwe re kirine erka bingehîn ku, weke yekemîn karên xwe, derfetên zeka û ramîna civakê lewaz bikin û yekemîn yekdestiyê weke yekdestiya heşmendî, anku weke perestgeh pêş bixin. Perestgeh, weke resenî ya xwe, du erkan bi hev re pêk tîne: ya yekemîn; serweriya zihnî, weke navgîna serwerî, ta radeya dawî girîng e. Ya duyemîn; ji bo ku civakê ji nirxên wê yên cewherîn ên zihnî qut bike, pirr destdayî ye.

Pêwîst dike ku heşmendiya cewherîn a civakê, weke têgîn, baş were têgihîştin. Mirovahî, dema yekemîn kevir û çov girte destê xwe, vî karî bi rêya ramînê kiriye. Yekemîn tovên, ne navajo, lê yên ramana analîtîk mijara gotinê ne. Herku ezmûn berhev dibe, civak pêş dikeve; di cewher de ev, kûrbûna raman e. Civakek, çiqas ezmûn, lewra çiqas ramana xwe kûr bike, ewqas hêz û şiyan qezenc dike; her wisa baştir xwe xwedî dike, xwe diparêze û xwe zêde dike. Ev pêvajo rave dike bê ka pêşketina civakî çi ye û çima pirr girîng e. Civak, herku bi berdewamî xwe dide ramandin kevneşopa xwe ya exlaqî, anku ramana xwe ya kolektîv, ku em jê re dibêjin aqil yan jî wijdan, çêdike. Exlaq ji ber vê sedemê pirr girîng e. Ji ber ku ew, mezintirîn xezîneya civakê, daneheva wê ya ezmûnê, sedema wê ya mayîna li ser piyan û organa wê ya bingehîn a berdewamkirin û pêşxistina jiyana xwe ye. Ji ber ezmûna xwe ya jiyanê pirr baş dizane ku, eger vêya wenda bike, wê ji hev bikeve. Hema hema bi tûjiya navajoyî, girîngî dide exlaq. Cezaya kesên ku di civakên berê yên klan û qebîle de rêsayên exlaqî nedisepandin, mirin bû; yan jî dihatin avêtin derveyî civakê û terkî mirinê dihatin kirin. Hîn jî di koka ‘kuştinên namûsê de’, tevî ku pirr tê paşevajkirin, van rêsayan hene.

Dema ku exlaq kevneşopa raman a kolektîv dinimîne, erka polîtîkayê hinekî cewaztir e. Bêhtir ji bo ku li ser karên kolektîv ên rojane gotûbêj bêne kirin û biryar bêne girtin, hêza raman pêwîst dike. Ji bo polîtîkayê, ramana afirîner a rojane şert e. Lê dîsa jî, civak pirr baş dizane ku eger mirov xwe nespêre exlaq, weke çavkanî û weke daneheva raman, mirov nikare ne ramana polîtîk pêş bixe û ne jî polîtîkayê bi xwe, bike. Polîtîka qadeke jênerevîn a çalakiyê ye ji bo karên rojane yên polîtîk ên kolektîv (berjewendiya hevbeş a civakê). Her çiqas di mijara karan de ramanên cewaz, heta yên dijraber jî, hebin, ji bo gotûbêj û girtina biryaran şert in. Civaka bêpolîtîka nêcewaz e ji lawirek, ku, weke mînaka keriyê, rêsayên ên dîtir dişopîne; yan jî, weke mînaka mirîşka serjêkirî, dipirpite. Hêza raman a cewherîn a civakê, ne saziyeke seresazî ye, lê, mejiyê civakê ye. Û organên wê exlaq û polîtîka ne.

Organa din a civakê, weke mekanê pîroz, elbet perestgeh e. Lê ev perestgeh, ne perestgeha hêza serwer (xerarşî û dewlet) bû, lê, mekanê wê yê pîroz bi xwe bû. Gerîna civakê li mekanê xwe yê pîroz ê cewherîn, di vedîtinên arkeolojîk de, koşeyê sereke dadigire. Belkî jî yekane avahiya girîng e ku heya roja me ya îro li ser piyan maye. Ev rastî, nikare weke rasthatinî (tesadufî) were hesibandin. Yekemîn mekanê pîroz ê civakê, ew cî ye ku têde tevahiya paşeroja wê, dapîr û bapîrên wê, nasnameya wê û hevpariya wê, têne nimandin. Ciyê bîranîn û ayîna tomerî ye. Mekanê xwe bîranîn û yadkirinê ye; nîşana xwe guhastina bo pêşerojê ye; her wisa sedema girîng a bi hevrebûnê ye. Civak di wê zanebûnê de bû ku perestgeh li ciyekî çiqas balkêş, biheybet û hêjayî jiyîna xweşik bihata avakirin, wê ewqas şiyana wê ya nûnerî û nirxa wê ya jiyanî çêbibûya. Lewre, biheybetiya herî zêde, di perestgehan de dihat pêşandan. Perestgeh, weke mînaka Sumer jî diteyisîne, di heman demê de, ciyê depo û stara kedkaran û ya navgînên hilberînê bû. Anku, ciyê xebata zibaretî [xebata

bi şêwaza kolektîv] bû. Ne tenê ciyê ayînê, lê di heman demê de ciyê gotûbêj û biryar ên tomerî bû. Navenda polîtîk bû. Hêlîna zenaetkaran bû. Ciyê nûvedan (îcad)ê bû. Ew navend bû ku têde avahîsaz (mîmar) û zanayan hunerên xwe diceribandin. Yekemîn nimûneya akademiyê bû. Ne rasthatinî (tesadufî) ye ku tevahiya navendên mirwayan (kehanetan), li perestgehan bûn. Tevahiya van pêkeran û hîn bi sedan ên weke vana, girîngiya perestgehê nîşan didin. Herwisa wê rasteqîn be ku ji vê rewşê re pirr bi hêsanî were gotin ‘navenda bîrdozî û heşmendî ya civakê’.

Ew  xirbeya li Rihayê, ku kevirên çikilandî ew honandine, ya donzdeh hezar salan berî niha ye. Hîn şoreşa çandiniyê çênebûye. Lê eşkere ye ku ji bo wê kevirtraşiyê û çikilana wan keviran, hebûna mirovên, lewre civaka, pirr pêşketî pêwîst dike. Gelo, kî bûn ew? Çawa diaxivîn? Çawa xwe xwedî dikirin û çawa xwe zêde dikirin? Raman û adetên wan çawa bûn? Debara xwe  çawa dabîn dikirin? Ti şop tine ye ku bersiv bide van pirsan. Weke şop, tenê bîrdarî (abîde) ya kevirê çikilandî jê maye - şîmaneya (îhtîmala) mezin e ku jêmayiyên perestgehê bin-. Li gorî ku gundiyên ji rêzê, tew di roja îro de jî ew hêza wan tine ye ku hilkişin wê derê, wan keviran bi rengekî watedar bitraşin û biçikilînin; civakên wan, ji gundiyan û komcivakên gundan, ên îroyîn, paşvetir nebûn. Em dikarin tenê mijarên dirûvî vêya texmîn bikin. Belkî jî pîroziya Rihayê (her çend hatibe çewtevajîkirin) jî, ji vê kevneşopa wêdetirî dîrokê, wek mîsala rûbarek, dipale û tê. Di vê wateyê de ez hebûn û girîngiya perestgeha civakî gotûbêj nakim; lê ez girîngiya hebûn û erka perestgeha serweriyê gotûbêj dikim.

Keşîşên Misirê jî, di çêbûna perestgeha serwer de, herî kêm bi qasî mînaka Sumer, rol leyîstin. Brahmanên Hindê ji wan kêmtir neman. Rojhilata Dûr bi tevahî de rewşa jêrtir de nebû. Perestgehên Emerîkaya Başûr jî serwer bûn. Ciwan, tewş weke qurban nedihatin bijartin. Hemû perestgehên zal ên çaxên şaristaniyê, serwer in. Mîna kopya ya resen bûn. Erka sereke ya van navendan ew bû ku civak, bi sûda serweran, hatiba amadekirin ji bo bikaranînê. Dema ku şaxê leşkerî yê yekdestiyê, bi rengekî sawnak serên mirovan jê dikir û wan di dîwarên qele û bedenan de bikardianî, şaxê wê yê ruhanî heman kar, bi fetha heşmendiyê, temam dikir. Ev herdu xebat, di kolekirina komcivakan de bi hev re rol leyîstin. Yek ji wana tirsê û ya din jî îqnakirinê afirand. Ma kî dikare domdariya bi vê şêwazê ya civaka şaristanî ya pênc hezar salî, înkar bike?

Şaristaniya serwer a Ewrûpa guheraneke mezin a şêwe di vê mijarê de çêkir. Lê cewhera xwe her parast. Ji çavdêriyên rojane ne ku emrazên dêwane yên dewlet-netewê yên li ser civakê, qîma xwe bi vê neanîn û çavikên hundirîn ên civakê, heya detayên herî zirav, bi xwe ve dane girêdan. Weke navendên çêbûna heşmendî, yên ku zanîngeh, akademî, li binîtir lîse, dibistana navîn,  dîsa dibistana seretayî û ya zarokan, didin; her wisa ên ku dêr, kenîşte (sînagog)  û mizgeft wan temam dikin û yên padîgan (qişle) jî wan tûj dikin; ma eger eşkere nînin çi ne ew feth, dagirî, asîmîlasyon û mêtina zihîn, exlaq û tevnên polîtîk ên civakê, ku weke jêmayiyên civakê mane?  Vala naaxivin hin şîrovegerên hêja, dema dibêjin ‘girsekrina’civakê, kerîkirina wê ye. Ji bîranînên me yên teze ye ku di heman demê de bi vê mêtina zihîn ve tê çûyîn bo civaka faşîzmê. Gola xwînê ya dîroka nêzîk jî, encama vê fetha zihnî ye.

Fikareya wê nîne ku were dubarekirin: eger tu îkonên netewperestî, olperestî, zayendperestî sporperestî û hunerperestî bihejînî, tu dikarî civakê -bibûrin, keriyê!-, anku girseyê biguhêzînî her hedefa ku dilê te bixwaze. Fetha zihîn, hîmê wê pêşketinê ye ku civakê vekirî dihêle ji sermayeya-fînans a kûrewî ya îroyîn re, bi qasî ku ti zor nikaribe bi ser bixe. Pêwîst e mirov careke din silav bide keşîşên Sumer û nûvedana wan a perestgehê! hûn fethkarên çi yeman bûne ku nûnerên we yên

dawî yên îroyîn û perestgehên wan, tevî ku pênc hezar sal bi ser re derbas bûne, dikarin ewqas daneheva herî mezin a sermaye ya dîrokê pêk bînin, bêyî ku destên xwe ji ava germ têxin ava sar! Tew hêma û sî (Zîllûllah) yên herî xurt ên Xwedayan jî, nekarîn ewqas qezenc bidest bixistana. Wate, daneheva berdewamî û lodî(kumulatîv) ya sermaye, têgîneke tewş nebûye. Her wisa şewşandinên zihnî operasyonên basît nebûne. Dema ku Dr. Hîkmet Kivilcimli û Antonîo Gramscî yê Îtalî jî, fetha serwerî digihandin pênaseyên dirûv, di girtîgehên heyama ku dewlet-netew herî zêde dihate pîrozkirin de bûn. Ên dizanîn, ji ber yên ku jiyabûn. Ez jî, di tehlîla dawî de, ‘mehkûmê’sermayêya kûrewî me. Nenaskirina wê bi awayekî rast, wê di kesayetiya zihnê min de (di nasnameya min de), bibûya xiyanet li zihnê civakê bi xwe.

## 4. Pirsgirêkên Civakê Yên Aborî

Dema qala pirsgirêkên aborî tê kirin, morîk têne bîra min. Dema ku tew pirsgirêkên aborî (ji xwe aborî, ji bo her hebûnek xwe xwedîkirin e) yên lawirek hûrik weke morîkan jî çênabin; ma çawa dibe ku pirsgirêkên yeman ên aborî yên hebûnek xwedî ezmûn û aqilê pêşketî weke mirov, heta rewşên weke bêkarî ku rûyê mirov reş dikin, tên jiyîn? Ma çi li xwezayê tine ye ku zekaya mirov li ser nexebite û nikaribe wê bike warê kar? Pirsgirêk, misoger, ne ji ber awayê xebitînê ye û ne jî bi jîngehê re têkildar e. Gurê zordar ê mirov, di hundirê mirov bi xwe de ye. Her pirsgirêka aborî, di serî de bêkarî, bi sermayekirina civakê re têkildar e.

Tehlîla Marks a li ser sermaye, bê gûman hêja ye. Hewl dide bêkariya têkildar bi pêvajoya aloziyê re jî rave bike. Lê, ya biêş ew e ku nexweşiya pozîtîvîzmê wî jî di rewşeke pirr xirab de girtiye. Nexweşiya zanistperestiyê nehêştiye ku analîzeke pirr zêdetir berfireh li ser civaka-dîrokî bikira. Ya ku ez hewl didim bikim, ew e ku ez pênase bikim ku sermaye ne aborî ye, berevajî, emraza bandorker e ku aboriyê ji bûyîna aborî derdixe. Sedema min a herî sereke ya ji bo vê yekê, ew e ku di pêşketina civakî de sermaya qet ne armanc e û cî nabîne. Mirov dikare civaka zengîn û ya di nava geşdarî de bihizire. Exlaq û polîtîka ji vê re vekirî ne. Lê dema ku civak di nava pêdivî û bêkariyê de diçîngize (dinale), mirov li naverastê qala zengînî û sermayeyê bike, ev, ji bûyîna sûc wêdetir, reng e bi qira civakî ve têkildar be. Pênasekirina şaristanî weke girêka pirsgirêkê bi xwe, ji ber wê yekê ye ku xwe dispêre yekdestiya sermayeyê.

Rosa Luksembûrg, dema ku pêkanîna sermayeyê, bi mercê civaka nekapîtalîst ve gire dide, di perava heqîqeteke pirr girîng de digere. Eger karîbûya ji peravê zêdetir ber bi hundir ve bimeşiya, wê karîbûya bidîta ku ew (sermaye), ne tenê girêdayî hebûna civaka ne kapîtalîst e, lê di heman demê de, wê civakê weke qijnikê dimije û dinepixe; her wisa dilopek xwîna ji vê jî bi karkeran dide vexwarin û wan ji xwe re dike hemtewan. Ez bi zelalî dikirpînim; ez hewldana karkeran înkar nakim. Lê ez diyar dikim ku çêbûna sermaye, dikare ancax di mêjereke pirr hindik de bi keda karker ve were girêdan; heta eger mirov felsefî-dîrokî-civakî bihizire, wê ev mêjer (mîqtar) wateya xwe hunda bike. Ji ber pirsgirêkên ekolojîk, herku diçe ronî dibe ku sanayîgerî (endustriyalîzm) çirpandineke li ser pişta civakê û jîngehê. Kîjan mirova/ê zana û têgihîştî dikare înkar bike ku rêveberên damûdezgehan û karkerên westa (hoste), bûne beşên herî xwedî îmtiyaz ên civakê û beranberiya vê yekê bêkarî ye, ku weke aşûtê mezin dibe? Tebeqeyên sanayî yên pêşketî,

bazirganiya yekdestîperest û beşên fînansî, anku yekdestiyên sermaye, têgîna 'karker' bi projeyên 'hevpariya pir-pişkdarî've, bi têra xwe bêwate kirine. Girîng e mirov bibîne ku karker herku çûye hatiye daxistin nava rola şemitîna ku yekdestiya sermayeyê bi civakê ve girê dide. Çawa ku rola sosyalîzma pêkhatî, weke kapîtalîzma dewletê, dikare weke 'karkerekî tawîzkar' were pênasekirin, kapîtalîzma taybet a klasîk jî, karkerekî wê yê tawîzkar ê dirûv heye. Vana herdem di nava civakê de her bi hev re bûne. Civaka bermayî, civaka nekapîtalîst e, ku hatiye bîra Rosayê.

Eger mirov bala xwe bidê, li vê derê cewaziya kapîtalîst û nekapîtalîst, tê pênasekirin. Li gorî Rosayê herdu jî şêwyên civakê ne. Ez bi rengekî cewaztir dinirxînim kapîtalîzmê, ne weke şêweyeke civakê, lê weke şebeke, anku rêxistineke fireh, ku li ser civakê nirxa-bermayî diçirpîne, aboriyê zuwa dike, bêkariyê dizayîne, her wisa bi dewlet û desthilatiyê ve dikelije û emrazên xurt ên serweriya bîrdozî bikar tîne. Di vê dema dawî de, beşa karkerên tawîzkar jî tevlî vê rêxistingeriyê kirine. Dema ez naveroka şebekeya yekdestîperest careke din wisa pênase dikim, armanca min ew e ku ez gelek têgihîştinên şaş ji navê rakim. Bi taybetî, ez neçar im ku karakterê kemînê yê têgîna 'civaka kapîtalîst'deşîfre bikim. Bi zêdeyî qencîxwazî (lutufkarî) ye ku mirov navekî wisa li yekdestiya kapîtalîst bibexşîne. Sermaye dikare ancax şebeke, anku tora rêxistinî çêbike. Divê pirr baş were têgihîştin ku mafya jî şebeyeke bijarte ya sermaye ye. Yekane sedema ku şebekeya sermaye nikare were binavkirin weke mafya, ji ber hêza wê ya serwer a di nava civakê de û pêwendiyên wê yên bi desthilatiya fermî re ye. Nexwe, wê bimana weke şebekeyek, ku bi qasî mafya jî rêsayên wê yên etîk tine ne.

Divê ez vê mijarê jî bi girîngî lê zêde bikim ku ez sanyîger, bazirgan û çandyar, ên navîncî, weke kapîtalîst nahesibînim. Vana, tevî ku ji alî sermaye ve bi rengekî pir-alî hatibin dorpêçkirin, di pîvana mezin de ji bo pêdiviyên rasteqîn ên aboriyê ne û ew beş in ku hewl didin hilberînê bikin. Dîsa, ez danûstendina piçûk a meta ya li bazarê û yên ku van metayan di damûdezgehên xwe yên piçûk de pêk tînin jî, kapîtalîst nahesibînim. Ji xwe, xwezayî ye ku yên xwedî pişe (meslek) yên cûrbecûr, weke kapîtalîst neyên hesibandin. Tevahî karker, ên ji bilî beşa tawîzkar, her wisa gundî, xwendakar, karmend, zenaetkar, zarok û jin, stûna piştê ya civakê pêk tînin. Ez hewl didim vê pênaseyê, weke civaka ne-kapîstalîst, pêş bixim. Anku, dema ez dibêjim civaka nekapîtalîst, mebesta min ne ew civak e ku tê bilêvkirin bi têgînên weke feodal, cûreya Asya û nîv-feodal, ku pirraniya Marksîstan wisa dizanîn. Ez îqna bûme ku van têgînan, rastiyê nakim fêrkar, lê zêdetir perde davêjin ser wê. Ji xwe ez vê tehlîlê pêş dixim, ne tenê ji bo şebekeyên şermaye, ku li Ewrûpaya piştî sedsala 16. bûn navendî, lê di heman demê de di wergiriya tevahiya şebekeyên sermaye (bazirganî-siyasî-leşkerî û yekdestiyên bîrdozî, çandinî û sanayî) de, ku bi dirêjiya dîrokê nirxa-bermayî xesp kirine. Eşkere ye ku pêdivî zêde bi lêkolînê tine ye ji bo mirov bibîne ku sermayeya Fînans a kûrewî ya roja me ya îro, vê tehlîlê bi awayekî kartêker piştrast dike.

Di girîngiya kilît de ye ku mirov karakterê dij-sermaye yê xwezaya civakî bibîne. Civak di meşa xwe ya bi hezaran salî de dizanîbû ku daneheva sermaye xwedî bandora herî rizîner e. Ji bo mînak, hema hema ti ol tine ye ku mehkûm nekiribe faîzgeriyê, ku yek ji rêbazên herî bandorkêr ên daneheva sermaye ye. Nirxandineke pirr kêm e ku mirov bêje bêkarî, ku di roja me ya îro de wek aşûtê mezin dibe, ji alî sermaye ve hatiye pêşxistin, ji bo ku karkerên erzan û karkerên nerme biafirîne. Tevî ku milekî rastiyê ev e, lê sedema wê ya rastîn ew e ku sermaye, civakê bi xebatên ku li pey karê dide bezandin ve girê dide. Xebata ji bo kar-sermaye, misoger nagunce li gel pêdiviyên bingehîn ên civakê. Eger hilberîna ku ji bo têrkirina civakê bê kirin karê nehîne, tew ne xema

sermayeyê ye ku civak ji ber birçîtî û hejariyê qir bibe -ji xwe bi milyonan mirov di roja me ya îro de di vê rewşê de ne-. Ji bo mînak, eger mêjer (mîqtar) a sermayeya di dest de, li çandiniyê hinekî were razandin, wê pirsgirêka birçîtiyê qet nemîne û nebe. Lê tam berevajî ye; sermaye, çandiniyê bi berdewamî vala dike û xira dike. Sedema vê ew e ku rêjeya karê ya di çandiniyê de, yan qet tine ye, yan jî pirr kêm e. Dema ku ji pere di mêjera dêwane de pere tê qezenckirin, ti sermayedar çandiniyê nahizire. Di karaktêrê sermayeyê de qet cî tine ye ji ev cûre raman re . Berê dewlet, weke yekdestî, pirr alîkarî dida çandiniyê. Lê, di beranberiya wê de jî, weke berhem yan jî pere û bac, digirt. Lê, piyaseyên niha yên sermaye, xebatên dewletê yên bi vî rengî jî bêwate kirine. Di rewşa berevaj de, wê dewlet nikaribin xwe rizgar bikin ji mayîna rûbirû bi îflasê re.

Wate, sedema ku sermaye, gewdeya hîmî ya civakê herku çûye bekar û hejar hêştiye, ne ji ber polîtîkayên demborî ne, lê ji ber karakterê wê yê pêkhateyî ye. Dikare bi hêsanî bê têgihîştin, bi çavdêriyeke ji rêzê, bêyî ku pêwîstî bi lêkolînê hebe, ku her çend mirov bixwaze bi berdêla pirr erzan jî kar bike, wê vê yekê nikaribe bêkariya di nava civakê de çareser bike. Ez dîsa dibêjim ku pêwîst e baş were zanîn ku wê civak nikaribe ji bêkarî û hejariyê rizgar bibe, heya ku polîtîkayên kardarî yên damezrandî li ser nirxa-bermayî û sîstema wê ji holê ranebin.

Nexwe, ji bo mînak, çima ewqas bêkarî, birçîtî û hejarî heye li deştên Mezopotamya, ku bi dirêjiya dîrokê gelek civakan têr kirine û ev panzdeh hezar sal in ku ji civaka neolîtîkê re dayîktî dikin? Yekane pêdiviya van deştan û mirovên wan, eger pêngaveke hilberînê ya ne bi armanca karê were plankirin ku wê karibin di pîvanên roja me ya îro de bîst û pênc milyon mirovan bi hêsanî xwedî bikin û bi ser re jî bihêlin, ew e ku ev dest, ne ku destê sermaye ku mirovan nade xebitandin, berevajî, ev dest (qet ferq nake ku taybet be, yan bi destê dewletê be), ku sedema bêkarî, birçîtî û hejariyê ye, pêsîra wan berde. Yekane tişta ku pêdivî pê heye, ew e ku ax û destên kedkara/ê rasteqîn bigihîjin hev; şoreşa heşmendî ya civakî, ku firset bide vê yekê, were pêkanîn; exlaq û polîtîkayên civakî, weke tevn û organên bingehîn, ji nû ve bêne gihandin erkên xwe; her wisa siyaseta demokratîk, ji ber van sedeman, bi çar destan û çar çavan, bi mejiyên rasteqîn ve were bezandin erka xwe.

## 5. Pirsgirêka Civakê ya Sanayîgerî (Endustriyalîzm)

Mirov dikare diyar bike ku şoreşa sanayî, ku bi qasî şoreşa çandinî girîngiya wê heye, di dawiya sedsala 18. û destpêkên sedsala 19. de li ser bingeha danehev a dîrokî ya bi hezaran salan, hilpekîneke wesfî çêkir û heya roja me ya îro rêveçûna xwe ya daketin û hilhatinê didomîne. Nikare were texmînkirin bê ka wê li ku derê, kînga û çawa raweste û were rawestandin. Ev şoreş, xwedî taybetmendiyeke weke peqîna aqilê analîtîk e û ji xwe berhema vî aqilî ye. Di bin serweriya misoger a sermayeyê de ye. Bê gûman sermaye bi xwe, bi pirranî, ne nûvekar (îcadker) a emrazên sanayî ye. Lê, ji bo ku wan veguherîne bo emrazên sermayeyê, herdem bi lezgînî li ser wan rawestiye û, yên ji bo xwe pewîst, xistiye bin mulkiyeta xwe. Hilberîna rêze û erzan, derfeteke mezin a pêşketinê ye ji bo civakê. Her wisa sanayiya di xizmeta civakê de jî, weke aqil, hêja ye. Pirsgirêk ne di sanayî bi xwe de ye, lê di şêwaza wê ya bikaranînê de ye. Sanayî (endustrî), heman weke derfeta nukléarî ye. Dema bi sûda yekdestiyan bê bikaranîn, dibe ku veguhere bo emrazek, ku ji felaketên ekolojîk heya şeran, herî zêde gef li jiyanê bixwe. Ji xwe bikaranîna wê ya bi armanca karê, weke di roja me ya îro de bi têra xwe diyar bûye, rûxana jîngehê bilez kiriye. Di rasterêya civaka ferazî de bilez, rê dide

kudandin. Şûna organên mirovan, bi lez, robotbûn digirin. Eger wisa biçe, wê mirov bi xwe bibe nepêwîst.

Nêrîna hevbeş e ku tew di awayê îroyîn ê jîngehê de, ne tenê jiyana civakê, lê jiyana tevahiya zîndeweran ketiye bin gefê. Pêwîst e bi girîngî bê kirpandin ku tam jirêderxistinek e ku sanayî weke diyarde, bi tena serê xwe, ji ber vê rêveçûnê, weke berpirsyar were ragihandin (îlankirin). Sanayî, bi tena serê xwe, derfeteke nêtar (notr) e. Sanayiyêk, yekparekirî bi sedemên hebûnî yên civakê re, dikare misoger rola destnîşankar bileyîze, da ku cîhan, ji bo mirovan, heta ji bo tevahiya jiyanan, were kirin Xwezaya Sêyemîn. Potansiyeleke wisa di xwe de werdigire. Eger wisa bibe, pêwîst e mirov sanayiyê bihomîne jî. Lê belê, eger bi giranî têkeve bin kontrola kar-sermaye, dibe ku cîhanê ji bo tevahiya mirovahiyê, ji bilî çengekî yekdestîperest, veguherîne dojehê jî. Ji xwe rêveçûn, di roj me ya îro de hînekî jî wisa ye. Nikare bê înkarkirin ku vê rêveçûnê, mirovahiyê xistiye nava endîşeyên kûr. Weke yekdestiya sanayî, li ser civakê împaratoriyên rasteqîn damezrandiye. Li beramberî tenê yek serweriya super a DYE, bi dehan serwerên sanayîgeriyê hene. Eger serwerê siyasî-leşkerî were rawestandin jî, wê nikaribe serwerên sanayîgerî bi hêsanî bênê rawestandin. Ji ber ku êdî ew jî bûne kûrewî. Eger welatek, weke navend, lê teng were, dikare tavilê mekanekî û welatên nû yên dîtir, bike navendên xwe. Ma mirov çi dizane ku împaratoriyeke sanayî ya DYE, Çînê jî ji xwe re sibe weke navend nebijêre? Tê çavdêrikirin ku, piştî ku merc zêdetir berdar bin, vê yekê îro jî hêdî hêdî gengaz e.

Sanayîgerî li ser kevçika dilê çandiniyê xistiye. Çandinî, ku hêmana sereke ya civaka mirov e û navîgana wê ya hebûnê ye, li hemberî sanayî, rûxaneke mezin dijî. Ev xebata pîroz, ku panzdeh hezar sal in ku mirovahiyê dide jiyandin, di roja îro de bêxwedî hatiye hêştin. Amadekarî çêdibin ji bo ku ji serweriya sanayî re were hêştin. Têketina sanayî, ya barkirî bi kar-sermaye, nava çandiniyê, weke tê texmînkirin, nikare were şîrovekirin weke hilberîna rêze û hilberîna zêde. Wê bi genan bileyîzin û bi vî rengî wê ax, ji alî yekdestiyên sanayî ve were xistin nava rewşeke dayîktî ya weke bergirtina xwedestî (sûnî). Çawa ku bi avikekî (sperm) biyanî, ducanî (hemîletî) û dayîktiyeke bijûndar gengaz nîne; di heman demê de berkirina axê bi tovên leyîstî bi genên wan, wê nikaribe têxe rewşa dayîktiyeke baş. Yekdestiyên sanayî, li hemberî çandiniyê, xwe ji vê harîtiyê re amade dikin. Dîroka mirovahiyê, belkî jî wê dij-şoreşa herî mezin di çandiniyê de bijî û heta dest bi jiyîna wê kiriyê jî. Ax û çandinî; ev herdu ne tenê navgîneke hilberînê û pêwendiyên wê ne; lê di heman demê de perçeyên hebûna civakê ne, ku jê venaqetin û mirov nikare bi wan bileyîze. Civaka mirov bi giranî li ser ax û çandiniyê hatiye avakirin. Dema mirov wê ji van mekanan û hilberînê qut bike, ev tê wateya ku mirov wê rûbirû dihêle ji derbeya herî mezin re, ya li hemberî hebûna wê. Rastiya bajêr, ku wek qansêr mezin dibe, vê xeteriyê, tew ji niha ve, bi hemû tazîtiya xwe raxistiye ber çavan. Rizgarî, bi şîmaneya mezin û di rêjeya mezin de, di tevgereke berevaj de tê dîtin: Tevgera vegerê ya ji bajêr bo ax û çandiniyê. Diyar e wê dîrûşma sereke ya vê tevgerê, bi vê şêweyê bê destnîşankirin: “ji bo hebûnê, yan çandinî û ax, an jî tunebûn”. Kar-sermaye, bi rêya sanayiyê, ax û çandiniyê bi hevdu re nake yekpare, û wan bi pêwendiyên dostane û sîmbiyotîk bi hevdu ve gire nade; lê nakokiyên bi qasî çiyan dixe navbera wan û bi vî rengî wan dike dijminên hevdu.

Nakokiyên çînî, etnîkî, netewî û bîrdozî yên di nava civakê de, dibe ku heya pevçûnan û şeran biçin. Lê vana, ne nakokiyên wisa ne ku nikaribin ji holê bêne rakirin. Çawa ku bi destê mirov hatine avakirin, her wisa dikarin bêne belavkirin jî. Nakokiya di navbera sanayî, weke navgîna sermaye, û ax û çandinî de, kontrola mirov derbas dike. Ax û çandinî, bi dirêjiya bi milyonan salan,

xwe weke ekolojîk amade kirine. Eger bêne xirakirin, nikarin bi destê mirov bêne avakirin. Çawa ku hilberîna axê, ne bi destê mirov e, afirandina berhemên çandinî û zîndewerên dîtir-ji bo mînak nebatan- jî bi destê mirov, ji bo niha gengaz nîne û nikare bê payîn ku gengaz jî bibe. Ji xwe ev gengazî, bi awayê mirov, pêk hatiye. Wate û derfeta dubarekirina ya/yê pêkhatî tine ye.

Ji ber ku mijareke kûr a felsefî ye, ez ê zêde nekevimê. Lê çawa ku fîrewn xwestiye pêşeroja xwe bi mezelên weke pîramîdan amade bike, şêwaza sanayîgerî jî, ku mirov dike robot, nikare pêşerojeke zêde jînbar biafirîne. Ev, li hemberî mirov jî bêrêzî ye. Dema hebûneke biheybet weke xweza li holê ye, dikare çi wate û girîngiya robot û kopyayên wê hebin? Li vê derê careke din harîtiya sermaye ya ji bo karê, derdikeve pêşberî me. Em bêjin ku robotan hilberînên herî erzan pêk anîn: ey baş e, ma wê bi kêrî çi bin, eger bikarhênerên wan nebin? Sanayîgerî di vî alî de pêkera herî bingehîn a bêkarkirina civakê ye. Sermaye, çeka sanayiyê tim bikartîne ji bo ku hem karkerên herî hindik bide xebitandin û hem jî bi fiyetên erzanbûyî, li gorî dile xwe bi piyaseyê bilîze (manîpule bike). Aloziyên xwe (aloziyên ji ber hilberîna zêde), ku pêkerên bingehîn ên fiyetên yekdestîperest û bêkariyê ne, dike jênerevîn. Di encam de malên riziyayî û bi milyonan mirovên bêkar, birçî û hejar dibin qurbanên van aloziyan.

Xwezaya civakê, dikare ancax xwe di nava girêdaneke tund a bi jîngehê re, ku berhema bi milyonan salan û ya mekanê guncav e, bide berdewamkirin. Ti çêbûneke sanayî û harîqaya gerdûnê, nikarê şûna jîngehê bigire. Trafîka li erdê, li hewayê, li deryayê û li fezayê, ji niha ve gihîştiye rehendên felaketê. Sanayî, ku bi sotemeniyên fosîlan dimeşe, av, hewa û jîngehe bi berdewamî jehr dike. Beranberiya van hemû felaketan, daneheva karê ya du sed salî ye. Gelo ev danehev, şayanê (layîqê) ewqas rûxanan bû? Tew yekûna şeran jî ew rûxana ku ji ber vê yekê hatiye jiyîn, nekirine; her wisa hundabûna can, ku hatiye dayîn, ne bi destê mirov û ne bi destê xwezayê; ji ber ti cûre bûyer, nehatiye dayîn.

Sanayîgerî, weke bîrdozî û emrazeke yekdestîperest, yek ji pirsgirêkên herî bingehîn a civakê ye. Pêwîst e bi kûranî were jêpirsîn. Tenê wan xeteriyên ku derxistiye holê, ji bo vê bes in. Eger ev cinawir zêdetir mezin bibe û ji kontrolê derkeve, dibe ku jêpirsîna wî û girtina tedbîrên pêwîst derbarê wî de, dereng û bêwate bibin. Ji bo ku mirov nehêle ku civak ji xwebûna xwe derkeve û bibe civaka ferazî, êdî tam ew dem hatiye ku mirov vî cinewarî ji destê yekdestiyan derxîne; pêşî, wî kedî bike û paşê wî bike dostê xwezaya civakê.

Dema li hemberî sanayîgeriyê têkoşîn bê kirin, veqetandina pêkhate û bikaranîna bîrdozî ya yekdestîperest a teknîka sanayî û şêwaza pêkhate û bikaranîna wê ya guncav li gel berjewendiyên gelemperî yên civakê, erka herî girîng a xebata zanistî û têkoşîna bîrdozî ya bi vê armancê ye. Nikare were payîn ku bigihîjin armancên xwe wan komên îdea dikin ku têkoşîna li hemberî sanayîgeriyê, serbixwe ji rewşa wê ya civakî û çînî, li ser bingeha mirovperwerî (humanîstî)yê, dikin. Van koman, wek objektîv, ketine nava rewşa berevajî armancên xwe û nikarin xwe rizgar bikin ji ketina nava rewşa xizmetkirina ji sanayîgeriyê re. Sanayîgerî, ji ya tê texmînkirin, zêdetir di karakterê bîrdozî, mîlîtarîst û çînî de ye. Di warê bîrdozî de zanist û teknîk e. Heta rehendên herî xeter ên zanist û teknîka ku bi vê armancê di bikaranînê de ye dinimîne. Cinawirê sanayî, ne ku bi tena serê xwe derketiye holê. Em bînin bîra xwe: Bûrjuwaziya Îngilîstanê, dema berê xwe da pêşxistina pêngava emperyalîzma dîrokî li giravê, li Ewrûpa û li cîhanê, çîneke wisa bû ku hem sanayîgeriyê birêxistin dikir û hem jî wê bi rengekî herî berfireh û zû bikar dianî. Sanayîgerî, pişt re

bi dorê, bû çeka hevbeş a hemû bûrjuwaziyên welatan. Serweriya burjuwa, ku pêk hat di nava sêmendiya fînansî-bazirganî-sanayî de, di sedsalên 19 . û 20. de, ku sedsalên herî zêde yên sanayî ne, vê rastiyê bi eşkereyî îspat dike.

Karl Marks û tevgera sosyalîst a pêkhatî, civaka ne-kapîtalîst, weke paşverû îlan kirin û peymana bi burjuwaya sanayî re weke stratejîk pesend kirin; mixabin, vê yekê bûye sedem ku bibin ya herî trajîk, belkî jî ya sereke, ya wan tevgerên ku di dîrokê de, bi zanebûn nebe jî, ketin nava rewşa berevajî armancên xwe, heta weke objektîv, tên wateya xiyanetê. Heman weke peymana ku Xirîstyaniyê, ku bi dirêjiya sê sed salan ola aştiyê bû, bi dewlet û desthilatiyê re çêkir, bû sedem ku weke objektîv, û bi pirranî jî bi zanebûn, bikeve nava rewşa berevajî armancên xwe û xiyanet li wan bike. Xirîstyanî jî, di tehlîla dawî de, ketiye nava rakêşerî (cazîbe) ya yekdestiya desthilatî û bi vî rengî ketiye nava rewşa berevajî armanca xwe ya derketinê û nekariye xwe ji bûyîna ola şaristaniyê rizgar bike. Lê, yê di Îslamiyetê de bûye, hîn dema Hz. Mihemed dijiya, dest bi pêkhatinê kiriye. Di encam de, li hemberî sanayiya desthilatiyê têk diçin.

Tevahiya mirovahî, eger di roja îro de, bi navê jîngehê, mîna ku saetên qiyametê nêzîk bibin, destpê kiriye feryad dike, neçar e ku rehendên civaka-dîrokî û çînî yên vê bûyerê, di ronahiya tevgerên mînak ên dirûv de têbigihîje, wan weke tevgerên hebûna civakê pesend bike û weke tevgereke pîroz a olî ya nû têbikoşe. Çawa ku gengaz nîne ku agir bi agir bê vemirandin; her wisa bêyî jêpirsîna jiyîna di avzêl/mexeriya sanayîgerî de û bêyî devjêneberdanê jî, nikare têkoşîna ekolojîk bê meşandin. Eger em nexwazin trajediyên nû yên Xirîstyanî, Îslamî û sosyalîzma pêkhatî bijîn, pêwîst e em wane (ders) ji wan derxin û têkoşîna zanistî-bîrdozî û exlaqî-polîtîk, bi rengekî rast bigirin dest.

### 6. Pirsgirêka Civakê ya Ekolojîk

Eşkere ye ku pirsgirêka sanayîgerî, hem perçeyek pirsgirêka ekolojîk e, hem jî sedema wê ya herî bingehîn e. Şîrovekirina wê di bin sernivîseke cewaz de, dibe ku bê wateya dubarekirinê. Lê ekolojî, mijarek wisa ye ku ji sanayîgerî zêdetir wate derdibirre, civakî ye û bipirsgirêk e. Tevî ku ev têgîn, wateya zanista jîngehê di xwe de werdigire, di bingeh de zanista tehlîla pêwendiya tund a di navbera pêşketina civakî û jîngeha wê de ye. Dema ku pirsgirêkên jîngehê alarma felakete lê dan, [ekolojî] bi giranî kete rojevê; tevî ku wateyên fikare di xwe de werdigire, hate kirin şaxekî cûda ya lêkolînê. Ji ber ku ew jî, weke sanayîgerî, ne pirsgirêkek wisa ye ku ji alî civakê ve hatibe afirandin, her wisa weke marîfeta dawî ya yekdestiyê, bi awayê pirsgirêka herî berfireh, ketiye rojeva dîrokê, cîhanê û civakê.

Belkî jî ti pirsgirêk, bi qasî yên ekolojîk, di wê girîngî û giraniyê de nebûne ku rûyê rasteqîn ê pergalên kar-sermayeyê (şebekeyên rêxistî), li tevahiya rojeva mirovahiyê bidin rûniştandin. Yekûna (bîlançoya) sîstema şaristanî ya kar û sermaye (bi dirêjiya dîrokê weke yekûna tevahiya yekdestiyên leşkerî, aborî, bazirganî û olî), ne tenê ji her milî ve bûye ji hevdeketina civakê (bêexlaqî, bêpolîtîkayî, bêkarî, enflasyon, fûhûş û wekî vana), di heman demê de bûye ku jîngeh jî tevlî jiyana hemû zîndeweran, ketiye bin xeteriyê. Ma em dikarin dijberiya yekdestîperestî ya civakê, ji van rastiyan kartêkertir, bi çi îspat bikin?

Civaka mirov jî, her çend xwezayek e ku para wê ya zeka û nermeyî, li gorî hemû zindewerên din, weke ya herî bilind tê naskirin, di tehlîla dawî de hebûneke zindî ye. Cîhanî ye.

Berhemeke peresana atmosfera  avhewayê, her wisa cîhana nebatan û lawiran e, ku bi rengekî pirr hestyar hatine rêkûpêkkirin. Rêkûpêkiyên ku atmosfer û avhewa, her wisa cîhana nebatan û lawirên cîhana mê pê ve girêdayî ne, ji bo civaka mirov jî, ku yekûna tevahiya wan e, derbasdar e. Van rêkûpêkiyan pirr hestyar in. Bi tundî girêdayî hevdu ne. Hema hema zincîrekê pêk tînin. Çawa ku dema xelekekê zincîrê qut bibe, rewşeke bêerk derdikeve holê; her wisa çawa ku dema xelekeke cidî ya peresanê qut bibe, wê bibe jênerevîn ku tevahiya peresanê jê bandor bibe. Ekolojî zanista van pêşketinan e. Ji ber van sedeman jî pirr gîring e. Dema rêkûpêkiya navxweyî ya civakê, ji ber her çi sedem be, bişike, dikare bi destê mirov, ji nû ve were rêkûpêkkirin. Ji xwe di encam de, rastiyên civakî, ew rastî ne ku bi destê mirov hatine avakirin. Lê belê, jîngeh ne wisa ye. Eger bi marîfeta hin komên ku ji çavkaniya civakê ne, hîn rasttir, ji nava civakê derdiketine û li ser wê, bi yekdestiya kar-sermaye, xwe birêxistin kirine, ji xelekên jîngehê qutbûnên cidî çêbibin, dibe ku felaketên peresanî, bi awayekî zincîrane, tevahiya jîngehê, di vê navberê de civakê jî, bi qiyametê re rûbirû bihêlin.

Di vê neyê ji bîrkirin ku xelekên jîngehê, bi peresana milyonan salan çêbûne. Rûxanên pênc hezar salên dawî bi gelemperî û yên du sed salên dawî bi taybetî, qutkirina bi hezaran xelekên bi milyonan salan ên peresanê, di şîl (beş)a vî zemanî (vê demê) de, ku mirov dikare wî weke kurttir bihesibîne, pêkanînê. Reaksiyona şkestinê destpê kiriye. Nikare were pêşdîtin (texmînkirin) ka wê çawa bê rawestandin. Pêşbînî tê kirin ku ew qirêjiya li atmosfere, ku di serî de rêjeya karbondîoksît ($CO_2$) û gazên dîtir bûne sedema wê, bi awayê xwe yê heyî, bi dirêjiya bi sedan, heta bi hezaran salan jî, nikare were paqijkirin. Belkî jî encama rûxanên li cîhana nebatan û lawiran, bi wateya tam, darketine holê. Lê, eşkere ye ku herî kêm bi qasî [yên li] atmosferê, nîşana S.O.S (Hawar)ê didin. Qirêjiya deryayan û rûbaran, her wisa çolbûn, ji niha ve hatine ber sînorên felaketê. Hemû nîşander nîşan didin ku, eger wisa biçe, qiyamet wê ne ji ber encama bêhevsengiya xwezayî be, lê wê bi destê komên xwe rêxistî bi awayê cûre şebekeyan, bi civakê bê jiyandin. Elbet, ji vê rêveçûnê re, bersivên ku xweza bide, wê hebin. Ji ber ku ew jî zindî ye û xwedî zeka ye. Yên wê jî, sînorên wê yên xwe ragirtinê hene. Wê berxwedana xwe di cî û dema xwe de nîşan bide. Lê ew, dema ku cî û zemanê wê bê, wê li hêsirê çavên mirovan mêze neke. Ji ber ku wê hemûyên wan berpirsyar bêne dîtin ji xiyanetkirina li nirxên ku ji şiyanên wan re hatine bexşandin. Ma pêşbîniya qiyamet jî, wisa nehatibû kirin?

Li vê derê, armanca min ne ew e ku ez li senaryoyên felaketê, yên nû zêde bikim; lê armanc ew e ku em bi berpirsyariya pêwîst, weke her yek endama/ê civakê ku divê teqez berpirsyar be, û bi feraseta xwe ya erkên exlaqî û polîtîk ku sedama hebûna me ne, di rêjeya şiyanên xwe de, ya/yê pêwîst bêjin û bikin.

Di dîroka mirovahiyê de gelek tişt têne vegotin derbarê serencam (aqûbet)a Nemrûdan û Firewnan de, ku xwe vekişandine qele û pîramîdên xwe. Sedema wê eşkere ye. Çawa be, her yek ji Nemrûd û Fîrewnan jî, hem weke kes, hem weke pergal, YEKDESTÎ bûn, ku îdeayên xwedayî di xwede werdigirtin. Belê, di çaxa destpêkê de mînakên herî biheybet ên yekdestiyên sermayeyê bûn, ku timî li pey karê dibeziyan. Çawa jî didirûvin (dişibin) yekdestiyên ku di bajarên niha de xwe vekişandine MEYDANAN (PLAZAYAN)! Di navberê de, elbet, di cewher de nebe jî, di şêweyê de cewazî hene. Qele û pîramîd, tevî hemû biheybetiya xwe, nikarin bi meydanên roja me ya îro re têkevin hemberiyê (pêşbirkê). Ji xwe di alî hêjmar de qet nikarin têkevin hemberiyê. Hêjmara tevahiya fîrewnan, eger hûn berhev  bikin, diyar e ji niha ve sed hezaran derbas kiriye. Di çaxên berê de mirovahî nekarî xwe rabigirta li hemberî giraniya çend Nemrûd û Fîrewnan û ew qas bi

berdewamî axînî û nalînî kir. Ey baş e, ma wê hîn çiqas xwe ragire li hemberî giraniya bi sedhezarên wan, ku tevahiya jîngehê û civakê hildiweşînin? Hwer wisa, wê çawa aşt bike wan êş û axînên ji ber ewqas şer, bêkarî, birçîtî û hejarî, ku bûne sedema wan?

Dema em dibêjin ku civaka-dîrokî yekpareyî ye, her wisa me xwest ku em di ronahiya peresanê de jî van rastiyan bînin ziman. Ma, vana rastiyên negirîng û hindek yeman in?

Zanista modernîteya kapîtalîst, bi pêkhateya xwe ya pozîtîvîst, bi xwe pirr bawer kir. Wer zanî ku vedîtinên mezin ên diyardeyî, her tişt in. Rastiya teqez (heqîqeta mûtlaq), weke pêkhatî ji agahiya serkî (rûxarkî) ya diyardeyan hesiband. Bawerbû ku hatiye ketin nava pêvajoya pêşveçûna bêdawî. Lê, mirov dikare çawa şîrove bike, ku felaketa jîngehê ya di bin poza xwe de pêşnedît? Her wisa, mirov dikare çawa şîrove bike, ku di derbarê tevahiya felaketên civakî yên çarsed salên dawî de, di serî de şer, ku hemûyê dîrokê derbas kirine, çareyên bikok pêşnedît û wan nexist pratîkê? Em li milekî bihêlin astengkirina wê ya şer, ku weke desthilatî, xwe çirpandiye nava tevahiya çavikên civakê, gelo divê mirov ji netespîtkirina wê ya rast re, çi bêje? Zanist, di çaxa zaliya mezintirîn a serweriya yekdestî de, bi pêkhateya xwe ya ku dorpêçana bîrdozî herî zêde dijî û ji xizmeta sîstemê re ahengiya herî baş pêk tîne, eşkere ye ku, berevajiyê tê texmînkirin, wê nekarîbûya bersiv bida van pirsan. Zanist, ku pêkhateya wê, armanca wê û şêwaza wê, weke bi armanca rewakirina sîstemê hatiye ragihandin û rêkûpêkkirin, nîşan daye ku nikare bi qasî olan jî bandorker bibe. Lê, pêwîst e mirov têbigihîje ku zanista ku nebîrdozî be, tine ye. Ya/yê girîng ew e ku mirov têderxe ka weke bîrdoziya kîjan civak û çîn zanîn e û zanist e û li gorî vê, şûngeha wê destnîşan bike. Ekolojî, weke yek ji zanistên herî nû, eger şûngeha xwe di vê çarçoveyê de destnîşan bike, dikare bibe hêza çareseriya îdeal a, ne tenê jîngehê, her wisa, ya xwezaya civakî jî.

## 7. Pirsgirêkên Zayendperestiya Civakî, Malbat, Jin û Şênî

Têgihîna jin, weke cûre mirovek ku cewaziya wê ya biyolojîk heye, dibe yek ji serekeya sedemên bingehîn ên korîtiya di mijara rastiya civakî de. Cewaziya zayendî, bi tena serê xwe, nikare bibe sedema ti pirsgirêkên civakî. Çawa ku dubendiya di her piçik (zerre) a di gerdûnê de, di ti hebûnewer de, weke pirsgirêk nayê girtin dest, her wisa dubendiya di hebûnewera/ê mirov de jî nikare weke pirsgirêk bê nirxandin. Bersiva ku ji pirsa “gelo çima hebûnewer dubendî ye?” re bê dayîn, dikare ancax bibe felsefî. Tehlîla ontolojîk (zanista hebûneweran) dikare li bersiva vê pirsê (ne pirsgirêkê) bigere. Bersiva min ev e: mirov nikare bi cûreyek dîtir heyîna hebûnewerê, ji bilî dubendiyê, pêk bîne. Dubendî, şêwaza gengaz a hebûnê ye. Eger jin û zilam bi awayên xwe yên heyî nebûna û di şûna vê de bêzayendar bûna, wê dîsa jî nekarîbûna xwe ji vê dubendiyê rizgar bikarana. Ew bûyera ku jê re tê gotin cot-zayendîtî jî ev e. Pêwîst e mirov neheyire (şaş nemîne). Lê, dubendî tim meyldar in ji bo xwe bi rengekî cewaz çêbikin. Her wisa mirov dikare di meyla vê dubendiyê de bigere li bingeha ku ji zekaya gerdûnî (Geist) re jî weke delîl lê bê gerîn. Herdu aliyên dubendiyê ne baş in û ne jî xirab in; lê tenê cewaz in û neçar in ku cewaz bin. Eger dubendî bibin weke hev, wê heyîn nikaribe pêk were. Ji bo mînak, bi du jinan yan jî bi du mêran, nikare pirsgirêka xwe zêdekirina hebûna civakî bê çareserkirin. Lewre, nirxa pirsa “çima jin yan zilam? nîne, yan jî eger li bersiva vê pirsê bê gerîn, mirov dikare bersiveke felsefî bide: Gerdûn divê (neçar e, di wê meyle de ye, di wî aqilî de ye, di wê arzûyê de ye) ku wisa çêbibe, loma.

Lêkolînkirina jin, weke kombûna têkiliyên civakî, ji ber vê sedemê, ne tenê watedar e, lê ji bo derbaskirina (tehlîlkirina) girêyênkor ên civakî jî, pirr girîng e. Şikandina korîtiya derbarê jinê de, wisa ye ku, heman weke ku mirov atomê perçe bike, ji ber ku nêrîna serwer a zilam bexşangî qezenc kiriye. Ji bo şikandina vê korîtiyê, pêwîst dike ku mirov hewldanên mezin ên rewşenbîrî pêş bixe û zilamtiya serwer birûxîne. Her wisa pêwîst e mirov di enî (bere) ya jinê de jî, ew jina ku hema hema ji xwe re kiriye şêwaza heyînê û di rastî de weke civakî hatiye avakirin, tehlîl bike û ewqas jî birûxîn e. Hemû şikestinên xeyalan ku hatine jiyîn di nekarîna xistina jiyanê utopya, bername û rêgezan, ên di serkeftin an ne-serketîbûnên tevahiya têkoşînên azadî, wekhevî demokratîk, exlaqî, polîtîk û çînî de, şopên şêweya têkilî (ya di navbera jin û mêr de) ya serwer (a bi desthilatî), ku nehatiye şkandin, di xwe de werdigirin. Têkiliyên ku tevahiya newekheviyan, koletiyan, zordarî (destpotî)yan, her wisa faşîzmê û milîtarîzmê xwedî dikin, çavkaniya xwe ya sereke, ji vê şêweya têkiliyan digirin. Eger em bixwazin li wan peyvên ku navên wan pirr derbas dibin, her wekî wekhevî, azadî, demokrasî, sosyalîzm, derbasdariyên ku nebin sedema şkestina xeyalê, bar bikin; pêwîst e ew tora têkiliyên ku li derdora jinê hatine honandin, ku bi qasî civak û xwezayê kevn in, were ji hevxistin û perçekirin. Ji bilî vê, wekî din ti rê nîne ku mirov bibe azadiyê, wekheviyê (ya guncav li gel cewaziyan), demokrasiyê, ya rasteqîn, û exlaqek ku dûrû nebe.

Ji dema derketina xerarşî û pê ve, li zayendperestiyê, weke bîrdoziya desthilatî, wate hatiye barkirin. Ji nêzîk ve bi çînîbûn û desthilatîbûnê ve têkildar e. Tevahiya lêkokîn û çavdêriyên arkeolojîk, antropolojîk û yên rojane, nîşan didin ku heyamên wisa hebûne ku jin çavkaniya otorîteyê bûye û van heyaman li demeke dirêj belav bûne. Ev otorîte, ne otorîteya desthilatî ya sazbûyî li ser berhema-bermayî ye, berevajî, otorîteyeke wisa ye ku çavkaniya xwe ji berdarî û zayokiyê digire û heyîna civakî bihêz dike. Zekayan hestî, ku bandora wê di jinê de zêdetir e, bi vê heyînê re xwedî pêwendiyên xurt e. Sedema ku jin di şerên desthilatî de, yên sazbûyî li ser berhema-bermayî, ciyekî zêde diyarker negirtiye û şêwaza we ya heyîna civakî, bi vê rewşa wê ve têkildar e.

Vedîtin (keşf)ên dîrokî û çavdêriyên rojane bi eşkereyî nîşan didin ku zilam di pêşketina desthilatî de, ya pêwendîdar bi pergala xerarşî û dewletî re, rola pêşeng lîstiye. Ji bo vê, pêwîst dikir ku otorîteya jinê, ku heya qonaxa dawî ya civaka neololîtîkê pêşketî bû, bihata şikandin û derbaskirin. Dîsa vêdîtinên dîrokî û çavdêriyên rojane piştrast dikin ku li ser vê, têkoşînên mezin, ên şêweya wan cûrbecûr û dema wan dirêj, hatine kirin. Bi taybetî mîtolojiya Sumer, heman weke hema hema bîrewerî (hafiza) ya dîrok û xwezaya civakê, xeylî (gelek) ronakker e.

Dîroka şaristaniyê, di heman demê de dîroka hundakirin û hundabûna jinê ye. Ev dîrok bi xweda û bendeyên xwe ve, bi ferwerdar (hukumdar) û rajêr (tebaa)ên xwe ve, her wisa bi aborî, zanist û hunera xwe ve, dîrokêk wisa ye ku têde kesayetiya serwer a zilam zexm bûye. Lewre, hundakirin û hundabûna jinê, bi navê civakê, ketin û hundakirina mezin e. Civaka zayendperest, encama vê ketin û hundakirinê ye. Zilamê zayendperest, dema serweriya xwe ya civakî li ser jinê ava dike, ewqas dilbijok (biîşteh) e ku her cûre miziş (temas)ê, dike pêşaniyeke serweriyê. Hertim têkiliya serwerî hatiye barkirin li diyardeyeke biyolojîk weke têkiliya zayendî. Zilam qet ji bîr nake ku li ser jinê bi hewaya serkeftinê mizişa zayendî (temasa cinsî) çê kiriye. Di vî milî de xûy(adet)ekî pirr xurt wergirtiye. Dinya xwedê (gelek) bêje nûvedaye (îcad kiriye), herwekî “ez şiyam/bi ser ketim”, “min karê wê qedand”, ‘dêlik/qancûx’, “kêm neke li zikê wê cehşik, li pişta wê doqik (çov)!”, ‘fehîşe, orispî’, ‘lawê mîna qîzan’, “tu qîza xwe serbest bihêlî, wê bireve ber yan daholvan, yan zirnevan”, ‘serê wê, tavilê girê bide- wê zû mar bike’ û wekî vana, bi rengekî bêhêjmar çîrok û

xeberoşkên dirûv têne vegotin. Pirr eşkere ye bê ka pêwendiya zayendî û desthilatî di nava civakê de çawa bandorker e. Rastiyeke sosyolojîk e ku tew di roja me ya îro de jî, her zilam li ser jinê xwedî mafên bêhêjmar e, 'mafê kuştinê'jî têde. Van "mafan" her roj têne bikaranîn. Têkilî, bi pirraniya raser, di karakterên taciz û tecawizê de ne.

Malbat, di vê pêwendiya civakî de, weke dewleteke piçûk a zilam, hatiye avakirin. Sedema xurtbûna berdewamî di dîroka şaristanî de ya saziya ku jê re tê gotin malbat bi şêwaza xwe ya heyî, ji ber wê hêza mezin e ku dide emrazên desthilatî û dewletê. Ya yekemîn, malbat li derdora zilam tê desthilatîkirin û bi vî rengî tê kirin şanika (hucreya) civaka dewletê. Ya duyemîn, xebitîna bêbergîdan a bêsînor a jinê, tê xistin bin misogeriyê. Ya sêyemîn, zarokan mezin dike û bi vî rengî, pêdiviya şêniyê dabîn dike. Ya çaremîn, weke modêla rolê, koletî û ketîbûnê li tevahiya civakê direşîne (belav dike). Malbat, bi vê naveroka xwe ve, di rastî de bîrdoziyek e. Ew sazî ye ku bîrdoziya xanedaniyê têde sazbar dibe. Her zilam, xwe di malbatêde weke xwediyekî xanî, têdigihe (dibîne). Sedema ku malbat, weke rastiyeke pirr girîng, tê têgihîn, ji ber wê yekê ye ku vê bîrdoziya xanedaniyê pirr çalak e. Jin û zarokên malbatê çiqas pirr zêde bin, zilam ewqas ewlehî û anûr (rûmet) qezenc dike. Her wisa girıng e ku mirov malbatê, bi awayê wê yê heyî, weke saziyeke bîrdozî binirixîne. Eger hûn jinê û malbatê, bi awayên wan ên heyî, ji bin sîstema şaristaniyê, her wisa ji bin desthilatî û dewletê bikişînin, wê bi navê pergalê li dû, pirr hindik tişt bimînin. Lê, berdêla vê şêwaza heyî, şêwaza heyîna jinê ya biêş, hejar, ketî û têkçûyî, ya di bin rewşa şerê berdewamî yê di kûraniya kêm de ye, ku naqede. Hema hema duyemîn zincîreke yekdestî jî ya dirûv û parelel li gel a ku, yekdestiyên sermaye bi dirêjiya dîroka şaristaniyê li ser civakê dane berdewamkirin, 'yekdestiya zilam'a li ser cîhana jinê ye. Hem jî yekdestiya wî ya xurt a herî kevn e. Eger mirov heyîna jinê, weke cîhana mêtingeha herî kevn, binirxîne, wê vê yekê mirov bibe encamên hîn rasteqîntir. Belkî jî ya herî rast ew e ku mirov ji bo jinan bêje, gelê mêtingeha herî kevn ku nebûye netew (milet).

Modernîteya kapîtalîst, tevî hemû xemlandinên lîberal, çawa ku ew statuya ji kevn ve mayî nekiriye azad û wekhev, bi ser re jî erkên lêk (zêde) li jinê bar kiriye û wê girtiye bin statuyeke girantir ji ya kevn. Statuyên weke erzantirîn karker, karkera malê, karkera bêmize, karkera nermeyî, xizmetkarî û wekî vana, nîşan didin ku rewşa wê zêdetir giran bûye. Bi ser re jî, weke hebûnewera herî magazînel û navgîna reklamê, îstîsmarbûna wê zêdetir hatiye kûrkirin. Tew bedena wê jî, weke navgîneke kedxwariya herî cûrbecûr, di asta meta de tê ragirtin, ku sermaye dev jê bernade. Navgîna tehrîka berdewamî ya reklamgeriyê ye. Bi kurtasî, nûnera herî berdar a koleya/ê nûjen (modern) e. Ma mirov dikare bihizre malekî hêjatir û bûhatir ji navgînek bêsînor a zewqê û ji koleyek ku bi mirov herî zêde bide qezenckirin?

Pirsgirêka şênî, ji nêzîk ve pêwendîdar e bi zayendperestî, malbat û jinê re. Zêdetir şênî, zêdetir sermayeyê. 'Jinîtiya malê', karxane (fabrîka) ya şêniyê ye. Her wisa em dikarin jê re bêjin karxaneya hilberandina malên, anku 'haveynên' herî bûha ji sîstemê re, ku pêdiviya wê herî zêde bi wan heye. Mixabin, malbat di bin serweriya yekdestîperest de hatiye xistin nava vê rewşê. Dema ku hemû zorî û dijwarî bi jinê têne kirin, nirxa mal jî, ji sîstemê re diyariya herî hêja ye. Şêniya ku zêde dibe, herî zêde jinê perîşan dike. Di bîrdoziya xanedaniyê de jî wisa ye. Malbatperestî, weke bîrdoziya herî guzîde ya modernîteyê, qonaxa dawî ye ku xanedanî xwe gihandiyê. Van hemû mijaran bi zêdeyî yekpare dibin bi bîrdoziya dewlet-netewperestî re jî. Ma çi dikare hêjatir be ji gihandina berdewamî zarokan ji dewlet-netewê re? Zêdetir şêniya dewlet-netew, tê wateya zêdetir

hêz. Wate ku sedema peqîna şêniyê, berjewndiyên jiyanî yên tund ên yekdestiyên sermaye û zilam in. Zorî û dijwarî, qehr, kêferat (derd û kul û keser, keder, kerb, xem), heqaret, êş, tewanbarî, hejarî, birçîtî û hwd. ji jinê re; kêf û qezenca wê jî, ji 'beg'ê wê û sermayedarê wê re ne . Di dîrokê de ti serdem, bi qasî ya roja me ya îro, ew hêz û ezmûnê nîşan nedaye ku jinê weke navgîneke pir-alî ya kedxwariyê, bikar bîne. Jin, weke mêtingeha pêşîn û paşîn, kêliya herî hestyar (krîtîk) a dîroka xwe dijî.

Di rastî de, hevpariya jiyanê, ku bi jinê re, bi felsefeyeke bikok a barkirî bi azadî, wekhevî û demokratî were rêkûpêkirin, di wê şiyanê de ye ku xweşiyê, başiyê û rastiyê di asta herî têkûz (tûmandar) de pêk bîne. Ez, weke kes, jiyîna bi jinê re di nava statuyên heyî de, bi qasî ku pirr bi pirsgirêk dibînim, ewqas jî kirêt, xirab û şaş dibînim. Jiyîna bi jinê re di bin statuya (rewşa) heyî de, mijarek e ku ji zarokatiya min û vir ve têde wêrekiya min herî lewaz e. Ya mijara gotinê jiyanek e, ku wê ajoyeke pirr xurt a weke ajoya zayendî jêpirsîn bike. Ajoya zayendî, ji bo xatirê berdewamkirina jiyanê ye. Harîqayeke xwezayê ye, ku pêwîst e pîroziya wê hebe. Lê yekdestiyên sermaye û zilam, jinê ewqas qirêj kirine ku, ev şiyana harîqaya xwezayê, hatiye veguherandin bo saziyek ku, mîna 'karxaneya haveynî' metayên herî pispayebûyî hildiberîne. Dema ku bi van metayan civak tê serûbinkirin, jîngeh jî di bin giraniya şêniyê de (ji bo niha şeş milyar e; em jîngehê bi şêniya deh, pêncî milyarî bihizirîn, eger bi vê lezayiyê biçe) kêlî bi kêlî rûxanê dijî. Bê gûman, dema mirov bi jinekê re bibe xwedî zarok, di cewher de bûyereke pîroz e; nîşandera wê yekê ye ku wê jiyan neqede. Bêdawîtiyê bi mirov dide hîskirin. Ma dikare hestekê ji vê hêjatir hebe? Her yek cûre, di bin vê rastiyê de, heyecan (coş) a xwe berdana ji bêdawîtiyê re dijî. Lê ev rewş di mirovê roja me ya îro de di asta, weke hozanek dibêje, "haveyna me, belaya serê me", de tê jiyîn. Nikare were înkarkirin ku em careke din bi bêexlaqî, kirêtî û şaşîtiya mezin a yekdestiyên sermaye û zilam re rûbirû ne, ku dijberî Xwezaya Yekemîn û Duyemîn in.

Ya/yê bi destê mirov hatiye avakirin, dîsa dikare bi destê mirov were xirakirin. Li vê derê, ya mijara gotinê, ne zagoneke xwezayê ye û ne jî çarenûs (qeder)ek e. Her wisa, yên mijara gotinê, rêkûpêkkirinên malxirab ên yekdestiyan in, ku destên şebeke, yên zilamê fenek (qurnaz) û xurt û yên jiyana biqansêr û bihormon in. Min tim wê kûraniya jiyanê ya hevwatebûna cota herî harîqa biqasî dikare bê zanîn ya di gerdûnê de, bi kûranî hîs kiribû. Min wê wêrekiyê nîşan da ku ez girîngiya hizirîna bi jinê re destpêkê, her wisa pê re gotûbêjkirina li ser ka li ku dere, kînga û çiqas xirabûn hebe û derbaskirina wê, deynim pêşiya hemû têkiliyan. Tenê jina ku xurt be, bihizire, karibe biryarên baş, xweş û rast bide, dema bi vî rengî min derbas bike, karibe min heyranê xwe bihêle û karibe bibe muxetaba min, bê gûman yek ji kevirên koşe yê lêgerîna min a felsefî ye. Min tim bawer kir ku wê sirrên herikîna jiyanê ya li gerdûnê, bi vê jinê re, bi aliyên wê yên herî baş xweş û rast re, wate bibîne. Her wisa min bawerî bi exlaqê xwe jî anî, ku bi qasî ku ti zilam nikaribe bi ser bixe, şêwaza min a heyînê bi malê li pêş min ê 'zilam û sermaye' re, anku bi hurmuza xwedî not hezar şî re, qet par neke. Wê demê têgîna, ji femînîzmê jî wêdetir, 'jîneolojî'(zanista li ser jinê), dibe ku armancê çêtir pêşwazî bike.

## 8. Pirsgirêka Civakê ya Bajarbûn

Medenîbûn, ku navekî din ê şaristaniyê ye, di zimanê Erebî de di wateya 'bajarbûn'ê de ye. Pirsgirêkên ji ber sedema bajarbûnê, ji pirsgirêkên ekolojîk, ne hindiktir in û ji wan ne kêmtir girîng in. Di roja me ya îro de, yek ji çavkaniyên bingehîn ên gefa li hemberî jiyana civakî ne. Gelo çi ye, ya/yê ku bajêr xistiye vê rewşê? Formulên bi feraseteke dûz ên bajar=çîn=dewlet, dibe ku rewşê basît bikin. Lê, kûranî û pir-alîtiya wateyê kor dikin. Mirovahî, avakirina bajêrjî bi qasî avakirina gund, guncav li gel xwezaya civakê hiziriye û pêk aniye. Bajêr di serê wan mekanan de tê, ku têde zekaya civakî kom dibe. Bajêr şiyana zeka ya di mirov de sor (tehrîk) dike û wê derdixe holê. Aqil, seyreke pêşketinê ya xeylî pêwendîdar bi bajêr re, şopandiye. Bajêr ew mekan e ku mirov têde têderdixe bê ka hêza wê/wî bi çi dikare. [Bajêr] ewlehî tîne. Ya/yê bi xwe ewle (bawer) be, bêhtir rasyonel (biaqil) dihizire. Hizir (raman) rê li ber vedîtinên nû vedike. Rêbaz û teknîkên zêdebûna berhemê pêş dixe. Mirov[ahî], ku vana ceribandiye, bajêr, weke çavkaniya roniyê dîtiye û hertim xwestiye ku bibeze wê derê. Sedema pêşketina bajêr li dora perestgehê, ew e ku perestgeh di demên xwe de ew cî bûne ku têde aqil û giyan (ruh)ên pîroz kom dibûn. Civak li wê derê aqilê û nasnameya xwe pirr zêdetir vedibîne (keşf dike) û wan diafirîne. Van tiştên em qala wan dikin, rabêj (feraziye/hîpotez) ên xurt in ku bi sûda bajêr in.

Rûyekî din ê bajêr jî, we bi zayîna xwe re, weke her rastî, xwe bide xuyakirin: çînbûn û dewletbûn. Bingeha daringî (madî) ya çînbûnê, bê gûman berhemdarî ye, ku zêde dibe. Hin aqilmendên bajêr, ku pêş ketin, bi ezmûnên xwe fêr bûne ku, eger hêjmara mirovan zêde bikin û wan li axên berdar bidin xebitandin, wê karibin qatbiqat mirovan têr bikin. li dû, ya dimîne, damezrandina vê sazgerînê (mekanîzma) ye. Pergal (sazgerîn) dewlet e, ku weke cûreyek yekdestî ye. Ev rêxistina nû ya pergalê, di asta bajêr de jî be, eşkere ye ku weke yekdestiya çandinî zaye. Bajarên Sumer di vê mijarê de her tişî rave dikin. Gelek şaristanî, yên weke Misir û Harappa, di zayînên xwe de, yekdestiyên çandinî ne û emrazên rêkûpêkkirina hilberînê ne. Dema ku hilberîna têr/bes bigihîje herî kêm asta ku karibe berhema-bermayî ya lêk li zêdebûna yek-qatî ya xebatkaran pêşkêş bike, ev tê wateya ku bingeha daringî (madî) ya dewletê zaye. Ew bûyera ku jê r tê gotin 'dewlet', di rastî de ew kes in ku debara xwe bi hilberîna zêde dikin. 'Dibe ku bêhtir watedar be ku mirov ji dewletê re bêje, rêxistina berhevkirina ya zêde. Bajêr ew mekan e ku ji bo vê jî guncav e. Pêwendiyên bi vî rengî di civakên qebîle û gund de ta radeya dawî zor in. Pêkhateya qebîle û gund, rê nade vê yekê. Sedema ku dewlet di bajêr de dize/diafire, ev rasti ye. Bi vî rengî, mirovahî li bajêr rastî diyardeya mêtinê tê. Nasdariya xwe bi şêweyek pêwendiya ku nas nake re, çêdike. Êdî navê nû yê hunerê, dibe, 'dewletperestî'. Ma bi çi nikarin, yên ku wê bidest bixin! Dibe mezintirîn deriyekî berjewendiyê. Tew kole û karker jî têgihîştine ku di bêkariya nava dewletê de, ji ya berê zêdetir rihet û biewle ne. Wê bibe nitrandêrî ku mirov xebîtîna wan, bi tevahî bi zorê re têkildar bike. Çîroka zayîna bajêr, kêm-zêde wisa ye.

Eşkere ye ku bajêr, tevî ku hin pirsgirêkên wî (mêtin û rêxistina yên bihêz) hene, di pêşketina rasyonel a civakê de gaveke şoreşane pêk tîne. Arîsto, şêniya îdeal (herî guncav) ji bo meziniya bajêr, weke pênc hezar, dihizire. Şêniya bajarên di heyama damezrîna xwe de jî, bi pirranî, ev e. Têkela nû ya mirovan mijara gotinê ye. Civaka qebîleyî hatiye derbaskirin. Yên ji qebîle û nijadên cewaz tên, bi pabenda ku em jê re dibêjin 'hemwelatiya bajêr', bi hevdu ve têne giredan. 'Gelê bajêr', 'hemşerî'û 'bajarî'çêdibin. Vê pêşketinê nîşan dide ku civak zengîn dibe. Bajêr, bi vî awayê xwe, navgîna pêşketinê ye. Çavkaniyeke cidî ya pirsgirêkan nîne. Mirov zêde çavdêrî nake ku di tevahiya çaxa destpêkê de bajarên pirsgirêkên wan ên şêniyê hebin -carna Babîl û Roma, ne têde-.

Bajêr, bi raseriya xwe ya civakî, rakêşî (cazîbe)ya xwe, bi berdewamî zexm dike. Dema modêla sumer xwe weke aşûtê zêde dike, Misir bajarên hindik û cewherîn ava dike. Di rastî de şaristaniya Misir, weke şaristaniyêke nîv-bajar û gund, di dîrokê de bêhempa ye. Bazirganî û zenaetkarî pirr pêş dikevin. Pêkhateya li derdora perestgehê, bi avahiyên xwe yên rê, avasazî/mîmarî, spor/werzîş, huner û serayan, ber bi tevnên nû ve fireh dike. Gelek bajar jî li derdora garnîzonên leşkerî têne avakirin. Bi taybetî her yek ji garnîzonên Romayê, dendika bajêr in. Dîroknas vedibêjin ku di vê demê de ji her deh gundan re, herî kêm bajarekî dikeve. Anku, di navbera wan de pêwendiya sîmbîotîk (sûda berhember) heye. Wate ku di navbera gund û bajêr de henûz pirsgirêk nîne.

Roma, bajarê biheybet ê dawî yê çaxa kevn, belkî jî tevahiya pirsgirêkên çaxa xwe guhastibû nava singê xwe. Vê yekê jî Romayê kiribû bajarê şaristaniyê yê hem herî biheybet, hem jî yê herî bipirsgirêk. Mirov dikarîbû rastî tevahiya çînan û komcivakan (arîstokrasî, burjuwazî, koleyan, proletarên (pale) tolaz, her cûre komên etnîkî, her cûre komên bawerî û her cûre nijad) bibûya. Çîn û komcivakên kevn, bi awayê bermayî/jêmayî û yên nû, bi awayê rûşeym/cenîn dihatin nimandin/nimandin/temsîlkirin. Li milê dîtir, mirov dikarîbû rastî her cûre şêweyên exlaq, polîtîka û rêveberiyê bihata. Hemû mînakên qraliyet, komar û demokrasiyan (di wergiriya împaratoriyê de) dihatin ceribandin. Her wisa mirov dikarîbû rastî mînakên zanist, huner, felsefe û olan, bi hemû awayên wan ên bermayî/jêmayî û rûşeym/cenîn, bihata. Roma bi rastî jî bajarekî ekumenîk (gerdûnî) bû. Her wisa wateyek a ku ‘hemû rê di Romayê re derdikevin’, ev rastî bû. Lûtkeya şaristaniya navendî ya sêhezar û pênc sed salî diteyîsand. Rûxîna wê jî, bi awayekî şayan (layîqî)î heybeta wê bû. Xirîstyanan, ku çîna hejaran bû, û komên etnîsîteyê (wê mirov bi termînolojiya şaristaniyê bixape, eger mirov ji vana re bêje ‘barbar’), ku henûz bihêziya xwe diparastin, ku du hêzên mezin ên derdê (belaya) serê şaristaniyê bûn, wê bi awayê pêlên ji hundir û derve, dawiya vî bajarî anîbana. Dîroka (mêjûya) 476 P.Z., ne tenê dîroka rûxîna bajarekî, anku Roma, ye; lê di heman demê de dîroka rizîn, hilweşîn û rûxîna, di kesayetiya bajarekî de, şaristaniya çaxa yekemîn û kevn a sê hezar û pêncsed salî ye.

Heyama ku tê binavkirin weke Çaxa Navîn, ti caran nekarî di alî bajarbûnê de xwe bigihanda çaxa kevn. Bajarê çaxa navîn, bi qele û bedenên xwe, yeknesak (monoton) û pirr piçûk destpê kir. Bajarên çaxa navîn, weke cûreyek biryargehên derebegî û mîrîtiyê bûn. Bi kombûna li derdorê hin zenaetkar û xizmetkar/qerwaşên serayan, potansiyela pêşketinê di xwe de werdigirtin. Zor e ku mirov rastî avabûnêm bajarên nû bihata, ku ku karîbûna xwe gihandibana mînakên bajaran, ku bêhtir kevnare ne, herwekî Roma, Îskenderiye, Antakya, Dara-Nisêbîn û Riha-Edessa, tevî ku çîna bazirgan, ji bo mezinbûn û biheybetiyê leza pêşîn dabe jî. Her çiqas di warê meziniya hejmarî de wan derbas kirine jî, di warên avahîsazî (mîmarî) û sazbariyê de (saziyên perestgeh, şano, meclîs, agora [meydan,qad û devera ku di heyna berê ya Yunan de gelê Sîteyê lê diciviya ji bo ku li ser siyaset, rêveberî û bazirganiyê mijûl bibûya, gotûbêjan bikira û hwd.], hîpodrom [meydana hespan ji bo pêşbirkê], amfîteatr [meydana gilor a şano li derve dorpêçkirî bi trîbûnên temaşevanan], hemam, kanalîzasyon [cok], kargeh û wekî vana), qet nekarîne xwe bigihînin biheybetiya (îhtîşama) yên kevn (berê). Çaxa Navîn, tiştekî weke şaristanî û bajarên wê ya kona (çadirê) ku hatibe vedan li ser xirbeyên (enqaz) çaxa yekemîn û çaxa kevn e. Bajar, henûz dûr bûn ji wê rewşa ku bibûna raserên çolter û gundan. Weke cûreyek giravokên di okyanusa avabûna gundan de bûn. Herçiqas di bûnyeya (nava) xwe de nakokiyên desthilatî û çînî werdigirtin jî, ne di wê rewşê de bûn ku bibûna sedema pirsgirêkên jîngehî. Sîstema şaristanî, weke gelemperî, ji ber sedema yekdestiya semayeyê, jîngehê

hêdî hêdî dikojand. Sedema şorbûna axê, ji ber yekdestiyên çandiniyê bû. Ev rewş, heya dawiyên sedsala 18. dewam kir û pirsgirêkan zêdetir giran kir.

Aloziya rastîn a ji ber bajarbûnê, weke berham şoreşa sanayî ya sed sala 19., anku weke sanayîgerî (endustriyalîzm) derkete holê. Ev, ne rasthatinî (tesadufî) bû, lê bi xwezaya dij-civakî ya sanayîgeriyê re têkildar bû. Aliyê herî girîng ê bajêr, ku di warê ekolojîk de pirsgirêk çêdike, ew e ku diyalektîkek qutbûyî ji jîngehê dijî. Gund di nava hemahengiyê de bi jîngehê re dijî. Bi her tiştê xwe ve pê ve girêdayî ye û dizane ku berhema wê ye. Bi lawir û bi nebatên xwe re, hema hema bi zimanê jîngehê diaxive û bi vî rengî jiyana xwe didomîne. Zimanekî hevbaş, anku zimanê çandiniyê hatibû çêkirin. Avabûna civakê, di bin bandora giran a vî zimanî de bû. Lê li bajêr, rewş berevajî ye; bajêr, herku diçe, ji çandinî û jîngehê qut dibe. Zimanekî nû, anku zimanê bajêr pêş dixe. Rasyonalîteke wî yê cûda heye. Herku diçe, bal (dêha)û pêwendiya wî bi zîrekiya jîngehê re lewaz dike. Zimanê bajêr, zimanekî pêwendîdar e li gel karûbarên bazirganî, zenaetî, sanayî û diravî (pereyî). Aqil û zanista vana çêdike û ji alî vana ve jî tê çêkirin. Pêşketina nû ya diyalektîkî ya ziman, wisa ye. Eşkere ye ku li vê derê ziman û heşmendiyeke binakok û barkirî bi biyanîbûnê, mijara gotinê ye. Bajarbûna wê demê, zarava û çandên ku civaka kevn a çolter û komcivakên berfireh ên klan, qebîle, eşîret, qewm û gundan dinimînin, digire nava xwe. Zimanekî xweser ê zanist, huner, ol û felsefeyê jî çêkiriye. Di hêla çînî de, du kategoriyên din ên sereke, weke arîstokrasî û yên dîtir, çêbûbûn. Bajêrvanî û bajarîtî henûz (hîn) kesayetî qezenc nekiribûn. Di rewşa nîçikek (berdewamiyek) a civaka giştî de bûn.

Sedsalên 19. û 20. vê hevsengî (denge) ya dîrokî bi temamı xira kirine. Bê gûman, ji nîşka ve nehatibûn gihêştin vê rewşê. Ji nû ve hilhatina bajaran (Venedîk, Cenova, Floransa, Mîlano û yên din) di navbera sedsalên 10. û 16. de li nîv-girava Îtalî, tê wateya ku di sedsala 13. de şoreşa bazirganî, bi rêya Îtalya hatiye guhastin bo Ewrûpa. Bajarên Îtalî pêşengiya pêvajoyê dikin. Dixwazin ku bi Ronesansê re di şopa Roma de dîsa mezin bibin. Di nava bajêr û navbera bajaran de hemberiyeke pirr dijwar tê jiyîn. A tê jiyîn, pevçûna li ser kirina pêşengî ji qonaxa nû ya şaristaniyê re ye. Tevahiya jiyana kevn, hema hema ji nû ve zindî dike. lê wê mercên nû, ew veguherînin. Wê Roma, bi zariyê (bi teqlîdê) nikaribe were afirandin. Ancax wê bihata gihîştin asta kopyayên jêbirî yên Roma. Her wisa, wê ceribandina qraliyeta navendî û dewlet-netew jî negihîştiba serkeftinê. Lê, bêgotûbêj e ku bajarên Îtalî, di navbera sedsalên 10. û 16. de bi navgîna Ronesansê ji şaristaniya Ewrûpa re seroktî kirin. Ev rol, hem weke dêr (katolîka ekûmen/gerdûnî) hem jî weke meyla laîk-sekular, hatiye leyîstin.

Şoreşa bajêr a Alman, di qonaxa pêşîn (destpêkê) de, bi yekîtiya bajaran a Hansatîk (nêzî 1250-1450 P.Z..), destpê kiriye û şoreşên xwe yên bazirganî pêk anîne. Heyama duyemîn (1400 P.Z..), bi qonaxa manîfakturel, diya dibe. Konfederalîzma bajaran li hemberî navendbûnê, têkoşînekî pirr dijwar dikin. Van têkoşîn û serhildanan, ku gelek komên gundî û nîv-karker û di bingeh de komek zenaetkar di wan de rol leyîstin, nêzîkî çarsed salan berdewam kirin. Piştî pêvajoyeke pirr bi xwîn, van yekemîn ceribandinên konfederalîzma demokratîk a çolter û bajaran, li hemberî meyla monarşiya navendîperest û dewlet-netewê, ji ber sedemên cûrbecûr (bîrdozî, rêxistinî, seroktî), têkçûn. Eger têk neçûna, dibe ku dîroka Ewrûpa, birengekî cewaz hatiba nivîsandin. Almanyaya federal a roja îro, ji faşîzma dewlet-netewa burjuwa, ber bi vê modêla kevn ve, weke peresanî, veguherîneke pirr hêdî (yawaş) dijî. Lê, ne weke konfederalîzma demokratîk; weke federalîzma burjuwa.

Peqîna rastîn, ji alî bajarên Holanda û Îngilîstanê ve hatin kirin. Sedema wê ew b û ku navendîtiya sê heb şoreşan bi hev re û bi rengekî kûr jiyan: Şoreşên bazirganî, fînansî (malî) û sanayî, di bingeh de li Amsterdam û Londonê gihîştin serkeftinê. Federalîzma komunal li herdu welatan jî bi hêsanî hate çewsandin. Gelê din ê bajêr û çolter, wisa bi hêsanî radestî navendê û dewlet-netewê nebû. Ji bo vê şoreşên 16. û 17. ên Holanda û Îngilîstanê pêwîst dikir. Amsterdam di sedsalên 17. û 18. de û London jî di sedsalên 19. û 20. de bajarên sereke yên van pêvajoyên şoreşane ne. Ev herdu bajar navendên cîhana çaxa nû ne. Sîstema şaristaniya navendî ya cîhanê, ku veguheraneke mezin derbas dikir, pêkhateya qansêrî (kanserolojîk), ya rastîn a bajêr, di vê demê de destpê kir. Bi pêkhateyên xwe yên merezdar (nexweşînok), bi dorê xwe guhastin bo Fransa, DYE, Ewrûpa ya Rojhilat, Rûsya, Rojhilata Dûr, Emerîkaya Başûr, Rojhilata Navîn û Efrîka. Sedsala 20., di dîrokê de ew ‘demajo’bû ku têde bajêr dest bi bidestxistina raseriya misoger kir û bi vî rengî şûna rola serekîn a cîhana paradîgmatîk a cîhana çolter a komunal, li gel a şaristaniya kevn, ku dozdeh hezar salan ajot, paradîgmaya kapîtalîst a bajarî digirt. Bajar, êdî ne tenê navenda bazirganî, fînansî û sanayî bû. Ev paradîgma, ku di serî de bi avahiyên xwe yên zanîngeh û zanista akademîk, bi nexweşxane û girtîxaneyên xwe û bi çîn û burokrasiyên xwe ve bi sazî bû, hewl dida li şûna paradîgmaya kevn a bi navenda eskatolojî (zanista axrêt, ûxrewîtî), xwe bi nêrîna tund a pozîtîv bike serwer. Pozîtîvîzm di rastî de ola çîna nû ya burjuwa bû. Lê bêhtir pratîk û serkeftî didît ku, bi rêya bixwevekirina maskeya ‘zanistaperestî’(bi rêya sûdwergirtina ji zanistên ku girîngiya wan bi rengekî awarte zêde dibûn), xwe pêşkêş bike.

Bi vê pêkhateya bajaran, civak bi rastî jî bi qansêra civakî ketîbû. Tew Arîsto jî bajarê xwedî şêniya deh hezar nesêwirîbû (xeyal nekiribû). Bajarên xwedî şêniya sed hezar, milyonek, pênc milyon, deh milyon, panzdeh milyon, bîst milyon û niha jî hedef bîst û pênc milyon e! Ma ev ne mezinbûneke rasteqîn a  kanserolojîk e? Ji bo tenê xwedîkirina bajarekî wisa, gengaz e ku welatekî navîncî, tevî jîngeha xwe ve, di demekê kurt de were tunekirin. Ti mantiqê vê mezinbûnê tine ye. Eşkere ye ku wê ti encam nede, ji bilî ku civak û bajêr, Xwezaya Yekemîn tevlî xwezaya wê ve birûxînin. Ti welat û jîngeh, tevî gelê xwe ve, nikare demekê dirêj xwe ragire li hemberî van mezinbûnên bajaran. Sedema rasteqîn a rûxîna jîngehê, ev mezinbûna qansêrî ye. Êdî bajêr, welatê xwe, tevî gelê wî ve, dadigire, vedigire, dirûxîne û hema hema wan dike mêtingeh. Hêzên nû yên mêtinger, bajar in; yekdestiyên kûrewî yên bazirganî, fînansî û sanayî yên li bajêr in û baregehên wan en li plazayan (meydanan) in. Tedbîrên ewlekarî yên van plazayan ku ji yên qele û bedenên berê pirr zêdetir in, vê rastiyê piştrast dikin.

Emperyalîzma sedsala 21. û mêtingeriya wê, êdî ne li derveyî welatan e, lê li hundirê (li nava) wan e. Mêtinger, ne tenê biyanî ne, lê bêhtir hevparên wan in. Ne tenê yekdestiyên sermaye bûn kûrewî, her wisa desthilatî û dewlet jî bûn kûrewî. Êdî cûdatiya hundir û derveyê desthilatiya kûrewî jî nema. Ti girîngiya xwemaliyên (aîdiyetên) netewî jî tine ye; hemû hevpar in. Her wisa wateya cûdatiyên leşkerî, aborî û çandî jî nema. Weke hevbeş: Îngilîsî zimanê wî; Anglo-Sakson çanda wî; Rêxistina peymana Atlantîka Bakûr (RPAB/NATO) rêxistina wî ya leşkerî; û netewên yekbûyî (NY/BM), rêxistina wî ya navnetewî ye. Êdî, ne yek, ne dido, lê gelek New York (navenda sermayeya DYE; di salên 1930yan de nobet ji Londonê hat dewrgirtin) û London hene. Em serdema bajarên kûrewî dijîn. Bajarên serdema kûrewî, ne tenê jîngehê bi lezayiya şanikên qansêrê tine dikin. Eger bi şêwaaza xwe ya heşmendî û jiyanê, yekê/a Merîhî bûya; diyar e wê ji wî kêmtir seyr (ecayîb) û ji wî zêdetir cîhanî hatiba hesibandin. Zadêganî/torînî ya bajarî, ku ji xwe zêde pêş

neketiye, hîn berî zayîna xwe, meriyeta xwe hunda kir (bû demborî). Bi pêşaneyên nûjenî û modayî, dixwaze cinawiriya xwe ya rasteqîn veşêre. Barbarê rasteqîn (faşîzm, nijadkujî, qirkirina çandî ya bêsînor û paşiya paşîn qirkirina civakê) bajêr e. Êdî her cûre kes û komên barbar (dîwane/şeydayên xeyaletê û civaka medyakêş, ên ferazî û zarîdar/teqlîdker/sîmulakr, ji fanatîkên sporê heya yên bi nexweşiya AIDS; ji partiyên dîwane/har heya komên tewş ên muzîkê;  ji burokrasiya tineker heya spekulatorên piyaseyê; ji yên nedilsozî ti rêgeza exlaqî heya yên robotbûyî, ku barbarê berê -ez qet bawer nakim ku qebileyên koçber barbar bin- bi mirov didin lêgerîn, ne ji navenda çolterê ne, lê ji navenda bajêr in û bajêr bi xwe ye.

Babîl (heyfa Babîlê, ji ber heya hilweşîna xwe hîn jî zadegan û pîroz bû. Bênifşbûyîn/dejenerasyon sînordar bû) ên çaxa nûjen têne jiyîn. Nikare bê rawêj(texmîn)kirin bê ka wê çawa dawî li wan were. Lê tevahiya daneyên zanistî nîşan didin ku wê rojger (planet) a me nikaribe vê cîhanê  (ev cîhana sosret ku xiyanet li xwe dike û her wisa biryardar e ku ekolojiya cîhanê tine bike) ragire. Tevî ku bar diki diçin  çolterê jî, heya her deren xwe, hem jî pir, merezdar (nexweşînok) in. Pêwîst e baş were têgîhêştin ku civaka bajêr di sînorên ‘qiracivakê’ de ye.

Bê gûman, ji ber vê rewşa bajêr, desthilatiya çînî û pêkhateyên dewletî berpirsyar in. Ranta tirsnak a bajêr, wan kir barbarên bêman û bi vî rengî cinawariya bajêr (Levîathanê nû) afirand. Eşkere ye ku tevahiya gelê û civaka bajêr, nikarin ji vê yekê berpirsyar bêne girtin. Lê, li gel a/ê hişk, a/ê terr jî dişewite. Berbajar (waroş), anku ‘Xirîstyanên nû yên bajêr’, neçar in ku rêyekî bidozin (bibînin). Nexwe, bêgav (mehkûm) in ku ji şewitîna ji alî bi hezaran Neronan ve, yên xetertir ji Neron, xirabtir rewşan bijîn. Pêwîst e mirov rizgarkirina bedewî (xweşîkî) ya bajêr û exlaq û aqilê wî, ku sînordar mane, bihizire. Divê êdî her projeya civakî, pirsgirêkên ku çavkaniya wan bajêr in (ji mêj ve merezdar/nexweşînok bûne), bigire navenda xwe. Qet nikare were paşçavkirin ku mirov ancax di vê çarçoveyê de dikare çareseriyên watedar ji bo tevahiya pirsgirêkên civakî û ekolojîk pêş bixe. Em ji ber rûxîna cîhanê û civakê, li sedemên dîtir negerin; yên ku çavkaniya wan bajêr in, bi serê xwe, vê rolê ji niha ve, bi zêdeyî dileyîzin.

### 9. Pirsgirêka Civakê ya Çîn û Burokrasî

Yên li çîn û burokrasiyê, weke mercên hebûna civakî binêrin, dibe ku pirsgirêkkirina di vê mijarê de bilomînin (li wan neyê rûniştin). Dikare were îdea kirin ku dibe pirsgirêkên ku çîn û burokrasî dibin sedemên wan, hebin; lê dibe ew bi xwe weke hebûn, nebin pirsgirêk. Lê pêwîst e bê têgîhîştın ku pêkhteyên, herî kêm bi qasî bajêr, bi pirsgirêk in. Çîn û burokrasî jî, heman weke bajêr, dibe ku di çaxên pêşîn ên şaristaniyê de zêde giranî û pirsgirêk çênekiribin. Her wisa dibe ku pêkhateya wan a bi pirsgirêk, ber bi roja me ya îro ve, bi rengekî zelaltir derketibe holê. Lê dîsa jî çînbûn, weke heyîn û burokratbûn, weke têkîldarî vê, hebûnên bi pirsgirêk in; her wisa hebûnên wisa ne ku di hêla exlaqê û polîtîkaya civakî de ne pêwîst in. Civak li hemberî van herdu  pêkhatebûnan, demekê dirêj li ber xwe da. Herduyan jî wisa bi hêsanî nepejirand û wan bi berxwedanên tund pêşwazî kir. Dîrok bi çîrokên van berxwedanan tijî ye.

Xwezaya civakî, di hêla cewaziyan de, weke em ê di beşên pêş de bi berfirehî li ser rawestin, dibe ku guherîn û şêwen mezin wergire. Vana pêşketinên asayî ne (normal in) û guncav in li gel giyana civakê. Lê belê, bi raya min, di xwezaya civaka mirov de jî çîn û tebeqebûnên pirole, mayînde û bêerk (ên ti sûda wan tine ne), ku weke gireyek (ûr) xwe diçirpînin nava heya tevnên civakî, ne pêwîst in, heman weke hin tevnên ku di cûreyên nebat û lawiran de pêş neketine û pêwîstî

pê nehatiye dîtin ku pêşbikevin, ji bilî çîn û tebeqebûnên (burokrasî jî tebeqe ye) ku ciherengî û cewaziyê watedar bikin û weke perçeyek ji wan, pirr sînordar, demî û sazbar bin. Keşîş,arîstokrasî û pêşketina çînî ya burjuwa, ku demekê dirêj hin sûdên biçûcik gengaz bikin, dibe ku bi feraset bêne pêşwazîkirin. Lê gengaz nîne ku vana, bi karakterên xwe yên mayînde, zordar û mijokdar, mîna hêzên serwer ên bîrdozî, siyasî, aborî û leşkerî, weke bi dirêjiya dîroka şaristaniyê, di hêla exlaqê û polîtîkaya civakê de, bi feraset bêne pejirandin. Nakokiya di vî milî de antagonîst e. Ji ber ku çîn û bukrasî, bi van awayên xwe, tên wateya înkara exlaqê û polîtîkaya civakî. Mercê ku ez didim pêş, pirr girîng e. Gengaz in çîn û burokrasiyên ku di wê taybetmendiyê de bin ku cewaziyeke wan hebin, yan jî tevkarî li wê [cêwaziyê] bikin. Ji bo mînak, gengaz nîne ku mirov, ew perestgeha ku ji alî çîna keşîşên Sumer ve hatibû afirandin, bi tevahî bê erk bihesibîne. Keşîşan hîmên bingehîn ên zanist, hilberîna berdar, bajêrbûn, ol, zenaetan û pergalê li vê derê danîn. Çîna keşîşan di gelek derketinên çandî de rola dirûv leyîst. Sedema ku feraseta mercdar ji keşîşan re hete nîşandan, ji ber vê erka wan a erênî ye. Lê, bi awayên xwe yên qestbûnê, nesazbar û mezinbûyî bi rêngekî pirole, rewatiya wan tim gengeşeyî ye û pêwîst dike ku bêne derbaskirin.

Ji bo Arîstokrasiyê jî, mijarên dirûvî vê, derbasdar in. Di warên pergala ku ji pêşketina civakî re pêşkêş kirine, xebata bendar, zerafeta rêveberî û tevkarî li huner û zanistê de, rolên wan çêbûye. Feraset di vê çarçoveyê de ye. Lê qestbûn û despotbûna dirûv ku dibin sedem; her wisa çêkirina wan a xanedanî û qraliyetan, heta xwe xwedakirinên wan, merezî (nexweşî) ne û nikare bêne pejirandin. Exlaqê û polîtîkaya civakî, bi van pêşketinan re di nava nakokiya antagonîst de ye. Lewre, pêdiviyeke exlaq û polîtîkaya rast e ku bi têkoşînê bêne derbaskirin.

Ên têne vegotin, ji bo burjuwaziyê bêhtir derbasdar in. Di heyamên şoreşî de, tevkariya vê çînê û ya peşketina emrazên wê yên burokratîk, li pêşketina civakî çêbûye. Girtina wan a înîsiyatîv di pêşxistina sanayî û navgînên bazirganî û geranê (pere û sened) de, ceribandina wan a carcaran demokrasiyê û tevkariyên wan ên sînordar li zanist û hunerê; vana aliyên wan ên erênî ne ku pêwîst e feraset bê nûşandan. Lê pêkhataya wê ya pirole ya mayînde, ku ev çarsed salên dawî ne, hema hema ji tevahiya dîroka şaristaniya çînî zêdetir, rê li ber çînbûn û burokratbûnê vekiriye û vana weke şanikên qansêrê zêde kiriye, ji tevahiya çînbûnên jorîn zêdetir e û bêhtir xeter e. Burjuwazî û burokrasî, ku di dîroka çînbûnan de naverastê dagir kirine, di paradîgmaya min de di rola qansêrê de ne. Xwezaya civakî ne destdayî ye ji bo ku xwe li hemberî ev cûre çîn û burokrasiyê ragire. Eger bê ferzkirin, ez ê jî bêjim “ha ji te re faşîzm!” Pêneseyeke dîtir a faşîzmê, bi raya min, berteka xwezaya civakî ya li hemberî çîna navîn e (yekûna burokrasî û burjuwa). Berevajî wê, hîn rasttir e. Faşîzm, qesta çîna navîn a li hemberî civakê ye. Ya li vê derê tê îspatkirin ew e ku wê civak û çîna navîn, bi hev re nemeşin. Hin rewşenbîr, çîna navîn weke binkeya çînî ya rejîmên komar û demokrasiyê pêşkêş dikin. Yek ji propagandayên gerî derewîn ên lîberalîzmê jî ev pêşkêşî ye, Çîna navîn, çîneke wisa ye ku di înkara komar û demokrasiyê de rola wê herî zêde ye. Rola çînên din di vê de sînordar e. Wekî din, haya wan ji faşîzmê tine ye. Çîna navîn, bi vê rola xwe, bi bajêrbûna pirole re heman role dileyîze: Mezinbûna kanserolojîk. Ji xwe di navbera herduyan de girêdana tund a organîk û pêkhateyî heye. Çawa ku bajêr vê nexweşî(merezî)ya xwe, ji xuretî û mezinbûna çîna navîn digire, bajarên bi vî rengî jî çîna navîn hertim mezin dikin.

Çîna navîn,di hêla heşmendiyê de pozîtîvîst e. Anku pêkhateya wê wisa ye ku herî zêde ji kûraniya cewherîn bêpar e, her wisa ji rokirin û pîvana diyardeyan wêdetir nabîne û, li gorî pêdiviya berjewendiyên xwe, naxwaze bibîne.Tevî ku pozîtîvîzmê bi qilfa ‘zanistperestî’yê pêşkêş dike, çîna

herî pûtperest (pirrbûna peykeran di heyema vê çînê de weke aşûtê hatiye mezinkirin) a dîrokê ye. Di dîmen de laîk û dinyawî ye, lê di cewher de herî olperest û xeyalperest e. Olperestiya wê ya li vê derê, bawerî û ramanên ‘diyardeperest’ ên di radeya bawerhişkî (paşverûtî) de ne.Em dizanin ku diyardeperestî qet ne yekpareyiya rastiyê ye. Qaşo laîktiya wê ew e ku projeyên herî xeyalî (cûreyek projeyên axretê) yên di cewher de dijberî laîktiyê, bêyî ku fedî bike, her û her datîne pêşiya civakê. Çîneke wisa ye ku yekdestîperestiya aborî, siyasî, leşkerî, bîrdozî û zanista sernayeyê, di wergiriya kûrewî de pêş dixe. Lewre çîneke wisa ye ku dijberiya wê ya civakê herê zêde pêş ketiye. Qira civakê û nijadkujiyê, bi du rêyan dimeşîne. Gelan û komcivakan ji ber reseniyên wan, nijadên wan û olên wan ji holê radike û vê yekê jî bi karakterê wê yê çîna burjuwa ve gengaz bûye. Ya hîn xeternaktir, qirkeriya wê ya civakê ye. Bi du rêyan qirkeriya civakê dimeşîne: Rêya yekemîn ew e ku bi bîrdoziya dewlet-netew û sazîbûna wê ya desthilatî ve, weke mîlîtarîzm û şer, xwe heya tevahiya çavikên civakê ferz dike. Ev, şerê sertaserî yê desthilatî ye ku bi rêya yekbûna bi dewlete re li hemberî civakê dimeşîne Burjuwazî bi ezmûnên xwe dizane ku nikare bi cûreyekê dîtir civakê rêve bibe. Ya duyemîn, çalakiya afirandina civaka xeyalî û rawêjî (ferazî) ye li şûna civaka rastîn (heqîqî), ku hat xistin pekhatinê bi şoreşa ‘medya û înformatîk’, ku di nîv duyemînê sedsala 20. de peqîna xwe çêkir. Ev nîv-sedsala dawî, bi şêweya vî şerê duyemîn, bi serkeftî tê rêvebirin. Dema ku civaka xeyalî, rawêjî (ferazî) û zarîdar (sîmulakr/teqlîdker) têkeve şûna xwezaya rasteqîn a civakî û wisa bê hesibandin, di rola qira civakê de ye.

Ez aligirê wê yekê me ku kategoriyên kole, gundî (serf) û karker, ku di dîroka şaristaniyê de weke çînên bindest û metîngeh têne pêşkêş kirin, bi rengekî guherde bêne girtin dest. Rola subjetî û demokratî ya van çînbûnan pirr sînordar e; ji ber ku bi her tiştên xwe ve di nava avahiya zihnî û pêkhateyî ya afendiyên xwe de ne. Di rewşa pêvek an nîçikek negirîngkirî de ne. Mirov nebûye şahîd ku di dîrokê de ti çîneke subje efendiyên xwe hilweşandibe. Ev rewş rastiyeke girîng diteyisîne. Çiqilên çînî, tevî ku di wateya bindest û mêtingeh de jî bin, di gewde û dara gelemperî ya civakê de, di mesafeya guliyekê de ne. Gulî, ç,qas daşindile (xwar bibe) û jêbe jî, nikare bandora xwe li gewdeyê bike, yan jî ev bandor sînordar dibe. Ji ber vê yekê, bi navkirina civakê bi awayê civaka kole, efendî serf(gundî), arîstokrasî, karker û bujuwazî, ji hilberandina termînolojiyeke şaş re pirr vekirî ye. Divê zanista civakî di vê mijarê de binavkirin û pênaseyake nû pêş bixe. Çawa ku em nikarin darê bi guliya wê pênase bikin, em nikarin civakê jî bi çînên ji nava wê derdikevin, binav bikin. Wekî din, û ya girîngtir jî, ez bawer dikin ku nêzîkatiyên subjekirina çînan, weke kole, serf (pale, gundî), karker û burjuwaya piçûk, her wisa dayîna pesna wan û arastekirina li wan rolên girîng ên şoreşgerî, weke di serî de di dîroka sosyalîzma pêkhatî û anarşîzmê de bi zêdeyî hate dîtîn, ne encamgir e û sedema vê ew e ku nirxeke subjeyî û roleke şoreşgerî ya şaş li van çînan hatiye arastekirin. Helwesta rast ew e ku mirov li hemberî her cûre çînbûnan be. Belkî çîna karker û serf jî, weke koletiyê, di destpêkan de, di qonaxa bihuranê de, dema di nîv-civakê de (bi pirranî bi awayên zenaetkar û nîv gundî) rola subjektîv (kirdewar) û şoreşgerî ya erênî leyistibin û leyîstine. Lê ew jî di rêjeya ku mayînde bûne û mezin bûne de, dejenere bûne, bi çînên jorîn re li hev hatine û bê erk bûne.

Ya hîn girîngtir ew e ku nêrîneke ji bo azadî, wekhevî û cîhana demokrat, nikare bi rengekî erênî binêre li subjektivkirina van herdu cûre çînbûnan û li arastekirina  li wan nirxa exlaqî û polîtîk, li derveyî wateya cewazbûnê ya min qala wê kir. Herwisa divê çînbûnê, ji herdu milî ve, weke dijberî xwezaya civakê û dij-civak bibîne û li hemberî wê têbikoşe. Pêwîst nake ku pêkhatina vana

weke nirxên rewa û rast ên civakî bêne şîrovekirin. Çawa ku em hêmanên gire(ur)bûyî yên di bedenêkê de, weke ji bedena asayî (normal) nahesibînin, mirov dikare ji bo diyardeyên civakî yên li peşberî me jî şîroveyên dirûv bike. Bi ser de, tevahiya çînbûnên bindest û mêtingeh bi zora desthilatî û bi bîrdoziyên wan ên serwerî hatine pêkanîn. Em dikarin ancax mehkûm bikin wan koletî, serftîtî (gundîtî) û karkerî yên di bin van mercan de hatine pêkanîn, Eger mirov bêje "Bijî karker, gundî(serf) û kole yên navdar (pîroz)!",wê bibe, weke objeltîv, pesndayîn û pesend kirina hêzên desthilatî yên serwer. Ev cûre şîroveyên çînî yên gelek bizav(ekol) an, Marks û peyhatiyên wî jî te de, sedema herî bingehîn a bi serneketina wan e. Belkî wateyekê çînên jorîn ta radeyek hebe; lê helwesta herî rast ew e ku têkoşîn bê kirin ji bo ku wan çînkirinan bi berdewamî bêne mehkûmkirin, pesnê wan neyê dayîn û bêne derbaskirin, ji ber ku çînkirinên di nava xweydan û xwînê de bi zorê û bi îqnaya bîrdozî hatine çêkirin. Arastekirina rola subje li ya/yê ku nikaribe bibe subje û rola şoreşger li ya/yê ku nikaribe şoreşê çêke, nikare xwe ji têkçûnê rizgar bike, weke ku mînakên wan di dîroka têkoşînên civakî yên bi vî rengî de bi zêdeyî hatine dîtin. Sedema têkçûnê ew e ku pirsgirêk bi awayekî rast nehatiye têgihîtin û rola şaş li çînbûnê hatiye arastekirin.Têkoşînên civakî yên sedsala 21.ên dema nû, di rêjeya ku ji vê şaşîtiya bikok bizivirin de, dikarin bi ser bikevin.

Rast e ku burjuwazî pirsgirêka çînî giran kiriye. Berjewendiyên xwe yên çînî, heya çavikên herî zirav ên civakê, kiriye desthilat (desthilatbûn şerkirin e li hemberî civakê) û bi rêya dewletê, wan kiriye fermî; ev jî delîla wê yekê ye ku qonaxa xwe ya herî pêşketî dijî. Bi zêdeyî çavdêrî tê kirin ku gelek beşên civakê, di serî de tawîzkariya kerkeran,di bin navê 'hevpariya sermaye'de, kiriye aletê xwe. Heya mirov dikare beje ku hema hema civakê daqurtandiye. Lê dîsa jî, ew rastiya ku çîna herî bipirsgirêk e, heta ew çîn e ku civakê xistiye nava rewşa herî zêde bi pirsgirêk jî, zêdetir rast e.

Her çiqas rast be ku burokrasî, bi dirêjiya dîrokê amûra pêkanîna saziyane ya çînên serwer e, lê dikare bi hêsanî bê gotin ku ber bi roja me ya îro ve bi şêwegirtina xwe ya dewlet-netew a du sed salên dewî, zêdetir rehend wergirtiye, hema hema rola çîna serbixwe dilîze, giraniya xwe ya di desthilatî û dewletê de zêde kiriye û xwe weke dewlet bi xwe dihesibîne. Her wisa rastiyek e ku redkirina wê zor e ku bûye hêzekê giran ku civakê xistiye nava qefesa ji hesin û bi rêya destavêtina tevahiya qadên civakî (perwerde, tendurustî, darazî, gihanî, exlaq, polîtîka, jîngeh, zanist, ol, huner, abori), vê rola xwe zexm (pitew) kiriye. Di civaka roja me de (modernîteya kapîtalîst), ne tenê burokrasiya dewletê bûye hût (azman), lê hema hema cîhana yekdestiyên di şopa wê de, di bin navê "Em ji bûyîna hevpariya (şîrketa) malbatê derkevin û em bibin hevpariyên ku ji alî profesyonelan ve were rêvebirin", burokrasiyên xwe wek aşûtê nezin kirine. Mezinbûna pirole ya burokrasiyê, bi vê rastiya nû ya hevpariyan ve têkildar e. Her wisa mirov dikare ji wan re bêje cûreyek 'dewletbûna' hevpariyan. Bi rastî jî, di mercên ku dewlet-netew êdî têrê nake û avabûna nû ya dewletê di rojevê de ye, dewletbûnên hevparîtiyên kûrewî/global û herêmî, weke meyleke zal (hakim) di nava pêşketinê de ne.

Pirsgirêkên civakê, yên çavkaniya xwe ji van herdu maşeyan digirin, rojaneyî ne û hema hema 'niha'ya tevahiya dîrokê ne. Heta mirov dikare pêşdetir biçe û bêje ku ev dumendî xwezaya civakî (civaka kevneşopî), weke heştpî (extapot), di nava piyên xwe de ragirtiye, fetisandiye û helandiye jî. Encama ku ji vê derê bê derxistan ew e ku pêvajoyeke kaotîk a herî bialoz tê jiyîn; azadî, wekhevî û demokratîkî ya civakî ancax bi sîstemekê li ser hîmê şaristaniya demokrayîk gengaz dibe û vê yekê jî têkoşîna avakirina bi zanista sererastkirî pêwîst dike.

**10. Pirsgirêkên Civakê Yên Perwerde û Tendurustî**

Tevî ku weke mijareke zêde jî xuya bike, girîng e bêne têgihîştin wan pirsgirêkên perwerde û tendurustî, ku çêbûne ji ber sedema ku, heman weke zanistê, ketine destê yekdestiya desthilatî û dewletê. Çawa ku zanista dewletbûyî, navgîneke herî bandorker a serweriya bîrdozî ye; her wisa perwerde û tendurustî jî, ya yekbûyî bi desthilatî re, heman karaktêrê diteyisîne.

Mirov dikare perwerdeyê pênase bike weke, ku ezmûnên civakê, bi awayê agahiyên teorîk û pratîk, bi endamên wê, bi taybeti bi ciwanên wê têne hezmkirin. Civakîbûna zarokan, bi çalakiya perwerdeya civakê ve tê meşandin. Perwerdeya zarokan, ne erka desthilatî û dewletê ye; lê,erka herî girîng a civakê ye. Ji ber ku zarok û ciwan, ên wê [civakê] bi xwe ne. Gihandina zarok û ciwanên xwe, weke hem maf û ham erk, li gorî kevnoşop û tabetmendiyên xwe yên civakî, û veguherandina wan bo xwe, mijareke jiyanî ye û pirsgirêka domandina hebûna wê ye. Ti civak nikare mafê xwe yê heyînê û erka xwe ya ji bo vê ya perwerdekirina ciwanên xwe, bi hêzeke dîtir  re parve bike û wan dewrî wê bike. Hêzên mijara gotinê, tevî ku dewlet yan emrazên cûrbecûr ên desthiltî bin, dîsa nikare vî mafî û vê erkê dewrî wan bike. Nexwe, wê wisa bê hesibandin ku xwe radestî (teslîmî) yekdestiyên serweriyê kiriye. Pîroziya mafê perwerdeyê, çavkaniya xwe heyînê digire.Yek ji dijîtiyên herî mezin ên şaristanî li hemberî civakê bi dirêjiya dîrokê, çalakiya hêştina civakê bêpar ji zarokan û ciwanan e. Van çalakiyên xwe bi du rêyan pêk tînin: An bi rêya tunekirina mezinên wan, ew dikin kole; yan jî ji bo nirxandina wan di qata desthilatî de, bi armanca qaşo perwerdekirinê, wan radigirin.

Yek ji armancên herî girîng ên şeran ew e ku zarokan, keçan û mêrên ciwan, weke malên herî bûha, bi van herdu rêyan di nava xwe de bihelînin û bi vî rengî war (ocax) ên civandinê (doşîrme,devşîriyê) ava bikin û ava dikin jî. Bingeha burokrasiya hoveber(kovî) wisa destpê kiriye; her wisa dîroka şaristaniyê di hêlekê de çalakiya bi vê rêbazê hêm lewazkirina civakê ye, hem jî ya çêkirina hêza emrazên burokratîk e: avakirina civakek li hemberî civakê, anku avakirina civaka desthikatî û dewletê li hemberî civakê. Di vê avabûnê de ziman, çand û dîrokêkê cipcûda (bi tevahî cûda) fêrî zarok û ciwanên razberbûyî ji civaka xwe ya cewherîn tê kirin. Armanca bingehîn, ew e ku wan ji cewhera wan biyanî bikin. Tê negengazkirin ku bêdesthilatî bijîn. Hem di warê bîrdozî, hem jî daringî(madî) de nasnameya herî dewletperest didin wan. Wer  tê kirin ku dewlet û desthilatî ji bo wan dibe yekane rêya derbasdar a heyînê. Hem xwe dewlet û desthilat dihesibînin û hem jî bi vî rengî têne kirin dijberî civaka xwezayî. Carna civaka dewletê û xwezaya civakî têne heman(eynî)kirin. Ev şaş e û binakok e. Dîroka şaristaniyê li ser vê nakokiyê hatiye avakirin. Di bin sedema ku desthilatî perwerdeyê xesp dikin de, van rastiyên dîrokî hene. Nexwe, erka perwerdekirina civakê, qet ne xema wan e. Kesekî sermayedar, karkerên xwe çiqas perwerde bike; desthilatî jî, rajêrên xwe bi wê mantiqê weke karkerên-bende perwerde dike. Navê wê burokrasî jî be, endamên wê, ji asta herî binî heya herî serî, weke bende têne gihîştin.

Bi taybetî desthilatiyên dewlet-netewê, yekdestiyên xwe li ser tevahiya zarok û ciwanên cvakê berî her tiştî bi rêya perwerdeyê dihonin. Kesên ku bi heşmendiya xwe ya dîrokî, hunerî, olî û felsefî ve distrînin, êdî ne yên malbatên xwe yên bere ne; lê, zarokên cewherîn (xas) ên desthilatdaran in, anku malên wan in. Biyanîbûna mezin, bi vî awayî tê sazîkirin. Burjuwazî, ew çîn e ku di warê perwerdeyê de, li ser tevahiya civaka gel yekdestiya herî dijwar dadimezrîne. Dema ku

perwerdeya seretayî û navîn dike neçarî (mecbûrî) û dîplomaya zanîngehê jî tîne bîra yên bixwazin kar bibînin, ev tê wateya ku maşeya biyanîbûn û rajêrbûn a li ser ciwanên civakê, her wisa pêvajoya girtina wan a nava qefesê, bûye divêtiyek (mecbûriyetek). Dîsa, tê wateya ku zor, hêza daringî(madî) û perwerde, bûne çekên mêtingehkirina civakê, ku zor e mirov xwe li hemberî wan ragire. Lewre, dikare bi hêsanî bê diyarkirin ku civak herî zêde derbe xwariye ji şerê ku dewlet û destyilatî bi dirêjiya dîrokê bi navgîniya perwerdeyê li hemberî wê meşandine. Mafên civakan ên perwerdeyê, ew maf in ku pêkanîna wan herî zor e. Bidestxistina civak heyîna xwe bi rêya perwerdeyê li hemberî hêzên dêwane yên dewlet-netew û yekdestiyên serwer, ketiye heyama xwe ya herî dijwar a dîrokê. Serweriya bîrdozî, bi şoreşa dawî ya ragîhandinê, bi şerê medya ku li ser tevahiya civakê dide meşandin, ji nû ve mêtingeriyeke çandî ya serkeftî dide meşandin (ji ber ku mêtingehkirinê, bi qasî aliyên wê yên leşkerî û aborî, belkî jî ji vana zêdetir kûr û bêyî pêhesandinê, dimeşîne). Yekane rêya rizgarî û azadiyê ew e ku civak li hemberî vê feth û mêtingeriya çandî bi têkoşîna xwe ya cewherîn a exlaqî û polîtîk, ku emrazên herî bingehîn ên heyînê ne, li ber xwe bide. Civaka ku ciwanên xwe wenda kiribe, yan jî berevejî,ciwanên ku civaka xwe wenda kiribin, tê wateya ku,ji bûyîna têkçûnê wêdetir, mafên xwe yên hebûnê wenda kirine û xiyanet lê kirine. Yê li pey were pûçbûn û belavbûn e. Erka wan a bingehîn a civakî li hemberî vê, ew e ku, weke navgînên bingehîn ên heyîna xwe, saziyên xwe yên perwedeyî peş bixin; her wisa şîroveyên xwe yên zanistî, felsefî, hunerî û zîmanî, weke naverok, ji pêkhateya zanist û desthilatiyê veqetînin û ‘şoreşa wate’yê bi ser bixin. Nexwe, wê gengaz nebe ku tevnên exlaqî û polîtîk ên hebûna civakî, bêne erkdar(sazbar)kirin.

Bi vî rengî, pirsgirêka perwerdeyê, di cewher de neçar dike ku saziyên (tevnên) exlaqî û polîtîk ên civakî werin avakirin; her wisa erka bingehîn a exlaq û polîtîka jî, pêkanîna perwerdeya civakî ye. Civaka ku xwe perwerde neke, wê ji holê rabe derfeta wê ya ku saziya xwe ya cewherîn a exlaq û polîtîka pêş bixe û wê li ser piyan bihêle; her wisa heyîna wê jî nikare xwe rizgar bike ji jiyîn, rizîn û belavbûna di bin gefa berdewamî de.

Pirsgirêka tendurustiya civakê mijareke xeylî hestyar e. Bi qasî perwerdeyê girîngiya wê heye. Hîm, heyîn û azadiya civakên ku nikaribin tendurustiya xwe bi derfetên xwe yên cewherîn biparêzin, an di bin gefan de ne, yan jî bi tevahî hunda dibin.

Rajêriya tendurustiye, nîşandereke rajêriya gelemperî ye. Civakek ku pirsgirêkên xwe yên fizîkî û giyanî çareser kiribe, tê wateya ku derfeta azadbûnê di deste wê de ye .Merezî(nezweşî)ya belave ya civakên mêtingeh, têkildar e bi rejîmên mêtinê re ku dijîn. Divê weke mafê û erka bingehîn a civakê bê dîtin ku sazî û pisporên xwe yên tendurustiyê çêbike. Desthilatî û dewletê, ev erk ji deste wê girtine û ew kirine yekdestî; ev jî derbeya mezin e ku li tendurustiya civakê hatiye xistin. Têkoşîna ji bo mafê tendurustî, li xwe rêzgirtin e û hestyariya di mijara azadiya xwe de ye.

Modernîteya kapîtalîst dewlet-netewekirina perwerde û tendurustiyê jiyanî dihesibîne. Heya ku ev herdu qad, ku pêşketina civakê ya heyînî, bi tendurustî û ronakî girêdayî wan in, neyên girtin bin kontrolê û li ser wan serweriya yekdestîperest neyê avakirin, pirr zor e ku serwerî û mêtina gelemperî were berdewamkirin. Ji ber tê zanîn ku tenê bi zora mîlîtarîst a tazî, nikare civak were mulkkirin, ji bo yekdestiyan kontrola li ser perwerde û tendurustî, di girîngiya awarte de ye.

Em careke din dibînin ku di bingeha tevahiya pirsgirêkên heyînî yên civakî de dewlet û desthilatiya yekdestîperest hene. Eger vê yekdestiya desthilatiyê nebe, kar-sermaye nikarin werin berdewamkirin. Li hemberî vê, eger têkoşîna sîstemî ya şaristaniya demokratîk jî nebe, ti pirsgirêkên civakê nikarin bigihîjin çareseriya mayînde.

### 11. Pirsgirêka Civakê ya Mîlîtarîzm

Milîtarîzm dilare were pênase kirin weke yekdestîperestiya herî pêşxistî ya dij-civakgerî. Mirov dikare rawêj (ferz) bike ku yekemîn damezrandina otorîteya bi armanca zordarî û kedxwarî ya li ser xwezaya civakî, di encame aqilê analîtîk ê 'zilamê fenek (qurnaz) û bihêz' û çalakiya wî de pêş ketine. Yê herî zêde hêza wî tere bike, hewl dide otorîteya xwe di bingeh de li ser du komên sereke ava bike: Li ser koma nêçîrvan a li ber wî û li ser jinê ku hewl dide wê li malê ragire. Mirov dikare çavdêrî bike ku yekemîn otorîteya xerarşîk, bi tevlîbûna hêmanên Şamanîstîk (pêş-keşîş) û Jerontokratîk (koma kalan) bo pêvajoyê, di gelek civakan de di bin şêweyên cûrbecûr de çêdibe. Em çavdêrî dikin ku zilamê bihêz û fenek û yên li ber wî, weke desthilatiya fermîbûyî û şaxê leşkerî yê dewletê (yekemîn yekdestîbûna spartî bi berhema-bermayî ya li ser aboriyê), bi têketina nava dîroka şaristaniyê re, xwe bi sazî dikin. I. II. û III. Xanedaniyên Ûrê, yekser piştî heyama qralên-kaşîş di civaka Sumer de, vê pêkhatinê diteyîsînîn. Rastiyên dirûv, di nava gelek civakan de mijara gotinê ne. Mirov dikare gav bi gav çavdêrî bike ku tew di destana Girgamêş de jî bi rengekî eşkere tê qalkirin bê ka qraliyet çawa ji kevneşopa Xwedavend Înana (kevneşop û keşîşeya xwedavenda jinê) tê qutkirin, keşîşe tê bêhêzkirin û li malan (ên taybet û giştî) tê ragirtin.

Eger em Girgamêş weke yekemîn fermandarê leşkerî bikin hêma (sembol), em ê karibin çêbûna kevneşopa leşkerî-mîlîtarîst- çêtir tehlîl bîkîn. Karûbarên wan ew e ku, bi armanca nêçîra mirovên kole, yên pêwîst ji bo bajêr, derkevin sefere û (li Bakûrê Iraqa îroyîn, bi alîkariya 'Enkîdû'yê hevxebatkar ê di destana Girgamêş de) biçin nêçîra qebîleyên (Hûmbaba) ku ji wan re dibêjin hov û barbar. Pirr eşkere tê dîtin ku di çavkaniya barbarî û hovîtiya rastîn de zorbetiya bajêr heye. Peyva 'barbar'a di kevneşepa çanda Grek de, weke çepandin (berevajî kirin)eke bajêr û propagandaya wî ya derewîn hatiye pêşxistin. Ji bo avakirina serdestiya bîrdozî ye. Eşkere ye ku qebîleyên çolter, ku li gorî rêxistingeriya bajêr, bêhtir lewaz û nêrêxistî ne, nabe ku bibin barbar. Têgîna barbar, yek jî derew û çewtandin (jirêkirin) ên herî mezin ên serekî yên dîroka şaristaniyê ye. Duyemîn erka zorbe yê bajêr,' ewlekarî' ye. Rêbaza ku bi vê armancê, herî zêde serî lê dide, çikilandina qele û bedenan e û pêşxistina çekên hertim xurttir û kujendetir e. Nêzîkatiyeke rastîparêz e ku nînkare bê redkirin, dema mirov diyar bike ku bi vê armancê, bi milyonan mirov hatine kuştin, serfkirin, bêkarkirin; ên van statuyan nepijirandine, hatine kuştin û van çalakiyan weke 'dîrok' hatine teyîsandin.

Şaxê leşkerî, li gorî rêjeya hêzên xwe, para herî mezin a çirpandina nirxa aborî, ji xwe re vediqetîne. Seferên bi armanca 'xenîmetê' di dîrokê de, vê rastiyê xeylî baş rave dikin. Wekî din, pirr eşkere ye ku di bingeha dewletê de mulk heye û di bingeha mulk de jî feth û desteserkirin heye. Yê feth bike, xwedî ye. Vê yekê weke mafê xwezayî û jêvenger ê çalakiya xwe dibîne û îlan dike (radigihîne). Dewlet yekûna di serî de ax, mulk û xenîmet (mulkê guhêzbar),e ku ji alî hêzên desthilatdar ve têne fethkirin û desteserkirin. Ji bo mînak, rêgeza "Tevahiya [Împaratoriya] Osmanî, ya padîşah e", derbirrana/îfadeya vê yekê ye. Dewlet û fethên leşkerî nayên wateyekê dîtir, ji bilî

dewama vê rêgezê û vê kevneşepê. Kevneşop bi vî awayî hatiye damezrandin. Dema ku beşa leşkerî, ji ber vê sedemê, xwe weke xwediyê bingehîn ê dewletê, lewre yê mulk dibîne û xwe wisa pênase dike, kevneşopa dîrokî li ber çavan digire. Bûyîna wî ya şaxê herî bi hêz ê yekdestîperest, pêdîviya xwezaya desthilatî û dewletê ye. Ji xwe hêza mirov û çek a di destê wî de, dişê/dikare vê yekê bi hêsanî pêk bîne. Di ronahiya van rastiyên bingehîn de çêtir tê têgihîştin ku wan hewldanên ku ji alî burokrasiya sivîl ve ji bo zêdekirina para (yekdestiya) xwe, yekcarna têne pêşxistin, bi derbeya leşkerî bi dawî dibin. Bê gûman rolên yekdestiyên bîrdozî û burokratî, ku ji wan re tê gotin çînên 'ilmiye' û 'qelemiye', di avakirina desthilatî û dewletê de, jêveneger in. Lê, bi qasî rola leşkerî, ne destnîşankar in. Tew lêkolînên herî serkî yên li ser emrazên desthilatî û dewletên dîrokê û yên roja me ya îro jî, van rastiyan piştrast dikin.

A yekemîn a mijarên sereke yên girîng di hêla mijara me de ew e ku leşkeriye (eskeriye), yekdestiya herî pêşketî û destnîşankar e. Ne ji bo leşker-artêş, her wisa şan, şeref û qehremanî ye, ku weke bîrdozî tê pêşkêşkirin (vana propagandiyên bîrdozî ne, ku bi armanca perdekirin û çepandin (jirêkirin)  a girîngiya cewhera vî karî têne pêşxistin), lê weke hêmana jêveneger a yekdestiya deshilatiyê heye. Di cewher de aborî ye. Artêş, yekdestiyeke wisa ye ku bi aboriyê spartî ye; li ser û li dûrî aboriyê disekine, lê dahata (mûçeya) xwe herî zêde digire bin misogerî(garantî)yê; her wisa li dijrabûna wê zor e û tevahiya beşên din ên yekdestiyê, neçar in ku pê re li hev bikin û parve bikin. Bi dirêjiya bingeh û pêşketina xwe ya dîrokî, kevneşop û yekdestiyeke wisa saziyane ya bi kok e. Di cewher de yekdestî (burokrasî) ya çîneke wisa ye ku ji herî nêz ve bi pêşketina aborî re têkildar e, lê pêwîst dike ku xwe jê herî dûr bihêle. Di vî milî de, mîna ku ji civakê herî dûr be, xwe dide xuyakirin. Hîn rasttir ew beşa yekdestî ye ku xwe bi çekên herî baş ên aborî û leşkerî arastiye (bi techîz keriye) û xwe rapêçaye. Eger em tehlîla leşkerî bi rengekî rast nekin, em nikarin tam tê bigîhêjin ne yekdestiya aboriyê û ne jî yekdestîperestiyên dewlet û desthilatiyê. Her sê jî yekpareyek in. Ji heman cewherê, anku ji nirxên-bermayî yên civakê xwe xwedî dikin. Îdea dikin ku, di beramberiya vê de, ewlekarî, perwerde, tendurustî û bera civakê rêkûpêk dikin. Dewletperestî, anku dewleta bîrdozî, xwe bi vî rengî pêşkêş dike. Lê, rastî bi cûreyek dîtir e û weke me ew danî holê ye.

Li gorî ku leşkerîbûn, anku milîtarîzm şaxê herî tûj ê rêxistî yê sermaye û desthilatî ye, pêdiviya xwezaya karê wê ye ku saziyek wisa be ku civakê herî zêde têxe bin serweriya xwe, anku qefesa xwe. Her çend mîlîtarîzm bi gelemperî di tevahiya dîrokê û dewletan de hêzek wisa ye ku xwe diçirpîne nava civakê, ew dixe bin kontrola xwe û li ser zaliyê dike,  herî zêde di çaxa çîna navîn (burjuwazî) de di yekdestiya dewlet-netew de gihîştiye asta herî jorîn. Di dewlet-netew de weke taybetmendiya destnîşankar derdikeve pêşberî me, ku tevahiya civak bi navê artêşê bi rengekî fermî tê bêçekdarkirin û bi vî awayî yekane yekdestiya çekan derbasî dewlet û artêşê dibe. Civak di ti heyama dirokê de ewqas nehatiye bêçekdarkirin bi qasî ya ku çîna burjuwa pêkaniye. Sedema vê rastiya pirr girîng ew e ku mêtin kûr bûye û li hemberî vê, berxwedanên mezin pêşketine. Civak nikare were rêvebirin, eger bi wergirî û berdewamî neyê bêçekdarkirin û heya tevahiya çavikên xwe yên hundirîn, ji çirpandin û raçaviya desthilatî re, neyê rajêrkirin. Mirov nikare bi civakê re serî derkeve, bêyî ragirtina wê ya hema hema nava 'qefesa ji hesin' a modernîtiyê. Dîsa, civak nikare bê rêvebirin, eger ji alî artêşa medyatîk a di gel çaxa yekdestî ya fînans a kûrewî ve neyê ragirtin û dorpêçkirin. Rehendên yekdestiyên mêtinê, xwe yekser li çêbûna yekdestiyên bîrdozî-medyatîk û leşkerî-burokratîk jî diteyîsinin. Di nava pabendên ku ji hev qut nebin de, hevdu mercdar dikin. Sedema ku sermayeya sanayî ya çekdar a dêwane ya spartî bi mîlîtarîzma şaristaniya navendî ya

mezin a dawî, serwerê super, her wisa serwerên din ên herêmî û tevahiya hevxebatkarên wan ên navçeyî, ya li ser û nava civakê, li gorî yekdestiyên wan ên navçeyî, li gorî yekdestiyên wan ên din, li pêş e, ji ber cewhera vê rewşa wan a dîrokî û rojaneyî ye. Her wisa wekhevbûna mîlîtarîzm li gel faşîzma yekdestiya kapîtalîst, wateya xwe di vê rastiya xwe ya cewherîn de dibîne.

Elbet, civakan, di nava tevahiya civaka xwezayî û awayên wê yên cûrbecûr de bi dirêjiya dîroka nivîskî, li hemberî pêşketina mîlîtarîst a şaristaniyê, xwe bi kûranî û dijwarî parastine. Ew kevneşop jî ku jê re tê gotin parastina cewherîn, di nava pêşketina xwe ya bi hezaran salan de bi awayên cûrbecûr ên bexwedan, serhildan, gerîla û artêşên parastina gel bisazî bûye û şerên mezin ên parastinê kiriye. Elbet, em nikarin şerên parastinê wekhev bibînin li gel şerên mîlîtarîst ên yekdestiyê. Di navbera wan de cewaziya naverok û cewher heye. Yek ji wan di karakterê dij-civakgerî (mêtinger, rizîner, tuneker) de ye; lê yê din, di karakterê civakgerî de ye (ku civakê diparêze û şiyanên wê yên exlaqî û polîtîk azad dike). Şaristaniya demokratîk strandin û parastina civakê ye, li ser bingeha sîstemkirina parastina cewherîn li hemberî mîlîtarîzma şaristanîperest a navendî.

## 12. Pirsgirêkên Civakê yên Aştî û Demokrasî

Yanzdeh sernivîsên berî vê hewl dane bi awayê pênaseya pirr kurt ên derbase pênase bikin bê ka xwezaya civakî bi çi cûre pirsgirêkan ve hatiye fetisandin. Paradîgma û zanisteke civakî ya watedar, ancax eger li ser bingeha van pênaseyan tehlîl bêne kirin û bersiv bêne hilberandin, wê wate di xwe de wergirin. Nexwe, wê ti cewaziya wan nemîne ji retorîk (hunerên gotinê ku serweriyê vedişêrin) ên lîberal û kevneşopperest (gerdîşperest). Encama hevbeş ku ez gihîştimê ew e ku di çavkaniya pirsgirêkên civakî de bandor, serwerî û mêtingeryên yekbûyî yên yekdestiyên zordest û mêtinê dirazin (hene), bi armanca kedxwarina xwezaya civakî (hebûna civakê) bi gelemperî û derfetên aborî yên ku nirxa-bermayî hildiberînin, bi taybetî. Bêhtir ji razanê, hebûna wan a herî şiyar mijara gotinê ye. Pirsgirêk çavkaniya xwe, ne ji xwezayê (xwezaya yekemîn) digirin û ne jî ji ti sedemeke dîtir a civakî digirin.

Civak nikarin hebûnên xwe yên cewherîn bidomînin, eger exlaqê û polîtîkaya civakî nebin, ku tevn werdigirin weke sedemên heyînê, ji bo meşandina di wateya giştî û kolektîv de karûbarên hevbeş ên civakê. Nabe ku awayê asayî (normal), anku heyîna civakê, bêexlaq û bêpolîtîka be. Eger tevna cewherîn a exlaq û polîtîka ya civakek di rewşa nepêşketî de be, yan jî hatibe kûd(kotromî)kirin, çepandin (jirêkirin) û felçkirin, mirov dikare bêje ku ew civak dagirkerî û mêtingeriya yekdestiyên cûrbecûr ên desthilatî û dewletê dijî. Lê, domandina heyîna xwe bi vê şêweyê biyanîbûn û xiyaneta cewherîn e li heyîna xwe: her wisa hebûna weke kerî, têkber (eşya) û mal û mulk di bin serweriya yekdestiyan de ye. Civak di vê rewşê de xwezaya xwe ya cewherîn wenda dike; şiyanên xwe yên civaka xwezayî, yan hunda dike, yan jî wan dide civitandin (pûçkirin); her wisa dibe mêtingeh, heta, ya xirabtir, bi her tiştê xwe ve weke mijara mulk, xwe ji rizîn û tunebûnê re diterikîne. Di dîrok û roja me ya îro de gelek civak hatine çavdêrîkirin ku diguncin li gel vê pênaseyê. Yên hatine rizandin û tunekirin, qatbiqat zêde ne ji yên hîn jî li ser piyan in.

Dema civak bikeve rewşeke wisa ku nikaribe saziyên xwe yên exlaqî û polîtîk ên pêwîst ji bo domandina xwe ava bike, wan bide xebitandin û wan erkdar bike, tê wateya ku hatiye girtin nava dewsandeka (cendereya) zordestî û mêtinê. Vê yekê, 'rewşa şer' e. Her wisa mirov dikare dîrokê pênase bike weke 'rewşa şer'a şaristaniyan li hemberî civakê. Dema ku exlaq û polîtîka nikaribin erkên xwe bikin, tenê yek karekî dimîne ku civak karibe bike: Parastina Cewherîn. Rewşa şer, rewşa nebûyîna aştiyê ye. Lewre, aştî, dikare ancax li ser bingeha parastina cewherîn wate wergire. Aştiya ku parastina wê ya cewherîn nebe, dikare ancax bibe derbirrana/îfadeya radestî û koletiyê. Aştiya bêparastina cewherîn, ku lîberalîzm wê li gelan û civakan di roja me ya îro de ferz dike, bi taybetî ew leyîstoka ku jê re tê gotin 'hêmînî-aramî (îstîqrar) û lihevhatina demokratîk', ji rewşa dapaçîna (sergirtina) serweriya çîna burjuwa, ku bi hêza çêkdar a heya qirika xwe bi rengekî yek-alî tê meşandin, anku ji meşandina nuxaftî ya rewşa şer wêdetir ti wateya wan tine ye. Pênasekirina aştî bi vê şêweyê, weke hewldana herî mezin a serweriya sermayeya bîrdozî derdikeve pêşberî me. Lê, di dîrokê de bi navê 'têgînên pîrozkirî'yên bi şêweya guherdetir, xwe derbirrîne. Ol di vî milî de bi têgînan barkirî ne. Bi taybetî olên şaristanîkirî, wisa ne.

Pêkanîna aştiyê, ancax dema ku parastina cewherîn a civakan, lewre karakterê civaka exlaqî û polîtîk bê strandin û saxlemkirin, dikare bigihîje wateya xwe ya rasteqîn. Pênaseya aştiyê, ku bi taybetî mijûliya mezin a Michel Foucoult jî da pêwîstkirin, ancax bi vî rengî dikare derbirraneke civakî ya pejirîner wergire. Arastekirinên wate yên li derveyî vê, wê ti wateya wan nebe, ji bilî ku aştî bi navê hemû komcivak û gelan bibe dafikek û rewşa şer bi awayê şêweyên nuxaftî her berdewam bike û biçe. Peyva 'aştî', di mercên moderniteya kapîtalîst de, peyvekê wisa ye ku bi dafikan barkirî ye. Dema bi rengekî rast neyê pênasekirin, bikaranîna wê pirr bi fikare ye. Eger em careke din wê pênase bikin; aştî, ne bi tevahî rakirina ji holê ya rewşa şer e û ne jî rewşa bûyîna hêminî (îstîqrar) û nebûna şer a di bin serdestiya aliyekî de ye. Di şer de alî hene. Serdestiya misoger a aliyekî mijara gotinê nîne û pêwîst e nebe. Ya sêyemîn ew e ku çek têne bêdengkirin li ser bingeha pejirandina xebitîna saziyane ya exlaq û polîtîkaya cewherîn a civakê. Van hersê mercan, hîmên aştiya rêgezane ne. Eger aştiyeke rasteqîn xwe nespêre van mercên rêgezî, ti wateya wê nîne.

Eger em van hersê mercan hinekî vekin; a yekemîn, tê pêşbînîkirin ku alî bi tevahî bêne bêçekdarkirin. Îdeayên wan çi dibin bila bibin soz didin ku tenê bi çekan êrîşî hevdu nekin. Li pey serdestiya çekdarî nagerin. Dipejirînin ku rêzdarbin ji maf û derfetên hev re, ku xwe di bin ewlekariyê de ragirin. A duyemîn; serdestiya dawînî (nîhaî) ya aliyekî ne mijara gotinê ye. Belkî hêminî û aramiyeke bidestxistî di bin serdestiya çekan de hebe, lê ev rewş, nikare weke 'aştî' were binavkirin. Aştî dikare were rojevê di rewşa ku, kîjan alî (mafdar-nemafdar) dibe bila bibe, bi rengekî berhemberî bipejirînin ku şer rawestînin, bêyî bidestxistina serdestiyê (ya bi rêya çekan). A sêyemîn; alî dipejirînin ku di çareseriya pirsgirêkan de rêzdarbin ji xebitîna saziyane ya exlaqî (wijdanî) û polîtîk a civakan re (dîsa, rewşa wan çi dibe bila bibe; du alî, civak yan jî desthilat). Mercê ku jê re tê gotin 'çareseriya siyasî/polîtîk', di vê çarçoveyê de tê pênasekirin. Ti agirbest, ku çareseriya exlaqî û polîtîk di xwe de wernegire, nikare weke 'aştî', were şîrovekirin.

Siyaseta demokratîk, di bin van mercên rêgezane yên aştî de, girîngiyeke jêveneger werdigire û bi vî rengî dikeve rojevê. Dema saziyên exlaqî û polîtîk ên civakê bixebitin, pêvajoya ku weke xwezayî derdikeve holê, dibe pêvajoya siyaseta demokratîk. Derdorên ku aştiyê hêvî dikin, her wisa divê zanibin ku, tenê dema polîtîka li ser bingeha exlaqî rola xwe bilîze, wê vê yekê karibe were bi serxistin. Di dema aştiyê de, pêwîst e herî kêm aliyekî di şûngeh (pozîsyon)a siyaseta demokratîk de

be. Nexwe, ya were kirin, wê ji bûyîna ‘lîstoka aştî’ ya bi navê yekdestiyên, wêdetir neçe. Siyaseta demokratîk di vê rewşê de roleke jiyanî dilîze. Pêvajoyeke watedar a aştî ancax ji alî hêzên demokratîk ve, li gel hêzên li hemberî wan ên desthilatî yan jî dewletê, di bin diyalogê de dikare were jiyîn. Jê pê ve, ew e ku şerkerî (yekdestî), bi awayê rawestandina pevçûnan bi rengekî berhemberî, her didomin û diçin. Westana ji şer, her wisa zorî û dijwariyên lojîstîk û aborî hene. Eger vana bêne derbaskirin, şer dewam dike heya serdestiya aliyekî bi temamî were pêkanîn. Ji van şêweyan re nayê gotin ‘pêvajoya aştiyê’; mirov dikare ji wan re bêje agirbestên ku ji bo şerên hîn tundtir têne îlankirin. Girîngiyeke rêgezî ye ku agirbestek ji bo karibe bibe aştîxwaz, rê li ber aştiyê veke û were girêdan bi hersê mercên ku me wan hejmart.

Di be ku di şer de rewşên wisa jî çêbin, weke yekcarna hatiye dîtin, ku aliyê parêzkar ê cewherîn (ên di şûngeha mafdarî de ne) jî serdestiya dawînî (nihaî) bidest bixin. Tew di vê rewşê de jî, ji bo aştiyê wan hersê mercan neguherin. Eger mirov yekser bibeze desthilatî û dewleta xwe ava bike û di bin vê desthilatî û dewletêde hêminî yê çêbike, weke di sosyalîzma pêkhatî û gelek şerên mafdar ên rizgariya netewî de hatin dîtin, nabe ku vê yekê bibe aştî. Vê carê, di şûna hêzeke biyanî (yekdestîperest) de, hêzeke herêmî (beşa jê re tê gotin kapîtalîzma dewletê yan jî burjuwaziya netewî), tê bicîkirin. Tevî ku jê re bê gotin ‘desthilatiya sosyalîst’ jî, rastiya sosyolojîk naguhere. Aştî, weke rêgez, ne diyardeyeke wisa ye ku bi raseriyên desthilatî û dewletê, were bidestxistin. Dema ku desthilatî û dewlet, bi kîjan navan dibe bila bibe (ferq nake ku burjuwa, sosyalîst, netewî û ne-netewî be) raseriya xwe bi hêzên demokratîk re parve neke, aştî nakeve rojevê. Aştî, di tehlîla dawî de, lihevhatina mercdar a demokrasî û dewletê ye. Çîrokên vê lihevhatinê jî bi dirêjiya dîrokê dem û ciyên mezin digirin. Di gelek dem û cî de hatiye ceribandin. A rêgezî û demdirêj jî heye: her wisa ya ku, bêyî ku hîn hubir (murekeb)a wê ziwa bibe, xira bûye jî heye. Civak, ne tenê pêkhatî ji damezrîna desthilatî û dewletê, dijîn. Çiqasî qadên wan tên tengkirin, bila bêne tengkirin; heya bi tevahî (ji kok ve) neyên tunekirin, bi ser dikevin ku, di bin nasnameyên xwe yên cewherîn ên exlaq û polîtîka de, jiyana xwe bidomînin. Belkî jî ev rastî ye ku di dîrokê de nehatiye niwisandin, lê awayê bingehîn ê jiyanê ye.

Eger mirov civakê, pêkhatî ji çîrokên dewlet û desthilatiyê nebîne û berevajî, wê weke xwezaya ku destnîşan dike rawêj bike (bi hesibîne), dibe ku tevkarî bike li avabûneke rastqîntir a zanista civakî. Desthilatî û dewlet, her wisa yekdestiyên sermayeyê, çiqas mezin û zengîn (Fîrewn û Karûn) dibin bila bibin, yan jî çiqas dibin cinawir (Levîathanê nû) bila bibin, bi qasî ku civakê, weke yên roja me ya îro, daqurtînin; lê ti caran nikarin civakê ji holê rakin. Ji ber ku, di tehlîla dawî de, ya wan destnîşan dike, civak e. Yên têne destnîşankirin, ti caran nikarin ciyê yên destnîşankar bigirin. Tew hêza propaganda ya herî dengî (bi şaşea) û medyatîk (a weka roja me ya îro) jî têrê nake ku vê rastiyê binuxêfe. Ew, hêzên herî reben û belêngaz in ku ketine sînç (dilq)ê dêw (hût)an. Li hemberî vê, civaka mirov, weke afirana herî harîqa ya xwezayê ji çêbûna xwe û vir ve, wê ji wergirtina wate bêpar nemîne.

Sîstema Şaristaniya Demokratîk, weke sîstema şîrovekirin, zanistîkirin û ji nû ve avakirina civakê, bi awayê wê yê hem di dîrokê de hem jî yê niha, di bin vê paradîgmaya serekî de, dibe mijara beşa piştî vê.

## 7- RAMÎN (HIZIRÎN) LI SER SÎSTEMA ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK

Ji roja min xwe naskiriye û vir ve, gûman, weke bêtarek (heyula) ku dev ji min ber nede, min dişopîne. Yekcarna weke nexweşiyekî lê dihat. Dema hin baweriyên min ên dogmatîk dihejiyan, min xwe di kêliya herî lewaz de hîs dikir. Ez diketim nava rewşa herî bêîdea ya jiyanê. Belkî jî tevkariya herî girîng a gûmandariya min li kesayeta min, ku tew di mijarên ku mirov nikaribe bi rengekî cidî wan biparêze de jî xwe dida hîskirin, ew wane (ders)  ye ku ez ê nikaribim wisa bi hêsanî 'rastiyê/heqîqetê' bibînim. Min her tişt, heya ajoyên xwe, kir pirsgirêk û ez di wê baweriyê de me ku vê yekê wê hêzê da min ku ez xwe qut bikim ji şêwaza ramana dogmatîk, ku di kevneşopa civaka Rojhilata Navîn de hîn jî pirr xurt e. Di tehlîla dawî de, ji ber ku şêwaza ramana serwerî ya bi navenda Ewrûpa hem di dogmageriya pozîtîvîst a meodernîst de, hem jî di ramangeriya postmodernîst de hîn jî bibandor e,  vê yekê girîngiya mijarê nîşan dide. Min hewl da ez ciyê xwe jî diyar bikim,  bi rêya berawir (muqayese) kirina şiyana ramana Rojhilat, ku hîmê wê bawerî ye, û hêza ramana Rojava, ku hîmê wê jêpirsîner e. Eşkere ye ku min nekarî li herdu aliyan jî ji xwe re cî bibînim. Elbet,dema ramana min wisa bû jiyana min  jî, weke xwezayî, qutbûna di navbera xwe û vana de, her roja ku çû, kûr kir û berdewam kir.

Qet min têr (tetmîn) nekirin ewên ku weke bawerî, yan jî ramana jipirsîner dihatin pêşkêşkirin. Rexneya min a bingehîn ew e ku di mezinbûna pirsgirêka civakî de berpirsyariya van ramanan girîng e. Ev jî pêwîst dikir ku helwesteke rexnegir çêbe li ser sîstematîka bawerî ya Rojhilat û li ser sîstematîka rasyonel a rovaja; her wisa di vê mijarê de wêrekî (cesaret) dida min.

Taybetmendiyeke min a duyemîn ew e ku heşê (şiûra) min ê şiyarbûyî, ti caran ji pratîka min a civakî qut nebû. Çêbûneke karakterê parvekar ê derasayî di vê mijarê de pirr zû di kesayetiya min de xwe da xuyakirin. Dema ez hîn bi peyatî diçûm dibistana seretayî (Cîbîn, gundê cîran), qet têgîhîner nebû ku min fortê xwe dida ku bi çend heb hewîş (dua) yên min ji ber kiribû, ji komeke piçûk a xwendekaran re meletî (îmamtî) bikira. Weke lîstokek jî, min wî karî bi awayekî cidî dikir. Ez rawêj (texmîn) dikim ku di bingeha vê de ew daxwazî hebû ku ez rêzdariya wan hewîş (dua) yên ku min bi zorê jiber kiribû, lewre min dest bi ramîn (hizirîn)ê kiribû, birêya parvekirinê îspat bikim. A/ê tu fêr dibî zor e û girîng e; wê demê, teqez (mûtlaqa) parve bike! Diyar e min li vê derê bi rêgezekî cidî ya exlaqî re nasdariya xwe çêkiribû. Ji ber ku min di berg (cîld)ên berê yên parêznameya xwe de, bi awayê kurteçîrok qal kiribû bê ka yekêmîn ronî (şewq)yên modernîteyê çawa li rûyê min dabûn, ez ê dubare nekim.  Dema min têr baş têderxist (ferq kir) ku hêza rûxanê ya beza dînkî ya di maratona mezin a raman de, modernîteya kapîtalîst e, ez rawestiyan.  Êdî, perçekirina xwedayên çarsed salên dawî (sîstema cîhanê ya kapîtalîst), min guhast hêzeke hestên -pirr seyr e- dirûvî dilgeşiya ku 'şkîneriya pûtan' a di derketina Hz. Îbrahîmê Rihayî de ew dabû. Bi vî rengî min dikarî hem gûmandariya xwe bi hêsanî têxista bin kontrolê û hem jî bi rastiyên xwe re, ku ez li pey wan dibeziyam, jîvanên (randevûyên) têrker (tatmînker) çêbikira.

Ademîzad (benîadem) bi tevahî lewaz bûye. Pirr biêş e ku jîvana (randevuya) wê/wî ya bi rastiyê re di dîroka wê/wî de, belkî jî daketiye heya asta herî navajoyî, îro hema hema takekesek nemaye ku neyê radestgirtin ji alî pîvang (welçek)a yek hevser, yek zarok û yek mûçe (meaş). Ez nabêjim ku ez vê diyardeyê înkar dikim. Ez dixwazim rebeniya ku hatiye rûniştandin li şûna felsefe, ya di parastina we ya weke ramana herî rasyonel de diyar bikim. Ewqas e ev cîhan, ku xwedatiya dewlet-netew wê ji bendeyên xwe yên dilşad re dibexşîne. Ma dikare bê înkarkirin ku em di cîhaneke  tengkirî bi rengekî tirsnak de dijîn? Ez weke kes, jiyîna li bin hêmayeke (sembol) xwedayê çaxên herî kevn, ji xwedatiya dewlet-netewa îroyîn, hezar qat zêdetir watedar û pîroz

dibînim. Elbet ez dizanim ku ez qala xwedaperestiya herî pûç a valakirî ji naverokê ya yekdestîperestiya sermaye dikim. Êdî ez biêş pêşwazî dikim, ji ber ku yên ku derbeya (lêdana) wê ya herî bi derd û kul dixwin, lê dîsa jî di bin bandora vê xwedaperestiyê de dimînin û derketina ji vê, nahînin heşê xwe. Ez têr baş di wê ferqê de me ku ev, rewşeke rojaneyî ya mirovahiyê ye. Ji ber ya ku vêya herî baş diteyisîne, bûyera nijadkujiya Cihû  ye; vê yekê rehendên trajîk ên rewşê dide dest. Heyf û mixabin ku, çîroka qebîlaya Îbranî; hem di pêkhatina vê rewşê de, hem jî di dayîna qurbanên wê de xwedî para girîng e. Weke gotinên pêşiyan "te bi xwe kir, te bi xwe dît". Ez gûman nakim ji karakterê serwer ê hêza raman a Cihû. Ez di kesayetiya xwe de jî, jiberkeriya xwe ya hewîş (dua)yan heya şkîneriya xwe ya pûtan, girîngiya vê înkar nakim û wê qet piçûk nabînim. Lê tenê, ew trajediya nijadkujî ya ku hate serê Cihûyan, dike wek deynekî ku xwe ji jêpirsîneke bikok a Adornowarî re derbas bikin. Min bi xwe jî, di rêjeya bandorbûyîna xwe de, bi niyeta sencandin (dayîn)a piçek ji vî deynî, min hewl da ez Sîstema Şaristaniya Demokratîk bihizirim.

Di vê xalê de em Îbrahîmî ne. Lê dema di serî (mejî) de hinekî Zerdeştîbûn hebe, şîroveya cewaz hêz werdigire. Feraseta Zal a dîrokê, ya bi awayê çîrokkirinên şaristaniyê, di şkestinên girîng re hatiye derbaskirin. Bi gelemperî tê pejirandin ku dibe meşa dewlet û desthilatî weke dîroka fermî were vegotin, lê vê yekê nikare bibe dîroka civakî. Şêwaza bûyîna dewlet û desthilatî, dikare ancax bibe nîçik a hêmayî (sembolîk) ya vemirî ya rastiya dîrokê bi sûda yekdestiyên sermaye. Dîsa, ev vegotina nîçik e ku dîrokê dike gebsoyî (acizker)  û bersiv nade kevneşopa civakî. Eşkere ye ku ev dîrok, ku di cewhera xwe de dij-civakgerî ye, weke pêdiviya pêkhateya xwe, wê nikaribe civakê weke kevneşop derbibirre (îfade bike), berevajî, dê sî bibe ser wê û dê wê di çapandin (jirêkirin)ên pir-alî re derbas bike. Çîrokên li ser xanedaniyê jî, dirûvekî vê vegotinê ne. Vegotinên olî, yên li ser dîrokê, ku asta nûneriya wan a civakê ta radeya dawî req e, bi taybetî di dema têketina nava pêvajoya şaristaniyê de, ji dîrokêkê dewlet û desthilatî wêdetir wate dernabirrin.

Şîroveyên çînî û aborî yên dîrokê, bi taybetmendiyên xwe yên ku rastiya civakî ji tevdeyiya wê qut digirin dest û digihîjin heya daxistkariyê, ji hêleke dîtir bin jî, dîrokên dewletan  tînin bîra mirov. Nêrîna qismî ya pozîtîvîst, bêpar e ji wê hêza ku wateyê bi qasî dîroka olan jî bide. Van hemû vegotinên li ser dîrokê, herçend dijberên hev xuya bikin jî, di xala bûyîna ji koka şaristaniyê de dibin yek.

Ez ne di wê baweriyê de me ku dîroka xwezaya civakî, hem weke paradîgmal, hem jî weke ampîrîk, wate girtibe. Nivîsên li ser dîrokê, ku ji wan re tê gotin dîroka civakî, ji bûyîna beşên herî biperçe yên sosyolojiya pozîtîvîst wêdetir wate dernabirrin. Her wisa, ji bûyîna şayes (teswîr)eke perçe ya bedenê, anku ya yekpareyê wêdetir naçin.

Mirov dikare van destnîşankirinan dirêj dirêj vebêje, lê wê tevkarî li mijara me nekin.

Bi bûhaya dubarekirinên pirr zêde be jî, lêhûrbûna min a li ser dîrokê weke vegotina şaristaniya demokratîk, ji ber neçareseriya pirsgirêkên civakî ne, ku ez hîn jî zoriyê dikşînim ku wate bidime wan. Neçareserî,  ne tenê di jiyana pratîk de ye, di heman demê de vegotin jî xeylî bi neçareseriyê barkirî ye. Dema herdu rewş dibin yek, wer lê tê ku naverast bi vegotinên şaristaniya fermî tê dagirtin. Hin tepisandinên perçe,  yên bi navê dîroka civakî jî, ji geremol (tevlîhev)kirina rewşê wêdetir naçin.

Ez timî diyar dikim ku sosyalîzma zanistî, tevî ku ravekirina wê ya vê rewşê bi karakterê çînî ya dîrokê hin rastiyan ronakker kiribe jî, nekariye pirsgirêkê çareser bike, her wisa tew nekariye xwe jê bide alî ku nebe perçeyek ji pirsgirêkê.

Ji ber vê yekê ye ku ez timî diyar dikim ku, heya paradîgmaya modernîst a kapîtalîst bi temamî nayê derbaskirin, em têgihîştina rastiya dîrokî li milekî bihêlin, dê ji dîroka olan pirr zêdetir ser wê binixumîne û wê bi bêwatetiyê bar bike. Encamên dîrokî yên vê nêrîna paradîgmatîk a Marks, di roja me ya îro de baştir têne têgihîştin. Dîroka şaş, tê wateya pratîka şaş. Ta ku nêzîkatiyên şaristanî bi gelemperî û yên paradîgmatîk û ampîrîk ên moderníteya kapîtalîst bi taybetî, neyên derbaskirin, mirov nikare xwe bigihîne nêzîkatiya xwezaya civakê ya paradîgmatîk û ampîrîk. A ku ez li vê derê, bi rengekî pirr neamadekar be jî, hewl didim bikim ew e ku ez ceribandinekê bikim.

### A- Pênaseya Şaristaniya Demokratîk

Dikare bê pênasekirin weke sîstema şaristaniya demokratîk, dibistana zanista civakî, ku rawêj (ferz) dike ku awayê heyîna xwezaya civakî û pêşketina wê, li ser bingeha civaka exlaqî û polîtîk were lêkolînkirin. Yekeyên cewaz ên lêkolînê yên bizav/ekolên cûrbecûr ên zanista civakî hene. Teolojî û ol, civakê esas digirin. Sosyalîzma zanistî bihîma çînî ye. Yekeya bingehîn a lîberalîzmê, takekes e. her wisa, yên ku dewlet û desthilatî esas digirin hene û nêzîkatiyên ku şaristaniyan jî esas digirin, ne hindik in. Van hemû nêzîkatiyên bihîma yekeyan, weke min pirrî caran qal kir, ji ber ku ne nêzîkatiyên dîrokî û yekpareyî ne, hatine rexnekirin. Lêkolîneke watedar di hêla civakê de, divê di xalên jiyanî de kûr bibe. Divê dîrok û rojaneyî, di bingeh de, di wan xalan de wateyên xwe bibînin. Nexwe, wê lêkolîn ji bûyîna çîrokan wêdetir neçin.

Girîng e ku em yekeya xwe ya bingehîn, weke civaka exlaqî û polîtîk destnîşan bikin, ji bo ku rehendên dîrokîtî û yekparetî bigire nava xwe. Civaka exlaqî û polîtîk, vegotina herî dîrokî û yekpareyî ya civakê ye. Mirov dikare exlaq û polîtîkayê bi xwe, weke dîrok jî bixwîne. Civaka ku rehenda exlaqî û polîtîk di xwe de wergire, ew civak e ku herî nêzî yekpareyiya heyîn û pêşketina xwe ye. Civak dikare hebe, tevî ku dewlet, çîn, mêtin, bajêr, desthilatî û netew nebin. Lê mirov nikare civaka bêpar ji exlaq û polîtîka bihizire. Civak, dibe ku weke çavkaniyên mêtingeh û daringa xam ên hêzên dîtir, bi taybetî yên yekdestiyên sermaye û dewletê, hebin. Lê di rewşên wisa de, mîras û jêmayiyên civakên derketî ji bûyîna xwe, mijara gotinê ne.

Wateya wî nîne ku mirov etîket û sifet (nav)ên koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst li civaka exlaqî û polîtîk, weke awayê xwezayî yê civakê, bike. Hîn rasttir, pênasekirina civakan di bin van sifetan de, wê bê wateya perdekirina civakê û daxistina wê heya hêmanan (çîn,aborî, yekdestî). Sedema xitimîna ku tê dîtin di vegotinên çareserî yên li ser bingeha van têgînan di teorî û pratîka pêşketina civakî de, kêmasî û şaşitî ne, ku di cewherên xwe de diguhêzin. Piştî ku tevahiya analîzên li ser civakê, ku tên binavkirin bi van sifetên ku nêzî materyalîzma dîrokî ne, dikevin vê rewşê, vegotinên ku nirxên wan ên zanistî xeylî lewaz in, zêdetir bêçareserî ne. Tevî ku vegotinên bi rehenda olî bi kûranî qala girîngiya exlaq dikin, rehenda polîtîk ji mêj ve spartine dewletê. Nêzîkatiyên lîberal ên burjuwa jî, ne tenê perde davêjin ser civaka birehenda exlaqî û polîtîk, di heman demê de, di her xala ku keysa wan lê bê, fikare nakin ku li hemberî vê civakê şer jî bikin.

Xweperestî, herî kêm bi qasî dewlet û desthilatî, li hemberî civakê rewşa şer e. Lîberalîzm di bingeh de tê wateya bêhêzkirina civakê (civaka bêexlaq û bêpolîtîka) û kirina wê amade ji bo her cûre êrişên xweperestiyê. Lîberalîzm bîrdozî û pratîka herî dij-civakgerî ye.

Têgînên sîstema civak û şaristanî di Sosyolojiya Rojava de (zanistekê bi navê Sosyolojî ya Rojhilat, henûz nîne), pirr bipirsgirêk in. Divê neyê jibîrkirin ku sosyolojî hatibû peydakirin ji ber pêdiviya çareserî bo pirsgirêkên pirr mezin ên alozî, nakokî û pevçûn û şer, ku yekdestiyên sermaye û desthilatî dibin sedema wan. Ji bo rizgarkirin û jînbarkirina pergalê, ji her milî ve, li pey hev tez dihatin hilberandin. Tevî hemû şîroveyên doktrîna Xirîstyanî yên mezhebî, teolojîk û feformîst, ji ber ku pirsgirêkên civakî her dema ku diçû girantir dibûn, şîroveyên bi nêrîna zanistî (pozîtîvîst) li pirsgirêkên civakê, derketin pêş. Şoreşa felsefe û serdema Ronakbîrî (sedsalên 17. Û 18.), di bingeh de encama vê pêdiviyê ye. Li şûna çareseriya dihat payîn li gel Şoreşa Frensî, pirsgirêk bêhtir tevlîhev bûn; ev jî meylên pêşxistina sosyolojî wek şaxekî serbixwe yê zanistê, hîn zêdetir kûr kir. Sosyalîstên utopîk (Saînt Sîmon, Fourier, Proudhon), her wisa  Auguste Comte û Durkheim di vê rasterê de nûneriya pêş-qonaxan dikin. Hemû jî kur (zarok)ên Ronakbîriyê ne. Baweriya wan heya dawî bi zanistê heye. Wisa bawer dikirin ku wê karibin civakê jî, bi rêya zanistê, çawa bi xwazin wisa, ji nû ve biafrînin. Xwe amade kiribûn ji bo rola xweda. Bi gotina Hegel, çawa be, Xweda daketibû rûyê erde; hem jî weke dewlet-netew! ‘Ya diviyabû bihata kirin, proje û plansaziya zirav a endazyariya civakê’ bû. Ti proje û plansazî tinebû ku nekarîbûya bi navgîniya dewlet-netewê bihata xistin jiyanê û bihata bi serxistin. Tenê bes e ku ‘zanistiya pozîtîvîst’bin û dewlet-netew wan bipejirîne!

Dema ku zanyarên civakî (siyasetmedarên-aborî) yên Îngilîs, bi rêya çareseriya aborî, tevkarî li sosyolojiya Frensî dikirin; bîrdozger (îdeolog)ên Alman jî, bi rêya felsefî, tevkarî lê dikirin. Adam Smîth û Hegel, di warê pêşkêşiya tevkariyê de, di serî de tên. Pircûreyî bûn, reçete (çare) yên ku ji milê rastê û çepê ve,  hatin dozîn (dîtin) bo pirsgirêkên çêbûyî ji ber îstîsmarbûyîna civakê di pîvanên tirsnak de, ji alî kapîtalîzma sanayî ya sedsala 20. ve. Lîberalîzm, ku bîrdoziya navend a yekdestîperestiya kapîtalîst e, ya herî pratîk bû.  Di warê afirandina sîsteman de weke boxçeya pînekirî, tam bi eklektîzmekê, bi rêya sûdwergirtina ji her cûre ramanan. Dema ku sosyolojiyên şematîk ên rastgir û çepgir jî projeyên, yan li ser paşerojê (lêgerîna rastgir a çaxa zêrîn), yan jî li ser pêşerojê (civaka utopîk) pêş dixistin, weke ku haya wan tinebûya ji xwezaya civakî, dîrok û rojaneyî. Dema bi dîrokê û jiyana rojaneyî re rûbirû diman, herku diçû, perçe dibûn. Lê rastiya ku hemûyên wan bûbûn dîlên wê, ‘qefesa ji hesin’ bû, ku modernîteya kapîtalîst ew giran giran honandibû û di warê mejî (zihnî) û şêwaza jiyana pratîk de hemûyên wan xistibû navê. Dema ku fîlozof Nietzche hemûyên wan weke ‘metafizîkvanên pozîtîvîzmê’ û ‘boçî (cûce)yên  xesandî yên modernîzma kapîtalîst’dinirxand, zêdetir li nêzî rastiya civakî  dima. Yek ji wan fîlozofên kêmdîtî (ender) ye ku bal kişandiye ser xeteriya daqurtîna civakê ji alî modernîzma kapîtalîst ve. Tevî ku tê tewanbarkirin ku bi ramana xwe ji faşîzmê re xizmet kiriye, lê wan şîroveyên wî jî ku nûçeya hatina faşîzmê û şerên cîhanê didan, balkêş bûn.

Aloziyên mezin ku zêde dibûn û şerên cîhanê têrê kirin ku sosyolojiya pozîtîvîst, tevlî şaxên wê yên navendî yên lîberal ên rast û çep ve, bidin îflaskirin. Endazyariya civakê bi xwe, bi faşîzma otorîter û totolîter, weke metafizîka herî req, ku ew pirr rexne dikir, nasnameya xwe ya rastîn derxiste holê. Dibistana Frankfûrt, weke belgeya fermî ya vê îflasê (têkçûnê) yê. Anneles Ecole û serhildana ciwantî ya 1968, rê li ber gelek nêzîkatiyên sosyolojî yên postmodernîst, di serî de rê li

ber feraseta I. Wallersteîn a fîstema-cîhanê ya kapîtalîst vekirin. Ekolojî, femînîzm, dîmanetî, çepgiriya nû û sîstema cîhanê, serdemeke gelek zanistên civakî yên perçebûyî jî bi xwe re anîn. Bê gûman di vê de, wergirtina kapîtala fînans karakterê serwerî jî ya piştî salên 1970yan, rola girîng lîst. Aliyê wê yê erênî ew bû ku serweriya ramana bi navenda Ewrûpa, hilweşiyabû. Neyînîtiya wê jî, fikareyên zanisteke civakî ya pirr peçebûyî bû.

Eger em rexneyên li ser sosyolojiya bi navenda Ewrûpa, kurtasî bikin;

**a-** Rexne û darazdan ên pozîtîvîst, ên li ser ol û metafizîkê, bi xwe jî nekarîne ji bûyîna cûreyekê ol û metafizîkê wêdetir biçin. Pêwîst e mirov ji vê yekê lomeyan neke. Ji ber ku çanda mirov bi xwe neçar e bibe metafizîk. A girîng ew e ku mirov di navbera metafizîka baş û xirab de cûdatî bike.

**b-** Binavkirina civakê bi awayê dubendiyên hoveber-nûjen, kapîtalîst-sosyalîst, sanayî-çandinî, pêşveçûyî-paşmayî, biçîn-bêçîn û bidewlet-bêdewlet, di wê meylê de ye ku perde zêdetir bavêje ser pênaseya nêzî heqîqetê ya li ser xwezaya civakê.

**c-** Ji nû ve afirandina civakê, ti wate dernabirre, ji bilî xwedaperestiya nûjen. Hîn rasttir, di bin her ji nû ve pêngava afirîner de, meyleke nû ya afirandina yekdestiyên sermaye û desthilatî û dewlet heye. Çawa ku xwedaperestiya Çaxa Navîn bi monarşiyên teqez (mûtlaq) (padîşahî, şehînşahî û sûltanî) re di nava pêwendiya bîrdozî de ye; endazyariya civaka nûjen (modern) jî, weke ji nû ve afiranê, di bingeh de, meyl û bîrdoziya xwedatiya dewlet-netew e. Pozîtîvîzm, di vê wateyê de, xwedaperestiya nûjen e.

**d-** Şoreş nikarin bêne şîrovekirin weke çalakiyên ji nû ve afirandina civakê. Nexwe, wê nikaribin ji xwedaperestiya pozîtîvîst rizgar bibin. Dikarin bêne pênasekirin weke ‘şoreşên civakî’, di rêjeya ku civakê ji barê pirole yê sermaye û desthilatiyê rizgar bikin.

**e-** Erka şoreşgeran nikare bê destnîşankirin weke afirandina her çi modêla civakek, ku projeya wê çekiribin. Lê, di rêjeya ku tevkarî li pêşketina civaka exlaqî û polîtîk bikin de, pênasekirineke erk a rast, dibe şayanî wan.

**f-** Rêbaz û paradîgmayên ku li Xwezaya Civakî bêne sepandin (tetbîqkirin), nikarin bêne wekhevkirin li gel yên li ser Xwezaya Yekemîn. Dema ku nêzîkatiya gerdûnewer a di derbarê Xwezaya Yekemîn de rê li ber encamên bêhtir nêzî rastiyê (lê ez nikarim tiştekî bi navê rastiya teqez-heqîqeta mûtlaq- bihizirin) vedike, dîmaneweriya di derbarê Xwezaya Civakî de bêhtir li nêzî rastiyê dimîne. Gerdûn nikare were ravekirin, ne bi vegotina xetî ya dûz a gerdûnewer a bêdawî û ne jî bi çerxên çemberî yên dirûv ên bêdawî.

**g-** Pêwîst dike ku rejîma heqîqeta civakî, li ser bingeha rexneyên ku dikare hîn zêdetir bûne pêşxistin, ji nû ve were rêkûpêkkirin. Bê gûman, ez qala afiraneke nû ya xwedayî nakim. Lê ez di wê baweriyê de me ku hêza taybetmendiya herî xurt a aqilê mirov heye ku li heqîqetê bigere û ew ava bike.

Di derbarê sîstematîka zanista civakî ya ez dixwazim pênase bikim de, van pêşniyarên li jêr di roniya van rexneyan de pêşkêş dikim:

**(a)** Watedarkirina Xwezaya Civakî weke şêweyeke herî nerme ya heyînên bingehîn ên gerdûnî bi cewaziyên zengîn ên girêdayî mercên dem (zeman) û cî (mekan), di şûna pêşkêşkirina wê weke heqîqeta sext a gerdûnewer bi honakên wate yên mîtolojîk, olî, metafizîkî û zanîstî (pozîtîvîzm) de, rê li ber pêşkêşiyên bêhtir nêzî heqîqetê vedike. Her şîrove, her wisa pêngavên ji bo zanista civakî û guherana pratîk ku, beyî naskirina baş a wesfên Xwezaya Civakî, bêne kirin, dibe ku çewt bizivirin li mirov. Eger wan vegotinên ku bi dirêjiya dîroka şaristaniyê, ji nezîkatiyên xwedayî heya nêzîkatiyên pozîtivîst hatine pêşxistin, nekarîne pêşî li yekdestiyên sermaye û desthilatiyê bigirin ku negihijin lûtkeyê, erka wan a jêvenger e, di hêla xizmet bo civaka exlaqî û polîtîk de, ku bi rexnedaneke bikok, xwe di şîroveyeke hîn mirovanetir re derbas bikin.

**(b)** Hêmana serekî ya Xwezaya Civakî, civaka exlaqî û polîtîk e, ku wateya wê ya hem dîrokî hem yekparetî dide û yekîtiya wê, weke taybetmediya bingehîn a heyîna wê, dinimîne. Ya karakter dide xwezaya civakî, pênaseya civaka exlaqî û polîtîk e, ku yekîtiya wê di nava cewaziyê de didomîne, dîrokîtî û yekparetî ya wê ya serekî derdibirre û rola hemana destnîşankar dileyîze. Ti yek ji wesfandinên hoveber, nûjen, feodal, koledar, kapîtalîst, sosyalîst, sanayî, çandinî, bazirganî, diravî (pereyî), bidewlet, binetew, serwer û wekî vana, ku di derbarê civakê de pirr têne bikaranîn, wesfa destnîşankar a Xwezaya Civakî dernabirrin. Berevajî, perde davêjin ser wê û encameke wate ya biperçe dizayînin (diafirînin), ku ev jî cewhera nêzîkatî û pêkanînên teorîk û pratîk ên şaş di derbarê civakê de pêktînin.

**(c)** Bêjeyên weke nûkirina civakê û ji nû ve afirandina civakê, li gel naverokên wan ên bîrdozî, operasyonên çêkirina yekdestiyên nû yên sermaye û desthilatî ne. Dîroka şaristanî, weke dîroka van nûkirinan, dîroka daneheva lodî (berhevî, kumulatîv) ya sermaye û desthilatî ye. Çalakiya bingehîn a pêwîst di derbarê civakê de, di şûna afiraneriya xwedayî de, divê têkoşîn be li hemberî hêmanên ku nahêlin tevna exlaqî û polîtîk a civakê pêş bikeve û erka xwe pêk bîne. Civaka ku rehendên xwe yên exlaqî û polîtîk bi rengekî azad bixebitîne, ew civak e ku wê pêşketina xwe bi awayê herî baş bidomîne.

**(d)** Şoreş şêweyên çalakî yên civakî ne, ku serî li wan tê dayîn, tenê dema ku bi awayekî tund were astengkirin ku civak erka xwe ya exlaqî û polîtîk bi rengekî azad bidomîne û bi cî bîne. Şoreş, ne ji bo afirandina civak, netew û dewletên nû ne, lê ancax dema bêne pêşxistin ji bo ku civaka exlaqî û polîtîk bigihînin erka wê ya azad, dikarin ji alî civakê ve, weke rewa, bêne pejirandin û divê bêne pejirandin.

**(e)** Qehramanî (lehengî) ya şoreşgerî, divê bi tevkariyên ku li civaka exlaqî û polîtîk bike, wateya xwe bibîne. Her cûre çalakiya ku vê wateyê di xwe de wernegire, wergirî (çap, modîne) û demsala wê çi dibe bila bibe, nikare weke lehengiya şoreşgerî ya civakê were pênasekirin. Ên rola takekessan di nava civakê de di wateya erênî de destnîşan dikin, tevkariyên di pêşketina civaka exlaqî û polîtîk de ne.

**(f)** Zanista civakî, ku pêwîst e were pêşxistin, bi rêya kirina bi kûranî van taybetmendiyên serekî mijara lêgerîn û lêkolînê, ne dikare pêşveçûneriya xezîkî ya dûz a gerdûnewer û ne jî dikare dîmanetiya yekanîgir a çerxî ya bêdawî esas bigire. Di tehlîla dawî de, divê zanista civakî were

pêşxistin ku rêbazeke wisa diyalektîkî esas bigire ku were wateya hemahengiya zekaya analîtîk û hestî, her wisa qalibên sext ên subjektîvîzm û objektîvîzmê derbas bike ji rewakirina danehevên lodî (berhevî, kumulatîv) yên sermaye û desthilatî yên di dîroka şaristaniyê de.

Eger em pêşkêş bikin bi awayê xalên serekî, careke din, taybetmendiyên derbarê yekeya serekî ya Sîstema Şaristaniya Demokratîk, ku em dikarin çarçoveya wê, weke paradîgmatîk û ampîrîk (teorîk û pratîk), bi awayê rawêjên (feraziyên) wisa pêşkêş bikin:

**1-** Civaka exlaqî û polîtîk, taybetmendiya bingehîn a civaka mirov e, ku pêwîst e ji destpêka wê heya dawiya wê bi berdewamî lê were gerîn. Civak di bingeh de exlaqî û polîtîk e.

**2-** Civaka exlaqî û polîtîk cî digire li cemser (qutb) a dijber a sîstemên şaristanî, ku li ser sêmendiya bajêr-çîn-dewlet (berya wan li ser pêkhateya xerarşîk) hiltên.

**3-** Civaka exlaqî û polîtîk, weke dîroka xwezaya civakî, bi sîstema şaristaniya demokratîk re di nava hemahengî de pêş dikeve.

**4-** Civaka exlaqî û polîtîk, civaka tewrî (herî) azad e.

Ti dînamîka dîtir a destnîşankar, bi qasî xebitîna tevn û organên exlaqî û polîtîk, ne mijara gotinê ye ku civakê azad bike û wê azad ragire. Ti yek ji şoreş û qehremanan nikarin di wê şiyanê de bin ku civakê bi  qasî rehenda exlaqî û polîtîk azad bikin. Bi ser de, şoreş û qehremanên wan, ancax di rêjeya ku tevkarî li civaka exlaqî û polîtîk bikin de, dikarin rola destnîşankar bileyîzin.

**5-** Civaka exlaqî û polîtîk, civaka demokratîk e. Demokrasî dikare wate wergire, tenê li ser bingeha heyîna civaka exlaqî û polîtîk, ku civaka vekirî û azad e. Civaka demokratîk, ku takekes û kom têde dibin subje, awayê rêveberiyeke wisa ye ku, weke berhember, civaka exlaqî û polîtîk herî zêde pêş dixe. Hîn rasttir, ji xwe em ji sazbarî (erkdarî)ya civaka polîtîk re dibêjin demokrasî. Polîtîka û demokrasî, di wateya rastîn de, têgînên wekhev in. Eger azadî qadeke avhewayî be ku polîtîka xwe têde derbibirre, demokrasî jî di vê qadê de şêwaza pêkhatina polîtîkayê ye. Sêmendiya azadî, polîtîka û demokrasî, nikarin ji bingeha exlaqî bêpar bin. Her wisa mirov dikare ji exlaq re bêje awayê kevneşopî yê sazîbûyî yê azadî, polîtîka û demokrasiyê.

**6-** Civakên exlaqî û polîtîk, di nava nakokiya berhemberî ya diyalektîkî de ne bi dewletê re, ku derbirrîna fermî ya awayê her cûre sermaye, mulkiyet û desthilatî ye. Dewlet hertim dixwaze huqûqê têxe şûna exlaq û rêveberiya burokratîk jî têxe şûna polîtîkayê. Li herdu nîçikên vê nakokiyê, ku bi dirêjiya dîrokê dewam kiriye (dike), sîstematîka şaristaniya fermî ya bidewlet û ya şaristaniya ne-fermî ya demokratîk pêşdikeve. Du tîpolojiyên cûda yên wate derdikevin holê. Nakokî, dibe ku, yan pirr dijwar bibin û rê li ber şer; yan jî têkevin rêya lihevhatinê û rê li ber aştiyê, vekin.

**7-** Aştî gengaz dibe bi vîna hêzên civaka exlaqî û polîtîk û ya hêzên yekdestî yên bidewlet, ku, bi rengekî bêçek û bêkuştin, bi hevdu re bijîn. Rewşên aştiya mercdar, ku jêre tê gotin ‘lihevhatina demokratîk’, bêhtir ji yên ku civak dewletê, yan jî dewlet civakê tune bike, rewşên wisa ne ku di dîrokê de hatine jiyîn. Dîrok, ne bi tevahî bi awayê şaristaniya demokratîk, weke derbirrana/îfadeya civaka exlaqî û polîtîk, û ne jî bi tevahî bi awayê sîstemên şaristanî, weke derbirrana/îfadeya civaka biçîn û bidewlet, tê jiyîn. Lê biawayên ku rewşên şer û aştî, di nava hev de

û bi têkilî û nakokiyên kûr, berra hev didin, tê jiyîn. Tevî ku utopîk e rakirina yekser ji holê, bi şoreşên awarte, vê rewşa ku herî kêm ji pênc hezar salan û vir ve didome; pesendkirina weke qeder vê herikîna ku ji dema bihûrî ve didome û tê, û destlênewerdana li rêveçûna wê ya herikînê jî, nikare bibe rewşên rast ên exlaqî û polîtîk. Bi zanebûna ku wê têkoşîna sîsteman dirêj bajo, nêzîkatiyên stratejîk û taktîk, ku qada azadî û demokratîk a civaka exlaqî û polîtîk fireh bikin, zêdetir watedar û encamgir in.

**8-** Pênasekirina civaka exlaqî û polîtîk bi sifet (wesf-nav)ên komunal, koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst, weke ku hevdu bişopînin, li şûna ku vebêjer be, rola nixumandin (perdêkirin)ê dilîze. Bê gûman, tevî ku di civaka exlaqî û polîtîk de cî nîne ji sifetên koledar, feodal û kapîtalîst re, gengaz e ku mirov di nava pêkhevî û lihevhatina rêgezî de bi rengekî bimesafe, sînordar û bikontrol nêzî van sifetan bibe. Ya girîng ew e ku mirov ne wan tine bike û ne jî ji alî wan ve were daqurtandin; lê, mirov qad û hêzên wan, bi raseriya civaka exlaqî û polîtîk, bi berdewamî sînordar bike. Sîstemên komunal û sosyalîst, di rêjeya ku bibin demokratîk de, dikarin wekhev bibin li gel civaka exlaqî û polîtîk.

**9-** Nabe ku weke hedefa acîl hebin armancên civaka exlaqî û polîtîk ên weke bibe dewlet-netewek, bijareyeke olî bike û li pey rejîmên, li derveyî demokrasiyê, bibeze. Ancax vîna azad a civaka exlaqî û polîtîk mafê destnîşankirina armanc û wesfên civakê diyar dike. Her wisa hem gotûbêj û biryarên rojane, hem jî biryarên stratejîk, ji alî vîn û derbirrana/îfadeya exlaqî û polîtîk a civakê ve têne destnîşankirin. A girîng ew e ku mirov gotûbêj û nîqaşan bike û karibe bibe hezar [girtina] biryaran. Civaka ku vê hêzê di destê xwe de bigire, dikare bijareyên xwe bi awayê herî bijûndar destnîşan bike. Rayeyan ti takekes û hêzan nîne ku bi navê civaka exlaqî û polîtîk biryaran bigirn. Nabe ku ‘endazyariya civakê’ di civakên exlaqî û polîtîk de derbasdar bin.

Di ronahiya van pênaseyan de, ku min ji aliyên cûrbecûr ve wan pêşkêş kir, wê bê dîtin ku sîstema şaristaniya demokratîk, weke rûyê din ê dîroka şaristaniya fermî, bi awayê yekparetî ya exlaqî û polîtîk a xwezaya civakî di cewher de her hebûye û xwe daye berdewamkirin. Rûyê din ê civakê, tevî hemû zordarî û mêtina sîstema fermî ya cîhanê, nekariye were tunekirin. Ji xwe, gengaz nîne ku bê tunekirin. Çawa ku kapîtalîzm, bêyî hebûna civaka ne-kapîtalîst, nikare hebûna xwe bidomîne; şaristanî jî, weke sîstema fermî ya cîhanê, bêyî hebûna sîstema şaristaniya demokratîk, nikare hebûna xwe bidomîne. Weke hîn bêhtir şênber, şaristaniya biyekdestî, bêyî şaristaniya ne-biyekdestî, nikare hebûna xwe bidomîne. Berevajî vêya ne rast e; anku, şaristaniya demokratîk, weke sîstema herikîna dîrokî ya civaka exlaqî û polîtîk, bêyî şaristaniya fermî, dikare hebûna xwe bêhtir bêastengî û bihêsanî bidomîne.

Ez şaristaniya demokratîk, li gorî pêdiviya pênaseya wê, hem weke sîstematîkek û daneheveke raman, hem jî weke yekparetî ya rêsayên exlaqî û organên polîtîk derdibirrim. Ez qala ne dîrokêkê raman, ne jî rastiya civakî ya di nava pêşketina exlaqî û polîtîk de dikim. Gotûbêj, weke di nava hev de, herdu mijaran jî digire nava xwe. Ez pêwîst û girîng dibînim ku, di hêlên rêbaz, dîrokçe û hêmanên wê de, hinekî zêdetir vekim, ji ber ku yekparetiyeke vegotin û pêkhateyên wisa ne ku ji alî şaristaniya fermî ve têne astengkirin. Sernivîsên piştî vê, wê van mijaran [rêbaz, dîrokçe û hêmanan] bigirin nava xwe.

**B- Nêzîkatiya Rêbazane bo Şaristaniya Demokratîk**

Rêbaza nêzîkatiya gerdûnewer, dûz, xêzikî û pêşveçûner, di zanistên civakî de rê li ber pirsgirêkên têgihîna rastiyê, herî kêm bi qasî yên dogmatîzma olî, vedike. Cewaziya darazên wê jî ji misogeriya olî nîne. Gerdûn di nava pêçveşûna bêdawî de ye; di Levhî Mehfûz de çi qeydkirî be, ew pêk tê. Bi gotineke din tişta ku pêk tê, yekane tişt e ku pêwîst e pêk bê. Her tişt weke pêşbînîkirî pêk tê. Pozîtîvîzm, ne dij-metafizîkî û dij-olî ye, berevajî tê rawêj (texmîn)kirin, ola herî çors a materyalîst e, ku cîlayakê teknîk a zanistgerî lê hatiye têdan. Hîn rasttir, pûtperestiya modernîte ye. Dirûviya bingehîn a di navbera van herdu rêbazên dogmatîk de, di derbarê hebûna hêzekê de ye, ku jê re tê gotin zagona li xwezayê serwerî (hukm) dike. Li şûna zagonên xweda, tenê peyva ‘zagonên zaniste’ hatiye danîn. Jê pê ve, heman vegotin e. Aliyê herî wehîm ê rêbaza ramana pozîtîvîst, vê nêzîkatiya di darazên wê ya di hêza zagonê de ye. Şîrove nîne. Nêrîna darazî, ya misoger, objektîv û ku li gorî herkesî heman be, di cewher de çewtî/tersî zansitê ye jî. Weke encama xwe spartina veqetîna tûj a subje-obje, cî ji para şelipîn (şaşbûn)ê re jî nahêle.

Hewldana çîna burjuwa ya pêşkêşkirina teolojiya çaxa navîn, weke felsefeyekê sekular û zanistgir a boyaxkirî bi cîlaya pozîtîvîzmê, dikare bê têgihîştin. Elbet, wê ew, şopa rastiya civakî, ku di malzaroka wê de zaye, di xwe de wergire. Bêyî xwe rizgarkirina ji nêzîkatiyên hêmayî (sembolî), ku ji Çaxa Navîn û vir ve, heta bi dirêjiya tevahiya dîroka şaristaniyê li mejiyên me hatine barkirin, wê bûbûya tiştekî jêveneger ku pêla pozîtîvîst mejiyên me hema hema dîl girtibana. Ev rewş firset neda ti pêşketinek, ji bilî ku me got qey retorîk (wesf/şarezatî û cambaziya peyvan)a pirole ya dubarekar, hundirê wê vala û hişk, rastî ye. Şûna çîvanoka berê ya “mele/îmam her çi bibêje, rast e”, çîvanoka “mamoste û fîlozof her çi bêjin, rast e” girt. Di bingeha neberdariya mejiyên me de ev rastî heye. Lewre, tew em ji wî mafê xwe jî bêpar man ku em karibin derbarê xwezaya xwe ya civakî de şîroveyekê bikin. Ev, rewşeke pirr wehîm e. Korbûn û dîlbûna ji ber xwe ve ya mejî ye. Dogmatîzma olî, qet nebe, bi cûreyek hêza kevneşopê, hin rastiyên dîrokî tîne bîra mirovan. Lê, di pozîtîvîzmê de ev jî tine ye. Bend (dîwar)eke qirase ya biyanîbûnê di navbera me û rastiyên me de lêdike/dihone. Weke hêza serwer a bîrdozî ya Rojava, didirûve/dişibe rewşek wisa weke ku, bêyî teqandina çekan (bêyî bikaranîna mejî), mirovan radest/teslîm bigire. Eşkere ye ku, bêyî şkandina vê dogmatîzmê, nekarî gengaz bibûya ku, şaristaniya fermî bi gelemperî û paradîgmaya nûjen (modern) a kapîtalîst bi taybetî, bihata şkandin. Lewre, me nekarî em xwe bigihînin hêza azad a şîrovekirinê. Ez di vê ramana xwe de îqna bûme: çekên bîrdozî, ji çekên leşkerî zêdetir rola qedexeker dileyîzîn.

Dema min pirsa “gelo mirov dikare şaristaniya demokratîk bike sîstemekê?” ji xwe pirsî, ez hindik negewixîm (pevneçûm) bi van zincîrên rêbazane re. Ya herî dijwar jî, şkestina dogmayên di derbarê sosyalîzma zanistî de bû, ku ez pirr jê bawer dikim. Hema bêje tu bi xwe re şer dikî û bi vî rengî tu rizgar dibî ji bûyîna dîla/ê dogmatîzmê. Bi ser de, beşeke mezin a jiyana min bi vê mijûliyê bihûrî.

Ez nakokiyekê wisa jî dijiyam: li milekî, dema ku em hîn jî di bin bandora çandekê de bûn, ku di niştimana dayîk a şoreşa çandiniyê de ji hezaran salan û vir ve (ji 10.000 B.Z. heya roja me ya îro) tê jiyîn; li milê din, me xwe amade kiribû ji bo têkoşîna damezrandina civaka piştî kapîtalîzmê. Lê, bêyî tehlîlkirina valatiya herî kêm dozdeh hezar salî ya di navberê de, me yê çawa civaka nû damezrandiba? Sîstema me ya ramanê, veguherîbû cûreyek zanista axretê (eskatolojî). Eşkere ye ku di ramana min de rêbazeke berdar cî negirtibû. Ew nexweşiya ku mirov nikare yek santîmet jî

wêdetir ji yên nivîsandî bihizire, dikare ancax bi bandora dogmatîzmê ve were ravekirin. Bêyî ku me karîbûya xwe rizgar bikira ji wîrewîra (hewlên beredayî yên) qalibên olî, vê carê em rastî bombebarana “gotina min gotin e” ya pozîtîvîzma fermî hatin. Ez têgihîştim ku hêza rasteqîn a nîgahdar (parêzvan) a sîsteman, çavkaniya xwe ji serweriya xwe ya bîrdozî digirin. Loma, ez niha baştir têdigihîjim, gewixîna Nietzche ku li hemberî hêza bîrdozî ya fermî ya Alman, heya ku aqilê xwe avêt, têkoşînê kir. Eger em li ser Rojava çend heqîqetên resen dizanin, diyar e em vana, deyndarî vê gewixîna dîn û harkî ne.

Dogmaya yekemîn ku ez bi têra xwe ji bandora wê rizgarbûm, derbarê wê îdeaya zanista civakî de bû ku [dibêje] wê piştî civaka komunal a seretayî, sîstemên din ên civakê yên çînî, bi rengekî neçarî li pey hev werin. Min vê dogmayê demekê dirêj weke cûre zagonekê pejirandibû. Her wisa ez dereng nemam ku bişkînim wê binavkirina civakê bi çînan, ku duyemîn dogma ye ku bi vê dogmayê re di nava hev de ye. Pênaseyên civaka koledar û feodal, rastiyê di ciyê wê yê herî hestyar de dinuxaftin û civakê wekhev dikirin li gel efendiyan. Eşkere bû ku vana jêmayiyekê devên zal/hakîm bûn. Dîsa, min zoriyê nekşand ku ez dogmaya sêyemîn jî, ku bi [herdu]yên din re di nava hev de ye, weke verisana goreyekê li peyv hev verisînim (ji hev bikim). Ez qala dogmaya di derbarê wê yekê de dikim, ku dibêje qonaxên civaka biçîn neçarî û pêşveçûyî ne. Ez têgihîştim ku qonaxên civaka biçîn qet ne neçarî û pêçveçûyî ne; her wisa ez biwêrekî tevgeriyam ku wê weke pêşketineke berevaj a herî paşverû û zincîrker binirxînim. Encam, ew bû ku vegotinên li ser dîrokê, yên mirov zêdetir nêzî rastiyê bikin, gengaz bûn. Bêyî fikarekirina ji şîroveyên piralî, berevajî, zêdetir di cî de bû ku, weke hewldaneke zengînkirina wateyê, bihata nirxandin. Dema ku dogmatîzm (pêşdarazî) di gelek qadan de hatiba şkandin, elbet wê hêza şîrove û zengîniya wate pêş biketana. Ez dikarim vê mijarê bi zelalî diyar bikim: Mirov li ku derê û di kîjan rewşan de dibin bila bibin, eger nikaribin pirsgirêkên li pêşiya xwe çareser bikin, sedema herî bingehîn a vê yekê, dogmayên bi hezaran salan in, ku nekarîne xira bikin, û astên wan ên ramana hoveber in, ku nekarîne wêrekiya xwe rizgarkirina ji ajoyan nîşan bidin. Tirsonekiya di raman de, di bingeha hemû tirsonekiyan de heye.

Duyemîn mijara girîng a di dema ramankirina şaristaniya demokratîk de, malzemeya ampîrîk a şênber a pirr zêde ya li derdora min bû. Van malzemeyan, qatbiqat bi zêdeyî dibûn şahîdên çavdêriyên li ser dîrokê. Gelo çima sîstema xanedaniyan, a talanên nirxa-bermayî û ya nîvengên desthilatî hebe, lê malbat, qebîle eşîret û gund, ku hema hema şanikên kok ên civakê ne, her wisa çînên li bajêr ên derveyî desthilatî û gel û netewên nedewletbûyî, bi rengekî sîstematîk (serûber) neyên nirxandin? Û, çima vana bi xwe nebin sîstem û weke bîrdozî û pêkhate wate negirin?

Eger, yên ku me hêviya xwe bi wan ve girêdaye, nekarîne bersivên têr bidin van pirsan, diyar e sedemên wan hene. Nexwe, eşkere ye ku vana ne wisa pirsên bêpar ji arastiyê ne. Bi ser de, bersivên ku beş bi beş hatine dayîn, sîstematîk (bi ser û ber) nebin jî, ne hindik in. Tenê bes e ku em zanibin li bersivan bigerin!

Pêker/faktora sêyemîn, dema mirov berê xwe dide lêgerîna ji bo şaristanî û moderniteyeke cewaz, potansiyela avakirina azad e di derbarê xwezaya civakî de. Eger li holê pirsgirêkên dewane yên lodbûyî hene û mirov ji bêkarî û birçîtiyê di rewşeke bêpertav de ne, avakirinên sîsteman (ne di wateya afirandin û endazyariya civakê de), hem gengaz e û hem jî neçariyeke girîng e; her wisa deynekî stû yê exlaqî ye. Ji xwe, rehenda pirsgirêkan pêdiviya bi şoreşê û şoreş jî pêkhateyên ku ji bersivan pêk tên, tînin rojevê.

Pêker/faktora çaremîn a lêgerîna min ew e ku, eger sîstem ti hêvî nade te, te weke mirov nahesibîne, her wisa tew bala xwe jî nade pirsgirêkên te yên herî ji rêzê yên nasnameyî û nikare ji wan re bibe çareserî; di vê rewşê de tişta ku tu weke pêdiviya bûyîna mirov bikî ew e ku tu zanibî rêzgirtina li xwe û hêviyê, bi hêza avakirina sîstema xwe ve girê bidî. Nexwe, ya ku li sifreya guran li benda te ye, ne jibermayiyên hestî ne, lê belkî jî tu bi xwe dibî qût/êm.

Pêker/faktoreke dawîn, belkî xweser bo min e, lê ez bawer dikim ku gelemperî ye. Ew jî ew e ku ya/yê tu hêviya xwe pê ve girî didî, dayîka te be jî, eger ne di wê rewşê de be ku tiştek pêşkêşî te bike, tu yê jî, weke takekes, fikare nekî ku bi hêza xwe ya cewherîn bawerbî. Her wisa tu yê radestî rast û çepê û ajoyan nebî. Eger li holê rewşek ku têde bê jiyîn nebe, [wê demê] zanibe ku tu, weke mirov, xwedî wê hêzê yî ku nîşan bidî ew aqil û vîna ku karibe ya baş, a rast û ya xweşik ava bike!

Civaka bajêr, ku piştî civaka çandinî ya gund hilhat, li gorî şîroveya xêzikî ya dûz li ser dîrokê, di şûngeha (hukmê) 'gotina dawî'de ye. Çîrokkirinên li ser şaristaniyê ku li derdora bajêr têne pêşxistin, rastî bi xwe ne. Hêza ku li bajêr rêvebiriyê bi dest dixe û olê weke dewlet birêxistin dike, weke çîna serwer, hêza mator  a dîrokê ye. Her çi bike, rast e û pîroz e; pêkhatina miqedes a nivîsa di eniya mirov de ye. Bi vê armancê, serweriyên bîrdozî yên xwedayî têne bilindkirin. Her dengekî dijber, weke xiyanet li gotina ezelî-ebedî û li derbirrana/îfadeya wê ya jiyanê, tê hesibandin û bi vî rengî 'xezeba xweda' lê tê barandin. Tevahiya karên bêrûmet  (pergalên herî pispaye/nizm yên zordestî û mêtinê) ên zordar (destpot), ji devên keşîşan, weke gotinên herî pîroz ên xweda yan jî xwedayan, têne rêzkirin. Êdî stûyên bendeyan li pêşberî zagonên xweda, ji mûyê ziravtir in. Eger stû were firîn (jêkirin) jî, tew naêşe.

Serdema bajêr, anku şaristanî, weke rêxistina zorê û sermaye, ku bi awayê resen weke mîtolojî yan jî ol, têne kirin vegotineke tew bi awayekî çors û bi vî rengî tê pêşkêşkirin, veguheranên cûrbecûr derbas dike û heya roja me ya îro diguhêze (tê). Tevî ku cewhera wî heman e, lê bi rêya guherandina retorîk û forma wî (şêweya wî ya rêxistinê), ew hinde hatiye pêşkêşkirin ku li hemberî tevahiya cilayên wê ku jêdiçin, êdî fikare nake ku xwe weke faşîzmekê hişkobiringo ya dewlet-netew, ebedî îlan bike. Tevlî qefesa ji hesin a burokratîk, weke rêxistina zorê û sermaye ya bajêr, tevlî yên di qefesê de, li gel qansêrbûnên biyolojîk û AIDS, a wehîmtir, bitevahiya pêkhateyên hundirîn ên xwezaya civakî, tevlî jîngeha wê ya xwezayî, hatiye ketin nava qonaxa qansêrbûnê. Dema mirov li van mêtingerî û şerên çarsed salên dawî (herî zêde panzdeh hezar salên dawî) yên sîstema cîhanê, li rewşa şer ku li tevahiya civakê belav bûye û li awayê rojaneyî yê felaketa jîngehê binêre, têrê dike ji bo mirov têbigihîje ku vê vegotina bi xetên pirr qalind (stûr), ne nitrandinek e.

Dema em li hemû awayên serweriya bîrdozî ya lîberal û bêhtir jî li qadên wê yên fermî (bîrdoziyên dewletê) binêrin, paşiya dîrokê bi vî rengî hatiye dawiyandin. Bi gotineke din, sîstema kapîtalîst, di lûtkeya çaxa kûrewî (global) de, awayê ebedî yê gotina dawî ye. Em dizanin ku ev vegotin ne nû ye; di dawiya her çaxên girîng ên sermaye û zordariyê de ragihan (îlan)ên bi vî rengî yê 'ebedîtî' têne kirin. Vaye, heqîqet ev e, ku ji alî 'zanistên'şaristaniya pênc hezar salî ve, bi hezaran qilf lê hatiye kirin û hatiye rêbazîkirin. Rêbaz bûye heqîqet û heqîqet jî bûye rêbaz.

Eger li guhên mirovan pistînî (pistepist) bê kirin û bê gotin ku dibe cîhan, zanist û rêbazên dîtir hebin, [wê demê] li gel gotinên dojehtî, paşevajbûyîtî (jirêderketîtî) û kafirtî, her şêweya sînor-nenas a 'teror'ê (derbaskirina di çarmixê de, şewitandina di agir de, bidardekirin, dayîna cezaya

kişandina bêrikê bi dirêjiya jînê, razandina li êşkenceyê, xebitandina heya mirinê, rizandina li zîndanan, pîrekkirin, şêweyên bêsînor ên mêtingehkirinê, asîmîlasyon û wekî vana) di dewrê de ne.

Em dibin şahîd ku şaristaniya navendî, ku wisa tevdigere weke ku tola xwe hilîne ji civaka çandinî û gund, ku ev pênc hezar sal in hewl dide wê birûxîne, dixwaze di salên 2000î de vê civakê bi tevahî bide îflaskirin û hewl dide şopên (rêçên) wê yên dawî jî jêbibe (xira bike). Rûxana jîngehê, di rastî de, awayê dawî yê tolhildana ji CIVAKA ÇANDINÎ Û GUND e. Pirr seyr e; di şûna Xwezaya Civakî de, ku hatiye bêdengkirin, Xwezaya Yekemîn bi felaketên cûrbecûr (germbûna avhewayê, hişkayî (ziwayî), helîna bilez a bûzên cemserê, tunebûna bilez a cûreyan (lawiran), felaketên lehî û bageran/babelîskan û wekî vana), ku dibe sedem, bersiva xwe dide vê rûxanê. Yekcarna wer li mirovahiyê (mirovahiya bêdengkirî) tê ku dikare bibe xwezaya herî lal. Ma kî dikare înkar bike ku ev, biêş e, lê rastiyek e?

Guheraniya herî bingehîn a di paradîgmaya li ser dîrokê de, divê derbarê wê yekê de be ku, eger civaka çandinî-gund (10.000 B.Z.. Heya roja me ya îro) nebe, wê yekdestîperestiya bibingeha bajêr a sermaye û desthilatî pêşnekeve. Mirov dikare di vê xalê de biçe guherana herî bingehîn a rêbazî. Şewazeke zêdetir rast a vegotinê ye ku derbirrana/îfadeya tehlîla bi dirêjiya civaka-dîrokî ye ku mirov pênaseya Rosa Luxemburg, ku bi rengekî pirr serkî tîne ziman, weke “eger civaka ne-kapîtalîst nebe, wê kapîtalîzm, danehevkariya sermaye û yekdestîperestiya wê jî nebin”, li tevahiya dîrokê û li şêweyên sermaye belav bike. Modêla K.Marks a civaka saf kapîtalîst, şaşîtiya wî ya herî bingehîn e, ku kiriye. Ji ber ku civakek wisa, ne di alî pratîk de, ne jî di alî teorîk de, gengaz nîne. Delîla wê hêsan (basît) e: Em bêjin ku di nava civakek de tenê kapîtalîst (tevlî burokratên xwe ve) hebin. Ji ber ku civaka saf kapîtalîst, pêşbîniya vê yekê dike. Em rawêj bikin ku di karxane/fabrîkayên sermayeyê de bi tevahî sed yeke mal bêne hilberandin. [Di vê rewşê de] wê bîst û pênc yekeyên mal, di bergîdana mizeyê de, bibin yên karkeran. Bila bîst û pênc yeke jî ji bikaranîna çîna sermayedar re bimînin. Ey baş e, ma wê çi ji pêncî yekeya mal werin, ku ji ber dimînin? Yên ji ber dimînin, yan wê birizin, yan jî wê belaş bêne belavkirin. Li gorî modêla civaka saf kapîtalîst, cûreyeke dîtir ne gengaz e.

Dema ku Rosa ji vê xalê birê dikeve û dibêje tenê eger ev pêncî yekeya mal bi armanca karê ji civaka ne-kapîtalîst re were firotin, wê sîstem karibe gengaz bibe, di peravên rastiyê de digere. Lê, rastiya civakî hîn berfirehtir e. Wekî din, pêwîst e pirr baş bê zanîn û qet neyê jibîrkirin ku kar û daneheva sermaye ya spartî bi wî, zêdeka civakî ye ku bergîdana wê nayê sencandin. Gelo kî ye civaka ne-kapîtalîst? Di serî de civaka çandinî û gund e: civaka jinê ye, ku li malan hatiye ragirtin: her wisa beşên bajêr in, ên zenaetkar, ku hejar in û bi keda xwe debara xwe dikin, û bêkar, ku bi alîkariyê debara xwe dikin. Dema rastî bi vî rengî were danîn, wê derfet çêbe ku şaristaniya pênchezar salî û sîstema cîhanê ya kapîtalîst, a çarserd salên dawî, ku heyama wê ya herî sîstematîk e, çêtir bêne tehlîlkirin. Şebeke (arîstokrasî, efendî, burjuwazî, her wisa yên bidewlet û bidesthilat, û wekî vana), ku bi dirêjiya tevahiya dîrokê xwe weke sermaye û desthilatî bi rêxistin kiriye, weke rawêjî (texmînî), ti caran derneketiye ser ji sedî deh ê tevahiya şêniya civakê. Lewre, gewdeya serekî ya xwezaya civakê, herdem li ser ji sedî not e.

Wê demê em di hêla rêbaz de bipirsin: kîjan ji vana bêhtir rê û rêbaza rast e: dîrokîkirin, sîstemkirin û kirina objeya bingehîn a ramana ji sedî deh, an dîrokîkirin, sîstemkirin û kirina objeya bingehîn a ramana zêdetirî ji sedî not? Rastiya bingehîn, ku pêwîst e li bersiva wê were gerîn, ev e.

Belkî karibe bê gotin ku ji ber kombûna raman, zanist û rêbaz, di bin yekdestiya vî ji sedî deh de ye, loma bi cûreyek dîtir gengaz nabe. Lê, ma qey ev yekdestî di tehlîla dawî de li ser xesp û mehandina zêdeka civakî nehatiye damezrandin? Gelo, ji ber ku koma herî rêxistî û bîrdozî ye, vê yekê îmtiyazdariya wê dike mafdar? Zarokê baş rêxistîbûyî, ji sedî yek be jî, dikare milyonan tê xe bin serweriya xwe û wan rêve bibe. Dikare yên bibêje, weke zanist û rêbaza herî bingehîn ferz bike. Lê ev rastî, dikare were wateya heqîqetê? Gelo kî çengekê zorbe û yekdestîperest, weke heqîqet îlan dike? Yên îlan dikin û yên, wan weke mîtolojî, ol, felsefe û zanist pêşkêş dikin, dema bi desthilatiya şebekeya sermaye û zorbe ve têne girêdan, gelo vê yekê dikare heqîqeta civakî (heqîqeta ji sedî not) biguherîne? Eşkere ye ku pêwîst e pirsgirêk bi vî rengî were girtin dest. Hêza ti serweriyeke bîrdozî, zanistî, olî, felsefî û hunerî têra guherandina vê heqîqetê nake û divê neke jî.

Dema em civaka-dîrokî di ronahiya vê rêbaza serekî de weke pêkhate lêbikolin, û em bixwazin bi şêweyên cûrbecûr ên raman (mîtolojî, olî, felsefî, zanistî û hunerî) wê bigihînin derbirranê, [hingê) wê rehendên rastiyê bêhtir bêne xuyakirin û wateya xwe bigirin. Mirov dikare şaristaniya demokratîk bigihîne sîstematîkekê pirr pêşketîtir, ku vê vegotina wê ya du-alî (objektîvîzma wê û subjektîvîzma wê wek şêwaza derbirranê; anku pêkhateyiya wê) hebe. Gengaz e û pêwîst e ku xwezaya civakî jî di nava dîrokîtî û yekparetiyeke berfireh de were sîstemkirin. Divê vê analîza sîstematîk were rûniştandin li bingeha paradîgmatîk a şoreşa zanistî û zanista civakî.

Nêzîkatiyeke bi vî rengî ji pirsgirêka rêbaz re, di wê şiyanê de ye ku xezaya civakî di nava hemû zengînî û yekparetiya wê ya dîrokî de pêşkêş bike. Di nêrîna pêşîn de tê dîtin ku

**a-** Civaka bêsermaye û bêdestihilatî gengaz e, lê sermaye û desthilatiya bêcivak ne gengaz in;

**b-** Aboriya bêsermaye gengaz e, lê sermayeya bêaborî ne gengaz e;

**c-** Civaka bêdewlet gengaz e, lê dewleta bêcivak ne gengaz e;

**d-** Civaka bêkapîtalîst, bêfeodal û bêefendî gengaz e, lê kapîtalîst, feodal û efendiyên bêcivak ne gengaz in;

**e-** Civaka bêçîn gengaz e, lê çîna bêcivak negengaz e;

**f-** Gund û çandiniya bêbajêr gengaz in, lê bajarê bêgund û bêçandinî ne gengaz e;

**g-** Civaka bêhuqûq gengaz e, lê civaka bêexlaq en gengaz e;

**h-** Weke kesê ku ew bi xwe lêde û ew bi xwe bilîze, gengaz e ku civak were xistin nava rewşeke bêpolîtîka û bêexlaq. Lê, wê demê, civak ji alî Levîathanê nû (faşîzma dewlet-netewê) ve tê perçekirin û daqurtandin, ku kêliya mirina civakê û mirov jî wisa dibe lîstika ji bo temaşeyê. Vê kêliyê, ew kêlî ye ku têde nijadkujî tê pêkanîn. Vê kêliyê, ew kêlî ye ku Michel Foucoult têde mirina mirov îlan dike. Vê kêliyê, ew kêlî ye ku Friedrich Nîetzche dibêje civak û mirov têde hatine xesandin, boçî (cûce)kirin û kurmorîkirin, her wisa wan weke kerî û girse îlan dike. Vê kêliyê, ew kêlî ye ku civak li ‘qefesa ji hesin’ a Max Weber tê ragirtin.

Paradîgmaya şaristaniya demokratîk divê û neçar e ku di vê kêliyê de têkeve dewrê:

**1-** Li gorî ku çandinî û gund nebin, civak nikare were berdewamkirin, berxwedana ku vê beşa civakê bi dirêjiya dîrokê nîşan daye, ku bi dirêjiya dîroka şaristaniya fermî tim bûye mijara mêtin û zordestiyê, dikare bigihîje armanca xwe, tenê dema ku veguhere (bibe) awayê civaka polîtîk.

**2-** Bajar, gengaz e hebin, bi mercê ku nebin baregehên yekdestiyên sermaye û desthilatiyê. Rizgariya rastîn û bajaran, ku bi dirêjiya dîroka şaristaniyê hatine neçarkrîn ku bibin baregehên mêtin û zordestiyê, gengaz dibe, tenê dema ku bibin civakên bajêr ên polîtîk û rêveberiyên demokratîk. Bi rêya pêşxistina rêveberiyên demokratîk û konfederalîst ên bajaran ku di dîrokê de pirr zengîn in, mirov dikare wan rizgar bike ji bûyîna girseyên pêkhateyên kanserolojîk.

**3-** Heya ku yekdestiyên sermaye û desthilatî, yên avabûyî li ser aboriyê, neyên tengkirin û ji holê neyên rakirin, nikare ne alozî û ne jî pirsgirêkên aborî  biqedin. Sedemên bingehîn ên rûxana jîngehê her cûre çînbûnên nepêwîst, nexweşiyên civakî û şeran, di serî de jî bêkarî, birçîtî û hejarî, têkoşînên komên sermaye û desthilatî ne, yên bo rahêştina parê li ser nirxa-bermayî ya civakî û zêdekirina parên xwe. Xwezaya civakî li hemberî van hemû pirsgirêkan û nexweşiyan bi perdeyeke nermeyî hatiye rapêçandin ku, eger emrazên sermaye û desthilatî bêne sînordarkirin, dîsa dikare bi serkeve. Dîrok, eger di hêla aborî û çînî de bê nivîsandin û xwendin, ancax bi vê paradîgmayê ve, dikare bigihîje wateya xwe ya rasteqîn.

**4-** Awayê xwezayî yê civakê, bêyî yekdestiyên sermaye û desthilatî, civaka exlaqî û polîtîk e. Divê tevahiya civaka mirov, ji zayîna xwe heya vemirîna xwe, vê wesfê bijî. Qalibên civaka koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst, weke cilên ku bêne xwestin li xwezaya civakî bêne kirin, rastiyê dernabirrin. Dibe ku îedeayên wisa hebin, lê civakên wisa nînin. Awayê bingehîn ê civakan, civaka exlaqî û polîtîk e, lê ji ber ku ji alî yekdestiyên sermaye û desthilatî ve bi dirêjiya dîrokê tim hatine tengavkirin, mêtin û mêtingehkirin, nekarîne derfeta pêşketina tam bidest bixin.

**5-** Erka bingehîn a siyaseta demokratîk, dikare ew be ku civaka exlaqî û polîtık, li ser bingehên azad, bigihîne erka wê. Civakên ku karibin bi vî rengî bibin sazbar, civakên vekirî û zelal ên demokratîk in. Civaka demokratîk çiqas pêş ketibe, wê civaka exlaqî û polîtık jî ewqas karibe bibe sazbar. Hunerê siyaseta demokratîk berpirsyar e ku civakên bi vî rengî bi berdewamî bike sazbar. Ne erka siyaseta demokratîk e ku civakan ji alî ‘endazyariya civakê’ ve bide afirandin. Ev cûre endazyarî, xebata lîberalîzmê ya çêkirina yekdestiyên sermaye û desthilatî ye.

**6-** Tevahî qraltî, împaratorî, komar, bajar û dewlet-netewan, ku bi dirêjiya dîrokê bi navê şaristaniyê hatine damezrandin, weke yeko yeko û tomerî, bi awayên xwe yên lihevhatî û hemberîgir, her wisa bi helwestên xwe yên serwer û wekhev di cewher de awayên sermaye yên desthilatbûyî û dewletbûyî ne. Armanca civaka exlaqî û polîtîk ti caran nikare wisa be ku xwe bike yekdestiyên bi vî rengî. Dikare ancax, an ji wan ser bi xwe, yan jî bi wan re di nava li hevhatineke aştiya mercdar de, bijî. Di rewşên wisa de şaristaniya demokratîk û şaristaniyên fermî yên desthilatî, dikarin di bin şêweyên cûrbecûr de li hev werin. Ji ber ku pêvajoyên aştiyê xwe dispêrin van lihevhatinên mercdar, hemû demên din ên dîrokê, yan li nava, yan jî li ser civakê di nava rewşa berdewamî ya şer de ne.

**7-** Civak, ji ber ku neçar e bi berdewamî xwe bispêre şerên (hundir û derve) yekdestîperest ên mêtinê, divê şaristaniya xwe ya demokratîk di bin şêweyên cûrbecûr de (hem di zemînê çandinî û

gund de, hem jî di nava kedkarên bajêr de) pêş bixe. Dîrok ne tenê yekûn (navgîna pêkhate û şerên herî dij-mirovatî û paşverû) a girseya desthilatî û û dewletan e, lê ji wê qatbiqat zêdetir (hebûna xwezaya civakî ya herdem li ser ji sedî not) bi mînakên şaristaniya demokratîk dagirtî ye. Tevahiya komên dêwane yên civakî, yên sîstem û konfederasyonên malbat, qebîle û eşîretan; demokrasiyên bajaran (Atîna ye mînaka herî kartêker, bi qasî ku tê zanîn) û konfederalîzmên wan ên demokratîk; keşîşxane/manastir, dergah/tekya, komun, partiyên yeksanîxwaz, civakên sivîl, terîqet, zav/mezheb; komcivakên olî û felsefî yên ne-desthilatbûyî; piştgiriyên jinan: civat û meclîsên bêhejmar ên piştgiriyê, ku derbasî nivîsê nehatine kirin û wekî vana, divê li xaneya şaristaniya demokratîk bêne qeydkirin. Heyf û mixabin ku dîroka van komcivakan, bisîstem (bi serûber) nehatiye nivîsandin. Lê di rastî de dîroka rasteqîn a mirovane dikare bibe derbirrana/îfadeya sîstematîk a van koman.

**8-** Ji ber ku şaristaniyên fermî yên desthilatî yekdestiyên sermaye û çekan û serweriya bîrdoziyê di nava hev de dane berdewamkirin, bîrdoziya şaristaniya demokratîk tim lewaz û bêsîstem maye. Ji alî desthialtiyan ve bi berdewamî hatine çewsandin, paşevajkirin (jirêderxistin) û bi pirranî hatine tunekirin. Gelek pirzan, zanist, felsefe, ol, zav/mezheb û hunermend, dema ku radest nebûne û guhdariya dengê wijdana azad kirine, cezayên herî giran li wan hatine barkirin û hatine bêdeng kirin. Nenivîsandina vê yekê, nayê wateya ku nîne. Yek ji erkên me yên serekî yên rewşenbîrî ye ku em sîstema şaristaniya demokratîk bigihînin derbirraneke sîstematîk a civaka-dîrokî.

Li hemberî sîstema şaristanî ya dewlet-netew, weke tevahiya yekdestiya bîrdozî, rêveberî, leşkerî, aborî û desthilatî, ya çarsed salên dawî yên sîstema kapîtalîst a cîhanê, sîstematîkekê şaristaniya demokratîk, tam yekparebûyî nebe jî, heye, ku pêwîst e neyê biçukdîtin, ku pêk tê ji tevgerên ku cî digirin di nava baweşîneke berfireh de ku dirêj dibin hey demokrasiya bajaran (li Îtalya) û konfederasyonan (li Almanya); serhildan û komunên gundiyan, her wisa serhildan û komunên karkeran (Komuna Parîsê); ceribandinên sosyalîzma pêkhatî (li yek ji sisê yê cîhanê); pêvajoyên rizgariya netewî (awayên wan ên ne dewlet û desthilatî); gelek partiyên demokratîk; civakên sivil; herî dawî tevgerên ekolojîk û femînîst; tevahî tevgerên demokratîk ên ciwantî; festîvalên hunerê û tevgerên nû yên olî, ku armanca wan ne desthilatî ye.

**10-** Her çend sîstematîka dewlet-netewên roja me ya îro pirsgirêkên giran dijî û qelşên wê her roj zêde dibin, lê hîn jî di qadên herêmî, netevî û kûrewî (global) de xwedî sîstematîka herî xurt e. Li hemberî dewlet-netewan (hejmara wan dusedî derbas dike), ku nûneriya wan bi yekîneyên herêmî (di serî de Yekîtiya Ewrûpa, DYE- Kanada-Meksîka û Asyaya Rojhilatê Başûr) û kûrewî (Netewên Yekbûyî) tê kirin, yekîneyên cûrbecûr ên kedkaran û gelan, (ên sîstema şaristaniya demokratîk) ku ne dewlet û desthilatî ne, her wisa sist û bêform in, weke Forûma Civakî ya Cîhanê, pirr nebes in. Nebesî di bingeha bîrdozî û pêkhateyî de ye. Ji bo derbaskirina vê nebesiyê, divê Konfederalîzma Demokratîk a Cîhanê, her wisa konfederasyonên demokratîk ên navçeyî, herêmî û netewî û emrazên vana yên partî û civakên sivîl bêne pêşxistin.

### C- Pêşnûma Ji bo Dîroka Şaristaniya Demokratîk

Taybetmendiya herî bingehîn a xwezaya mirovê azad ew e ku dîroka xwe dibijêre û dizane bi dîroka xwe re bijî. Dîrok şîroveya heyînê û ya pêvajoya pêkhatî ye. Çiqas heyînên cewaz hebin, wê

ewqas jî dîrok hebin. Lê cewaziya dîrokî nayê wateya nebûna yekîtiya dîrokî. Cewazî, bêyî yekîtî, wate dernabirre. Cewazî girêdayî bi yekîtiyê dibin. A girîng ew e bê ka wê çi nûneriya yekîtiyê bike. Dema cûreya mirov dibe mijara gotinê, bê gûman şiyanên wê/î yên bikaranîna zeka û amûran, dikarin bêne kirin hîmên yekîtiyê. Ji ber, bêyî vana, di navbera wan de ti cewazî tine ye. Carna dewlet, yekcarna demokrasî, her wisa rehendên exlaqî û polîtîk, şêweyên heşmendî û rewşa aborî dibin bingeh/hîmên cewaz ên yekîtiyê. Ya girîng ew e ku were tespîtkirin bê ka kîjan cewazî li ser bingeha kîjan yekîtî pêşdikevin.

Me weke yekîtiya bingehîn a şaristaniya demokratîk, civaka exlaqî û polîtîk esas girt. Ji bo bê têgihîştin, me hewl da em pênase û rêbaza wê destnîşan bikin. Niha jî em pêşnûmaya pêşketina wê ya dîrokî bi kurtasî bişêwînin:

**a-** Em dizanin ku nêzîkî ji sedî 98 ê jiyana xwezaya civakî, bi awayê yekeyên 25-30 kesî, ku em ji wan re dibêjin civaka klan, berdevam kiriye û hatiye. Em dikarin klan weke şanika kok a civakê pênase bikin. Civaka klan jiyana xwe di tevahiya civakên malbat qebîle, eşîret, gel û netew de, bi şêweya dirûvê cewazbûna şanikek, hîn jî dide berdewamkirin. Klan, dixwazî di awayê zimanê nîşanî, dixwazî di yê zimanê hêmayî de be, li gorî pênaseya me ya bingehîn a li ser xwezaya civakî, civakekê exlaqî û polîtîk e. Elbet, di klan de exlaq û polîtîkayek pirr ji rêzê (basît) heye. Lê, ya girîng ew e ku heye. Basîtî, girîngiyê ji holê ranake. Berevajî, girîngiya girîngiyê îspat dike. Heta dikare bê gotin ku exlaq derbirrana/îfadeya xwe ya herî xurt di civaka klan de dijî. Hema bêje, di rola derbirrana/îfadeya navajoyî de ye. Jiyîn li gorî wî [exlaq], mercê heyînê yê ‘nebe nabe’ye. Klana ku exlaqê xwe winda kiribe, klana belavbûyî, jihevketî û tunebûyî ye. Derbirrana/îfadeya wê ya bi rêsayên jirêzê, dikare ancax bi jiyanîbûna wî ve bê şîrovekirin. Ji bo berawir (muqayese) kirinê, dikare bê gotin ku her çend rêsayên huqûqê di roja me ya îro de pirrî caran têne binpêkirin, lê dîsa jî tiştek bi civakê nabe. Belkî jî vê binpêkirinê, ji ber kevneperestiya huqûqê, dibe ku tew rolekê erênî jî bilîze. Lê di klan de xirabûna rêsayê, dawî li komcivakê tîne.

Mirov dikare ji bo polîtîkayê jî heman taybetmendiyê diyar bike. Du karên pirr basît ên klan hene, weke komkerî û nêçîrvanî. Bê gûman hemû endamên klan, li ser komkerî û nêçîrvaniyê, ku rola jiyanî ji bo wan dilîzin, belkî jî hezar carî gotûbêj kirine, bi hev şêwirîne, danûstendina ceribandinê kirine, hin endamên xwe erkdar kirine û bi vî rengî hewl dane polîtîkayên xwe yên komkerî û nêçîrvaniyê bi şêweya herî baş û berdar çêbikin û wana pêk bînin. Nexwe wê jiyan nekarîbûya gengaz bûbûya. Polîtîkaya bingehîn bû ka wê çi bihata komkirin û xwarin; anku karê hevpar bû (polîtîka weke karê hevpar tê pênasekirin). Wê demê civaka klan pirr basît bû, lê komcivakek jiyanî ya polîtîk bû. Eger tenê rojek jî polîtîka nekira, dimir. Ji ber vê sedemê, polîtîka xwedî sazbariyeke jiyanî ya tevnê ye. Belkî jî hemû taybetmendiyên wê yên din didirûviya (dişibiya) prîmatên dîtir (lawirên nêzî mirov). Yekane cewaziya wan a girîng ew bû ku tevna ji rêzê ya exlaqî û polîtîk pêşxistibûn. Tew amûr jî, tenê dema ku polîtîka hebe, dikevin dewrê. Tew pêşxistina ziman jî, ancax li ser bingeheke exlaqî û polîtîk, gengaz dibe. Divê em qet jibîr nekin ku hêmanên ku pêdiviya axaftinê bilez dikin, gotûbêj û biryarên li ser kirina kar in. Li vê derê ji bo min bêwate ye ku mirov bêje “pêdiviya xwe xwedîkirinê, di bingeha exlaq û polîtîka de heye”. Bê gûman pêdiviya amîpên yek-şanikî jî bi xwe xwedîkirinê heye. Lê em nikarin qala exlaq û polîtîkaya amîpan bikin. Cewaziya mirov ji amîpan ew taybetmendiya wî/ê ye ku pêdiviya xwe ya xwe xwedîkirinê, bi nêzîkatiyên cewaz ên exlaqî û polîtîk bi berdewamî pêş dixe. Di vê wateyê de, ew derbirrana/îfadeya “Aborî her tiştî destnîşan dike” ya di doktrîna Marksîst de zêde vebêjer nîne. Ya

girîng ew e bê ka aborî çawa tê destnîşankirin. Ev rewş di cûreya mirov de tevna exlaqî û polîtîk û qada civakî pêwîst dike.

Em dikarin civaka klan, ji ber vê taybetmendiya wê ya bingehîn, bidin rûniştin li goşeyê sereke û destpêkê yê dîroka sîstema şaristaniya demokratîk. Dîroka sîstemê, bi vî milê xwe ve, tê kirin xwediyê beşa ji sedî 98 ê temenê mirovatiyê. Bi ser de, klan hebûna xwe, mîna ku me diyar kir, hîn jî di malbat, eşîret, gel, netew, komcivakên navnetewî, heta di komcivakên ser-netewan de, weke şanika serekîn, dide berdewamkirin.

Civakên mezolîtîk (serdema navber a nêzîkî 15000-12000 B.Z..) û neolîtîk (12000 B.Z. heya roja îro), ku di sîstema Toros û Zagrosê de, bi helîna qeşaya serdema çaremîn nêzîkî bîst hezar sal berî niha, bi awayên xwe yên herî biheybet çêbûn, ji civaka klan pêşketîtir bûn. Amûr û pergalên nîştecîbûnê yên di destên wan de pêş ketibûn. Ji xwe yekemîn şoreşa çandinî û gund di vê pêvajoyê de çêbû. Digel ku sîstema Zagros û Toros serekîn e, çêbûnên (pêkhateyên) dirûv ên civakî di gelek cî û warên Afro-Avrasya jî jî, ku komcivakên mirovan lê dijiyan, destpêdikin (şîroveya min ew e ku ev pêşketin bi belavbûna civaka neolîtîk a Zagros û Torosê re pêk hatiye). Ev serdem di dîroka xwezaya civakî de serdemeke biheybet e. Gelek pêşketin, ji çêbûna şêweyên serekî yên zimanê hêmayî, ku hîn jî têne bikaranîn, heya şoreşa çandinî (danîn/çinîn û hilanîna bizanebûn a tovan û kedîkirina lawiran); ji çêbûna gundan heya binekoka bazirganiyê; her wisa ji malbata dayîkane heya rêxistingeriya qebîle û eşîretan, rastî vê qonaxa dîrokî tên. Bê gûman, bibîranîna vê heyamê bi navê Heyn/Serdema Kevirên Nû, nîşana hebûna amûrên pêşketî yên kevirîn e. Her wisa vebûna zekaya mirov jî biheybet e. Hatine nûvedan/îcadkirin hema hema tevahiya hîmên bikaranîna amûr û pêwîstiyên ku mora xwe heya li roja îro dane. Duyemîn serdema dirêj a dîrokê ye. Yek ê ji sedî dido yê mayî, xwemalî (aydê) vê demê ye. Civak dîsa di bingeh de civaka exlaqî û polîtîk e. Hîn huqûq û dewlet tine ne. Desthilatî nayê naskirin. Pîrozî li dayîkê tê arastekirin û sembola xwedavenda jin, tê hilkirin. Derbasî serdema pîroz a perestgeh û mezelan bûne. Ewqas dîrokî dijiyan bi qasî ku bi miriyên xwe re li heman cî û waran di nava hev de dijîn. Jêmayî hîn jî vê rastiyê hema hema dixin hundirê çavên me. Em bi mirovên rastîn û rasteqîn re, ne bi yên hoveber re, rûbirû ne.

Mirov dikare duyemîn serdema serekî ya dîroka şaristaniya demokratîk bi vî rengî bişêwîne. Ev serdem bi nirxên xwerû yên şaristaniya demokratîk tê nimandin/temsîlkirin. Civaka exlaqî û polîtîk, bi pêşketina ziman û aqilê hêmayî ve, demokrasiyê di wergiriya gund û qebîle de bi şêweyeke herî biheybet jiyaye; dibe ku vê yekê ji alî hin [xwedî] ramanan ve were lomandin. Lê, rastî wisa ye. Heyameke wisa ye ku ya exlaqî û polîtîk e, demokrasiya herî xwerû ye. Dema derfetên berhema zêdemayî zêde dibin, wê ev rewş bibûya sedema zordestî û mêtinên sîstematîk li ser civakê yên hêzên xerarşîk pêşî û hêzên şaristanî yên bi navenda bajêr, paşê.

**b-** Vegotinên (her cûre vegotinên mîtolojî, olî û zanistî) li ser şaristaniyê, ku ji wan re tê gotin dîroka nivîskî, dîrokê bi fermana afirîner didin destpêkirin. Dîroka qala wê tê kirin, dîroka nêzîkê pênc hezar salên dawî ye. Dema ez analîza sosyolojîk kûr dikim û bi nêzîkatiyên dirûv xurt dikim, ez dikarim diyar bikim ku jêderka bîrdozî ya van pêşnûmayên li ser dîrokê, misoger xwe dispêre homandin/pîrozkirina zordestî û mêtinê. Karê ku tê kirin, polîtîk-ekonomiya qaşo zanistî ya îroyîn jî tê de, ew e ku bîrdoziyekê sazbûyî bê pêşxistin li ser nirxabermayî, ku civak, bi wesfa xwe ya kedê ku pêş dikeve, vêya bidest dixe; heta li ser nirxên civakê yên jiyanê. Tê têgihîştin ku, ji bo veşartina rastiyê, hewl û zora pirr mezin tê bikaranîn. Avabûnên bajêr-çîn-dewlet, di heman demê de

serdema avabûnên mezin ên bîrdozî ne. Erkên wan ên bingehîn ew in ku afirîşê, anku çêbûnê bi rengekî cewaz nîşan bidin û weke serkeftina keşîş, zilamê bihêz û rêveber, di nava hemaya/sembola xwedatiyê de, biteyisînin.

Şaristaniya demokratîk, divê berî her tiştî van perdekirin û barajkirinên bîrdozî derbas bike. Ancax wê demê em ê karibin baştir têbigihîşin, ne tenê civaka çandinî û gund û pêkhateyên qebîle û eşîretan, lê di heman demê de bajêr-çîn-dewletê, desthilatiya xerarşîk, ku berê hatiye damezrandin û her berdewam e, û yekemîn mêtingehbûna jinê. Guherana paradîgmayê, wê vê hêza wate pirr pêş bixe.

Bê gûman şaristaniya demokratîk, li derveyî komcivakên yekdestîperest ên sermaye yên bi awayê şebekeya şaristaniya ku weke sêmendiya bajêr-çîn-dewlet cewaz bûye, tevî ku bi wan re binakok e, bi awayê qonaxeke nû berdewam dike.

Di navbera bajêr û çolter de nakokî çêbûne. Lê meyla bajêr û çolter a temamkirina hevdu, zêdetir li pêş e. Di gel ku nîçikên (berdewamiyên) şaristaniya demokratîk ên bajêr (kole, zenaetkar û jin) hene, nîçikên bajêr ên çolterê jî hene. Bi taybetî pêkhateyên xerarşîk ku bihêz bûne, hevxebatkarên rêveberiya bajêr-dewlet ên li çolterê ne. Nakokî û pevçûn di rastî de di navbera van herdu blokên civakî de, ku berjewendiyên wan ên daringî (madî) cewaz bûne, pêk tên. Tê çavnêrîkirin bi rengekî kûr ku pevçûnên dijwar ên bîrdozî, leşkerî û rêveberî hene di navbera şaristaniya demokratîk, ku hêzên civaka komunal, exlaqî û polîtîk derdibirre, û şaristaniya biyekdestiyên sermaye û dewlet de, ku ava bûye li ser karkeriya koleyan li bajêr, û talan û xenîmetên qebîle û gundan li çolterê. Wekî din, şerên berdewamî yên rahêştina parê, di navbera rêveberiyên bajaran bi xwe de jî, hene. Girî û newa yên li ser bajêr ên di destanên Sumer de, bi mirov didin hîskirin bê ka pevçûn çiqas bi dijwarî derbas bûne. Mirov dikare diyar bike ku pêkhateyên qebîle û eşîretan di rêjeya mezin de di bin êrîşên şaristanî yên ji koka bajêr de şêwe girtine. Pêkhateyên etnîkî, ku di salên 4000-3000 B.Z. de mirov dibe şahidê hebûna wan, reng e berhema vê heyamê bin. Em dizanin ku Sumerî û Misirî nav li vana danîne. Dema ku Sumerî digotin Ûryan û Aryen (yên ji koka gir, çiya, ax û cotkarî) ji yên li bakûr û rojhilatê bakûrê re û Amorît (yên ji koka Semîtîk û pêş-Erebên nebûbûn Sumer), her wisa digotin Gûtî û Kassît ji yên li rojavayê xwe re; Misirî digotin Apîrû (mirovên bitoz ên ji çolê tên) ji yên ji Çola Sîna dihatin re. Tê pejirandin ku navê 'Îbranî' ji 'Apîrû' piraştiye (peyda bûye). Lêkirina bedenan li derdora bajar û bircan, delil e ku hebûna civaka hember bi awayê herî baş diyar dike.

Ji dijwariya pevçûnan bi têra xwe baş tê têgihîştin ku civak, şaristaniya bi bingeha çînê wisa bi hêsanî nepejirandiye. Tê şopandin ku carna gund, heta navêndên şaristaniyê, bi temamî têne şewitandin (qeydên Arkeolojîk di vê mijarê de gelek nimûneyan didin). Mezopotamya tijî ye bi navendên niştecihî yên girikên pir-qatî (tebeqeyî), ku bi caran hatine şewitandin. Mîtolojî û wêje yên ji vê heyamê mane, bi giranî van rastiyan diteyisînin. Hesîodos versiyoneke dirûv çêkiriye û bi vî rengî panteona xwedayî ya Sumer, veguherandiye panteona Olîmpos. Di tevahiya kevneşopa destanên wê demê de diyar dibe ku şer, di kesayetiya qralan de şerê xwedayan e. Wekheviya xweda û qralan pirr berbiçav e. Navên Fîrewn û Nemrûd derbirranên nimûne yên kartêker ên vê wekheviyê ne. Dema yên ku ji şeran tê payîn, talankirina aboriya civakên gundan û dîlgirtina wan e, li hemberî qebîleyan jî seferên dirûv mijara gotinê ne: dîl û têkber(eşya)ên xenîmetê. Şaristanî, bi ser de, ji bo xwe weke deriyê bingehîn ê qezencê dihesibandin ku hevdu jî talan bikin û dîl bigirin. Pêkhateyên

lihevhatin û dijberî, yên spartî bi berjewendiya daringî/madî, heya roja me ya îro berdewam kirine. Her tişt li ser bingeha hesabê “Kî mezintir e?” bû. Pirr eşkere ye ku yekîtiya xwedayê li ezman di bingeh de, weke awayê hêmayî yê qraltiya herî mezin a li rûyê erdê tê sêwirîn (tesawirkirin). Xwe binavkirina Siltanên Osmanî jî weke ‘zîlûllah’(siya xwedê ya li rûyê erde), vê rastiyê îspat dike.

Wê kêmasiyeke mezin be ku nakokiya bingehîna di vê dema dîrokî de weke bibingeha teng a çînî were pêşkêşkirin. Tê çavnêrîkirin ku mirovên ji çîna kole, weke qerwaş/xizmetkarên herî pindirî (sernerm) yên perestgehê û efendiyên xwe, heta weke nîçikên bedenên wan, tevdigerin. Yên şer dikin gundî û komcivakên eşîret û qebîleyan in, ku kolebûnê red dikin. Wekî din, şerên yekdestiyan ên rahêştina para ji bo xwe, timî têne jiyîn. Tê dîtin ku têkoşîna serwerî di navbera şaristaniyên Hîtît, Hûrî-Mîtanî û Misir de, ber bi salên 1500 B.Z. destpê dike. Salên 1500 B.Z, ew serdem e ku têde şaristaniya navendî, cara yekê, li Rojhilata Navîn çêdibe. Heyama 1500-1200 B.Z, yekemîn nûmûneyên biheybet ên dîrokê yên hemberiya pêşbirkbaz a di navbera pirraniya bajaran de û hilhatina bo serwerîperestiyê, pêşkêş dike. Ev serdem, heyameke pirr bi liv û tevger û biheybet a dîrokê, tê hesibandin. Her wisa civakên qebîle, eşîret û gundan jî pêşketinên xwe didomînin. Bazirganî, yekem car ewqas girîngî wergirtiye bi qasî ku li dora wê împaratorî têne avakirin. Asûr û Fenîke hêzên xwe di bingeh de ji yekdestiyên bazirganiyê digirtin. Di salên 1500 B.Z. de, dema şaristaniyên Çîn û Hîndê gavên xwe yên pêşîn diavêtin, tevahiya Ewrûpa û beşên din ên Asya, Efrîka û Emerîka, hîn di wê rewşê de bûn ku nasdariya xwe bi neolîtîkê re çêdikirin û pê re dijiyan. Du heyamên di dîrokê de ku ez herî zêde meraq dikim; neolîtîk, anku civaka çandinî û gund a salên 6000-4000 B.Z. û jiyan û civaka bajêr a salên 1500-1200 B.Z. ne. Tempoya van heyaman û resenî û afirîneriya vegotinên destani, pirr balkêş in. Ez bawer dikim ku têgînkirinên destanî yên lehengî û xwedatî, bi giranî ji van heyaman mane.

Nirxandinên min ku min pirrî caran li ser heyamên belavbûn û pêşveçûna di warên dem û cî yên şaristaniyan de kiriye, ez dikarim wan bi kurtekirinekê, wisa derbibirrim:

**1-** Civaka çandinî û gund ku, piştî civakek biheybet a nêçîrvan û komker di salên 15000-12000 B.Z. de (perestgeha Kevirê Çikilandî ya li Rihayê di wesfa vebêjer a vê pêvajoyê de ye), destpê kir li qadên ku sîstema Zagros û Toros, ku Dîcle û Ferat jê xwedî dibin, bi deştan re dibe yek û xwedî cûreyên per zengîn ên nebat û lawiran e, heya salên 6000 B.Z, di qonaxa çarlepk û derbase ya tam a niştecihiyê de ye. Civaka çandinî û gund a di navbera salên 6000-4000 B.Z, heyama xwe ya herî afirîner dijî. Ji salên 5000 B.Z. û pê ve, xwe li her aliyan belav dike. Pirr hindik koçber û bi pirranî xwe belavkirina çandî mijara gotinê ye. Çanda El-Ûbeyd, ku di heyama 5000-4000 B.Z. de li derdora çandiniya avî li Mezopotamyaya Jêrîn dest bi hilhatinê dike, ewqas xurt bûye bi qasî ku li ser Mezopotamyaya Bakûr dest bi siyaseteke dijber a mêtingeriyê dike. Jêmayiyên arkeolojîk hene ku dibin şahidên vê belavbûna çandî ya mêtinger a di salên 4000 B.Z. de li Mezopotamyaya Jorîn. Lê çanda cewherîn a herêmê hîn jî taybetmendiya xwe ya serekîn diparêze (diparêze). Çaxa Ûrûkê di heyama 4000-3000 B.Z. de hiltê. Nûneriya zayîna bajêr dike. Destana Girgamêş, wê pêşketina bi vî rengî dike mijara xwe. Belavbûneke dirûv, ber bi bakûr ve pêk tîne. Ev herdu heyam, diyar e bi rêya berdarkirina raçandin [xav û cav, bestir, tekstil, pot û pertal, pirtû, caw, pertal], her wisa dîzik û xilik [çêkirî ji herriyê ji bo derdanên cûrbecûr] û hilberîna çandiniyê, raseriya pêngavê bidest xistine. Heyama 3000-2000 B.Z, heyama klasîk a Xanedaniyên Ûr e. Taybetmendiya wê ya veqetîner pirrbûna bajaran û pevçûnên di navbera wan de yên dijwar û berdewamî yên li ser parvekirinê bû. Mirov dikare ji vana re bêje şerên ji nû ve parvekirinê jî, yên yekemîn yekdestîperestan.

**2-** Mirov dikare bihizire ku serdema neolîtîk a bi navenda Mezopotamya, ber bi Çînê, Hîndê, hemûyê Ewrûpa û bakûr û rojhilatê Efrîka ve, li derdora salên 4000 B.Z, pêngav davêje. Heyama 4000-2000 B.Z, ew heyam bû ku civaka neolîtîk li van qadan bi têra xwe bi cî dibe. Mirov temaşe dike ku komcivakên neolîtîk ên Ewrûpa û Kafkasya, ku bihêz dibin, pêleke berevaj piştî salên 2000 B.Z. pêk anîne. Herikîna bi awayê pêlan, ji Anatolya heya Hindîstanê, ya êrîş û koçberiyên yekemîn binemalên mezin ên qebîleyên mirovên bakûr en kej û çavşîn, pêvajoyeke girîng a serûbinbûyîna dîrokî ye. Êrîş xwe dirêjî heya navêndên Mezopotamya û yên şaristaniya Misirê kirine. Wekî din, hem qebîleyên Erebîstanê, ku koka wan Semîtîk e, û hem qebîleyên çiyayî yên Aryen jî, di navbera salên 4000-2000 B.Z. de, bi awayê pêlan êrîş birine ser navendên şaristaniyê.

Di van tevgerên belavbûnê yên yekemîn mêtingerî (kolonyalîzm) û dij-mêtingerî (anti-kolonyalîzm) yên dîrokê de, di herdu cûreyên şaristaniyê de jî pêşketin têne jiyîn. Dema ku beşên xerarşîk ên qebîleyan dikevin nava pêvajoya dewletbûnê, gelek endamên qebîleyan têne tevlîkirin nava çîna koleyan. Di nava refên qebîle û eşîretan de veqetîn têne jiyîn. Li milekî, şaristaniyên nû yên bajêr diperijin (peyde dibin); li milê din, rêxistingerî û piştgiriyên qebîle û eşîretan xurt dibin.

**3-** Dema ku heyamên klasîk ên Sumer û Misir di salên 2000-1500 B.Z. de bi dawî dibin; serdemeke wisa mijara gotinê ye ku di heyamên Babîl, Asûr; Hûrî-Mîtannî-Hîtît û Xanedaniya Nû ya Misirê de di navbera şaristaniyan de têkilî û nakokî pirr kûr dibin. Yekem car serdema şaristaniya serwer a navendî destpê kiriye. Heyameke cewaz a kûrewîbûnê mijara gotinê ye. Binemalên qebîleyên bakûr û qebîleyên çol û çiya yên Rojhilata Navîn jî, ku teknîk û xûyên din ku ji şaristaniyê digirin li hemberî navendên şaristaniyê bikartînin, êrîşên xwe bênavber didomînin. Dema ku di teknolojiya biçekbûnê de hesin dikeve şûna tûnc, wê vê yekê rê li ber gelek pêşketinên nû veke. Wê yekêmîn car gerîna li kan(maden)an û bazirganiya wan, girîngiyeke mezin wergirin. Di çêkirina qele û bedenan de, zêdebûneke mezin heye. Yekemîn nimûneyên biheybet ên qeleyan, berhemên vê serdemê ne. Rola bazirganî jî digihîje lûtkeyê. Hilhatina mezin a Asûr û Fenîke, berhema yekdestiyên bazirganî ye. Şaristanî, di bin êrîşên qebîleyên şervan ên Îskît û Doran ji bakûr ve û yên Aramiyan ji başûr ve, di navbera salên 1500-1200 B.Z. de derbeyeke mezin dixwe. Heyama navbera salên 1200-800 B.Z, bêhtir, heyama paşketinê ye. Yekane hêza ku li ser piyan dimîne, Împaratoriya Asûr e.

**4-** Grek-Roma, weke şaristaniya mezin a dawî ya çaxa klasîk a çaxa destpêkê, weke ku tevahiya mîrasên sîstemên herdu şaristaniyan (Mezopotamya û Misir), heya serdemên xwe, hezm kiribin. Ev pêvajoya şaristanî, ku heyama navbera salên 1000 B.Z-500 P.Z digire nava xwe, belavbûna xwe li ser Asya, Efrîka û Ewrûpa domandiye, wekî din li hundir çaxekê klasîk ava kiriye û bi vî rengî tevkariya xwe kiriye. Dema ku çaxa mîtolojîk girîngiya xwe wenda kiriye, derketinên nû yên resen ên pêşketina olî, felsefî û heta zanistî hatine jiyîn. Împaratoriya Roma, ji ber berxwedan û êrîşên partiya Xirîstyanî ya hejaran ji hundir ve û yên qebîle û qewmên, ku ji çar aliyan ve diherikin, ji der ve; anku di bin derbeyên hêzên şaristaniya demokratîk de, serdema xwe û tevahiya çaxa destpêkê bi xwe re girtiye.

**c-** Ya ku di hêla şaristaniyan de di nava pêvajoya dîrokê de, şûngeh/pozisyona wê herî zêde zoriyê pêktîne, kevneşopa olên Îbrahîmî ye. Hîn jî gengeşeyî ye bê ka wê li şaristaniyêke çawa bêne rûniştandin, weke sê olên bingehîn. Ez van kevneşopan, ku min hewl da di bingeha tehlîlên xwe yên li ser şaristaniyê de li ser wan pirr kûr bibim, weke tevgereke kevneşopî ya lihevhêner û eklektik

(heman weke tevgerên demokrat ên civakî yên roja me ya îro), pênase dikim ku hewl dide di navbera herdu hêzên bingehîn ên şaristaniyê de rêyekê navîn diyar bike. Herçend weke hêmayî, ez jê re dibêjim tevgerek ku di bin serokatiya qebîleya Îbranî de tê rêvebirin, wê zêdetir li cî be ku, bêhtir ji wateya nijadî, weke tevgerek ku aliyê wê yê bîrdozî xurt e, were nirxandin. Di gel ku di dîmen de weke tevgerekê qebîleyî tê pêşkêşkirin, di cewher de nirxandineke berwenda ya tevahiya şaristaniyên demokratîk û bidewlet ên ji jêderka Rojhilata Navîn, heye. Ne tevgereke tam çînî ye û ne jî tevgereke tam qebîleyî ye. Wekî din, ne tam bîrdozî ye û ne jî tam exlaqî û polîtîk e. Ji her hêlê ve berwenda ye. Vê taybetmendiya xwe, ji dema derketina Hz. Îbrahîm (salên 1700 B.Z; mirov dikare bispêre heya şaristaniyên Sumer û Misir, eger em heya Hewa û Adem bibin), heya şopên xwe yên roja me ya îro tim parastiye (parastiye). Lê, hertim hem îlham daye herdu şaristaniyan û hem jî hêzên xwe (ez qala hêzên wê yên daringî (madî) û arişî (manewî) dikim), ji mîrasa wan qurmiçandiye. Lewre, bi rêya qezenckirina hem dostaniya wan, hem jî dijminahiya wan, rê li ber pêşketinên dîrokî vekiriye.

Dikare Olên Îbrahîmî, ku roleke wisa digirin ser xwe ku çaxa mîtolojîk a vegotinên li ser şaristaniyê digirin û pêşengî ji çaxa olî re dikin, di bin paradîgmaya me ya nû de, bêhtir bêne kirin têgihîner. Vegotina herî berbiçav a li ser çaxa mîtolojîk, vegotina qralê xweda ye. Pêwîst e neyê jibîrkirin ku zimanê vegotinê yê çaxên destpêkê, bi mitolojiyê barkirî ye. Hewldaneke tewş e ku mirov weke îro li rasyonalîteyê bigere. Hemû têkber, diyarde û bûyer, bi zimanê mîtolojîk têne vegotin. Mîtolojiya Çaxa Sumer, ku di bin bandora kûr a anîmîzm (baweriya avabûyî li ser zindîtiya xwezayê) de çêbû, zindîtiya xwezayê (mirov dikare jê re bêje ‘ola klanan’) hinekî veguherand û bi vî rengî yekem car berê xwe da çêkirina veqetîneke bi şêweya ‘xwezaya xwedayî û ne-xwedayî’. Keşîşên Sumer, ku hemû hêza (naveroka) xwe ji civaka neolîtîk a Mezopotamya Jorîn girtin, di şûna vegotina xwedavenda dayîk de, giranî dan mîtolojiya xweda yê bav-zilam. Em di derketina biheybet a Enkî de, rastî teyisîna bîrdoziya nû ya mîtolojîk (pêşî pergala xerarşîk a bi giraniya zilam; paşê, li pey hev û bi hev re otorîteya bi awayê dewletê) a veguherîna mezin a daringî (madî) ya di nava civakê de, tên. Têkoşîna di navbera Înana (koka xwe ji Star-Îştar, Xwedavenda Dayîk a Mezopotamya Jorîn, digire), Xwedavenda Ûrûk û Enkî (yekemîn xwedayê zilam ê bajêr), Xwedayê Erîdû de, di vê mijarê de pirr kartêker e. Enkî şorind (waez) dide Înana, ku hewl dide îspat bike bê ka çima tevahiya mafên xwedayî xwemaliyên (aydê) xwedavenda dayik in, (îdea dike ku 104 Me’yên navdar her wisa not û neh dilpakî (fezîlet), şiyan, nûvedan (îcad) û huner, afirana jinê ne) ku vê yekê girîngiya xwe hunda kiriye û weke delîlê/a pindirîtî (sernermî)ya xwe, guhdariya bavê xwe bike (dema xwe weke bav-zilam-xweda ilan kiriye, Înanayê, xwedavenda berê ya jin, êdî xistiye nava rewşa qîza xwe û jina xwe). Çiqasî jî didirûve (dişibe) tevahiya şorind (waez)ên roja me ya îro, yên sekular, laîk, olî û zanistperest! Ez bi xwe di wê baweriyê de me ku yekemîn xwedayê van hemû beşan Enkî ye. Enkî resen e û yên din versiyon in (kopya ne). Bi taybetî, dema ku xwedayên Olîmpos di rêza sêyemîn û çaremîn de cî digirin, bi xwedayên Roma re, vegotina bi şêwaza mîtolojîk ditemire.

Weke tê zanîn, li gorî çîroka ku tê kirin malê Hz. Îbrahîm, ji ber pûtên xwedayan ku li Panteona Nemrûd a li Rihayê ye, dişkîne, tê avêtin nava agir, paşê li ciyê agir, bi mucîzeya xwedayî, gola pîroz çêdibe; her wisa dema ku derfetên stirînê dijwar dibin, ber bi diyarên Kenan ve koçberî (hicret) dike. Diyar e bûyereke kevneşopî (tîpîk) ya penaberiyê hatiye jiyîn. Dîsa, diyar e Îbrahîm, ku serokê navçeyî yê qebîleyekê ye, bi Nemrûd re, ku rêveberê bajêr e, ketiye nava

dubendî(hevrikî)yê. Eşkere ye ku dubendî di mijara mal, mulk û bazirganî de ye. Di wê demê de, di navbera şaristaniyên Babîl û Misirê de, yekem car, serdemekê hem hemberî, hem jî danûstandineke zindî ya bazirganî destpê kiriye. Berjewendiyên kevneşopî yên bi hezarên weke Îbrahîm, ji ber vê hemberiyê, derbe dixwin. Bingeha daringî ya penavberiyê ev e. Diyarên Kenan, di navbera herdu şaristaniyan de, weke rêjeyî, di rewşa nîv-serbixwe de ye. Di dema ku serwerî li ser wî lêhûrbûna xwe zêde dike, dest bi koçberiyê, anku hîcretê dike. Diyar e bûyer, veguherandina bi hezaran koçberiyên dirûv bo vegotineke hevbeş a bi zimanê wê demê, nîşane dike. Hemû nîşander, nakokî û pevçûnên qebîle û mîrîtiyên navçeyî yên li ciyê navber û navîn in, ku berjewendiyên wan dihejin di serdemên Nemrûd û Fîrewn de, ku navên qral ê xweda yên serdema herdu şaristaniyên mezin (Babîl û Xanedaniya Nû ya Misir) in, ên li hemberî vana, dikin çîrok. Hem xwe pêşkêşkirina Nemrûdan û Fîrewnan weke xweda, red dikin û hem nûneriya wan a pûtan jî, dema keysa wan lê bê, dişkînin û bi vî rengî wan şermezar dikin. Puxteya gotinê (bi kurtasî), pevçûna li ser berjewendiya daringî weke têkoşîna bîrdozî diteyise.

Ne wisa hêsan e ku mirov têbikoşe li dijî bîrdoziyeke herî kêm sê hezar salî ya qral ê xweda; wêrekî û şiyaniyeke mezin jê re tê xwestin. Vegotina mûcîzewî ya çalakiya Îbrahîm a berxwedanê ya li Rihayê, girîngiya xwe ji vê rastiyê digire. Yekem car, bende (evd) li hemberî xweda derdikevin. Ev e ew bûyera mûcîzewî ya bêhempa. Hem çalakiya daringî, anku şikandina pûtan heye, hem jî lêgerînên nû yên bîrdozî mijara gotinê ne. Gotûbêjeke mezin e bê ka wê xwedayê nû li ku derê û çawa bibîne (bidoze), di wateyekê de bê ka wê sêwiran (tesawir)ên xwe yên bîrdozî yên ramanî çawa çêbike. Ev gotûbêjeke wisa ye ku bi sedan salan berdewam dike. Îbrahîm, ji dengê ku best (îlham) dide wî re, yekem car bi gotina “Wa hewe” (Yahweh) –Ev ew e-, di wê îdeayê de ye ku xwedayê xwe dîtiye. Peyv didirûve (dişibe) koka Aryen. Wê demê, qebîleyên Aryenî li Rihayê bêhtir di pirraniyê de ne û înîsiyatîv di destên wan de ye. Pêwendiya Îbrahîm bi van qebîleyan re hîn jî tê niqaşkirin. Şîmaneyêke (îhtîmaleke) xurt e ku gotibe “Wa hewe” û ji vir derbasî ‘Yehova’ bûbe. Yehova, yekemîn xwedayê Îbrahîm e; şîmaneyêke mezin e ku ji koka çandî ya Aryen be. Tê zanîn ku piştî derbasî diyarên Kenan dibe, pirr bi şûndetir, veguherîn tê kirin bo xwedaperestiya ‘El, Ûla û Allah’.

‘El’, ji koka Semîtîk e; di hawîra bêserûbin a çolê de, taybetmendî û bêrî/kesera dirûvî û yekîtiya yeknesakî (monotonî) ya qebîleyê diteyisîne. Duyemîn best (îlham)a mezin di Mûsa de, wê bi ‘Deh Fermanan’derbirrana/îfadeya xwe bibîne. Hevdîtina xwedayî ya li Çiyayê Sîna di rastî de li beramberî pirsgirêkên pirr giranbûyî yên qebîleya ku Mûsa serokê wê ye, lêgerîna wê [ya çareseriyê] derdibirre. Eger em li ber çavan bigirin ku ‘Deh Ferman’ rêsayên kevneşopî ne, ku qebîleyê rêkûpêk dikin, em ê karibin tehlîlê zêdetir pêş bixin. Kevneşop, wê di Îsa de jî bê nûkirin. Hz. Miheme, wê hevdîtineke bi heman cûreyî, di dorhêla Meke de (li Çiyayê Hîra, ciyê ku yekemîn wahî ji xweda girtiye) pêk bîne. Di Pirtûkên Pîroz de tê qalkirin ku gelek pêxember, hevdîtinên dirûv pêk anîne. Eşkere ye ku em rûbirû ne bi vegotinên kevneşopî yên raman û çalakiyên rêber/rêzanên di qonaxên girîng ên serdeman de. Vegotin wisa ye. Derbirrana/îfadeya bi zimanê vegotina demê ya li ser diyarde û bûyerên xwezayî û civakî (Xwezayên Yekemîn û Duyemîn), ku ez jê re dibêjim metna pîroz û şêwaza pêxemberî, diteyisîne.

Em pirr bi hêsanî dikarin bêjin ku, di hêla mijara me de, qonaxeke dîrokî derdibirrrin:

**1-** Tê derketin li dijî şaristaniyên demê û dîrokê, ku bi du qraliyetên mezin ên xweda yên destpêkê têne rêvebirin. Yekemîn serhildana xwedayî ya bendeyan e.

**2-** Derbirraneke nû ya bîrdozî tê afirandin. Tê kirin bêje, ku qral ê xweda jî mirovên ji rêzê ne; xweda ne mirov e; afirînerê rastîn ê her tiştî Ew e (bêjeya navdar a "Ev Ew e", vê best/îlhama mezin derdibirre) û ancax Ew dikare bibe xweda û Reb (efendî).

**3-** Mirov dikare ancax stûyê xwe ji Wî re xwar bike û ne ji qral ê xweda re. Rêgezên sereke yên bîrdoziya nû bi vî rengî ne. Di bingeha kuliyat [rezeya hemû nivîsarên nivîskarek, tevgerek û hwd…] a tirsnak de, ku em jê re dibêjin ola Îbrahîmî, derbirranên ku di van her sê xalan de hatin kurtekirin, hene.

Dema ku tebeqeyên jorîn qîma xwe, bi xwe yekdestîkirinê nahînin û xwe dikin xweda bi xwe, beşên fireh ên civakê, piştî gelek ezmûnên dîrokî, herku diçe zêdetir li dijî wan dirdikevin û bi vî rengî pîrozî û xwedatiyeke nêzîktirî berjewendiyên xwe yên cewherîn, dikin bejê (derdixin pêş).

Pirr zêdetir girîng e ravekirina guherana ku di hêla civaka exlaqî û polîtîk de pêkhatiye. Civaka exlaqî û polîtîk derbeya mezin xwariye di civaka dîtir a qraliyeta-xwedayî de, ya du hezar salî (3500-1500 B.Z). Bi taybetî zal(hakîm)kirina xwedayên mezin ên mîtolojîk ê zilam, afirînerên erd û ezman û deryayan, ku cûdatiya bende û xweda (di cewher de çêbûna çîna kole-efendî) bi tundî derdibirrrin, li şûna 'xwedaperestiya xwezayê', ku pêwendiyên bêhtir jidil, bi xwezayê re bêcûdatî, wekhev û zindî, yên xwedavenda dayîk û tevahiya serdema klan û qebîle derdibirre, diteyisîne bi rengekî eşkere ku di qada bîrdozî de jî derbeya mezin hatiye xwarin. Veguherana mezin di çanda daringî/madî û arişî/manewî de mijara gotinê ye. Vebêjeyên mîtolojîk bi derbirranên vê tijî ne û hatine tijîkirin.

Eşkere ye ku li ser xwezaya civakî, şebekeyeke mezin a berjewendiya daringî û sêmendiya keşîş-qral-fermandar ku perdeya bîrdozî belave dikin, wê di vê dema dirêj a dîrokî de derbeya mezin li civaka exlaqî û polîtîk bixin. Dema em bi vê paradîgmayê lê binêrin, em ê karibin civaka heyama du hezar salî jî çêtir têbigihîjin. Têgînkirin karekî pirr zor e; keda mezin jê re divê. Paradîgmaya ku ji alî kevneşopa Îbrahîmî ve jî hatiye çêkirin, bê gûman dema serdema herî kêm du hezar salî ya Nemrûdan û Fîrewnan ji nû ve dike têgîn, derbasî vegotin(ol)eke bêhtir mirovî û hişwer (maqûl) dibe. Vegotina nû ya olî jî, elbet, metafizîk e. Xeylî (gelek) li dûrî û di cewaziya rasyonalîte û zanista civakî ya roja me ya îro de ye. Lê dîsa jî pêngaveke pirr girîng a dîrokî ye. Vegera tam bo civaka xurt a exlaqî û polîtîk a serdema berê, nikare were kirin mijara gotinê. Ji 'Deh Fermanan' jî gelek baş tê têgihîştin ku exlaq, bi tevahî weke ol, tê pêşkêşkirin. 'Deh Ferman' ên Mûsa, rêgezên dipdiyar ên exlaqî ne, ku bi navê olê hatine nuxaftin. Aliyên wan ên baweriyê, di rêza dûyêmîn de ne û lewaz in. Wate ku vê veguherana pirr girîng a di derbarê civaka exlaqî û polîtîk de, ew e ku di vê demê de ol hatiye xistin şûna exlaq. Jiyana berê û bêhtir xwerû ya exlaqî û polîtîk, bi feraseteke xwedayê ku her alî dorpêç dike, hatiye nuxaftin. Rûber/perdeyeke hîn pêşketî ya olî tê avêtin ser jiyanê.

Mijara bingehîn ku pêwîst e were jêpirsîn, ew e bê ka exlaqê û politikaya olîkirî, çiqas dijberên şaristaniyê (ya bidewlet-biçîn-bibajêr) ne, yan jî ew bi xwe şaristaniyêke nû pêk tînin an na. Di bingeha gotûbêjên li ser laîktî û şaristaniya Îslamî de, ku bi taybetî li Tirkiye û Rojhilata Navîn di

roja îro de têne berdewamkirin, vê paşeroja dîrokî heye. Dema em peresana ku olên Îbrahîmî heya roja me ya îro derbas kirine bînin ber çavan, gengaz e ku bersiveke du-alî were dayîn:

Meyla yekemîn ku teyisana xwe di tebeqeya jorîn de dibîne, hîn di heyamên xwe yên destpêkê de, weke beşek ku armanca wê ew bû ku rastiya desthilatî ya Nemrûd û Fîrewn di bin rûbereke nû de (weke qasidî, sîdarî û bervedarî ya xweda, şûna bûyîna xweda bi xwe) bidomîne, li pey avakirina qraltî û begitiyên herêmî de ye (heman weke beşa rastgir a demokratên civakî). Berdewamkirina Îbrahîm bi hev re hem serokatiya bazirganî û hem serokatiya qebîleyê, rewşa wî ronî dike. Ne zor e ku bê tespîtkirin ku di lêgerîna begitî û qraltî ya herêmî de ye. Naxwaze weke bendeyekî ji rêzê yê Nemrûd bimîne. Vêya hem di hêla olî, hem di hêla exlaqî û polîtîk de dijber e. Bi rêya xwespartina yên koka wan Îbranî ne (di wateya mirov û qebîleyên bitoz de ên ji Rojhilat tên), ku hejar in, di mercên nîv-koletiyê de dijîn, tam nebûne Misirî û taybetmendiyên xwe yên cewaz diparêzin (diparêzin) serî radike. Di encama hevdîtinên bi Fîrewn re, ku li gorî vegotina di Pirtûka Pîroz de pirr dijwar derbas dibin, bi ser dikeve ku ji Misirê veqete, yan jî bi dizîka koç (hicret) bike (derketina dirûv Hz. Miheme. Çîroka çil salî ya çolê bi damezrandina begitiyeke nû derbas dibe. Rêsayan pêş dixe. Li 'axên sozdayî', yên xeyala wan tê kirin, digere. Weke tê zanîn, ev utopya, ji alî pêxemberên Samûel, Dawid û Silêman ve li derdora salên 1000 B.Z. tê pêkanîn. Serokatiya rastîn a bîrdozî ji alî Samûelên keşîş ve tê kirin. Piştî salên 1000 B.Z. gelek begitî û qraltî yên dirûv çêdibin. Nimûneya dewlet-netewa piçûk a navbera herdu blokên mezin ên roja me ya îro tîne bîra mirov. Ev meylbi awayê nimûneyên dirûv bi taybetî li Emerîkaya Başûr û gelek deveran weke cewazbûyî di roja îro de jî didome.

Meyla duyemîn, meyla dij-şaristanî ya beşa bêhtir hejar û radîkal e. Tê derdixin (ferq dikin) ku şaristanîbûn rewşa wan zêdetir giran kiriye. Ev nakokî, tew di yekemîn Qraltiya Yehûda ya Îsraîl de, bi rengekî kûr hatiye jiyîn. Dijberiya tund a Samuelên Keşîş li hemberî serokên qralbûyî, beşên vê rastiyê diteyisîne. Rewş di derketina Îsa de bêhtir zelal dibe. Veqetîna çînî tew di nava qewmê Îbranî de di heyama wê de kûr bûye. Nûnerên tebeqeya jorîn, ku hevxebatkarên Roma ne, weke xwediyên Qraltiya Yahûdiye, Îsa bi kolandina binê xwe ve tewanbar dikin û bi vî rengî hem wî didin girtin (Yehûda Îskaryotê ku Îsa îxbar dike, Cihûyekî hevxebatkarê Roma ye. Hawariyê sêzdemîn bû), hem jî wî di çarmixê re didin derbaskirin. Walî yê nûnerê Roma, zêde pêdager (israrker) nîne ku Îsa di çarmixê re were derbaskirin; lê nûnerên Qraltiya Yehûda pirtir daxwaz dikin ku ew di çarmixê re were derbaskirin. Eşkere ye ku Îsa hatiye pejirandin weke hêmayê/sembola yekemîn partiya mezin a nav-qewmîgir, ku hejarên ne tenê qewma Îbranî, lê yên tevahiya qewmên (qewmên wê demê ku şaristaniyan ava kiribûn, di serî de Grekî, Asûrî û Ermenî), ku hatibûn hejarkirin ji alî Romayî û Persan ve, dinimîne. Pêşketina tevgerek nû ya dijberî şaristaniya klasîk mijara gotinê ye. Bi dirêjiya tam sê sed salan, li bin erdê, her cûre birçîtî û êşkenceyê dane ber çavan û bi vî rengî jiyaneke dij-Roma û dij-Sasanî berdewam kirine. Pişt re, rêveberiya jorîn (konsey-konsula keşîşan), ku dibe polîtîk, di heyn/dewr a Konstantîn ê Împaratoriya Roma de bi awayekî fermî hevkarî dike û bi vî rengî dibe organa bîrdozî ya duyemîn Romaya mezin a Rojhilat.

Li beramberî vê, berxwedaneke dijwar a mezhebên beşên hejar û radîkal heye. Ev rewş bi dirêjiya gelek sedsalan hatiye berdewamkirin. Arîûsgir, Suryanî û Gregoryan girîng in. Eşkere ye ku têkoşîna çînî, heta têkoşîna exlaqî û polîtîk a qebîle û qewmên di bin zordestiyê de, bi dirêjiya van sedsalên dirêj di bin rûbera olî de hatine berdewamkirin. Wê gotûbêja di Xirîstaniyê de ya "gelo Îsa ji xwezaya xweda, yan ji xwezaya mirov, çêbûye?", Pêker/faktora bingehîn a di cewazbûna mezheb

de ye. Koka wê, xwe dispêre mîtolojiya Sumer li beramberî ku tebeqeya jorîn xwe ji nijada xweda ilan dike, vebêjeyên bi şêwaza ku wê tebeqeyên jêrîn ti caran nikaribin ji nijada xwedayî bin (heta ew efsaneya bi şêweya ku ji pîsiya xweda hatine afirandin, vê rastiyê derdibirre), bandora xwe demeke dirêj li ser olên Îbrahîmî jî kiriye. Helwesta Hz. Miheme zelal e; mirov nikare bibe xweda, lê tenê dikare bibe qasidê wî. Dema ku mezhebên ji koka tebeqeya hejaran (Arîûsgir), îdea dikin ku Îsa ji nijada mirov e; meyla yên hevxebatkariya desthilatiyê dikin, bêhtir li ser îdeaya ji nijada xweda, ye. Cewhera pirsgirêke, bi çînbûnê re pêwendîdar e. Têkoşîna dij-şaristanî, ku di navbera salên 3000-1500 B.Z, bi baweriyên wan ên herêmî û bi baweriyên fermî yên mîtolojîk ê veguherandî, tê berdewamkirin, hem taybetmendiyên çînî û hem taybetmendiyên etnîkî di xwe de werdigire. Bêrî û keserên wan ên ji bo azadiyê zelal e. Qebîle û eşîretên li qada Zagros û Toros ku koka wan Aryen e, têkoşînên mezin kirine; komrig/sulaleya Gûtî, Gûdea damezrandinê; her wisa Konfederasyona wan a Mîtannî, ya bi navenda Serêkaniyê (Ceylanpinar) ya roja îro, ku bi Hîtîtiyan re, ku tevlî Kasîtiyan Babîlê di sala 1596 B.Z. de dagir kirin, hêza xwe di salên 1500 B.Z. de bi Misirê û bi tevahiya bajarên Mezopotamya dan pejirandin; vê yekê van rastiyan derdibirre.

Kevneşopa Îbrahîmî ya berxwedanê, piştî vê qonaxa dîrokî pêş ketiye û di çêbûnên dîrokî de bi şêweyên cewaz, heya roja me ya îro gelek bandorker bûye. Lê dîsa jî, wê ne rast be ku mirov kevneşopa Îbrahîmî, ji mîtolojiyê bi tevahî qut bike. Beşeke mezin a bûyerên ku di hersê Pirtûkên Pîroz de jî cî digirin (di serî de Hewa û Adem), di mîtolojiyên Sumer û Misirê de jî derbas dibin. Cewazî, bi veguheranan re, di serî de yên li ser xweda ku serdeman derbas kiriye re, têkîldar e. Ya girîng ew e ku civaka exlaqî û polîtîk xwe bi derbirranên herêmî yên xurt ên bîrdozî û olî ferz kiriye. Ol, di rêjeya mezin de, berxwedana exlaqî ye. Bi taybetî kevneşopa Zerdeşt, veguheraneke zêdetir bikok derdibirre. Kevneşopa Zerdeştî, ku çavkaniyeke wisa ye ku ya herî zêde bandora xwe li olên Îbrahîmî kiriye, doktrîna civaka çandinî û ajelvanî ya ji koka çiyayê Zagros, a exlaqî û polîtîk, her wisa bi giranî nîv-felsefî û nîv-olî ye. Jêpirsîna wî ya navdar a xwedayê ji koka Semîtîk, bi bangnîşana “Ka bêje, tu kî yî?” qutbûneke bikok diteyisîne. Bi rêya bicîkirina, yekem car, têgînên ‘baş’ û ‘xirab, her wisa ‘ronahî’ û ‘tarîtî’ li şûna ‘pîrozî’, wê pêşiya etîk (zanista li ser exlaq) û bizavên felsefî veke, ku pişt re wê ji alî Grekiyan ve xeylî bêne pêşxistin. Mirov dikare ji vegotinên li ser Medan jî yên di beşeke mezin a Dîroka Heredot de, têderxe ku Grekî, bi taybetî bi kanala Medan, pirr tişt deyndarên kevneşopa Zerdeşt in. Şîmaneyêke (îhtîmaleke) xurt e ku kevneşopa Zerdeşt, hîn jî di qebîleyên çiyayan û civaka fireh a çandinî ya Aryenî de, ku nekariye bihata mêtingehkirin, rastiya civaka exlaqî û polîtîk a xurt diteyisîne. Mijareke têgihîner e ku rastiya exlaqî û polîtîk a civakekê derdibirre, ku te de koletî zêde pêşneketiye û jiyana azad xurt e.

**d-** Şaristaniya Grek-Roma, ku heyama dawî ya çaxa destpêkê jiya, her sê kevneşopan jî bi hev re jiyaye. Serdema xweda yê qral ê kevneşopî ya li herdu nîv-giravan, qonaxa yekemîn pêkaniye. Weke mîtolojîk, verêj(muştaq)a dawîn a resen(orîjîn)ên Sumer û Misir e. Kevneşopa mîtolojîk (Zeûs ê li Olîmpos û Jupîter ê li Roma), di heyna Qraltiyên Etrusk û Îsparta de, çaxa xwe ya mezin a dawî jiyaye. Dema ku vegotina mîtolojîk, di heyamên Komara Roma (508-44 B.Z) û, Demokrasiya Atîna (500-300 B.Z) de, herku diçe vedimire, kevneşopa felsefî derdikeve pêş. Çîçero û Sokrates bêjer(xetîb)ên navdar ên vê demê ne. Hemwelatiyên Atîna û Roma, ku kevneşopên xwe yên berê yên azad, wisa bi hêsanî bi cî nahêlin (naterikînin), hîn jî xeylî dilsozî kevneşopa civaka exlaq û polîtîk in. Bi tundî têkoşîn kirine li dijî sîstemên qraltî û împaratoriyan. Têkoşîna ku Atîna li hemberî Îsparta û ya ku kesên li pêş ên arîstokrasiya Romayî li hemberî Sezar, kirine, vê rastiyê

diteyisînin. Çîçero û Sokrates fîlozofên exlaq û felsefeyê ne. Di yekemîn doktrînên derbarê teoriyên etîk û siyaseta demokratîk de, navên girîng in. Bê gotûbêj e ku Atîna û Roma, hêzên xwe, tevî ku li tevahiya civakê nateyisînin, ji kevneşopa civaka exlaqî û polîtîk digirin, ku hîn jî xwedî damarên xurt e. Saziya sînordar a koletiyê, nikare were berawir/muqeyesekirin bi girseya hemwelatiyên xurt ên azad re, hem ya li qada bajêr û hem ya li qada çolterê. Lewre rola wan a di pêşxistina doktrînên di derbarê komar û demokrasiyê de girîng e. Têkçûna Komara Roma û Demokrasiya Atîna li hemberî ceribandinên Aûgûstûs û Îskender ên împaratoriyê, pêşketineke girîng derdibirre. Pêwîst e neyê jibîrkirin ku beşeke mezin a nirxên erênî yên mayî ji serdemên klasîk ên Roma û Atîna, berhemên Komar û Demokrasiyê ne. Rastiyek e ku di dîroka nivîskî de yekem car derdikeve pêşiya me ku exlaqî û polîtîk, bi komar û demokrasiyê ve, bi tevahî jî nebe, baştir têne derbirrîn. Ji bo karibin tam bêne derbirrîn, pêwîst e demokrasiya rasterast a beşdar ku demokrasiya nûnerî (temsilî) derbas bike, bijîn.

Rola di împaratoriyê de ya Xirîstyanî, ku kevneşopa sêyemîn e, di dema pêşîn de rûxîner e. Heya rûxîna Roma (476 P.Z) di rola, tevlî êrîşên qebîleyên Germen, têkeleke xurt a şaristaniya demokratîk de ye. Bi hilhatina Împaratorî ya Bîzansê re, dadikeve rola nûnerekî paşverû yê şaristaniya fermî ya bidewlet. Lê, nûneriya wê bi mezhebên pirr xurt ên dijber (muxalif), nîşan dide ku Xirîstyanî rola xwe ya erênî ya di pêşketina şaristaniya demokratîk de didomîne.

Weke encam, hilweşîna (hilweşîna Roma, hilweşîna çaxa destpêkê ye) sîstema şaristanî ya klasîk a sê hezar û pênc sed salî, spartî bi sêmendiya bajêr-çîn-dewlet, (tevî herku çû karakterê xwe yê navendî yê serwer pêş xist) bi berxwedan û êrîşên Xirîstyaniya dij-şaristanîperest û yên qebîleyên (Germen Hûn, û Frank) dîsa dij-şaristanîperest, ku pêwîst e weke du têkelên serekî yên şaristaniya demokratîk bêne hesibandin, xebitîna rêveçûna wê ya dîrokî, gelek eşkere bi me nîşan dide. Dejenerebûnên tebeqeya jorîn û dariştinên (klasîk) ên şaristanî, yên di singê hêzên şaristanî de, vê rastiyê naguherînin. Pêwist e neyê jibîrkirin ku war û bajar ên şaristaniya klasîk, hîn jî di okyanusa hêzên demokratîk (rêxistingeriyên qebîle, qewm, ol, mezheb û zenaetkariya bajêr) de di rewşa giravan de ne. Mirovahî dev ji civaka exlaqî û polîtîk bernedaye. Şerên bi hezaran salan, ji nêz ve bi vê rastiyê re pêwendîdar in. A ku dixwaze di bin dîmena olî de xwe bide berdewamkirin, di bingeh de rastiya heyîna weke civaka exlaqî û polîtîk a meyla azadiyê ya derbarê xwezaya civakî de ye. Ev tespît pirr girîng e!

**e-** Pirsgirêka bingehîn a di hêla Îslamiyetê de, ku ola mezin a dawî ya Îbrahîmî ye, derbarê wê yekê de ye bê ka dewameke şaristaniyên klasîk e, yan dengekî xurt ê şaristaniya demokratîk e. Ez bawer nakim ku vê gotûbêjê hîn jî hatibe tehlîlkirin. Meke, ku bajarek e ku têde Hz. Miheme pêngav avêt, li ser bazirganiyê avabûye. Li gorî xwe, xwedî hînterlandeke (herêma paş a li ber deryaye) fireh e. Li wî cî ye ku rêyên bazirganî yên Bakûr-Başûr û Rojava-Rojhilat rastî hev tên. Ne tenê pêşkêşiya malan, lê di heman demê de pêşkêşiya ramanan, koleyan û hêmayên xwedayan jî, tê kirin. Ciyekî wisa ye ku têde olên ji kevneşopa Îbrahîmî û ji kevneşopa mîtolojîk, heta ji ya anîmîst, deng vedidin. Navenda hecê û serdanê ye. Bîzans, ku yek ji du împaratoriyan e, ku di dema zayîna Hz. Miheme de, awayê bihûranê (derbasbûnê) yê ji çaxa destpêkê bo çaxa navîn jiyan, li Bakûr daketiye heya Şamê û şaxê fermî yê Xirîstyaniya di bin kontrola xwe de, bi xwe re diguhêzine. Keşîşên Suryanî bêhtir di rewşeke dijber de ne û lezayî dane Xirîstyankirina Sasaniyan. Sasanî jî dikevin pey berfirehkirina serweriyên xwe, ji bakûr ve, li ser nîv-girava Erebîstanê. Bandora Hebeşîstanê (Etiyopya ya îroyîn li Efrîkaya Rojhilat) li ser Yemenê li Rojavayê Başûr belav dibe.

Cihû, ku kevneşopa herî kevn in, xwe çirpandine her aliyên nîv-giravê. Ji tewa mulkan û bazirganiyê sûd werdigirin.

Lê, qebîleyên Ereban, ku nişteciyên rastîn ên nîv-giravê ne, aloziyeke kûr a civakî û aborî (sosyo-ekonomik) dijîn. Wan nijd/êrîşên ku di dîrokê de pirrî caran ber bi çar aliyan ve kirin (tê zanîn ku binemalên Semîtîk, berî şaristaniyên Sumer û Misir, êrîş birine ser qadên berdar ên neolîtîk û şaristaniyên bajaran ên pişt re. Amorît, Apîrû, Akad, Kenan û Aramî navên pêlên vê serdemê ne), [vê carê] ji ber hêzên şaristaniyên heyî, nikarin dubare bikin. Serdemeke wisa mijara gotinê ye ku pirr têne tengavkirin. Heman weke nepox(balon)a ku pirr bişide, di şûngeh/pozîsyona teqînê de ne. Ereb, ji bo belavbûna mezin a dawî ya binemalên Semîtîk pêk bînin, hema hema li benda mûcîzeyekê bûn. Îslamiyet, navê vê mûcîzeyê ye. Eşkere ye ku Miheme zeman û zemîn baş xwendiye. Tevahiya taybetmendiyên pêdiviya dema nû ya dîrokê, di kesayeta xwe de diteyisîne. Nabe murîdê ti yek ji wan kevneşopên heyî yên bîrdozî. Ji Mûsawîtî û Îsawîtî, ku ji wan re dibêje pirtûka olê (Kitab-î dîn), her wisa ji Sabîtî û Zerdeştiyê, bibandor bûye. Helwesta wî ya li hemberî pûtan, didirûve ya Îbrahîm; têderxistiye (ferq kiriye) ku wê xizmetî armancên wî nekin. Yekemîn çalakiyên wî yên propaganda û leşkerî, li hemberî yekdestiyên bazirganî yên Mekeyê ne. Dizane ku, bêyî şkandina bandora wan, wê nikaribe ji dînamîzma qebîleyê sûd wergire. Wahî yên derbarê Xweda (Allah) de, ku wan ji nû ve şîrove dike, pirr didirûvin kevneşopa Mûsa ya Deh Fermanan. Eşkere ye ku lê xebitiye (hewl daye) ku hedefeke misoger a exlaqî û polîtîkayeke nû têxe nava qebîleyan. Eger naveroka têgîna ‘Allah’(xweda) bê tehlîlkirin, wê bê têgihîştin ku hewl tê dayîn utopyayeke herî bijare ya civakî were avakirin. Di dema Medîne de, ku têde bû hêzeke siyasî, utopyaya xwe bêhtir zelal kiriye.

Serkeftina çalakiyên destpêkê weke mûcîzewî hatine dîtin û bi xwe ewletiya wî zêde kirine. Şêwaza xebatê ya Miheme li Medîneyê, di hêla mijara me de girîngiya pirr mezintir di xwe de werdigire. Ew ciyê ku jê re tê gotin ‘mizgeft’, di rastî de, di erka meclîsa demokratîk de ye. Destpêkê, civîn, ên ku di wan de tevahiya pirsgirêkên civakî têne gotûbêjkirin û li rêyên çareseriyê têne gerîn, li mizgeftan têne çêkirin. Vê rola xwe, heya mirina xwe domandiye. Her wisa rîtuelên ayînî (nimêj, rojî, zekat), di wergiriya xebatên perwerdeyî de ne, ku armanca wan bihêzkirina kesayetiyan e. Ti kes nikare înkar bike ku di cewhera Îslamiyetê de pêngaveke wisa heye. Pirr eşkere ye ku civaka exlaqî û polîtîk, tevî ku di bin rûbera olî de ye, bi dînamîzmeke xurt tê zindîkirin. Lewre, eger em qala tevgereke rastîn a Mihemedî û Îslamiyetê bikin, rastiyek e ku nikare bê înkarkirin ku rêya vêya di wê yekê de derbas dibe ku civaka exlaqî û polîtîk, ji nû ve û bi armanca derbaskirina pirsgirêkên wê yên rasteqîn, li ser bingeha demokrasiya beşdar, were avakirin. Tê zanîn ku di hin çalakiyên xwe de zêdegaviyan kiriye û di vê mijarê de ew bi xwe jî ketiye nava dudiliyê. Bi taybetî, di mijarên Cihûyan û Qible de û avêtina ber şûran a tevahiya zilamên ji qebîleya Cihû ya [bi navê] Benî Hûveyza. Eger karîbûya çareseriyeke rast di vê mijarê de hatiba dîtin, belkî jî wê karîbûya nakokiya Ereb-Îbranî bihata çareserkirin û Îslamiyet bêhtir pêş biketa. Lê, weke yekpareyî, gengaz e bê wesfandin weke tevgerek demokratîk, azadîxwaz û nêzî wekheviyê. Belavbûna wê di demeke kurt de li beşeke mezin a qadên kevn ên şaristaniyê, nikare were girêdan tenê bi zora çek û şûran. Bextreşiya Îslamiyetê ew e ku di demekê ji Tevgerên Mûsawî û Îsawî pirr kurttir de, hat kirin aleta hêzên şaristaniyê. Hîn bêyî ku bi ser zayîna wê re pêncî sal derbas bibe, tevlî binemala Muawiye li Şamê, hatiye veguherandin bo rola hema hema pîne bo hêzeke klasîk a şaristaniyê. Kuştina Ehlîbeyt tê wateya kuştina, di heman demê de, gelek taybetmendiyên erênî yên

di naveroka wê de. Îslamiyet, bi raya min, di wê demê de hatiye qedandin. Mezhebên ku weke şopînerên Ehlîbeyt şêwe girtin û Xarîcî, ku Îslama beşa bêhtir hejaran e, kevneşopên hêjayî bibîranînê ne. Şaxê Şîa yê Ehlîbeyt li Îranê, ji Xanedaniya Safevî û pê ve, ketiye rêya şaristaniya fermî û bi vî rengî dij-şaristanîperestiya di cewhera xwe de vala kiriye. Elewiyên Kurdîstan û Anatolya, bi sedan salan di bin zorî û çewsana bêeman a kevneşopa desthilatiya Sûnî de, karine ancax di rehenda civaka exlaqî û polîtîk de heyînên xwe bidin berdewamkirin. Nekarîne pêşketineke sîstematîk bi ser bixin. Rewşa şaxên din  ne cewaz e. Xariciyan, Karmatiyan û gelek tevgerên dirûv, xwestine Îslamê weke tevgereke sext a çîna bindest, têxin jiyanê. Lê vê taybetmendiya wan, bi tesfiyebûyîna zêdetir stemkarane, bi dawî bûye. Pêwîst dike ku hebûna mîraseke pirr zengîn a di vî milî de, ya di bin rûber/perdeya Îslam de, were lêkolîn. Dîroka demokratîk ji bo vê, pêwîst e. Îslamiyeta di kesayetiya Miheme de, misoger nebûye mijara gotinê. Ne gengaz e ku mirov ji tevahiya heyamên Emewî, Ebasî, Selçûkî, Osmanî, Safewî û Babûrî re, di hêla Miheme de, bêje 'Îslam'. Ji ber vê yekê gelek terîqat û mezheb çêbûne. Serkeftineke cidî tine ye. Yekane sûda wê ew e ku yekdestiya fenek/qurnaz a bazirganî ya Meke (di kesayetiya Mûawiye de) hêza mezin bidest dixe, her wisa arîstokrasiyên (mîr û şêxên) din ên qebîleyan, dibin yekdestiyên bazirganî û desthilatî, ku nikarin di xewnên xwe de jî bibînin, û bi vî rengî vebûn û deskeftiyên mezin bi dest dixin. Eşkere ye ku ev jî, xiyanet e li Îslamiyetê.

Tê zanîn ku xiyanet li Hz. Mûsa û Hz. Îsa jî hatiye kirin. Lê, rewşa xiyaneta li Miheme hatiye kirin, pirr zêdetir berfireh e. Tê zanîn, ka Îslama sedsalên 19. û 20. çawa hatiye bikaranîn di belavbûna mêtinger a Îngilistanê li Rojhilata Navîn de û rolekê çawa netewperest a herî paşverû, di çêbûna dewlet-netewan (tevahî dewletên Ereb, Îran, Tirk, Efxanistan, Pakistan, Endonezya û weki vana) de pê hatiye leyîstandin. Hewldanên di roja me ya îro de, yên îspatkirina hebûna xwe, bi radîkalîzma El Qaîde, ku hîn jî ne diyare ka çi ye, her wisa bi pêkhateyên weke Konferansa Îslamî (ez qala gelek pêkhateyên bi navê 'Îslam', nakim. Pêwendiya wan bi Îslamê re, tenê weke peyv, heye û pirraniya wan a raser, rêxistingeriyên kapîtalîst, modernîst û netewperest in), ku hebûn û tinebûna wê yek e, tên wateya ku dema herî bêwate di hêla Îslam de tê jiyîn.

Ez Miheme digirin cidiyê; lê bi şertê ku li ser wî pirr bê gotûbêjkirin, bi taybetî bi şêwaza nêzîkatiya derbarê raman, exlaq û polîtîka de; her wisa yên ku rêza wan piçikek jî be ji Îslamê re hebe, rêzdar û dilsoz (girêdayî) bin ji rastiya Mihemedî re, ku wê bi zelalî derkeve holê. Ez hêvî dikim ku di beşên pêş ên pêwendîdar de jî, vê mijarê vekim.

Divê bi têgihîştî bê pêşwazîkirin ku ez hewl didim Çaxa Navîn (476-1453 P.Z), bi Îslamê û Miheme  tehlîl bikim. Ji ber ku dîroka çaxa navîn, bi rastî jî, çaxa "Îslamî û Mihemedî" ye, ne di wateya sepana wê de, lê bi xiyaneta li navê wê û cewhera wê ve. Pêşaneya  serweriya roja me ya îro, ku jê re tê gotin 'kapîtalîzm', bi rastî jî ev Îslam e. Çaxekê wisa ye ku yekdestiyên bazirganî, yekem car digihîjin lûtkeyê. Navend, hîn Rojhilata Navîn e. Pêş-heyam e ku têde tevahiya dek(lîstik)ên kapîtalîzmê têne nûvedan (îcadkirin) û sepandin. Venedîk bû bajêrekî wisa ku, bi awayê hevkarî bi van yekdestiyan re bi dirêjiya sê sed salan, çanda daringî(madî) ya Rojhilata Navîn, guhast. Xirîstyanî jî çanda arişî (manewî) ya Rojhilata Navîn, di navbera sedsalên 6. û 10. de, guhastibû tevahiya Ewrûpa. Sedsalên 8. ta 12. ku ji wan re tê gotin Ronesansa Îslamî, weke boçî(cûce)yan bûn, ku li ser kevneşopên bi hezar salan ên şaristaniyê rûniştibûn.

Ez, hem rewşa Rojhilata Navîn a girêya kor û hem jî ketina wê ya berdewamî, ku ji sedsala 12 û pê ve destpê kir, di nava pêwendiya nêzîk a bi xiyaneta di bin navê Îslamê de dibînim. Xiyanet, tevî ku ji tevgerek a di nirxa zêrîn de jî pêngav bavêje, dikare ancax ya herî xirab bike. Ya di Îslamiyetêde jî rû daye (qewimiye), hinekî piştrasbûyîna vê rêsayê ye. Ez vê mijarê girîng dibînim û jê bawer dikim; eger Mihemediyan jî karîbûna gotûbêjeke rasteqîn a teolojîk, etîk, felsefî, hunerî û polîtîk, herî kêm bi qasî Mûsawiyan û Îsawiyan, pêş xistibana û encamên wê veguhastibana bo civaka exlaqî û polîtîk, wê navenda serwerî ya şaristaniya klasîk neşemitiyaba Rojava. Ya ji vê jî girîngtir, ew e ku şaristaniya demokratîk dikarîbû, di şûna şaristaniya klasîk de, rewşeke serekîn jiyaba.

Kevneşopên Mûsawî û Îsawî, ku hatin kişandin bo Ewrûpa, ji gotûbêjan re bêhtir vekirî bûne. Bê gûman, dogmatizm, ku di cewhera kevneşopa olî de heye, rewşa xwe ya bûyîna astengiyeke cidî, domandiye. Lê belê, karîne nirxên Rojhilata Navîn ên çanda arişî (manewî) ku ne têgînên bi tevahî vala ne, li Ewrûpa belav bikin; vê yekê, weke pêwîstiya diyalektîkî, lez daye pêşketina cemsera (qutba) felsefî û zanistî. Ya ku li Rojhilata Navîn a Îslam nehatiye kirin û hîn jî îzin(destûr) nayê dayîn ku bê kirin, rêzgirtin e ji vê gotûbêja diyalektik û encamên wê re. Nexwe, di pêşketina çandinî û bazirganî de, bi hezaran salan berê, ji Ewrûpa peştir bûn. Di sanayiya manîfaktur de jî ji Ewrûpa paştir nebûn. Pûxteya/cewhera gotinê, Tevgera Mihemedî dikarîbû bûbûya pêngaveke şayan(layîq)ê dîroka Rojhilata Navîn. Lê belê, eshabiyên korbûyî yên qebîleyan, dirûveke meylên faşist û netewperest ên roja me ya îro, weke ku Îbn-î Xaldûn di dema xwe de tehlîl kir, hîn di destpêka Îslamê de, ferz kirin û bi vî rengî  çaxa navîn heba kirin. Sîstema şaristaniya navendî, ku li Rojhilata Navîn ket nava meyla ketine, li Ewrûpa, ji sedsala 15. û pê ve, dîsa dest bi hilhatinê kir. Daneheva çanda daringî û arişî ya nêzîkî deh hezar salên ku piştî şoreşa çandinî bihûrîn, pêngava xwe ya nû, di vê demê de, wê li vê erdnîgariyê pêk anîbana.

Armanca min, bêhtir ji dîrokêkê şaristaniya demokratîk di asta pêşnûmayekê de be jî, ceribandinek e derbarê pênaseya wê, ciyê wê, her wisa ka çi ye û pêwîst e erka wê ya dîrokî çawa bê ravekirin. Ez di wê baweriyê de me ku pêdiviya dîrokê, misoger bi vê ravekirinê heye. Nexwe, em ê qet nikaribin watedar bikin pêngavên ku ji wan re tê gotin ‘mûcîzewî’. em ê çawa karibin dîrokê têbigihîjin, eger em ji hev dernexin (analîz nekin) wan pêkhateyên berxwedan, şer û yên weke komun, ku bi hezaran salan in di nava dorhêl(atmosfer)eke pirr zengîn de têne pêşxistin li dijî yên xwe weke ‘xweda’ îlan dikin, yên dixwazin dawî li nijadên wan bînin, her wisa yên pîşeyên bêrûmet ên weke koletî, serftî, karkerî û pîrekî, li wan ferz dikin û yên hewl didin tevahiya nirxên wan ên daringî û arişî talan bikin? Em çawa dikarin mirovahiya xwe nas bikin, eger em dîrokê tênegihîjin? Divê em van pirsan bikin û bersivên wan bidin, eger rêza me hebe ji jêvenegerên me yên civakî re, bi navê polîtîka weke aqil, exlaq û hunerê azadiyê. Ne bi dekên (hileyên) teng ên çînî û ne jî bi eshabiyên qebîleyan, em nikarin ti pirsgirêk çareser bikin. Eger em tevgerên mehşerî yên di xwezaya civakî de rû didin nekin sîstem, her wisa sedem û encamên wan daneynin holê, em ê nikaribin weke mirov heyînên xwe pênase bikin.Wê demê, wê jiyana me nikaribe wateya xwe bibîne. Bi pêşkêşiyên şebekeyan ve ku propagandaya wan di bin navê şaristanî de pirr tê kirin, lê cewhera wan, bi rastî jî, ew e ku yekdestiya sermaye û desthilatiyê ji ser pişta civakê bidin hev, gengaz nîne ku dîrokêkê watedar a mirovahiyê derkeve holê. Peyan (teşebus)a şaristaniya demokratîk a li ser civaka-dîrokî, çavkaniya xwe digire ji pêdivî û pêwîstiya, ne tenê ku cîhanên nû, bi qasî ku karibe xeyal bike û

bihizire hene, lê ku dawî bîne li xapandina şebekeya kapîtalîst a bi navê ‘dawiya dîrokê’ û ‘tek cîhan’.

Hîn bêyî rûxandina dîroka dogmatîzma Çaxa Navîn, ku mirov tine dike, vê carê dogmatîzmaya xirabtir ji wê, ya dîrokên dewlet-netewan mejiyan radest (teslîm) girtin. Dîrokên li ser netewan, ên ji eshabiyeyên qebîleyan hezar qat zêdetir şovenîst, her wisa li beramberî rastiyan korker in û wan tine dihesibînin, çolên nû yên mejî afirandin. Xwîn weke lehiyan, bes (sirf) ji bo afirandin û piştrastkirina van dîrokên kerax, hatin herikandin. Pûtên netewperestî û dewlet-netew, ku ne ti tiştek in ji bilî pûta herî paşverû, qira tevahiya mirovahiya roja me ya îro anîn. Bi zanîna ku civakên tew di demên ku ji wan re tê gotin herî tarî de jî, nebûn xwediyên mejiyên ewqas req û çolbûyî û neketin nava van rewşan, ez lê dixebitim ku hin hewldanan bikim.

Divê ez careke din diyar bikim: Heqîqet tiştekî wisa ye ku nayê têgihîştin, eger xwezaya civakî neyê zanîn. Ez ti caran lê nabûrim (efû nakim) wê nêrîna reşbîn a li dîrokê, ku modernîteya kapîtalîst (wê) di min de afirand. Ji ber ku, eger em dîrokê nizanibin, ku mehşereke rastîn a mirovahiyê ye, û weke pêdiviya vê yekê em nebin exlaqî û polîtîk,  em ê nikaribin xwe rizgar bikin ji ketina nava rewşeke herî bêrûmet û pispaye. Bi qasî ku tu karibî bibî dîrokî, ewqas tu bi rastiyê re yî. Û dîrok jî, ancax eger di wateya şaristaniya demokratîk de be, dikare bi rastiya civakî re pêwendî deyne.

Ez ê hewl bidim, nêzîkatiya li ser dîroka şaristaniya demokratîk li hemberî modernîzma kapîtalîst, ji ber girîngiya mijara wê, di beşa piştî vê de, bi awayê cûda pêşkêş bikim.

**D- Hêmanên Şaristaniya Demokratîk**

Dibe ku fêrkar be ronîkirina yekeyên komcivakan, di wergiriya civaka exlaqî û polîtîk de. Her wisa di hêla têgihîştina yekparetiyê de jî pêwîst e ku hêmanên cewazbûyî yên civakî bêne pênasekirin. Yekparetî, dikare ancax di nava cewaziyan de wate bigire. Em nikarin bajêr, weke dewlet, hêmaneke şaristaniya demokratîk bihesibînin. Lê, yên bi keda xwe debara xwe dikin, her wisa zenaetkar, karker, bekar û yên xwedî her cûre pîşeyên serbest, serbixwe ji vê, tevî ku bajarî ne jî, di wergiriya hêmana demokratîk de ne. em ê mijarên bi vî rengî niqaş bikin.

**a- Klan:** Me bi kurtasî qala wana kiribû. Me diyar kiribû ku klan, weke şanikên sereke yên civakê, di serpêhati(macera)ya dirêj a jiyana cûreya mirov de, ji sedî 98ê temenê wê, digirin nava xwe. Jiyan bi rastî jî zor bû ji bo van komên ji 25-30 kesî, ku zimanê nîşanê bikar dianîn û debara xwe bi nêçîrvanî û komkeriyê dikirin. Pirr zor bû ku nebûna êm/qût ji lawirên kovî re û qûtên bijûndar peyde bikirana. Avhewa, carna pirr sar dibû. Çar serdemên girîng ên qeşayî hatibû jiyîn. Pêwîst e mirov nebêje “dapîr û bapîrên me” û wan di pişt guhê xwe re bavêje. Eger hewldanên wan ên mezin nebûna, niha em jî nedibûn. Divê yekparetî, li vir lê wêre gerîn. Tevahiya mirovatiya me ya îroyîn, encama şerê (têkoşîna) ji bo kêferata jiyanê ya vana ye. Dîrok, ne tenê bi beşa wê ya nivîskî, dibe dîrok. Dîroka rasteqîn, eger em rewşa awayê xwe yê xwezaya civakî ya bi milyonan salan berî niha, nedin ber çavan, nikare wateya xwe bibîne. Yekemîn awayê ku wê mirovahiyê bikira yek, belkî jî taybetmendiyên sereke yên civaka klan bûn. Me hewl da em klanê, weke awayê

herî xwerû yê civaka exlaqî û polîtîk biwesfînin. Van komcivakan, ku hebûnên xwe hîn jî li gelek qadan didomînin, di hemû hêmanên civakên pêşketî de jî, rola xwe ya şanika serekîn didomînin.

**b- Malbat:** Her çend klan bi xwe weke malbat neyê wesfandin jî, nêzîkî wê ye. Malbat, yekemîn sazî ye ku di nava klanê de cewaz bûye. Di bin otorîteya xerarşîk a bi serweriya zilam de, ku piştî şoreşa gund û çandinî (nêzî salên 5000 B.Z) pêş ket, piştî ku demeke dirêj weke malbata dayîkane tê jiyîn, hat derbasbûn bo heyama malbata baviksalarî. Rêveberî û zarok hatin hêştin bo kontrola zilamê mezin ê malbatê. Xwedîtiya li ser jinê, bû bingeha yekemîn ramana mulkiyetê. Li pey vê, hat ketin bin koletiya zilam. Di serdema şaristaniyê de, em rastî şêweyên fireh û demdirêj ên malbatên weke xanedaniyan tên. Her wisa malbatên bêhtir basît ên gundî û zenaetkar jî her hebûne. Dewlet û desthilatî, zilamê bav ê di nava malbatê de, weke kopyayeke otorîteyên xwe, kirine xwedî rol. Bi vî rengî malbat hate dehfdan nava rewşa navgîna herî girîng a rewatiyê. Herdem rola çavkaniyê leyîst ji şebekeyên desthilatî û sermaye re, ji bo kole, serf û karker, kedkar, leşker û tevahî xizmetên din. Ji ber vê sedemê, girîngî hat dayîn bo malbatê û ew hate homandin (pîrozkirin). Şebekeyên kapîtalîst, tevî ku çavkaniya herî girîng a karê li ser jina di nava malbatêde pêk tînin, vêya nuxaftine û bi vî rengî barekî zêde li malbatê siwar kirine. Malbat, hema hema hatiye kirin sîgortaya pergalê û bi vî awayî hatiye mehkûmkirin bo jiyîna heyama xwe ya herî kevneperest.

Rexneya li ser malbatê, girîng e. Dikare ancax li ser bingeha rexneyan, bibe hêmana serekîn a civaka demokratîk. Eger, ne tenê jin (femînîzm), lê di heman demê de, tevahiya malbat, weke şanika desthilatiyê, neyê tehlîlkirin, wê îdeal û sepan (pêkanîn)a şaristaniya demokratîk, ji hêmana xwe ya herî girîng bêpar bimîne. Malbat, ne saziyeke civakî ya wisa ye ku bê derbaskirin, lê dikare bê veguherandin. Divê îdeaya mulkiyet a li ser jin û zarokan, ku ji dema xerarşiyê maye, were terikandin û di têkiliyên hevseran de têkiliyên sermaye (her cûreya wê) û desthilatî rol nelîzin. Divê ew nêzîkatiya ajoyî ya weke domandina zayendê, bê derbaskirin. Nêzîkatiya herî îdeal ji bo pevretiya jin û zilam, ew nêzikatî ye ku felsefeya azadî ya girêdayî civaka exlaqî û polîtîk, esas bigire. Malbat, ku di vê çarçoveyê de veguheranê bijî, wê bibe garantiya herî saxlem a civaka demokratîk û yek ji pêwendiyên bingehîn ên şaristaniya demokratîk. Bêhtir ji hevseritiya fermî, hevserîtiya xwezayî girîng e. Divê alî, herdem amade bin ku mafê jiyîna bi tenê, bipejirînin. Nabe ku mirov di têkiliyan de, weke koleyan û bi çavkorî, tevbigere. Eşkere ye ku wê malbat, di bin şaristaniya demokratîk de, veguherana herî watedar bijî. Heya ku jin, ku bi hezaran salan e ji girambarî (rêzdarî)ya xwe pirr tişt hunda kiriye, girambarî û hêza mezin bidest nexe, wê nikaribin yekîneyên watedar ên malbatê pêşbikevin. Nikare girambarî (rêzdarî)ya malbata avabûyî li ser nezaniyê (cehaletê) hebe. Para ku, di ji nû ve avakirina şaristaniya demokratîk de, dikeve ser milên malbatê, girîng e.

**c- Qebîle û Eşîret:** Qebîle û eşîret ji hêmanên herî girîng ên civakî ne ku malbatan jî digirin nava xwe û pêş dikevin bêhtir di civaka çandinî û gund de ku heman ziman û çand dijî. Yekîneyên civakî yên pêwîst ji bo hilberîn û parastinê ne. Klan û malbat, dema di çareserkirina pirsgirêkên hilberîn û ewlekariyê de ku pêş ketine nebes mane, pêwîst dîtine ku xwe veguherînin awayê qebîleyan. Hêmanên dendik ên civakê ne, ku ne tenê girêdana xwînê, lê hilberîn û ewlekarî jî wan pêwîst dikin. Nûneriya kevneşopa bi hezaran salî dikin. Ragihîn (îlanbûyîn)a wan weke saziyên paşverû û ku pêwîst e bilezginî bêne derbaskirin, yek ji nijadkujiyên herî mezin a modernîteya kapîtalîst in. Ji ber, heya ku mirov di nava yekîneyên qebîleyan de bimana, wê nekarîbûna wisa bi hêsanî bihatana karkerkirin û mêtin. Loma, hebûna qebîleyan, ji bo efendiyên koledar û feodal, bi

yek gotinekê, wekhev bûn li gel dijmin. Wê qebîle nekarîbûna koletî, serftî û karkeriyê bi endamên xwe bidana kirin.

Qebîle xwedî jiyaneke nêzîkî komunaliyê ne. Şewegirtinên civakê ne ku civaka exlaqî û polîtîk bi awayê herî xurt têde tê jiyîn. Xuyabûna wan herdem weke dijminên bêman ên şaristaniyên klasîk, bi taybetmendiya wan civaka exlaqî û polîtîk ve girêdayî ye. Wekî din, gengaz nedibû ku bihatana fethkirin. Yan wê tune bibana, yan jî wê azad bimana. Lê, hatiye dîtin ku bi demê re dejenere bûne. Yên hevxebatkar ên di nava wan de, weke li nava malbatan, di nava qebîleyan de jî, tim rolên neyînî leyîstine. Lê dîsa jî qebîle, ku koçberiya wan tim di rêza pêş de ye, yek ji hêzên rasteqîn ên avakar ên dîrokê ne. Kole, serf û karkeran, ti caran awayê berxwedana dîrokî, serhildêr û azad ê qebîleyan nejiyane û bi giranî, ji bili îstîsnayên wan, bûne bendeyên herî dilsoz ên efendiyan. Belkî jî li dîrokê, di şûna şerê çînî de, weke şerê qebîleyan ê berxwedanê hatiba nêrîn, wê bi awayekî pirr rasteqîntir nêzîkatî çêbûbûya. Ji şewşandinên herî girîng ên avakarên dîroka şaristaniyê ne ku rola qebîleyan piçûk tê dîtin, carna weke neyînî tê hesibandin û qet rol ji wan re nayê dayîn.

Eşîret, weke cûre federasyoneke komcivakên qebîleyan, zêdetir girîngiya wan hebûye. Hebûnên xwe, di rêjeya mezin de, li dijî êrîşên şaristaniyên koledar, bidest xistine. Pêdiviya yekbûn û berxwedanê, ji bo tune nebin, rêxistingeriya eşîretê zayandiye(afirandiye). Şêwegirtina civakê ye, ku rêxistingeriyên wê yên leşkerî û polîtîk, bilez pêkhatine. Hêzeke ji ber xwe ve ya artêş û polîtîka ye. Yekîtiya mejî (zihnî) û rêxistinî esas e. Çand û paşerojeke dirêj a dîrokî bi xwe re diguhêzin. Di rewşa çavkaniya sereke ya çandên netewan de ne. Her wisa, mirov nikare tevkariya wan jî ya li hilberînê, piçûk bibîne. Pêkhateya wan a kolektîv a civakî, alîkariya berhemberî jî esas digire. [Tê de] giyana (ruhê) komunal xurt e. Ji hêmanên avakar ên karakterê netewî ne. Lê, dema hevxebatkarî pêş bikeve, dibe ku zêdetir xeter bin. Tevî hemû hewldanên dîroknasên şaristaniyê, yên xistina wan ji ber çavan, ji hêzên bingehîn ên motora dîrokê ne. Eger berxwedana eşîretan a ji bo azadî, komunalîzm û kevneşopa demokratîk nebûna, wê mirovahî nekarîbûna xwe ji bûyîna girseyeke bende û keriyan rizgar bikira. Bûyîna wan ji hêmanên herî bingehîn ên şaristaniya demokratîk, bi van taybetmendiyên wan ve girêdayî ye.

Dîroka şaristaniya demokratîk, di rêjeya mezin de, dîroka qebîle û eşîretan a berxwedan, serhildan û helwestên wan ên pêdager (bisrar) ên di jiyana civaka exlaqî û polîtîk de ye li hemberî êrîşên şaristaniyê, ji bo azadî demokrasi û wekhevî yên ku bi rastî rengên xwe didin civakan, dîsa pêkhateyên qebîle û eşîretan in. Dewlet-netew, di giraniya komeke etnîkî de, tevahiya çandên eşîret û qebîleyan tefsiye kiriye û ev jî bûye tam nijadkujiyeke çandî. Vê nijadkujiya mezin a li hemberî civakê, her çend hinekî sist bûbe jî, hîn jî gef(tehdîd)a herî girîng e. Qebîle û eşîret, weke yekeyên avakar jî, dikarin rola serekîn bilizîn di avabûna netewa demokratîk de, di şûna dewlet-netew an jî netewa dewleta dewletê de. Ta radeya dawî têgihîner e ku eşîret û qebîle, bi van sedem û wasfên xwe ve, ji hêmanên bingehîn ên şaristaniya demokratîk bêne hesibandin.

**d- Qewm û Netew:** Şêwegirtina civakan di şaristaniya demokratîk de weke qewm û netew û jiyana wan, cewaz e ji şaristaniya klasîk. Şaristaniyên fermî, qewm û netewan weke nîçikekê xanedan û koma etnik a serwer, dikin têgîn. Qewm û netew têne kirin deyndarên minetdar ên xanedan û koma etnîk a fermî û bi vî rengî têne kirin çîrok. Awayê civaka xwezayî, di nava dîrokêkê gurivandî (derew) de, tê dapaçîn (tê sergirtin). Bi qehremankirina kesên ku di nava xanedan û koma etnîk a zal de têne derxistin rêza pêş, wer lê tê kirin ku bavên qewm û netewan tênê afirandin.

Gaveke berî û piştî wê, xwedakirin e. Dîrok, di wateyekê de, tê xebitîn weke hunerê hilberandina vî bavkirinî û xwedekirinî. Lê belê, rastî cewaz e. Xwezaya civakî, ku bi awayê qebîle û eşîretan pêş dikeve, herku zêdetir niştecî dibe û zimanê û çanda xwe pêş dixe, û nasnameya di cewhera xwe de ya civaka exlaqî û polîtîk didomîne, destpê dike ku weke qewm û netew şêwe bigire. Civak ji destpêkê ve di nasnameya qewm û netew de nazin (çênabin); lê pirr zêdetir nêzî nasnameya qewmî di çaxa navîn de û ya netewî di çaxa nêzîk de, bûne.

Qewm, wek cûre malzemeyeke netew e. Tê dîtin ku, tevlî çaxa nêzîk ve, bi du rêyan dibin netew. Dîsa, tê dîtin ku şaristaniya fermî eshabiyeta qewmî vediguherîne bo netêwperestiya nûjen (modern) û bi vî rengî hewl dide ku awayê nû yê dewlet, burjuwazî û bajêr weke netewa-dewletê diyar bike Komeke zal (hakîm)a etnîkî, rola bingehîn a dendikê dilîze. Nasnameya xwemalî (aîdî) wê, tê kirin malê hemûyê netew. Heta qebîle, eşîret, qewm û netew, ku nasnameyên wan pirr cewaz in, bi zorê têne neçarkirin ku di nava zimanê û çandê vê koma etnîkî de bêne helandin. Ev e, ew rêya ku jê re tê gotin ‘netewkirina hovane/wehşî’. Komkujiya herî mezin a çandî ya dîrokê, bi vê nêzikatiya şaristaniya fermî, di nava tevahiya netewan de li ser hemû ziman û çandên bi hezaran qebîle, eşîret, qewm û netewan, hatiye meşandin. Di serê hêmanên ku pêwîst e weke pêkhateyên dîrok û sîstem ên şaristaniya demokratîk, li ser wan herî zêde were rawestîn, qewm û netewên bi vî rengî tên.

Netewbûna rêya duyemîn tê pêkanîn bi rêya veguherandina komên heman yan jî dirûv ên ziman û çand ên di wergiriya civaka exlaqî û polîtîk de bo civaka demokratîk, li ser bingeha siyaseta demokratîk. Tevahî qebîle, eşîret, qewm, heta malbat, di netewbûnê de, weke yekeya civaka exlaqî û polîtîk cî digirin. Zengîniyên xwe yên zimanî, zarava (lehçe)yî û çandî vediguhêzînin netewa nû. Di netewa nû de misoger cî nîne ku komeke etnîk, mezhebek, baweriyek yan jî bîrdoziyekê mora xwe li serweriya xwe bide. Her wisa senteza herî zengîn e û ew e ku bi awayê herî dilxwaz were pêkanîn. Heta, tew gelek komên cewaz ên ziman û çandî jî, weke civakên demokratîk, dikarin bi navgîniya siyaseta demokratîk û bi awayê yekeya jorîn a hevpar a netewan, di nasnameya netewa netewan de bijîn. A guncav li gel xwezaya civakî jî, ev rê ye. Lê di rêbaza netewa-dewletê de, bi nêzîkatiya modernîteya kapîtalîst, bi awayê razberbûyî di rêjeya mezin de ji civaka xwezayî, weke tek ziman, tek milet, tek welat, tek dewlet (a unîter), li şûna feraseta kevn a tek ol û xwedaperest, weke versiyona wê ya laîk, şêwe dide xwe û vê yekê jî di heman demê de dibe awayê nû yê şêweya dewletê ya yekdestiya sermaye û desthilatiyê. Netewa dewletê, wê rastiyê derdibirre ku, di qonaxa veguherana kapîtalîst a yekdestiya sermaye û desthilatî de, xwe ji serî heya lingan di nava singê civakê de bicî dike, civakê dike mêtingeh û wê di nava xwe de dihelîne. Ew şêwe ye ku diyardeya zêdetirîn desthilatî û zêdetirîn mêtin têne pêkanîn. Her wisa tê wateya ku civak ji rehenda xwe ya exlaqî û polîtîk tê razberkirin û bi vî rengî tê razandin bo mirinê; takekes tê kurmorîkirin û bi vî awayî civaka faşist a kerî tê avakirin. Di bin vê modêlê de, ku herî dijraberî xwezaya civakî ye, pêker (faktor)ên dîrokî û bîrdozî, her wisa pêkerên çînî, sermayeyî û desthilatî, yên kûr, rol dilîzin. Nijadkujî, weke encama kombûyî ya van pêkaran hatine pêkanîn.

Avabûn û kelijînên netewan, di sîstema şaristaniya demokratîk de, dijejehr (panzehîr)ê yekdestiyên sermaye û desthilatî ye û rêya serekî ye ku mirat (nexweşîn)a faşîzme û komkujiyan (girêya ûr-kanserolojîk a civakê), tevlî sedemên wan ve, ji holê rake. Careke din, ahengiya xwezaya civakî bi karakterê şaristaniya demokratîk re, derdikeve pêşiya me.

**e- Hêmanên Gund û Bajaran:** Wateya gund û bajêr di perspektîva (paradîgmaya) şaristaniya demokratîk de diguhere. Çawa ku çandinî û sanayî di xwezaya civakê de du qadên hilberînê yên pêwîst ji bo hevdu ne; gund û bajêr jî du yekêyên niştecîhiyê ne ku hevdu pêwîst dikin. Dengeyeke di navbera wan de heye, ku pêwist e, teqez, were parastin. Dema ev denge were derbaskirin, rêya felaketa ekolojîk, dêw(azman)bûna çîn û dewletê û yekdestîbûna sermaye vedibe. Her wisa, bazirganî (bi rêya îstîsmarbûyîna cewaziya bûhayan/fiyetan) dikeve rêya ne-rewa. Ev xal girîng e: “erê” ji bajêr re, lê “na” ji yekdestîbûyîna wî ya çîn-dewlet-sermaye re. Ji bo şîrovekirina dîrokê, di hêla pêşketina gund û bajaran de, divê van pîvang(krîter)an esas bêne girtin. Tam îroniyek e ku etîketa ‘şaristanî’ li sêmendiya bajêr-çîn-dewlet hatibe dayîn. Her wisa binavkirina komcivakên ku di xeta rastîn a xwezaya civakî de dijîn, weke ‘hov’ û ‘barbar’, wekok(mîsal)a ku diz dibêje: “min xwediyê malê girt”, tîne bîra mirovan. Barbarî û hovîtiya rastîn, talankirin û rûxandina xwezaya civakî ye, ku vê rewşê çavkaniya xwe ji peymana sêmendî ya bajêr-çîn-dewlet û ji bajarê wê yê bi awayê yekbûyî, digire. Em careke din (di vê rewşa îronîk de) dikarin bi rengekî zelal girîngiya wê yekê bibînin ku serweriya bîrdozî rastiyan berevaj dike û wan wisa nîşan dide. Bîrdozî, di hêla ku mirov hem nêzî heqîqetê bike û hem jî jê dûr bixe, bi dirêjiya dîrokê girîngiya xwe domandiye û didomîne. Şaristaniya demokratîk, tevgera yekbûyî ya sêmendiya bajêr-çîn-dewlet, weke barbariya rasteqîn dinirxîne, her wisa rawêj (ferz) dike ku yên li hemberî vê ne, civaka exlaqî û polîtîk a rasteqîn derdibirre û wana dike bîrdozî.

Civaka gund, weke yekemîn diyardeya niştecihiyê, girîng e. Pêwîstiya jêvenegar a jiyana ekolojîk e ku di çaxa sanayî de were nûkirin û berdewamkirin. Gund, ne tenê diyardeyeke fizîkî ye, lê di heman demê de ji çavkaniyên bingehîn ên çandê ye. Ji yekeyên bingehîn ên civakê ye, mîna malbatê. Êrîşa bajêr, sanayî û burjuwazî weke çîn û dewlet, vê rastiyê naguherîne. Wekî din, pirr girîng e weke yekeya sepan(pêkhatin)a herî guncav a civaka exlaqî û polîtîk. Bajêr jî girîng e, lê bi mercê ku, hem di hêla ku bi gund re ji nû ve were dengekirin, hem jî di wateya sazbarî de, têde veguherana misoger bê çêkirin. Ji bo ku karibe were derxistin ji bûyîna navenda çerxa mêtin û zordestiyê û karibe rol bilîze, weke rehendekî gihîştî ya pêşketina civakî, tenê bi veguherana bikok, gengaz dibe. Xwedî wateyeke navendî ye di rizgariya civaka çaxa me de, ku were derxistin ji hevpariyan/şîrketan. Bajar, bi awayên xwe yên heyî, bi wergirî û wateyên xwe ve, di şûna navendên sereke yên wisa de ne ku civakê (weke rûxana ekolojîk û qiracivakê) bi rastî jî dimezêxînin. Belgeyên herî saxlem in ku têkçûna şaristaniya klasîk îspat dikin. Roma tek bû û tevahiya çaxa destpêkê bû. Rûxîna wê jî tek bû û tevahiya çaxa destpêkê bû. Lê, bajarên roja me ya îro, weke navendên daqurtandina civakî (çolter û gund jî tê de), pirrane û hema hema her tiştên civaka kanserolojîk in. Divê qet jê gûman neyê kirin ku heya mirov, weke civak, rizgar nebe ji van bajaran, ku ketine vê rewşê, wê bajar wê/wî ji bo bûyîna xwezaya civakî derxînin!

Yekîtiya ahengdar a gund û bajaran di sîstema şaristaniya demokratîk de, weke bîrdozî û pêkhateyî, xwedî girîngiya bingehîn e. Xwezaya civakî dikare, ancax li ser bingeha vê ahengiyê, heyîna xwe di bin ewlehiyê de bidomîne.

**f- Hêmanên Heşmendî û Aborî:** Hîma aborî ya şaristaniya demokratîk, di nava nakokiya berdewamî de ye li hemberî yekdestiyên sermaye yên avabûyî li ser nirxa-bermayî ya civakî. [şaristaniya demokratîk] Vekirî ye ji her cûre xebatên bi serbestî yên pêşketina çandinî, bazirganî û sanayî re, bi mercê ku pêdiviyên civakî û hêmanên ekolojîk ên bingehîn bêne girtin ber çavan. Qezenca li derveyî kara yekdestiyê, weke rewa dihesibîne. Ne li dijî bazarê ye; berevajî, ji ber

dorhêla azad ku pêşkêş dike, aboriyeke rasteqîn a bazara serbest e. Rola pêşbirkbaz a afirîner a bazarê înkar nake. Yên ku li hemberî wan disekinin, rêbazên qezenca spekulatîv in. Di pirsgirêka mulkiyetêde pîvan berdarî ye. Rola yekdestî weke mulkî, herdem binakok e li hemberî berdariyê. Ne mulkiyetparêziya pirole ya takekesî û ne jî mulkiyetparîziya dewletê di wergiriya şaristaniya demokratîk de ne. Aborî di xwezaya civakî de herdem bi awayê komcivakan hatiye meşandin. Ti têkiliya yek takekes yan jî dewletê bi aboriyê re, ji bilî yekdestîperestiyê, tine ye. Aboriyên ku takekes û dewlet li ser wan xwedî gotin bin, bi rengekî neçarî yan wê derbasî karê bibin, yan jî wê îflas bikin. Aborî herdem karê koman e. Qadeke demokratîk a rasteqîn a civaka exlaqî û polîtîk e. Aborî demokrasî ye. Demokrasî herî zêde ji bo aboriyê derbasdar e. Di vê wateyê de aborî nikare were şîrovekirin ne weke binesazî û ne jî weke seresazî. Bêhtir rasteqîn e ku weke çalakiya herî bingehîn a demokratîk a civakê were şîrovekirin.

Pirr fikaredar in wan analîzên li ser têkiliya aborî, ku ji alî polîtîk-ekonomiya kapîtalîst û şîroveya Marksîst ve hatine razberkirin. Aborî ti carî nikare bibe çalakiya patron-karker. Ez bi xwe dumendiya patron-karker dinirxînim bi awayê dizên aborî, weke çalakiya herî bingehîn a demokratîk a xwezaya civakî (eger em serdemên klan û qebîleyan jî tevlî vê bikin, wê guncav be ku mirov jê re bêje xebata bingehîn a civaka exlaqî û polîtîk). Mebesta min ji karker, karkerê tawîzkar e, ku beşeke biçûçik a nirxa tê dizîn ji hejarên din ên civakê, bi taybetî ji keç û jinên malê yên bêmize (bêucret), di bin navê ‘mize’de jê re tê dayîn. Çawa ku kole û serf bi giranî di şûna nîçikên efendî û begên xwe de ne, karkerê tawîzkar jî herdem nîçikê patronê xwe ye. Mercê sereke yê bûyîna civaka exlaqî û polîtîk e ku bigûman were nêrîn li kolebûn, serfbûn û karkerbûnê, li hember were derketin, her wisa çalakî û bîrdoziya wê li ser vê bingehê were pêşxistin. Çawa ku sêmendiya efendî-beg-patron ne şayanî pesnê ne, sêmendiya kole-serf-karker jî, di wateya nîçikên vana de, ti caran nikarin, weke beşên baş ên civakî bêne pîrozkirin. Helwesta herî rast ew e ku, weke beşên ketî yên civakî, mirov dilê xwe bi rewşa wan bişewitîne û lê bixebite (hewl bide) ji bo di zûtirîn demê de bêne azadkirin.

Aborî, weke cewhera bingehîn, çalakiyeke civaka dîrokî ye. Ti takekes (weke efendî, beg, patron, kole, serf û karker) û dewlet nikarin bibin niyar/aktorên çalakiya aborî. Ji bo mînak, ti takekesek, patron, beg, efendî, karker, gundî û bajarî nikare bisencîne bergîdana karê dayîktiyê, ku saziyeke herî dîrokî û civakî ye. Ji ber ku dayîktî, çalakiya herî zor û pêwîst a civakê, anku domandina jiyanê, destnîşan dike. Ez ne tenê qala zayandina zarokan dikim. Ez di hêla berfireh de dinêrim li dayîktî, weke çandekê, her wisa weke diyardeyeke ku, bi dilê xwe ve, bi berdewamî di nava serhildanê de ye û weke kesa ku xwedî  çalakiya dagirtî bi jîrî(zeka) ye. Ya rast jî ev e. Ey baş e ma bi kîjan aqil û wijdan digunce ku mirov kirariya (muameleya) kedkara bêmize (bêucret) bike li jinê, ku ewqas neçar (bêgav) e, çetîn (dijwar) e, livbaz e (biçalakî ye), dagirtî ye bi dil û aqil û di nava serhildana berdewamî de ye? Gelo, zanisteke civakî, ku van xwedayên çalakiya civakî û yên dirûvî vana, ku tew Marksîzm jî wan weke bîrdoziya herî kedkar neanî bîra xwe, li derveyî mizeyê dihêle û xulam (peya) ê patron li koşeyê serekîn dide rûniştandin, çawa dikare çareseriya xwe, weke ‘civakî’(sosyal), pêşkêş bike? Aboriya Marksîst, bi awayekî fena (xirab), aboriyeke burjuva ye. Pêdiviya wê bi rexnedaneke mezin heye. Gerîn li sosyalîzmê di qada berjewendiya burjuwazî de, bêyî dayîna rexnedana bi wêrekî, xizmeta herî hêja ya tevgera sed û pêncî salî (sosyalîzma pêkhatî) û hilweşîn (hem jî ji ber xwe ve) a wê de hate dîtin. Lenîn çiqasî jî rast diyar dikir, dema digot: “Rêya dojehê, bi kevirên niyet-baş raxistî ye!” Gelo, ew dikaribû hizirîba ku wê vê hevokê di

çalakiya wî bi xwe de jî bihata piştrastkirin? Ez hêvî dikim van tehlîlên di beşa pêwendîdar de jî pêş bixim.

Dibe ku mirov mijara aboriyê weke çalakiya sereke ya exlaqî û polîtîk a civaka dîrokî bihizire û, eger pêwîstî hebe, wê bike razberkirin û zanistekê. Lê eger polîtîk-ekonomiya bi navenda Ewrûpa weke zanist bê hizirîn, tê wateya ku reng e aqil, piştî mîtolojiya Sumer bibe dîlê mîtolojiyeke duyemîn. Şoreşeke radîkal a zanistî, wê ji bo vê qadê jî rola jiyanî bilîze.

Divê em bi pêdagerî (israr) diyar bikin ku ti çalakiyek civakî nikare bi qasî aboriyê bibe exlaqî û polîtîk. Bi vê wesfa xwe ve, nikare xwe rizgar bike ji girtina wate, weke mijara herî pêşdatir a siyaseta demokratîk. Sîstema şaristaniya demokratîk, li ser aboriya civaka-dîrokî, ku hezar qat zêdetir pêwîst e ji bo tendurustiya civakê, soza ji bo şîroveya wê ya rast û şoreşeke rasteqîn, dide.

Hêmana heşmendî, ne wisa seresaziyeke dûrî aboriyê ye, bi qasî ku tê rawêj (texmîn) kirin. Ji xwe cûdayiyên dirûv ên binÎ û serî, pêvajoya ku mirov xwezaya civakî têbigihîje, zêdetir tevlîhev dikin. Xwezaya civakî bi xwe heyînek e ku têde zekaya xwezayê ya herî kûr e. Hizirîna li hêmanên cûda yên heşmendî, dibe ku bêkêr (berredayî) bê dîtin. Lê ji ber ku zanist ji civaka-dîrokî hatiye qutkirin û hatiye xistin bin xizmeta şaristaniya fermî, her wisa hatiye daxistin asta rola çavkaniya herî berdar a hêzê ji bo desthilatiyê; vê yekê girîng dike ku heşmendî û pêkhateya jiyana şaristaniya demokratîk, di ber çavan re bê derbaskirin. Bi dirêjiya dîrokê, hatiye domandin çalakiya berdewamî ya helwesteke dijber û avakirina alternatîvekê li hemberî heşmendî û pêkhateya şaristaniya fermî, weke serweriya bîrdozî û zanista wê. Têkoşînên bîrdozî û tevgerên zanista alternatîv herdem her hebûne. Şaristaniyên klasîk bûne ew sîstem ku pêşketina analîtîk a zekayê, herî zêde îstîsmar kirine. Ji bo dapêçîn (sergirtin)a rastiya xwe ya kedxwar (îstîsmarkar) pirr sûd wergirtine ji her cûre sazgerîn(mekanîzma)ên hêma û sembolên xapînok, tirsnak û ku mirov dikin xeyalperest. Rastiyên xwe yên daringî, di qadên mîtolojî, olî, felsefî û zanistperestî de, weke rastiyên gelemperî yên civakî pêşkêş kirine û xwestine tim belave bikin ku gerrîna li rastiyên dîtir, hewldaneke berredayî ye.

Vê îdeala 'tekperest', wê şopê di xwe de werdigire ku sermaye û yekdestî xwe weke 'yekane rêya rast', ferz dikin. Rengên Xwezayên Yekemîn û Duyemîn bi rengê gewr boyax kirine û bi vî awayî lê xebitîne îspat bikin ku tekane reng gewr e. Mêjereke hindik ku ji nirxa zêdemayî kom dikin, weke sermayeya rewşenbîrî (entelektuel) bikar anîne û bi vî rengî serweriya xwe ya bîrdozî qet kêm nekirine. Sîstemên dibistan û perwerde hatine kirin şûnên ku têde şêwazên wan ên jiyanê bi mirovan didin jiberkirin. Zanîngehê, ne weke warê xunaftin (hezmkirin)a rastiyê û nasnameya civakî, lê weke warê jêderkirin û înkarê, bikar anîne. Naverok û pêkhateya zanistê bibayex (îtîna) hatine rêkûpêkkirin ji bo ku rastiya civaka-dîrokî ya xwezaya civakî, di bin navê objektîvîzmê de bikin obje û ew ji rola subje derxînin. Sazgerînên di xeteke sext a şaristanîperest de, weke rêsa û şêwe(form)yên îdeal ên gerdûnî hatine pêşkêşkirin.

Ahengiya şaristaniya demokratîk bi xwezaya civakî re, xwe di pêşketina mejî (zihîn) de jî dide teyîsandin. Mejiyên herî zarokwarî yê klanan jî tew di wê zanebûnê de bûn ku girêdana wan a zindî bi xwezayê re heye. Hêmaya 'xwezaya mirî', xiyanet û pêvekirineke heşmendiya şaristanî ye ku herku çûye ji xwezayê qut bûye. Dema em bidin ber çavan ku ew zindîtî û xwedatî ya ku çaxa finans a kûrewî (global) a roja me ya îro di 'pere'de dibîne, di ti çêbûneke din a xwezayê de nabîne, ya di mijara zindîtî û pîrozî ya di xwezayê de li pêş e, ne yekdestîperestiya roja me ya îro ye, lê rastiya klan e. Pêkhateyên qebîle, eşîret, qewm û yên demokratîk ên netewî, bûne warên hebûna

heşmendiyeke zindî. Zeka û pêkhate, bi jiyanê re di nava pêwendiyê de ye. Zekaya analîtîk û hest, dikare ancax di sîstema şaristaniya demokratîk de bigihîje yekîtiya xwe ya diyalektîkî.

Heşmendiya şaristaniya demokratîk, ku bigûman dinêre li pergalên fermî yên dibistan, akademî û zanîngehan, bi dirêjiya dîrokê di warê pêşxistina alternatîvan de xwe nedaye paş. Meqam, dergah, ocax, terîqat, medrese, mezheb, manastir, tekya (tekke), mizgeft, dêr û perestgeh ên bêhejmar, ji sîstemên pêxemberiyê heya dibistanên fîlozofan û ji tesawûfê heya zanistên xwezayî, hatine pêşxistin. Tê dîtin ku awayê, ne yek-bend lê yê dubend, ê şaristaniyê di her qada xwezayê de xwe dide xuyakirin. Pirsgirêk ew e ku bêyî xwe fetisandina di nava pêkhateya fermî ya yek-bend de, mirov karibe di seriyê dû-bend ê xwezaparêz de çareserker be û cewaziya jiyana azad weke bijareyeke şaristaniya demokratîk pêş bixe.

**g- Hêmanên Siyaseta Demokratîk û Parastina Cewherîn:** Hêmanên şaristaniya demokratîk ên siyaset û ewlekarî di heyîna civaka exlaqî û polîtîk de rola bingehîn dilîzin. Dibe ku zêde were, kategoriyek din a siyaseta demokratîk di feraseta civakê de, ku ew bi xwe, ji xwe polîtîk e. Lê, di navbera herduyan de cewazî heye. Di civaka polîtîk de, dibe ku siyaseta demokratîk herdem neyê sepandin. Bi ser de, ya ku şaristaniya fermî bi dirêjiya dîrokê li civaka polîtîk ferz kiriye, bi pirraniya raser serweriya zordarî (despotîk) ya qraltî ye. Civaka polîtîk a di bin serweriyê de bi tevahî tune nabe, lê nikare xwe bike demokratîk. Çawa ku ji bo bihîstinê, ne bes e ku mirov herdem xwedî guh be, wekî din pêwîst dike ku mirov bijûndar (bisihet) be; bi şêweya dirûv, heyîna tevna polîtîk, nayê wateya ku herdem bi rengekî azad bixebite. Xebitîna bijûndar a tevnê, ancax girêdayî hebûna dorhêla demokratîk e.

Bi gelemperî mirov dikare bêje siyaseta demokratîk ji heyîna dorhêla demokratîk û pêkhateya siyasetê ya civaka polîtîk re. Siyaseta demokratîk, ne tenê şêwazek e, lê yekparetiya saziyê derdibirre. Eger gelek sazîbûn ên mîna partî, kom, meclîs, medya, mîtîng û wekî vana nebin, pratîka siyaseta demokratîk pêş nakeve. Rola rastîn a saziyan gotubêj û girtina biryaran e. Eger di hemû karên hevbeş ên civakê de gotubêj û girtina biryaran nebin, jiyan nameşe; di encam de kaos yan jî dîktadorî çêdibin. Çarenûs (qeder)a civaka ne-demokratîk, tim wisa ye. Di navbera serîkên kaos û dîktadoriyê de hema her têne hejandin. Nikare were hizirîn ku di dorhêlên bi vî rengî de civaka exlaqî û polîtîk pêş bikeve. Wê demê, armanca pêşdatir a têkoşîna polîtîk, anku siyaseta demokratîk, ew e ku civaka demokratîk ava bibe û di vê çarçoveyê de karên hevbeş bi gotûbêj û biryaran bêne xistin rêya çareseriya herî baş.

Armanca siyaseta ku ji erka xwe ya rasteqîn hatibe dûrxistin û di dorhêl û saziyên ku jê re tê gotin ‘demokrasiya burjuwa’de be ew e ku berî her tiştî bibe desthilat. Desthilatî jî ji yekdestiyê girtina parê ye. Eşkere ye ku nabe ku armancên wisa yên siyaseta demokratîk hebin. Em bêjin ku di saziyên desthilatî (ji bo nimûne, hukumet) de cî hat girtin, tew wê demê jî karê bingehîn heman e. Ev kar, ne ew e ku ji yekdestiyê par were rahêştin, lê ew e ku mirov karibe ji bo berjewendiyên jiyanî yên hevbeş ên civakê, biryaran bigire û sepanan bişopîne. Ne nêzîkatiyeke watedar e ku mirov bêje di demokrasiyên burjuva de, weke rêsa, cî nayê girtin. Lê belê, pêwîst e mirov zanibe ku bi mercdarî di nava wan de cî bigire. Bêrêgezî herdem bi kêrî siyasetmedariya sexte ya çîna serwer, tê.

Ti caran nikare bê paşçavkirin ku ji bo siyaseta demokratîk, bi rengekî têr baş, kadro, medya, rêxistingeriyên partiyan, rêxistinên civaka sivîl, xebatên berdewamî yên perwerdeya civakê û propaganda, pêwîst dikin. Weke taybetmendiyên pêwîst ên siyaseta demokratîk, di warê girtina encam û serkeftinê de, mirov dikare vana rêz bike: nêzîkatiya rêzgir (hurmetkar) ji hemû cewaziyên civakê re; pêdiviya wekhevî û lihevhatinê li ser bingeha cewaziyan; şêwaz (uslûb)a gotûbêjê û bi qasî wê, naveroka wê; wêrekiya siyasi; pêşikiya exlaqî; zalî (hakimiyet) li ser mijaran; zanyarî li ser dîrok û rojaneyîtî û nêzîkatiya yekparetî û zanistî.

Parastina cewherîn polîtîkaya ewlekarî ya civaka exlaqî û polîtîk e. Hîn rasttir, wesfa exlaqî û polîtîk a civaka ku nikaribe xwe biparêze, wateya xwe wenda dike. [Di rewşa wisa de] civak, an dibe mêtingeh û dihele û dirize; yan jî di berxwedanê de ye û dixwaze wesfa xwe ya exlaqî û polîtîk ji nû ve bidest bixe û wê bigihîne sazbariyê. Parastina cewherîn, navê vê pêvajoyê ye. Civaka ku pêdagerî bike ku bibe ya xwe, her wisa mêtingehbûn û her cûre rajêriyên yek-alî yên pêwîstker (ferzker) red bike, dikare vê helwesta xwe ancax bi derfet û sazî yên parastina cewherîn pêş bixe. Parastina cewherîn, ne tenê li hemberî xeteriyên ku ji derve bên, çêdibe. Her wisa her dem gengaz e ku di pêkhateyên navxweyî yên civakê de jî nakokî û rageşî hebin. Pêwîst e neyê jibîrkirin ku civakên-dîrokî ji mêj ve ye biçin û bidesthilat in û wê hêz hebin ku bixwazin hîn demeke dirêj van taybetmendiyên xwe biparêzin (muhefeze bikin). Van hêzan, ji bo parastina hebûnên xwe, wê bi hemû hêza xwe li ber xwe bidin. Lewre parastina cewherîn, weke daxwaziyeke belave ya civakî, wê demeke dirêj, di rojeva civakê de ciyekî girîng bigire. Hêza biryarê, eger bi hêza parastina cewherîn ve xurt nebe, nikare bi hêsanî were xistin meriyetê.

Bi ser de, di roja me ya îro de, em bi rastiyeke desthilatî re rûbirû ne, ku ne tenê ji derveyî civakê, lê ji hundirê wê ve jî xwe çirpandiye heya tevahiya çavikên wê. Jiyanî (heyatî) ye ku civak di tevahiya çavikên xwe yên guncav de komên dirûv ên parastina cewherîn ava bike. Civakên bêparastina cewherîn, ew civak in ku ji alî yekdestiyên sermaye û desthilatî ve hatine radest (teslîm) girtin û mêtingehkirin. Her yekeya civakê, ji klan û qebîleyan heya eşîretan, ji qewm û netewan heya civatên olî û ji gundan heya bajaran, herdem pirsgirêkekê wê ya parastina cewherîn, bi dirêjiya dîrokê, hebûye. Yekdestiya sermaye û desthilatî di êrîşkariya gurê li pey nêçîrê de ye; yên bêpar (mehrûm) ji parastina cewherîn, weke keriyên pez, tarumar kiriye û bi qasî ku xwestiye, desteser kiriye.

Merc (şert) e ku, di bûyîna civaka demokratîk û domandina hebûna xwe de, pêkhate û çalakbaziya parastina cewherîn, herî kêm di pîvana sînordarkirina êrîşên yekdestiyên sermaye û desthilatî de, bêne çêkirin û di rewşa amade û sazbar (xebatbar) de bêne hêştin. Li gorî ku wê demeke dirêj bi emrazên sermaye û desthilatî re di nava hev de bê jiyîn, girîng e ku mirov nekeve nava du şaşîtiyan: şaşîtiya yekemîn ew e mirov ewlekariya xwe ya cewherîn radestî (teslîmî) pergala yekdestîperest bike, mîna ku mirov kezebê raspêre (emanet bike) pisîkekê). Encamên rûxîner ên vê yekê, bi hezaran nimûneyan derketine holê. Şaşîtiya duyemîn ew e ku mirov hewl bide bibe emraza desthilatî, bi parolaya bûyîna yekser weke dewlet li hemberî dewletê. Ceribandinên sosyalîzma pêkhatî, di vê mijarê de, bi têra xwe ronakker in. Lewre parastineke cewherîn a watedar û sazbar, wê bidomîne bûyîna xwe ya hêmaneke şaristaniya demokratîk, ku dê nikaribe wê di dîrokê, roja me ya îro û pêşerojê de ji paşçav bike.

Bê gûman mirov dikare hêmanên şaristaniya demokratîk zêdetir pirr bike û rave bike. Lê ez di wê baweriyê de me ku, ji bo mijar karibe bê têgihîştin û girîngiya wê bê têgihîn, ev pêşkêşî bes e.

## 8- MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK LI HEMBERÎ MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST

Rêbazên lêgerîna li rastiyê yên zanistên civakî yên bi navenda Ewrûpa, li gorî pêdiviya cewhera xwe, serwerperet (hegemonîst) in. Rêyên alternatîv ên rastiyê, bi du rêbazên bingehîn ve, hema hema ne-gengaz (bêîmkan) dikin. A yekemîn nêzîkatiya gerdûnewer a monist (xweperest)e. Rastî (heqîqet) herdem tê daxistin 'yek'ê. Ya duyemîn, modêla dîmanewer a bêsînor e. Dema dibêje ku rastiyeke herkesî, li gorî xwe, heye; di cewher de hewl dide derbibirre ku rastî tine ye. Ev tiştekî wisa ye mîna ku mirov bêje her tişt guheriye, ji bo mirov îdea bike ku ti tişt neguheriye. Eşkere ye ku herdu rêbaz jî di daxistkariyê de dibin yek. Hem 'tekperestî'ya gerdûnewer û hem jî 'tekanîtî'ya dîmanewer, bi daxistina rastiyê bo 'tek'ê, karakterên xwe yên serwer bi eşkereyî diteyisînin.

Bê gûman li pey van rêbazan yekdestîperestiya şaristaniyê heye. Bingehên wan dirêj dibin heya heyamên ku keşîşên Sumerî 'En', weke xwedayê herî mezin, ava kirin. Sedema ku 'En' hate homandin (pîrozkirin), ji ber pêdiviya rewakirina xerarşî û bajêr-çîn-dewlet ku hiltên, û serwerî û hegemonkirin (ez dihizirim ku ji heman jêderkê ne 'egemen'û 'hegemon') a wan li ser heşmendiya civakî ye. Yekemîn sedem a di felsefeya Yunanî de, weke nûvedanî (îcad) ya herî mezin (feraseta Eflatûn û Arîsto ya xweda), tim ji heman çavkaniyê tê. Awayê ku 'En' di olên yek-xwedayî de xwe lê kirmişandiye (xwe lê pêçandiye), 'Allah' e, ku xwedayê aleman e. 'El', ji jêderka 'Ellahî' tê. Di hilhatina Roma de, weke 'Jupiter' derdikeve pêşberî me. Mijarek e ku pirrî caran çavdêriya wê tê kirin ku hewl tê dayîn vana werin rewakirin, bi ev cûre têgînên rewakirinê yên olî yan jî mîtolojîk, li ser her civaka ku rejîmên qraltiya-xweda û yên împaratorî têne avakirin. Hema hema di her rejîma qraltî, împaratorî û zordestî (despotî) de bi rengekî dirûv homandineke têgînan û hewldaneke ji bo serweriya bîrdozî dixuyin. Çimkî /ji ber ku, eger serweriyeke mejiyî ya bi vî rengî nebe, zor e ku van rejîman bibin mayînde.

Yekdestîperestiya kapîtalîst a Ewrûpa, dema di sedsala 16. de (weke navend û şêweyeke nû ya serwerî ya şaristaniyê) hilhat, bi eşkereyî pêdizanî ku, eger hewldaneke dirûv nebûya, wê nekarîbûya bi serketiba. Pere û sermaye (şêweyeke sermaye ya cewaz ji sermayeya weke emraza çandinî, bazirganî û desthilatî bi xwe), ku di dîrokê de yekem car heya wê demê xwe di qelaştin û dalan(dehliz)ên civakê de veşartibû, weke hêza serwer li ser civakê û pê re di tevahiya çavikên wê de, di rewşa hilhatinê de ye.

Lêgerînên nû yên rêbazê, yên Francîs û Roger Bacon û Renê Descartes, ku ji teolojiya bi koka Xirîstyanî (lewre ji ya bikoka Sumer a Rojhilata Navîn) tên, bi vê pêngava daringî ya serwer ve ji nêz ve têkildar in, 'Rastî', ku weke hem rêbazî û hem jî naverokî, li pey wê ne, bi vê cûreya nû ya sermaye re, di dema hilhatina serweriyê de, hevpar e. Yekdestiya kapîtalîst herku xwe saxlem dike, serweriya wê ya bîrdozî jî bi vê ve di nava hev de xwe saxlem dike, her wisa xwe dike mayînde. Rêbaza nû, anku şoreşên felsefe û zanist dikare ancax bi bandora veguherîner a vê merca daringî ve raveya xwe ya zanistî bibîne. Bê gûman, eger mirov her tişt bi kapîtalîzmê ve girê bide, wê rê li ber koriyê veke. Nêzîkatiyeke wisa wê bê wateya ku mirov were dek û dolaban û têkeve nava daxistkariya herî çors. Lê, dema girîngiya girêdana di navbera wan de were paşçavkirin, wê lêgerînên li rastiyê seqet bimînin û di nava vegotinên metafizîk de girîngiyên xwe hunda bikin.

Dema têgîna ‘modernîte’ were ravekirin, ta radeya dawî pêwîst û fêrkar e ku van çêbûnên rêbaz û rastî, bêne girtin ber çavan. Modernîte, ku weke têgîn tên wateya ‘çax’, cûrbecûr in; li gorî serdeman cewazîtî werdigirin. Gelek nimûneyên modernîteyan hene, ji modernîteya Sumer heya modernîteya Roma, heta yên beriya wan û piştî wan jî hene. Ma kî dikare înkar bike ku, ji deman demekê, modernîteya Roma, li tevahiya navenda şaristaniyê, bi şanazî/xurûr dihat jiyîn. Ma em ji qeydên arkeolojîk di nava hûşû (bi dilpakî ji xwe ve çûyîn) de temaşe nakin û fêr nabin ku modernîteya Sumeriyan heta modernîteya Mezopotamyaya Jorîn ku beriya pêşîn ên wan e, di hêla zeman û wergirî de belkî jî nimûneyên herî pêşanîdar pêşkêş dikin? Gelo gengaz dibe ku vê modernîteyê were ravekirin, eger wate neyê arastekirin li çanda wê ya daringî ya di wesfa şoreşane de?

Anthony Gîddens, dema cewaziya modernîteya kapîtalîst ji tevahiya modernîteyên din datîne holê, di hêla ravekirina rastiyê de biqismî tevkarî dike. Eşkere ye ku vê rewşa Anthony Gîddens, weke kurê serwerîperestiya Îngilîs, dikare were têgihîştin. Weke deynekî û ayîn(îbadet)ekê her rewşenbîrê hemdem e ji waletê xwe û dewlet-netew (xwedatiya nû) a  xwe re, ku îdea bike ku yekta (yegane) ne. Fêrkar e ku [A. Gîdens] modernîteya kapîtalîst li ser linga sêmendî (sêalî) dide rûniştandin. Gerçi (heçî) modernîteyê, weke kategoriyeke jorîn, ji kapîtalîzmê vediqetîne. Dema vê dike, helwesta ku dikeve navê, eşkere ye ku heşmendiya ‘tekanîperest’ e, ku li ser rêbaza zanista civakî zal e. Naxwaze şans bide cûre modernîteyeke dîtir. Eger modernîtê hebe, wê ‘tek’ be; di heman serdemê de du modernîte nabin! Vaye ev mijar, heşmendiya hevbeş e, ku li ser tevahiya bizav(ekol)ên zanistên civakî, bi rastên wan, çepên wan û orteyên wan ve, zal e. Tevahiya rewşenbîrên çep, di serî de jî K. Marks, ji tekîtiya modernîteyê, anku ji cûreya wê ya Ewrûpa, gûman nedikirin. Beşên rewşenbîrên navîn û rast, anku rewşenbîrên lîberal, bawer bûn ku gotina dawî ya rastiyê ne (çiqasî jî didirûve –dişibe- gotina ‘Pêxêmberê dawî’ya di Îslama Çaxa Navîn de!). Lê di heyama postmodernîte de gotinên cewaz nû destpê kirine xwe nîşan didin.

Bê gûman, rexneya Nietzche ya li ser modernîteyê girîng e. Lê, rexneyên oldarî yên li ser modernîteyê, ancax di hêla modernîteyên xwe (çaxa kevn a mayî li pey çaxa nû) de wateya wan hene. Îdeaya Michel Foucault a dibêje ku modernîte bi mirina mirovan bi dawî bûye, li gel ku girîng e, ne bes e. Û sosyalîzma pêkhatî, bilî/tevî îdeayên xwe yên cewaz, ti caran weke pirsgirêka ne teorik û ne jî pratîk, ji xwe re nekir derd ku bibe modernîteyeke cewaz. Dema derdorên fermî yên sosyalîzma pêkhatî pirrî caran îdea dikirin ku şaristaniyêke nû ne, mebesta wan pêrabûn (pêşveçûn) û hemberiya li her qadê bi kapîtalîzmê re bû. Hiziriyabûn ku ji kapîtalîzmê zêdetir nêzî qalib û spartekên bingehîn ên modernîteya kapîtalîst in (kapîtalîzma dewletê li şûna kapîtalîsta taybet, sanayîgerî/endustriyalîzm, dewlet-netew) û weke erkê sereke destnîşan kiribûn ku bi rêya wana bikevin pêş. Ceribandinên sosyalîzma pêkhatî, di serî de jî ceribandinên Rûsya û Çîn, bi rastî jî dereng neman ku îspat bikin ku xwîna teze ya modernîteya kapîtalîst in. Armanca yekta ya tevahiya tevgerên rizgariya netewî ew bû ku di zûtirîn demê de modernîteya zal ku weke lûtkeya serkeftinê dixuye, biqefêlin/bigirin û bi vî rengî jiyana bextiyar/dilşad pêk bînin. Pevbestîn û pratîk wisa ye. Pirr hindik gûman ji vê tê kirin.

Lê di rastî de, dema wergirî û awayê wê, weke modernîteya zal a van çarsed salên dawî yê çaxên şaristaniya pênc hezar salî ye, her wisa wê zor nebe ku bê dîtin û tehlîlkirin ku weke goşt û neynûk rajêrên (girêdayî) hevdu ne û ji xelekên guherde (ciyê, cûda) yên zincîre pêk tên.

Tişta ku ez, hem bi vê berg(cîld)ê, hem jî bi wan herdu bergên berî vê, hewl didin bikim ew e ku ez vê feraseta li ser modernîteya bi 'tek' hilweşînim. Mebesta min ji hilweşînê ew e ku min hewl da îspat bikim ku alternatîva wê herdem pê re ye; her wisa tevî hewldanên çewsandin û dapaçînê xwe dide xuyakirin û, weke seriyê hember ê dubendiya diyalektik, hebûna xwe bi hemû wergirî û awayên xwe ve didomîne. Şaristaniya demokratîk (şaristanî beranberiya peyva 'çax'a bi Tirkî ye û tê wateya 'modernîte') dibe ku weke nav ne bes be û gelek rexne jê re pêwîst bikin. Lê dema min wesfa civakê ya 'civaka-dîrokî'(nêzîkatiya Fernand Braudel a di derbarê mijarê de cesaret dida mirov) digirt ber çavan, ne dilê min û ne jî mejiyê min qet nedikarîn qayîl (razî) bibûna ku min wan tevgerên ji civaka klan heya komcivakên eşîret, qebîle, qewm, gund, civatên olî û wekî vana, ku hema hema dîrokê vediguhêzînin binav kiriba, di nava heman nêzîkatiyên şaristanîperest (bajêr-dewlet-çîn) de, weke 'barbar' yan jî 'paşvemaniya olî'yên basît. Piştî ku min têr baş têderanî (ferq kir) ku diyalektîk tim weke cemser(qutb)ên tineker naxebite, zor nebû ku ez tespît bikim ku şaristanî di pêşketina diyalektîkî ya civaka-dîrokê de, ku ne tineker e (dibe ku carcaran bibe lê bi daîmî nabe), ne pêvajoyeke 'tekperest' e, lê pêvajoyeke dubendî ye. Jê pê ve, hewl tê dayîn ku di van bergan de, tevî di mercên dijwar û pirr bêrapêçanî de jî be, were anîn ziman û weke ceribandinekê were pêşkêşkirin. Mijara ez pirr lê diheyirim û jê hêrs dibim ew e ku bê çima zanyarên civakî yên binavenda Ewrûpa, tevî ewqas rapêçanên xwe yên bixof, hewl nadin ku vê dubendiya şaristaniyê weke du modernîteyên cewaz bikin sîstem.

Careke din em vegerin ser sê hêmanên bingehîn ên têgîna 'modernîte'ya Anthony Gîddens û em hewl bidin tehlîl bikin ka çi wate derdibirrrin, her wisa em bersivên hember ên têgîna modernîteya demokratîk, ku li cemsera wê ya dijber e, analiz bikin.

### A- Veqetîna Kapîtalîzm û Modernîte

Li gorî Anthony Gîddens, kapîtalîzm di dîrokê de yekem car li Ewrûpa derketiye holê û di ti dema û ciyê dîrokê de rastî dirûvê wê nehatiye bûyîn (bê gûman pirraniya raser a zanyarên civakî yên binavenda Ewrûpa nêrînên dirûv parve dikin). Kapîtalîzma qala wê tê kirin, kapîtalîzma Amsterdam-Holanda û London-Îngilistan e ku di sedsala 16. de weke navenda hêza serwerî hilhat. Para wê ya rastiyê ew e ku Amsterdam û London, bi rastî jî ji vê sedsalê û pê ve serweriya navenda şaristaniya klasîk a cîhanê dewr girtine. Dîroka cîhanê belkî jî tenê di derbarê vê demê de xwedî wêje (lîteratur) ya herî berfireh e derbarê ka şemitîna serwerî çawa pêk hatiye. Ne derfeta dubarekirinê û ne jî pêwîstî bi vê heye; ez bi bibîranînê qîma xwe tînim. Di bergên din de jî biqismî hatibû vegotin. Aliyên kêm û şaş ên van pênasekirinan, bêhtir girîng in.

**a-** Îdeaya derbarê tekanetiya kapîtalîzmê de ne rast e. Min bi rengekî berfireh diyar kiribû ku yekemîn sermaye (kapîtal), di perestgeha keşîş a Sumer (Zîgûrat belkî jî yekemîn banka û karxane ye) de hatiye pêkanîn. Girêdayî bi vê, em pirr bi hêsanî dikarin diyar bikin ku sêmendiya bajêr-çîn-dewlet, şêwegirtina xwe ya weke yekemîn yekdestiya serwerî, deyndarê Sumeriyan in. Bi taybetî, piştî ku ez nêrînên Andre Gunder Frank û yên koma hevalên nêzî wî, yên li ser şaristaniya navendî û sîstema cîhanê; fêr bûm, rewşa min a îqnabûyînê ya di nêrînên min de zêdetir xurt bû. Wekî din, ez vê yekê bi pêdagerî diyar dikim: yekdestiya desthilatî jî, awayekî cewaz ê yekdestiya sermaye ye. Min wê girîngiyê kirpand ku yek ji çar tewirên serekîn ên danehevê ye. Yekemîn yekdestî di çandinî de, ku berdariya wê hildihat, hatiye damezrandin. Her wisa ji ber sedema ku herêm, neçar dikir ku bazirganî pêş biketa yekdestiya bazirganî jî derfeta pêşketinê bidest xistibû. Wekî din, yekemîn

yekdestiya sanayî jî li ser zenaetkariya bajêr-perestgeh pêşketibû. Û rêveberiya bajêr weke leşkerî û rêveberî erk girtibû, lê li di şûna yekdestiya herî xurt a desthilatî de bû, ku bi sêmendiya yekemîn re di nava hevkariya xurt de ye. Guherdebûyîna rêjeya hêzan, têkiliya serwerî neçar dikir. Dema ku pêşî, serweriya keşîşan bihêz e, wê vê rewşê birêzê biguhere. Bi kurtasî, hem yekdestî û hem karakterê serwerî, hîn di qonaxa damezranê de derbasdar in. Min hewl dabû ku pêşketina wan a dîrokî, di bergên berî vê de, bi awayê xelekên çors pêşkêş bikim. Wekî din, tespîteke pirr girîng jî, ya di derbarê yekdestiyên şaristanî de, ew e ku di navbera xwe de çiqas zêde jî şer bikin, ew taybetmendiya wan heye ku li hemberî derve (hêzên şaristaniya demokratîk), bi hev re û weke dîrokî jî, mîna xelekên zincîrekê tevbigerin. Ti şaristanî, bêyî mîrasa ya beriya xwe, nedikarî derbiketa holê. Ez qala sîstema  şaristaniya navendî dikim; nexwe ez qala Çînê û Înkayan nakim.

Her wisa min hewl dabû ku çîroka pêkhatina xeleka şaristaniya Ewrûpa, bi dirêjî vebêjim. Min bi girîngî, têkiliya wê ya bi şaristaniya Rojhilat re (heta bi neolîtîkê re) û rola ragir (hilgir) a Venedîkê ya di nirxa zêdetirî sê sed salan de, diyar kiribû. Hêmana herî girîng, ku karibe were îdeakirin derbarê tekanetiya şaristanî (di wateya 'modernîte'de ye) ya piştî sedsala 16. a li Ewrûpa, wesfa wê ya pere  û sermaye ye, ku zêdetir pêşketî ye. Bê gûman yekdestiya pere-sermaye bi ser ketiye ku yekemîn yekdestiya xwe ya serwer, ji vê sedsalê û pê ve li Ewrûpa ava bike. Di vê wateyê de gengaz e qala tekanetiya wê û bêhempatiya wê were kirin. Lê eşkere ye ku ne gengaz e ku were diyarkirin ku niştimanadayîk a pere û sermaye Ewrûpa ye û dîroka wê jî ev dem e. Yekemîn têkberên dirûvî pere, tew pirr beriya şaristaniyê bûn. Pisporên li ser çaxa yekemîn hemraman (hemfikir)in ku obsîdyen û daringên giranbûha (biqîmet) hîn jî di nava civakên komuna seretayî de rola dirûv dilîzin. Ên têkildar bi mijarê re (hema hema kes nîne) ku nizanibe ku yekemîn çapa pere, bi awayê pereyên zêrîn ên Kreuzus bûn li Qraltiya Lîdya, ku di sedsala 7. B.Z. de li rojhilatê Ege hat avakirin. Mirov dikare ji bo daneheva pere û sermaye jî heman mijaran diyar bike. Danehev kevneşopeke pirr kevn e. Têkber (eşya) û kan/madenên giranbûha di vê wateyê de bi dirêjiya dîrokê hatine berhevkirin. Qeydên arkeolojîk di vê mijarê de gelek nimûneyan pêşkêş dikin. Gotina "ewqas zengîn bi qasî Karûn", vê  rastiyê tîne ziman. Ti tişt nikare bikaranîna pere-sermaye ya bi armanca karê, bi qasî Karûnên Asûr (wateyên wê yên yekbûyî hene, weke pere, bazirganî, bazar û embar (depo)a berheman), bi rengekî resen û dilkêş (cazîb) rave bike. Gelek bajarên Rojhilatî hene ku, bi hezaran salan berî Venedîk, Amsterdam û Londonê, bûne cî û warên pere û sermaye.

Ya ku di pere û sermayeya Ewrûpa de tekane ye, ew e ku dest bi hilhatinê kiriye û yekem car serweriya xwe damezrandiye. Karl Marks, ev cûre serweriya sermayeyê û lêdana wê ya mora xwe li modernîteyê, weke roleke erênî û pêşverû dinirxîne. I. Wallastein, dema ku vê serweriye  didirûvîne (dişibîne) şêrê derketî ji qefesê, pêwîst dibîne ku rola wê ya erênî bi girîngî diyar bike. Heta, dema ku sedemên wê yên derketina holê, bi lewazbûyîna dêrê û qraltiyan ve, her wisa bi dagirî (vegirî)ya Moxol a li Rojhilat ve girê dide, weke ku (berê) li xwe mikur were ku bi pirsnîşanên mezin re rûbirû ye. Di encam de digihîje wê xalê ku vê yekê ji bo dîrokê bijareyeke qet ne baş e. Vê derê ne ew cî ye ku mirov yekûn (bîlanço)a bixof a serweriya çarsed salî ya pere-sermaye dubare bike. Bi tenê dema hejmara mirovên ku di şeran de mirinê û  birîndar bûne, her wisa hejmar û demajoya şeran; encamên rûxîner ên aloziyên aborî; rêjeyên bêkarî û hejarbûnê û ya herî girîng jî, felaketên ekolojîk li para vê [yekûnê] were nivîsandin, wê zor nebe ku mirov rawêj/texmîn bike bê ka em bi serweriyeke çawa re rûbirû ne.

**b-** Îdeaya ku kêm û şaş e, yekanetiya modernîteya spartî bi kapîtalîzmê ye. Ev îdeaya zanista civakî ya binavenda Ewrûpa, pirr berfireh û dorpêçker e. Ne kêmtir e ji çaxên din ên beriya xwe, ku weke sîstema-cîhanê hebûna xwe û dorpêçkeriya xwe, weke 'dawiya dîrokê' û 'gotina dawî'ya heqîqetê, dike ebedî. Heta bi îdeaya xwe ya zanistîtiyê, pirr zêdetir misoger e. Serweriya bîrdozî ya lîberal, tevlî yekdestiyên xwe yên medya ve, ji bo ku vê îdeayê bike rastiya hevbeş a tevahiya mirovahiyê, weke çaxa di nava çaxê (çaxa medya û înformatîk) de di şûngeheke awarte de hewldanan pêş dixe. Dema girîngî dide ku rastiyê, weke naverok û şêwe, di nava rehenda wê ya dîrokî de pêşkêş bike, xwe nade paş ku futurolojiyeke (zanista pêşerojê) qut ji paşerojê û roja îro, ava bike. Bi awayekî felaket 'nihaperest'e. Dîrûşma "ya/yê niha bijî, jê pê ve vala ye!", wek baweriyeke bingehîn tê bikaranîn. Neolîberalîzm, ku ew bi feraseteke eklektîk ji tevahiya qalibên raman û bîrdozî yên kevn û nû çêkiriye weke beyterê (xirabtirê) beyteran, hewaya dawî ya Roma tîne bîra mirov. Hersê 'S'–spor, seks û senaet (huner)- mezintirîn heyama xwe ya bîrdozîbûnê dijîn. Rehenda olî li hemûyên wan hatiye arastekirin. Pirr zor e ku mirov di roja me ya îro de olekê duyemîn a efyonker a ji şahiya fûtbolê ya di stadyûmekê de bibîne. Di sanayiya huner (senaet) de jî pêşketinên dirûv têne jiyîn. Navajoyeke herî bingehîn a xwezayî weke zayendîtî jî tew hatiye veguherandin bo sanayiya seksê. Bandora efyonker a seksê, herî kêm bi qasî yên spor û senaet (huner)ê, hatiye olîkirin. Dibe ku bêhtir guncav be ku mirov ji vê sêmendiyê re bêje şahiyên olî yên modernîteyê ye. Her çiqas xwe weke dij-nûjenî (anti-modern) jî pêşkêş dike [lê dîsa wisa ye].

Eger bi kûranî lê bê nêrîn, wê bê têgihîştin ku modernîteya bi mora kapîtalîzmê, cûreya herî bixwenebawer e. Dîtina wê ya pêwîstî bi ewqas eklektîzmê, vê rastiyê îspat dike. Postmodernîzm, her çend weke berhema vê bixwenebaweriyê derket holê, nekarî bibe alternatîva modernîteyê. Dixwest tenê pencereyek vekira ji wan derdorên rewşenbîr re, ku ji modernîteyê bêzar bûbûn. Di şûngeheke wisa de ye ku, weke şêwaza jiyanê, heya qirika xwe noqî modernîteya kapîtalîst bûye. Mirov dikare mînaka herî balkêş a vê yekê di Adorno yê filozof de bibîne. Adorno, dema digot "jiyana şaş bi awayê rast nayê jiyîn", modernîteyê bi rengekî pirr wecîz rave dikir. Li di warê pêşkêşkirina ya alternatîv de, sifir bû. Ji ber vê yekê bertek (reaksiyon)a mezin a ciwantiya şoreşger rakişandibû ser xwe. Neolîberalîzm di rastî de dixwest bibe cîlayekê nû ji modernîteyê re, ku cîlaya wê jêçûye. Lê belê, çiqas pêvekirin (veserkirin) û nûbûnan bike jî, wisa hêsan nabe ku nakokiyên çaxa yekdestiya finans a kûrewî (global) binuxêve û sîstemê rizgar bike.

Andre Gunder Frank, dema cî û girîngiya şaristaniya Ewrûpa di pêvajoya şaristaniya pênc hezar salî de destnîşan kiriye, pirr nêzîkî rastiyê bûye. Lê, weke ew bi xwe jî kêmasiya wê hîs dike, ji bilî çend giştîkirinan, nikare çareserî, yan jî alternatîvê pêşkêş bike. Hîn rasttir hêviya xwe diparêze. Di gel ku formula wî ya 'yekîtî di nava cewazî de' ya di nava şaristaniya klasîk de, rast e, lê giştîkirineke pirole ye. Ti rave (daxuyanî) pêşkêş nake derbarê ka wê çawa were xistin jiyanê. Û şaşîtiya wî, hêviya wî ya ku pê re ye derbarê wê yekê de ku dibe ku jiyanên modern ên baştir û cewaztir di nava sîstemê de (di teorî û pratîkê de) çêbibin. I. Wallerstein di vê mijarê de erênî û radîkal e; baweriya wî qet nayê bi çareseriya di nava sîstemê de. Bêacisbûn dubare dike ku aloziya tê jiyîn sîstemî û pêkhateyî ye; her wisa pêşniyar dike ku mirov bi çar destan hembêz bike wan erkên rewşenbîrî (entelektuel), exlaqî û polîtîk, ku wan bi rengekî pirr rast destnîşan dike. Kêmasiya wî ew e ku nikare çareseriyên wergir pêşkêş bike bo pirsa 'gelo kîjan sîstem?' Di vê mijarê de rexnedaneke jidil (samîmî) jî pêşkêş dike. Dibêje "Me hemûyan, di perestgeha pîroz a burjuwazî de, heman şerbetê vexwar!". Wekî din, ji ber vê sedemê, tirsa xwe ya ji xezeba xwedayan (di wateya xazeyî

/mecazî de) tîne ziman. Tiştên ku pêwîst e xeylî (gelek) wane (ders) ji wan bêne derxistin dibêje, ku tîne ziman ka sermayeya rewşenbîrî (entelektuel) çiqas girêdayî modernîteya kapîtalît e û qutbûna radîkal a ji wê çiqas zor û dijwar e.

Rewşa min, dikare bêhtir bi bêjeya "sûda (feydeya) revê, ji ecelê re nîne", wateya xwe bibîne. Ez ji 'modernîteya kapîtalîst' direviyam. Lê vê yekê têrê nedikir ku ez ji destê wê rizgar bibim. Lewre, di şûna ku ez di destê wê  de bimirim, min pirr zêdetir rasteqîn û biwêrekî dît ku ez alternatîva wê biceribînim. Bi vî awayî, ne min weke Nietzche qîma xwe pê anî ku ez rast bêjim; ne ez weke Mîchel Foucault razî bûm ku mirina xwe (weke mirovahî) ragihînim (îlan bikim); ne min mîna Adorno, weke qedeperest û xeydok, got "Divê mirov xwe radigire li hemberî ya ku tê serê mirov" û ne jî min weke Andre Gunder Frank bes dît ku ez xwe bipenihim (bispêrim) dîrûşma gerîna li "yekîtî di nava cewazî de". Heta ne jî min weke I. Wallerstein bawer kir ku sêmendiya erkên rewşenbîrî (entelektuel), exlaqî (etîk) û siyasî (polîtîk) jî bes be. Bê gûman ceribandina min tevkarî û werekiya girîng girtiye ji van mirovên raman û fezîletê. Lê, ya destnîşankar, ew e ku gotina "Jiyana şaş bi awayekî rast nayê jiyîn", ji bo min nikare were kirin mijara gotinê. Ji ber ku ti jiyana min li gorî vê gotinê tine bûye. Ez pirr beziyam, lê ne hêza min û ne jî baweriya min têre nekirin ku ez xwe bigihînim jiyana nûjen (modern) a kapîtalîzmê. Lê, ya hîn sojer (sotîner)tir gotina wî mirovî ku di min de serî hilda, ku digot "me nefroşe, tu li her çi bigerî, di xwe de bibîne/bidoze. Ez serhildanên xwe dinivîsînim.

Dibe ku were gotin û pirskirin: Gelo tu dikarî çi bikî bi hêzên modernîteyê û sêmendiyên wê, ku ev pênc hezar sal in ti mejî (zihîn) û giyan(rih) nehêştine ku rayên xwe bernedabin nava wan û di van çarsed salên xwe yên dawî de jî, ti nirxên civakê nehêştine ku, ji derveyî wê, ji nava wê û ji hewaya jîngehê heya bin erdê dest neavêtibin wan, ew nekiribin meta, nefrotibin û nekirrîbin; her wisa, ku xwe ji pergalên Nemrûd û Fîrewn milyon car zêdetir bihêz kirine? Bê gûman ez pirsê bi vê awayî şaş dipirsim. Anku ez bi şêwaza ku modernîte dixwaze, dipirsim. Armanca min ew e ku ez nîşan bidim ku her tiştên ku rê li ber vê pirsê û pevbestîna li pey wê vedikin, (di wateya erênî de) di nirxeke hîç -ne ti tiştek- de ne.

Ez modernîteya demokratîk, ne vedibînim  (keşf  dikim) û ne jî wê nûvedidim (îcad dikim). Tevî ku yên ez ê di mijara ji nû ve avakirinê de bêjim hebin jî, ez zêde girîngî nadimê. Hîn rasttir, mijara ku girîng e, li ciyekî dîtir e. Ew jî li vir e û ev e: şaristaniya demokratîk, ji dema çêbûna şaristaniya fermî û vir ve, bi awayê dubendî, heye. Ya ku ez hewl didim bikim, ew e ku bi awayekî serobero jî be, ez nirxa ku heq kiriye bidime vê şêweya şaristaniyê (şaristaniya demokratîk a nefermî, nav ne girîng e), ku li her ciyê (mekanê) û her dema (zemanê) şaristaniya fermî heye; her wisa ez rave (daxuyanî)yên balkêş ên di rehendên wê yên serekîn de pêş bixim, û pênase û pênaseyan bikim derbarê bê ka çi ye bi şêweyên xweyên bingehîn ên heşmendî ve û bi civaka xwe ya bî awayê pêkhate û jiyanê ve.

Ti aliyê wê yê ku neyê têgihîştin nîne ku li her ciyê ku deste şaristanî lêketiye (modernîteyên cewaz ên çaxan), ya ku tê îdeakirin ku tekanî ye, û li her dema ku heyn(dewr)a wê têde bihûriye, dijberekê wê, weke pêdiviya diyalektîkî, were destnîşankirin. Berevajî; ya nayê têgihîştin ew e bê ka çima vê beramberiya herî xwezayî ya rêbaza diyalektîk bi dirêjiya dîrokê weke sîstem nehatiye manidar (watedar)kirin û zarvekirin.. Ma wê ti bertek (reaksiyon), raman û pêkhateyên dijber ên qebîle, eşîret û civatên olî yên bêhejmar nebin ku, dema ewqas şaristanî, ji Sumer heya Misir û

Harappa û ji Çîn û Hîndê heya Roma, çêbûne hatine tengezarkirin, hatine kolekirin, her wisa ji Sehreya Mezin heya çolên Asya Navîn û ji Sîbirya heya Erebîstanê herikîne (çoşiyane) weke lehiyê û serî hildane? Gelo, dikare gengaz bibe ku vê yekê neyê hizirîn? Ma qey wê ti deng, bertek (reaksiyon) û pêkhateyên dijber ên komcivakên çandinî û gund nebin, dema ku tevahiya şaristaniyan bi dirêjiya deh hezar salan xwedî kirin? Gelo ev dikeve aqilê û însafa mirov? Ma wê gelên kedkar bêdeng bimînin û şukur li qedera xwe bînin, dema ku ji alî serwerên bajaran ve, ku bi hezaran sal in ew ava kirine, bi her cûre zordestî û mêtinê re rûbirû têne hêştin? Gelo, ev gengaz dibe?

Mirov dikare di derbarê bi hezaran qadan û serdeman de bi hezaran pirsan bike. Û bersivên wan jî hene. Tiştê tine ye, ew e bê ka çima sîstematîkekê şaristanî (avakirina raman û teorî) ya honandî (pêkhatî) ji van bersivan nekariye were avakirin. Pêkhateyên dijber (helwesta civaka exlaqî û polîtîk) jî hene. Tiştê/a tine ye, ew e ku ew pêwendî (eleqe) ya hatiye nîşandan bo bi hezaran zordaran (despot), împaratoran û yekdestiyên sermaye û desthilatî, nehatiye nîşandan bo awayê helwesta herî bingehîn a xwezaya civakî, anku bo rewş û pêşketina civaka exlaqî û polîtîk.

Wê di derbarê her awayên tevahiya xelîfe, sultan mîr, şêx, şehînşah û fermandarên şaristaniya Îslam de, ku em wê pirr baş dinasin, çîrok heya detay(berfirehî)ên herî zirav bêne vegotin; lê, wê terîqet û mezheb, her wisa berxwedan, bêrî û bawerî yên mumînên ku li sê parzemînan belav bûne, yan bi şayanî (layîqî) neyên dîrokîkirin, yan jî wê bêne şewşandin (paşevajkirin) û çîrokkirin.

Eşkere ye ku li vê derê pevçûn û dubendiya nav-şaristanî heye. Lê, dema ku aliyekî bi pesn û fortên bêsînor hatiye pîrozkirin, aliyê hember hatiye noqandin (xistin) bine erdê. Tew di jiyana xwe de jî ez bûm şahîd. Min çavdêrî kir li Kurdê Elevî, Kurdê Sûnî û Kurdê Êzîdî. Divê ez eşkere bêjim ku min wê şaristaniya di Kurdên Elevî û Êzîdî de, ku ji hezaran salan û vir ve paliye (herikiye) û hatiye, ji şaristaniya dijber pirr zêdetir exlaqî û polîtîk dît. Lê, bêje û gotinên şaristaniya klasîk, di derbarê Elewî û Êzîdiyan de bi reşkirinên ku nayên devê mirov ve dagirtî ne. Elbet, li vê derê mebesta min ne kedkar û çandên qebîle û eşîret ên Sunî ye. Ciyê wan hemûyan di şehîne/kefe ya şaristaniyê de medeniyeta demokratîk e. Mirov dikare nimûneyên vê li her cî û dem nîşan bide. Lê ez bawer im di hêla ravekirina armanca me de têrê dike.

Divê ez diyar dikim ku girîng e di derbarê modernîteyê de mijareke din jî were ravekirin. Têgîna 'modernîteya kapîtalîst' di wateyekê de ne rast e. Divê bê dîqetkirin ku ez vê têgînê bi rengekî mercdar bikar tînim. Çawa ku fikareya têgîna 'civaka kapîtalîst' a weke nediyarî û dapaçîn (nixumandin)a rastiyê, heye; di heman demê de fikareyên dirûv ên têgîna 'modernîteya kapîtalîst' belkî jî ji wê zêdetir hene. Modernîte, di wateya gelemperî de, şêwaza jiyana civakî ya çaxekê ye. Tevahiya hêmanên teknîk, zanîst, huner, siyaset û moda digire nava xwe, ku weke çanda daringî û arişî mora xwe li heyamekê didin. Di vê wateyê de wê bibe şaşîtiyeke mezin ku mirov modernîteyê bike malê kapîtalîzmê. Heta dijberî kapîtalîzmê ye, ku bi gelek hêmanên xwe ve, weke pirraniya raser, yekdestiyek e. Çawa ku civaka exlaqî û polîtîk, ku şêwaza bingehîn a jiyana xwezaya civakî ye, dijberê şaristanî bi gelemperî û şaristaniya kapîtalîst bi taybetî ye, di modernîteyê de jî helwesteke dirûv mijara gotinê ye. Civaka nûjen (modern), ne civaka kapîtalîst e. Wê demê, gelo çima min têgîna 'modernîteya kapîtalîst' bikar anî? Ji ber ku yekdestiya kapîtalîst, tevlî hevpeymanerên xwe yên serwer ve, dixwaze mora xwe hem li civakê û hem jî li modernîteya wê bide, ku weke şêwaza jiyanê ya wê demê tê pejirandin. Hewldanen pirr bisîstem (bi navgîniyên

perwerde, padîgan (leşkergeh), ciyên ayîn/îbadetê û medya) tevlî hevpeymanerên xwe yên bîrdozî, siyasî û leşkerî ve pêş dixe, mîna ku afirîner û avakarê şêwaza jiyana çaxê ew bi xwe be. Heşmendiyeke serwer, mîna ya/yê ku ya/yê wê nîne weke ku ya/yê wê be, diafirîne. Eger hewldanên wê ya propagandayê di vê hêlê de bi serketibe, tê wateya ku mora xwe li civakê, yan jî li moderníteyê daye.

Anthony Giddens, dema kapîtalîzmê weke linga herî girîng a moderníteyê dihesibîne, belkî jî pê nizane (ne di wê ferqê de ye) ku dikeve nava dubendiyekê. Pirsa ku pêwîst e were kirin ew e bê ka kîjan ji wan a din dizayîne yan jî destnîşan dike. Nikare bê hizirîn ku modernîte kapîtalîzmê bizayîne; weke çaxa xweser a xwezaya civakî tê jiyîn. Lê weke bajêr-çîn-dewlet, piştî ku yekdestiyên zordestî û mêtinê çêdibin, dixwazin mora xwe li şêwaza jiyanê ya wê demê bidin û wê bikin malê xwe. Pêwîst e bê pejirandin ku di vê rewşê de bi pirranî bi ser dikevin. A ku bûye û domiye/dewam kiriye, serkeftina vê propagandayê ye. Çaxeke pirr qirase hatiye kirin malê heramzadeyan. Dema têgîna 'moderníteya kapîtalîst' tê bikaranîn, pêwîst e vê merca me herdem were girtin ber çavan. Lê belê, xwezaya civakî ti caran bi temamî kapîtalîzmê, yan jî şêwaza heyînê û rengê tam ê yekdestiyeke dîtir, weke nasnameyên xwe napejirîne. Xwezayên civakî, weke xwebûnan û weke teorîk jî, nikarin veguherin bo şaxê yekdestiyeke zordestî û mêtinê. Çawa ku me îspat kir ku nikare kapîtalîzma xwerû çêbibe, her wisa pêkhatina şaristaniya xwerû jî ne gengaz e. Eger kes hebe ku bêje belê 'gengaz e', wê demê pêwîst e mirov bipirse: Gelo, wê sêmendiya bajêr-çîn-dewlet çawa karibe weke xwe bijî, eger civaka ku were mêtin û rêvebirin nebe? Her wisa, weke herî basît wê jiyana xwe ya daringî/madî çawa bidomînin? Lê, vana mora xwe li xwezaya civakî ya demê didin û dikarin kedxwariyê lê bikin (wê îstîsmar bikin). Dema Ewrûpa bibe mijara gotinê, em nikarin Ronesansê, Reformê û Ronakbîriyê bikin malê kapîtalîzmê. Afirînerên wan ti caran pere-sermayedar û desthilatî nebûne. Lê herdem xwestine ku bi hêza pere û desthilatiyê mora xwe li wan bidin. Ji ber ku baş dizanin ku, eger vê yekê bi ser bixin, wê pirr zêdetir pere û desthilatî bidest bixin.

Her wisa civak jî, ku weke dijber, hedefa pere-sermaye û desthilatiyan e, dikare mora xwe li şêwaza jiyanê ya çaxê bide. Gelek rê û nimûneyên vê yekê jî hene. Xwebûna xwezaya civakî jî di bingeh de meyldara vî milî ye. Civak, weke pirraniya raser, dij-kapîtalîst e. Ji ber ku mêtin û zordariya yekdestiya sermayeyê bi rengekî rojane dijî. Ciwantî, jin, bêkar, gelên mêtingeh, gelek civatên olî û her komcivaka ku debara xwe bi keda xwe bike, ku vana girseya hîmî (serekî) ya civaka-dîrokî (demos) ne, ew beş in ku di bingeh de rengên xwe didin şêwaz û modernîte ya jiyanê ya çaxê. Em ji van hemû beşan û dirûvên vana re, da ku hêsanî çêbe, dibêjin 'gel'(demos). Demokrasi bi xwe dibe navê xwe rêvebirina van beşan. Têgînên 'civaka demokratîk' û 'moderníteya demokratîk', ku, her çend têgînên polîtîk in, ji ber ku qad û beşên ku digirin nava wergiriya xwe, girseya hîmî ya civakê pêktînin, ew têgîn in ku nêzîkî rastiyê û cewherê ne. Ji ber vê yekê, divê bi feraset were pêşwazîkirin ku ez wan timi (pirrî caran) bikar tînim. Dema ez dibêjim 'moderníteya demokratîk', mebesta min ev rastî ye. Wê demê moderníteya tekanî ya bi şêwaza A.Gîddens, hem jî têgîna modernîte ya bi mora kapîtalîzmê, têgînên pirr nediyar in û potansiyela wan a ku şaşîtiyan di xwe de wergirin, pirr mezin e.

Yên ku rengê moderníteyekê diyar dikin astên îdea, pêkhate, têkoşîn û serkeftin ên cemserên dijber in. Mirov ji wan re bêje ku bi tevahî kapîtalîst in, yan jî demokratîk in, wê bibe daxistineke çorsane û korane. Ji xwe peyva 'tevahî', dema civak bibe mijara gotinê, pêwîst dike ku pirr bidîqet

were bikaranîn. Ji ber ku xwezaya civakî girîft (tevlîhev) e û ti caran bi tevahî denk nabe li gel tiştekî û rengekî. Divê neyê jibîrkirin ku nakokî cewaziyê pêwîst dike. Cewazî jî wateya jiyanê ye. Kêliya ku nakokî, anku cewazîbûn bisekine, tê wateya ku jiyan jî qediyaye. Tew mirin jî wateyeke dîtir dernabirre, ji bilî îspatbûyîna jiyanê. Gelo em dikarin bihizirin ku jiyanek, ku mirina wê qet tinebe, ji bo mînak mehkûma bêdawîtiyê be, wê tiştekî çawa bixof be? Ya rast, jiyaneke wisa, wê bibûna êşkenceyekê mezin. Gerrîna tim li dirûvî (hempatî)yê, eger bi armanca pelixandina dijberên xwe be, wê bibe înkarkirina jiyanê. Hewldana faşîzmê, anku modernîteya kapîtalîst a tesfiyekirina tevahiya cewaziyên civakî û daxistina wan bo tek rengekî, ji bilî moda (di mînaka moda de, hunera herî xapînokî ji bo veşartina diberiya jiyanê ya kapîtalîzmê li hemberî êşkenceya dirûvîbûnê), mînakên din ên selmîner ên dijberiya wê ya jiyanê ne.

Weke encam, dema ku modernîte, ku têgîneke nediyar e, were wesfandin, diyarbûniyên wergirî û demajo girîng in. Tekanîkirina wê, şaşîtiyên mezin di xwe de werdigirin. Dema weke hemdemîtî û rojaneyîtî ya şaristaniyê bê pênasekirin, hêla wê ya civakî, bijartinên bidîqet pêwîst dike. Kêmasî û şaşîtiyên mezin ên bi vî rengî yên zanistên civakî bala mirov dikşînin. Em dikarin vê yekê ancax girêdayî bi hêza pere û zordestî ya yekdestiyên sermaye û desthilatiyê rave bikin. Wekî ku zanist desthilatiyê û desthilatî jî zanistê dizayine, berevajî wê jî rast e. Lê, tevî vê yekê, xwezaya civakî, weke girseya xwe ya hîmî (serekî), di çaxa serwerî ya kapîtalîst de demokratîk e. Lewre, nikare were hizirîn ku modernîte, weke şêwaza jiyanê ya çaxê, nebe demokratîk. Demokratîkbûna modernîteyê, weke qebareya (hecma) civakî, ji kapîtalîst û hevxebatkarên modernîteyê qatbiqat raser (serdest)tir e. Ji bo têgihînê, tenê bes e ku em zanibin bi rengekî rast bihizirin.

### B-Rehenda Modernîte ya Sanayigerî (Endustriyalîzm) û Modernîteya Demokratîk

Rastiyek e ku çaxa me (şêwaza jiyana me ya nûjen/modern) di rehendên mîslê nedîtî de rajêrî (girêdayî) sanayiyê ye. Her wisa nikare were înkarkirin ku şoreşa sanayî ya sedsala 19. duyemîn şoreşa mezin a civakî ye, ku piştî şoreşa çandinî pêk hatiye. Ew îdeaya ku sanayîbûn bêhempatiyeke modernîteya me ye jî, heman weke di daneheva sermaye de nitran e. Pêngavên sanayîgerî bi hejmareke zêde di xwezaya civakî de bi giştî û di civaka çandinî ya neolîtîk de bi taybetî, her wisa di civakên serdema şaristanî de, belkî di eyara sedsala 19. de nebin jî, hatine pêkanîn. Ji ber ku tevahî pêşketinên teknîkî, wek cûreyek pêngavên sanayî ne, pêşketin berdewamî ye. Û yên di serdemên pêngavan de pêk tên, hilpekînên wesfiyane ne. Mirov dikare bi hezaran nûvedanên sanayî bijmêre, her wekî yekemîn sanayiyên dîzik û xilik, destar, tevn (dezgehên raçandinê), tekel, gîsn, çakûç-sindan (ê goşkaran), bivir, kêr, şûr, aş, papîrûs, kaxiz, amûrên cûrbecûr ên madenî û wekî vana. Lê, bêgotûbêj e ku şoreşa herî mezin a sanayî di destpêkên sedsala 19. de di bin serokatiya Îngilistanê de pêngaveke mezin avêtiye. Vê yekê, di gel ku cewaziyeke girîng a modernîteyê heye, tekanîtiya wê misoger nake, lê tenê cewaziya wê nîşan dide.

Derbaseya ji sanayî (endustrî) bo sanayîgerî (endustriyalîzm) rewşeke hîn cewaztir e. Sanayîgerî tê wateya ku sanayî naveroka bîrdozî wergirtiye. Sanayîgerî, ku li hemberî çandinî û gund pêşket û wekî din zenaetkariya kevneşopî ya bajêr girt hemberî xwe, di pêşketina xwe ya ber bi roja me ya îro ve, sedema di serî de felaketên ekolojîk tevahiya merezî (nexweşî)yan e. Elbet, sanayîgerî bîrdoziya yekdestiyên sermaye ye. Dema ku di dawiyên sedsala 18. de teng bûn wan qadên bikaranîna pere-sermaye (bi awayên xwe yên kevneşopî), ku di destên wan de gihîştibû mêjer

(mîqdar)ên mezin, berê xwe dan sanayî, vê yekê çavkaniya xwe ji wê meyla zagona karê girtiye da ku pêşî  li daketina rêjeyên karê bigirin û heta wan hîn zêdetir bilind bikin. Bi taybetî sanayiya raçandinê wisa ye. Dema ku hilberîna mekanîk, bi çavkaniyên nû yên enerjî (komir, hilm/bûxar-elektrîk) re gihîşt hevdu, hilberîn ku peqînekê çêkir, rêjeyên karê ji nîşka ve bilind kir mezintirîn astê. Her wisa diyardeya dewlet-netew û hemberî (reqabet) ya tund a di navbera wan de, bi van rêjeyên nû yên karê ve pêwendîdar in. Sanayîbûn, anku endustriyalîzm ket pêşiya her tiştî. Ew bi xwe bû baweriya herî pîroz a dewlet-netewê. Ev pêşbirk, bêyî wendakirina ti tişt ji lezayiya xwe, heya roja me ya îro berdewam dike. Yeqîn (qenaet)a hevbeş e ku encamên wê ji niha ve gihîştine rehendên bixof. Ne tenê rûxanên ekolojîk di wateya teng de, di heman demê de nijadkujiyên bikoktir û berfirehtir ên çandî û fizîkî; her wisa şerên bi qasî ku nikaribe bi ti serdemên dîrokê re bêne berawirkirin, rehendên kûrewî (global), herêmî û navçeyî wergirtine; dîsa civak ku bi rêbazên bîrdozî-metafizîk û pirkirinên desthilatiyê ji nasnameya xwe ya exlaqî û polîtîk hatiye qutkirin; lewre komkujiyên qirên civakê; vana hemû ji nêz ve girêdayî meyl yan jî ola sanayîgeriyê ne. Zanist û teknîk, ku ji alî sanayî ve têne bikaranîn, bi qasî ku nikaribe bi ti serdemên dîrokê ve were berawirkirin, naverokekê bîrdozî wergirtine.

Sanayîgerî weke bêhempatiya modernîteyê, gefa herî mezin pêk tîne hem li nava singê û hem jî li pêşiya civakê. Sanayîgerî (endustriyalîzm) di şûngeha Pêker/faktora herî bingehîn de ye di meyla aşûtbûna desthilatiyan de, ku çandinî û gundan dirûxînin, bajaran weke qansêr mezin dikin, civakê bi tevahî digirin bin raçavî û kontrolê û ti çavikên wê nehêştine ku xwe çirpandibin/bernedabin nava wan. Dewlet-netew, weke forma bingehîn a serweriya desthilatî û bîrdozî ya sanayîgerî, di van hemû pêvajoyan de rola serekîn dilîze.

Mirovahî weke xwezaya civakî, ji mêj ve ketiye bin gefa rasteqîn a mehşerî ya vê sanayîgeriyê, weke bêhempatiya moderniteyê. Felaketên ku serê xwe derxistine, fişekên nîşanê yên vê xeteriyê ne. Di vê de, arzûya ji bo berhevbûn û mezinbûna berdewamî ya sermaye, ku jê re tê gotin ‘zagona karê’, pirr eşkere ye ka çiqas wekhev e li gel dijberiya civakê. Ferzkirina li xwezaya civakê tim zagona danehevê, qira-civakê bi xwe ye. Nijadkujiyên daringî û çandî, bûne yekemîn gavên vê pêvajoyê. Encameke hevbeş a her zanyara/ê biaqil û hînekî xwedî wijdan e, ku digihîjê, ku, eger tedbîr nayêne girtin, mirovahî ripîrast (rasterast) diçe mehşerê. Lewre, sanayîgerî, ku weke bêhempatiya moderniteyê, tekaniya duyemîn e, tevlî kapîtalîzmê ve ku ‘cêwiya wê ya Siyam’e, ne tenê qîma xwe nahînin bi lêdana mora xwe li moderniteyê; her wisa ne tenê bi navgîniya modernîtê dibin sedema aloziyên aborî, lê di heman demê de di tevahiya tevn û hêmanên jiyanî yên civakî de di qansêrbûna wê de rola serekîn dilîzin.

Tam di vê xalê û wergiriyê de şûna moderniteya demokratîk a di heyîna civakî de bi hemû zelalî û pêwîstiya xwe derdikeve holê. Civak; yan wê bêza xwe ya bi çar nalan bo mehşerê bidomîne; yan jî wê bi pêngava xwe ya hembêzkirin, pîrozkirin û ji nû ve avakirina moderniteya demokratîk ve, bêje “rawest e [êdî bes e]!”. Maliyetên gevizîna li naverastê, her roja ku diçe, weke aşûtê mezin dibin.

Van tespîtan nabêjin ku sanayî bi tevahî neyînî ye; lê, bal dikşînin ser felaketa sanayîgeriya li pey karê. Sanayî jî, heman weke di têkiliya aqilê analîtîk de, eger di rasterêya [bi sûda] civaka exlaqî û polîtîk de were bikaranîn, dikare mirov bibe jiyana weke bihûştê. Mirov dikare diyar bike ku pêngaveke sanayî, ku bi ekoloji û çandinî re dest bidin hev, ne tenê wê pirsgirêkên herî bingehîn ên

aborî çareser bike, her wisa wê karibe tevahiya pêkerên din ên duyemînî yên pirsgirêkan veguherîne bo erênîtiyê. Ne zor e ku mirov rawêj bike ku, eger tenê xurdekariya maşîn(erebe)an raweste, wê di gelek qadan de, ji petrolê heya rêyên guhastinê û ji qirêjiya jîngehê heya biyolojiya mirovan, encamên di wesfa şoreşê de bizin (çêbibin). Heta, dema bê girtin ber çavan ku, eger sanayîgeriya deryayî bi vê lezayiyê biçe wê ti xêr ji derya û bejayiyê nemîne, wê baştir bê têgihîştin ku sînordarkirineke misoger a amyar(wesaît)an, çiqas girîngiya jiyanî di xwe de werdigire. Elbet ciyê lêkolîna berfireh a encamên guheranên bikok ên ku çêbin ji ber sînordarkirinên ku bêne danîn li ser sanayîgeriya di warê bi hezaran şaxan de, di serî de sanayîgeriya nuklear, sanayiya çandî jî tê de, van risteyan nînin. Tenê balkişandina ser vê û tegihîna rehendên wê yên şoreşane jî tew girîngiya mijarê radixe ber çavan.

Ji bo rawestandina zagona karê, elbet çalakbaziya mezin a civakî jê re pêwist dike. Ji ber ku ajoya serekîn û hêmana arastekar a modernîteya demokratîk ne kar e, di girîngiya jiyanî de ye ku ew bibe bijareya herî guncav a şaristaniyê. Endîşeya serekîn a sîstema civaka exlaqî û polîtîk, ku xwe naspêre sîstema çîn-sermaye û karê, ew e ku nasnameya xwe azad bihêle û ji bo vê, amûrên xwe yên siyaseta demokratîk bike jiyanî. Lîberalîzm, ku bengiya bêsînor a qezenc û karê datîne pêşiya takekes, bi vê armancê bi berdewamî mizginiya modernîteya kapîtalîst û endustriyalîst weke yekane şêwaza jiyanê dide. Pêwîst dibîne, weke cûreyek olên çaxa yekemîn, ku sîstemê bihomîne (teqdîs bike). Sanayîgeriya çandî, şêweyeke nû ya sînornenas a vê homandinê ye. Têkoşîna aborî ya çînî û tevgerên ekolojîk û femînîst bi serê xwe, dikarin her cûre şerên desthilatî û wê modernîteya ku ewqas rehendên dêwane wergirtiye, bi modernîteyeke alternatîv rawestînin. Van çarsed salên serwerîperestiya kapîtalîst, vê rastiyê têr baş rave dikin.

Pêwîst nake mirov bibe zanyarekî/e mezin a/ê civakî ji bo tenê mirov têbigihîje ku sedema hilweşîna sosyalîzma pêkhatî jî ew bû ku nekarî modernîteyeke alternatîv pêş bixista. Em pirr bi hêsanî dikarin rawêj bikin ku eger sosyalîzma pêkhatî tew ji sanayigeriyê re jî çareserî anîba, wê karîbûya raresiya xwe parastiba. Eger komên serekîn ên dijber/muxalif (utopyager, anarşîst, rizgarvanên netewî, ekolojîst û tevgerên femînîst), di serî de jî yên di xeta sosyalîzma pêkhatî de, ji bo qezenckirina şerê modernîte, ku serwerîperestiya kapîtalîst li pey wê dibeze û ji bo mora xwe lê bide her tiştên xwe datîne holê, karîbûna ji bo têkoşînên xwe yên modernîte, herî kêm rastereyekê (xetekê) di teorî û pratîkê de dabana rûniştandin, diyar e wê dîmena modernîteya îroyîn a cîhanê pirr cewaztir bûbûna. Xala tek û hevbeş ku têde wenda kirine, ew e ku pirsa “Gelo kîjan modernîte?” nepirsîne û ji bo bersivê, bi hev re nebeziyane li pey xeteke sîstematîk a teorik û pratîk; her wisa xirab (eyb) nedîtine ku heya qirika xwe bijîn wê şêweya jiyanê, ku kapîtalîzm û endustriyalîzm bi awayekî perçiqîner pêşkêşiya wê dikin. Li gel vê û ya herî girîng ew e ku piştî pejirîna netewperestiya-dewlet weke formeke serekîn a şêweya jiyanê, li şûna rexnekirina wê weke hêmaneke modernîte, elbet wê nediyar û zor be ku dozeke serekîn a muxalefet bi giştî û muxalefet a çep bi taybetî, xuyanîtî wergire.

Mijareke ku ez lê diheyirim, di derbarê vê dîrûşmê de ye: “Cîhaneke dîtir, gengaz e”. Pêşkêşbûyîna vê dîrûşmê, mîna ku vedîtin/keşfek, peyamek yan jî heşmendiyeke girîng be, metel/heyreta min hîn bêhtir zêde dike. Dema ku li naverastê pirsgirêkên modernîte, weke dêwekî ku nakeve xirar (çuwal) derketine holê; dema ku sîstem ji her aliyê xwe ve av girtiye û dihilhile [dikermite weke pelikên masiyan]; her wisa dema ku bin û ser erdê serî hildidin, vedîtin,/keşfa wisa bi mirov ‘pî!’dide gotin. Ma qey wê ji mirov pirs nekin û nebêjin; dema ku modernîteya zal a heyî

(moderníteya ku kapîtalîzm û endustriyalîzm mora xwe lê dane) bi hemû pirsgirêk û harîtiyên xwe ve (ya qala wê tê kirin, şêwaza jiyanê ye) li naverastê ye, ma tu yê bi kîjan alternatîva xwe û qîma xwe bi rexneya xwe nehînî di tevahiya hêmanên serekîn de û bibî bersiv, her wisa karibî bibî bersiv?

Ol, felsefe û dokrînên exlaqî, her wisa tevahiya pirzaniyên di dîrokê de ji bo ku bibne bersiv bo pirsgirêkên modernîte yên di serdemên xwe de hatine pêşxistin. Dikare bê gotûbêj kirin bê ka têrê kirine yan na. Lê ya girîng ew e ku hewldan bi navê civaka exlaqî û polîtîk qet ne kêm bûne. Modernîteya demokratîk, dema di ronahiya tevahiya van ezmûnan de, modernîteya kapîtalîst tevlî pirsgirêkên wê yên xweser ve, bi tehlîl û bersivên berfireh pêşwazî bike, ancax wê demê dikare wate derbibirre. Dîrok û rojaneyîtî, berevajiyê tê rawêj (texmîn)kirin, ne meydana zalî (serwerî)ya teqez a hêzên şaristaniyê ye. Dîrok bi propagandayê barkirî ye derbarê ku wisa ye. Çawa ku her dîroka hatiye nivîsandin ne rastî ye, her wisa her tiştê ku zanista civakî jî ji bo modernîteya roja me ya îro dibêje ne rastî ye; lê di rêjeya mezin de retorîka şaşwazkirin, korkirin û dogmakirina serweriya bîrdozî ye. Siyaseta demokratîk ne tenê bi wateya teng amûrek e ku civaka polîtîk dike erkdar; di heman demê de çalakiya wê ye ku civaka-dîrokî bi hemû aliyên wê rave dike. Ravekirina modernîteya kapîtalîst û endustriyalîst bi rêya siyaseta demokratîk, tenê dema ku bi heqîqetê re bibe yekpare, hingê wê hêza mezin a biryar û çalakî ya civaka exlaqî û polîtîk derbikeve holê. Wê demê, dê pirsa “Gelo jiyaneke hemdem û modernîteyeke çawa?”, bi şayanî bersiva xwe bibîne. Ezmûna çarsed salên dawî ya serweriya kapîtalîst îspat dike ku ti rêbazên dîtir bersivên têr û yên mirov bibne serkeftinê, hilneberandinê. Modernîteya demokratîk, bi sepanên xwe yên îdeayan, ji vê ezmûna dîrokî re bersiva xurt e.

**C-Dewlet-Netew, Modernîte û Konfederalîzma Demokratîk**

Dewlet-netew, weke bêberdewamiya sêyemîn û herî girîng a modernîteyê, şêwê (form) ya herî bingehîn a navgînî ya çalakî ya kapîtalîzm a fethkirin û mêtingehkirina civakê ye. Dema lîberalîzm xwe weke yekpareyıya armancan (civaka îdeayan) pêşkêş dike, dewlet-netew jî weke şêwe (form)ya bingehîn a desthilatî wateya xwe dibîne. Feth û mêtingekirina herî berfireh a civakê li hundir û derve, ku di dîrokê de rûbirû maye, eger forma dewlet-netew nebe, nikarin bêne pêkanîn. Dîsa, mijara ku zanistên civakî li ser wê herî zêde korkirin, ji rêderxistin û loda dogmayan pêş dixe, dewlet-netew e. Hîn jî zor e ku mirov bêje ku tehlîla berfireh a dewletê hatiye kirin. Marksîstekî tew mîna Lenîn jî; dema berê xwe da avakirina yek ji şoreşên herî mezin ên civakî yê dîrokê, nekarî bi serketa ku tehlîlkirina ‘pirsgirêka desthilatî û dewlet’, ji linga dewlet-netew rizgar bikira. Serketinê li milekî bihêlin, tevî hemû rexneyan, nikare xwe bide alî ku tew veguherandina Sovyetan, ku rêxistingeriya civaka demokratîk e, bo dewlet-netew, weke saxlemkirina şoreşa binirxîne. Dewlet-netewa Çîn, ku di roja îro de xizmeta herî mezin pêşkêşî kapîtalîzma cîhanê dike, nimûneya dêwane ya heman nêzîkatiyê ye.

Nêzîkatiya Anthony Gîddens a di derbarê tekanetiya dewlet-netew de, tevî ku para rastiyê di xwe de werdigire, di hêla girêdana wê ya zincîrane bi yekdestiyên desthilatî re yên lodane (kumulatîv) yên dîrokî de, vegotineke pirr nebes e. Ez ê li vir dubare nekim, ji ber min hewl dabû ku dewlet-netewê di bergên berî vê de bi berfirehî pênase bikim. Lê,bi rêya ronîkirina vê mijarê di hêlên cewaz de û bi diyarkirina encamên ku pêwîst e jê bêne derxistin, ez ê vegotinê bihez bikim.

Berî her tiştî divê netew-dewlet weke mezintirîn şêweya (forma azamî) desthilatiyê were hizirîn. Ti şêweya dewletê, bi qasî dewlet-netew (wê rasttir be ku jê re bê gotin ‘netew-dewlet’), ne

di kapasîteya desthilatî de ye. Sedema herî bingehîn a vê yekê ew e ku beşa jorîn a çîna navîn, di rêjeya zêdebûyî de, bi pêvajoya yekdestîbûnê ve tê girêdan. Pêwîst e mirov qet ji heşê xwe dernexe ku dewlet-netew bi xwe yekdestiyek tevdeyî (komple) ya herî pêşketî ye. Yekdestîperestiyên bazirganî, sanayî û malî (fînansî), di qonaxa dewlet-netewe de, bi yekdestîperestiya desthilatî re mezintirîn peymanê saz dikin. Yekîtiya herî pêşketî ya tevahiya yekdestiyan e. Pêwîst e mirov yekdestiya bîrdozî jî, weke perçeyekê jeveneqetî ya yekdestiya desthilatî, di vê wergiriyê de bihizire.

Yek ji qadên ku zanistên civakî têde herî zêde şaşwazî dikin, ewa di derbarê yekdestiyan de ye. Bayêxa mezin nîşan didin da ku emrazên desthilatiyê, weke ser-aborî, ji yekdestiyên bazirganî, sanayî û malî cûda bicî bikin. Bi vî rengî, dixwazin ku desthilatiyê bi giştî û dewletê jî bi taybetî, mîna ku diyardeyên cewaz bin, pêşkêş bikin [nîşan bidin]. Yek ji xalên bingehîn ku zanistên civakî saqet dihêlin, ev e. Cewaziya di navbera yekdestiyên ser-aborî û yekdestiyên desthilatî de, dikare ancax de wateya karbeşî de were ravekirin. Ji bilî vê, yekparetiya di navbera wan de dîrokî ye û misoger e. Divê ez hevokekê Fernand Braudel bigirim vê derê, ku ez wê pirr bandorker dibînim. Braudel dibêje: “Desthilatî jî, weke sermaye, tê berhev kirin.” Wisa ye weke ku yekparetiya di navbera wan de qefaltibe. Bi ser de, kesekî pirzan e ku vê mijarê ji gelek hêlan ve zelal dike.

Desthilatî ne tenê weke sermaye tê berhevkirin, lê, awayê sermaye yê herî homojen, parzinandî û weke dîrokî berhevkirî ye. Eger ez bi tîpên mezin binivîsînim; DESTHILATÎ, AWAYÊ SERMAYE YÊ HERÎ HOMOJEN, PALANDÎ Û WEKE DÎROKÎ BERHEVKIRÎ YE.

Sermayeyên din ên ser-aborî, di şûngeheke wisa de ne ku, bi rêya berhevkirina cewaz, dest diguherînin û xwe birêxistin dikin. Sedema ku li hemûyên wan weke yekdestî tê nêrîn û wate tê dayîn, ew e ku ser-aborî ne û di wê karakterê de ne ku dest datînin (desteserkirin=yekdestî) ser nirxên civakî bi giştî û nirxên-zêdemayî yên civakî bi taybetî. Hemû çirpandinên ji civakê, dixwazî bi awayê bacê bin, dixwazî bi rengê kara dem û dezgeh bin û dixwazî bi şêweya talana dipdiyar bin, di karaktera yekdestî de ne. Ji ber vê, divê têgîna ‘yekdestî’di cî de û baş were têgihîştin.

Ciyê dewlet- netewê di nava dîrokê de ew e ku tevahiya van yekdestiyan bi şêweyeke baş di wergiriya xwe de kiriye yek. Ew bi xwe dibe mezintirîn yekparetiya sermaye û hêza xwe jî ji vê şûngeha xwe digire. Her wisa, ji ber vê şûngeha wê ye ku navgîna herî bandorker a daneheva sermaye ye. Ji bo me hemûyan pirr şaşwazker bû ku avabûna dewlet-netew a Partiya Bolşevîk, piştî heftê salan weke yekparetiyeke sermaye ya biqelafeta dêwekî –qelantor- derket pêşiya me. Lê di rastî de, dema em di hêla tehlîla dewlet-netew de li mijarê binêrin, ev rewş ta radeya dawî têgihîner e. Ji ber ku rêxistingeriya dewlet-netew, awayê herî kevneşop (tîpîk) û kurtebir ê xwe rêxistinkirina sermaye weke dewlet e. Bi dewlet-netewê, mirov dikare, ne sosyalîzmê, lê, kapîtalîzma herî xas birêxistin bike. Çiqas gengaz be ku hêstir /qantir were kirin hesp, ew qas jî gengaz e ku dewlet-netew were kirin, yan jî hesibandin, sosyalîst!

Tevî vê yekê, gengaz nîne ku tekanetiya dewlet-netew, bi rêya qutkirina wê ji şêweyên dîrokî, were ravekirin. Cewazîbûna wê çiqas pêşketibe bila bibe, ya destnîşankar daneheva dîrokî ya desthilatî ye. Em li Îngilistanê binêrin, ku yekemîn welat e ku dewlet-netewê birêxistin kiriye. Îngilistan di destpêkên sedsala 16. de di pencika desthilatî ya Îspanya, Fransa û Normanan de ye. Eşkere ye xeteriya ku tesfiye bibe, eger nikaribe xwe weke dewlet-netew birêxistin bike. Ew bi xwe qraltî ye. Xanedanî li pey hev tên û diçin. Aboriya wê, bi koçberiyên ku ji dema neolîtîkê û vir ve di rêya Ewrûpa re diçin, tê avakirin. Cewaziya wê ji welatên din ên Ewrûpî, di bingeh de şûngeha wê

ya giravî e. Dewlet-netewa xwe, bi rêya xwespartina van mercên dîrokî û şênber, ava kir. Dîrok vê pêvajoyê di nava temamiya şênberiya wê de vedibêje ka zêdebûna hêza Sterlîn (yekeya pere ya Îngilîs) çawa meşiyaye dest bi dest (milbimil) li gel deyndarbûn û yekdestîbûna mezintirîn a li ser aboriyê. Her wisa, tê zanîn ku, ji bo pêngaveke serwerî, berê xwe da şoreşa sanayî jî. Wate, eşkere ye ku, bêyî hebûna dîroka Îngilîs, dîroka wê ya xanedanî bi taybetî û xanedanî ya wê bi xwe, em gengazbûna dewleta netew a Îngilîs li milekî bihêlin, tew qet nikare were hizirîn. Xanedanî şêweya dewletê ya herî berfireh û demdirêj a bi dirêjiya dîrokê ye. Sedema ku Îngilîstan hîn jî dev ji forsa xanedaniyê bernade, bi vî aliyê dîrokê re pêwendîdar e. Demokrasî û komar pirr sînordar in. Împaratorî formeke hîn guherdetir e. Eger danehevên desthilatî nebin ku bi hezaran salan in weke yekdestiyên herî palandî (refînekirî) herikîne û hatine, nikarin çêbibin devlet bi giştî û dewletên netewî bi taybetî.

Pirr hindik qala pêwendiya dewlet-netewê bi çavkaniyên teolojîk re hatibû kirin; lê vê mijarê ta radeya dawî, girîng e. Karl Schmîtt, dema diyar kiriye ku çavkaniya tevahiya têgînên hemdem ên siyasî, teolojîk (zanista li ser xweda) e; rastiyê bi aliyekî wê ronî kiriye. Eger mirov bi baldarî lêhûrbûneke sosyolojîk bike, wê mirov zoriyê nekşîne tespît bike ku ol û hêmaya xweda, ku pê re pêwendîdar e, şêweyên herî kevn ên nasnameya civakî ne. Ol û xweda, divê bêne têgihîştîn weke pêdiviyeke serdemên heşmendiyê, bêhtir ji bûyîna her yek ji wan bizanebûn nasnameyeke hêmayî. Sêwiran (tesawir)a kolektîv a civakî, dihizire weke yek ji rêyên mayîna li ser piyan, ku xwe bi têgînên herî pîroz bike nasname. Di jêderka xwedatiyê de homîn/pîrozbûyîna heyîna civakî heye. Bi pêvajoyê re, herku veqetîna dewlet û civak bilez dibe, payeyên pîrozî û xwedatî têne derxistin ji bûyîna nasnameya kolektîv a civakê û têne kirin malên desthilatdaran û yên xwedî dewlet. Serweriya bîrdozî li vê derê rola girîng dilîze. Tê diyarkirin ku desthilatî û dewlet ji çavkaniya xweda ne; lewre êdî rê vedibin ku, weke desthilatdar û xwedî dewlet, îdea bikin ku ew bi xwe jî pîroz in û xwedayî ne. Êdî ne zor e ku xwe bigihînin têgînên 'qralê xweda' û 'siya xweda' li pey hev pêş bikevin.

Her çend têgîna dewleta laîk dixwaze xwe li derveyî vê pêvajoyê bihêle, li ev ne rast e. Laîktî, ku rêgeza bingehîn a civata Mason e, ku ji bandora dêrê nerehet e û koka wê bigiranî Cihû ye, weke pêdiviya xwezaya wê ye ku, ji xwe weke cemsera dijber a rêgeza rûhanî, heyîna xwe di pîvana mezin de ji van têgînan bigire. Pêwîst e bi rengekî eşkere bê diyarkirin ku ne laîktî bi qasî ku tê rawêjkirin cîhanî û sekular e û ne jî rûhanîtî bi qasî ku tê têxmîn/rawêjkirin axretî û ûxrewî ye. Herdu têgîn jî cîhanî ne û civakî ne. Dogmayên bîrdozî cewaziya di navbera herduyan de vekirine.

Lewre, dikare bê payîn ku hêmaya ji çavkaniya xwedayî ya desthilatî û dewlet, ku bi dirêjiya tevahiya çaxan hatiye dîtin, heman weke xwe, li çaxa me biteyîse. Nikare were hizirîn ku dewleta hemdem jî ji vê teyisanê bibandor nebe. Ev têgîn bi dirêjiya dîrokê wisa hatiye strandin. Têgîna laîk a dewlet û desthilatî binakok e û nediyar e.

Dewlet-netew barkirî ye bi têgînên xwedayî, zêdetir ji ya tê rawêj/texmînkirin. Rajêrî merasîmên homîn/pîrozbûyînê ye, bi qasî ku di ti serdema dîrokê de nehatibe dîtin. Têgînên weke 'welat', 'al', 'unîter', 'serxwebûn', 'pîrozî', sirûd/marş-muzîk', 'vegotina bi awayê çîrokkirinê', û wekî vana, ku xwe dispêre wan û wana weke hêma ji xwe re bijartiye, ji qraltiyên-xweda zêdetir xwedî payeyên xwedayî ne. Ti şêweya dewletê, bi qasî dewlet-netew, zirxên bîrdozî, huqûqî, siyasî, aborî û olî li xwe nekiriye. Sedema bingehîn a vê yekê dîsa ew e ku deriyê bingehîn ê debarê ye ji bo

burokrasiyeke sivil-leşkerî, ku pirr qelebalix bûye. Bila ji bin burokrasiyê qoltixên dewletê bêne kişandin, wê mîna masiya derketî ji avê li wan were. Dewlet ji bo wan pirsgirêka mirin û mayîne ye. Kirmişandina dewletê bo payeya herî pirole ya xwedatî, têkîldar e ji nêz ve bi vê taybetmendiya burokrasiyê re. Sedema ku di modernîteya kapîtalîst de, bi qasî ku di ti modernîteyan de nebûye, ewqas li ser dewletê tê rawestîn û tofan tê rakirin, dîsa guherana di pêkhateya wê ya çînî de ye. Her wisa, di navbera kirpana modernîte, dewlet-netew û bi taybetî "yekîtîgirî-unîterî" û têgîna 'yekîtiya xweda' de têkiliyeke nêzîk heye. Çawa ku di dîrokê de xwedayên qewm û qebîleyên din tevli qebîle û qewmên xwe ve hatine tesfiyekirin û di nava xwedayê zal/hakîm de hatine helandin, xwedayên wan jî di nava xwedayê qebîle û qewma zal de têne helandin û tekkirin. Dema em di nava vê rastiya sosyolojîk de li têgîna 'yekîtiya xweda' binêrin, em ê bi rengekî hîn hêsantir xwe bigihînin wateya wê.

Dîroka unîterî/yekîtîgirî ya dewlet-netew, bi awayekî pirr kûr xwedayî ye. Dema bêçekkirina temamî ya civaka di bin rajêriya wê de û veguhastina tevahiya yekdestiya çekan bo dewleta nûjen (modern), rê li ber unîteriyê vedike; di cewher de yên ku pêk tên, bi rengekî bixof mêtin, mêtingerî û yekdestîperestiya wê ne. Teorîsyenên serweriyê (di serî de Hobbes û Machiavellî), dema dewleta nûjen/modern bi navê zanistperestî pênase kirine, xizmeta herî girîng pêşkêşî yekdestîperestiya kapîtalîst kirine. Kombûna tevahiya çekan di pêkhateyekê tekperest de bi bahaneya 'aramiya civakê' wê bê wateya şêlîna civakê ji hêza wê ya polîtîk, lewre ji hebûna wê ya aborî, bi qasî ku di ti serdema dîrokê de nehatibe dîtin. Dewlet û desthilatî, di tehlîla dawî de, li gorî ku wê weke yekdestiyekê tevbigerin, wê bi hêza çekên ku ewqas kom bûne, ti nirxên civakî nemînin ku nikaribin wan bidest bixin [desteser bikin]. Wê bi awayê ku ew bixwzin, şêwe bidin civakê û yên ku bixwazin ji holê rakin. Ji xwe tiştên ku di dîrokê de rû dan (qewimîn) li ser vê mînvalê pêş ketin. Nijadkujiyên nedîtî pêk hatin.

Dewlet-netew, weke paydeya hevbeş a tevahiya yekdestiyan, qîma xwe nahîne bi xwe rûniştandina li ser xesp, feth û mêtingehkirina çanda daringî ya civakî; her wisa di asîmîlasyona çanda arişî de jî rola destnîşankar dilîze. Bi pirranî, norm/asayên çandê yên etnîsiyeke zal yan jî yên civateke olî, di bin navê 'çanda netewî' de dike fermî û bi vî rengî şer vedike li dijî tevahiya hebûnên dîtir ên çandî. Çiqas ziman û çandên ol, etnîsîte, qewm û netewan hebin, ku hebûnên xwe ji hezaran salan û vir ve diparêzin, dibêje "zerardar in ji yekparetiya netewî re" û bi vî rengî dawiya hemûyên wan, yan bi zorê, yan jî bi handan/teşwiqên daringî  amade dike. Ziman, ol, mezheb, qebîleyên etnîkî û eşîret, her wisa qewm û netew, bi qasî ku di ti serdema dîrokê de nebûye, bûne qurbanên siyasetê, hîn rasttir vê nijadkujiyê. Nijadkujiyên daringî (tunekirinên fizîkî), li ber nijadkujiyên arişî tew ne guhê hêştir (deve)ê ne jî. Nirxên zimanî û çandî ku ji hezaran salan û vir ve herikîne û hatine, tevlî komên wan ve, di bin harîtiya 'yekîtiya netewî'de, mîna ku 'çalakiya pîrozî'be, têne qurbankirin.

Feraseta dewlet-netew a 'welat', pirr zêdetir bipirsgirêk e. Sînorên erdnîgarî, ku her çawa be têne girtin bin serwerî, anku yekdestî ya dewletê, weke 'welatê pîroz', têne hêmakirin. Welat, di rastî de, hatiye kirin mulkiyeta hevbeş a hevpeymanên yekdestiyan. Sîstema ku li ser wan damezrandine, mêtingeriyeke pirr kûrtir e ji mêtingireya berê ya kolonî. Berê, yek welatekî mêtinger hebû; lê niha, bi qasî hejmara yekdestiyên dewlet-netewê, cûreyên mêtingeriyê li ser 'welatê wê yê pîroz' hene. Gelên mêtingeh çawa hatibin bêçekkirin, gelê 'welatê pîroz' jî wisa hatiye bêçekkirin û

bi vî rengî, li hemberî her cûre mêtinê bêberxwedan hatine hêştin. Hemû hebûnên wan ên çandî yên daringî û arişî, di serî de jî karûbarên wan, têne girtin bin mêtineke qatqatî.

Dîplomasiya dewlet-netewê, ji bo kordînasyona bi dewlet-netew ên din re, ku yekdestiyên derveyîn in, û şopandina karûbarên sîstema cîhanê ya dewlet-netewan, tê avakirin. Eger pejirana dewlet-netewên li derve nebe, gengaz nîne ku tenê yek dewlet-netewek jî bîst û çar saet li piyan were hêştin. Sedema vê di mantiqê sîstema cîhanê ya kapîtalîst de veşartî ye. Eger rîzaya hêza serwerî nebe, gengaz nîne ku hebûna ti dewlet-netew bibe mayînde. Çîroka hemûyên wan di lênûs/deftera serwer de nivîsandî ye. Ya ku derkeve derveyî rêsayê, yan weke dawiya Sedam lê tê kirin, yan jî bi embergoyan tê îflaskirin û bi vî rengî tê hilweşandin. Tê ferzkirin ku hemû dewlet-netew, yan di dema damezrana xwe de, yan jî pişt re, pirr baş dizanin ku bêyî destûra hêza serwer, wê hebûna ti yek ji wan nikaribe bibe mayînde.  Tew dewletên Çîn û Yekîtiya Sowyetan jî nekarîne li derveyî vê rêsayê bimînin.

Her wisa, yek ji taybetmendiyên herî bingehîn ên dewlet-netewê ew e ku di pêkhateyeke -di pîvana gengaziyê de- girtî de ye li hemberî çêbûnên piralîparêz/pluralîst û cewaz ên siyasî. Sedema vê, tê têgihîştin. Ji ber ku wê çêbûnên piralîparêz û cewaz ên siyasî di nava sînorên heyî de bibin asteng li hemberî mêtina yekdestiyê. Eger civaka exlaqî û polîtîk, weke pêdiviya xwezaya xwe, bi çêbûneke cewaz a siyasî re, bi taybetî bi çêbûnên siyasî yên demokratîk re, heyîna xwe wergirê, wê qada yekdestîperestan bi awayekî xirab teng bibe. Têgînên ‘parvenebûyîna serwerî’, ‘yekparetiya welat’, ‘pêkhateya unîter’ û wekî vana bi vê armancê hatine dariştin. Armanc ew e ku nirxên welat bi gelê wê û komên civakê re neyên parvekirin. Têw di tunekirina çanda arişî de jî ev bahane rola bingehîn dilîze. Piralîparêziya demokratîk a siyasî, tevî ku rejîma herî guncav e ji bo wekheviya li ser bingeha hem azadî û hem jî cewaziyan, tê teyisandin weke nêrîn û çalakiyên dere-zagonî ku ‘yekparetî û rejîma welat dixin xeteriyê’.

Dewlet-netew, bi nasnameya ‘netewxwaz’ ku herî zêde lê dixebite, belkî jî di dîrokê de nûnera herî hevxebatkar a hêza serwerî ye. Di bin navê ‘netewxwaz’ de hevxebatkara herî dilsoz a sîstema cîhanê ya kapîtalîst e. Ti sazî bi qasî dewlet-netew, rajêr û xizmetkara hêza serwer, anku hêza navendî ya kapîtalîzma cîhanê nîne. Bûyîna wan a mêtingehên hundirîn, ji ber sedema vî karakterê wan e. Dewlet-netewek çiqas xwe netewperest nîşan bide, tê wateya ku ewqas xizmetî hêza serwer a sîstem a cîhanê dike. Mirov dewlet-netewîgeriyê, ku hêza serwer ji çarsed salan û vir ve ew bibayex amade kiriye û şêwe dayê, weke dewleta herî ‘netewxwaz’ bihesibîne, tê wateya ku mirov ji şerên tirsnak ên hêza serweriyê ti tiştekî tênagihîje.

Di dema tehlîlirina têgîna dewlet-netew de, girîng e ku bi hin mijarên din re neyê tevlîhevkirin û neyê gihandin encamên şaş. Berî her tiştî, pêwîst e têgîna dewlet-netewê baş bê pênasekirin. Dewletan di dîrokê de bi gelemperî weke rêxistin, xwe bi pêgirên xwe ve sînordar dikirin û xwe wisa pênase dikirin. Anku, weke deweletên kadro, di wê şûngehê de bûn ku dihatin pejirandin, hevdu îqna dikirin, bilind dikirin, hevdu dikirin torîn (zadegan) û heta dikirin xweda. Lê bi dewlet-netewê re, ev nêzîkatî guherî. Hate ketin nava rewşek wisa ku xwe di mezinî, bilindî û pîrozî ya dewlet-netew de pêşkêşî, ne tenê kadroyên dewletê, lê di heman demê de pêşkêşî tevahiya civaka di bin rajêriya xwe de, ku jê re dibêjin hemwelatî, kir û xwe bi wan da pejirandin. Tevahiya civak di nava dewlet-netew de hema hema hate helandin. Ev e ew bûyera ku jê re tê gotin ‘ragirtina nava qefesa ji hesin’. Ta ku ev rastî neyê têgihîn, gengaz nabe ku ne dewlet-netew û ne jî modernîte

werin têgihîştin. A yekemîn ew e ku dewlet-netew tevlî komar û demokrasiyê ve tê nirxandin. Dewlet-netew ne komar e; bi ser de li ser dijberiya felsefeya komarê, xebitîna wê û saziyên wê yên bingehîn pêş ket. Dewlet-netew, înkara komargeriyê ye. Ew nêrîna “Bêyî hebûna dewlet-netewa navendî, nikare gengaz bibe ku demokrasî û sosyalîzm hebin”, ku hîn jî di nava çapgiriyê de bandorkar e û nêrîna fermî ya çepa sosyalîst a pêkhatî ye, xwe xapandineke bixof e. Encamên vê yên wehîm di tunekirina gelek sosyalîst û demokratan de, bi taybetî di serî de di tunekirina Rosa Luksemburg de li Almanya, hatin dîtin; her wisa di hilweşîna sîstema sosyalîzma pêkhatî de hatin dîtin. Ti xwe xapandin, ew qas zerar nedaye sosyalîzmê û demokrasiyê. Komar û demokrasî, ancax bi pêkhateyên siyaseta demokratîk ên piralîparêz li hemberî yekdestîperestiya dewlet-netewê, digihîjin wateyên xwe yên rasteqîn. Ancax wê demê dikare jiyaneke pêkveyî ya di nava welatparêzî û cewaziyeke watedar de, bi rejîma siyaseta demokratîk a piralîparêz a komara demokratîk ve pêk were.

Di mercên ku yekdestiyên kapîtala finans a kurewî yên roja me ya îro li pey serwriyê dibezin, tê dîtin ku dixwazin dewlet-netewên di pêkhateya kevn de ji nû ve ava bikin. Tevî ku armancên cewaz û dîtir ên vê meyla Neolîberalîzmê hene (bi taybetî xapînokiya wê ya maskeya demokratîk), tê têgihîştin. Yekdestîperestiya netewî ji gelek hêlan ve nikare xwe biguncîne li gel yekdestîperestiya kûrewî, her wisa nikare pêdiviya polîtîkayên kûrewî bilez têxe qonaxa sepanê. Lewre, dibe sedemeke xitimîner ji bo yekparetiya sîstemê. Ji nû ve avakirin, ne ji bo tesfiyekirina dewlet-netew e, lê ji bo rajêrkirina bo daxwaziyên kapîtala finans a nû ya serwerîperest a kûrewî ye.

Dewlet-netew di serweriya bîrdozî de ku li civakê diçirpîne, napelike (fikare nake) ku çar formen sereke yên bîrdozî di nava hev de û weke bîrdozî bikarbîne. Netewperestî, ku forma bingehîn a bîrdozî ya dewlet-netew e, bi temamî cewhereke olî, lê hatiye kirmişandin. Dewlet-netew çiqas modernîst a kapîtalîst be, netewperestî jî ewqas ola modernîst e. Hatiye amadekirin weke ola civakî ya felsefeya pozîtîvîst. Pêwîst e mirov welatparêziyê weke xwezaya civakî, dijberê civaka netew bihizire. Netewperestî di vê wateyê de bîrdoziya herî dij-netew e. Netewê, ku diyardeyeke demokratîk e, bi rêya netewperestiyê digire bin serweriya bîrdozî ya kapîtalîst û bi vî rengî ji yekdestiyên mêtinê re xizmeta herî mezin dike. Tevahiya netewê dike mulk û mêtingeha hevbeş a yekdestiyên (bazirganî, sanayî, mali/finans û desthilatî) ku bi wan re di nava peymanê de ye. Bi taybetî vê erka xwe di bin navê ‘ola netewxwaz’ de, ku herî pozîtîvîst e, tîne cî. Netewperestî weke ola dewlet-netewê her çend bi vî aliyê xwe nakok bixuye jî, bi awayê du fenomenên ku di bingeh de heman in, xwe nîşan dide:

Yekemîn a ji vana di şêweya xwedatiya ‘dewleta unîter’de ye. Di nava netew de, weke dewleta ‘tek xweda’, pirr hetsyar e. Ev şêweya ‘tek xweda’ di qada navnetewî de xwe weke ‘Mezintirîn Serwer’ (Super Hegemon) diteyisîne (G. W. Bush, Serokê [berê yê] DYE ku Mezintirîn Serwer e, ji bo xwe got ku ew ji alî xweda ve hatiye erkdarkirin; ev jî delîla vê yekê ye). Mezintirîn Serwer, bi gotina Hegel, ‘awayê meşa xwedayê daketî rûyê erdê’ye (gerçî vêya ji bo Napolyon û Fransa ya di dema xwe de gotibû). Ya duyemîn; her dewlet-netew pûta netew a Mezintirîn Serwer ê weke xweda ye. Xwe pirkirina wê ya bi vî rengî, nayê wateya perçebûna wê û derbaseya bo sîstemeke pir-xwedayî; lê, tê wateya pirkirina wan weke pûtan. Çavkaniya vê, ya di felsefeyê de, pozîtîvîzm e. Bîrdoziya eklektîk a dewlet-netew a di rêza duyemîn de, zanistperestiya pozîtîvîst e. Çavkaniyeke bîrdozî ya herî nêzî netewperestiyê ye. Herdu ji hev du xwedî dibin. Auguste Comte, damezrînerê wê, bi xwe xwestibû ku pozîtîvîzmê, weke ola sekular a gerdûnî, ava bikira. Lê, nekarî

bi qasî Marksîzmê xwe ragirta. Lê dîsa jî di şûngeha ola bingehîn a laîsîzmê de ye. Nietzche tespîteke girîng dike, dema pozîtîvîzmê pirr di cî de weke metafizîka herî çors-vulger dinirxîne, tevî ku pozîtîvîzm îdea dike ku dijberî metafizîk e. Di şûngeha bîrdoziyeke serwerî de ye ku, weke yek ji varyasyon (muştaq)ên guzîde ya bîrdozî ya modernîteyê, zanistên civakî herî zêde paşevaj dike, kor dike û wan dike pût.

Pozîtîvîzm (zanistperestî) jî, weke zanistê, felsefeya herî çors a diyardetî ye. Diyarde, dîmena rastiyê ye; lê di pozîtîvîzmê de rastî bi xwe ye. Her tiştê ku diyarde nebe, ne rastî ye. Em ji fizîka kûantûm, her wisa ji astronomî û biyolojiyê, heta em ji raman weke cewher bi xwe, dizanin ku rastî di alemên wêdatirî bûyerên ku weke herî mezin bi çavan têne dîtin, rû didin/diqewimin. Rastî di têkiliya çavdêrbûyî –çavdêr de xwe li naverokekê herî razdar (bisirr) kirmişiye, ku ev di xaleke wisa de ye ku di ti pîvang û pênaseya fizîkî de hil neyê. Pozîtîvîzm, weke înkara we kûraniyê, herî zêde didirûve pûtperestî (paganîzm) ya çaxa yekemîn. Pût, ji ber ku weke diyardeyekê dîmen wergirtiye, pêwendiya hevbeş a di navbera paganîzm û pozîtîvîzmê de diteyisîne. Ji ber vê sedemê tevahiya mejiyên ku di nava dewlet-netew de bi ola netewperest hatine şûştin, cîhanê pêkhatî ji xuyanek (fenomen)ên basît dihesibînin û bi vî rengî wê weke cûre perestinekê têdigihîn. Civaka mezaxê bûye miriya ‘obje/heyber’ê û ev perestin bi xwe ye. Di vê hêlê de, ta radeya dawî girîng û têgihîner e şêwegirtina civaka mezaxê weke berhemeke dorhêla dewlet-netewê. Bi vî awayî, li milekî, tevahiya takekesên civakê, wekê dîlên meta (Bi dewlet-netewê re, meta di civaka mezaxê de bi temamî bûye pût) û mezêxerên pirole, keysa pirole ya karê pêşkêşî yekdestiyên kapîtalîst dikin; li milekî din, civak, ku bi mezêxeriya ku cûre xuyaniyeke ol wergirtiye, hatiye dîlgirtin û tê xistin rewşa civaka herî pindirî, asîmîlebûyî û rêvebirî bi awayê herî hêsan. Civaka ku daye dû (ketiye pey) mejiyê bixof ê netewperest û dîrûşmbêj/sloganavêj, vê rastiyê pirr eşkere derdibirre.

Sêyemîn forma girîng a bîrdozî, zayendperestiya civakî ye. Zayendperestî bi dirêjiya dîrokê jî bûye çekek ku sîstemên şaristaniyê wê herî zêde bikaranîne li dijî civaka exlaqî û polîtîk. Mêtingehkirina jinê ji bo gelek armancan, vegotina mînak a herî kartêker a vê yekê ye. Dunde (dol) hildiberîne, karkera bêmize ye, xwediya karên herî biqehr e û koleya herî pindirî ye. Navgîna reklamê ye. Metaya herî nirxdar e û banû ya metayan e. Di xuyaniya karxaneya zilam de ye ku bi berdewamî weke navgîna destavêtinê/tecawuzê, desthilatiya wî pêk tîne. Weka objeya rindî û deng, di warê arişî de jî domandar a civaka bi serweriya zilam e. Jin bi van hemû aliyên xwe ve, bi awayê herî zêde di nava dewlet-netew de digihîje vê rewşa xwe ya di nava civaka zilam de. Jina hêma (nasname û sêwirana hevbeş a jinê) ya di civaka dewlet-netew de, weke îlahe (xwedavend), di dîmen de malzemeyeke perestinê ye. Lê belê rengdêra ‘îlahe’ li vê derê de wateya ya herî piçûkxistî û malagiştî de ye. Jin, weke îlahe, ew jin e ku herî zêde rastî heqaretê bûye û hatiye xistin. Zayendperestiya di civaka dewlet-netew de, dema li milekî, zilam bi awayê herî zêde dike desthilat (her zilamê serwer têkiliya zayendî di wateya “min karê fehîşeyê qedand”, “ez jê hatim/min şiya” de, bi awayekî nuxaftî li mejiyê xwe dinexşîne), civakê di kesayetiya jinê de vediguherîne awayê mêtingeha herî binî. Di vê wateyê de jin di dewlet-netew de di şûngeha netewa mêtingeha herî pêşxistî ya civaka-dîrokî de ye.

Dewlet-netew xwe nade paş ku olê jî, ku kevneşopa beriya modernîteyê ye, bi bîrdoziya netewperest re di nava hev de bi kar bîne. Sedema vê, Pêker/faktorên olê ne, ku di nava civakan de hîn jî xurt in. Bi taybetî Îslam di vê mijarê de hîn jî pirr zindî ye. Lê, kevneşopa olî, bi bikaranîna wê ya di modernîteyê de, êdî ne ola berê ye. Ola di bikaranîna modernîte û dewlet-netew de, dixwazî bi

awayên wê yên radîkal yan jî nerme be, ji erka wê ya rasteqîn a civakî (rola wê ya mezin a di civaka exlaqî û polîtîk de) tê qutkirin û bi vî rengî bi awayê wê yê xesandî tê pêşkêşkirin. Rola wê ya di civakê de di wê pîvanê de ye ku dewlet-netew destûr bide. Astengiyên tund têne danîn pêşiya domandina wê ya erka xwe ya erênî ya di civaka exlaqî û polîtîk de. Laîktî di vê mijarê de di şûngeha astengiya serekîn de ye. Lewre, pêwîst e mirov şaşwaz nebe (lê neheyire) ku di navbera herduyan de yek carna têkoşîn dipeqin. Sedema ku dewlet-netew bi temamî dev ji olê (weke kevneşopa kevn) bernade, ew e ku her wisa giraniya mezin a olê li ser civakê heye; li gel vê, pêhateya wê pirr destdayî ye ji bo hatina bikaranînê û netewperestkirinê. Carna ol bi xwe rol/rista netewperestiyê dilîze. Şîatî ya li Îranê di pêşkêşiyê de ye, çeka herî xurt a bîrdozî ya serwerî ya dewlet-netewa Îranê ye. Şîatî nimûneya netewperestiya ola herî pêşxistî ye. Hempayên wê gelek in. Sûnîtiya li Tirkiyê di şûngeha bîrdoziya olî de ye, ku sînordar be jî, herî nêzî netewperestî ye û bi hêsanî dişemite.

Dewlet-netew, ji bo pêkanîna mêtina yekdestîperest a yekbûyî ya çar-qatî (yekdestiyên bazirganî, sanayî, malî û desthilatî) ku girtiye ser xwe, nikare qîma xwe tenê bi bikaranîna faşîzmê bîne, ku şêweya herî bixof a zorê ye, lê di heman  demê de bikaranîna serwerî ya çar bîrdoziyên eklektîk, herî kêm bi qasî zora sîstemî ya rejîma faşist, neçar dike. Rejîma faşist, a bêserweriya bîrdozî, nikare were domandin.

Modernîteya demokratîk, bi rêbazên piralîparêz, şîmanegir, vekirî bo alternatîvan û ku civaka demokratîk didin xuyakirin, bersiv dide civaka homojen a kerî û girse û mirovê/a homojen (bi tek-tîp), ku dewlet-netewa nûjen/modern dixwaze pêk bîne di rêya ku şêwandiye bi rêbaza gerdûnewer, dûz, pêşveçûner û misogerîperest (feraseta rêbaza girtî bo şîmaneyan û alternatîvan). Modernîteya demokratîk alternatîva xwe pêş dixe, bi pêkhateya xwe ya vekirî bo çêbûnên cewaz ên siyasî; pir-çandî; girtî bo yekdestîbûnê; ekolojîk; femînîst; ku bersiv bide pêdiviyên bingehîn ên civakî; her wisa aborî ya spatî bi teserûfa komcivakan. Alternatîva siyasî ya modernîteya demokratîk li hemberî dewlet-netewa modernîteya kapîtalîst, Konfederalîzma Demokratîk e.

**Konfederalîzma Demokratîk;**

**a-** Vekirî ye ji pêkhateyên siyasî yên cewaz û pir-tebeqeyî re. Neçar e ku hebin pêkhateyên siyasî yên cewaz ên berwarî/horîzontal û tîkanî/vertîkal, ji ber pêkhateya heyî ya girîft (tevlihev) a civakê. Pêkhateyên siyasî yên navendî, navçeyî û herêmî di denge/hevsengî de di nava hev de radigire. Ji ber ku her yek ji pêkhateyên piralîparêz ên siyasî bersiv didin mercên şênber, zêdetir nêzî dîtina rêyên çareserî yên herî rast in ji pirsgirêkên civakî re. Mafên herî xwezayî yên nasnameyên çandî, etnikî û netewî ne ku xwe bi pêkhateyên siyasî derbibirrin. Hîn rastir, pêwîstiya civaka exlaqî û polîtîk e. Vekirî ye ji li hevhatinên rêgezî bi kevneşopên dewletê re, dixwazî bi awayên dewlet-netew, komar yan jî demokrasiyên burjuva be. Dikare pê re, li ser bingeha aştiya rêgezî, bi hev re bijî.

**b-** Xwe dispêre civaka exlaqî û polîtîk. Di wergiriya yekdestiyên kapîtalîst de dibîne wan hewldanên dirûv ên projeyên şablonîst ên li ser civakê, yên spartî bi endazyariya civakê ya kapîtalîst, sosyalîst, feodal, endustriyalîst (sanayîger) û mezêxer. Di cewher de, civakek wisa tine ye, lê têne propagandaya wê heye. Civak di bingeh de exlaqî û polîtîk in. Yekdestiyên aborî, siyasî, bîrdozî û leşkerî, emrazên wisa ne ku, bi rêya kojîna vê xwezaya bingehîn a civakê, li pey nirxa-zêdemayî, heta li pey xûgî (xerac) ya civakî dibezin. Bi serê xwe, ti nirxa wan tine ye. Tew şoreş jî

nikare civakekê nû biafirîne. Şoreş ancax ji bo ku tevnên civakê yên exlaqî û polîtîk, ku hatibin mehandin û derxistin ji meriyetê, bigihînin erkên wan ên rastîn, dikarin rola erênî bilîzin weke operasyonên ku serî li wan bê dayîn. Jê pê ve, ji alî vîna azad a civaka exlaqî û polîtîk ve tê destnîşankirin.

**c-** Xwe dispêre siyaseta demokratîk. Tevahî komên civakî û nasnameyên çandî, bi pêkhateyên siyasî yên ku wan derbibirin, rêveberiya xweser a civakê pêk tînin li hemberî feraseta dewlet-netew a rêveberî û îdare ya bi navenda sext, bixeta dûz û burokratîk. Kar têne rêvebirin, ne bi pêşandanên di astên cûrbecûr de, lê bi rêveberên ku bi hilbijartinan bêne ser kar. A rastîn, şiyana biryara bimeclîs û bigotûbêjan e. Rêveberiya bi kêfa dilê xwe, nederbasdar e. Bi demeta desteyên ku li yekîtiyê di nava cewaziyê de bigerin, her wisa yên pir-pêkhateyî û guncav li gel bûnyeya her kom û çandên ji desteya giştî ya kordînasyona navendî (meclîs, komisyon, kongre) heya desteyên herêmî, rêveberî û kontrola demokratîk a karûbarên civakî têne pêkanîn.

**d-** Xwe dispêre parastina cewherîn. Yekîneyên parastina cewherîn, ne weke yekdestiya leşkerî, lê di bin kontrola tund a organên demokratîk de, li gorî pêdiviyên civakê yên ewlekariya hundirîn û derveyîn, hêza bingehîn in. Erka wan ew e ku vîna siyaseta demokratîk, weke pêkhateya biryarê ya civaka exlaqî û polîtîk a azadixwaz û wekhevî/yeksanîxwaz a li ser bingeha cewaziyan, derbasdar bikin; her wisa destlêwerdana hêzên ku vê vînê ji derve û hundir ve vala derxin, asteng bikin û tune bikin, bêbandor bikin. Pêkhateya fermandeyî/komûta ya yekîneyan di bin cot-kontrola hem organên siyaseta demokratîk û hem jî endamên yekîneyê de ye û, eger pêwîst bê dîtin, bi pêşniyar û pesendkirinên berhember, dikare bi hêsanî were guherandin.

**e-** Cî nîne ji serwerîperestî re bi gelemperî û ji serwerîperestiya bîrdozî re bi taybetî. Rêgeza serwerî di şaristaniyên klasîk de derbasdar e. Di modernîte û şaristaniyên demokratîk de bi xweşbînî li hêz û bîrdoziyên serwer nayê nêrîn. Dema ku sînorên derbirrana/îfadeya cewaz û rêveberiya demokratîk derbas bikin, bi rêveberiya xweser û azadiya derbirranê, têne bêbandorkirin. Di rêveberiya kolektîv a karûbarên civakê de neçar e ku feraseta berhember, rêz ji pêşniyarên cewaz re û dilsozî bi hîmên biryarên demokratîk re hebin. Di vê mijarê de, tevî ku feraseta rêveberiya şaristaniya klasîk a giştî û modernîteya klasîk û feraseta dewlet-netew li hevdiguncin (li hev rast tên), di navbera feraseta şaristanî û modernîteya demokratîk û wana de cewazî û dijraberî yên mezin hene. Di bingeha cewazî û dijraberiyan de şêwaza îdareya burokratîk û kêfî û ya rêveberiya exlaqî ya demokratîk heye.

Serweriya bîrdozî nikare bibe mijara gotinê. Piralîparêzî di navbera nêrîn û bîrdoziyên cewaz de jî derbasdar e. Pêdiviya rêveberiyê nîne ku xwe bi kamûflaja bîrdozî bihêz bike. Lewre, çawa ku pêdiviya wê bi bîrdoziyên netewperest, olperest, zanistperestên pozîtîvîst û zayendperest nîne, li hemberî damezrandina serweriyê ye jî. Her nêrîn, raman û bawerî xwedî mafê xwe derbirrîna serbest in, bi mercê ku pêkhateya exlaqî û polîtîk a civakê nemehînin û le pey serweriyê nebezin.

**f-** Alîgira Yekîtiya Konfederal a Demokratîk a Cîhanê ye li hemberî feraseta yekîtiya bi NY (Netewên Yekbûyî) ya dewlet-netewan, ku di bin kontrola mezintirîn hêza serwerî de ne. Biyekkirina komcivakên pirr firehtir, weke hem hejmarî û hem wesfî, di Konfederasyona Demokratîk a Cîhanê de, guncav li gel krîterên siyaseta demokratîk, şert e  ji bo cîhanekê bêhtir ewle, aştiyane, ekolojîk, dadwer û berhemdar.

Weke encam, cewazî û dijberiyên moderniteyên kapîtalîst û demokratîk, ku em dikarin wan hîn pirr berfirehtir berawir bikin, ne tenê îdeayek e, lê du cîhanên qirase ne, ku di şênberî de têne jiyîn. Ev herdu cîhan, bi rêwîtiyekê ku têde bi dirêjiya dîrokê, bi awayê dijberiyên diyalektîk, carna bi hev re bi rengekî bêeman şer kirine û aşîtî jî di navbera wan de ne kêm bûne, di roja me ya îro de jî bi şêweyeke dirûv, bi têkilî û nakokiyên xwe ve, carna şer dikin û carna jî aştiyê çêdikin. Bê gûman wê encam ji alî yên ku ji aloziya pêkhateyî ya sîstemîk a heyî, derketina rast, baş û xweş, weke entelektuel (rewşenbîrî), polîtîk (siyasî) û etîk(exlaqî) bikin ve were destnîşankirin.

**D-Bîrdoziya Cihû, Kapîtalîzm û Modernîte**

Eger çîroka Îbraniyan a di dîrokê û roja me ya îro de bi rengekî rast neyê têgihîştin, vegotineke tam a pêşketina civaka-dîrokî zor e. Nirxandina Îbraniyan di dîrokê de û ya Cihûyan ber bi roja me ya îro ve, weke komcivakeke etnîkî yan jî netewî, kêmasiyên mezin di xwe de werdigire. Pirr girîng e ku mirov wan weke çavkaniyeke bingehîn a çandî binirxîne, ku ji koka Rojhilata Navîn e, lê tevahiya cîhanê pêwendîdar dike û bandora xwe lê dike. Ez ne di wateya teng de qala çandê dikim; lê weke yekûna çanda daringî/madî û arişî/manewî digirim dest. Pêwîst e mirov ji du şaşîtiyên mezin ên di derbarê vê mijarê de xwe dûr bide: ya yekemîn; ew feraseta ku Cihûtiyê, weke hêza ku cîhanê birêve dibe, dinitrîne û wê dihomîne (pîroz dike). Ew bêjeya 'netewa bijartî ji alî xweda ve' jî di vê wergiriyê de ye. Mirov çiqas xwe dûr bide ji van cûre nitranan, ku pirr guncav in ji bo kedxwariyê, wê ewqas hêsan bibe ku vê mijarê bi rengekî rasteqîn were têgihîştin. A duyemîn: feraseta ku Cihûtiyê dike şeytan û serê guneyan. Dîtina Cihûtî weke çavkaniya tevahiya xirabiyan, nêrînek e ku pirr lê hatiye xebitîn. Mirov xwe dûr bihêle ji bandorên vê nêzîkatiyê, ku herî kêm bi qasî nitrana yekemîn mirov dibe têgihînên şaş, wê vê mijarê çêtir bike têgihîner.

Min di bergên din de hewl dabû ku ez Îbraniyan di hêlên cûrbecûr de, di wergiriya olên Îbrahîmî de, bidim xuyanîkirin. Lê niha ez ê hewl bidim ku nêrîna xwe ji aliyên wê yên dîtir ve gihîşti (xurt) bikim. Di bingeh de jî ez ê di hêla kapîtalîzm û moderniteyê de li ser pirsgirêka Cihûtî û Cihû rawestim.

Diaspora (belavbûna li rûyê erdê) ya Cihûyan, ku destpê kir, piştî ku Împaratoriya Roma di sala 70 P.Z. de cara duyemîn Perestgeh (Mabed)ê rûxand, hem li Rojhilata Navîn, hem li Ewrûpa û ber bi roja me ya îro ve jî li tevahiya cîhanê, rê li ber pirsgirêk û encamên mezin vekiriye. Di rastî de, beriya wê jî pirsgirêk û encamên dirûv hatibûn jiyîn. Koçberiya Hz. Îbrahîm ji Rihayê heya dorûberên Qudûsê, di hêla pirsgirêkên ku afirandiye û encamên wan de bandora xwe, weke mezinbûyî di asta cîhanê de, hîn jî didomîne. Her wisa, serpêhatiya kurên wî ya Misirê, bûyera Wusiv û koçberiya Mûsa jî, bûyerên wisa ne ku di asta cîhanê de bandora xwe hêştine. Wekî din berheva Pirtûka Pîroz, damezrîna yekemîn Qraltiya Îbranî ya berî ya din, koçber/sirgûnbûna bo Babîlê û têkiliyên ku di wê demê de bi Persan û Grekiyan re destpê kirin, rê li ber encamên girîng vekirine. Bandorên wan di dîroka şaristaniyê de xwedî ciyekî diyar e. Berheva Pirtûka Pîroz, bi serê xwe, bûyereke pirr mezin e; weke cûreyek e ku olên Îbrahîmî bikin fermî. Bûyîna xwedî Pirtûka Pîroz, bûyerek wisa ye ku bandora wê ya dîrokî pirr mezin e.

Lê, dîasporaya piştî sala 70 P.Z., xwedî bandorên pirr bikoktir e. Ez ê li vê derê dîrokê nenivîsînim, divê ez qîma xwe bi nirxandinên kurtikî bînim. Nêrîna ku bi gelemperî tê pejirandin ew e ku dîaspora û kombûna Cihûyan, weke Rojhilat û Rojava (Seferad û Aşkenaz), dibin du beş. Bandorên wan jî, girêdayî bi vê, cewaz bûne. Tê zanîn ku Cihûtiya Rojhilat belav bûye di serî de li

Sûrî, Îraq, Îran, qeraxên Hezar, Rûsya yên îroyîn û dibe ku paşê ber bi Asyaya Hundirîn ve belav bûbe; her wisa Cihû bi awayê koloniyên girîng jiyane. Lê, ber bi Rojava ve koçberî û kolonîbûnên wan, bi gelemperî di qadên serwerî yên Împaratoriya Roma de biberdewamî pêş ketine. Mirov rastî koçberî û kolonîbûnên wan tê, ji Efrîkaya Bakûr heya Ewrûpaya Rojhilat û ji Nîvgirava Îberîk heya Balkanan. Lê, Anatolya di xuyaniya navendê de ye ku têde veqetîna Rojhilat û Rojava pêk tê. Bandorên wan heya hilweşîna Roma, di hêla olîtî de, girîngî di xwe de werdigirin. Gûman jê nîne ku hem weke Mûsawîtî û hem jî weke Xirîstyanî, zayî ji Mûsawîtiyê, xwedî bandoreke pêşeng in. Weke cûreyek împaratoriya arişî ya wê serdemê ava kirine.

Elbet, mijara lêkolîneke dirêj e bê ka Cihû çawa bi pere re ketine têkiliyê û çawa pere, heman biqasî bandora arişî, kirine awayê hêzeke bandorker a daringî. Lê, misoger e ku eger ya yekemîn ji mijarên ku weke stratejîk li ser xebitîne, ol, wêje û zanist be, ku wana bi giranî çanda arişî ne, duyemîn mijara wan a stratejîk a xebat û qezencê jî pere ye. Ji ber ku di dîrokê de, ya yekemîn çanda arişî û ya duyemîn jî çanda daringî kirine mijarên stratejîk, pirr girîng in. Yên ku hîn wê demê di van herdu mijaran de pêşengiyê bidest xistibana, dihat wateya ku di dîroka cîhanê de girîngiya stratejîk werdigirtin. Rawêja min ew e ku Cihû di van sedsalan de di van herdu mijaran de jî di ferqa kûraniya pêşengiya stratejîk de bûne û ji bo vê xebitîne. Sedemên bingehîn ên vê yekê, mercên şênber in ku têde dijîn. Hindikiya şêniya wan, jiyîna wan a di pencika berdewamî ya herdu şaristaniyan de ku kokên wan Rojhilat û Rojava ne, û xwe zanîna wan wek ‘bendeyên bijartî yên xweda’(em bi serweriyeke tûj a bîrdozî re rûbirû ne), [van pêkeran] ew neçar kirine ku di nava lêgerîna berdewamî ya stratejîk de bin. Hindikiya şêniyê, koçberî, baweriya wan a pîroz û mayîna wan a di bin gefa berdewamî ya nijadkujiyê de, hem wan pirr zana kirinê û hem jî wan neçar kirine ku bi berdewamî ‘stratejiyên rizgariyê’(çiqas jî didirûve/dişibe stratejiyên şoreşger ên rizgariyê!) pêş bixin. Şêwaza wan a jiyanê li wan ferz dike ku bi rengekî stratejîk bihizirin û emrazên rizgariyê pêş bixin. Nexwe, wê qet zor nebe ku tune bibin û biqedin, weke hatiye serê bi hezaran qebîleyên ji wan pê ve.

Di vê xalê de rewşeke berdewamî ya berxwedanê, dibe tekane rêya rizgariyê. Û berxwedan jî misoger du tiştan pêwîst dike: Bawerî û emrazên daringî. Dema ku bawerî xwe weke hêmana arişî ya stratejîk diteyisîne, pere jî xwe weke hêmana daringî ya stratejîk diteyisîne. Lewre, rola stratejîk a olê, weke hêmana arişî, û rola stratejîk a pere, weke hêmana daringî, ku girîngiya wan a mezin di Cihûtiyê de heye, dibin du çavkaniyên serekîn ên jêveneger ku di armanca rizgariyê de biyek dibin. Eger em bigerin li bersiva pirsa ka çima li gel Cihuyan serweriya pere û ol-wate heye, bersiv diyar e: ji ber ku çareyeke wan a dîtir tine ye. Şêwaza wan a jiyanê berxwedana berdewamî pêwîst dike. Ev şert e ji bo ku tune nebin û di wesfa raser de bijîn (ji ber bawer dikin ku bendeyên bijartî yên xweda ne). Û berxwedan jî hunerekî zor e ku were domandin, eger stratejiyên pêşengî (pêşengiya bîrdozî) û pere (pêşengiya daringî), weke derfeta daringî ya stratejîk, nebin. Ji bo vê, yan hûnê li çolê (mîna Ereban) bin, yan jî hûnê li çiya (mîna Kurdan) bin. Li cem Cihûyan herdu jî [çol û çiya] nînin. Jê pê ve, dimîne derfeta bîrdozî û daringî.

Rola hundirîn a Xirîstyanan di hilweşandina Roma de, di gel ku hîn jî tê gotûbêjkirin, misoger e. Dema koka Cihû ya Hz. Îsa, ku yekemîn Xirîstyan e, were girtin ber çavan, rola, bi tevahî jî nebe, baskekî Cihû di hilweşandina Roma de bêgotûbêj e. Tê wateya ku tola herdu perestgehan (mabed, anku perestgeh, bi cûreyek tê wateya Qudûs, paytexta Cihûyan), ku hatibûn rûxandin, hatiye hilanîn. Bi ser de, wê bêgerew (bêbersiv) nemana jêkirina serê Ezîz Paûl li Roma (li Tarsûsê

jidayîk bûye û yek ji yekemîn Xirîstyanan e; her wisa yek ji kesên sereke ye ku doktrîna Xirîstyaniyê rêkûpêk kiriye). Bi hezaran Xirîstyan di çarmîxê re hatin derbaskirin, ew bi şeran dane xwarin û hatin tunekirin; vana weke perçeyek ji berxwedana wan bûn. Anku wê yekêmîn pêngava serkeftî ya dîaspora, bi bikaranîna Xirîstyaniyê re, weke hêza arişî ya stratejîk, pêk were. Mirov dikare bi hêsanî berpêş/îdea bike ku rûxandina ji hundir ve ya Roma, encama weke objektîv, yekemîn pêngava mezin a arişî ya stratejîk a dîasporaya Cihûyan e. Bê gûman, êrîşên qebîleyên Germen, Hûn û Frank ên li Ewrûpa jî di vê de pirr bandorker in. Lê dîsa jî pêkerên hundirîn destnîşankar in.

Pêngava Cihûtiya Rojava ya piştî Roma, wê bi damezrîna bajaran (Yekemîn Şoreşa Ewrupa ji sedsala 10. P.Z. û pê ve) û bi pêşketina bazarê ya li derdora wan, di warê daringî de pêş bikeve. Pêşketina têkiliya meta-pere-bazirganî, wê hêza duyemîn pêngava stratejîk, anku rola stratejîk a pere, bide Cihûyan. Serweriya pere tê wateya ku mirov di rêveberiya bajaran de, lewre di rêveberiya dewletên nû de, ku hildihatin bibe nîv bi nîv xwedî rol. Ji xwe fetha arişî (Xirîstyankirin) ya Ewrûpa ji sedsala 10. û pê ve temam bûye. Ev feth, wê bi aliyên xwe yên erênî û neyînî, bi rengekî neyêkser pirr bandora xwe li ser Cihûyan bike. Aliyê wê yê erênî ew e ku olekê Îbrahîmî Ewrûpayê feth kiriye; lê aliyê wê yê neyînî ew e ku Mûsawîtî, weke olekê teng a qebîleyî (olekê bijartî ya Cihû) herku çûye hatiye tepisandin. Ewrûpaya sekular û qebîle, wê bêje ku sedema gelek pirsgirêk û aloziyên ku heya [dema] Hîtler û roja me ya îro jiyaye, ji ber bandora hêza arişî ya Mûsawîtî û ya hêza pere ya Cihûtî ye. Biryara ragirtina Cihûyan yekemîn car li ‘getto’yan, a di sala 1179 de ji alî Konseya Xirîstyanî ya Katolîk ve, encama vê bandorê ye.

Cihûtî weke hêza stratejîk a hem bîrdozî û hem jî daringî ya Ewrûpa (Rûsya jî têde) ji sedsala 10. û pê ve di nava pêşketina berdewamî de ye. Zengînek û rewşenbîrekî her bajarekî, teqez Cihû ye. Bivênevê, ev rewş rê li ber dexesiyan, nakokiyan û pevçûnên mezin vedike. Gettoyên yekemîn (taxên girtî), nîşana wan bûyeran in ku wê pişt re rû bidin/biqewimin. Cihûtî wê li hemberî van rewşên nû jî, strateji û taktîkên nû pêş bixe. Ya yekemîn tevgera abal (çerixîn) e, û ya duyemîn tevgera ‘sekular-laîk’e. Herdu jî tevgerên wisa ne ku wê encamên wan ên mezin çêbibin. Cihû wê bi van herdu pêngavên nû yên stratejîk, ji çaxa navîn bi serkeftî derkevin. Pêwîst e neyê jibîrkirin ku zivirîn/veger ji ola berê, pêngaveke stratejîk e ku yekem car Îbrahîm û Mûsa jî ew pêk anîn. Mirov bihêsanî dikare vê pêngavê weke gaveke arişî ya stratejîk binirxîne.

Locayên Mason, ku ji alî hosteyên avasazî yên Cihû ve di çaxa navîn de hatin damezrandin, dikare werin hizirîn weke yekemîn tevgera sekular-laîk. Û fîlozof Spînoza wê li Amsterdamê, ku yek ji perestgehên destpêkê yên moderniteya kapîtalîst e, bibe pêşengê yekemîn pêngava mezin a felsefî ya sekular-laîk. Laîktî, yek ji mijarên gotûbêjên kûr e li welatên ku weke Îslam têne binavkirin (çawa ku ez binavkirinên bi awayê ‘civaka yan jî welatê kapîtalîst û sosyalîst’ weke propaganda dibînim; binavkirinên welatan bi awayê ‘laîk’, ‘Îslam’, ‘Xirîstyan’ û ‘Bûdîst’ jî weke ku bi heman armancê ne, dinirxînim; her wisa wesfandinên ku derbarê civakan de têne kirin bi awayê ‘civaka ku exlaqî û polîtîk e û nîne’, bêhtir rasteqîn dibînim), di serî de jî li Tirkiyê. Erkekî erênî yê laîktî weke dûrketin ji dogmayên olî û azadbûn, di wateya sekularbûn (dinyawîbûn/cîhanîbûn) de heye.Lê, dibe ku laîktî bi xwe, weke cemsereke dijber, bilez bibe dogma, dema ku di wateya laîsîzm/laîkperestî de were bikaranîn. Divê ez bi girîngî diyar bikim ku zêde cewaziya laîsîzma di vê wateyê de ji olperestiyên din namîne. Wekî din, herku dijberiya li hemberî Cihûyan pêşbikeve, wê abaltî jî bilez bibe. Berî dewamkirina li ser rewşa Cihûtiyê ya di pêvajoya dewlet-netew de, wê

pêwîst bike ku ez qala tiştên ku di vî milî de li Rojhilata Navîn û Rojhilat jî bûne û rû dane/qewimîne bikim, ji ber ku gelek bandorkar û balkêş in.

Heya Îslamiyetê, têkiliyên baş ên Cihûtiyê bi Dewleta Sasanî ya Pars/Fars re hene. Tê têgihîştin ku di serayan de bandora wan mezin e. Tê zanîn ku yekemîn pêxembera jin bi navê Ester, di serayên Sasaniyan de xwedî roleke mezin e. Ciyê wê di Pirtûka Pîroz de jî heye. Şîmaneyêke mezin e ku hem di karûbarên bazirganî û pere yên împaratoriyê de û hem jî di pêşketinên wê yên bîrdozî de, xwedî şûngeheke bihêz bin. Her wisa di vê de rizgarkirina Cihûyan ji Nabokadnezar, Serwerê Babîlê, di dema koçberbûna wan a Babîlê de (596-546 B.Z..) ji alî Kuros damezrînerê Persan ve bandoreke xurt a kevneşopî çêkiriye. Cihûtî li qada Îranê bi dirêjiya dîrokê herdem bûye hêzek ku mirov nikare wê piçûk bibîne. Cihûtî ciyekî tim girîng di dîrokê de girtiye, bi rengekî dirûv, li Erebîstan, Efrîkaya Bakûr, heta li Hebeşistana Efrîkaya Rojhilat. Nikare were piçûkxistin bandora wan a di tevahiya pêşketinên çandî yên daringî û arişî de.

Cihû, weke komeke olî ya bazirganî, di heyama derketina Îslamiyetê de li Erebîstanê di rêza pêş de bûn. Di eraziyên berdar de xwedî mulk bûn. Wer tê têgihîştin ku ji komên sereke yên binekoka wan Semîtîk bûn ku bûbûn Ereb. Rewşeke dirûv a Suryaniyan jî mijara gotinê ye.

Ereb, di wateyek de, bi pêngava Îslamê re, dixwestin ku li şûna yekdestiya Cihû yekdestiya xwe ya bazirganî û desthilatî damezrînin. Bandorbûyîna pirr zêde ya Îslamiyet ji Cihûtiyê vêya piştrast dike. Mirov dikare vê rewşê bidirûvîne damezrîna dewlet-netewa di moderniteya kapîtalîst de. Ereb bi Îslamê bersiv didin moderniteya çaxa navîn. Di bingeha nakokiyên wan ên bîrdozî û daringî yên bi Cihûyan û Cihûtiyê re, ev rastî heye. Pêwîst e bê diyarkirin ku di derketina Îslamiyetê de rehenda çînî jî bi qasî rehenda etnîkî rol dilîze.

Li hemberî belavbûna bilez a Îslamê û şkandina wê ya bi rengekî tund yekemîn berxwedanên Cihûyann, ketibûn rewşeke wisa mîna ku bi duyemîn felaketeke Roma re rûbirû mabin. Du rê le pêşiya wan hebûn: yan dîsa koçberbûyîn, yan jî ‘abalîtî’. Dikare were rawêj/texmînkirin ku beşek ji wan xwe penihîbin (îltîca kiribin) li Îranê, Efrîkaya Bakûr û Anatolya. Gelek nimûne hene ku beşeke girîng a ji wana jî, di dîmen de Îslamiyetê pejirandine, lê ‘teqiyegerî’ kirine, di wateya nepejirandinê de, anku ketine nava meyla abalê (çerixînê). Mirov dikare bihêz rawêj/texmîn bike rola abalan di gelek serhildan û mezheban de yên ku li hemberî desthilatiyên Ereb ên Sûnî yên şoven hatin pêşxistin. Hêjayî lêkolînê ye para Cihûyan di [pêşxistina] gelek bizavên dijber ên ku koka wan bi taybetî Îran û Mezopotamya ye.

Pêşketina wan a herî cidî jî Dewleta Cihû ya Tirk a Hazara bû, ku li rex peravên bakûrê Deryaya Hazar, di beşekê Tirkmenistan û Azerbaycana îroyîn de, damezrandin. Tê vegotin ku Selçûk Beg, yekemîn bapîrê Selçûkiyan, di vê dewletê de di asta fermandarekî de bûye. Navên her çar kurên wî jî navên Cihû bi xwe bûne û ev jî vê vegotinê bihêz dike. Eger ev rast be, nikare were piçûkdîtin rola Cihûyan di tevgera Selçukiyan de jî, heman weke rola wan a  di gelek tevgeran de, yên ku li hemberî sultaniyên Ereb li ser Îranê hatin pêşxistin. Eve mijareke pirr girîng e ku pêwîst e were lêkolîn. Anatolya, hin di çaxa yekemîn de navendeke cidî ya Cihûtiyê bû. Cihû jî bi qasî Grekiyan di damezrîna gelek bajaran de cî digirtin. Di navbera wan de hemberî/reqabet heye. Kevneşopî ye ku Cihûyên li Rojava û Erebîstanê diketin tengezariyê, li Anatolya kom dibûn. Dikare di nava vê perspektîva dîrokî de baştir bê têgihîştin ku Anatolyayê, ji ber vê sedemê, weke duyemîn

niştimana xwe ya dayîk, piştî Îsraîlê, nirxandine. Anatolya, bi ser de, di şûngeha bazareke xurt a pere û bazirganî û tevgerên bîrdozî de bû, ku di vê de rola Cihûyan nikare were piçûkdîtin.

Tê zanîn ku Cihû, di ser Îspanya re di salên 1391, 1492 û 1550 de pêl bi pêl xwe li Anatolya bicî kirine. Dema mirov giraniya wan a di sultantiyên Selçûkî û Osmaniyan de bide ber çavan, wê karibe baştir bê têgihîştin ka di vê yekê de çiqas ciyekî bikok dagirtine. Wekî din, girseyeke mezin a misilman a abal jî çêbûbû. Sabetaygirî (tevgera xurt a abal ku koka wê Îzmîr û Manîsa ye) ji salên 1650 û pê ve, roleke pirr girîng dileyîst. Bandora vana ya di polîtîkayên pere û maliyê yên Osmaniyan de tê zanîn. Belkî jî di rola mamosteyan de bûn ku girîngiya pere û bazirganiyê didan têgihandin. Tevî ku car caran guherana mal û nakokiyên cidî dihatin jiyîn, rola wan a di tesfiyekirin û destnîşankirina gelek sultanan de nikare were înkarkirin.

Wer tê têgihîştin ku abalîtî bûye sêyemîn pêngava stratejîk a Cihûtiyê, ji bo li ser piyan bimînin. Eger ji diyardeya abalîtiyê nebûya, wê nekarîbûna hebûna xwe ne da nava pirraniya Îslam a Rojhilat de û ne jî di nava pirraniya Xirîstyan a Rojava de bidana berdewamkirin. Divê abalîtî weke stratejiyeke jiyanê were têgihîştin. Heya ku dogmatîzma olî azadiya derbiranê nepejirîne, bivênevê wê meylên çerxîner û abalîtî, weke di bîrdoziyên dirûv de, hebin. Cihû, bi van hersê stratejiyên girîng, bi ser dikevin ku ji çaxa navîn, bêyî ku bi tevahî tune bibin, derbikevin.

Pêwîst e mirov, tenê di hêla berjewendiya daringî de, li pere nenêre; ji ber bi saya hêza ku dide, misoger dike ku jiyana xwe damezrînin û bidomînin. Her wisa bi saya çêkirina wan a hêza bîrdozî, bi ser dikevin ku, bi rêbazên arişî, hem bandorker bibin û hem jî li jiyanê bimînin. Pirrbûna hejmara rewşenbîr, nivîskar, ramannas û bîrdozgerên mezin ên di nava Cihûyan de, ji nêz ve pêwendîdar e bi vê rewşa wan a serokatiya arişî re, ku bi dirêjiya dîrokê pêdiviya wan pê hebûye. Dîsa, pêşxistina wan a gelek tevgerên olî, felsefî û zanistî, ji ber pêdiviya jêveneger a stratejiya wan a jiyanê ye.

Û stratejiya abalîtî jî, wê girîngiya xwe ya bingehîn di çaxa dewlet-netewan de nîşan bide. Îngilistan weke yekemîn dewlet-netew, di girîngiya kilît de ye ji bo wê mijarê were têgihîştin. Qralên Îspanya û Fransa, ku du hêzên mezin bûn ku koçberî û komkujiyan disepandin hem li Xirîstyanên Protestan ku koka wan Katolîk e û hem jî li Cihûyan, di nava hewldanên mezin de bûn sedsala di sedsala 16. de ji bo hem Îngilistanê li Ewrûpa bêbandor bikirana û hem jî pêşî li derketina wê bigirtana. Cihû di vê sedsalê de (sedsala 16. ), tevî ku di nava têkiliyên pirr xurt de bûn di navbera Îzmîr-Anatolya, Amsterdam-Holanda û London-Îngilistan ê de, ku deverên ewle bûn ji bo wan (xebatên ji bo çêkirina peymanan heye di navbera herdu hêzan de) herku biçûya wê Londonê ji xwe re weke baregeh bijartibana. London, ji wê rojê heya îro, wê vê şûngeha xwe berdewam kiriba.

Tê zanîn ku di vê sedsalê de dewlet-netewa Îngilîs hate avakirin. Dewlet-netew, weke tê zanîn, tê wateya ku, ne tenê kadroyên dewletê, lê tevahiya hemwelatiyan û kadroyên dewletê bîrdoziyeke hevbeş (heman weke olê) parve bikin û temamê civakê were hesibandin weke endam û hemwelatiya dewletê. Ji xwe ev taybetmendî, pêşxistina taybetmendiya qebîleya Îbranî ye, ku ji destpêkê ve di xwe de werdigire, ya pêşî weke qewm û paşê jî weke dewlet-netew. Qebîle û qewma Îbranî, herî dawî jî netewa wê, hem di warê etnîkî de û hem jî di warê olî de, yekpare ye. Hîn rasttir, etnîkî di heman demê de olîtî ye û olîtî jî etnîkî ye. Wekî din, di armanca hevbeş de dibin yek, bêyî nêrîna li cûdatiya yên rêve dibin û yên têne rêvebirin. Di rastî de dewletperestiya netewî weke versiyoneke pêşxistî ya bîrdoziya qebîleya Îbranî, şêweyeke wê ye ku, li tevahiya qewm û netewen

ji bilî xwe hatiye ferzkirin, guncandin û di guheranê re hatiye derbaskirin (ev şîroveya min a takekesî ye û ez wê pirr girîng dibînim).

Xwe rêxistinkirina dewleta kapîtalîst a nûjen di şêwaza Îbraniyan û Cihûyan (di roja me ya îro de di şêwaza Îsraîliyan) de, xwe weke dewlet-netew dide xuyanîkirin. A girîngtir jî ew e ku dendika her dewlet-netew, ne di wateya nijadî de, lê di wateya bîrdozî de di karakterê Siyonîst ê Cihû (dewletperestiya- netew a Cihû) de ye. Dewlet-netew, weke modêl, şêweya dewletê ye ku Cihûtî wê di modernîteya kapîtalîst de werdigire. Verner Sombart dema ku kapîtalîzmê weke berhema Cihûtîperestiyê hesibandiye, belkî jî zêde pêş de çûye. Eger ez şaş nebim, Colînwood, felsefevanê mezin ê Îngilîs ê li ser dîrokê, dema netewperestiya dewlet-netewê pênase dike, dibêje ku gerdûnewerî (dikare bê gotin her wisa bîrdozî) ya Cihû gihîştiye serkeftinê; lê dema diyar dike ku vê yekê serkeftineke wisa ye ku di kesayetiya nijadkujerê xwe de qezenc kiriye, bi raya min, xwestiye rastiyekê derbibirre. Dewlet-netew serkeftin bidest xistiye û di bingeha vê de bîrdozî (qebîleperestî, netewperestî û siyonîzm) ya Cihû heye. Lê di encam de nijadkujerê xwe jî bi xwe re afirandiye. Di rastî de ev tespît girîng e, ji ber taybetmendiyeke gelemperî rave dike. Her netewperestî siyonîst e. Netewperestiya Ereb jî di vê rêvşê de siyonîst e. Wê şaş nebe ku mirov tevahiya netewperestiyan, ên Filistîn, Tirk, Kurd, Şîaya Îran û wekî vana, pênase bike weke şêweyên bîrdoziya Cihû, ku di serî de ji alî yekdestiyên netewegir ve têne sepandin. Ji xwe eger netewperestiyên dewlet-netewên Îngilîs û Holanda bêne lêkolîn, wê bi rengekî kartêker bê dîtin ku di pêşketina wan de yekdestiyên Cihû weke pere-sermaye, ne tenê weke teorîk, lê weke şênber jî, rola mezin leyistine.

Pêwîst e vê yekê weke komplo, yan jî weke niyeta xirab neyê dîtin. Cihû, weke bazirgan û bankerên ku sermayeyê herî zêde di bin destên xwe de kom dikin, di avabûna her dewlet-netewan de mezintirîn qadên veberhênan û penihîn/strînê bidest dixistin. Dewlet-netew rê vedikir ku sermayeya Cihû wek aşûtê mezin bibe. Verner Sombart dikaribû bêhtir rasteqîn bûbûya, eger teoriya xwe bi vî rengî rave kiriba. Sermayeya Cihû, dema ku di asta cîhanê de mezin dibû, elbet wê dijberê xwe jî hilberandiba. Her wisa nakokiyên roja me ya îro yên yekdestiyên netewan û yekdestiya ser-netewan çavkaniya xwe ji vê rastiyê digirin. Bi eşkereyî tê têgihîştin ku danehevkarên sermaye yên Cihû, bi girtina herdem li ber çavan tengezariyên xwe yên di dîrokê de, dema xizmetekê dîrokî dikirin ji pêkhateyên dewlet-netewan re li ser bingeha xeta xwe ya kevneşopî ya bîrdozî, di heman demê de bingehên nijadkujiyê, weke objektîv, dadianîn li ser komcivakên Cihûyan, ku haya wan ji vê yekê tinebû û pêwîst e ji vê rewşê berpirsyar neyên girtin. Hinekî mînaka Hz. Îsa û Yehûda Îskaryot glîkarê wî, tîne bîra mirov. Cihû, ku bi dirêjiya nêzî sê sed salan ji bo pêşxistina dewlet-netewa Alman çanda xwe ya daringî û arişî seferber kirin, (Bîrdoziya Alman tewş nedirûvî bîrdoziya Cihû) heya dema Hîtler, netewperestên herî tund ên Alman bûn. Netewperestên herî xurt ên Siyonîst, di heman demê de, ji gelek hêlan ve, nûnerên xurt ên netewperestiya Alman jî bûn. Mirov dikare gelek mînakên dirûv (bi taybetî di şênberiya Rûsya û Osmanî-Tirkiyê de) pêşkêş bike. Gerdûnewerî (netewperestî-pozîtîvîzm-olperestî) ya Cihû, ku Colînwood ew destnîşan dike, serkeftin qezenc kiriye. Lê ne tenê nijadkujiya li ser Cihûyan, di heman demê de tevahiya nijadkujerên fizîkî û çandî yên li cîhanê jî bi xwe re afirandiye.

Pêwîst e ji nêzîktir ve bê dîtin vê mijarê, ji ber girîngiya wê:

Cihûtî, belkî jî yek ji yekemîn nimûneyên nasnameyên civaka-dîrokî ye ku, weke bîrdozî, taybetmendiyên etnîkî û olî ketine nava hevdu. Vê taybetmendiya xwe ji Hz. Îbrahîm heya roja me ya îro diparêze. Dema baweriya 'qewmê bijartî' jî lê tê zêdekirin, xwe dîtina wan bi ser tevahiya civakan re, weke sêyemîn taybetmendiya girîng a bîrdoziya wan xuya dike. Ev feraseta raserî bi dirêjiya dîrokê, wê potansiyelê tim di xwe de guhastiye ku wan bi civakên din re rûbirû bihêle û rê li ber pevçûnan jî vekiriye, ku bi pirranî gihîştine heya nijadkujiyan.

Cihûtî, vê taybetmendiya xwe ya civakekê bîrdozî tim parastiye, ku girêdayî bi vê nakokiyê re pêş ketiye. Weke xwezayî, neçar maye ku stratejiyên xwe parastinê û navgînên wan ên taktîkî pêş bixe. Stratejiyên parastinê, weke pêdiviya pêkhateya wan, divê weke teorîk û bîrdozî bêne pêşxistin. Û navgînên taktîkî, bêhtir bi hêza daringî re pêwendîdar in. Di serê vana de hêza çekan û pere tên. Dema ku pere bi rêya bazirganî û bankeriyê tê bidestxistin, çek bêhtir bi nûjeniyên teknîkê hatine pêşxistin. Hêza Cihûyan di herdu qadan de jî tê zanîn û hatiye îspatkirin. Di vê mijarê de, em çaxên yekemîn û navîn li milekî bihêlin, dema çaxa nû, anku çaxa me ya nûjen pêşdiket, bê gûman wê di nava pêwendî û têkiliya nêzîk a Cihûtiyê de bûya, weke gelekî herî rêxistî û xwedî-ezmûn di asta cîhanê de. Dema hilhatina serwerî ya sîstema-cîhanê ya kapîtalîst ji sedsala 16. û pê ve binavenda Ewrûpaya Rojava, bi taybetî binavenda Amsterdam-Holanda û London-Îngilistan pêşdiket, wê hêza malî û bîrdozî ya Cihû, ku weke stratejîk di rewşeke bihêz de bû, di vê de rola girîng bilîsta. Yên ku wê demê ji nêz ve lêbikolin, wê zoriyê nekişînin ku vêya tespît bikin.

Eger were diyarkirin ku kapîtalîzm ji alî Cihûtiyê ve hatiye nûvedan (V. Sombart), dibe ku nitrandî be; lê nikare were înkarkirin ku rola wan a têde ku bûye sîstem û serwerî wergirtiye, pirr girîng e. Diyardeyek e ku hemû lêgerîn destnîşan dikin ku bazirgan û bankerên Cihû li bazar, borsa û fûarên tevahiya bajarên girîng, di serî de li London û Amsterdamê, hespên xwe dibezînin. Sedema ku siyaseta-aborî (ekonomî-polîtîk) di vê mijarê de bêdeng dimîne û ji nedîtî ve tê, bi rola korkirina bîrdoziyê re pêwendîdar e. Nelêxebitîna zêde jêderka etnîk û netew a daneheva sermaye di nirxandinên di mijara siyaseta-aborî de, di serî de di yên di Kapîtal a Marks de jî tê de, hem kêmasiyeke pirr pirr girîng e û hem jî mirov xeylî dide hizirandin. Ew çîvanoka "ol, îman û netewa sermaye tine ye", şaş e. Ji ber girêdaneke pirr tund a sermaye bi ol, îman û netew re heye. Elbet, dema hin kesên xwedî ol, îman û netew gelek yekdestiyên sermaye û desthilatiyê pêk tînin, li hemberî vê, pirranî têne mêtingehkirin. Nimûneya herî tazî DYE ya roja me ya îro ye. Nikare bê înkarkirin ku herî zêde sermayedar, hem weke ol, hem weke îman û hem jî weke netew, ji wê derê ne.

Rola Cihûtî ya di avasaziya sanayîgerî (endustriyalîzm) û dewlet-netew de jî bêgotûbêj e, ku herdu lingên din ên kapîtalîzmê, anku moderniteyê ne (moderniteya kapîtalîst). Bazirgan û bankerên Cihû, ku ji yekemîn şoreşa bajaran a Ewrûpa (1050-1350 P.Z..) û pê ve pêşketina xwe domandin, di heyama kapîtalîzma bazirganî ya sedsalên 15. û 18. de, bi awayê zêdetir xurtbûyî pêngav avetine. Li bajarên Rojhilat (Qehîre, Heleb, Şam, Îzmîr, Tebrîz, Antakya, Bexda, Îstembol û wekî vana) jî pêşketinên dirûv bidest xistine. Dema ku Şoreşa Sanayî weke qada herî kardar hate destnîşankirin, dereng nemane ku sermayeya mezin a di destên xwe de ramedînin/veguhêzînin qada sanayî. Zêde pêwîst nake ku vêya jî were ravekirin. Her ciyê ku kara wî zêde ye, ew cî ye ku li wê derê sermaye derbasî êrîşê dibe. Ma ne ev e, ew rêgeza ku jê re tê gotin 'zagona karê?'

Wê demê, mirov çawa dikare sivik bibîne rola sereke ya yekdestîperestiya sermayeya Cihû, ya hem bi mora kapîtalîzmê û hem weke modernîteya kapîtalîzma sanayî û girîngiya wê nekirpîne? Herçend ji vê re neyê gotin paşevajkirineke bizanebûn, lê dikare pirr bi hêsanî jê re bê gotin korîtiya bîrdozî. Bi ser de, ev rewş ji hêla Cihûtiyê ve ne tewanek e jî. Di her komcivakên netewî, olî û etnîkî de dikarin yekdestiyên bazirganî û sanayî çêbibin. A girîng li vê derê rola stratejîk a yekdestiyên Cihû yên bazirganî û sanayî ye. Fînans, ji xwe weke ebed-ezel di yekdestiya Cihû de hebûye. Siyaseta-aborî xwe dûr dide ji tehlîlkirina girêdana yekdestîperestiyên bazirganî, sanayî û malî (fînansî) bi bîrdozî re bi gelemperî (lîberalîzm ancax di nirxa propagandayê de dikare bibe mijara gotinê) û bi bîrdoziyên netewperest, olperest, zanistperest û zayendperest re bi taybetî, Sedema vê yekê, ne ji ber endîşeya wê ya bûyîna ‘objektîv’e ku îdea dike. Berevajî, nebûyîna objektîv pêwendîdar e bi nebûyîna zanisteke objektîv re ya tevahiya yekdestiyana, bi taybetî yekdestiyên desthilatî jî tê de, bi rêya veşartina nasnameyên xwe yên olperest, zayendperest û netewperest; her wisa pêwendîdar e bi wê yekê re ku rastiya şênber û jînbar di xalên wê yên jiyanî de vedişêrin û wê negirîng dikin. Dîsa pêwendîdar e bi wê yekê re ku bi vî awayî weke navgîneke propagandaya bîrdozî, û ne weke zanist, erka xwe pêk tînin.

Şûngeha stratejîk a Cihûyan di sîstema cîhanê ya serwerî ya çar sed salî de di yekdestiyên bazirganî, sanayî, malî, medyayî, rewşenbîrî û sermayeyî de hîn jî girîngiya xwe, weke bêhtir zêdebûyî, berdewam dike. Ta ku ev diyarde neyê tespîtkirin, wê gengaz nebe ku ti pirsgirêkên ne kûrevî û ne jî herêmî bi mafdarî bêne tehlîlirin (teorîk) û çareserkirin (pratîk).

Cihûtî, hem weke hêza bîrdozî ya stratejîk û hem weke hêza daringî ya stratejîk, di avakirina modernîte û dewlet-netew de di şûngeheke pirr zêdetir destnîşankar de ye. Dema ku bi navgîniya dewlet-netewê wesfa misoger kapîtalîst a modernîteyê derdixe holê û pêk tîne, modernîteyê jî bi dewlet-netewê, ku awayê yekbûyî yê yekdestiyên bazirganî, malî, sanayî û desthilatî ye, şênber dike û wê misoger dike. Cihûtî, elbet ne xwedayê dewlet-netewê ye. Lê, wê ji awayê wê yê di malzarokî de heya temenê wê yê îroyîn ê kalbûyî û riziyayî, ji çaxa xwe ya qebîle heya roja me ya îro, di qada xwe ya westatî/hostetî de pêş xistiye.

Ez qet rûmet nadim teoriyên li ser komployan. Tim îdea têne avêtin naverastê. Bi binavkirina Komeleyên Mason, ên veşartî ku Cîhanê rêvedibin, Civînên Bîlderberg, Konseya Daîmî ya ji 12 kesî, ku cîhanê rêve dibe, û aletbûna NY ya Cihû û bi wekî vana hewl tê dayîn ku mafdarî were dayîn bo van teoriyên li ser komployan. Digel ku îdeayên ku para rastiyê di vana de diguhêzin hebin jî, aliyên wan ên nitranê û awayên wan ên dogmatik û nebûyîna zanîstî, taybetmendiyên hevbeş ên van teoriyan in. Lê, rastî li holê ye. Şûjin di xirar de hilnayê. Raseriya Cihûtiyê di hersê lingên modernîteya kapîtalîst de jî bêgotûbêj e. Di hersê qadan de jî weke stratejîk, di wateya hêza bîrdozî û daringî de di şûngeha bandorker, heta bi pirranî, destnîşankar de ye. Divê mirov bala xwe bide wergiriya gotina min: Ez qala bandorkeriya wê ya di qada modernîteya kapîtalîst de dikim. Nexwe ez qala modernîteya demokratîk nakim, ku weke rastiya civaka-dîrokî zêdetir wergir e. Cihûtî di van modernîteyan de jî heye. Lê bi rengê ku ji hêza xwe ya stratejîk pirr tiştan hunda kiriye heye.

Beriya ku em qasekî şûndetir derbasî vê bibin, wê kêrhatî be ku em dewlet-netewê hinekî din tehlîl bikin. Bîrdoziya Cihû, di dema derketina ji çaxa navîn de hewldanên xwe yên bêbandorkirina dijberên xwe yên hem Xirîstyan û hem jî yên Misilman, di hêla stratejiyên xwe yên jiyanê de qet kêm nekiriye. Modêla dewlet-netew, hem xwedaperestiya netew, (Rab di Cihûtiyê de wateya

xwedayên netew de ye) ku di nava xwe de werdigire, û hem jî weke awayê kûrbûyî yê tevahiya yekdestiyên bazirganî, malî, sanayî, bîrdozî û desthilatî, bi rengê modêla stratejiya jiyanê ya herî guncav di gel vê mijarê derdikeve pêşiya me. Laîsizm a di dewlet-netew de di şûngeha Reb, Xwedayê Netewî yê Cihû de erk dibîne. Avakirina têgînên bi vî rengî ji alî Masontiya Cihû ve, pirr girîng e. Dewlet-netewa bi vî milê xwe ve û di vê wateyê de, navgîna herî girîng a rêveberiya gerdûnî ya Cihûtiyê ye. Yekdestiyên Cihûyan, li gel yekdestiyên ku koka wan Anglo-Sakson in, modêla dewlet-netewê weke navgîneke bandorker bikar anîne ji bo ku Împaratoriyên Fransa û Îspanya hilweşînin. Ji ber ku ev herdu hêz ji bo herdu hêzên din (Holanda û Îngilistan) xwedî planên mirinane bûn. Bi gefa komkujî û tesfiyebûyîna ji dîrokê re rûbirû bûn. Dewlet-netew, weke hêzeke yekdestî ya herî kûrbûyî, bûye modêlekê serkeftînê li hemberî yekdestîperestiyên Îspanya û Fransa, ku nekarîn bi vî rengî xwe birêxistin bikin û dixwestin bêhtir bi kevneşopên împaratorî yên mayî ji çaxa navîn, encam bigirin. I. Wallersteîn, dema di berhema xwe ya navdar a bi navê Sîstema Cîhanê de pêkera bingehîn a ku serdestiya Îngilistanê li hemberî Fransa destnîşan dike, weke sîstematîka dewlet-netew rave dike, girîngiya vê rastiyê diyar dike.

Dema Xanedaniya Habsbûrg a Awusturya tê hilweşandin, peyman, şêwegirtina dewlet-netewa Prûsya [weke merc] dide pêş. Yekîtiya Almanya ji serokatiya Awusturya tê derxistin û tê dayîn bo pêşikiya Prûsya. London dibe navenda her cûre dijberiyê (muxalefetê) li hemberî qralê ku di Şoreşa Fransa de dijminê wan ê kevneşopî bû. Rêxistina Mason di şoreşê de roleke girîng dilîze. Serê qral tê jêkirin. Tesfiyeyên dirûv di Şoreşên Îngilistan û Holanda de, yên beriya vê, têne jiyîn. Dema ku dewlet-netewa Prûsya weke hêzeke nû ya serwerî dixwaze di şûna Fransa de derkeve pêş, heman leyîstik li hemberî Prûsya tê lîstin. Tew Marks jî, weke dijber, li Londonê rûdine/dijî. Peyman îdeayên Almanya yên ji bo serweriyê, bi Yekemîn û Duyemîn Şerên Cîhanê ve, têk dibe. Sedema bingehîn a di nijadkujiya Cihû de, ku ji alî Hîtler ve hate pêkanîn, ew e ku sermayeya Cihû hêza xwe ya stratejîk bi sûda Îngilistanê bikar anî û bi vî rengî di têkçûna Almanan de roleke girîng leyîst. Heman peyman, bi şêwegirtinên nû, wê di şerê sar de îdeayên Rûsya jî, yên ji bo serweriyê, têk bibe. Bi vê rêveçûnê [eger wisa biçe], bila qet gûman jê neyê kirin ku, eger îdeaya Çînê ya ji bo serwerî bihejike, ku tê îdeakirin û ji bo niha rawêjî (ferazî)ya wê gelek tê kirin, şîmaneya mezin e ku heman dawiyê parve bike.

Zêdetirî du sed dewlet-netew di roja me ya îro de li NY, ku navenda wê bajarê New York e, têne nimandin/temsîlkirin. Tê zanîn ku NY di bin pêşengiya heman peymanê de tevdigere û herî kêm pesenda peymanê nebe, nikare tew yek biryarekê jî derbixe.

Divê ez dubare diyar bikim ku van du sed dewlet-netewan ji alî Siyonîzmê ve, yan jî ji alî hêzeke dîtir a Cihû ve, nayên rêvebirin. Lê her du sedên wan jî (dewlet-netewên Îran û Ereban jî tê de, ku can-dijminên wan in), bi paradîgmaya netewperest a Cihû hatine damezrandin û tayên wan, ev çarsed sal in ku di destê heman dendika peymanê de ne. Her çend di nava bijarteyên dewlet-netewan de qet Cihû tinebin jî, lê ji ber sedemên hem paradîgmatîk û hem yên tedbîrên şênber ên peymanê (anku weke teorîk û pratîk), qadên wan ên livîn/tevgerîna serbixwe, ta radeya dawî sînordar in. Karên ku bikin, ta ku guncav bin li gel qalibên kevneşopî yên bîrdozî û pêkhateyî yên modernîteya kapîtalîst a çar sed salî, pirsgirêk tine ye. Dikarin di rêya xwe de dewam bikin. Lê, eger bişemitin şûngeha, bi gotina G.W. Bûsh, ‘dewleta serhildêr’, wê dawiya her dewlet-netew bibe heman a Efxanîstan a Talîban, Îraq a Sedam û ya bi dehan nimûneyên wan ên di dîrokê de hene. Ev e ew diyardeya ku jê re tê gotin sîstema navnetewî û statukoya NY.

Tew Rûsyaya Sovyetan a heftê salî jî, ancax piştî ku guncana tam derbirrî li gel pêwîstiyên moderníteya kapîtalîst, wê demê dest bi yekparebûyîna wê ya bi sîstemê re hate kirin. Çîn hîn zûtir hate yekparekirin. Eşkere ye ku sîstem hêza xwe ji herdu hêzên stratejîk digire, ku ez ji serî ve hewl didim ku wan vebêjim. Di herduyan de jî Cihûtî, weke dîrokî û rojaneyî, di şûngeheke nêzî destnîşankariyê de ye. Hêmanên hêza bîrdozî yên stratejîk sanayiya çandê, sermayeya rewşenbîrî û medya ne. Naverokên wan netewperest, olperest, zanistperest û zayendperest in. Hêmanên hêza daringî yên stratejîk pêkhateyên yekdestî yên bazirganî, sanayî, malî û desthilatî ne. Peymanên navnetewî yên dewlet-netewan, weke sîstemên dewletan, pêkhateya fermî derdibirre. Pêwîst e mirov van qadên dêwane yên van herdu hêzên stratejîk bi xwe, têkel (tevlihev) neke bi dewletan re weke derbirrana/îfadeya fermî û bi sîstemên wan re.

Girîng e ku nirxandineke kurt jî, weke pêvek, di derbarê Cihûtiya Anatolya de were pêşkêşkirin. Di vê mijarê de min bi kurtasî qala çaxên yekemîn û navîn kiribû. Têkiliyên Selçûkî-Cihû û Grek-Cihû girîng in. Cihûyên Rojhilat di çaxa navîn de ji Endulus heya Asyaya Navîn belav bûne. Dewleta Cihû ya Tirk a Hazara berhema vê pêvajoyê ye. Abalîtî û Cihûtîperestiya eşkere li welatên Îslam nehatine qedexekirin; bi taybetî di qadên stratejîk ên desthilatî û dewletan de, bi hêzên xwe yên bîrdozî û daringî, bandorker in. Bazirganî û bankerî, ne di şûngeheke kêmtirî yên li Rojava de bûn.

Dema ku nakokiyên wan ên kevneşopî bi Xirîstyanan re (derbaskirina Îsa di çarmixê re û bûyîna Xirîstyanî baweriya fermî ya Rojava) veguherîn gettobûnê bi biryara Konseya Lateran a sala 1179 û sirgûn/koçberbûyînên wan ji Îspanya di salên 1391 û 1492 de bûn mijara gotinê, wê demê Cihû ji bo xwe bêhtir pêwîstî bi niştimanadayîk dîtin. Têgîna ‘welatê soza wî hatiye dayîn’ hîn jî zindî ye. Têkiliyên ku hîn di dema hilhatinê de bi derdorên saltanat ên Osmaniyan re danîn, wê encamên xwe yên erênî bidin. Dema ku bankerî û bazirganî ji bo Osmaniyan jî zêdetir girîng dibin, wê Cihûtî jî şûngeha xwe bihêz bike. Ji ber ku Osmaniyan li ser şêniya Xirîstyan desthilatiya xwe bi berdewamî belav kirin û pêş xistin, ev bû sedem ku Cihû, ku rewşa wan a li cîhana Xirîstyanî ya Rojava (yên Katolîk û Ortodoks) herku diçû tengav dibû, wê peymaneke dirûv a bi Îngilistanê re bi padişahên Osmaniyan re jî çêbikin. Nêrîna hevbeş ew e ku ev peyman di navbera salên 1550-1600 de xurt bûye. Di heman dîrokê de wê peymaneke dirûv were pêşxistin bi Holanda û Îngilistanê re, ku Protestan in. Têkiliya Cihû bi Protestanî, kapîtalîzm, dewlet-netew û moderníteyê re, mijareke girîng e ku hêjayî lêkolînê ye.

Paqijkirina Nîvgirava Îberîk a Îspanya ji Misilman û Mûsawiyan (heya salên 1600 temam dibe), pagijkirina Xirîstyanan ji Anatolya, weke pêngaveke dijber, tîne rojevê. Çarenûsa Rûman, Pontûsan, Ermeniyan û Suryaniyan, ku ji gelên herî kevnare yên dîrokê yên li Anatolya ne û dîrokekê wan a xurt a çanda daringî û arişî heye, lê zû bûne Xirîstyan, ji ber sedema vê rojevê, destpê dike ber bi berevajî ve dizivire [û trajedî bi ser wan de tê]. Nîvgiravên li herdu seriyên Deryaya Spî, hema weke ku bergirîdanê (mîsîlleme) li hevdu bikin, gav bi gav tesfiyeyên berhemberî pêk tînin. Duyemîn pêngava mezin a Cihûyan, piştî pêngava wan a navbera salên 1550-1600, bi Partiya Îtîhad û Terakî re tê jiyîn (di salên 1890 de; Kongreya Siyonîst di 1896 de di heman demê de tê damezrandin). Misoger e ku herî kêm baskekê Îtîhad û Terakî Cihû ye, ku navenda wê Selanîk e û di nava hev de pêşdikeve bi tevgera abalîtî re, ku ji Sabetay (ji salên 1650 û vir ve) tê. Netewgiriya ku ava dikin (Cohen, Wamberî) weke peyv ‘Tirk’ e, lê naveroka wê tijî ye bi Kurd, Arnawûd û Cihûyan, ku Mason in û abal in. Weke diyardeyeke sosyolojîk, zêde têkiliya wê bi

Tirkîtiyê re tine ye. Tirkîtiyeke bi tevahî siyasî mijara gotinê ye. Girîng e, her wisa, bandoreke Cihûyên Almanya û Îngilistanê, ku li ser wê pêşbazî dikin. Dîroka wê dirêj e û ciyê wê ne ev der e.

Di encam de, bi raya min, dema ku dîroka Cihûyan a li Almanya, sirgûnên ku jiyane û ezmûnên wan ên avakirina dewlet-netewan dibin yek bi hêzên wan ên stratejîk, bîrdozî û daringî re, hem di damezrandina Komara Tirkiyê de û hem di veguherandina wê ya bilez (dibe ku di salên 1926 de) bo dewlet-netew de roleke girîng dileyîzin. Heman weke wê rola ku di salên 1600 de li Holanda û Îngilistanê leyîstin. Eger veguherîna bilez a komarê bo dewlet-netew û hatina rojevê ya tesfiyebûna çandî, ya Kurdan û ya Îslama kevneşopî piştî tesfiyebûyîna Xirîstyaniya Anatolya (tesfiyebûyîna fizîkî jî ya Xirîstyanan mijara gotinê ye) tenê weke projeyeke Tirkan a bûyîna netew were pêşkêşkirin, wê şaşîtiyên mezin di xwe de wergire. Mijar zêdetir berfireh e û pêwendîdar e ji nêz ve bi pejirandina Cihûyan Anatolya weke niştimana dayîk a Cihû, beriya Îsaîlê. Tê zanîn ku ev mijar di nava Cihûyan de pirr hatiye gotûbêjkirin. Projeya Cihû ya bi navenda Selanîk yan jî Edirne, ku li Mistefa Kemal hatiye ferzkirin, mijarek e ku hatiye dapaçîn/sergirtin. Lê, gengaz e mirov diyar bike ku bi damezrîna Îsraîlê re, ev proje girîngiya xwe wenda kiriye. Lê, bala Cihûyan û Îsraîlê li ser Anatolya û Komara Tirkiye hîn jî stratejîk e.

Şûngeha Mistefa Kemal Atatirk di avabûna Komara Tirkiyê de bêgotûbêj e. Lê, xwedakirina wî, tevî dijberiya wî, sêwiraneke bîrdozî ya Cihû ye, weke bi dirêjiya dîrokê vê yekê li gelek deveran kirine. Di gerdûneweriya Cihû de (Levhî Mehfûz, çarenûs/qeder, zagonerî, misogerî/determînîzm, pêşveçûnerî; awayê sêwirîkariya Sumer a xweda yê veguherandî bo olên yek-xwedayî), bûyîna xwedayîtî têgînek e ku pirr hatiye pêşxistin û sepandin. Wan têgînkirinên heşmendî yên weke her cûre utopyayên wêyeyî, çaxa zêrîn, teori, rawejî (ferazî) û zagonên, ku hem jî alî pêxemberan ve û hem jî ji alî rewşenbîran ve di dema modernîteyê de hatine pêşxistin, pêwendîdarin in ji nêz ve bi vê kevneşopê re. Heya bi awayekî rast neyê tehlîlkirin ku dogmayên kûr ên serwerî yên sekular-laîk ên xwedayî yên bi vî rengî li ser Tirkan jî, weke li ser tevahiya gelên Rojhilata Navîn ava kirine, wê kêm bimîne û zor be ku mirov herêmê têbigihîje.

Elbet, hêzên daringî/madî jî yên Cihûyan di girîngiya stratejîk de bûn. Ez bawer dikim ku M. Kemal radestî vê meylê nebûye. Lê tevî ku pirr xwendiye û lêkolaye (tewş nîne ku heya Sumer û Hîtîtyên daketiye/xwendiye) jî, ez ne di wê baweriyê de me ku tam tehlîl kiribe. Ez gûman nakim ku xwestiye ku bibe komargirekî baş û her wisa xwestiye ku vêya, ne weke dewlet-netew, lê weke demokrasî were pêşxistin. Ne dij-Kund û dij-Îslam e jî, weke tê îdeakirin wisa ye. Le divê ez gûmanên xwe jî bi girîngî diyar bikim ku nekariye bidomîne wan nezîkatiyên xwe yên liberal di destpêkê de ji pirsgirêka îslam-laik re (laîktî, ancax di 1937 de dikeve makezagonê/destûrabingehîn) û ji pirsgirêka Kurd re; sedema vê jî ew bûye ku dora wî jî alî kadroyên abal ên Îtîhadgir ve bi tundî hatiye dorpêçkirin.

Berdewamkirina bu hemû leza xwe  wê pevçûna ji bo serweriyê, ku li ser Komara Tirkiyê hîn di salên 1926 de destpê kir, mijareke wisa ye ku, bi raya min, pêwîst e di rasterêya kêmasî û daxwaziya Mistefa Kemal Atatirk de neyê nirxandin. Delîl û nîşane zêdetir in di derbarê wê yekê de ku meyla wî bi xwe di rasterêya Komara Demokratîk de bûye. Ez bawer nakim ku pevçûna ji bo serweriya di rojên em tê de dijîn, bi serkeftineke tam a bi sûda yek ji aliyan bi dawî bibe. Ez dixwazim diyar bikim ku hêviyên min zêde bûne di derbarê wê yekê de ku li axên Anatolya, ku ez bawer dikim xwedî kevneşopeke pirr mezin a demokratîk in, wê ve carê pêngava ji bo Komara

Demokratîk hêz û serkeftin qezenc bike. Ez hevî dikim ku sedema rastîn a têkoşîna serwerî ya li ser Anatolya û Tirkiyê, di beşa Rojhilata Navîn a parêznameya xwe de pêşkêş bikim, ku ez wê weke bergekê cûda dihizirim.

Wê kêm bimîne û şaş be ku mirov Cihûtiyê, tenê di hêlên kapîtalîzm, modernîte û dewlet-netew de bihizire. Her wisa bandora wê ya girîng li ser modernîteya demokratîk jî çêbûye. Her çend bi qasî baska desthilatdar û dewletperest (Qraltiya Cihû û dewleta Cihû) nebe jî, baskekî xurt ê modernîteya şaristaniya demokratîk ê Cihû bi dirêjiya dîrokê her her hebûye. Her wisa Cihûtiya hejar û pêwendiyên wê yên qebîleyî lewaz jî di dîrokê de tim qala xwe daye kirin. Rûyê din ê Cihûtiyê, ji Îsmeîl kurê Hecera cariye û Hz. Îbrahîm heya Wusivê li Misirê û Meyrema xuşka Mûsa heya Meyrema dayîka Îsa, bi hejmareke zêde pêxember, nivîskar, rewşenbîr, anarşîstên cikavî, femînîst, felsefevan, zanyar û bi hemû gelê xwe yê kedkar ve, di têkoşîna şaristanî û modernîteya demokratîk de vedîtin/keşfan, nûvedan/îcadanan, teoriyan, şoreşan û berhemên hunerî, yên mezin, pêk aniye. Cihuyan hêzên xwe yên bîrdozî û daringî tim oxira yekdestiyan de bikar neanîne. Her wisa hewldan û serkeftinên wan ên pirr girîng jî çêbûne ji bo cîhaneke bêhtir ronak, dadwer/adil, azad û demokratîk. Gelo em dikarin kîjan tevgerên pêxemberî, her wisa piştgiriyên ji bo biratî û hejaran û tevgerên utopîk, sosyalîst, anarşîst, femînîst û ekolojîk bê Cihûyan bihizirin? Bizav/ekolên felsefî, tevgerên zanistî û hunerî û mezhebên olî, bê Cihû pirr hindik dikarin bêne hizirîn. Gelo, eger Cihûtî û Cihû nebûna, sosyalîzm li hemberî kapîtalîzmê, enternasyonalîzm li hemberî dewletperestiya-netew, komunalîzm li hemberî lîberalîzmê, femînîzm li hemberî zayendperestiya civakî, eko-ekonomîzm li hemberî endustriyalîzmê, laîsîzm li hemberî olperestiyê û dîmanewerî li hemberî gerdûneweriyê, wê çiqas karîbûna pêş biketana?

Eşkere ye ku Cihûtî di hêla herdu cîhanên modernîteyê de jî girîng e. Vê girîngiya xwe di beşên girîng ên dîrokê û roja me ya îro de parastine. Tevî vê yekê, pirsgirêka Cihû hebûna xwe di roja me ya îro de jî, heman weke di dîrokê de diparêze. Nêrîna li Cihûtiyê weke komcivakek bijarte ya xweda, her wisa ditin û nirxandina wê weke serê gunehan ; weke min di destpêkê de jî diyar kir, [ev herdu nêzîkatî jî] rê li ber şaşitî û pêkhateyên wehîm vedike, mîna ku gelek nimûneyên wan hatine ditin. Ji ber vê sedemê ye ku min pêwîst dît ku ez di asta pêşnûmayê de rawestim li ser vê mijarê, ji ber girîngiya wê. Tehlîlên hem herêmî (navçeyî) û hem kûrewî/global, eger rastiya Cihû nedin ber çavan, nikarin têr baş rast û encamgir bin.

Di dema girêdana vê mijarê de, ez dixwazim gotineke Karl Marks dubare bikim. Marks gotibû, “Proletarya eger dixwaze xwe rizgar bike, divê tevbigere bi zanebûna ku, bêyî rizgarkirina cîhanê, ev kar nikare pêk were.” Ez jî dibêjim ku Cihûtî, eger dixwaze xwe rizgar bike, divê zanibe ku, beyî rizgarkirina cîhanê, vê yekê nikare pêk were, û bi vî rengî hêza xwe ya bîrdozî û daringî/madî, ku stratejîk e, li ser vê bingehê bikar bîne. Modernîteya demokratîk di serê vê bingehê de tê.

**E-Rehendên Modernîteya Demokratîk**

Ez di wê baweriyê de me ku tehlîla me, tevlî rexneyêke berfireh li şaristani û modernîteyê, modernîteya demokratîk bi dîroka wê ya pêşketina şaristaniyêne re di nava hev de û bi awayê beşên ku hêmanên wê yên cûrbecûr ên serekîn pênase dike, xeylî ronî kiriye. Karê ku ez ê li vê derê hewl bidim bikim ew e ku ez vê mijarê bi rehendên wê yên serekîn û bi awayekî yekpare zêdetir bidim xuyanîkirin. Ez ê bersiv bidim pirsa “gelo mirov dikare çawa pêşkêş bike modernîteya demokratîk,

bi nêrîneke ji jor ve û bi awayê rehendên serekîn?" Divê bingeha xebatên me yên zanistî ew bin ku em feraseta modernîteya tekperest bişkînin û heviyên biheybet ên civaka-dîrokî, ku dapaçiye (nuxaftiye), bidin xuyanîkirin. Dîroka şaristaniyê didirûve (dişebe) bîreke kor ku herku mirov xwe berdide jêr, binê wê xuya nake. Çi qas em hewl didin ronî bikin jî, yekser xalên dîtir ên tarî xuya dibin. Mirov dikare rawêj (texmîn) bike ku bîrewerî/hafiza (wijdan) ya civakî ya bi hezaran salan, di bin bombardûmana bîrdozî ya yekdestiyên serwer de, elbet wê di qatbûnek de, ku badekên di mejî de tîne bîra mirov, derbas bibe û hempayekê diyardeya ku jê re tê gotin bineheşî, wê bi awayê bi hezaran dehlîzên badekî yên bîrewerî/hafizaya civakî çêbibe. Lê, dîsa jî divê mirov çavtirsî nebe. Ti pirsgirêkek civakî, eger têr baş neyê ronîkirin, çawa ku organekî mirov ku nasan/teşxîsa wî bi rengekî rast neyê kirin, nikare tîmar/tedawiya wî bi rengekî rast bê kirin, bi şêweyeke hempayê wî, nikare bigihîjê derfeta tehlîl (nasan/teşxis)a rast û çareserî (tîmar/tedawî)ya rast.

Ji bo li min neyê lomandin, ez pêwîst dibînim ku tim bikirpînim. Eger zanista civakî, yan jî dîsîplîneke dîtir a zanistê, ku armancên wê yên bi îdeaya dirûvê wê, bi ser ketibana, wê mirovahî van çarsed salên dawî ewqas bi rengekî bixof bi şeran, bi nijadkujî û girêncivakan, bi kendalên zengînî û hejariyan, bi bêkarî û koçberiyan, bi dejenerasyonên çandî û bêexlaqiyan, bi hezên yekdestî yên hût (azman)bûyî û takekesên daxistî asta hîçbûnê û bi rûxanên hewîrdorê ku mehşerê tînin bîra mirov, derbas nekirana û neketana vê rewşa îroyîn. Sîstema şaristanî ya cîhanê, tevahiya navgînên çanda daringî (madî) û arişî (manewî), ku ev pêne hezar sal in xwe li wan bar kiriye, hema hema wan mazaxtiye (qedandiye). Êdî ti cî nemaya ku bi navgîniya şer were fethkirin û ji nû ve were desteserkirin. Eger bê gotin maye jî, zerara wî ji kara wî qatbiqat zêdetir e. Yên mayî ji navgîna bajêr, bajarên bêbajar in, ku hewl didin wan ji hev bixin û di encam de weke qansêr mezin dibin, û civaka çandinî û gund e, ku ji tunebûnê re hatiye mehkûmkirin. Her wisa, yên mayî jî navgîna ku jê re dibêje aborî û ew hembêz kiriye, yekdestiyên kurewî ku di encamde mirov nikare hevsarên wan bigire û êdî bi rêbezên herî dij-exlaqî weke qezenkirina pere ji pere nepixîne (werimîne), û bi milyonan bekar mane, ku hejmara wan her sal zêde dibe. Yên mayî ji navgîna ku jê re dibêje 'dewlet' û ew hembêz kiriye, yekdestiyên desthilatî û dewlet-netewê ne, ku hingî civaka xwe ya hundirin xwarine nepixîne û êdî ti sazbarî/fonksiyonên wan nemane, û hemwelatî, anku girseya kerî mane, ku ti têkiliyên wan bi cavaka exlaqî û polîtîk re nemane. Yên mayî ji navgînên bîrdozî ku hêvî bi wan tê girêdan, olperestî ye, ku sazbarî/erka xwe ya exlaqî hunda kiriye; zayendperestî ye, ku desthilatiyê li çavikên tevahiya civakê belave kiriye; netewperestî ye, ku mirov ji qebîleperestiyê hezar qat zêdetir di şovenizme de tifetisîne; her wisa zanistperestî ye, ku ti armanca wê nemaye, ji bilî nîşandana rêyên kara mezintirîn ji yekdestiyên sermaye û desthilatî re. Û ya mayî ji huner jî, sanayiya çandî ye, ku pîroziya hestan û hestên xweşikiyê kiriye meta. Ew rewşa ku jê re tê gotin 'dawiya dirokê', reng e vê yekûn/bilançoya şaristaniyê be. Civak ku bi yekdestiyên medya ve di cîhaneke rawejî (xeyalî) de hatiye fetisandin û korkirin, çiqas hatibe bêbertekkirin bila were kirin û bi emrazên desthilatî ve, heya çavikên wê, çiqas hatibe girtin bin kontrol û raçaviyê bila were girtin; sîstema cîhanê ya şaristanî û modernîte ya pênc hezar salî bi gelemperî û ya çarsed salî bi taybetî, di xala herî bini ya aloziya heşmendî û pekhateyî de ye. Kapîtalîzma finans, ku bûye hêzeke kûrewî û serwerî, delîla herî eşkere ya vê yekê ye. Lş cîhan jî, ku çerxên wê ji alî kapîtalîzma fînans ve têne zivirandin, cîhaneke qeyranan e ku ji ber aloziyan diperpite.

Armanca min ne ew e ez teoriyên alozî û qeyranên pêş bixim. Min kapîtalîzmê pênasê kiribû, ne tenê weke sîstemekê xwedî aloziyên dewrewî, lê di heman demê de weke qonaxekê aloziya

pêkhateyî ya sîstemîk a sîstema şaristaniyê, ku xedî aloziyên dirêj û dewrewî ye. Eger di nava qonaxa alozî bi xwe de, qonaxen wê yên dijwartir ên navxweyî hebin, pêvajoya ku niha tê jiyîn, ew e. Dema ez vana diyar dikim, pêwîst e ez bêjim ku ez ne ji wan sosyalîstan im, ku demekê hevî dikirin, belkî hîn jî hêvî dikin, ku ji aloziyan şoreş hilberînin. Alozî, ne tenê şoreşan, lê dij-şoreşan jî hildiberînin. Bi ser de ez teoriyên bi vî rengî yên alozî-şoreş û dij-şoreş, bêhtir ji rastiyê weke hewldaneke retorîk û propaganda dinirxînim. Lewre ez bêjeyeke wisa navêjim naverastê û nabêjim ku dorhêl bilez ji modernîteya demokratîk re vedibe. Ez pêvajoyên alozî û qeyranan, weke diyardeyekê dipejirînim. Lê ez li wan nenêrim weke pêkar/faktorên ku bûyerên dîrokî bizayînin. Xeta pêşveçûner a gerdûnewer, demekê bi bayex tevdigeriya ji bo ku ji teoriyên aloziyê şêweyên civaka ku li pey hev ji ya xirab ber bi ya baş ve biçûya, derxîne. Lê şenberî bi xwe, vê teoriye zêde piştrast nekiriye.

Wate ku pêwîst e mirov pêker/faktorên ku dîrokê û rewşa niha de nirxa destnîşankar di xwe de werdigirin, di qadên dîtir de bigire. Bijareya modernîteya demokratîk, bêhtir bûye encama van hewldanên lêgerînê. Dema ez pêşkêşiya wê dikim, ez neçar dimînim ku pirrî caran qala wê bikim. Ez di wê baweriyê de me ku naskirina taybetmendiyên veqetîner ên vê bijareyê, wê hewldanên derbarê pratîkê de berdar bike. Ez rêz û dilsoziyeke mezin nîşan didim ji mîrasa erênî ya demokratîk a dîrokê re.

Ez vê yekê ji bo xwe, bi ser de, weke rexnedanekê dipejirînim. Ez ne tenê dibêjim ku wane (ders) jê derbixim, lê ez bawer dikim ku nirxeke jêveneger a rêbazî di xwe de werdigire ku bi dîrokê 'niha' were çêkirin. Lê ez heman rêz û dilsoziyê nîşan nadim ji her raman û çalakiyên ku nirx û encamên wan çi dibin bila binin, tênegihîjin ku pêwîst e dîrok niha be û niha jî dîrok be. Ji ber ku ez ji raman û çalakiyên wisa bawer nakim. Lê ez dizanim ku pêşeroj ji 'niha've derbas dibe û ez bawer nakim ku ya/yê 'niha' ya xwe tehlîl neke û çareser neke, pêşeroja wê/wî jî hebe.

Van dubarekirinên di derbarê rêbaz de, têne diyarkirin bi armanca ku bi pêdagerî (israr) were kirpandin ku şaristaniya demokratîk, ne tê hizirîn weke xeyalekê li ser 'çaxa zêrîn' ku di paşerojê de hatibe jiyîn, û ne jî tê sêwerîn weke 'utopya'yekê li ser pêşerojê. Lê derbirrana/îfadeya wate ya şêwaza jiyanê ye ku weke rojane, heta weke pêdiviyeke kêliyî, di raman û çalakiyê de pêk tê. Her wisa, ne yadkirina bîranînên kevn e û ne jî bi xeyalên pêşerojê aştbûyîn e. Dîsa, ne afiranên kêliyî ye û ne jî awayê heyîna rastiyên ebed-ezel e. Dibe ku guncav be ku mirov bêje modernîteya demokratîk ji awayê heyîna xwezaya civakî re, weke zekaya nerme û weke yekîtî li nava cewaziyên ku kapasîteya wan a azadiye mezin bin. Lê bele, ji ber ku modernîte tê wateya 'çax' (serdem), divê ji bîra me neçe ku bi çaxên klasîk ên şaristaniyê re, weke cemsera dijber a diyalektîkê, heyîna xwe wergirtiye û pêwîst e teqez bi vê pênaseyê re were yekparekirin.

Çawa ku modernîzm, weke çaxa serwerî ya kapîtalîzmê, tê hizirîn weke binavkirineke xweser a van çarsed salên dawî yên şaristaniya klasîk, divê modernîteya demokratîk jî bê hizirîn weke binavkirineke xweser a van çarsed salên dawî yên şaristaniya demokratîk.

Mijareke din a girîng ew e ku modernîteya demokratîk weke cemsereke dijber tê jiyîn li her qad û demên ku şebekeyên modernîteya kapîtalîst lê hene. Modernîteya demokratîk, weke serkeftî yan neserkeftî, azadî yan koletî, dirûvî yan cewazî, dûrî yan nezî wekhevî, wergirtî yan newergirtî wateya femînîst, bi kurtasî weke nêzî yan dûrî taybetmendiya civaka exlaqî û polîtik, di singê modernîteya kapîtalîst de, li her der û deman, di awayê heyîna de ye.

Divê bi girîngî diyar bikim ku ez rêbazên dijber (muxalif) ên çep yan rast ên diş-şoreşan û afirandina paşê bi plansaziyeke navendî civakên ku xeyala wan dikin, bi rêya kirina 'endazyariya civakî' bi armanca têxistina jiyanê plan û bernameyên ku dihizirin, edî ne tenê wan weke bêje (retorîk) yên tewşik û propagandatîv dinirxînim, di cewher de vê şêwazê yan weke lîstokekê lîberalîzmê, yan jî weke raman û sepanên ku, heftê sal jî bi ser re derbas bibin, wê zoriye nekşîne ku wan di nava xwe de hezm bike, dinirxînim.

Xwezayên civakî jî, bi şêweyeke dirûvê xwezayên biyolojîk, xwedî kodên genetîk in. Haya min ji biyolojîzmê heye. Ez dizanim ku veguhastina vêya bo xwezayên civakî Darwînîzm e û weke materyalîzma herî çors, malzemeya ramanî ji endazyariyên civakî re tedarik dike. Mijara ez qala wê dikim ew e ku hestyariyên xweser bo xwe yên guherandina bîrewerî (hafiza) û taybetmendiyên bingehîn ên pêkhateyî yên civakên-dîrokî hene, tevî ku ewqas vekirî  ne ji bijareya azadî re, weke xwezayên ku asta wan a zeka ya herî bilind e. Em nikarin civakan di guheranê re derbas bikin, weke gihandin (mezinkirina)a nebateke cewaz û lawireke kedîkirî (îslehkirî), bi rêya guherandina kodên wan ên genetîk. Bîrewêrî (hafiza)ya xwezeya civakî, ji xwe tewş vê yekê weke civaka exlaqî û polîtîk destnîşan nekiriye. Pirr girîng e were destnîşankirin ku rêya civakî ya guheranê tenê, bi merc/şertê ku asta civakî ya exlaqî û polîtîk bilind bike, dikare weke rewa bê pejirandin û, berevajî vê, wê bi her cûre rêbazên totalîter û otorîter asta civaka exlaqî û polîtîk daxîne, lewre encamên wê çi dibin bla bibin, wê weke rewa neyê pejirandin.

Moderníteya demokratîk, xwedî taybetmendiya sîstemekê wisa ye ku rêya rewa ya guheranê, vekirî dihêle. Bilindbûna nirxa wê ya exlaqî û polîtîk, bi vê cewhere wê ya sîstematîk re pêwendîdar e. Digel ku rêya rewa ya guheranê pirr girîng e, lê basît e. Her pêgir (mensûb)eke civakê li ku derê û çi çax dibe bile bibe, dikare tevkariya xwe li vê guheranê bike. Pêgireke/î wê ya/ê ku jêmayiyên civaka neolîtîk, heta yên civaka klan bijî û pêgirekeke/î wê ya/ê ku li Moskowa yan jî li New Yorkê biji, xwedî wê potansiyelê ne ku her kêliyekê tevkarî li vê guheranê bikin. Çawa ku ji bo vê vebêjeyên mezin û pîroz ne şert in, çalakiyên lehengî/qehremanî jî ne şert in. Tekane şert/merc nîşandana şiyana ramîn û tevgerîna exlaqî û polîtîk e, weke awayê heyîna bingehîn a xwezaya civakî; her wisa sazbarkirina vê şiyanê (fezîletê, erdemê) ye, ku em bawer in di her takekes de di asta herî hindik de be jî, heye. Bê gûman, ez naxwazim bi vê yekê diyar bikim ku negirîng in wan vebêjeyên mezin û pîroz, ku bi dirêjiya civaka-dîrokî derketine û hatine kirin malê bîreweriya mirovahiyê, ji bo rêya rewa ya guheranê were ronîkirin. Berevajî, rola mezin dikeve ser van vebêjeyan, ji ber herku rêya rewa ya guheranê bi yekdestiyên bîrdozî û daringî (madî) ve hatiye girtin. Her wisa, çalakiyên lehengiyê, bi şêweyeke dirûv, nirxên jêveneger ên pîroz di xwe de werdigirin. A girîng ew e mirov zanibe ku guheran, di moderníteya demokratîk de, bêyî hewldanên yekpareyî yên civaka-dîrokî, nikare were pêkanîn. [Li vê derê) rola kesayetî û rêxistinên girîng nayê înkarkirin. Lê wê vê rolê zêde wate dernebirre, ta ku neyê kirin malê tevnên civakê yên exlaqî û polîtîk û di rêya rewa re neyê derbaskirin.

Ji bo şoreşan jî heman mijar derbasdar in: Guherîn, weke pêşketina civakî, ku neyê kirin malê tevna exlaqî û polîtîk û rêya rewa, pêwîst e neyê nirxandin weke xwebûneke xwezaya civakî. Civak nayên afirandin, lê tên jiyîn.

Bê gûman cewazî di navbera jiyanan de hene. Çawa ku jiyaneke bêhtir bi azadî, wekhevî û demokratî heye, her wisa jiyanên xwe lê ranegir ên di bin koletî, newekhevî û diktadorî/zordarî de jî

derbas dibin hene. Belkî jî zêdetir in. van mercên de ji derbas dibin hene. Belkî jî zêdetir in. Modernîteya demokratîk di bin van mercan de  derdibirre heşmendî û pêkhateya kirina jiyanê, bi hemû rêbazên bêhtir azad, wekhev û demokratîk. Bi qasî rakirina kevirekî, ku ketibe nava rê, çêkirina şoreşekê jî, ku weke tekane rêya rewa ya guheranê mabe, di wergiriya moderrnîteya demokratîk de hêja ne. Li beranberî vê, rizgariya xwedayî (îlahî) jî û sofîtiya kolewariya qederperest jî di heman wergiriyê de nayên hizirîn û weke etîk (exlaqî) nayên ditin. Gengaz e ku modernîteya demokratîk were bihêzkirin û heta were nûkirin li hin deveran  bi ji nû ve avakirinên xurt, di serdema aloziya sîstemîk û pêkhateyî ya di serweriya kapîtalîzma fînans a kûrewî de ku em tê de derbas dibin, di ronahiya waneyên ku em karibin derxin ji têkoşîna van çarsed salên dawî ya ji bo azadî wekhevî û demokrasî. Lewre lêhûrbûn û ronakbûn li ser rehendên bingehîn ên modernîteya demokratîk, wê wisa bike ku hewldanên me yên bi vî rengî zêdetir sefkeftî bibin.

**a-Rehenda Wê Ya Civaka Exlaqî û Polîtîk (Civaka Demokratîk)**

Çawa ku gengaz e mirov modernîteya kapîtalîst bi awayê sê rehendên girîng bihizire, nêzîkatiyeke dirûv ji bo madernîteya demokratîk jî dikare derbasdar be. Li beramberî civaka hilberînê, civaka sanayî û civaka dewlet-netew a kapîtalîst, ku ji bo modernîteya kapîtalîst weke bêberdewamiyên bingehîn û wesfên xweser têne hizirîn, rehendên modernîteya demokratîk ên civaka exlaqî û polîtîk, civaka eko-endûstriyel û civaka konfederalîst a demokratîk derdikevin pêş. Rehend di hûrgilî(detay)yan de di hêla herdu sîsteman de dikarin bêne pirkirin. Lê ji bo ku bi xetên giştî bêne pênasekirin, van rehendên sêmendî dikarin wateyeke têr bidin. Rehendên modernîteya kapîtalîst di beşên beriya vê de ti tehlîlên berfireh de hatibûn derbaskirin. Hewl hatibû dayîn ku modernîteya demokratîk jî bi pêşketina wê ya dîrokî ve, bi berawirkirina wê ya bi modernîte û şaristaniya klasîk re û bi hêmanên wê yên serekîn ve, bihata xuyanîkirin. Dema li rehendên bingehîn were cûdakirin û ji nêz ve were pênasekirin, wê vebêjan (vegotin)a wê û nêzîkatiyên pratîk bihêz bibin.

Her wisa gengaz bû ku civaka exlaqî û polîtîk, weke civaka demokratîk (komunalîteya demokratîk) jî bihata pêşkêşkirin. Dibe ku nêzîkatiya herî guncav a kategorik ev bûya; ku bibûya beramberî civaka kapîtalîst. Lê ji ber ku di xwezaya civaka exlaqî û polîtîk bi xwe de civaka demokratîk jî heye, me xwe dûr neda ji esasgirtina civaka exlaqî û polîtîk.

Li ser vê mijarê di beşên cûrbecûr de hatiye rawestîn. Tişta ez ê li vê derê bikim, wê bibe berheveke serekîn. Beriya ku civaka exlaqî û politik biwesfînim, ez mijarekê di berbarê cewhera wê de çiqas dubare bikim, wê ewqas di cî de be. Ew jî têkiliya derûnî (cewherî) ya civaka exlaqî û polîtîk li milekî bi qencî, dilşadî, rastî û xweşikiyê re û li milê din, têkiliya wê ya bi azadî, wekhevî û demokratiyê re ye. Qencî û dilşadî ji xwe cewherên exlaq in. Rastî bi heqiqetê re pêwendîdar e. Tiştekî tewş e ku mirov rastiyê/heqiqetê, li derveyî civaka exlaqî û polîtîk bigere. Ya/yê ku nikaribe bibe exlaqî û polîtîk, nikare rastiyê bibîne. Û xweşikî têgîna armanc a estetîkê ye. Ez xweşikiya li derveyî civaka exlaqî û polîtîk, weke xweşikî nahesibinim. [Ji ber ku] xweşikî exlaqî û polîtîk e! Têkiliya azadî, wekhevî û demokrasî, ku sêmendên din in, bi civaka exlaqî û polîtîk re, xeylî hatiye tehlîlkirin. Ti civak, bi qasî civaka exlaqî û polîtîk, ne di wê hêzê de ye ku azadiyê, wekheviyê û demokrasiyê hilberîne û pêk bîne.

Mijara yekemîn a berhevê di derbarê kapasîteya civaka exlaqî û polîtîk de ye, ku dikare biguhere û veguhere. Kapasîteya guheran û veguheranê, ta ku rehenda exlaqî û polîtîk, weke  heyîna

bingehîn, ji holê neyê rakirin, dikare were hizirîn weke civaka herî berfireh. Bê gûman di ti civakek de nikare exlaq û polîtîka bi tevahî ji holê werin rakirin. Lê dikare erkên wan ta radeya dawî werin tengkirin. Ji bo mînak, di civaka moderníteya kapîtalîst de exlaq û polîtîka di bin zordariya dewlet-netew de hatiye daxistin asta herî kêm û heta hatiye tengkirin heya sînorên tunebûnê. Em li ser sedem û encamên vê yekê bi dirêjî rawestibûn. Gelo, tê wateya ku di vê rewşê de civak guheriye? Na (naxêr). Berevajî, tê wateya ku hatiye tengkirin, guheran û cewazbûna wê hatine rawestandin, heta hatiye neçarkirin bo homojenbûnê û di bin statuyeke pirr tund a huqûqî de hatiye fetisandin. Em kapasîteya wê ya guheranê li milekî bihêlin, di bin navê homjenbûnê de, ji bo çêkirina tek-cûre çand û hemwelatî, hatiye daxistin asta dubendiya em-a/ê dîtir û hatiye tengkirin. Di dîmen de, weke ku civaka nûjen/modern guheraneke bêsînor jiyabe, dîmeneke pir-reng tê pêşkêşkirin. Ev bi temamî medyatîk e û dîmena propaganda ye. Lê, rastiya di bin wê de tek-rengî ye; yan nêzî [rengên] bej e, yan jî reş e.

Li beramberî vê, civaka demokratîk ku awayê moderníteya hemdem a civaka exlaqî û polîtîk e, bi rastî jî ew civak e ku cewaziyan bi awayê herî fireh dijî. [Têde] Her komên civakî, bêyî ku bêne neçar(mehkûm)kirin bo tekcûre çand û hemwelatî, dikarin bijîn di nava cewaziyên ku wê li dora çand û nasnameya wan de çêbibin. Komcivak, ji cewazbûnên çandî heya cewazbûnên siyasî, dikarin potansiyelên xwe derxînin holê û wan veguherînin bo jiyaneke çalak (aktif). [Di civaka demokratîk de] Endîşeya ti komcivakan a homojenbûyînê tine ye. Tek-rengî weke kirêtî, gebsoyîtî û hejarî tê ditin. Lê, pir-rengî zengînî, xweşbînî û xweşikiyê di xwe de werdigire. Tê wateya ku wekhevî û azadî di bin van mercan de bêhtir têne bidestxistin. Ancax wekhevî û azadiya spartî bi cewaziyan, heja ne. Ji xwe azadî û wekheviya ku bi destê dewlet-netew hatine çêkirin, mîna ku di tevahiya ceribandinên li cîhanê de jî hatiye îspatkirin, tenê ji bo yekdestiyan in. Azadî û wekheviyên rastîn, bi yekdesteyên desthilatî û sermayeyê neyên dayîn. Tenê bi şêwaza siyaseta demokratîk a civaka demokratîk têne bidestxistin û bi parastina cewherîn têne parastin.

Reng e ev pirs were kirin: Gelo sîstemek çawa dikare ewqas cewaziyan ragire? Bersiva ji vê re were dayîn, di bingehe civaka exlaqî û polîtîk de yekîtî ye. Tekane nirxa ku her takekes û kom jê deman/tawîz nedin, pêdagerî (israr) ye ku weke civaka exlaqî û polîtîk bimînin. Merca tekane û bes ji bo cewazî, her wisa ji bo wekhevî û azadî civaka exlaqî û polîtîk e. Civaka demokratîk weke awayê nûjen ê vê civaka dîrokî, xwe herku diçe bêhtir îspat dike.

Liberalizm, ku bîrdoziya navendî ya sîstema fermî ya modernîzmê ye, xeylî argûman (bahane)an bikar tîne ji bo ku vê rastiyê paşevaj bike. Lîberalîzmê hema hema dike wekhev li gel demokrasiyê. Geremoleke tam a têgînan tê afirandin. Xwe wekhevkirina lîberalîzmê, tevî ku bîrdozî ye, li gel demokrasiyê, ku sîstemeke siyasî ye, mînaka tîpîk a vê yekê ye. Lê lîberalîzm di cewher de tê wateya rûxandina bêhevsar a takekes li pêşberî civakê, ku serweriya yekdestiyan a li ser civakê vêya îspat dike. Her cûre ezeziya ku demokratîk nebe, ji malbetê heya dewletê, di meyla dîktadoriyê de ye. Lê takekesiya demokratîk cewaz e. Dengdana wê ya hev beş, weke biryardariya civakê, berê pêşîn dide takekes. Û takekes, tenê dema ku vî dengi û vê biryardariyê esas bigire, nirxa wî/wê çêdibe û di civakê de ciyekî rêzdar ji bo xwe dibinê. Wê demê, ezeziya liberal wek cûre-yekdestiyeke bêsînor û bêhejmar, antî-demokratîk e. Her yek zimandirêjî û geremoliya têginên liberal yan jî neolîberal, nikarin vê taybetmendiya wê ya serekî biguherînin. Lîberalîzm, ku di hêla wateya wê ya peyvê de, weke 'azadbûyîn' jî tê bikaranîn, di sepanê de îspat kiriye ku nekariye vê jî veguhêzîne wêdetirî pêşketina bêsînor a yekdestiyan. Azadiya ku di dîmen de tê pêşkêşkirin, di

pratîkê de li qeyd (pranga)ên pir-alî yên bîrdozî û daringî (madî) hatiye xistin, ku di dîrokê de tew di rejîmên fîrewnan de jî nehatine dîtin. Azadiya rasteqîn di civakek de, tenê dema ku bi rehenda civakî were destekkirin, dikare wate werbigire. Azadiyên takekesî yên ji alî civakê ve neyên destekkirin, dikarin tenê girêdayî bi însafa yekdestiyan ve wate wergirin, ku ev jî tê wateya rewşeke dijraberê giyana azadiyê. Ji xwe ti pirsgirêkekê lîberalîzmê ya bi navê wekheviyê tine ye.

Civaka exlaqî di mercên moderníteya kapîtalîst de awayê herî tengkirî, hêştî bêerk û bêmeriyet ê dîroka xwe dijî. Dîsa, qadên huqûqî têne danîn li şûna rêsayên exlaqî, bi şêweya ku di ti serdemên dîrokê de nehatibe dîtin. Burjuwazî weke çîn, exlaq bêmeriyet dike û serweriya xwe ya çînî di bin navê 'huqûq'de, heya hûrgilî (detay)yên herî zirav, dike kod û li civakê ferz dike. Civaka huqûqî li şûna civaka exlaqî tê bicîkirin. Li vê derê em bi guherdetiyeke pirr girîng re rûbirû ne. Mirov di dîrokê de rastî hewldanên huqûqîkirinê tê. Lê, di ti yek ji wana de, bi qasî di ya moderníteya burjuwa de, li hûrgiliyan (detayan) nehatiye fetisandin. A di rastî de tê pêkanîn, yekdestîperestiya çînî ye di bin navê huqûqê de û afirandina yekdestîperestiya huqûqê ye. Ne gengaz e ku xwezayek ta radeya dawî girîft weke civak, bi huqûqê were rêvebirin. Bê gûman, ciyê huqûqê di civakê de heye, lê bi mercê ku dadwer (adil) be; bi vê wateya xwe jêveneger e. Lê, ya ku ji alî dewletê ve di bin navê huqûqa pozîtîv de li civakê tê ferzkirin, ne huqûqa dadwer e, lê yekdestîperestiya çîn û netewa zal (hakîm) e, ku li huqûqê hatiye barkirin û rêsaperestiya dewlet-netew e. Rûxîna exlaq hemwate ye li gel rûxîna civakî. Tiştên dibin û rû didin vê heqîqetê piştrast dikin. Di roja îro de, civakên guzîde weke DYE û Rûsya, bê statuqo, anku beyî rêsayên fermî yên huqûqe, nikarin tew yek saetekê jî xwe bidin jiyandin. Civak dibe qada hovîtiyê, weke em yekcarna di heyamên (serdemên) aloziyê de rastî wê tên.

Di rastî de ev rewş rastiyekê derdibirre. Dema me dewlet-netewê pênase kir, me wê weke awayê şer ê ferzkirî li heya çavikên civakê, destnîşan kiribû. Ev rastî di heyamên alozî û qeyranan de tê îspatkirin. Potansiyela herî mezin a qeyranê civakên fermî yên huqûqê wê di xwe de werdigirin. Sedem jî bêpariya wan a ji rêgeza exlaqî ye. Sedema ku jîngeh di rehendên felaketan de qeyranan dijî, ew e ku li beramberî bêpariya ji rehenda exlaqî, huqûqa jîngehê jî hîn nehatiye pêşxistin. Bi ser de, jîngeh, ne mijareke wisa ye ku bi huqûqê were parastin, ji ber ku bêdawî ye. Lê, kartêkeriya huqûqî ta radeya dawî sînorker e. Lewre, sedema pirsgirêka ekolojîk, ketina ji rêgeza civaka exlaqî ye. Civakek ku nikaribe ciyê ku rêgeza civaka exlaqî heq dike bidê, domdariya wê, ne di bunyeya wê ya hundirîn de û ne jî di jîngeha wê de namîne. Rastiya rojaneyî vê yekê pirr baş rave dike. Heman mijar ji bo rêgeza civaka polîtîk jî derbasdar in. Dema ku rêveberiya dêwane ya burokratîk a dewlet-netewê were danîn li şûna polîtîkayê, sazbariya demokratîk a civakan namîne. Rêveberiya dewlet-netewê, ku xwe çirpandiye (têxistiye) nava civakê heya çavikên wê yên herî zirav, bi vê rewşa xwe ve, tê wateya awayê bifelç ê civakê. Civakek ku hemû pêkhatinên xwe û karên xwe yên hevbeş ji burokrasiyê re hiştibe (terikandibe), bi rastî jî hem weke mejî (zihîn) hem weke vîn (îrade), rewşeke giran a felcîtiyê dijî. Ne bêsedem e ku Ewrûpa, ku vêya têderxist (ferq kir), bi hemû hêza xwe ve rêgeza polîtîk a demokratîk hembêz kir. Sedema pêşxistina wê ya kêm-zêde, ew e ku li gel burokrasiyê, ji polîtîkaya civakî re jî qad hêştiye.

Civaka polîtîk, li gorî dewlet-netewa moderníteyê, gef(tehdîd)ek e li dijî hebûna wê, yekîtiya wê û yekparetiya wê. Lê di rastî de, rêveberî û burokratîzma dewlet-netew, ku, wêdetir ji tengkirina hêmana polîtîk, weke awayê heyîna civakê, wer lê kiriye ku bi kardanî (fiîlî) nikaribe were bikaranîn, ne tenê weke şûrê Demokles li ser civakê radiweste, di heman demê de saet bi saet wê

[civakê] hûr dike. Pirsgirêka herî bingehîn a felsefeya polîtîk a çaxa me ev e û her wisa weke faşîzm jî di pratîke de astengiya herî mezin e li pêş jiyanê. Min vêya diyar kiribû: Hîtler weke kes têk çû lê sîstema wî gihişt serkeftinê. Dewletperestiya netew di wateya rakirina ji holê ya civaka polîtîk de, wekhev e li gel faşîzma Hîtler (Hîtler, her çend, ne yekemîn kes be ku vêya tam bi ser xistibe, lê ew kes e ku vêya bifermî ragihandiye (îlan kiriye) û lê xwedî derketiye.

Civakek ku rêgeza wê ya polîtîk tinebe, neyê xebitandin yan jî ji holê bê rakirin, ew civak term (ceset) e û mirov dikare rewşa wê ya herî baş weke civaka metîngeh, derbibirre. Ji ber vê sedemê, sazbariya ku civaka demokratîk dide rêgeza polîtîk, xwedî girîngiya jiyanî ye. Her wisa weke sîstem, delîla herî bingehîn a raseriya wê ye.

Dîroka şaristanî di wateyek de dîroka tengkirin, bêerkhêştin û bêmeriyetkirina civaka polîtîk e. Çînkirina civakê gengaz bûye, ancax dema ku têkoşîna polîtîk, ku pirr dijwar derbas bûye, bi sûda dewletê hatiye çewsandin. Divê mirov pirr bala xwe bide vê mijarê. Tew Marskîstan jî, ku bi pirsgirêka têkoşîna çînî re herî zêde mijûl bûn, nekarîne xwezaya çînbûnê bi rengekî rast destnîşan bikin. Nekarîne xwe bidin alî ji nirxandina weke ku çînbûn fezîletek be û pêşvebera şaristaniyê be. Weke pêdiviya materyalîzma dîrokî hesibandine nêzîkbûna weke ku têkiliyekê pirê û qonaxek be, ku pêwîst e teqez dîrok di ser re derbas bibe. Min di tehlîla xwe ya li ser şaristaniyê de, çînbûnê, weke tengkirin û bêerkkirina civaka exlaqî û polîtîk nirxand; her wisa min bi girîngî diyar kir ku, herku çînbûn pêş dikeve, civak zêdetir dikeve bin serweriya desthilatî û dewletê. Dîrok di vê wateyê de têkoşîneke pirr dijwar a çînî ye. Lê em li milekî bihêlin ku pêşxistina çînbûnê bi xwe pêşveçûn û pêşketinek be, berevajî, paşketin û ketineke civakî ye. Weke exlaqî ne pêşketineke baş e, lê xirab e. Îdeakirina ku çînbûn, bivênevê rawestgehek e ji bo pêşveçûnê û bi ser de destnîşankirina ku vê yekê weke ku derbirraneke Marksîst be, şaşîtiyeke cidî ye ku hatiye ketin navê.

Pênaseya herî rast a civaka polîtîk, dema em wê bi civakên çînî re berawir bikin, ew e ku li hemberî çînkirinê bi berdewamî li ber xwe dide. Civaka ku xwe herî kêm bike çînî, civaka herî baş e. Serkeftina têkoşîna polîtîk, beyî xwe derbaskirina di çînkirinê de, dikare were destnîşankirin. Têkoşîneke polîtîk a serkeftî, tenê bêyî çînkirina civaka xwe, lewre bêyî xistina wê bin zora yek alî ya emrazên desthilatî û dewletê, dikare were îspatkirin. Di civakên ku zora desthilatî û dewletê heya qirika wan bê jiyîn de, wê bibe çewtiyeke cidî ku mirov qala têkoşîneke polîtîk a serkeftî bike. Ji bo civaka polîtîk îdeal e pejirîneke desthilatî û dewletê, ya ku, yan xwe qet nexistibe bin zora desthilatî û dewletê (zêde ne girîng e di vê wateyê de ku [zora] hindirîn yan derveyîn be û netewî yan dere-netewî be), yan jî spartî be bi rîzaya berhemberî ya weke encama lihevhatinek ku bi têkoşîneke dijwar hatibe destnîşankirin.

Moderníteya kapîtalîst qonaxa dawî ya şaristaniyê ye, ku têde civaka polîtîk herî zêde hatiye tengkirin û bêerkkirin. Pêwîst e vê mijrê baş were têgihîn. Têkoşîna polîtîk, heta siyaseta demokratîk, li gorî lîberalîzm weke serweriya birdozî, ta radeya dawî pêşketî ye. Ev îdea, ku dema ji rûxarî ve lê bê nêrîn rast xuya dike, di cewher de tê wateya berevejiyê wê. Serdemeke wisa ye ku civaka exlaqî û polîtîk, di encama pêşxistina bi awayê herî mezin xweperestî û yekdestîperestî de, di dîrokê de awayê xwe yê herî bêerk dijî. Dewlet-netew weke girtirîn desthilatî, ew civak e ku girtirîn polîtîk nîne. Dewlet netew civakên wisa dizayîne. Heta li holê tiştekî bi navê civakê namîne. Civak, di nava dewlet-netew û hevparî (şîrket) yên ku bûne kûrewî de, hema hema hatiye helandin. Mîchael Fouchault, parastina civakê di vê xalê de, weke bingeha azadiyê dibîne. Wendabûyîna civakê (ji alî

xweperestî û yekdestiyên pirole vê, weke modernîte bi xwe), weke wendabûyîna, ne tenê azadî, lê ya mirov jî, dinirxîne.

Modernîteya demokratîk di vê wateyê de di rêjeya ku civak were parastin de, di bidestxistina azadiyê de jî tekane rêya çareseriyê ye. Civaka ku bi rêya siyaseta demokratîk xwe biparêze (li hemberî xweparastî, dewlet-netew û yekdestiyan), tevna xwe ya polîtîk erkdar dike û xwe vediguherîne bo civaka demokratîk a nûjen/modern. Civaka demokratîk a nûjen, weke civaka ku li ser tevahiya karên xwe yên civakî, hem dihizire û dibêje û hem jî xwe dike biryar û derbasî çalakiyê dibe; cewazbûnê, pir-çandîtiyê û li ser vê bingehê wekheviyê dike jiyanî û bi vî rengî raseriya xwe îspat dike. Bi vî awayî modernîteya demokratîk, ne tenê têkoşîna çînî li ser bingeheke rast dike; her wisa civaka xwe bi desthilatî û dewleteke nû ve nafetisîne (şaşîtiya trajîk a dîrokî ya sosyalîzma pêkhatî) û nakeve vê kemîna dîrokî. Pêdizane ku çiqas xwe bike desthilatî û dewlet, çînîbûn jî di wê rêjeyê de pêş dikeve, lewre têkoşîna çînî tê wendakirin. Divê karibe vê pêzanînê weke yek ji taybetmendiyên xwe yên herî bingehîn destnîşan bike.

Bi modernîteya demokratîk, weke wê bê têgihîştin -tîpekî- awayekî nû yê civakê, weke ne kapîtalîzm û ne jî sosyalîzm, nayê afirandin. Diyar dike ku van têgînan, têgînên propagandayê ne ku ji wesfandina civakê dûr in. Bê gûman civakek tê pêkanîn, lê ev civak, civaka demokratîk a nûjen e, ku têde rêgeza exlaqî û polîtîk mezintirîn rolê dilîze; çînîbûn nikare tê de zêde derfeta pêşketinê bibîne, lewre hev pejirandinek, ku têde emrazên desthilatî û dewletê yan nikaribin zora xwe ferz bikin yan jî bi lihevhatineke berhemberî pêk tê, her wisa azadî, wekhevî û yekîtî di nava cewazî de, weke taybetmendiya hem takekesîtî (ne ezezîtî, xweperestî) û hem civakîtî têde têne jiyîn. Zêdetir wekhevî, azadî û demokrasî, weke pêdiviyên xwezaya vê civakê, encama guheran û veguheranê ye, ku saziya siyaseta demokratîk rê li ber wê vedike.

**b- Rehenda Wê Ya Civaka Sanayî (Endustriyel) Ya Ekolojîk**

Bingeha rehenda aborî û sanayî ya modernîteya demokratîk, ekolojîk e. Girîng e ku bi taybetî pênaseya aboriyê bê kirin. Di vê mijarê de pêşikî ye ku bê têgihîştîn ku siyaseta-aborî (ekonomî-polîtîk) mezintirîn emrazeke paşevajkirin û karkirinê ye. Bi taybetî têgîna 'aboriya kapîtalîst' lîstokekê propaganda ye û derew e. Kapîtalîzm bi xwe, weke me wê di bargên beriya vê de tehlîl kiribû, ne aborî ye, lê can-dijminê aborî ye. Her wisa rêxistingeriyeke şebekeya bisîstem e (bi serweriya çanda birdozî û daringî), ku rûyê erdê ji bo kara yekdestiyan, veguherandiyê rewşeke nejînbar (ji bilî çengekî Fîrewn û Nemrûdan) û di cewher de spartî ye bi talankirina nirxên civakî (ne tenê nirxa-bermayî). Çewaziya wê ji çil heramî û korsanan ew e ku ji xwe re rewatiyên bîrdozî, qilfên zagonî û spartekên desthilatî, yên bi rengekî pir-alî çêdike. Bi van amûran ve, hewl dide rûyê û cewhera xwe ya rasteqîn veşêre. Bi gelek dîsîplînên qaşo 'zanistî', di serî de bi siyaseta aborî (ekonomî-polîtîk), xwe, weke ku rastî (heqîqet) bi xwe be, pêşkêş dike. Eger mezintirîn birdoziyek û zirxeke honandî ji zorê nebin, nikare tew yek rojek jî hebûna xwe bidomîne. Bi vê pêkhateya xwe ve, çalakiya aborî ya civakê (şêweya xebata bingehîn a civaka exlaqî û polîtîk), ku wateya jîngehê jî di xwe de werdigire, ku heyina wê ya bingehîn e, digire bin zordestî û mêtinê û bi vî rengî hem pêşî li pêşketîna wê digire û hem jî vediguherîne çavkaniyeke dilşadî ya çengekî hindikahiyan. Fernand Braudel di pênasekirina xwe ya aborî de, pêdiviyên bingehîn ên mirovan, weke qata zemîn; xebatên meta yên li derdora bazarê, ku kedxwarî (îstîsmar) ya yekdestî û fiyetan (bûha) di xwe de wernegirin, weke qata yekemîn, ku qada bingehîn a aboriyê destnîşan dike; her wisa, qata jor jî, ku

bi şebekeyên yekdestiyan û kedxwariyên bûhayan (fiyet), ku li ser van herdu qatan [ên zemîn û yekemîn] çêdibe, weke qata serekî ya kapîtalîzmê destnîşan dike û wê weke dijberî bazarê dihesibîne (Î. Wallerstein, vê tespîte pirr girîng dibîne), vê yekê xwedî nirxeke mezin a fêrkar e. Di ronahiya vê pênaseyê de eşkere ye ku tam derewek e ku lîberalîzm kapîtalîzmê bi pêdagerî (israr) weke aboriya piyase û bazarê dihesibîne. Têkiliya kapîtalîzmê bi bazarê re ancax sîstemeke hovane ya lîstokê ye, ku xwe dûr nade ji leyîstina her cûre harîtiyan, ku bi leyzên bûhayan (fiyetan) kara yekdestiyê bidest dixe û ji bo vê, eger pêwîst bike, şeran û aloziyan derdixîne ; em ji vê bigirin heya ku temamê aboriyê derdixîne ji bûyîna  xebatek ku pêdiviyên bingehîn dabîn dike û wê dişemitîne nava qadên ku herî zêde karê tînin (zagona kara herî zêde). Em jê re dibêjin lîstok, anku lîstokek e, weke şêwazeke çalakî û êrîşa dijberî jiyanê, bi qasî ku civaka mirov ji sedemên wê yên bingehîn ên heyînê qut bike.

Yekdestiyên şaristanî bi gelemperî û yekdestiyên kapîtalîst bi taybetî (emrazên çandinî, bazirganî, malî (fînansî), desthilatî û dewlet-netewî), faktor/pêkerên bingehîn ên birçîtî û hejariyan, felaketên jîngehî û şewşandin, alozî û pirsgirêkên aborî ne. Li ser van pêkeran, bi ser de, her cûre çînbûnên civakî û siyasî, desthilatî, bajarbûnên pîrole (hemû nexweşiyên spartî bi vana), paşevajkirinên bîrdozî (her cûre dogmayên olperest, metafîzîk û zanistperest), kirêtî (şewşandina hûnerê) û xirabî (hejarî û xirabûnên exlaqî) hiltên (bilind dibin). Van çarsed salên dawî yên modernîteya kapîtalîst, nimûneyên bêhejmar di derbarê van tespîtan de pêşkêş dikin.

Aborî di modernîteya demokratîk de digihîje wateya xwe ya rasteqîn. Pêkhateya sîstematîk a watedar derdibirre, ku hem nirxên bikaranînê (taybetmendiya herî bingehîn a dabînkirina pêdiviyan), weke pêdiviyên bingehîn ên qata zemîn, û hem nirxa guheranê (rêjeyên guheranê yên metayan bi hevdu re), weke aboriya rastîn a piyase û bazarê derdixe holê. Aborî derdikeve ji bûyîna qadek ku hesabên karê li ser wê têne kirin. Zelal dibe ka wê pêdiviyên bingehîn çawa û bi kîjan rêbazan werin kirin yên herî berdar, bêyî ku rê li ber cûdatiya çînî bê vekirin û zerar li ekolojiyê bê dayîn; her wisa aborî, weke qadeke çalakiya civakî, digihîje wateye xwe ya rastîn. Dîsa, wate werdigire weke şêweyeke bingehîn a xebatê, ku wê civaka exlaqî û polîtîk hem li ser wê pêş bikeve û hem wê pêş bixe.

Feraseta modernîte ya aborî, ya siyaseta-aborî (ekonomî-polîtîk) ya Marksîst jî tê de, nekarîne xwe ji nêrîna çînî (nêrîna serwerî ya burjuwa) rizgar bikin. Nirxê bi dûmendiya karker û patron ve girê dane û bi vî rengî bi xemsarî nêzî tevahiya zemînê wê yê civaka dîrokî bûne û ew dapaçîne (nuxaftine). Nirx, berhemeke civaka dîrokî ye. Patron û karkerê tawîzkar, em lî milekî bihêlin ku peydakerên vê berhemê bin, di bingeh de di şûngeha xespkarên wê de ne. Delîla vêya pirr eşkere ye. Eger ji keda jina bêmize (bêucret) nebe, tenê yek patron û karkerê tawîzkar nikarin tew yek rojek jî zikên xwe têr bikin û jiyana xwe ya rojane bidebrînin. Tew ev nimûne jî, rûyê dij-aborî yê kapîtalîzmê bi zelalî nîşan dide. Bi ser de, me bi berfirehî nîşan da ku, eger ne ji civaka-dîrokî be, wê şaristanî bi gelemperî û modernîteya fermî bi taybetî, nikaribin heyîna xwe wergirin.

Esas e yekparetiya sanayî û ekolojî ya nirxen bikaranîn û guheranê di rehenda aborî ya modernîteya demokratîk de. Sînorê sanayî xwe dispêre ekolojiyê û sînorên bingehîn ên pêdiviyan. Nabe ku van herdu sînoran derbas bîke. Sanayiya ku di vê rewşê de derkeve holê, eko-sanayî ye. Sanayiya ku ekolojîk nebe, ew sanayî ye ku ne aborî ye. Sanayiya ku girêdana xwe bi ekolojî re wenda (qut) kiribe, ti cewaziya wê tıne ye ji cinawirek makînebûyî (ku jîngehê bi berdewamî dixwe

û ew tune dike). Dîsa, sanayiyek ku girêdana xwe bi aboriya pêdiviyên bingehîn re wenda (qut) kiribe, ti nirxeke wê ya dîtir nîne, ji bilî armanca karê. Eko-endûstrî, ji ber van sedeman, di şûngeha rêgeza bingehîn de ye. Rêgeza serekîn e, ku pêwîst e hemû xebatên aborî, pê ve girêdayî bin. Di vê rewşê de, çalakiya aborî wateya xwe ya rastîn dibîne û zemînê civakî jî, yê bêkarî, hilberîna zêde û kêm, welat û herêmên hindik û pirr pêşketî, dijberiya gund û bajaran, kendalên çînî, aloziyên aborî û şeran, ji holê radibe.

Bêkarî, bi temamî encameke şewşiya pêkhateya aborî ya bi armanca karê ye. Di rehenda aborî ya moderníteya demokratîk de, cî ji vê şewşiyê re nîne. Bêkarî, rewşeke herî dij-mirovahî ya civakî ye.

Her wisa hilberîna zêde û kêm jî, dîsa encama şewşiya pêkhateya aborî ya bi armanca karê ye. Dema ku pêdiviyên bingehîn li naverastê ne û sanayî ewqas pêş ketiye, wateya ne hilberîna kêm û ne hilberîna zêde heye. Divê ez bi girîngî diyar bikim ku hilberîna kêm û zêde ya bi destê mirov, ji bilî ya mercên avhewayî û xwezayî, tê wateya rewşeke dijmirovahî.

Pirsgirêka welat û herêmên hindik yan pirr pêşketî jî, dîsa derbirraneke dîtir a rewşa dij-mirovahî ye, ku ji alî aboriya bi armanca karê ve tê pêkanîn. Bi vî awayî, tovên her cûre pevçûnên di navbera welatan û herêman de direşîne û bi vî rengî rê lî ber alozî û şerên herêmî,-navçeyî- netewî û navnetewî yên bêpayan û bêdawî vedike. Eşkere ye ku aboriyeke di xizmeta mirov de wê ti carî rê li ber van rewşan veneke û pêwîst e veneke jî. Têkiliyên gund û bajêr, avabûyî lî ser ahengî û karbeşiyekê bi dirêjiya civaka-dîrokî, veguherîne nakokiyên ku her diçe kurtir dibin û denge (hevsengî) li hemberî civaka çandinî û gund xira dibe; ev jî di bingeh de dîsa pêwendîdar e bi wê yekê re ku aborî hatiye girtin bin rêkûpêkkirinên bi armanca karê. Hêştina ciyê têkiliyên bajêr, gund, çandinî, zenaet û sanayî, yên spartî bi hevdu xwedîkirinê, ji têkiliyên ku [hevdu] tesfiye dikin re, ya dîtirek e ji encamên wehîm ên zagona kara mezintirîn. Dema civaka çandinî û gund hema hema hatiye anîn ber şêmûga tesfiyebûyînê, bajêr û sanayî jî ketine pêvajoyeke mezinbûna qansêrî (kanserolojîk). Ne tenê aborî, lê civaka-dîrokî bi xwe, bi tesfiyebûyînê re rûbirû hatiye hêştin.

Derbaskirina aboriya spartî bi zagona kara mezintirîn (azamî) di şewşandinên bi vî rengî de, çînbûnê û pevçûna polîtîk bi xwe re aniye û rê lî ber her çûre şerên navçeyî (herêmî), netewî û navnetewî vekiriye. Di bingeha tevahiya van neyîniyan de, ku di vebêjeyên şaristaniyê de weke ku çarenûs/qedera mirovahiyê bin têne pêşkêşkirin, metîngehkirin û talana aborî heye, ku hatine pekanîn ji alî xweperestî û yekdestîperestî ya kapîtalîst ve, ku dijberên aboriyê ne.

Moderníteya demokratîk, ne tenê aboriyê ji van meylên dijber rizgar dike; di heman demê de xwedî sîstematîkek wisa ye ku bi mercên hîn pêşketîtir têde bêkarî û hejarî tine ne; cî nade hilberîna zêde û kêm; cewaziyên welat û herêmên hindik û pirr pêşketî dadixîne asta herî kêm; her wisa nakokiyên gund û bajaran vediguherîne têkiliyên ku hevdu xwedî bikin. Cewaziyên civakî û aborî di nava sîstematîka wê de nayên guhartin heya rehendên mêtîna çînî; pêşketinên çînî kûr nabin; mêtîna aborî û nakokiyên civakî, ku karibin bibin sedema alozî û şeran, bi rehend nabin. Her wisa, sîstema moderníteya demokratîk destûr nade ku sanayîgerî (endüstriyalîzm) û bajêrbûn daqurtînin, ne tenê gund û çandinî, lê di heman demê de xebatên bajêr û sanayî jî yên birehend ên rasteqîn û jînbar. Mekanîzmaya vê di rehendên bingehîn ên moderníteya demokratîk de bi awayê yekpare danandî (bidane) ye. Hemû komcivak di xebatên xwe yên aborî de hêmanên ekolojîk û sanayî girêdayî bî rehenda exlaqî û polîtîk di nava yekpareyî de digirin dest. Vana bi gîrêyên nequtbar ve bi hevdu re

pêwendîdar in. Ti tiştek nayê hêştin ji penceyên perçeker ên xweperestî û yekdestîperestî re. Eko-ekonomî/aborî û eko-endüstrî/sanayî di hemû xebatên civakî de têne girtin ber çavan. Li ser vê bingehê, tenê projeyên ji nû ve veherandin/tamirkirina jîngehê û zindî kirina çandiniyê, her wisa yên veguherandina gundan bo qadên jiyana xwedî jîngeha herî bijûndar (bisihet), bi serê xwe, xwedî wê potansiyelê ne ku tevahiya bêkarî û hejariyê ji holê rakin. Bêkarî, dijraberê xwezaya mirov e. Bêkar mayîna ademîzad ku xwedî zekayek ewqas pêşketî ye, ancax bi destê zorê yê mirov gengaz e û ji xwe wisa dibe. Xweza, ku tew yek kurmoriyek wê jî bêkar xuya nake, wê çawa heyîna xwe ya herî pêşketî bêkar û bêçare bihêle? Her wisa, wê çawa hejarî bibe çarenûs/qeder, di çaxa teknolojî û sanayî de, ya spartî bi wê, ku berhemên biheybet ên pratîka mirov in?

Eşkere ye ku ya pêwîst, vuguherana pêhateyî ya sîstemîk e. Rastiya modernîteya demokratîk a hem dîrokî û hem rojaneyî, di wê taybetmendiyê de ye ku mirov nake biyaniya/ê keda wê/î û pratîka wê/î. Şoreşa sanayî, weke yek ji qonaxên herî mezin ên ên vê pratîkê, serkeftinek e ji bo civak û aboriyê. [Lê] pirsgirêk ew e ku modernîteya kapîtalîst, vê serkeftina bêhempa, hîn ji destpêka wê ve, xistiye xizmeta zagona xwe ya karê û ji bo vê [bi vê armancê], xweperestî û yekdestîperestî (ya bazirganî, sanayî, malî, desthilatî û dewlet netewî) yên bêhempa ava kiriye û bi vî rengî civaka-dîrokî aniye ber şêmûya tesfiyebûyînê. Modernîteya demokratîk di weteyek de di feraset û sepanên vê modernîteya şewş de, navê şoreşeke sîstematîk û pêkhateyî ye. Eko-endustrî, yek ji rehendên herî bingehîn ên vê şoreşê ye. Tew ev sedem bi serê xwe jîndariya modernîteya demokratîk îspat dike.

Her çend yekeya kevneşopî (klasîk) ya aborî ya modernîteya fermî, weke hevparî (şîrket)yên bi pêkheteyên malbat û pispor (profesyonel) tê pêşkêşkirin, vana yekeyên wisa ne ku armanca wan kar e. Ti endîşeyeke bingehîn a ti yek ji wana, ji bilî karê, nîne. Tevî ku ti qadeke aborî di asta cîhanê de nehêştine ku weke heştpî (ahtapot) milên xwe lê belave nekiribin, tekane pirsgirêka ku pê ve mijûl dibin, di derbarê wê yekê de ye bê ka wê kara mezintirîn çawa were bidestxistin. Bêkarî gihiştiye heya rehendên dêwane; kendala dahat û hejariyê wek aşûtê mezin bûye; dema li milekî qira bi milyonan mirovên di birçîtiyê de tê, li milê din mezintirîn potensiyela hilberînê vala tê hêştin; rê li ber aloziyên bi hilberîna zêde û kêm tê vekirin; bi çandiniyê didin îflaskirin û civaka gund tê tesfiyekirin; tevahiya vana tim ji ber encama havparîbûna li ser bingeha zagona kara menzintirîn e û ya xebatên yekeyên aborî (hîn rasttir, dere-aborî) ne. Yekeye bingehîn a aborî ya modernîteya demokratîk, elbet wê weke heşmendî û pêkhate, dijberê van yekeyên hevparî yên bi armanca karê be.

Aborî bi dirêjiya dîrokê, weke mijareke tim hestyar, bûye endîşeya sereke ya civaka exlaqî û polîtîk. Di seriye vê mijarê de diyardeyên weke qutûtî (xela), birçîtî û mirin hene, ku bi sertaserî gef li civakê dixwin. Kar jî, weke danahevê, ti caran ji alî civakan ve weke rewa nehatiye pejirandin; tim weke çavkaniya xirabiyan û dizitiyan hatiye dîtin û herku keysa civakê lê hatiye, xwe dûr nedaye ku wê desteser bike. Pirr eşkere ye ku nikare aboriya girêdayî bi armanceke wisa were avakirin. Ji xwe weke hate ravekirin, qalkirina aborî ji bo xebatek dijberî aborî, weke pêdiviya xwezaya wê, nakokî bi xwe ye.

Yekane rêya rizgarbûyîna ji vê nakokiyê, aboriya komcivaka-eko ye. Bi hezaran civakên-eko, weke yekeyeke aborî, li gorî pêdiviya mercan, dikarin xwe birêxistin bikin. Ji nû ve rêxistinkirina axên ku di çandinî de ji alî malbatan ve hingî hatine perçekirin, taybetmendiyên xwe

yên yekeyê wenda kirine, bi rêya her wisa girtina ber çavan rêgeza sanayiya-eko (eko-endustrî), pirsgirêkek e ku ji mêj vwerin avakirin. Ferasetên li ser çewlik/zeviyan jî ku ji dema serftî û koletiyê mane, weke girêdayî bi vê, rastiyên xwe wenda kirine. Komcivakên-eko, ku wê bi rêya avakirina yekeyên çandinî yên di pîvanga ekolojîk de werin pêkanîn, bingeha modernîteya gundan in jî. Anku gund, yan jî gundên nûjen, weke komcivakên-eko, dikarin weke yekeyên aborî yên bi pîvanga ekolojîk heyîna xwe ji nû ve wergirin.

Dikare li bajaran jî komcivakên-eko yên dirûv bêne avakirin. Aborî, di plansaziya bajêr a li derdora ekolojî de weke perçeyek ji yekparetiya giştî tê rêkûpêkkirin. Çawa ku pêwîst e burokrasiya ku bajêr dadiqurtîne nebe, nabe ku aboriya bajêr daqurtîne jî, hebe. Xebatên aborî, yên guncav li gel xwezaya bajêr, weke yekeyên di meziniya optimal de têne rêxistinkirin, ku bi armanca karê nebin û armanca wan ew be ku bêkarî û hejarî ya gelê bajêr ji holê rakin. Şenî dikare were belavkirin li van yekeyan, guncav li gel pêkhete û şiyanên wan.

Dibe ku wisa xuya bike ku em qala aboriyeke biplana sosyalîst bikin. Lê, modêla em qala wê dikin, cewaz e. Çawa ku pêwendiya vê modêlê bi plansaziya navendî û aboriya fermande (qumanda) re tine ye, her wisa pêwendiya wê bi hevpariyên qaşo aborî, yên hov, bi armanca karê û dere-aborî, re jî tine ye. Pêkhateyeke navçeyî (herêmî) ye ku têde civaka exlaqî û polîtîk biryar û çalakiya xwe pêk tîne. Elbet, kordînasyonek, ku mercên netewî, herêmî, heta navnetewî bide ber çavan, her dem pêwîst e. Lê vê yekê, ji holê raneke ku biryar û çalakî di înîsiyatîva civaka navçeyî de bin. Divê ez dubare bikim ku aborî, ne pirsgirêkeke teknîkî ya biesazî ye; lê xebatek wisa ye ku, weke pêkhateya bingehîn a heyîna civakan, bi nêrîn, gotûbêj, biryar û bi çalakî û xebata rêxistinî ya tevahiya civakê tê pêkanîn. Qutkirina mirov ji aboriyê, bingeha hemû biyanîkirinan e. Çawa ku mercê ku pêşî li vê were girtin, her wisa yekene rêya wê jî di wê yekê re derbas dibe ku aborî were kirin malê tevahiya komcivakan. Çawa ku ji “yek dixwe, ya/yê din dinêre”, qiyamet radibe; ji “yek dixebite ya/yê din aware –vala- digere” jî qiyamet radibe. Aborî merca bingehîn a heyîna civakê ye ku pêwîst e teqez li derdora komcivakê, weke giredayî bi hîmên ekolojîk û berdarî were rêxistinkirin. Ti kes, ji bilî civak û komcivakan, ne dikare bibe xwedî vî mafê heyînê û ne jî dikare wî ji holê rabike. Yeke, dixwazî bazirganî, sanayî û çandinî bin, heta dixwazî fînansî bin, bi mercê ku tenê rola navgînî bilîzin, neçar in ku biguncin li gel van rêgezên bingehîn. Divê di bingeha karxaneyêke –fabrîka- dêwane de jî û di ya yekeyeke gund û çandinî de jî van rêgezan hebin.

Di modernîteya demokratîk de mulkiyeta yekeyên aborî, girîngiya xwe wenda dike û di rêza duyemîn de dimîne. Mulkiyet, elbet wê girêdayî komcivakan be, yên ku guncav li gel rêgezan tevbigerin. Ne mulkiyeta malbatê û ne jî mulkiyeta dewletê, nikarin ji aboriya nûjen re bibin bersiv. Mulkiyeta dewlet û malbetê, ku ji dema xerarşiyê mane, di wê şûngeh/pozisyonê de ne ku tew di modernîteya kapîtalîst de jî nikarin hebûna xwe bidomînin. Heta tew hevparî/şîrket jî, ji ber zordayîna sedemên aborî, herku diçe dikevin mulkiyeta hevbeş a xebatkaran. Lê dîsa jî divê mirov rêsa (norm) yên mulkiyetê, bi xetên stûr (qalind) ji hevdu veneqetîne. Çawa ku herdu sîstemên şaristanî di nava hev de dijîn, wê sîstemên mulkiyetê jî navheviya hev demeke dirêj biparêzin. Çawa ku tew di mulkiyeta komcivakê de jî mulkiyeta malbatê hebûna xwe diparêze, wê hebûna dewletê jî badora xwe û para xwe bidomîne. Ya girîng ew e ku mirov vekirî be ji rêsa (norm)yên nerme yên mulkiyetê re, ku karibin ji jîngeh, bêkarî û berhemdariyê re bibin bersiv. Her sexbêrî (teserûf), ya ku xizmet bike ji hebûnî, azadî, qencî û xweşikî ya takekes re, ew mulkiyet jî be, binirx e. Lê li gorî ku van nirxan nikarin bêkomcivak çêbibin, ya herî rast, dîsa ew e ku pirsgirêk di sînorên optîmal de

werin çareserkirin. Moderníteya demokratîk di wê şûngehê de ye ku mulkiyeta bibingeha komcivakan ku hebûna xwe bi dirêjiya dîrokê ti caran wenda nekiriye, bi cî bike ji nû ve li bingeha civaka exlaqî û polîtîk di mercên nûjen de û bi vî rengî rola xwe ya dîrokî di vê mijarê de jî bi serkeftî bilîze.

### C- Rehenda Wê Ya Civaka Konfederalîst a Demokratîk

Mirov dikare sêyemîn rehenda xwezaya civakî, di asta rêbazî de, bi awayê sîstema konfederalîst a demokratîk destnîşan bike. Rehenda sêmendî, tevî hemû fikareyên wê, dikare bibe fêrkar. A girîng, navheviya rehendan e. Belkî gengaz be ku mirov bi rengekî kêfî tiştekî dîtir dahîne (deyne) şûna yek ji wan, lê tişta derbikeve holê, wê ne sîstema moderníteya demokratîk be, wê tiştekî din be. Sêmendiya moderníteya kapîtalîst jî di nava hev de ne. Hebûnên wan hevdu pêwîst dikin.

Beramberiya dewlet-netewê, ku forma bingehîn a dewletê ya moderníteya fermî ye, di moderníteya demokratîk de sîstema konfederalîst a demokratîk pêk tine. Mirov dikare vê yekê weke şêweya rêveberiya siyasî ya ku ne dewlet e, pênase bike. Ya ku xweseriya xwe dide sîstemê jî ev taybetmendî ye. Pêwîst e rêveberiyên demokratîk misoger neyên têkelkirin bi rêveberiyên îdarî yên dewletan re. Dewlet îdare dikin, lê demokrasî rêve dibin. Dewlet xwe dispêrin desthilatiyê, lê demokrasî xwe dispêrin rîzaya kolektîv. Di dewletan de pêşandin (tayînkirin), lê di demokrasiyan de hilbijartin esas in. Di dewletan de neçarî/bêgavî, lê di demokrasiyan de dilxwazî esas e. Mirov dikare cewazîtiyên dirûv zêde bike.

Konfederalîzma demokratîk, weke tê rawêj/texmînkirin, ne her çi şêweyeke rêveberî ya xweser bo roja me ya îro ye. Lê, sîstemeke wisa ye ku bi hemû giraniya xwe di dîrokê de cî girtiye. Dîrok di vê wateyê de, ne dewletî ya navendî ye, lê konfederal e. Forma dewletê, ji ber ku pirr fermî bûye, hatiye naskirin. Lê, jiyana civakî bêhtir nêzî konfederalîzmê ye. Dewlet, dema ber bi navendîperestiyê ve dibeze, berjewendiyên yekdestiyên desthilatî, ku xwe dispêre wan, esas digire. Nexwe, nikare van berjewendiyan biparêze. Tenê navendîperestiyeke pirr tund dikare ewlehiyê misoger bike. Lê, di konfederalîzmê de berevejî wê derbasdar e. Ji ber ya ku esas digire, ne yekdestî ye, lê civak e, bi qasî ku gengaz be, neçar e ku xwe ji navendîperestiyê dûr bide. Ji ber ku civak ne homojen (tek girse) in, lê ji bi hejmareke zêde komcivak, sazî û cewazîtiyan pêk tên, xwe neçar dibîne ku yekparêtiya hemûyan di nava ahengiyeke hevbeş de misoger bike û biparêze. Lewre rêveberiyeke pirole ya navendîperest, ji bo van pirrîtiyan, gelek caran dibe sedema peqînan. Di dîrokê de nimûneyên bêhejmar ên vê yekê hene. Lê, konfederalîzma demokratîk, ji ber guncaviya xwe ya ku têde her komcivak, sazî û cewazîtî xwe diteyisînin, zêdetir tê jiyîn. Nebûna wê ya sîstemeke pirr naskirî, ji ber pêkhate û bîrdoziya serwerî ya hebûneke fermî ye. Her çend pênaseya wê ya fermî nebe jî, civak di dirokê de di bingeh de konfederalîst in. Tevahiya rêveberiyên qebîle, eşîret û qewman destûr didin konfederalîzma tim di wesfa têkiliyên sist de. Nexwe, xweseriya wan a navxweyî dihincire. Û ev jî hebûna wan belav dike. Heta tew împaratorî jî di pêkhateyên xwe yên navxweyî de xwe dispêrin rêveberiyên cewaz ên bêhejmar. Her cûre rêveberiyên qebîle, eşîret û qewman, her wisa otorîteyên olî, qraltî, heta komar û demokrasî dikarin di bunyeya împaratoriyekê de bibin yek. Di vê wateyê de girîng e mirov têbigîhe ku tew împaratoriyên ku herî navendî têne

hesibandin jî, wek cûreyek konfederalîzm in. Meyla navendî, modêleke îdarî ye ku ne pêdiviya civakê, lê ya yekdestiyê, pê heye.

Pêvajoya modernîteya kapîtalîst, ew pêvajo ye ku têde dewlet bi awayê mezintirîn dibe navendî. Monarşiyên nûjen/modern, ku pêş ketin bi reya rawestandina navendên hêzê yên siyasî û leşkerî yên di nava civakê de bi sûda yekdestiya herî bihêz ku jê re tê gotin 'otorîte'û bi rêya hêştina civakê bêhêz û bêreveberî di alî siyasî û leşkerî de di mezintirin pîvanê de, û dewlet-netew, ku li dû wan hatin pêşxistin, bûne rêveberiyên wisa ku di wan de civak di hêla leşkerî û siyasî de herî bêhêz û bêçek hatiye hêştin. Ew diyardeya ku jê re tê gotin pergala civakî ya aramî û huqûqê, ne tiştekî dîtir e, ji bili damezrîna serwerî ya çîna burjuwa. Kûrbûyîna mêtinê û şêweyên nû ku girt, çêbûna dwlet-netewê neçar kiriye. Dewlet-netew, ku em dikarin jê re bêjin her wisa xwe rêxistinkirina desthilatî weke dewleteke mezintirîn a navendî, şêweya bingehîn a reveberî ya modernîteyê ye. Sepanên ku ji wan re tê gotin 'demokrasiya burjuwa', ku weke qilfekê lê hatiye kirin, ji bo wê yekê ye ku di bingeh de di civakê de rewatî ji yekdestiya desthilatî re were çêkirin. Dewlet-netew, li ser bingeha înkara demokrasî û heta komarê, pêk tê. Demokrasî û komar, weke naverokên xwe, şêweyên rêveberî yên cewaz in ji dewlet-netewê.

Modernîteya demokratîk, dema ku hem weke bingeha dîrokî û hem di hêla xwezaya girîft a civakî ya rojaneyî de, konfederalîzma demokratîk weke modêla bingehîn a siyasî destnîşan dike, bijartineke kêfî neke; lê tê weteya ku sîwana siyasî ya civaka exlaqî û polîtîk derdibirre. Ta ku tam neyê têgihîn ku xwezaya civakî, ne homojen û monolîtîk e, zor e ku konfederalîzma demokratîk were têgihîştin. Dîroka modernîteya fermî ya çarsed salên dawî, wek cûreyek çalakiya bi navê netewa homojên, pêkanîna nijadkujî (yên çandî bi giştî û yên fizîkî yekcarna) ye li ser civaka bi pir-etnîsîte, pir-çandî, bi pêkhateyên cewaz ên siyasî û bi parastina cewherîn. Lê, konfederalîzma demokratîk li hemberî vê dîrokê, dîroka pêdagerî/israrkirin e di pêkhateyên bi pir-etnîsîte, pir-çandî û yên cewaz ên siyasî de. Postmodernîzm tê wateya ku vê dîroka bipevçûn a modernîteyê di bin şêweyên nû de berdewam dike. Qelişîna di çaxa finans a kûrewî de dewlet-netew, ku weke hebûna herî xwedayî ya du sed salên dawî tê homandin/pîrozkirin, û rojevbûna ji nû ve rastiyên civakî, ku wan bi zorê di nava xwe de helandiya û tepisandiye, weke ku tola xwe helîne; pêvajoyên pêwendîdar in bi hevdu re. Feraseta karê ya çaxa fînans, pêwîst dike ku dewlet-netew biguhere. Ev guheran, ji ber ku alozî sîstemîk e, rola girîng dilîze. Û avakirina dewlet-netewa nû ya lîberalîzmê, dike û nake nikare bi serkeve. Ezmûnên Rojhilata Navîn di vê hêlê de fêrkar in.

Sîstema demokratîk, ku weke modernîteya dijber divê herku biçe xwe zêdetir bide xuyanîkirin, dema ku di bin van mercan de heyîna xwe xurt dike, bi wê yekê re rûbirû ye ku pirsgirêkên xwe yên şêweyî bi serkeftî çaraser bike. Bi vê armancê, me hewl da em destnîşan bikin ku konfederalîzm ji dîrokê re ne biyanî ye û bersiva çêtir e ji xweza ya girîftbûyî ya civaka roja me ya îro re. Me pirrî caran anî ziman ku rêya herî baş a ku civaka exlaqî û polîtîk xwe derbibirre, siyaseta demokratîk e. Siyaseta demokratîk şêwaza avabûna konfederalîzma demokratîk e. Demokratîkbûna xwe jî ji vê şêwazê digire. Modernîteya dijber, dema hewl dide xwe bidomîne bi emrazên desthilatî û dewletê ve, ku herku diçe dibin navendî û xwe li heya çavikên herî hundirîn ên civakê belav kirine, tê wateya ku di rastî de qada polîtîk jî tune dike. Siyaseta demokratîk, li hemberî vê, dema ku derfet pêşkêşî her beş û nasnameyên li civakê dike da ku xwe dirbibirrin û bibin hêzên siyasî, tê weteya ku civaka polîtîk jî pê re ava dike. Polîtîka ji nû ve dikeve nava jiyana civakî. Qeyrana dewletê, bêyî ku polîtîka têkeve dewrê, nikare were tehlîlkirin. Qeyran bi xwe, çavkaniya

xwe ji înkarbûyîna civakê digire. Siyaseta demokratîk tekane rêya derbaskirina qeyranên dewletê ye, ku di roja me ya îro de kûr bûne. Nexwe, wê gerînên li dewleta tundtir a navendî, nikaribin xwe ji şkestinên sert/tund rizgar bikin.

Van pêker/faktoran, careke din nîşan didin ku konfederalîzma demokratîk, weke bijareyeke xurt, ketiye rojevê. Konfederalîzm, ku di ceribandina Rûsya ya Sowyet de destpêkê di meriyet û sazbarî de bû, bi navê dewleta navendî bilez ji holê hate rakirin; vê yekê sedema bingehîn a hilweşîna sosyalîzma pêkhatî ye. Sedema ku tevgerên rizgariya netewî nekarîn bi serkevin û di demekê kurt de dejenere bûn, pêwendîdar e ji nêz ve bi wê yekê re ku siyaseta demokratîk û konfederalîzmê pêş nexistin. Her wisa sedema neserkeftina ceribandinên du sed salên dawî yên tevgerên şoreşger jî ew e ku dewlet-netewê bêhtir şoreşger hesibandin, konfederalîzma demokratîk wek şeweyeke siyasî ya paşmayî dîtin û bi vî rengî li hemberê wê helwest girtin. Kes û tevgerên ku bi rêya hembêzkirina dewlet-netewê ku çeka jorîn a modernîteya kapîtalîst e, wer dizanîn ku wê di rêya kurtebir de veguheranên mezin ên civakî pêk binin, pirr dereng têgihîştin ku bi vê çekê li xwe dixistin.

Konfederalîzma demokratîk, çawa ku xwedî wê potansiyelê ye ku neyîniyên ku çavkaniya xwe ji sîstematîka dewlet-netewê digirin derbas bike, di şûngeha navgîna herî guncav a polîtîkkirina civakê de ye jî. Basît e û dikare were sepandin. Her komcivak, etnîsîte, çand, civatên olî, tevgerên rewşenbîrî, yekeyên aborî û wekî vana, weke yek bi yek yekeyên polîtîk, dikarin xwe bi xweserî ava bikin û xwe derbibirrin. Pêwîst e têgînên ku ji wan re tê totin ‘federe’ yani jî ‘xweserî’, anku ‘xwebûnî’, di vê çarçove û wergiriyê de bêne nirxandin. Şansê her xwebûniyê heye ku konfederasyona xwe, ji navçeyî heya kûrewî, çêbike. Hêmana herî bingehîn a naçveyê mafê gotûbêj û biryarên azad e. Her xwebûnî, yan jî yekeya federe, bêhempa ye, ji ber xwedî şansê sepana demokrasiya rasterast e, ku weke demokrasiya beşdarî jî tê têgînkirin. Hemû hêza xwe ji sepanbariya demokrasiya rasterast digire. Sedema hebûna roleke wê ya bingehîn jî ev e. Dewlet-netew çiqas înkara demokrasiya rasterast be, konfederalîzma demokratîk ewqas di şûngeha şêweya wê ya avakar û sazbar de ye.

Yekeyên federe, weke şanikên serekin ên demokrasiya beşdarî ya rasterast, di hêla nermeyiya wan a ku vuguherin bo yekeyên konfedere de jî, bi qasî ku merc û pêdivî wan pêwîst bikin, bêhempa û îdeal in. Her cûre yekîtiyên siyasî ku bêne pêşxistin demokratîk in, bi mercê ku yekeyên spartî bi demokrasiya beşdarî ya rasterast esas bigirin. Mirov dikare bêje siyaseta demokratîk ji sazbariya polîtîk re, ku were pêşxistin ji yekeya ku demokrasiya rasterast li herî navçeyê were sepandin û jiyîn heya pêkhateya herî kûrewî. Sîstema demokratîk a rasteqîn formulasyona jiyîna hemû van pêvajoyan e.

Eger xwezaya civakî bi baldarî were çavdêrîkirin, wê karibe wesfa dewlet-netewê ya ‘qefesa ji hesin’û wesfa konfederalîzma demokratîk a herî guncav a ku mirovan azad dike, bi hêsanî wein têgihîştin. Dewlet-netew çiqas civakê ditepisîne, wê dike tek-tîp û wê ji demokrasiyê dûr dixîne, modêla konfederalîst a demokratîk jî ewqas wê azad dike, wê pirr dike û wê dike demokratîk.

Mijareke din jî ku pêwîst e bê dîqetkirin, ew e ku yekeyên federe û xwebûnî, di wergiriyeke pirr zengîn de têne hizirîn. Pirr girîng e mirov têbigihîje ku wê li taxekê gund yan bajêr jî pêdivî bi yekîneyên konfedere hebe. Her gund ya jî tax dikare bi hêsanî bibe yekîtiyeke konfederal. Eger em bikin mînak; li milekî yeke, anku federeya ekolojîk a gund, li milê din bi hejmareke zêde yekeyên

demokrasiya rasterast, ji yekeya jinên azad heya yekeyên parastina cewherîn, ciwantî, perwerde, folklor, tendurustî, kirina alîkariya hevdu û yên aborî, divê di wergiriya gund de bi hev re bibin yek. Mirov dikare bi hêsanî ji vê yekêya nû ya yekeyan re jî bêje ‘yeke’, yan jî yekîtiya konfedere (yekeya konfedere ya yekeyan). Dema em heman sîstemê vuguhêzînin heya astên navçeyî, herêmî, netewî û kûrewî, wê karibe bi hêsanî were têgihîştin bê ka konfederalîzma demokratîk, sîstemeke çiqas wergir e. Mirov dikare bi sîstematîka konfederalîzmê baştir têbigihîje ku hersê rehendên bingehîn ên modernîteya demokratîk jî, di wesfa temamkirina hevdu de ne. Ji ber ku her rehend xwedî wê potansiyelê ye ku di nava vê sîstemê de xwe guftûgo bike, binirxîne, bike biryar, ji nû ve ava bike û bike çalakî, tê wateya ku rastî û yekparetiya civaka dîrokî ya xwezaya civakî jî, bi şêweya herî baş têne bidestxistin (misogerkirin).

Mirov dikare parastina cewherîn a civakî jî di sîstema konfederal de bi şêweya herî baş pêk bine. Parastina cewherîn, weke saziyeke siyaseta demokratîk, di wergiriya sîstema konfederal de ye. Parastina cewherîn, weke pênase, derbirran (îfade)a kûrkirî ya siyaseta demokratîk e.

Dewlet-netew di bingeh de sîstemeke leşkerî ye. Hemû dewlet-netew berhema şeran in ku li hundir û derve bi awayê pirr stemkar (bêrehm), cûrbecûr, demdirej û guherde hatine pêkanîn. Tew yek dewlet-netewek jî ku berhema şer nebe, nikare were hizirîn. Dewlet-netew, ne tenê di qonaxa xwe ya damezrîne de, heta ji wê zêdetir di heyamên xwe yên sazîbûn û hilweşînê de, tevahiya civakê bi zirxeke mîlîtarîst ji hundir û derve werdigire. Civak bi tevahî dibe leşkerî. Saziyên desthilatî û dewletê, ku ji wan re tê gotin ‘îdareya sivîl’, di bingeh de di şûngeha perdeyek de ne, ku vê zirxa leşkerî dinuxêvin (degirin). Û emrazên ku ji wan re tê gotin ‘demokrasiyên burjuwa’, bêhtir pêş de diçin û, bi rêya dapaçîn (sergirtin)a vê pêkhateyê û heşmendiya mîlîtarîst bi cilaya demokrasiyê, erka propagandaya ku sîstemeke civakî ya demokrat a lîberal di meriyetê de ye, digirin ser xwe. Ta ku vê nakokiya yeman a îdare/rêveberiya modernîteyê neyê tehlîlkirin, gengaz nabe ku mirov qala ti diyardeyeke rast a siyasîbûnê û kirina siyaseta demokratîk bike. Ew diyardeya ku jê re tê gotin ‘leşker-milet’ ev e. Ev, diyardeyeke wisa ye ku ji bo hemû dewlet netewên ku ev çarsed sal in hatine avakirin, derbasdar e. Di bin tevahiya pirsgirêkan, aloziyan û rizînan, ên civakî, de ev rastî heye. Her cûre sepanên desthilatî yên faşîst (faşîzmên bi derbe, bê derbe, leşkerî û sivîl) ku weke çareserî têne ferzkirin û timî têne dubarekirin, pêdiviyên xwezaya dewlet-netewê ne û awayên wê yên herî xweser ên derbirrana/îfadeya fermî ne.

Konfederalîzma demokratîk dikare ancax bi navgîniya parastina cewherîn, vê mîlîtarîstbûna bi çavkaniya dewlet-netew, bide rawestandin. Civakên bêpar ji parastina cewherîn, neçar in ku nasnameyên xwe, taybetmendiyên xwe yên polîtîk û demokratîkbûnên xwe wenda bikin. Ji ber vê sedemê, rehenda parastina cewherîn, ji bo civakan, ne diyardeyeke basît a parastina leşkerî ye. Bi wê diyardeyê re di nava hevdu de ye ku nasnameyên xwe biparêzin, polîtîkbûnên xwe bidest bixin û demokratîkbûnên xwe pêk binin. Civak, tenê dema karibe xwe biparêze, dikare bêje ku nasnameya xwe diparêze, polîtîkbûna xwe bidest dixe û dikare siyaseta demokratîk bike. Konfederalîzma demokratîk di ronahiya van rastiyan de di heman demê de divê weke sîstemeke parastina cewherîn birehend bibe. Modernîteya demokratîk, di çaxa serwerî ya kûrewî ya yekdestiyan de û di mercên ku vana tevahiya civakê bi şêwaya dewlet-netew kirine mîlîtarîst de, dikare ancax bersiv bide serweriyê di heman wergiriyê de di hemû mercên dem (zeman) û cî (mekan) de, li ser bingeha parastina cewherîn û siyaseta demokratîk, bi sîstematîka xwe ya cewherîn ve, ku ji tor (şebeke)ên konfederal pêk were. Çiqas tor û şebekeyên serwerî (yekdestiyên bazirganî, malî, sanayî, desthilatî, dewlet-

netewî û bîrdozî) hebin, divê ewqas tor(şebeke)ên konfederal, parastina cewherîn û siyaseta demokratîk di modernîteya demokratîk de werin pêşxistin.

Pirsgirêkek dawî, ku pêwîst e di mijara vê rehendê de em qala wê bikin, der barê wê yekê de ye bê ka wê têkilî û nakokiyên di navbera herduyan de çawa karibe bêne berdewamkirin. Bi taybetî nêzîkatiyên desthilatîperest (nêzîkatiyên ji bo hesthilatî, heta dîktadoriya proleter li şûna desthilatiya burjuwa û yên desthilatiya netewî li şûna rêveberiyên mêtinger û hevxebatkar) ku li bizavên rizgarixwaziya netewî û li sosyalîzma pêkhatî zal/hakîm in, şaşîtiyên herî trajîk ên dîrokê kirine û ji ber sedema vê feraseta xwe, şansekî xwe domandinê pêşkêşî kapîtalîzmê kirine, ku heq nekiribû. Van bizavan û yên dirûv, ku em dikarin her wisa ji wan re bêjin feraset û sepanên cûreyek hilweşandina desthilatî û dewletan û avakirina yên nû li şûna wan, di şûngeha hêzên herî berpirsyar de ne ji ber fetisîna civakê li nava mîlîtarîzasyonê, wendakirina wesfa xwe ya polîtîk û dîsa, wendakirina têkoşîna xwe ya demokratîk. Van nêzîkatiyên bi vê şêwazê, ev nêzî du sed sal in ku ji dewlet-netew a serweriya kapîtalîst re serkeftin di nava sêniya zêrîn de bi desten xwe pêşkêş kirine. Anarşîst, pirr dereng be jî hin tevgerên postmedern ên femînîst û ekolojîk, her wisa ferasetên din ên çep û civaka sivîl, di vê mijarê de di şûngeha bêhtir erênî de ne.

Herdu sîstemên modernîteyê, bi şêweya merc û rêgezên xwe, ên ku me berê pêşkêş kir, bivênevê wê demeke dirêj, tijî bi aştî û pevçûnan, bi hev re bijîn. Ev, rastiyeke jiyanê ye. Ne rast e ku mirov pêvajoya pêvrejiyîna demdirêj, ne bi nêzîkatiyên aştiya bêrêgezî û bi radestî û ne jî bi feraset û sepanên di her mercî de pevçûner û şerxwaz, bide berdewamkirin. Nêzîkatiyên stratejîk û taktîk ên bi felsefeya siyasetê, ku bidin ber çavan ku wê sîstematîka dewlet-netewê û sîstematîka konfederalîzma demokratîk bi hev re bêne jiyîn, hem bi aştiyên rêgezî û mercdar û hem bi şerên parastina cewherîn, di rewşa ku van rêgezan û mercan bêne pinpêkirin de bêhtir guncav in li gel meşa civaka-dîrokî ya ji bo azadî, wekhevî û demokrasî.

Ez di wê baweriyê de me ku min têrbaş pênasekir karakterê dumendî yê modernîzmê, weke heyama dawî ya dîroka şaristaniyê, ku min hewl da ez wê di vê beşa dirêj a xebata me de tehlîl bikim. Modernîzm bi xwe û dîrokçeya wê jî ku kintir e, weke di pêşketina diyalektik a şaristianî de, bi pêşketinên kûr ên diyalektik ve barkirî ne. Mijara ku pêwîst e bê têgihîştin, dema tê gotin ‘diyalektîk’, ew e ku pêşketina binakokî û têkilî ya bi du serî, du heşmendî û pêkheteyên cewaz di singê xwe de werdigire. Dîroka çarsed salên dawî piştrast dike ku kapîtalîzm mora xwe li modernîzmê daye. Lê, ji ber ku kapîtalîzm mora xwe lê daye, nayê wateya ku modernîzm bi tevahî kapîtalîst e. Bi ser de, kapîtalîzm bi xwe jî, ji şêweya civakek bêhtir, sîstemekê daneheva sermaye û karê ye. Ne sîstemekê guncav e ji bo wesfandina diyardeyekê pirr berfireh weke modernîte. Her çend min têgîna ‘modernîteya kapîtalîst’ pirrî caran bikar anibe jî, min tim kirpand ku pêwîst e vê yekê weke bi awayê lêdana mora xwe, were têgihîştin. Li gel vê, min hewl da tehlîl bikim ku nirxandina rûyê duyemîn ê modernîteyê wek modernîteya demokratîk (dibe ku navekî dîtir jî be, eger ê guncavtir were dîtin), zêdetir para rastiyê di xwe de werdigire (ez zêde guncav nabînin ku jê re bêjim ‘modernîteya bi mora demokratîk’). Min bayex nîşan da ku xwe dûr bidim jî helwestên pirr zêde req weke modernîteya kapîtalîst-modernîteya sosyalîst, ji bo nekevim nava şaşîtî û neçareseriyên dîrokî, ku di cûdayiya civaka kapîtalîst-sosyalîst de hatine jiyîn.

Min tim wê rêbazê bikar anî ku ez diyardeyên herdu modernîteyên cewaz biberawirî bigirim dest û wan weke dîrokî berawir bikim. Ji ber rastî bi xwe, biçetel bû. Çawa ku demên di dîroka

şaristaniyê de, demên nûjen (zemanên modern), weke qonaxên wan ên kurttir, bi tevahî bi têkilî û pevçûnên xwe ve dibûn şahîdên vê dubendiyê. Ya ku ez hewl didim bikim, ew e ku ez bi rêya xwe spartina van şahîdiyan, di wesfa caribandinan de be jî, pênaseyan û tehlîlên kurt pêş bixim. Ez jê gûman nakim ku wê herî kêm weke pêşnûmayeke ramanî bêne têgihîştin. Bê gûman rexne û pêşniyarên ku bêne pêşxistin, wê van tehlîlan bêhtir xurt bikin.

Nikare were înkarkirin ku kapîtalîzm, weke sîstema danehevê ya kar û sermaye, mora xwe li modernîzmê daye û hîn jî di bin zalî (serwerî)ya kapîtal a fînans de şûngeha xwe weke hêza serwer didomîne. Dîsa nikare bê înkarkirin ku li gel vê, weke sîstemek (sîstema kapîtalîst a cîhanî anku sîstema cîhanê) hatiye avakirin û di singê xwe de, di mercên hemû cî û deman de, hêzên pirr kûr ên binakok dihewîne. Tê zanîn ku mirov bûye şahîdê wê yekê ku van hêzan, ku hewl hat dayîn bêne pênasekirin weke hêzên modernîteya demokratîk, weke hêsaniya têgînê, pêngavan avêtinê, ne tenê weke tevgerên rizgariya netewî û sosyalîzma pêkhatî, lê di dema dawî de jî mîna sîstemên ekolojîk, femînîst û olperestên radîkal, di serî de jî yên anarşist. Singîtiya sîstemê ji mêj ve hatiye xepirrandin û yên ji nava wê û ji derveyî wê tên (pêwîst e ez bêjim bêhtir yên ji derveyî wê tên. Ji ber ku xwezaya civakî di bingeh de hêzên ku ji derve tên, nas dike), di hemû cî û demên sîstemê de hebûnên xwe, her wisa daxwaziyên xwe yên ji bo azadî û wekheviyê tim anîne ziman û wan veguherandine çalakiyan. Anku, ji lêgerînên xwe yên sîstemê, qet xwe nedane paş.

Hewldanên sîsteman ên tunekirina hevdu û yekdestîbûnê, çawa ku di hemû dîroka şaristaniyê de hatine ceribandin, di demên nûjen (zemanên modern) de jî encam nedane û bi ser de berdêla wan giran jî bûye. Bê gûman xirabiyên ku di xwe de werdigirin, yekûn (bîlanço)ên van şerên sîsteman pirr giran kirine. Wê sîstem bixwazin ku, bi rêya kirina raserî li hevdu, jiyîna xwe dewam bikin. Çawa ku wê serwerî ji asta kûrewî heya astên navçeyî bêne ferzkirin, wê berxwedanên dijber jî, bi wane (ders)yên ku ji ezmûnan derxistine, zêdetir xurt bibin û berdewam bikin. Herku neçareserî dewam bikin, em ê jî dewam bikin ku hemû bi hev re aştî û şeran bijîn. Tehlîl û çareserî herku serkeftî bin û rastiyê, qenciyê û xweşikiyê zêdetir biteyisînin, em dikarin cîhaneke bêhtir biarzû û xweşiktir, ku em ê karibin jê re bêjin rewşa bêaştî û bêşer, xeyal bikin û wê pêk binin. Elbet pirtir aştî û hindiktir şer jî awayekî hêja ye û hewldanên ji bo pêkhatina wê zadegan/pîroz in; tenê bi mercê ku rêgezî û rûmetdar bin.

Me serweriya kapîtal al fînans a kûrewî bi xwe weke pêvajoya herî kûr a qeyranê pênase kir. Pêşketin, vê pênaseyê piştrast dikin. Wekî din, me bi berfirehî anî ziman ku vê qeyranê sîstemîk û pêkhateyî ye. Tew nûçeyên rojane jî yên li ser qeyranê, karakterê wê yê sîstemîk û pêkhateyî piştrast dikin. Sîstemên nûjen di demên qeyranan de zayîner dibin. Çawa ku hin ji wan, zayanên bifelc dikin, lê yên ku zayanên bijûndar (bisihet) jî dikin kêm nabin. Paketên çaraserî yên pirr fireh û bijarteker/eklektîk di utopyaya lîberal a kapîtalîzmê de qet kêm nabin. Her û her planên rojane, hefteyî, mehane, salane, deh-salî û pêncî-salî bi rengekî bêpayan çêdikin. Ev, karê wan e. Wê berdewam bikin ku vê bikin.

Şansê hêzên modernîteya demokratîk jî dibe ku di van demên qeyranan de bêhtir vebe. Dîroka wan a berxwedanê û utopyaya wan a azadî û wekhevî, yên biheybet ên li pey wan, pêşiya wan ronî dikin. Wekî din waneyên mezin hene ku ji têkçûn û nebesiyan derxistine. Dema ku hemûyan di nava hev de, weke demetek [pêkhatî ji] erkên rewşenbîrî, exlaqî û polîtîk, têbigihîjin û wan derbasî çalakiyê bikin, elbet wê şansê wan ê serkeftinê zêde bibe. Lê dîsa jî, aliyên xweser ên

demên qeyranên sîstemîk û pêkhateyî hene, ku pêwîst e werin girtin bir çavan. Nabe ku were paşçavkirin ku pêwîst e zanist û felsefeya wê ya exlaqî û polîtîk, ku divê werin sepandin, her çend di şopa paşerojê de bin jî, nûbûnê di xwe de wergirin. Nexwe, wê reqiyên ku di paşerojê de pirrî caran hatin jiyîn, korbûnên nû bi xwe re bînin. Bi ser de, timî xwe 'neo'(nû)kirina lîberalîzmê, xeteriyê zêdetir mezin dike. Divê neyê jibîrkirin ku dema herkes dipa (hêvî dikir) ku ji aloziya mezin a cîhanê ya 1929 şoreş derkevin, pêla faşîst a hilhatî bandora xwe hîn jî didomîne, civak ji her demê bêhtir ji wesfa xwe ya exlaqî û polîtîk bêpar hatiye hêştin. Teknolojiya înformatîk bi zêdeyî derfetan dide destê hêzên serwerîperest ên bîrdozî yên kûrewî ku bi awayê girtirîn, cîhanên hêmayî (xeyalî) pêşkêş bikin û cîhana rasteqîn paşevaj bikin. Astengî -beîs- nabînin ku pêkhateyên xwe yên riziyayî, bi hêsanî pêşkêş bikin bi awayê embalajkirî bi sîstemeke nû, mîna ku hîn nû zabe. Girseya heyî, ji mêj ve hatiye veguherandin bo girseya kerî ya faşîzmê. Li şûna şkandina hêviyê, ez diyar dikim ji bo bikirpînim ku heya em jiyîna teqez a exlaqî û polîtîk, bi rêya neanîna qîma xwe bi yekkirina aliyên rastiyê yên analîtîk û hestî, veneguhêzînin her kêliya xwe û her ciyê xwe, em ê karibin bi hêsanî werin valaderxistin. Beşa dawî ya piştî vê, wê li ser van mijaran be.

## 9- PIRSGIRÊKÊN MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK ÊN JI NÛ VE AVABÛNÊ

Aliyê herî trajîk ê şoreşên nûjen ew e ku bûne qurbanên modernîzma ku tevkarî li pêkahatina wê kirine. Netehlîlkirina modernîzmê bûye kêmasiya hevbeş a van şoreşan û wer zanîne ku wê di armancên xwe de, yên ku li pey wan beziyane, bêyî çareserkirina têkilî û nakokiyên wan jî bi modernîzmê re, bi ser kevin. Ji ber ku wisa bûye, naverokên utopîk ên şoreşan, bêyî ku bir ser re pirr derbas bibe, nekarîne ji helîna di hesabên bi bûz ên modernîteyê de rizgar bibin. Waneya ku karibe were derxistin ji dîroka şaristanî û modernîte ya pênc hezar salî bi gelemperî û ya çer sed salî bi taybetî, wê yekê ye ku pêker/faktora bingehîn a di bi serneketina hemû berxwedan û şoreşan de ew e ku nekarîne cewaziyên xwe ji sîstemên li hember derketine nîşan bidin û sîstemên xwe yên dijber çêbikin. Her wisa şaristaniyan û modernîteyê bi nezîkatiya tekperest nirxandine û wan wekhev kirine li gel jiyana gerdûnî ku pêwîst e mirov lê bigunce. Tevî ku berxwedanên bêhejmar û şaristaniyên ku hilneweşandibin nemane, lê yên hatine pêkanîn, bûne versiyoneke nû ya şaristaniya kevn.

Li vê derê çavkaniya hêzê ya şaristaniyan derdikeve pêşberî me. Kes, şoreşgerên mezin jî tê de, ji bilî awarteyî (îstîsna) yên pirr hindik, bi gelemperî zarokên şaristaniyên di serdemên xwe de ne. Dê û bavên wan ên rastîn, ew çax e, ku tê de dijîn. Ez bi awayekî qederperest nêzî vê mijarê nabim. Ez dixwazim bikirpînim ku heya ku şaşîtiyek bikok, tevî ku pênc hezar yan jî çar sed salî be jî, neyê derbaskirin, wê şoreşên tew herî radîkal ên bigotin û biçalakî jî nikaribin xwe ji neserkeftinê rizgar bikin. Em ti caran nikarin bêjin ku berxwedan û şoreşên civakî qet mîras nehêştine. Eger ev mîras nebûya, wê ti wateyek jiyîna me nemana. Tew aloziya ku modernîteya me dijî, ku li naverastê bi xwe herî zêde ewle ye, bi têra xwe îspat dike ku ji çareserkirina çavkaniya pirsgirêkan dûr e. Belavbûna şaşîtî li demajoyên dirêj, ew ji şaşbûyînê rizgar nake; her wisa, pirsgirêk jî ji pirsgirêkbûyînê dernekevin. Û eger ev wisa bidome, wê xeyalên ji bo jiyaneke bi wekhevî, azadî û demokrasî jî nikaribin ji mayîna weke utopyayek rizgar bibin.

Dema ez di parêznameya xwe de di bingeh de hesab ji dîroka şaristanî û modernîteyê dipirsim, tê wateya ku li milekî ez di rexnedaneke bikok re derbas dibim û li milê din ez hewl didim alternatîva xwe çiqas kêm be jî pêşkêş bikim. Durustî vêya pêwîst dike. Lê, zanista civakî ya bi

navenda Ewrûpa nikare vê durustiyê nîşan bide. Hem em ê qala çaxeke zanistê ya bêhempa bikin û hem jî em ê nikaribin bi hovîtiyek weke şer re serî derkevin! Di vê rewşê de, rewatiya wê namîne ku mirov bi çeka zanistperestiyê çaxên kevn rexne bike. Ya pêwîst e bê kirin ew e ku mirov li pey zanistek, ku rewatiya wê hebe, bibeze. Ez hewldanên xwe di vê wergiriyê de dinirxînim.

Divê weke nitran neyên hesibandin wan tiştên ku ez di derbarê şaristanî û modernîteyê de dibêjim. Mirov qet nikare têkeve gûmanan ji jidilî (samimiyet) ya mezin a pêxemberan, dema ku pergalên Nemrûd û Fîrewn weke kelama ên xweda rexne dikirin. Lê, yên îdea kirine ku tim di rêça wan de meşiyane, nekarîne xwe bidin alî ji pêkanîna pergalên nû yên Fîrewn û Nemrûdan, ku heman Nemrûd û Fîrewnan li paş dihêlin. Sultan, şah û padişah eger bûnê dîlên pergalên heman ên [pergalên] ku damezrandine, di vê de pêwîst e mirov dîsa hêza şaristaniyan bibîne. Mirov bibe xwedî niyeta baş û di rêça pêxamberan de be, vê yekê mirov rizgar nake ji bûyîna rajêrî sîstemên Nemrûd û Fîrewnan.

Marks, Lenîn û Mao dema bi kapîtalîzmê re pevdiçûn,  jidil bûn. Heta, baweriya wan tam bû ku li hemberî kapîtalîzmê sosyalîzmê jî damezrandine. Lê, encama ku derket holê, bêyî ku pirr bi ser re derbas bibe, nîşan da ku pêkhateya ku ji alî wan ve hate damezrandin, zêde cewaz nebû ji kapîtalîzmê. Ya ku li vê derê jî hêza xwe da axaftin şaristaniya nû, anku modernîte, bû. Nirxandinên serkî yên li ser sermaye, têrê nedikirin ji bo pêşxistina sosyalîzmê. Yên [tiştên) ku kem bûn, tehlîlên li ser modernîteyê bûn. Nêrîna wan a li cîhanê ya pozîtîvîst, ku bandora wê bi kûranî dijiyan, modernîteyê weke awayê herî pîroz ê rastiyê pêşkêş dikir. Em li milekî bihêlin ku ew rexne bikirana, dihizirin ku dê wê zêdetir tekûz bikin. Lê encam li holê ne. Şaşîtiya dîrokî, herku bi awayê zincîrane bidome, armancên tew herî zadegan û pîroz jî nikarin rizgar bibin ji bûyîna navginek ji bo hesabên mîna bûzê yên şaristanî û modernîteyê.

Postmodernîzm, tevî ku yek ji yekemîn tevgerên rexnegir e di derbarê nedombariya modernîteya kapîtalîst de, lê ji alternatîvbûyînê dûr e. Pêkhateya wê ye bijarteker/eklektîk û nediyar, nehêşt ku tew cewaziya xwe jî ji modernîteya klasîk bi serkeftî raxe ber çavan. Hewldanên dirûv ên romantîkên sedsala 19. nekarîn wêdetir biçin ji bûyîna cûre- wêjeyekê. Rexneyên li ser modernîteyê, ku di dawiyên sedsala 19. de F. Nietzche û di nîv duyemîn sedsala 20. de Michel Foucault serkêşiya wan kirin, tevî ku pirr hêja bûn, zêde nekarîn ji bûyîna hewldanên takekesî derkevin û wesfa bizaveke kolektîv a exlaqî û polîtîk wergirin. Analîzên li ser şaristanî û sîstema modern, ên Fernand Braudel, l. Wallessteîn, Andre Gunder Frank û hevalên wan ên nêz ên xebatê, ku bêhtir rojaneyî ne, tevî ku bi rexnegiriya bêhtir rasteqîn, di nava yekparetiya civaka-dîrokî de, nêzî vê mijarê bûne, mirov nikare bêje ku di warê hilberandina alternatîvê de heman serkeftinê nîşan dabin. Şaristanî û modernîte têne girtin dest [nirxandin] weke ku sîstemên çerxî (fetlokî) yên girtî bin, ku neçar bin bi berdewamî (daîmî) bidomin;  her wisa rexneyên pirr berfireh li wan têne kirin, lê yên [tiştên] ku bi navê alternatîviyê têne pêşxistin, nikarin biçin wêdetir ji bûyîna çend hevokan. Em dikarin dînbûna Nietzche û mirina pêşwext (zû) a M. Faucault têbigihîjin. Lê, ne gengaz e ku mirov têr bibîne hesibandina F. Braudel sosyalîzma pêkhatî weke alternatîv, her her wisa pêanîna qîma xwe l. Wallwestein bi têgînên zêdetir wekhevîxwazî, azadîxwazî û demokratîkbûnî û bêjeya Andre Gunder Frank a 'Yekîtî di nava cewazîtî de' ku pirr zêdetir gelemperî ye.   Tê wateya ku bi van nebesiyên xwe, hema li xwe mikur hatine ku wan bi xwe jî nekariye xwe tam rizgar bikira ji zincîrên zanista binavenda Ewrûpa, ku pirr rexne lê dikirin.

Dema ez vê mijarê li ser bingeheke rexnegir di wergiriya parêznameyê de tehlîl dikim û alternatîv pêşkêş dikim, dibe ku vê yekê bê dîtin weke darizandineke takekesî li hemberî şaristaniya kevn û modernîteya kapîtalîst, ku nûnera wê ya roja me ya îro ye. Ev nêrîn di wateyek de rast e. Weke kes, baweriya min ew e ku eger kesayetek mehkûmiyeta xwe (Ez di wateya teng de qala mehkûmiyeta li girtîgehê nakim; lê ez qala mehkûmiyeta giştî ya civakî dikim, ku ji alî şaristanî û modernîteyê ve li jiyana azad hatiye ferzkirin) çareser neke, nikare zanisteke bijûndar çêbike. Yekemîn merca çêkirina zanisteke watedar ew e ku subjeya ku wê çêdike, berî her tiştî xwe çareser bike û şûngehkirina xwe ya pratîk pêk bine. Nexwe, wê nikaribe xwe rizgar bike ku agahî/zanyarî û zanista ku bi dest bixe, weke sermayeyeke rewşenbîrî (entelektuel) li piyaseyê bikarnehîne, lewre zanisteke desthilatî çêneke.

Ramana serekîn a rexneyên min, ew e ku sîstema şaristaniya pênc hezar salî (sîstema xerarşî jî têde, ku hîn kevntir e) çavkaniya xwe digire ji daneheva sermaye û desthilatî ku sazbûye li ser komcivakên keçberî, çandinî û gundan li çolterê û li ser karkerên kole û zenaetkaran li bajêr. Di gel ku vê cewhera xwe heya roja me ya îro parastiye, van yekdestiyên desthilatî û dewletê, ku bazirganî, pere, sanayî û awayên cûrbecûr wergirtine, weke şêweyên serekîn ku neguherîn, mane. Dîroka şaristaniyê sazbûyî ye li aliyekî li ser şerên parvekirinê yên di navbera yekdestiyan bi xwe de û li aliyê din li ser şerên ku vana hemû bi hev re li ser hêzên dijber dimeşînin. Jê pê ve, şerên bîrdozî yên ji bo serweriyê ne, her wisa sazgarîn (mekanîzma) û lîstokên li ser xespa nirxên civakî ya spartî bi şer û desthilatî ne. Heyama şaristaniya kapîtalîst anku modernîte, awayê herî pêşketî yê vê sîstemê ye. Karakterê alozî yê sîstemê bi awayê navend-derdor, serwerî-hemberî (hegemonya-rekabet) û ya dadikeve (nizm dibe)- ya hitlê (bilind dibe), hîn ji destpêkê ve heye. Lê, heyama modernîteyê, bi taybetî di pêvajoya ku sermayeya fînans (malî) rola serwerî dilîze de, tê wateya rewşa qeyrana herî kûr a pêkhateyî.

Lê, çareseriya alternatîv ku ez pêşniyar dikim di derbarê wê yekê de ye ku pêwîst e lê were gerîn di zanebûn û tevgerên xwezaya civakî ya tevahiya hêzên ku ji hilhatina xerarşiyê heya pêvajoyên şaristaniyê û bi dirêjiya dîroka modernîzma dawî ya bi mora kapîtalîzmê, di seriye dijber ê sîstemê de, weke pêdiviya karakterê wê yê diyalektîk, cî girtine. Ti versiyonekê dîroka şaristaniya fermî nikare bibe çareseriya hêzên dijber. Eger têkoşînên civakî, bi dirêjiya dîroka xwe nekarîne di utopyayên xwe yên ji bo wekhevî û azadiyê de bi serkevin, sedema vê ya bingehîn ew bûye ku heman çekên (hêzên desthilatî û dewlet), ku ji alî şaristaniya jihevketî ve hatine bikaranîn, bikaranîne û pêşeroja ku xwestine ava bikin, weke versiyoneke wê ya guherde sêwirandine. Ji ber ku nekarîne heşmendî û pêkhateyên guncav li gel xwezaya xwe ya civakî bi rengekî serbixwe pêş bixin, bûye sedem ku di nava versiyonên cemsera dijber de bihelin.

Çawa ku herikîna dîrokî, ne sîstemeke çerx (fetlok) ên pêkhatî ji dubareyan e, ne pêşveçûneriyeke xêzikî ye jî; lê, yekûn (kombûn)a tevgereke zanebûn û çalakiyan e, ku di nava xwe de çiqas heşmendî û tevgerên pêkhateyî çêkiribe, di wê giraniyê de paran di xwe de diguhêze û yekparetî werdigire. Dîrokîbûn û bûyîne yek ji xelekên herikînê, herdem gengaz e. Û merca vêya ew e ku bi hêza hêşmendî ya di giraniya pêwîst de, forma pêkhateyî bê wergirtin. Dîrok di vê wateyê de xwedî xwezayeke şaşnebar e. Hemû nêrîn û çalakbazî yên ku nikaribin hêza heşmendî ya bi qasî ku di dîrokê de cî bigirin pêş bixin û forma xwe ya pêkhateyî çêbikin, divê berpirsyariya vê yekê di xwe de bibînin.

**A- Pirsgirêka Şaristanî, Modernîte û Qeyranê**

Sîstemên şaristaniyê, li gorî pêdiviya pêkhateyên xwe, wesfa aloziyê di xwe de werdigirin. Alozî, ne rewşên wisa ne ku di encama Pêker/faktorên hundirîn û derveyîn, bi dirêjiya dem (zeman) û cî (mekan) yekcarna pêkhatibin. Sîstem bi xwe bi berdewamî alozî (qeyrana bi awayê pirole) hildiberîne. Mantiqê aloziyê gelek basît e: Li ser nirxên-zêdemayî û nirxên civakî, yên desteserkirî, çînên desthilatî û dewlet weke hîn fermîtir têne damezrandin. Van çînan, ku di nava singê civakê de têne damezrandin, li gorî pêdiviya pêkhateyên xwe yên çekdar ên rêxistî, bi berdewamî di nava meyla mezinbûnê de ne. Dema ku beşên kedkar ên civakê bi zorê debara xwe dikin û ji ber nexweşî û şerên cûrbecûr zû dimirin, şêniya wan bi rêjeya çînên dewletê re kêm dibe. Lê, şêniya emrazên dewlet û her cûre desthilatiyan, ji ber xwe baştir xwedî dikin, diparêzin û pirr hildiberin (wesfa xanedanî ya yekemîn desthilatî û dewletan aligirê malbatên mezin bû û ku şêniya wan pirr bûna, [ji ber ku] polîtîkaya hêzê vêya pêwîst dike), bêhtir zêde dibe. Vê rewşa bêdengetiya berhemberî, ku sîstematîk e, tê wateya ku alozî ye. Çînên dewletê, ku zêdetir pirr bûne û bihêz bûne, herku li ser civakê nirxan xesp dikin, nedombanya sîstemê dikeve dewrê. Ev e ew e ew rewşa ku jê re tê gotin heyamên aloziyê.

Ji bo derketina ji aloziyê, du rê pêwîst in: A yekemîn; hêza ku di encama şerên sorbûyî yên serwerî de hevrik (hember)ên xwe tune bike, weke serwerê/a nû derdikeve holê. Hêza serwer, ji ber hevrikên xwe yên ku berê xwedî par bûne diperçiqîne, dest datîne ser parên wan weke xwezayî û heya hevrikên nû derkevin holê, wer tê hesibandin ku aloziyê ji bo demeke diyar, weke rêjeyî, derbas kiriye. Ya duyemîn û bi pirranî bi ya yekemîn re di nava hev de, hilberîna bêhtir berdar û rêbazên bazirganî û sanayî dixe dewrê û bi vî rengî zêdebûnên hilberînê pêk tîne. Sîstema serwerî, ku zêdebûnên hilberînê pêk anîbe, tê wateya ku heyam (serdem)a geşdariyê weke dijrabera aloziyê, bidest xistiye. Alozî di şaristaniyên çaxa yekemîn de bêhtir bi navberên dirêj û demdirêj in. Aloziyên ku bi navberên ji hezar sal heya du sed salan ajotine, pirrî caran hatine jiyîn. Her heyama aloziya mezin, bi gelemperî, bi guherana xanedanî û navendê bi dawî bûye. Mirov dikare van pêvajoyan ji şaristaniyên Sumer û Misir û vir ve bi rengekî belave bişopîne. Aloziyên Çaxa Navîn jî digel ku dirûv in, demajoyên wan bêhtir kurt bûne. Weke nîvekî, bi awayê demajoyên sed, heta sed û pêncî salî bi belaveyî hatine jiyîn.

Digel ku li ser vê rêveçûna gelemperî pêk tên, aliyên xweserî yên aloziyên sîstema kapîtalîst hene. Diravîtî (pereyîtî) û yekdestiyên bazirganî di sîstemê de, destpêkê rola pêşeng dilîzin. Têkiliyên wan bi hilberînê re sînordar in. Li beramberî vê, pere di aboriyê de bi belaveyî tê bikaranîn û ji ber pêşkêtina metabûna bazirganî û wergirtina wê ya taybetmendiyeke zal (hakîm), pirr zêde dibe. Yekdestiya pere û bazirganî, bi pêvajoyê (demê) re, di deste hindik hêzan de kom dibin. Di vê rewşê de, hêza kirrîna civakê ji ber [sedema] bêperetiyê dikeve. Ji ber ku hilberîna zêde ku derdikeve holê, nayê mijandin û dimîne, aloziyên berhema zêde, weke yekemîn awayê aloziyê, têne jiyîn. Li aliyekî, hilberîn (berhem)a zêde, ji ber ku nikare were firotin, tê rûxandin; li aliyê din, kedkar, ku ji ber bêperetiyê hêza wana kirrînê dadikeve, ji ber hejerî û birçîtiyê qira wan tê. Di demeke kurt de berevajiyê wê jî tê jiyîn. Hilberîna ku pere nake, bi têra xwe dadikeve. Girêdana pereyê di dest de bi hilberînê re qut dibe. Li holê pirr pere, lê hindik hilberîn heye. Bûhatiya jiyanê (enflasyon), ku zêde dibe, rewşeke nû ya alozî ye. Rêya ku tê dîtin (dozîn) ji bo derketina ji herdu aloziyan, ew e ku li gel şerên serwerî, ku rêya kevneşopî ye, lêçûnên dewletê werin zêdekirin û bi vî rengî hewl were dayîn ku beşeke diyar a mizedar (biucret) were afirandin û hilberîna zêde û kêm

were qerebû/telafîkirin. Aloziyên bi vî rengî di di çaxa serwerî ya çarsed salî ya kapîtalîzmê de bi belaveyî û di nava hev de hatine jiyîn. Lê, [niha] demajoyên wan hinekî din kurt bûne û daketine heya her pêncî û sed salî.

Şerên serwerî, bi qasî ku nikaribe bi ti heyamên şaristaniyê re bêne berawirkirin, kûr û demdirêj bûne. Her wisa yekdestiyên ku tevlî şer bûne, di wergiriya –asta- netewî û navnetewî de bûne. Lewre yekem car bi şerên di asta cîhanê re nasdarî çêbûye. Şerên navçeyî û herêmî ti caran kêm nebûne. Ya wehîmtir ew bûye ku civak, herku çûye ji alî dewlet-netew ve bi tevahî hatiye mîlîtarîstkirin û hatiye xistin nava cûreyek rewşa şer. Bêhtir rasteqîn e ku mirov ji civakên roja me ya îro re bêje ‘rewşa şer’. Rewşa şer ku tê ferzkirin, ji du kanal (cok)an ve tê meşandin: A yekemîn, ku kanal(cok)a rêya rasteqîn e, ew e ku emrazên desthilatî û dewletê tevahiya çavikên civakê weke şebeke/torek radipêçin û wê dixin bin raçavî, venêran/kontrol- û çewsanê. Ya duyemîn ew e ku bi kanalên teknolojiya înformatîk ku di nava pêncî salên dawî de bi şoreşeke wesfiyane pêş ketin, civaka hêmayî (xeyalî) hatiye xistin şûna civaka rastîn. Mirov dikare ji herdu awayên şer re jî bêje qiracivakê. Tevlî nijadkujiyên berê ku bi rengekî bêhtir sînordar dihatin sepandin,  van qirên civakê, bi awayên xwe yên kûrtir û berdewamîtir, dawiya xwezaya civakî amade dikin. Belkî, weke afirîşên ku didirûvin cûreya mirov, hebûna xwe bidomînin: Lê weke girseya kerî û weke girseya faşîzmê. Bilanço (yekûn) ya qiracivakê, weke girantir ji nijadkujiyan, xwe di wendakirina wesfa exlaqî û polîtîk a tevahiya civakê de dide xuyakirin. Girseyên mirovan, ku tew di felaketên herî giran ên civakî û ekolojîk de jî xwe berpirsyar nabînin, vê rastiyê îspat dikin. Nikare bê înkarkirin ku rewşeke wêdetir ji alozî û qeyranê tê jiyîn. Kurtekirina, her çend dubare be jî, ka em çawa hatine vê rewşê, dibe ku bikêrhatî be di hêla bidestxistina yekparetiyê de.

**a-** Dîrok, ji damezrînên yekemîn xerarşiyên desthilatî û serweriyên dewletan heya roja me ya îro, di wateyek de mezinbûna kumulatîv (xwe mezinkirina weke giloka berfê ya ku herku were gêrrkirin) a desthilatiyê ye. Demajoyên hem cî (mekan) û hem dem (zeman) tijî ne bi şerên desthilatî, ku cewhera dîroka şaristaniyê ne. Hemûyên wan, ji şerên navçeyî heya şerên cîhanî, ji şerên qebîleyî heya şerên netewî û ji şerên çînî heya şerên olî, bi pirkirina deshilatî û mezinbûna wê ya kumulatîv (lodane) ve bidawî bûne. Pirkirina desthilatî, tê wateya pêşketina çînî ya li ser nirxên civakî ku weke lamij (parazît) dijî. Rêveberî, ku destpêkê xerarşiyeke sînordar pêkdianî û carna jî bi ezmûn û pisporiyên xwe tevkarî li civakê dikir, dema ku veguherî bo awayê dewletê, bû qatqatî (qest). Komên qatqatî tevlî wesfên xwe yên  xanedanî ve, bi rêya xwe rêxistinkirina bi awayê çînên imtiyazkar, bi qasî ku xwedayîtiyê îdea bikin, îmtiyaz wergirtin. Çaxên destpêkê tijî ne bi qralên-xweda û împaratorên ku nîşan didin ku desthilatî xwe bi îdeayên bi vî rengî biberdewamî mezin kiriye û xwe homandiye (pîroz kiriye). Çînên desthilatî û dewletê, ku xwe weke sêmendiya keşîşt +rêveber +fermandar (komûtan) birêxistin kirin, bi van awayên xwe ve dîsa jî zumreyeke sînordar bûn. Rêjeyeke pirr hindik a şêniya civakî pêk dianîn. Lê, em ji nimûneyên bêhejmar dizanin ku, weke destpêka lamij/parazîtbûne, bûn awayê barekî giran li ser pişta civakê. Pîramîd, perestgeh û arena (meydan) wesfa vî barî gelek baş rave dikin.

Zêdebûna desthilatî di çaxên navîn de ji lezaniya xwe ti tiştek wenda nekir. Dîrok dagirtî (tijî) ye bi şerên desthilatî ku, bi rêya belavbûna li ciyên hin firahtir, zêde bûne. Di vê de berhemdariya civakê jî, ku zêde dibe, dibe sedem. Tebeqe anku çîneke fireh a arîstokrasiyan li xanedaniyên qraltî hate zêdekirin. Tevî vê yekê, ne gengaz e ku mirov hîn qala qansêrbûna çîna rêveber bike. Karesat/felaket destpê kir dema ku çîna navîn ku bi rêya hilweşandin û veguherandina

pêkhateyên qraltî û arîstokratî, destpê kir bibe rêveberî, bû awayê çîna desthilatî ya burjuwazî û burokrasî. Bê gûman mirov dikare rêveberiyên beriya wê jî weke karesat (felaket) binav bike. Lê vana, ne di wê rewşê de bûn ku civakê bi tevahî daqurtînin. Şûngeha wan a çendîtî (quantîtê) û çawanîtî (qualîtê) guncav nebûn ji bo vê yekê. Desthilatbûna burakrasî û beşeke girîng a burjuwaya navîn, tevlî beşên jorîn ên yekdestîperest ên burjuwa, û bûyîna wan a çînên dewletê, tê wateya bicîkirina bi hezaran û bi deh hezaran hêzên nû yên xanedanî li şûna çend hêzên kevn ên xanedanî û qraltî. Her wisa tê wateya ku bi hezaran qral dikevin şûna yek qral. Yekbûna kesayetiya serwer a zilam, ku di civaka zayendperest de pêşket, û van hêzên nû yên qraltî tên wateya fethkirin û mêtingehkirina xwezaya civakî bi tevahî ji alî hêzên nû yên desthilatî ve. Hemû beşên civaka exlaqî û polîtîk di serî de jin, di şûngeha qurbanên vê mêtingeriya hundirîn de ne.

Bi mêtina aborî û dewlet-netew re, yekparebûna yekdestiyên serwerî yên bîrdozî û emrazên desthilatî derdibirre, desthilatî bû her tişt. Lê, civak bû ti tîşt. Ev e cewhera wê bûyera ku em jê re dibêjin ‘qeyrana desthilatiyê’. Sîstema kapîtalîst hêza zayander a vê qeyranê ye. Şebekeya kapîtalîst, bi çîna xwe ya navîn a hûtbûyî û bi yekdestiyên xwe yên sermaye, ku sînor nas nakin di mezinbûna li ser aboriyê de, ancax bi şêwegirtina desthilatî weke dewlet-netew, dikare hebûna xwe bidomîne. Ev e her wisa ew bûyera ku jê re tê gotin ‘xitimana sîstamê’.

**b-** Civaka exlaqî û polîtîk, ku awayê asayî (normal) yê xwezaya civakî ye, rûbirû ye bi mayîna bêpar ji wesfên xwe yên bingehîn di çaxa me de, bi qasî ku nikaribe bi ti serdemên dîreokê re were berawirkirin. Civaka exlaqî û polîtîk, ku dewlet di hemû çaxên yekemîn û navîn de li hemberî wê pêşket, li gel modernîteya kapîtalîst, neçar maye ku ciyê xwe bihêle (biterikîne) ji rêveberî (îdare)ya dewletê û xalên huqûqa pozîtîf re, ku bi rengekî bêsînor pirr bûne. Wesfên civakê yên exlaqî û polîtîk di modernîteyê de ciyê xwe hêştine ji girseya kerîbûyî re û ji endamên hemwelatî yên kurmorîbûyî re, ku ti wate dernabirrin. Hemwelatî ya/yê qaşo ‘nûjen’(modern) ku di xwe de ti endîşeyeke exlaqî û polîtîk naguhêze, heyama xwe ya herî lewaz a bûyîna takekes, beravajiyê tê gotin, dinimîne. Girêdana wê/wî bi civakê re sînordar e [tenê] bi pîreka wî re, ku li ser wê rayeya împaratoriyê disepîne. Hebûneke bêkesayet e ku heliyaye di nava otorîteya desthilatî û dewletê de, bi qasî ku bi heyn/dema Fîrewn re neyê berawirkirin. Ev hemwelatî, bi serweriyên fizîkî û bîrdozî û bi sepanên vana yên înformatîk û teknîk, ne tenê radestî pergala yekdestîperest bûye, lê hîn rasttir, bûye endamekî faşîst ê dilxwaz, bi awayekî bê qeyd û merc, ê vê pergalê. Ev e ew bûyera ku ez jê re dibêjim ‘qeyrana kesayetiyê’. Xwezaya civakî nikare ji van kesayatiyan pêk were. Ji ber ku tevna wê ya bingehîn di wesfa exlaqî û polîtîk de ye. Lê, hûn bi find (mûm)ê jî bigerin, hûn nikarin van wesfan di vê kesayetiyê de bibînin (bidozin). Dewlet, bi van kesayetiyan ve dikarin bimeşin. Lê, ti civak nikare bi vê kesayetiyê ve were berdewamkirim. Hîn rasttir, ev kesayetî tê wateya înkarbûyîna civakê.

Li gorî ku wê dewlet nikaribe bêcivak be, careke din em bi wê rewşê rûbirû ne, ku dewlet û civak di nava hev de qeyranekê dijîn. Rewşa kesayetê bêkesayetî, ku xweperestî (ezezî)ya kapîtalîst gihîştiyê, ne tiştekî dîtir e, ji bili sîketin (projeksiyona)a qeyrana ku hem civak û hem dewlet ew dijîn. Eşkere ye ku, heya civak û takekes neyên xistin nava vê rewşê, nikare gengaz bibe rêveberiya ne sermaye û ne jî yekdestiyên desthilatî û dewlet-netew ku form(şêwe)a yekbûyî ya dewletê ye. Qeyrana civakî tê wateya rewşeke wêdetirî qeyrana pêkhateyî. Dikare ya nû li şûna pêkhateyekê were avakirin. Lê, wendabûyîna wesfên bingehîn ên bûyîna civakê, ne rewşeke wisa ye ku bi ji nû

ve avabûnê, bi hêsanî were derbaskirin. Lê, pêwîst dike ku civaka exlaqî û polîtîk ji nû ve were avakirin. Zorî li vê derê ye.

c- Bajarbûn, dîtirek e ji hêmanên herî biqeyran ên modernîteyê. Civaka bajêr a pêşketiye di nava yekparetiya diyalektîk de li gel civaka çandinî û gund, erkên girîng ên civakî pêk aniye. Rola wê di pêşketina rasyonalîte (aqil) û sanayî de heye. Nakokiya wê bi jîngehê re henûz (hîn) pêş neketiye. Lê, pêvajoya dewletbûnê rola bajêr şewşandiye. Hatiye veguherandin bo şûngeha baregaha çîna rêveber û bi vî rengî di nava pêvajoya dîrokî de pêkhate ê heşmendiyekê wergirtiye li hemberî civaka çandinî û gund û ekolojiyê. Bi şûngeha navendî ya çîna bazirgan re, sazbarî li hemberî civakê, li gel çîna hilberîner, lê hatiye arastekirin. Van sazbariyên neyînî, ku di çaxên yekemîn û navîn de sînordar bûn, li gel modernîteyê wek aşûtê mezin bûne. Bajar, ku li gel şoreşa sanayî mîna qansêr mezin bûn, bûne navendên rûxîna civaka kevneşopî. Bajarê sanayî, ne bajêr e, lê bêbajarbûna bajêr e û derxistina wî ya ji bûyîna bajêr e. Ne ku bajarên [bi şêniya] bi milyonan, lê tew bajarên [bi şêniya] sed hezarî jî dijraberî mantiqê bajêr in. Bajarê [bi şêniya] bi milyonan nabe, lê bajarên bi milyonan dibin. Eger li deverek bajarekî pênc milyonî hebe, tê wateya ku li wê derê bi rastî jî herî kêm pêncî bajêr hene. Taybetmendiya rûxîner a bajêr ji bo civakê, di vê rastiya wî de veşartî ye. Civakên asayî (normal) nikarin bajarên wisa ragirin û jîngeh ji xwe qet nikare wan ragire.

Mantiqê di bin mezinbûna hejmarî ya bajarên bi vî rengî de ew e ku civaka ku ne kapîtalîst e were mêtingehkirin, desthilatî were pirkirin û çîna navîn were hilhatin (bilindkirin) bo şûngeha rêveber. Hersê pêker (faktor) jî, bi tasfiyebûyîna civaka exlaqî û polîtîk, çêdibin. [Van hersê pêkeran] ne tenê gund û çandinî û civakên koçber tesfiye dikin; her wisa hunermend, zenaetkar, rewşenbîr û kedkarên din jî, ku beşên kevnepşopî yên xwedî erkên erênî ne, weke çanda hem daringî (madî) û hem arişî (manevî), wan dixin nava pêvajoya tesfiyebûyînê. Ji civaka bajêr tê derbasbûyîn bo girseya bajêr. Û qada çolter tê guhastin bo perr (waroş)ên bajêr û bi vî rengî şûngehekê mêtingeh wendigire, ku pirr zêdetir tê girtin bin venêran (kontrol)ê. Yekdestiya dewlet û sermaye bajêr û bajêr jî çolterê daqurtandiye. Û civaka ku ne civak e jî jîngehê daqurtandiye. Li gorî ku ne civaka çolterê, ne jîngeh û ne jî kedkar û rewşenbîrên kevneşopî yên bajêr nemane ku bajêr ragirin, rewşa ku derdikeve holê, careke din rewşa wêdetirî qeyranê ye.

Ne tenê karesat/felaketên jîngehî, lê qireke civakê ya rastîn, bi vê qansêrbûna bajêr re yekser têkildar e. Tespîteke hevbeş a zanistan e ku bi bajarên bi hejmara zêde, ku ne herêmek, lê tew welatek jî wê nikaribe wan ragire, denge (hevsengî)ya ekolojîk a cîhanê derbeyên mirinane xwariye. û tesfiyekariya civakê, tevnên civaka exlaqî û polîtîk in, ku hatine rûxandin ji alî çîna navîn a rêveber ve, ku weke gire (ûr) mezin bûye; girseya bêkar e; her wisa qelebalix (geremol)a hemwelatiyên bêberpirsyar e.

**d-** Hêza serwerî ya yekdestiyên dijberî aborî, ku her diçe mezin dibin, çavkaniyên aborî kiriye rajêrî daneheva kar û sermaye û bi vî rengî wan dûr xistiye ji şûngeha wan a dabînkirina pêdiviyên bingehîn ên civakê. Kapîtalîzm xwe bi aloziyên xwe yên sîstemîk îspat dike ku, berevajî yê tê rawêj (texmîn)kirin, ne sîstema aborî ya herî berhemdar e, lê yekdestiya dijberê aboriyê ye. Bandora şebekeyên yekdestî yên kapîtalîst aboriyê, ji sîstemek ku pêdiviyên bingehîn ên mirovan hildiberand, veguherandiye bo sîstemek ku bi berdewamî daneheva kar û sermaye pêk tîne, di pîvanên ku bi ti serdeman re neyê berawîrkirin, tevî hemû tezên vajî yên siyaseta-aborî (ekonomî-

polîtîk). Zanist û pêşketinên teknîkî di wê pîvangê de ne ku dikarin pêdiviyên bingehîn ên mirovan bi hêsanî dabîn bikin.

Divê em di vê rastiyê de li aloziya sîstemîk û pêkhateyî bigerin. Alozî û qeyran (ku şîdeta wan hindik û pirr e) ku bi berdewamî xwe diteyisînin bi kêmî û zêdeyî ya hilberînê, di serî de bi bêkarî (dîrok pirr kêm qala kole û serfên bêkar dike), ku di dîrokê de mînaka wê nehatiye dîtin, û bi hejarî û birçîtiyan, her wisa şer û pevçûnan bêhtir kûr dikin, wan dikin demdirêj û bi vî rengî cûreyek rêveberiya qeyranê ava dikin. Dijberiya aaborî, neçarê rêveberiya qeyranê ye. [Ji ber] bi cûreyek dîtir rêveberî nabe. Pêwîst e baş bê têgihîştin ku rêveberiya dewlet-netew rêveberiyeke qeyranê ya dere-asayî (anormal) ye. Derxistina civakê ji bûyîna civak û veguherandina wê bo girseyeke faşîst a kerî, ne tenê rêveberiyeke xweser bo Hîtler e, lê di heman demê de bi karakterê mîlîtarîst ê dewlet-netew tewê re pêwendîdar e. Rêveberiya dewlet-netew weke forma desthilatî ku tevahiya civakê dorpêç dike û xwe diçirpîne heya çavikên wê, neçar e ku bibe rêveberiya qeyranê, ji ber ku wê nikaribe pergala yekdestî bi cûreyek dîtir were domandin,. Afirandina netew, armanca wê ya dawî ye. Netewperestî jî, tevlî hêmanên din ên bîrdozî, 'nebe nabe'ya şêwaza vê rêveberiyê ye.

Ji hev cûdakirina aloziyên bazirganî, sanayî û malî yên di derbarê yekdestiyên kapîtalîst de, şêwazeke tehlîlê ye ku serî lê tê dayîn. Wekî din, qonaxên alozî û geşdarî, ku têne nitrandin, dûr in ji teyisandina sîstemê. Çerx (fetlok)ên ne nevend-derdor, ne serwerî (hegemonya)-hemberî (rekabet) û ne jî alozî-geşdarî, cewhara rasteqîn a sîstemê nateyisînin. Bê gûman, para van hemû rastiyan heye. Bi taybetî, tespîteke rast e ku qonaxa serwerî ya yekdestiyên malî (fînans) tê wateya heyama ku qeyran herî zêde diteyise. Lê, pirr girîng e tehlîl werin pêşxistin, bi zanebûna ku, eger dijberiya sîstemê ya aborî neyê têgihîn, wê van hemû rastiyan zêde wate di xwe de wernegirin.

**e-** Ne rasthatinî (tesadufî) ye ku qeyrana ekolojîk di heyama modernîteyê de peqiyaye. Ev qeyran bi dijberiya sîstemê ya aborî re pêwendîdar e. Pêkhateyîtî di xwe de werdigire. Dengeya biyolojîk di bingeh de bi têkiliyên sîmbîotîk (xwe domandin, bi rêya xwedîkirina berhemberî ya hev û din) ên cûreyan tê bidestxistin. Ya dibe para biyolojî ya zekaya gerdûnî, rêkûpêkkirineke bi vî rengî çêkiriye. Me hewl dabû em wê pênase bikin weke pêkhatin û pêşketina cewazîtiyên jiyanê. Dengeya biyolojîk girêdayî vê rêsayê ye. Min qala girêdana çêbûna cewazîtî bi şiyana azadî û bijartinê re jî kiribû. Cîhan (alem)ên mîkro (livik û paketên herî piçûk ên enerjî û daring/made) û makro (giravên enerjî yên di meziniya astronomîk de) bi sîstemeke dirûv dixebitin. Nikare were jêpirsîn sedemîtiya şêwazên têkiliyan, ku cewazîtiyan pêk tînin. Ji bo niha, em qîma xwe pê tînin, bi gotina "wisa ye, ji ber ku wisa ne". Belkî jî nebesiya me ya li ser zanînê –agahiyê- û feraseta me ya şaş a li ser zanistê, bêzar e ji têgihîna rastiyê.

Xwezaya civakî ya mirov, di têkiliyên xwe yên bi jîngehê re, rejêrî vê rêsaya gerdûnî ye. Di heman demê de, ji ber xwezaya xwe ya tijî bi zekaya herî nerme, cûreyek wisa ye ku şiyana wê ya azadî û bijartinê, herî pêşketî ye. Lê, yekdestiyên dij-aborî yên kapîtalîzmê, bi vê rêsayê re binakok dibin. Çawa ku têkiliya sîmbîotîk vediguherîne (bo) têkiliya mezintirîn serwerî, desthilatî û zordarî jî girêdanên ekolojîk ên bi jîngehê re di pêkhateya hundirîn a civakê de vediguherîne bo têkiliya zordarî li ser xwezayê û mêtingehkirina wê. Tevahiya jîngeh û civakê digire bin zordarî xwe ya yek-alî û bi vî rengî dibe hût/dêw, heman mîna kevzên kujer, yan jî weke di her çi cûreyek dîtir a dirûv de tê dîtin. Dibe awayê hebûneke bi gewdeya dêw (Levîathan). Sîstemek, spartî tenê bi daneheva kar û sermayeyê, nikare bi cûreyek dîtir tevbigere. Eger di bergeh/îstîqameta vajî/ters de

tevbigere anku şêwaza têkiliya sîmbîotîk esas bigire, wê zagona karê nexebite. Her wisa, wê sîstem neçar bimîne ku veguhere.

Xweza û jîngeh, bi sîstemên mantiqên xwe yên cewherîn re berevajî yê tê rawêjkirin, di nava denge (hevsengî)yê de ne. Kirina qala dîliya (esareta) hêzên kor, nirxandineke şaş e. Yên ku vê hestyariyê dirûxînin, sîstema şaristanî yê û bêhtir jî modernîteya zordar a yekdestîperest a roja me ya îro ye. Mezinbûna wek cûreya qansêr a çîna navîn, ku bûye awayê hêza desthilatî, her wisa mezinbûna qansêrî (kanserolojîk) bi şêwaza dirûv a bajaran, ku qadên bingehîn ên jiyanê ne, sedemên rasteqîn ên civakî yên rûxana li ser jîngehê ne. Hem bi rêya şerkirina li hemberî pêktateyên barkirî bi zekaya herî nerme ya xwezaya civakî û hem bi rêya veguherandina têkiliyên wê yên sîmbîotîk bi jîngehê re bo têkiliyên zordar  û mêtinger, rê li ber van rûxanan vedike. Ji ber vê sedemê, di navbera qeyrana civakî (hîn rasttir qira civakê) û qeyrana ekolojîk de, girêdaneke pirr tund heye. Qeyranên di herdu qadan de, hevdu bi berdewamî xwedî dikin. Dema ku kara yekdestiyê, bi awayekî naçarî rê li ber zêdebûna şênî, bêkarî, birçîtî û hejariyê vedike, heman peqana şêniyê, ji bo derbaskirina bêkarî, hejarî û birçîtiyê neçar dimîne ku berê xwe bide rûxandina jîngehê. [Bi vî rengî] cîhana lawiran, nebatan û daristan dikevin bin xeteriyeke mezin.

Bê gûman, vê rewşê weke kara zêdetir, li yekdestiyan dizivire. Çerx (fetlok) herku bidome (ji bo mînak, herku şênî bigihîje deh milyarî û hîn zêdetir mezin bibe), dengeya ragirtina cîhanê bi temamî ji hev dikeve. Qiyameta tê payîn, bi vî rengî pêk tê. Çawa ku awayê bijûndar ê mezinbûnê û awayê wê yê biqansêr di asta şanikan de şaşwaz dibin û bi vî rengî rê li ber qansêr û mirine vedikin, mezinbûnên kara yekdestî jî yên bi şêwaza dirûv, mezinbûna bijûndar (di her asta xwezaya civakî de) asteng dikin û bi vî rengî pêl li tetîka pêşketina qansêrî (kanserolojîk) ya civakî û jîngehî dikin. Bi ser de, ji alî bijîşkiyê ve dikare were ravekirin ku nexweşiyên qansêrî jî yên biyolojîk, di cûreya mirov de, weke encameke van qansêrên civakî pêş dikevin. Diyar e, ne kêmtir e ji kurmoriyekê şiyana azadî û bijartinê ya heyînekê weke cûreya mirov ku asta we/wî ya zekaya nerme, herî bilind e. Gelo hatiye dîtin ku kurmorî bêkar mabin, ku mirov bi awayên zekaya xwe ya heyî bêkar bimînin? Eger zagona karê neyê raçavkirin, tenê sererastkirinên ekolojîk jî xwedî derfetên bicîkirinê (îstîhdam) ne ku karibin bi tena serê xwe tevahiya bêkariyê ji holê rakin. Bicîkirin (îstîhdam)ên biarmanca ekolojîk; li milekî, dema jîngehê rizgar bikin; li milê din, dikarin bi bingehî dawî li bêkariyê jî bînin. Gengaz e bi sedan qadên wisa bêne dîtin –dozîn-. Lê ji ber ku li gorî zagona karê, ne kardar in, ji  bicîkirin (îstîhdam) ê bêpar têne hêştin. Têkiliya di navbera kirina ekolojîk û sîstemê de biqeyran e û di wesfa nedombariyê de ye.

**f-** Lîberalîzm, ku bîrdoziya serwerî ya sîstemê ye, bi awayên xwe yên çi klasîk û çi jî ‘neo’ nikare çareseriyê hilberîne. Lîberalîzm, ku wateya wê ya peyvê ‘azadîxwazî’–rizgarvanî- ye, têgînek e ku xwedî dîmaneweriya tund e. Ya ku ji kesek an jî komek re azadî bûye, li dijberê/a xwe weke koletî teyisiye, yan jî zêdetirîn azadî ji bo qralên-xweda yên çaxa yekemîn, kariye gengaz bibe ancax bi koletiya girseyên fireh ên gundî û serf. Lîberelîzm ji bo burjuwayên Çaxa Nû, meşiyaye di nava hev de bi koletiya fireh a mizeya herî hindik a proletaran, nîv-proletaran û kedkarên din re, ku koleyên şêwaza nû ne.

Lîberalîzm dema ku bi wateya xwe ya fermî ji bo hemû çînên dewlet-netewê, azadî ye; lê ji bo hemweletiyên ku bendeyên nûjen in, tê wateya bêkarî, xebata bêmize, hejarî, birçîtî, newekhevî, bêazadîtî û bêparî ji demokrasiyê. Pêwîst e di wateya teqez de baş bê dîtin ku lîberalîzm ne

azadîxwazî ye. Hegel, dewletê weke navgîna herî baş a azadiyê hasibandibû. Lê, derket holê ku ev azadî, tenê ji bo çînên dewletê û burokrasiyê derbasdar e. Bi gotineke din, ya ku ji bo yekdestî (bijarteker)yên aborî û desthilatî azadiya zêdetirîn e, ji bo hemûyên din û dîtir koletiya ji her nijadî ye.

Pirr girîng e ku lîberalîzm weke bîrdozî were naskirin. Ji bo pênaseyê têrê nake ku tenê jê re bê gotin xweperestî (ezezî) û azadixwazî. Weke têgîn, di Şoreşa Frensî de tevlî têgînên weke azadî, wekhevî û biratî derket pêş: Bi awayê wan têgînên navdar ên lîbertê (azadî),egalîtê (wekhevî) û fraternîtê (biratî). Weke têgîneke navendî, li aliyê xwe yê rastê, kevneparêzî (muhafazakarî)yê û li aliyê xwe yê çapê jî, pêşî demokratparêziyê û paşê sosyalîstan, dît (dozî). Xwe da xuyanîkirin bi awayekî nerm weke pêşxistina sîstemê (yekdestîperestiya kapîtalîst) bi peresanê bêyî ku pêdiviya wê bi şoreşan hebe. Û kevneparêz (muhefazakar), dixwazî bi peresanê, dixwazî bi şoreşê bûya, bi tevahî dijberên pêşketina azadîxwaz bûn. Lê qraltiyê, malbatperestiyê û dêrê bi bawerhişkî (paşverûtî) diparastin. Û sosyalîst û demokrati jî ji bo ku guheran bêhtir bilez çêbûna, şoreşan weke neçariyekê didîtin. Paydeya hevbeş a hemûyan jî modernîte bû. Herkes tevî ku hin îtîrazên wan jî hebû, di warê xwe nûjenkirinê de, xwe weke xwedî îdea didît. Jiyîn, bi rêya derbaskirina guherana bi xetên herî gelemperî, têrê dikir ji bo mirov bûbûya modernîst. Jiyana nûjen/modern a bi navenda Ewrûpa, ku bingehên wê bi bajarbûnê hatin danîn û bi Ronesans û Ronakbîrî bilez bû, asoya hevbeş a hersê bîrdoziyên serekîn jî dinimand. Pirsgirêk di wê yekê de asê dibû ka wê kê, kî, kîjan bîrdozî û partî, rêbaz û sepan, her wisa çalakî û şer, vê asoyê bi awayê herî baş bidest bixistana.

Lîberalîzm vê rewşê pirr baş tespît kir. Pê zanî (ferq kir) ku modernîte bi mora kapîtalîst pêşdiket û dikarîbû hîn zêdetir bihata pêşxistin; bi vî rengî, dereng nema ku bi bîrdozî û pêkhateyên li rast û çepê xwe re, bi westa/hostetî bilîze. Xwe weke lîberalîzma rast û çep dabeş kir. Dema ku bi lîberalîzma rast ve, kevneparêzan bêbandor kir û ew di nava xwe de veguherand bo baskekî, bi lîberalîzma çep ve jî, demokrat û sosyalîstan biqismî li yêdeka xwe bicî kir. Li şûngeha navendî, bi vî awayî rûnişt. Di her kûrbûna qeyranê de, dikarîbû yek ji wana bigirta yêdeka xwe û bi vî rengî xwe xurt bikira. Burjuwabûyîna arîstokratan û demokratbûyîna sosyal (civakî) a beşek karkerên tawîzkar, bi derêjiya rêveberiyên qeyranê pêş ketin. Pareke pirr kêm (cuzî) ji kara yekdestiyê, têra vê yekê dikir. Dijber (muxalif)ên li dijî sîstemê yên sedsalên 19. û 20. bi vî awayî, ne tenê dihatin bêbandorkirin, her wisa dihatin xistin şûngeha hêzeke yêdek, ji bo ku bunyeya bi qeyran di hemû pêvajoyan de bihata rêvebirin. Serweriya bîrdozî ya lîberalîzmê bi vî awayî dihate damezrandin.

Lîberalîzm, ji bo domandina serweriya xwe ya bîrdozî, ji çar varyantên bîrdozî yên girîng, sûdwergirt:

**1-** Netewperestiyê bi şêweyekê bandorker bikar anî. Netewperestî, hem di rewakirina şerên hundirîn û derveyîn de û hem di çêkirina netew de bi deste dewletê, hevpeymanera guzîde ya lîberalîzmê bû. Yekemîn xeleka bijateker (eklektîk) pêk dianî. Gelek ezmûn bidest xist di derbaskirina qeyranên herî giran de bi rêya sorkirina hestên netewî. Bîrdoziyeke pîroz di asta ol de li netewpêstiyê hate kirmişandin. Di bin vê rûberê de, ne tenê qeyran bi hêsanî dihatin derbaskirin û domandin, her wisa li aliyê din, yekdestî dikarîbûn sîstemên xwe yên herî giran ên mêtinê û xirabûyî, bi heman rûberê veşêrin.

**2-** Rola netewperestî hate arastekirin li bîrdoziya olî ya kevneşopî. Lîberalîzm, olên kevneşopî, ku cewhera wan a taybetmendiyên exlaqî û polîtîk vala kir, wan di bin serweriya xwe de

kir mîliyet. Hîn rasttir, wan kir ola mîlî (netewî). Hestên olî, ku binekoka wan di kûraniyên civakê de hene, bi rengê netewperest hatin boyaxkirin, bi netewperestî re heman rolê, heta ya bêhtir kelijîner, leyîst. Carna, herdu bîrdozî ketin nav hevdu û bi vî rengî hewl hat dayîn ku netew li ser bingeha etnîkî û olî were avakirin. Bi taybetî bîrdoziyên Cihû û Îslam bi hêsanî bûn wekhev li gel netewperestiyê. Olên din (Xirîstiyanî, Olên Rojhilata Dûr û kevneşopên olî yên kevn ên Afrîka) jî li paş neman ku şûngeha dirûv bigirin ser xwe. Dihat wateya ku lîberalîzm jî mîrasa çanda arişî bi kanala olî diguhast bo şaristaniya kapîtalîst, ku mîrasa çanda daringî ya şaristaniyê dewr girt, û wê pê re dikir yekpare –entegre-. Di derbaskirina qeyranên sîstemê yên di rehendên nedomdar de, nikare were paşçavkirin rola bîrdoziyên netewperest ên olî, ku li lîberalîzmê hatin lêkkirin.

**3-** Bîrdoziya zanistprerestiya pozîtîvîst, bi taybetî weke varyanteke felsefî, tevkariya xurt ji lîberalîzmê re pêşkêş kir. Bîrdoziya pozîtîvîst, ku ji rêzdariya xurt a zanistên xwezayî sûd wergirt, di warê bandorlêkirina bîrdoziyên hem rast û hem jî çep de, rola sereke leyîst. Weke etîketa zanistî, bi hêsanî bi bîrdoziyan ve hate kirin û rê li ber mezintirîn paşêvajkirinan vekir. Bi taybetî, mora xwe li hemû derketinên bîrdozî yên çep xist. Sosyalîzma pêkhatî di vê mijarê de serkêşî dikir. Mirov bi zanistperestiya pozîtîvîst, ketin kemîna modernîzma kapîtalîst. Û li aliyê rastê, faşîzm di şûngeha bizaveke herî li pêş de bû ku hêza xwe ji zanistperestiya pozîtîvîst digirt. Pozîtîvîzm, bi vî awayî bijareyên bîrdozî di baweşînek de ji çepa herî pirole heya rasta herî pirole ji lîberalîzmê re pêşkêş dikir. Lîberalîzm, van bijareyan di mercên her cî (mekan) û dem (zeman) ên pêwîst de, bi xwe vidikir movik û wan bi kar dianî; ev dihat wateya ku di derbaskirina qeyranên xwe yên pêkhateyî de, bi mezintirîn awayî ji wan sûd werdigirt.

**4-** Zayendperestî di dîrokê de herî zêde di çaxa lîberalîzmê de weke hêmaneke bîrdozî hate pêşxistin û bikaranîn. Lîberalîzm ne tenê qîma xwe pê neanî ku jinê ji nava malê de veguherîne bo karkera bêmize; lê bêhtirî vê yekê bidest xist, bi rêya ku wê weke heyber(obje)eke zayendî kir meta û pêşkêşî piyaseyê kir. Dema ku di zilam de tenê ked hate metakirin, jin bi hemû beden û giyana xwe ve hate metakirin. Di rastî de ev dihat wateya ku şêweya herî xeternek a koletiyê dihate avakirin. 'Pîreka Şiyê xwe' tevî ku rengdêreke baş nebe jî, dibe mijara kedxwariyeke sînordar. Lê belê, metabûna bi hemû kesayetiya xwe ve, tê wateya koleya xirabtir ji koletiya fîrewnan. Vebûna ji koletiya herkesi re, qatbiqat xetertir e ji bûyîna koleya dewletek, an jî kesekî re. Ev e ew kemîna ku modernîte li jinê daniye. Jina ku di xuyaniyê de li azadiyê vedibû, dihat wateya ku diket şûngeha navgîneke herî rezîl a kedxwariyê (îstîsmar). Navgîna bingehîn a kedxwariyê, em ji navgînîtiya reklamê bigirin heya navgînitiya seks û porno, jin e. Ez dikarim bi hêsanî bêjim ku jin di guhastina kapîtalîzmê de hatiye xistin bin barê herî giran.

Zilam, weke nûnerê dewletê yê di nava malbatê de, ji pêşxistina hem mêtin û hem jî desthilatiya li ser jinê, xwe weke berpirsyar û rayedar dibîne. Bi rêya belavekirina zordestiya kevneşopî ya li ser jinê, her zilam vediguherîne (dike) parçeyek desthilatiyê. Civak bi vê rê dikeve sendroma mezindirîn desthilatbûnê. Statuya jinê hest û ramana desthilatî ya bêsînor dide civaka bi serweriya zilam. Wekî din, kedkarên jin in û jin bi xwe ne yên ku berdêl bi wan têne sencandin, di hemû tiştên neyînî de, ji çêbûna karkeriya tawîzkar heya bêkarî û ji karkeriya bêmize heya mizedariya herî kêm. Bîrdoziya zayendperestiya bijarteker (eklektîk) a lîberalîzmê, ne tenê vê rewşê paşêvaj dike û wê cewaz nîşan dide; her wisa bi ser de wê vediguherîne bo varyasyonên bîrdozî, ku ji bo jinan bi bayex hatine pêşxistin. Tiştekî wisa ye weke ku mirov koletiya xwe bi deste xwe bide pêsend kirin. Dikare bê gotin ku sîstem, bi îstîsmarkirina jinê re di warên bîrdozî û daringî (madî)

de, ne tenê qeyranên xwe yên herî giran derbas dike, lê di heman demê de heyîna xwe jî misoger dike û wê dixe bin ewlehiyê. Jin di şûngeha mêtingeha herî kevn û herî nû ya dîroka şaristanî de bigelemperî û moderníteya kapîtalîst de bi taybetî, ye. Eger dikare ji her hêlê ve rewşeke qeyranê ya nedombarî were jiyîn, di vê de para mêtingehbûna jinê di serî de tê.

Sîstema kapîtalîst a cîhanê, di serweriya yekdestiyên fînans ên kûrewî de di roja me ya îro de qeyranên xweser bo fînansê jî bi qasî aloziya gelemperî ya sîstemîk bi hevparî dijî. Aloziyên gelemperî yên sîstemî (çavkaniya xwe ji dijberiya aboriyê digirin) bi qeyranên xweser bo fînansê re (ya ku tê nimandin bi argûmanên kaxizên cûrbecûr ên xeyalî û wekî vana, ku pirrî caran qut dibin ji hilberîna pere, ji zêr û heta ji Dolar) di nava hev de û pêvajoya herî binî ya dîroka xwe dijî. Sîstem, aloziyên xwe heya niha di bingeh de bi du rêyan derbas kiribû: Ya yekemîn, bi emrazên zora daringî (madî) yên desthilatî û dewlet-netewê, ku bi berdewamî têne pirkirin. Vana, her cûre şer, girtîxane -geh-, tîmarxane, nexweşxane, êşkancaxane, getto, her wisa nijadkujî û giren civakî yên herî xeternak in. A duyemîn, bi emrazên serweriya bîrdozî yên liberal ku bi rêya movikkirina berdewamî têne pêşxistin. (vana) ew bi xwe di navendî de weke bîrdozî û pêvekên wê netewperestî, olperestî, zanistperestî û zayendperestî ne. Di navberê de dibistan, padîgan/qişle, ayîngeh/îbadetgeh, organên medya û herî dawî tor/şebekeyên înternetê hene. Divê mirov sanayîkirina çanda hunerê jî li vana zêde bike.

Lê, tew zanyarên ji rêzê jî dipejirînin ku van herdu rêyan jî wateyek wisa di xwe de werdigirin ku di şûna hilberandina çareseriyê de rêveberiya qeyranê pêşxistine. Alozî û qeyran, bi qasî ya berê jî be, nayên derbaskirin. Berevajî, alozî û qeyran, ku berê îstîsnaî bûn, niha bûne berdewamî: heyamên asayî/normal, weke awayê awarte/îstîsnaî bi hev re cî diguherînin. Digel ku di bingeha sîstemên şaristaniyê de hêmanên aloziyê hene, civaka mirov qet nebûbû şahîdê ya ewqas giran. Civak, eger bidomin, nikarin demeke dirêj xwe ragirin li hemberî rêveberiyên qeyranê. Yan wê ji hev bikevin, yan wê belav bibin; yan jî wê li ber xwe bidin û bi vî rengî sîstemên nû pêş bixin û wan derbas bikin. Niha em di heyam (dem)eke wisa de derbas dibin.

**B-Rewşa Hêzên Dijberî Sîstemê**

Dijberiya sîstemê, weke tegîn, pirr bipirsgirêk e. Berî her tiştî, gelo şaristaniyê jî digire nava xwe? Bi kîjan aliyê xwe ve, wê digire nava xwe û wê jêder dike? Çawa dinêre li têkiliya sîstemê bi moderníteyê re? Gelo dikare sîstemeke nû were avakirin, bêyî girtina şûngeheke dijberî moderníteya sîsteme? Moderníteyê çawa têdigihe û gelo kariye karaterê wê yê dumendî tespît bike? Gelo têgihana wê ya modeníteya alternatîv heye? Eger pirsên bi vî rengî neyên bersivandin, wê tegîna 'hêzên dijberî sîstemê' li hewayê bimîne. Eger, ne tenê proyên wan ên di derbarê pêşerojê de, her wisa dîrokên wan ên di derbarê paşerojê de jî, bi awayekî rast neyên tehlîlkirin, zor e ku dijberiyeke sîstemê ya watedar were pêşxistin. Di tehlîla xwe de min têgîna şaristanî û moderníteya demokratîk esas girt ji bo derbaskirina van zoriyan û peydakirina bersivên potansiyel ji van pirsan re. Ez di wê baweriya de me ku vê yekê gerîneke rast a li rêbaz û alternatîvan e, ji bo mirov nekeve wan çerx/fetlokên stewr (bêsûd), ku di dema bihûrî de hatin jiyîn.

Hêzên dijberî sîstemê tevî hemû pêkhateyên xwe yên bipirsgirêk rastiyek in. Herî kêm bi qasî sîstemê, bandora xwe li çaxa me kirine. Dibe ku nekarîbin sîstema xwe di warên teorîk û pratîk de çêbikin, lê bênîqaş e ku xwedî daneheveke pirr mezin a ezmûnê ne. Digel ku cewazîtiyên girîng

hene di navbera hêzên dijberî sîstemê de, ku xwedî baweşîneke fireh in, dikare bê diyarkirin ku gelek nirxên hevbeş parve dikin.

Mebesta wan ji sîstemê, kapîtalîzm e. Nikare bê gotin ku mebesta wan bi tevahî modernîte ye. Di mijara sanayîgerî (endustriyalîzm) û dewlet-netew de, ku herdu rehendên din ên modernîteyê ne, zêdetir cewazîtî werdigirin. Di mijara şaristanî de şolî ne (tevlîhev in). Bi nêrînên xwe yên girîft ve, dikarin pirrî caran li cemserên dijber cî bigirin. Zêde nayê dîtin ku utopyayên wan ên li ser pêşerojê, modenîteyê derbas bike. Mirov dikare diyar bike ku, ne derbaskirina wê, lê sererastkirina wê, esas digirin. Dibe ku modenîteyeke bêkapîtalîzm têra bernameya pirraniya wan bike. Lê, zêde pêdernaxin (ferq nakin) ku ev ancax (tenê) utopyayek e.

Di mijara sîstemê de û di derbarê ku sîstem di qeyranê de ye, xwedî nêrîna hevbeş in. Lê ji bo çareyê, cewaziya di navbera wan de mezin dibe. Ji guherana peresanger heya guherana şoreşger û ji rêbezên aştiyane –aştixwazî- heya rêbazên şerane –şerxwazî- gelek rêyên cewaz têne pêşniyarkirin. Çawa ku yên guhertina dewlet û desthilatiyê weke şoreş dihesibînin hene, yên civakek bêdewlet û bêdesthilatî pêşniyar dikin jî hene. Koka hemûyan di bingeh de xwe dispêre Şoreşa Frensî. Pêkhateyên wan ên raman, ji netewperestî heya komunîzmê ji olperestî heya pozîtîvîzmê û jî femînîzm heya ekolojiyê, perspektîveke fireh pêşkêş dikin. Tevî ku xeylî di nava hev de ne, vêya têdernaxin (ferq nakin). Bi gelemperîkirineke bingehîn ku karibe di derbarê şûngeha wan a civakî de were kirin, dikare bê gotin ku xwe dispêrin beşa serekîn a ku li derveyî yekdestiyên sermaye û desthilatî yên çîna navîn dimîne. Van tevgeran, ku rewşa wan li hemberî kapîtalîzmê herku diçe dijwar dibe û rewşenbîrên ku di perwerdeyeke diyar a nûjen de derbas bûne pêşengiya wan dikin, dûr in ji wergirtina pirraniya raser a civakê. Yên ku berjewendiya wan di kapîtalîzmê de ye, eger kêm-zêde ji sedî deh bin, rêjaya dijber (muxalîf)ên wê jî di vê astê de ye. Ji sedî heştê yê civakê, weke civaka ku ne-kapîtalîst e, di hêla herdu beşan de jî, di tehlîl û çareseriyan de di şûngeha ne subjê, lê obje de ye. Dema ku kapîtalîzm li ser wê [civakê] hesaba karê dike, dijber (muxalîf), wê dinirxînin [lê dinêrin] weke girseyek, ku karbibe ancax ji der ve were kişkişandin. Di bingeha nekarîna wan a derbaskirina modernîteya kapîtalîst de, ev rastî heye.

Dema em diyar dikin ku sîstem (weke modernîteya kapîtalîst) di rêveberiya qeyraneke nedombar de tê jiyîn, em qala 'rewşeke şoreşgerî'ya nû nakin. Rewşên bi vî rengî, ku weke mercên objektîv ên şoreşê jî têne nirxandin, di gotûbêjen dema bihûrî de pirr hatin îstîsmarkirin. Mirov nikare bêje ku encamên zêde serkeftî ji wan hatiye derxistin. Dema ku ji qeyranan gelek rêveberiyên qeyranan derdikevin, dikarin dij-şoreşên tundtir jî derbikevin. Belkî jî, ya ku şansê wê herî zêde lê tê, şoreş e. Bi ser de rola şoreşan a di veguheranan de bi gelemperî hatiye nitrandin û bi pirranî jî bi awayekî şaş hatiye tehlîlkirin. Veguheranên bingehîn, ne ji alî şoreşan ve, lê ji alî cewazîtiyên sîstemê ve têne pêkanîn. Şoreş, ancax di nava sîstemên ku tê de bin, dikarin rê li ber guheraniyên watedar vebikin. Bê gûman, rast e ku hêzên dijberî sîstemê ji alozî û qeyranan bi tundî bibandor dibin. Lê, şaş e ku mirov hemû hêviyan girêbide bi encamên ku ji aloziyan derbikevin. Di dema bihûrî de gelek caran hate ketin nava şaşîtiyên bi vî rengî. Her wisa bi awayekî kûr, mirad di ber de man (şikestinên xeyalê çêbûn).

Sosyalîzma pêkhatî, demokrasiya civakî (sosyal) û bizavên rizgariya netewî, bêyî ku zêde karibin sed salekê jî derbas bikin, bûn movikên kapîtalîzmê; vê yekê bû sedema neyîniyên kûr li ser dijberên sîstemê. Tevger, hêza xwe wenda kirin. Ev rewş çavkaniya xwe di rasti de ji nebesiyên di

bunyeya wan de, û ji bîrdoziyên wan ên şaş û nêrînên wan ên bernameyî digire. Dema heşmendî û pêkhateyên wan were lêkolîn, wê bê dîtin ku zêde nekarîne lîberalîzm û modernîteyê derbas bikin. Bûyîna wan a çepa rêal a herî rast, ne astêng e li pêş wê yekê ku zû yan dereng bi lîberalîzmê bidawî bibin. Û xwe movikkirina wan li yekdestiyên kapîtalîst, pêwendîdar e bi feraseta wan a li ser moderniteyê. Postmodernîzm, olperestiya radîkal û tevgerên femînîst û ekolojîk tevgerên nû ne, ku bêhtir weke encama berteka ku ji van pêşketinan re hate nîşandan, derketin holê. Lê, şûngeha wan a bîrdozî û pratîkî ya heyî, mirovan dixe nava gûmanan derbarê ka wê karibin bandorker bin bi qasî dijberên sîstemê yên kevntir. Neolîberalîzm û olperestiyên radîkal ji ber vê sedemê dikarin hinekî bandorker bibin. Pêdiviya dijberên sîstemê, ji ber van sedeman, bi nûbûnên radîkal ên rewşenbîrî, exlaqî û polîtîk heye. Naskirina ji nêztir ve hêzên dijberî sîstemê di nava vê çarçoveya serekîn de girîng e, pêwîst e û kêrhatî ye.

### a- Mîrasa Sosyalîzma Pêkhatî

Yek ji wan tevgerên sereke ye ku li hemberî sîstema kapîtalîst, yekem car bi zanabûn bertek nîşan da. Bi gotina damezrînerên wê Karl Marks û F. Engels, bi rêya xwe xwedîkirina ji sê çavkaniyên serekîn, hewl dane sîstema xwe ya dijber pêş bixin. Vana, bîrdoziya Alman, siyaseta aborî (ekonomî-polîtîk) ya Îngilîs û sosyalîzma utopîk a Frensî ne. Wer tê têgihîştin ku materyalîzma diyalektîk ji bîrdoziya Alman, teoriyên xwe yên li ser nirxê ji siyaseta-aborî ya Îngilîs û teoriyên xwe yên di derbarê têkoşîna çînî de ji sosyalîzma utopîk a Frensî, gitine. Bi senteza ku ji van hersêyan girtine, şîroveyên xwe pêş xistine. Heyama ku tê de dijiyan û yekem car dijberî (muxalafet) dikirin, rastî aloziya cidî ya kapîtalîzma salên 1840-1850 tê; loma vê yekê bandora xwe li ser wan kiriye. Hêvî der/çê bûne di derbarê wê yekê de ku wê karibe siste tavilê were hilweşandin. Pirsgirêkên Almanya yên yekîtiya netewî û yên Fransa yên komarê di rojevê de ne. Îngilîstan, weke hêza serwer a sîstemê, di lûtke de ye. Şoreşên gelerî yên Ewrûpa yên 1849, weke nîşane hatine hesibandin, derbarê bê ka wê hêvî karibin pêk werin an na. Manifestoya Komunîst, weke bernameya giştî ya van şoreşan, hatiye hizirîn. Lîga Komunîstan jî, weke yekemîn parti yan jî rêxistina enternasyonal –nevnetewî- a giştî, hatiye damezrandin. Van herdu xebatan bi eşkereyî nîşan didin ku ji aloziya kapîtalîzmê û ji tevgerên şoreşger ên gelêrî serkeftin û zafer hêvî dikirin.

Dema şoreş hatine çewsandin, pêwîst ditine ku kapîtalîzmê bi kûranî lêbikolin. K. Marks weke sirgûn li Londonê, kabeya kapîtalîzmê, bi cî bûye. Ew û F. Engels pirrî caran hevdu dibînin. Xebatên Enternasyonala Yekemîn a 1864, berhemên ve demê ne. Pêşketineke din a girîng a vê vê demê ew e ku dibe şoreş dereng bimîne [pêk were] lewre dibe ku xebata peresaner demeke dirêj pêwîst bike. Xebatên li ser sendîka û parlamenterî, guncav hatine dîtin. Her çend serhildanên Komuna Parîs a Frensî ya 1871 hêviyan teze kiribin jî, lê zû hatin tepisandin (serkutkirin) û ev jî wê yekê bi xwe re aniye ku di mijarên diktadorî (zordarî), desthilatî û dewletê de hîn zêdetir bihizirin. Bûyîna wan a alîgirên dewlet-netewa navendî, çawa ku rê li ber dijberiya (muxalefeta) anarşîstan vekiriye, yekemîn gotubêjen li ser reviyonê jî bi xwe re aniye.

Ji nû ve ragihan (îlan)a Enternasyonala Duyemîn di salên 1880 de, di bin siya şovenîzma netewî de hatiye kirin. V.l. Lenîn, bi xebata xwe ya bi navê Enternasyonalîzma Proletarya û Kaûtsky yê Lader, wê vê pêvajoyê bi revîzyonîstiyê tewanbar bike. Partiya Demokrata Sosyal (civakî) a Alman (Partiya Yekemîn), wê hîn di vê demê de bi kirina serkêşiya revîzyonîzmê (Bernstesîn) were tewanbarkirin. Şoreşa Cotmehê ya Rûs, zêdetir xurt kiriye wan hêviyên derbarê ku wê utopyaya

komunîst karibe pêk were (bi serxistina ya ku Komuna Parîsê nekarî bi ser bixe). Ev şoreş di asta cîhanê de rê li ber pêşketinan ve kiriye. Ji gavên pêşîn ên di vê rasterê de ew bûn ku, tevgera rizgariya netewî ya Kurd û Tirk a Anatolya destek bike û bi vî rengî tevkarî pêşkêş bike da ku çaxa tevgerên netewî di asteke hîn jortir de û bi serkeftî pêş bikeve. Mirina pêşwext a Lenîn, heyama ku jê re tê gotin têkoşîn li hemberî tesfiyekariyê, avakirina sosyalîst, têkoşîna dij/antî-faşîst di Duyemîn Şerê Cîhanî de, Peymana Warşowa li hemberî Rêxistina Peymana Atlantîk a Bakûr (RPAB/NATO) di heyama şerê sar de, xebatên li ser fezayê, hemberî (pêşbazî) ya aborî bi kapîtalîzmê re û desteka belave ku hate dayîn bo tevgerên rizgariya netewî, yekûn (bilanço)a serekîn pêk tînin. Di van heyaman de di salên 1920 de Enternasyonala Sêyemîn hatiye nûkirin, lê ji ber neçareseriya wê ya dewlet-netewê, heman weke Enternasyonala Duyemîn, tesfiyeya navxweyî jiyaye. Rûsyaya Sovyet, weke berendamekê nû yê serwer, kariye li yek ji sisê yê cîhanê bandorker bibe. Tevgerên sosyalîst ên di nava dewlet-netew de bi bextê wan re rûbirû hêştiye û bi vî rengî dageriye (ketiye) heman rêya revîzyonîst (Partiya Demokrat a Sosyal a Alman). Êdî Partiya Komunîst a Yekîtiya Sovyetan rêwiya kapîtalîzmê ye. Berxwedana demkurt a Çînê (heyna Mao ya 1960-76) û ya Albanya/Arnavutluk encam nedane. Tevgerên rizgariya netewî û tevgera karkeran a sendîkalîst (sendîkavanî) hîn zû bûn yekpare –entegre- bi sîstema kapîtalîst re; her wisa Çîn di salên 1980 de, Rûsya û hevpeymaner (mutefîk)ên wê jî di sala 1990 de bi fermî ragihandin ku dev ji sosyalîzma pêkhatî berdane; bi vê yekê re heyamekê hatiye girtin.

Ezmûna nêzî du sed salî (eger em Şoreşa Frensî esas bigirin) ku hêşt (rê vekir) ku weke sosyalîstên real (pêkhatî) werin binavkirin, derfet dide ku em van tevgeran binirxînin.

**1-** Tê têgihîştin ku bêhtir li hemberî yekdestiyên taybet derketine û kapîtalîzma dewletê, weke yekdestiya hem desthilatî û hem sermaye, li derveyî rexneyan hêştine. Tehlîlên xwe yên li ser desthilatî û dewletê pirr serkî kirine û di ser guhê xwe re avêtine; ev jî, ji ber meyla wan a serekîn e. Ew bi xwe weke hêza dewlet û desthilatî, jidil (bi kûranî) bawer kirine ku wê sosyalîzm were avakirin. Rêyeke dîtir nayê hizirîn. Tew demokrasiyê jî, di hêla herdu çînan (burjuwa-piroletarya) de, wek cûreyek dîktadorî şîrove dikin. Ji ber siyaseta-aborî (ekonomî-polîtik)ya Engilîs, ku xwe dispartinê, tehlîleke pirr teng li ser kapîtalîzmê pêş xistine.

**2-** Wer dixuye ku haya wan tine ye ji bingeha çînî ya modernîteyê, yan jî zêde pêwîst nedîtine ku wê bikin mijara tehlîlkirinê. Û, dema kirine jî, nimûneyêke paşevajbûna tam a rast, raxistine berçavan. Nekarîne tew kapîtalîzmê jî, ku linga yekemîn a modernîteyê ye, veguhêzînin wêdetirî ji bingeha patron-karker, kar-mize û nirx-nirxa zêdemayî. Nekarîne bibînin ku kapîtalîzm, şêwazeke danehevê ye ku mirov hîn ji Sumeriyan û vir ve rasti hebûna wê tê. Kapîtalîzma bajêr a Îtalî ya sêsed salî, weke destpêka sîstemê hesibandine. Pêngava kapîtalîst a Îngilîs-Holanda ya sedsala 16. wek cûreyek destpêka dîrokê hatiye hesibandin. Pesnê sanayîgeriyê (endustriyalîzm) hatiye dayîn, ku duyemîn linga girîng a modernîteyê ye. Girêdana wê ya wesfî bi kapîtalîzmê re û fikareyên wê yên paşê, nehatine kirin mijara rexneyan, lê berevajî, rola rizgarvanî lê hatiye arastekirin. Her wisa linga dewlet-netewê jî, weke pêşketî hatiye hesibandin û bi vî rengî, paşê derî li şovenîzma netewî û civakî hatiye vekirin. Dewlet-netewê di şûna konfederalîzmê de bijartine. Nekarîne, heman weke dîroknasên li ser şaristaniya kevneşopî, xwe jê bidin alî ku rûyê din ê modernîteyê weke paşmayîtî, bûyîna di xewê de, barbarî, tevgerên paşverû û zivirandina çerxa dîrokê berevajî, nenirxînin.

**3-** Weke bîrdozî, şêweya materyalîst (daringperewst) a herî çors, weke zanistîtî pejirandine û bi vî rengî di vê qadê de jî ketine nava şaşîtiyeke dîrokî. Sosyalîzma ku ava kirine, weke zanistî hesibandine di hemasta ya ku Darwîn û Newton ew di qadên biyolojî û fizîkê de pêk anîn. Nêzîkatiya wan ên sosyolojîk nekariyê biçe wêdetir ji bûyîna Darwînperestiyeke çors. Pêwîst nedîtine ku cewaziya wesfînî ya xwezaya civakî destnîşan bikin û, bi baweriya ku rajêrî zagonên di heman wesfê de ne li gel Xwezaya Civakî, derî ji determînîzmeke sext re vekirî hêştine. Pêşketinên pişt re, şiroveyên tew herî çors (vulger) jî, bi rêya sûdwergitina ji vî deriye vekirî, wekhev hesibandine li gel rastiyên zanistî yên sext.

4-Neketine nava tehlîlên  li ser desthilatiyê bi giştî û li ser dewlet-netewê bi taybetî, dîsa wan hesibandine weke tenê pêkhatî ji komîsyonên ku erka burjuwaziyê pêk tînin. Nekarîne tehlîl bikin ku desthilatî bi taybetî kapîtalîzma yekdestîperest a kûrbûyî ya dewlet-netewê ye û vê yekê aliyê herî kêm ê teoriya wan e.  Tehlîlên ku kirine jî, ne tiştekî din in, ji bilî erênîkirina dewlet-netewê. Pê ewle bûn ku ku sosyalizm, dikare herî baş bi rêya dewlet-netewê were avakirin. Çawa ku nekarîn tehlila Hegel a li ser dewletê derbas bikin, tew gûman jî nedikirin ku, eger dewlet were bidestxistin, wê karibin wê weke navgîneke her cûre rêkûpêkkirinên ku bixwazin û ya pêşxistina azadî û wekhevî, bikarbînin. Têkiliya sosyalîzm û demokrasî, yek ji mijarên sereke ye ku bi awayê herî serkî û şaş qala wê kirine. Şoreşên Çîn û Rûs di resterêya van nêzîkatiyan de pêş ketine. Sepanên desthilatî yên din ên rizgariyên netewî û demokratên sosyal jî ne cewaz bûne. Cewaziya wan a ji kapîtalîzma taybet, ew bûye ku kapîtalîzma dewletê çêtir dîtine. Sepanên wan ên li ser desthilatiyê, vê rastiyê bi zelalî danîne holê (nîşan dane).

**5-** Rexneyên wan ên li ser şaristaniyê zêdetir req in û hindik in. Zêde qala wê yekê nekirine ku qonaxa şaristaniya kapîtalîst perçeyek ji şaristaniyên dîrokî ye û xeleka dawî ya zincîra serekîn e. Pêwîst nedîtine ku karakterê daneheva  kumulatîv (lodane) a dîrokî ya desthilatiyê destnîşan bikin. Ji xwe re weke pirsgirêk nedîtine ku sîstema wan bi xwe jî, wê bi hêsanî karibe bibe desthilatî û şaristaniyeke dirûv.  Li şûna ku têbigihîjin ku desthilatî êşkence, kirêtî, derew, şer, gemarî û sermaye ya berhevbûyî ye, hewl dane teoriyan hilberînin derbarê ka wê  ew di dîrokê de karibe çawa bibe navgîneke pêşveçûnê. Lê dîrok îspat kiriye ku di van nêrînên xwe de nemafdar û şaş bûne.

**6-** Pêwîst nedîtine ku hêzên dij-şaristanî, anku rûyê duyemîn ê dîrokê, weke cemsera duyemîn a diyalektîka dîrokî, ku pê ve girêdayî xuyanî dikin, tehlîl bikin. Û şîroveyên ku di derbarê van hêzan de kirine bi pirranî neyînî ne. Texsîr nekirine ku qala tew pêşveçûneriya mêtingeriya kapîtalîst a li Emerîka, Asya û Afrîka bikin. Ên dijberên wê, bi parastina civaka kevn ve, rexne kirine. Nekarîne bibînin ku cemsera dijber a şaristaniyê xwedî mezintirîn giranî, kevneşopa demokratîk, berxwedanî, azadî, lêgerînên ji bo wekhevî û dadwerî û ezmûnên komunalîteyê ye; sedema vê yekê pêwendîdar e ji nêz ve bi rastiya wan a çîna burjuwa û burjuwaya piçûk re. Nikarin bibînin, ji ber ku çavên ên ku ji van çînan tên tine ne ku  van rastiyan bibînin.

**7-** Nêzîkatiya pozîtîvîst a gerdûnewer û pêşveçûneriya-xezikî di derbarê xwezaya civakî de, wan biriye feraseta sosyalîzmeke wisa ku wê zû yan dereng pêk were. Eskatolojî (zanista axretê) ya di Pirtûkên Pîroz de wek cûreyek sosyalîzm teyisiye. Civak, mîna modêlên ku di xetekê dûz (rast) de pêşbikevin, weke hoveber, koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst hatine sêwirandin. Lê vê derê, cûreyek feraseta li ser qederê mijara gotinê ye. Têderxistina ku di binekoka van ferasetên dogmatîk de, ku em ji wan bikûranî bibandor bûn, qedera olî û baweriya bi axretê heye, biêş û dereng bûye.

Nekariye wete tehlîlkirin ku xwezaya civakî di bingeh de di wesfa exlaqî û polîtîk de ye; sîstemên şaristaniyê van wesfan mehandine û rêsayên huqûqî yên çors û îdare (reveberî)ya dewletê li şûna wan danîne; modernîteya kapîtalîst vê pêvajoyê bi awayekî bêsînor, bikûranî û biberfirehî pêş xistiye; her wisa vê yekê qeyraneke aborî, civakî, desthilatî û dewletî ye. Ew rastî nehatiye pêşdîtin ku ya rast, baş û xweş, pêkanîna tam a wesfa exlaqî û polîtîk a civakê ye û ji bo vê, sîstemeke konfederal a demokratîk e, ku bi siyaseta demokratîk bimeşe. Tehlîl û çareseriyên bi vî rengî pêş neketine. Nekarîne bibînin ku civakek azad, wekhev û demokratîk, nikare bi emrazên desthilatî û dewletê ve were avakirin. Berevajî, ew binakok e li gel van emrazan; her wisa nekarîne teori û pratîka wê yekê pêşbixin ku herdu wê karibin bi hevdu re bijîn, ancax (tenê) bi aştiyeke rêgezî ya spartî bi hîmê pejirandina hebûna hevdu. Dema paradîgmaya bingehîn weke şoreş-desthilatî-sosyalîzm were pêşdîtin, divê mirov şaşwaz nebe ku wê di encam de tiştekî dîtir çênebe, ji bili kapîtalîzma dewletê.

Wateyeke din a bidawîbûna tevgera sosyalîst a real bi kapîtalîzma dewletê, têkildar e bi bingehên wê yên çînî re. Pêwîst e dîsa bê diyarkirin ku tekane bijareya burjuwa û burjuwayên piçûk û burokrasî ku pirraniya wê ji van çînan tê, ku nikarin bidest bixin wan tiştên ji yekdestiyên taybet dipên (hêvî dikin), her wisa nikarin sermayeyê berhev bikin û heta ya di dest de jî dimezêxînin/diqedînin, ew e ku  bi destê dewletê bibin sermayedarên kolektîv. Ew diyardeya ku jê re tê gotin burjuwaziya netewî (mîlî) û kapîtalîzma netewî (mîlî), ji vê pê ve, ne tiştekî dîtir e. Tê wateya ku bi kapîtalîzma dewletê, weke yekdestiyeke kolektîv, bi gotineke din, weke dewlet-netew, şûngeheke pirr bihêz bi dest dixin. Dewletperestiya-netew a sosyalîzma pêkhatî –real- ji ber vê sedemê, bihêztir e. Vê bingeha daringî (madî) jî li hevhatin û yekparebûna wan a bihêsanî bi modernîteyê re, rave dike.

**8-** Femînîzm, ekolojî û tevgerên çandî weke asteng hatine dîtin li hemberî têkoşîna çînî. Ew mêtingeriya giran a ku jin, ne tenê bi keda xwe, lê bi hemû beden û giyana xwe dijî, di tehlîlên berfireh de nehatine derbaskirin. Pivanên wekhevî  yên huqûqa  burjuwa nehatine derbaskirin. Vê kedkara herî kevn û herî nû ya dîrokê, ku bi pirranî bêmize ye û bimizeya pirr hindik e, li gorî pêdiviya dîroka bi serweriya zilam, ti wate dernebirriye, ji bili bûyîna heyberekê –obje-. Eşkere ye ku çîna hatiye tehlîlkirin, zilam e. Nêzîkatî bi awayekî dirûv ji ekolojiyê re jî çêbûye. Çawa ku nekariye pirsgirêkên bi vî rengî bêne pêşdîtin, hatiye îdeakirin ku dibe vê yekê bi awayekî neyînî biteyise li yekparetiya têkoşîna çînî. Tevgerên çandî jî nekarîne xwe rizgar bikin ji nirxandina weke zindîkirina ya kevn û hêmaneke din a xirabkar a têkoşîna çînî. Encam teyîsiye wek çînperestiyeke razber a fetisî di aborî de û qut  ji tevahî hevpeymanerên xwe yên şîmaneyî.

**9-** Çînîbûn, di wateya exlaqî û polîtîk de weke pêşketineke neyînî nehatiye dîtin; lê weke qonexeke neçarî, pêdiviya azadî, pêşverû û baş hatiye nirxandin. Nekariye were têgihîn ku rewadîtina  çêbûna çînî, weke objektîv, ji çînên desthilatî û dewletê re xizmetek e. Koletî, serftî û proletartî hatine şîrovekirin weke berdêlên ku pêwîst e bêne sencandin (dayîn), ji bo pêşveçûna dîrokî û azadiya li hemberî xwezayê. Dikare bi hêsanî bê diyarkirin, weke şîroveyeke dijber, ku van hersê şêweyên çînbûnê, berevajî, di heman cewherê de ne; nikarin têkildar bin bi pêşveçûn û azadiyê re; civaka exlaqî û polîtîk nikare bi van pêkhateyan re bijî; her wisa li hemberî çînbûna bi vî rengî, encax têkoşîna exlaqî (etîk), siyasî (polîtîk) û rewşenbîrî (entelektuel) pêwîst dike.

Mîrasvanên îroyîn ên tevgera du sed salî ya sosyalîst a real, digel ku bi rengekî sînordar be jî şûngeheke rexnedanê girtîne, nikare were gotin ku veguheraneke bikok jiyabin. Di heyameke lewazî û aloziya ewleyî ya mezin de derbas dibin. Lê dîsa jî, tevgereke wisa ye ku ciyê wê di dîrokê de heye. Tevî ku sîstema kapîtalîst derbas nekirine, lê wê xeylî dane mijûlkirin. Ji yên xwedî para erênî û neyînî ne di hatina –gihîna- heya roja îro de. Aloziya ku dijîn, perçeyek ji aloziya pêkhateyî ya sîstemê ye. Lê dîsa jî, wê nêzîkatiya herî herî rast ew be ku sosyalîzma pêkhatî, weke tevgerek ku bandora xwe bi awayê herî zêde li tevahiya dijberên sîstemê kiriye, weke qonaxekê bê pejirandin û bi waneyên ku ji mîrasa wê bêne derxistin, weke perçeyek ji avakirina modernîteya demokratîk bê nirxandin û bi vî rengî helwest û peyman bêne pêşxistin.

**b- Ji Nû Ve Nirxandina Anarşîzmê**

Tevgerên anarşîst, ku kok girtin di Şoreşa Frensî de, ku bi sosyalîzma pêkhati re hemsal e, piştî hilweşîna sosyalîzma pêkhatî, hîn rasttir piştî yekparebûna wê ya bi sîstemê re, ji nû ve nirxandinê heq dikin. Di roja îro de baştir tê têgihîştin ku Proudhon, Bakûnîn û Kropotkîn nûnerên wan ên navdar, di rexneyên xwe de (yên li ser sîstemê û sosyalîzma pêkhatî) bi tevahî nemafdar nebûne. Weke têvgerek, ku li paş namîne ku kapîtalîzmê, ne tenê weke yekdestiyeke taybet û dewletê, lê wê weke modernîte jî, rexne bike, bi cîgirtina li seriyê herî dijber ê sîstemê bal dikşînin. Rexneyên ku hem di alî exlaqî (moralîst) de û hem di alî siyasî (polîtîk) de li desthilatiyê araste kirine, parke girîng a rastiyê di xwe de werdigirin. Bandorên pêkhateyên civakî yên jê tên, berbiçav in. Bertekên çînî yên beşên Arîstokrat ên ji alî kapîtalîzmê ve ji desthilatiyê hatine xistin, û yên zenaetkarên bajaran, ku kapîtalîzme rewşa wan weke dîmaneyî (îzafî) li gorî berê zêdetir xirab kiriye, vê rastiyê diteyisînin. Sedema ku takekesî (ferdî) mane, her wisa nekarîne zamînê xurt bidozin (bibînin) û nekarîne sîstemeke dijber pêş bixin, ew e ku ji nêz ve bi pêkhateya wan ên çînî re pêwendîdar e. Dizanin ka kapîtalîzm çi dike, lê baş nezanîn ka divê ew bi xwe çi bikin. Eger em nêrînên wan bi kurtasî bidin hev (komî ser hev bikin);

**1-** Rexne ji aliyê herî çep ve li sîstema kapîtalîst dikin. Baştir têdigihîn ku ew [kapîtalîzm] civaka exlaqî û polîtîk ji hev dixe (belav dike). Rola pêşverû, weke Marksîstan, lê barnakin. Erênîtir e nêzikatiya wan ji civakên ji alî kapîtalîzmê ve hatine belavkirin . Wan weke paşverû û neçarî rizîne nabînin. Her wisa mayîna wan a li ser piyan, bêhtir exlaqî û politik dibînin.

**2-** Nêzikatiya wan li desthilatî û dewletê, li gorî ya Marksîstan, bêhtir berfireh û rasteqîn e. ew kesê ku gotiye desthilatî teqez xirabî ye, Bakûnîn e. Lê, daxwazkirina wan a ku desthilatî û dewlet, bi bûhaya çi dibe bila bibe, yekser ji holê bêne rakirin, utopîk e û nêzîkatiyên wisa ne ku di pratîkê de zêde şansê wan ê pêkhatine tine ye.

Bi serketine pêşbînî bikin ku sosyalîzma spartî bi dewlet û desthilatî, nikare were avakirin û belkî jî bi kapîtalîzmeke burokratîk a hîn xeternaktir bidawî bibe.

**3-** Pêşbîniya wan a ku avakirina dewlet-netewa navendî, wê ji bo tevahiya çîna karker û tevgerên gelêrî bibe felaketek û derbeyekê mezin li hêviyên wan bixe, rasteqîn e. Her wisa di rexneyên ku di mijara yekîtiya Almanya û ya Îtalya de li Marksîstan kirine, mafdar derketine. Gotine [diyar kirine] ku pêşketina dîrokê bi sûda dewlet-netewê, tê wateya wendabûneke mezin ji bo utopyayên wekhevî û azadiyê, her wisa cîgirtina Marksîstan li cem (ber) dewlet-netewê, bi tundî

rexne kirine û ew bi xiyanetê tewanbar kirine; vana mijarên girîng in ku pêwîst e bêne diyarkirin. Wan bi xwe konfederalîzmê parastiye.

**4-** Her wisa nêrîn û rexneyên wan li ser burokratîzm, sanayîgerî (endustriyalîzm) û bajarbûnê, di rêjeya girîng de piştrast bûne. Sedema ku helwesteke ekolojîk û dij-faşîst zû pêş xistin, ew e ku parakê girîng a van nêrin û rexneyan heye.

5-Rexneyên ku her wisa li sosyalîzma pêkhatî kirine, bi hilweşîna sîstemê, piştrast bûne. Ew beş e ku bi awayê herî baş peyitandiye (tespît kiriye) ku ya hatiye damezrandin, ne sosyalîzm e, lê kapîtalîzma dewlet ê ya burokratîk e.

Tevî van nêrin û rexneyên tevgera anarşîst, ku xeylî girîng in û piştrast bûne, mirov dide hizirandin [seyr e] ku nekarîbûye li gorî ya sosyalîzma pêkhatî, şansê bûyîna girseyî û sepana pratîk bi dest bixe. Ez bawer im vê yekê çavkaniya xwe digire ji kêmasî û seqetiyên cidî  yên di teoriyên wan de hene. Di vê de kêmbûna tehlîlên wan ên li ser şaristaniyê û nekarîna wan a pêşxîstina sîstemeke sepanbar roleke girîng lîstiye. Tehlîlên wan ên li ser civaka-dîrokî û pêşniyarên wan ên çareseriyê jî, zêde nehatine pêşxistin. Wekî din, ew bi xwe jî bandora felsefeya pozîtîvîst di xwe de werdigirin. Mirov nikare bêje ku zêde derketibin derveyî zanista civakî ya bi navenda Ewrûpa. Kêmasiya wan a herî girîng, bi raya min, ew e ku  nekarîne di mijara siyaset û modernîteya demokratîk de têkevin nava raman û pêkhateyeke sîstematîk. Hewldanên ku di derbarê rastiya nêrîn û rexneyên xwe de nîşan dane, nekarîne di mijara bi sîstemkirin û sepandina wan de nîşan bidin. Belkî jî şûngeha wan a çînî asteng e li pêşiya vê yekê.

Astengiyeke din a girîng, bertek e ku di nêrînên xwe yên teorîk û jiyanên xwe yên pratîk de li hemberî her cûre otoriteyî nîşan dane. Berteka mafdar, ku li hemberî otorîteya desthilatî û dewletê nîşan dane, li hemû şêwegirtinên otorîte û pergalê teyisandine û vê yekê bandora xwe kiriye li xistina wan a rojevê modernîteya demokratîk weke teorîk û pratîk. Ez di wê baweriyê de me ku mijara herî girîng a rexnedanê ew e ku nekarîne rewatiya otorîteya demokratîk û pêwîstîtiya modernîteya demokratîk bibînin. Wekî din, nepêşxistina wan a bijareya netewa demokratîk li şûna dewlet netewê, kêmasiyeke girîng e û mijareke rexnedanê ye.

Hilweşîna sosyalîzma pêkhatî, pêşketina tevgerên ekolojîk û femînîst û hilhatina gelemperî ya civakparêziya sivîl di roja me ya îro de, bê gûman bandorên erênî hêştine li ser anarşîstan. Lê, zêde wate dernabirre dubare bikin ku mafdar bûne. Pirsa pêwîst e were bersivandin, ew e bê ka çima çalakbazî û avakirina sîstemeke bi îdea pêşnexistine. Ev jî, kendala kûr a di navbera teorî û jiyana wan de tîne bîra (heşê) mirovan. Gelo, wan bi xwe kariye derbas bike jiyana nûjen/modern, ku ewqas rexne lê dikin? Hîn rasttir, di vê mijarê de çiqas durust in (hevgirtî ne)? Gelo, wê kabirin dev ji şêwaza jiyanê ya binavenda Ewrûpa berdin û gav bavêjin bo nûjeniyeke demokratîk a kûrewî ya rasteqîn?

Mirov dikare pirs û rexneyên dirûv zêde bike. Ya girîng ew e ku ev tevger, ku fedakariyên mezin di dîrokê de kiriye, ramannasên girîng di xwe de werdigire û bi nêrîn û rexneyên xwe ve, di civata rewşenbîrî de ciyekî girîng digire, û mirov karibe mîrasa wê di nava sîstemek durust – hevgirtî- û ku karibe pêş bikeve de, ya dijberî sîstemê, komî ser hev bike. Dikare bê payîn ku anarşîst bi rexnedaneke asan/rihettir li gori ya sosyalîstan, berê xwe bidin pratîka rojaneyî. Girîngiya xwe diparêze ku di têkoşînên xwe yên aborî, civakî, siyasî, rewşenbîrî û exlaqî de ciyê ku heq kirine

bigirin. Gengaz e anarşîst di têkoşînên ku di zemine Rojhilata Navîn de bilez bûne û rehendên wan ên şaristanî û çandî jî derketine pêş, hem xwe nû bikin û hem jî hevkariyên xurt pêşkêş bikin. Yek ji wan hêzên girîng e ku pêwîst e di xebatên ji nû ve avakirina sîstema moderntîteya demokratîk de pê re peyman were pêşxistin.

**c-Femînizm: Serhildana Mêtingeha Herî Kevn**

Têgîna femînîzm, bi zimanê Kurdî di wateya jinparêzî (jinperestî) de, dûr e ji wesfandina tam a pirsgirêka jinê û, ji ber ku dijraberê wê weke zilamparêzî tê sêwirîn, dibe ku bibe sedema zêdetir bêsûdiyan. Wateyek wisa diteyisîne weke ku tenê jina bindest a zilamê serwer be. Lê bele, rastiya jinê pirr berfirehtir e. Wateyên wisa di xwe de werdigire ku, ji zayendiyê wêdetir, rehendên wê yên aborî, civakî û siyasî hene. Eger em têgîna 'mêtingerî' ji hîmê welat û netew derxînin û wê daxînin bo komên mirovan, em ê karibin şûngeha jinê bi hêsanî weke 'mêtingeha herî kevn' pênase bikin. Bi rastî jî, ti diyardeyeke civakî, bi qasî jinê weke giyan û beden, mêtingeriyê nas nekiriye. Divê were têgihîştin ku jin di statuyeke mêtingeh a wisa de tê ragirtin ku sînorên wê bi hêsanî nikarin werin destnîşankirin.

Risteyên ku qala jinê dikin, di bêje û gotinên zilam de, ku mora xwe, çawa ku li tevahiya zanistan daye, li zanistên civakî jî daye, barkirî ne bi nêzikatiyên propagandatîv ku qet dest nadin rastiyê. Statuya rastîn a jînê bi van bêje û gotinan ve belkî jî çil caran tê nuxaftin, heman weke ku dîrokên şaristaniyê çîn, mêtin, zordestî û êşkenceyan dinuxêvin. Jîneolojî (zanista li ser jinê) li şûna femînîzmê, dibe ku çêtir bersiv bide armancê. Rastiyên ku jîneolojî wan derxine ronahiyê, diyar e para rastiya ku di xwe de wergirin wê ne kêmtir be ji ya gelek 'lojî'yên beşên sosyolojî yên teolojî, eskatolojî, polîtîkolojî, pedagojî û wekî vana. Bê nîqaş e ku jin weke hem fîzîkî û hem jî wate, beşa herî fireh a xwezaya civakî pêk tîne. Wê demê, çima vê perçeya xwezaya civakî, ku pirr [ewqas] girîng e, neyê kirin mijara zanistê? Sosyolojî, ku dabeş bûye heya li perwede û terbiyeya zarokan weke pedagojî, jineolojiyê ava nekiriye; vê yekê nikare were ravekirin bi mijareke dîtir, jî bilî ku bi bêje û gotina zilamê serwer e.

Ta ku xwezaya jinê di tarîtiyê de bimîne, wê tevahiya xwezaya civakê weke neronîbûyî bimîne. Ronîbûyîna rastîn û berfireh a xwezaya civakî gengaz e ancax bi ronîbûyîna berfireh û rasteqîn a xwezaya jinê. Zelalkirina şûngeha jinê, ji dîroka mêtingehbûna wê heya mêtingehbûna wê ya aborî, civakî, siyasî û zihni (mejî) wê tevkariyeke mezin bike li zelalbûyîna tevahiya bi her milî ve mijarên din ên dîrokê û civaka rojaneyî.

Bê gûman, zelalbûyîna statuya jinê tenê rehendekê mijarê ye. Rehendeke hîn girîngtir, bi pirsgirêka rizgarbûna wê re têkildar e. Bi gotineke din, çareseriya pirsgirêkê zêdetir girîng e. Pirrî caran tê gotin ku asta gelemperî ya azadiya civakê rêjedar e bi asta azadiya jinê re. Ya girîng ew e bê ka wê çawa were dagirtin nava vê biwêja ku rast e. Azadî û wekheviya jinê, ne tenê azadî û wekheviya civakî destnîşan dike, lê ji bo vê sazgerîn (mekanîzma)ên pêwîst ên teorî, bernameyî, rêxistinî û çalakî pêwîst dike û ya hîn girîngtir, nîşan dide ku bê jin siyaseta demokratîk nikare çêbibe, heta tew siyasetmedariya çînî jî wê kêm bimîne û her wisa wê nikaribe aştî û jîngeh jî bêne pêşxistin û parastin.

Pêwîst e mirov jinê ji statuya ''dayîka pîroz, namûsa bingehîn û hevsera jêneger ku bê wê nabe'', derxîne û wê weke yekûna kirde (subje) û heyber (obje), bigire nava lêkolînê. Elbet, pêwîst e

mirov van lêkolînan, berî her tiştî ji qeşmeriyên evînê biparêze. Heta, pêwîst e rehendeke herî girîng a van lêkolînan ew be ku van pispayetiyên mezin (di serî de tecewuz, kuştin, lêdan û dijmîn/dijûnên ku hezaren wan dikin yek pere) ku di bin navê evînê de têne dapaçîn (sergirtin), raxin ber çavan. Ew gotina "Tevahiya Şerên Rojhilat û Rojava, ji rûye jinê çêbûne" ku biwêja Heredot e, dikare ancax rastiyekê rave bike. Ew jî ew e ku, weke mêtingeh nirx wergirtiye û ji ber vê sedemê hatiye kirin mijara şerên girîng. Çawa ku dîroka şaristaniyê wisa ye, modernîteya kapîtalîst mêtingehkirineke jinê, ya hezar qat girantir û wergirtî pir-alîtî, dinimîne. Wate ku li nasnameya wê [jinê] kolaye. Mêtingehkirina wê, weke dayîka hemû kedan, kedkara bêmize, karkera bimizeya herî kêm, a herî zêde bêkar, çavkaniya bêsînor a dilçûn (îşteh) û zordestî ya zilamê xwe, makîneya pergalê ya zayandina zarokan, dadika gihîştandinê, navgîna reklamê, navgîna seks-porno û wekî vana, her dirêj dibe û diçe. Kapîtalîzm, bi qasî ku di ti sazgerîneke mêtinê de nebûye, sazgerîneke mêtinê li ser jinê pêş xistiye. Biêş dibe vegerîna dîsa û dîsa ser statuya jinê, tevî ku em nexwazin jî. Lê, zimanê rastiyan, ji bo yên têne mêtin, bi cûreyekî dîtir jî nabe.

Divê tevgera femînîst bê gûman di ronahiya van rastiyan de bibe tevgereke herî radîkal a dijberî sîstemê. Tevgera jinê, ku bi awayê wê yê nûjen, dîsa em dikarin kokên wê bispêrin Şoreşa Frensî, kariye, piştî çend qonaxan, heya roja me ya îro were. Di qonaxa yekemîn de li pey wekheviya huqûqî hatiye bezin. Ev wekhevî, ku zêde wate dernabirre, di roja me ya îro de hema bi belave hatiye bidestxistin. Lê, pêwîst e baş were zanîn ku naveroka wê vala ye. Her wisa di mafên din de jî, yên mîna mafên mirovan û mafên aborî, civakî û siyasî, pêşketinên şêweyî hene. Jin di dîmen de bi qasî zilam wekhev û azad e. Lê di rastî de xapînokiya herî girîng di vê şêwaza wekhevî û azadiyê de veşartî ye. Ji bo azadî û wekheviya jinê, ku ne tenê heyamên modernîteya fermî, lê tevahiya yên [heyamên] xerarşî û şaristaniyê wê di hemû tevnên civakî de di warên mejî (zihnî) û bedenî de kirine kole û wê bi awayê koletiya herî kûr dane xebitandin, xebatên teorîk ên demokrasiya wan pirr berfireh be, têkoşînên bîrdozî, xebatên bernameyî û rêxistinî û ya herî girîng jî çalakiyên xurt pêwîst dikin. Beyî vana femînîzm û xebatên li ser jinan, ti wateyek wernegirin, ji wêdetirî xebatên lîberal ên jinê ku hewl didin sîstemî rehet bikin.

Di rewşa ku zanista li ser jinê [jineolojî] pêş bikeve, wê xeylî fêrkar bibe ku çareseriya pirsgirêkan bi mînakekê were ravekirin. Pêwîst e mirov têbigihîje ku navajoya zayendî, yek ji şêweyên sereke yên herî kevn ên fêrbûnê ya jiyanê ye. Bersivek e ji pêdiviya jiyanê ya xwe berdewamkirinê re. Negengaziya jiyîna bêdawî ya takekes, weke çareserî, yekî/ê neçar kiriye ku potansiyela xwe ji nû ve hilberandinê pêş bixe. Ew tişta ku jê re tê gotin ajoya zayendî, ew e ku vê potansiyelê xwe di mercên guncav de hilberrîne û bi vî rengî jiyanê bidomîne. Dibe wek cûreyek çare li hemberî mirinê û mezixîn/qedîna nijad. Her wisa, dibe yekemîn dabeşbûna şanikê û, bi rêya xwe pirrkirina şanikê, ku yek e, xwe dike nemir. Eger em hîn bêhtir bikin gelemperî, ew bûyer e ku meyla bêdawîbûna gerdûnê, li hemberî tineyî û valatiyê, ku dixwazin wê daqurtînin, xwe bi berdewamî dike cihereng û xwe pirr dike û bi vî rengî di jiyana zîndewer de dewam dike.

Ew yek, yan jî takekes a ku vê bûyera gerdûnî di cûreya mirov de dewam dike, jin e. Pirrbûn di bedena jinê de pêk tê. Rola zilam di vê bûyerê de ta radeya dawî duyemînî (talî) ye. Lewre, di bûyera berdewamkirina nijad de hemû berpirsyarî li ser jinê ye û ev jî weke zanistî mijareke têgihîner e. Bi ser de jin ne tenê cenîn di zikê xwe de diguhêze, mezin dike û dizayîne; lê di heman demê de berpirsyariya xwedîkirina wê/wî jî hema hema heya mirina wê/wî, weke xwezayî, digire ser xwe. Wê demê, yekemîn encama ku pêwîst e em ji vê bûyerê derxin, ew e ku jin di mijara hemû

têkiliyên zayendî de teqez xwedî gotin be. Ji ber ku her têkiliya zayendî ji bo jinê pirsgirêkên ku weke potansiyel pirr zor e ku mirov ji binî derbikeve, bi xwe re tîne. Pêwîst e mirov têbigihîje ku jina ku deh zarokan bizayîne, weke fizîkî û heta di warê giyanî de, dikeve rewşên xirabtir ji mirine.

Nêrîna zilam li zayendîtiyê bêhtir şewş (çewt) û bi rengekî bê berpirsyar e. Di vê de nezanîn û korkirina desthilatî di radeya yekemîn de rol dileyîze. Wekî din, bi xerarşî û dewleta xanedanî re, ji bo zilam, bûyîna xwedî pirr zarokan, tê wateya bûyîna xwedî hêzeke jêneger. Bûyîna xwedî pirr zarokan, ne tenê misogerî (garantî)ya berdewambûn nijadê, her wisa, ya [misogeriya] mayîna wî ya wek desthilatî û dewlet jî, pêk tîne. Mercê ji dest neçûyîna dewletê, ku tê wateya cûreyek yekdestiya mulk, girêdayî meziniya xanedaniyê ye. Jin bi vî awayî tê veguherandin bo navgîna zayandina pirr zarokan ji bo hem heyîna biyolojîk û hem heyîna desthilatî û dewletê. Hîmê, pêwendîdar bi xwezaya yekemîn û duyemîn, ê mêtingehbûna tirsnak ji bo jinê, bi vî rengî tê amadekirin. Pirr girîng e ku mirov rûxîna jinê, weke pêwendîdar bi van herdu xwezayan re, tehlîl bike. Pêwîst nake zêde bê vegotin ku ne gengaz e ku jin di bin vê statuya dumend a xwezayê de di warên giyanî (ruhî) û bedenî de demek dirêj, weke zinde (zindî) û nehinciriyayî li ser piyan bimîne. Rûxîna fizîkî û giyanî di nava hev de zû pêş dikeve û jinê, di berdêla domandin û misogerkirina jiyana yên dîtir de, bi jiyaneke biêş, kin û bikeser (biderd), ber bidawiyê ve dibe. Pirr girîng e ku dîroka şaristanî û modernîteyê li ser bingeha vê rastiyê were tehlîlkirin û xwendin.

Em giraniya pirsgirêke di hêla jinê de li aliyekî bihêlin. A ku bandorên xwe yên girantir li ser tevahiya xwezaya civakî û jîngeha ekolojîk dide hîskirin, rehenda şêniya pirole ya mirovan anku ya [rehenda] pirsgirêka demografîk e. Yek ji waneyên herî bihgehîn ku pêwîs e jê bêne derxistin di hêla hem zanista jinê û hem hemû zanistên civakî de, ew rewş û rastî ye ku şêniya mirovan nikare bi rêbaza ‘fêrbûna navajoyî’ were berdewamkirin, mezinkirin û, hin rewşên awarte ne têde, biçukkirin. Domandina nijadê bi rêbaza herî hoveber weke navajoyîtî, tê destekkirin bi rêbazên zanistî yên pêşxistî bi dirêjiya dîroka şaristanî û modernîteyê; vê yekê sedema bingehîn a zêdebûna pirole ya şêniyê ye. Tê wateya rewşeke pirr paşmayî ku cûreya mirov, weke xwezaya civakî, tenê bi rêyên navajoyî, bi taybetî bi dehfdana ajoya zayendî, heyîna xwe bidomîne. Asta wê/wî ya zeka û çand, potansiyelên wisa yên fêrbûnê jê re pêşkêş dikin ku karibe heyînên civakî di wesfên hîn pêşketîtir de bidomîne. Takekes û komcivak, bi zeka û çandên xwe, her wisa bi saziyên xwe yên felsefî û siyasî dikarin derfeta xwe jiyandina di demên herî dirêj de bikar bînin. Lewre, wê pêwîst neke ku nijad, bi rêya ajoya zayendî pirr bibe û were domandin. Çand û zekaya mirov ji mêj ve ye ku vê rêbazê derbas kiriye. Lewre, di bingeh de rêgeza karê ya şaristanî û modernîteyê, ji vê hoveberiyê berpirsyar e. Qet gûman jê nîne ku zêdebûna pirole ya şêniyê YEKDESTÎ Û DESTHILATIYA PIROLE ye û ew jî wekhev e li gel KARa pirole û mezîntirîn. Sedema ku cûreya mirov bi dîrêjiya dîrokê, bi rêya xwe pirkirina pirole, ne tenê civakê, lê jîngeh û xwezaya wê jî aniye ber şêmûga tunebûnê, teqez ji ber encama DANEHEVA KUMULATÎV (LODANE) A SERMAYE Û DESTHİLATÎ ye, lew re ji ber encama ZAGONA KARA MEZINTİRÎN e. hemû pêker/faktor û sedemên din duyemînî (talî) ne û di rêza duyemîn de rol dilîzin.

Wê demê, divê berpirsyariya bingehîn di destê jinê de be, di çareseriya pirsgirêka demografîk de, ku rêya sereke ya pêşîgirtina li rûxana ekolojîk e û ya çareserkirina pirsgirêka jinê ye, ku ji niha ve rehendên dêwane wergirtiye. û yekemîn merca vê jî, azadî û wekheviya tam a jinê ye; her wisa, mafê wê ye tam ê kirina siyaseta demokratîk e û di hemû têkiliyan de mafê wê yê tam ê gotin û vînê ye. Ji bilî van rastiyan, gengaz nabe ku rizgarî, azadî û wekheviya jinê, civakê û jîngehê

bi wateya tam pêk werin. [Di vê rewşê de] elbet, şêwegirtînên siyaseta demokratîk û siyaseta konfederatîv jî gengaz nabin.

Jin, bi ser de, weke hêmana serekîn a civaka exlaqî û polîtîk, di ronahiya azadî, wekhevî û demokratîkbûnê de, di hêla etîk û estetîka jiyanê de, wê di hemû mijarên etîk û estetîk de, weke hêza hem raman û hem sepanê, vebûn û pêşketinên mezin bidest bixe. Girêdana jînê bi jiyanê re, li gorî ya zilam, pirr berfirehtir e. Gihaştîtiya rehenda zekaya wê ya hestî, bi vê yekê re pêwendîdar e. Lewre, estetîk, ku tê wateya xweşikkirina jiyanê, di hêla jinê de, mijareke hebûnewerî ye. Her wisa, berpirsyariya jinê di hêla etîk (teoriya exlaqî; estetîk=teoriya xweşikî) de jî, bêhtir berfireh e. Li gorî pêdiviya xwezaya jinê ye ku di hêla civaka exlaqî û polîtîk de zêdetir rasteqînî û berpirsyar tevbigere di warên nirxandin, destnîşankirin û biryarkirina aliyên baş û xirab ên perwerdeya mirovan; girîngiya jiyan û aştî; xirabî û saw/erjenga şer; her wisa pîvanên mafdarî û dadwerî. Elbet, ez qala jina dûvelang (qûqla) û ya siya zilam nakin. A mijara gotinê, jina azad û wekhev e û ku demokratîkbûne hezm kiribe.

Wê bêhtir rast be ku zanista aborî jî weke perçeyek ji zanista jinê were pêşxistin. Aborî hîn ji destpêkê ve şêweya xebateke civakî ye, ku têde jin rola serekîn dilîze. Ji ber ku persgirêka xwedîbûyîna zarokan li ser pişta jinê ye, aborî ji bo jinê wateyeke jiyanî derdibirre. Bi ser de, wateya peyva aboriyê “zagona malê û rêsayên debrandina malê” ye. Eşkere ye ku ev jî, karê bingehîn ê jinê ye. Aborî ji destê jinê hatiye girtin û hatiye dayîn destê rayedarên wek axayekî, mîna selefxur, bazirgan, pere, sermayedar û destjilatî û dewletê; vê yekê bûye derbeya (lêdana) herî mezin li jiyana aborî. Aborî, ku hatiye dayîn destê hêzên dijberî aboriyê, hatiye kirin armanca bingehîn a desthilatî û mîlîtarîzmê û bi vî rengî, bi dirêjiya hema hema dîroka şaristanî û modernîteyê, hatiye vegûherandin bo pêker/faktora sereke ya şer, pêkdadan, alozî û pevçûnên bêsînor. Aborî di roja me ya îro de hatiye kirin qadekê lîstoka yên ku ti pêwendiya wan bi aboriyê re tine ye, ku bi rêya leyîstina bi perçeyên kaxizan, bi rêbazên xirabtir ji qumarê, nirxên civakî bi awayekî bêsînor xesp dikin. Pîşeya pîroz a jinê hatiye vêguherandin bo destegeh (îmalatxane), borsa û lîstokên fiyet (bûha) û faîzê (selef) ku hildiberînin makineyên şer; amûrên trafîkê, yên ku jîngehê anîne rewşa nejînbar [ku mirov nikare têde bijî] û berhemên negerek (fizûlî), yên kara ku zêde pêwendiya wê bi pêdiviyên bingehîn ên mirovan re tine ye, ku jin bi temamî ji vana hatiye jêderkirin. Tevgera jinê ya ji bo azadî, wekhevî û demokratî, spartî bi zanista jinê ku femînîzmê jî wergire nava xwe, eşkere ye ku wê di çareseriya pirsgirêkên civakî de rola sereke bilîze. Bêyî ku mirov qîma xwe bine bi rexneyên tevgerên jinan ên di paşeroja nêzîk de, pêwîst e mirov giraniya xwe bide ser şaristanî û modernîteyê, ku jinê windabûyî kirine. Eger mijar, pirsgirêk û tevgerên jinan di zanistên civakî de hema hema di radeya nîne de ne, berpirsyarên bingehîn ên vê yekê heşmendiya serwer û pêkhateyên çanda daringî (madî) yên şaristanî û modernîteyê ne. Bi nêzikatiyên teng ên huqûqî û wekheviya siyasî, belkî karibe tevkarî ji lîberalîzmê re were pêşkêşkirin; lê [bi vî awayî] em çareseriya pirsgirêkê li milekî bihêlin, tew tehlîlkirina wê jî, weke diyarde, nikare were bi serxistin. Wê bibe xwe xapandinek ku mirov îdea bike ku tevgerên femînîst ên heyî, ji lîberalîzmê qut in û bûne hêzên dijberî sîstemê. Eger yek ji pirsgirêkên sereke yên femînîzmê, weke ku tê gotin, radîkalîzm e, wê demê pêwîst e pêwendiya xwe ji xûy, şêwazên hest û raman, en bikok ên lîberal, û ji jiyanên wan bibirre; her wisa şaristanî û modernîteyê, ku dijminên jinê ne, tehlîl bike û li ser vê bingehê giraniya xwe bide ser rêyên watedar ên çareseriyê.

Divê modernîteya demokratîk xwezaya jinê û tevgera wê ya azadiyê, weke yek ji hêzên xwe yên bingehîn bibîne; her wisa wê yek ji erkên xwe yên serekîn bihesîbîne ku hem were pêşxist û hem pê re peyman were çêkirin û bi vî rengî wê di xebatên xwe yên ji nû ve avabûnê de binirxîne.

**d- Ekolojî: Serhildana Jîngehê**

Yek ji pirsgirêkên bingehîn ku sîstema şaristanî bûye sedema wê, xirabûna dengeya hestyar (krîtîk) a di têkiliya civak û jîngehê de ye. Xwezaya civakî, her wisa jiyan û pêşketina wê di qonaxa xwe ya dirêj de di hemahengiya xwe ya bi jîngehê re, tim girêdayî dengeya hestyar ma. Di pêşketina ji ber xwe ve de paşevajbûnên ku dengeyê bi awayekî bikok buguherînin nayên dîtin û vê yekê pêdiviyeke pêşketina xwezayî ye jî. Sîstem, di bingeh de, ne bi rêya hevrûxandinê, lê bi rêya hevxwedîkirinê, pêş dikevin. Dema paşevajbûn çêbibin, divê ji alî mantiqê sîteman ve bêne derbaskirin. Şaristanî di vê wateyê de di sîstema xwezaya civakî de weke paşevajbûnekê derdikeve pêşiya me. Her çiqas em jê re dibêjin ‘sîstema şaristanî’, lê ancax nirxeke propagandayî ya vê biwêjê (gotinê) heye. Ji bo xwe têxe şûna sîstema xwezaya civakî ya rasteqîn, hatiye guncandin. Dema ji ya ku sîstem e re, tê gotin ‘barbarî’, koçber û komên marjînal, navê ‘sîstema şaristanî’ şayan (liyaq) hatiye dîtin li şebekeyên ku bi awayekî kurtêlxurî (parazîtî) ji nirxên civakê xwe xwedî dikin. Şer, talan, rûxan, qir, yekdestî, her wisa xerac û bac, ji ku derê ve li wan tê nêrîn, bila were nêrîn, nîşaneyên serekîn ên pêşketina şaristaniyane ne û heq dikin ku weke barbariya rasteqîn bêne nirxandin. Rûxandinên gund û bajaran, bi berdewamî kuştina bi milyonan mirovan û girtina pirraniya raser a civakê bin sîstema mêtinê, ne pêdiviyeke xwezayî ya sîstem a xwezaya civakî ne, lê mirov dikare ancax wan weke paşevajbûna wê binirxîne.

Dîroka şaristanî ya pênc hezar salî di heman demê de dîroka pêşketin û mezinbûna vê paşevajbûnê ye. Felaketên ekolojîk herî zêde di çaxa kapîtalîzmê de, ku tê îdeakirin têde şaristanî pêş ketiye, peqiyane û ew jî delîla vê rastiya paşevajbûnê ye, ku nikare were redkirin. Xwezaya civakî, di pêvajoya jiyanê de ku ev nêzî sê milyon sal in ku her didome, rê li ber felaketên bi vî rengî venekir. Sîstemên civak û jîngehê, hevdu xwedî dikirin. Qeyranên ekolojîk, ku peqiyan di dîroka şaristaniyê de, ku kin e, bi cewhera wê ya rûxanî ya bi armanca karê re pêwendîdar in. Ne tenê kara kapîtalîst, lê danehevên pirole yên nirxan jî yên de hemû pêvajoyên şaristaniyê de, bi rûxana herdu xwezayan re mil bi mil meşiyane. Pîramîd jî danehevek in. Lê, mirov kêm-zêde dikare bisêwire (xeyal bike) bê ka bi bûhaya çi cûre rûxanên civakî pêk hatine. Danehevên bêhejmar ên dirûvî vana, barên pêvek/îlawe li ser jîngehê bi berdewamî siwar kirin. Hilweşîna civakî, bi xwe re hilweşînên jîngehî anî. Pêkhateyên yekdestîperest ên kara bêsînor ên modernîteya kapîtalîst, giraniyên ku civak û dengeya wê ya bi jîngehê re nikaribin rakin, hingî (ewqas)  kom kirin ku di encam de em tê ketin çaxa qeyrana ekolojîk.

Di vê de, rola stratejîk a sanayîgeriyê destnîşankar bûye. Modernîzm û sanayîbûna spartî bi sotemeniyên fosîlan, di vê destnîşankariyê de pêker/faktorên sereke ne. Wekî din, bikaranîna sotemeniyên fosîlan di maşînan de, dikare bi rengekî neyêkser bibe sedema felaketên trafîkan û ew jî bi xwe re rê li ber rûxanên zincîrane vekin. Bi vî awayî felaketên jîngehî vediguherin bo felaketên civakî, ew jî dîsa vediguherin bo felaketên jîngehî û bi vî rengî reaksiyona zincîrane çêdibe. Ji ber vê sedemê şaş e ku ji çaxa kapîtalîzmê re tê gotin çaxa rasyonalîzmê. Çavê danehevê kor e. Bi hemû encamên wê ve li holê ne ku hemû danehev bi dirêjiya dîrokê ne bi rasyonalîteyê, lê berevajî, bi

korîtiyê tevgeriyaye. Dibe ku weke analîtîk rasyonel be. Lê, têrbaş zelal bûye ku zekaya analîtîk di hêla hestî de, ku tekane zekaya jîngehê ye, tam zekayeke korîtî û rûxanê ye.

Girêdayî bi vebûnên me yên beriya niha, zêdebûna pirole ya şêniyan û mezinbûna bajaran, ku dema ku çîna navîn û bajêr bûn nîvenda desthilatiyê bilez bûn, ne diyardeyên wisa ku jîngeh karibe wan ragire. Xwezaya civakê nikare li hemberî van diyardeyan li ber xwe bide. Mezinbûna di nava hev de ya desthilatî û dewletê bi pêvajoya berhevkirina sermaye re, ne qebare (hacîm) û giraniyên wisa ne ku ti dengeyên civak û jîngehê karibin wan ragirin. Qeyranên jîngehî û civakî di nava hev de ne û bûne berdewamî; vê yekê pêwendîdar e bi mezinbûna yekdestîperest a di herdu qadan de. Weke du sîstemên qeyranê, hevdu xwedî dikin. Hemû tespîtên zanistî di vê mijarê de hemraman in ku, eger ev pêçokeyî (helezonî) pêncî salên din jî bidome, wê hilweşîn bigihîje rehendên nedombar û ev tê dîtin. Lê karaketerê kor û rûxîner ê yekdestiyên sermaye û desthilatiyê vêya nabîne, nabihîse û ev ji ber pêdiviya cewhera wî wisa ye.

Dîroka zanistgeriya jîngehê û tevgera wê, ku weke rêjeyî nû ye, her roja ku diçe, pêş dikeve. Herku di derbarê vê diyardeyê de jî, weka di rastiya jinê de, zanist pêş bikeve zanyarî û herku zanyarî pêş bikeve tevger pêş dikeve. Qada herî belave ya tevgerîna civaka sivîl e. Herku diçe sosyalîstên-real û anarşîstan jî ber bi xwe ve dikşîne xwe. Di şûngeha tevgerek wisa de ye ku dijberiya li hemberî sîstemê herî zêde dide hîskirin. Ji ber hemûyê civakê pêwendîdar (eleqedar) dike, tevlîbûn di wê rewşê de ne ku wesfekê ser-netewan û çînan wergirtine. Mirov dikare li vê derê jî şopên serweriya bîrdozî ya lîberalîst bi rengekî kûr bibîne. Lîberalîzm di pirsgirêka ekolojîk de jî, weke di hemû mijarên civakî de, aliyê xwe yê pêwendîdar bi cewhera xwe ya pêkhateyî re vedişêrê û hewl dide teknolojiyê, sotemeniyên fosîlan û civaka mezaxê, weke berpirsyar nîşan bide. Lê di rastî de van hemû diyardeyên duyemînî, berhemên sîstema (bêsîstemiya) modernîteya wê ne. Lewre, pêdiviyeke mezin a tevgera ekolojîk, weke ya tevgera femînîst, bi zelaliya bîrdozî heye. Pêwîst e rêxistin û çalakbaziya xwe, ji kolanên teng ên bajaran bişemitîne (bibe) nava tevahiya civakê, bi taybetî nava civaka çolterî ya gund û çandinî. Ekolojî di bingeh de rêberiya çalakî ya civaka gund û çandinî, ya koçer û koçberan, bêkaran û ya jinan e.

Van rastiyan, ku hîmê modernîteya demokratîk jî pêktînin, bi hemû zelaliya xwe nîşan didin bê ka wê ekolojî rola çiqas girîng di xebatên ji nû ve avakirinê de bilîze.

**e-Tevgerên Çandî: Tolhildana Kevneşopê Ji Dewlet-Netewê**

Tevgerên çandî, bi dirêjiya hemû çaxên şaristaniyê qet kêm nebûn. Sedema ku di heyama postmodernîte de qala wan bi belaveyî tê kirin, pêwendîdar e bi jihevketina sînorên dewlet-netewê re. Wê di cî de be ku mirov tevgerên çandî, bi gotineke din, weke serhildana kevneşopê biwesfîne. Di pêvajoya netew-dewletê ya homojenkirina civak û netew de, bi rêya xwe spartina ser yek etnîsîte, ol, mezheb, yan jî diyardeyeke dîtir a komî, yên zal (hakîm), hewl hat dayîn ku bi hejmareke zêde kevneşop û çand, yan bi rêya nijadkujiyê, yan jî bi rêbaza asîmîlasyonê, werin tunekirin. Bi hezaran ziman, zarava, qebîle, eşîret û qewm, tevlî çandên xwe ve, hatin anîn ber şêmûga tunebûnê. Gelek ol, mezheb û terîqat hatin qedexekirin; her wisa folklor û kevneşopên wan hatin bişaftin/asîmîlekirin; yên nakarîn bişaftin/asîmîlekirin, hatin neçarkirin ku koçber bibin; her wisa hatin marjînalîzekirin û yekparetiyên wan hatin perçekirin. Ev pêvajo, nêzî du sed salan bi hemû hêza xwe dewam kir, ku tê wateya qurbanbûyîna tevahiya çand, kevneşop û hebûnên dîrokî ji netewperestiya ‘tek ziman, tek al, tek netew, tek welat, tek dewlet, tek marş û tek çand’ re, ku

wateyeke wê ya cidî ya civaka-dîrokî tine ye û di tehlîla dawî de tê bikaranîn weke rûbera kûrbûna yekdestiyên bazirganî, sanayî û malî yên modernîte weke yekdestiyên desthilatî û dewlet-netew. Ev pêvajo, ku belkî jî heyama şerê herî demdirêj û herî tund ê dîrokê ye, rûxana xwe ya herî mezin li ser çand û kevneşopên bi hezaran salî nîşan da. Hêrsa karê ya yekdestîperestiyên ku bi awayê mezintirîn xwe birêxistin kirine, dilê xwe bi ti kevneşop û çandên pîroz neşewitand.

Dema hin tevgerên bêsîstem, ku ji wan re tê gotin postmodernîte, 'zirxê dewlet-netewê' kun kirin yan jî 'qefesa wê ya jî hesin' perçe kirin, çand û kevneşopên li ber vê şêmûga tunebûnê ku bi pirranî hatibûn mehkûmkirin bo jiyaneke di asta marjînal de, ji nû ve çîçek girtin û dest bi pirrbûnê kirin, weke vebûna çîçekên piştî barana ku li çolê bibare. Di vê de bandoreke girîng a hilweşîna sosyalîzma pêkhatî jî çêbû. Û tevgera ciwantî ya 1968, bû fitîla ku agir berda bi vê pêşketinê. Wekî din meyl û qonaxên nedewlet-netewbûyî jî yên tevahiya tevgerên rizgariya netewî, di vê de çêbûye. Ji xwe kevneşop û çand bi xwe, tên wateya berxwedanê. Yan wê tune bibin, yan jî wê bijîn; [ji ber ku] nizanîn radest bibin. Taybetmendiyeke wan a wisa heye. Weke pêdiviya cewhera wan e ku, dema keysa wan lê bê, berxwedanên hîn mezintir pêş bixin. Ev e ew rastiya ku faşîzma dewlet-netew nikare wê bihesibîne. Tepisandin û heta bişaftin/asîmîlekirina wan, nayê wateya qedîna wan. Berxwedana çandan, mînaka çîçekên ku zinar/tehtan kun dikin û hebûna xwe îspat dikin, tîne bîra mirovan. Delîla vê rastiyê ew e ku wan betonên modernîte yên hatine avêtin ser wan, perçe dikin û dîsa derdikevin rûyê erdê. Eger em bi kurtasî rêz bikin van tevgerên ku em dikarin wan veqetînin bo komên cûrbecûr;

### 1- Tevgerên Etnîsîte û Yên Netewa Demokratîk

Di serê tevgerên çandî de, ku dewlet-netew nekariye wan bitepisîne û tam bihelîne, netewperestiya mîkro (herî piçûk) ya diyardeyên etnîkî tê. Cewaz e ji netewperestiya dewlet-netewê. Naveroka wê ya demokratîk di giranî de ye. Armanca wan a herî bingehîn ew e ku, bêhtir ji gerîna li dewleteke nû, karibin li derdora çandên xwe bibin pêkhateyeke siyasî ya demokratîk. Vê yekê cewaz e ji xweseriya herêmî yan jî navçeyî. Yekîtî û piştgirî, li derveyî sînor (tîxûb)an be jî, ya yên ku heman hebûna çandî parve bikin, derdibirre ku ne girêdayî sînorên mekan e. Her wisa yek ji armancên wan ên girîng ew e ku heyîna xwe li hemberî etnîsîteya zal (hakîm) biparêzin.

Di hêla sosyolojîk de xeylî rast û watedar e ku mirov bêje Tevgera Netewa Demokratîk ji tevgera etnîsîteyên cewaz ên bindest re, bi gotineke din, ji tevgera gelên ku di bin zordestiyê de ne. Xeylî (epey) zor e ku mirov bi awayê tek etnîsîteyeke bindest [karibe] li ser piyan bimîne û hebûna xwe bidemîne. Divê ziman û zaravayên çandên dirûv û tevgera yên ku sînorên erdnîgerî û siyasî parve dikin, ji ber çend sedeman, weke Tevgera Netewa Demokratîk bêne wesfandin. A yekemîn; bêhtir ji armanca [avakirina] dewleteke cûda, di nava lêgerîna li pêkhate û rêveberiyeke siyasî ya demokratîk de ne. Pêkhateyeke siyasî ya demokratîk a di bin sîwana heman dewletê de, şêweyeke hebûna siyasî ye ku di dîrokê de jî herîz êde tê naskirin (zanîn). Dîrok, hema hema bi pirraniya raser, tijî ye bi pêkhateyên siyasî yên hebûnên cewaz ên çandî. Jiyîna bi awayê pêkhateyên siyasî, bi qasî ku bê xwestin, di nava sînorên her dewlet yan jî împaratoriyan de, şêweyeke asayî (normal) ya rêveberiyê ye. Ya ne-asayî (anormal) ew e ku van pêkhateyên siyasî tune bêne hesibandin û bêne tepisandin. Bişaftin/asîmîlasyon jî ne rêbazekê wisa bû ku serî lê bihata dayîn. Împaratoriyên Roma, Bîzans, Osmanî, Pers-Sasanî û Ereb-Ebasî, bi sedan yekeyên cewaz ên siyasî û îdarî (reveberî), weke sedema hebûna xwe hesibandibûn. Merc ew e ku rewatiya împarator (şah) yan jî sultan,

pejirandibana. Ya bingehîn ew bû ku ziman, ol, folklor û reveberiyên xwe yên xweser diparastin û bi vî rengî dijiyan. Lê cinawîr (Levîathan)ê dewlet-netew, vê pergalê tune kir. Faşîzm jî li ser vê bingehê çêbû. Encama vê yekê, bû gelek nijadkujiyên çandî û fizîkî.

Şîrovekirina, tenê weke dewlet-netew, mafê bûyîna netew ê etnîsîte yan jî gelên bindest, şewşandin û bobelat (facîa)a mezin a hem lîberalîzmê û hem sosyalîzma pêkhatî bû. Her wisa, encama netewperestî û totalîtaryanîzm bû. Rêya herî rast, mirovane û guncav li gel xwezaya civakî ew bû ku netewbûna asayî nehatiba neçarkirin (mehkûm) bo sînor (tîxûb)an, lê hatiba avakirin li ser hîmê çandî û bingehên rêveberiya demokratîk. Rastiyên dîrokî, bêhtir vê rêyê rave dikirin. Lê, hêrsa sermaye ya yekdestîperest a li pey kara mezintirîn, ku dixwaze bilez sermaye kom bike,cbû pêkereke herî girîng a di girtina vê rêyê de. Dema ku dewlet-netew, ku rêya ne-asayî ye, hate kirin rêya asayî ya netewbûnê; rêya netewbûna demokratîk, ku ya asayî ye, hate têgihîn weke rêya ne-asayî û heta rêya ku tune hate hesibandin. Şewşandina mezin, ev bû.

Dema ku neçareseriya pir-alî ya dewlet-netewê (şerên cîhanî û herêmî, hev qirkirinên netewî û qelîbîna sermaye li dîwarên netewî) derket holê, netewbûnên demokratîk, ku rêya asayî (normal) ye, bi kûranî dest bi jiyînê kirin. A ku tevahiya Ewrûpa, piştî Duyemîn Şerê Cîhanî, jiya, di rastî de veguheran e ji dewletperestiya-netew bo netewgiriya-demokratîk. DYE ji xwe bi ser ket ku herdem weke netewa netewên demokratîk bimîne. Dewletperestiya-netew û netewgiriya-demokratîk li Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetan (YKSS), tevî gelek şewşandinên dewletperesta-netewî yên yekdestîperestiyê, di nava hev de hatin jiyîn. Meylên netewî yên demokratîk li Hîndîstanê jî xurt in. Her wisa, meylên netewî yê demokratîk li Efrîka û Emerîkaya Latîn [Başûr] jî herdem li pêş bûne. Dewletperestiya-netew a sext bi hejmarekê pirr hindik bû û bi hin deran, di serî de bi Rojhilata Navîn sînordar ma. Vana jî di nava pêvayoya jihevketina (hilweşîna) bilez de ne.

Ya duyemîn; dema netewbûna desthilatperest û dewletperest esas nahatiba girtin; jê pê ve, yan wê rêveberiyên serkar (taşeron), spartî bi berjewendiyên malbatî, bi hin saziyên mayî ji çaxanavîn (axatî, şêxîtî, serok-eşîrtî û terîqat) esas hatibana girtin û bi rêya modern/nûjenkirina wan, hatibana berdewamkirin; yan jî wê rêveberiyên demokratîk hatibana pêşxistin. Rêya yekemîn, awayê nûjenbûyî (modern) yê hevxebatkariya klasîk bû ku di dîrokê de jî pirr tê naskirin. Lê rêya duyemîn, ew rê bû ku armanca bingehîn a modernîteya demokratîk bû. Rêvaberiya berxwedana li hemberî dewlet-netew û hevxebatkarên wê, dikare ancax bibe demokratîk. Ev jî rêya azadîxwaz û wekhevxwaz a herî bijûndar bû, ku mirov ber bi netewbûna demokratîk ve dibe.

A sêyemîn; karakterê piralî yê çandan, zimanan û zaravayan, mirov neçarî netewbûna demokratîk dikir. Dijraberî cewhera wê bû ku weke dewlet-netewê, ziman, zarava û zordestiya çandî ya etnîsîteya zal esas girtiba. Tekane bijare ew bû ku mirov karîbûya bûbûya netewa bi pêkhateya pirr zimanî-çandî-siyasî. Eşkere bû ku ev jî dihat wateya netewa-demokratîk. Heta, ew rê jî vekirî bû ku mirov karîbûya ji çend netewên-demokratîk, bûbûya yek neteweke demokratîk. A ku li Îspanya li Hîndistan, li Komara Afrîka Başûr, ku wê begem nakin, heta li Endonezya û li gelek welatên Afrîka tê jiyîn, pêşketinên dirûv in. Mirov dikare tew YE û DYE jî wek cûreyek netewa netewên demokratîk pênase bike. Federasyona Rûsya mînakekê din a girîng a dirûv e.

Ya çaremîn; ji ber tê xwestin ku cewazîtiyên aborî, civakî, siyasî, heşmendî (zihnî), zimanî, olî û çandî zêdetir bêne parastin, tavilê tê têgihîştin ku rêya vê di netewa demokratîk re derbas dibe. Eger her cewazîtî were veguherandin bo cûdadî, wê ev bibe windakirina hemûyan. Lê, di rastî de

şêweya herî guncav a awayê ‘yekîtî di nava cewazîtî de’ ku ji bo hemûyan îdeal e, ew e ku karibin bibin netewa-demokratîk. Tew vê potasiyela çareseriyê, bi tena serê xwe jî, têra ravekirina hêza çareseriya mezintirîn a tevgera netewa-demokratîk û ya pêkhateyiya wê ya alternatîv bo dewlet-netewê, dike.

Aloziya ku tê jiyîn, ji ber ku neçareseriya dewlet-netewê tê tengav kirin ji alî tevgerên sermaye yên kûrewî, ji jor ve; her wisa, ji milê jin ve ji alî tevgerên xweserî yên bajarî, navçeyî û herêmî û tevgerên netewa-demokratîk û olî, ji jêr ve, berendam e ji bo zayandina sîstemên nû. Gelek nîşane û delîlên vê yekê derketine holê.

Lîberalîzm, li aliyekî dema hewl dide dewletperestiya-netew a klasîk derbas bike û wê ji nû ve ava bike; li aliyê din, girîngî û bayex pê dide ku vê çalakiya xwe di bin maskeya pêşxistina demokrasiyê de bide meşandin. Û dewletperestên-netew ên sext, di nava kevneperestî û paşverûtiyekê xirabtir ji kevneperestên berê her diperpitin. Xwe kirine şûngeha cûreyek kevneperestên rasteqîn ên roja me ya îro. Û olperest di nava lêgerîna li umeta kevneşopî de ne. Şîmaneyêke (îhtîmala) xurt e ku modernîzmê di bin dilqa olê de bikin jiyanî û dewletperestiyeke-netew a bi bingeha olê, ava bikin. Îran di vê mijarê de nimûneyêke fêrkar e.

Bijareya netewbûna-demokratîk, bi potansiyela xwe ya mezin a çareseriya ku pêşkêş dike di mijara pirsgirêkên bîrdozî û pêkhateyî yên pirr girîft (tevlîhev) ên roja me ya îro de, soza pêşerojê dide. Bi taybetî, rêya ku YE têde pêş dikeve, bandorker e. Pirr girîng e ku modernîteya demokratîk bijareya netewa-demokratîk hem di hêla bîrdozî de û hem jî di hêla pêkhateyî de, weke yek ji rehendên xwe yên bingehîn bigire dest. [ji ber ku] şansê hem tevkariyê û hem rizgariyê dide şaristaniyê. Xebatên ji nû ve avabûnê yên modernîteya demokratîk, ku bi rêya netewa-demokratîk wan pêk bîne, di mijara çareseriya pirsgirêkên bingehîn ên civakî û jîngehî de di şûngeha projeyên herî hêvîdar de ne.

### 2- Tevgerên Çanda Olî: Zindîbûna Kevneşopa Olî

Tê çevdêrîkirin ku kevneşopa olî jî, ku modernîte û bi taybetî dewletperestiya-netew hewl didin wê bi têgîna laîkperestî bikin mêtingeh, zindîbûnek mîna ji nû ve vegera li jiyanê ya etnîsîteyê dijî. Bê gûman, ev ne zindîbûnekê di heman asta erka wê ya berê ya civakî de ye. Lê, ev vegerek di bin mora modernîteya fermî de ye, hem bi hêmanên xwe yên radîkal û hem bi basken xwe yên nerme. Vegera xwe, bi awayê hezmkirî gelek taybetmendiyên modernîteyê, dike. Ev mijar di rastî de hinekî zêdetir girîft (tevlîhev) e. Laîktî, her çend tê pênasekirin weke dest vekişandina tam a olê ji jiyana cîhanî (dinyawî) û bi taybetî ji karûbarên dewletê, têgîneke nediyar e. Laîktî, weke tê gotin, ne tam cîhanî (dinyawî) ye û ne jî ol tam dikare ji dewletê were razberkirin. A girîngtir jî ew e ku ol, ti caran jiyana axretê rêkûpêk nakin. Lê, ya ku di rastî de rûkûpêk dikin, erkên cîhanî (dinyawî) û civakî ne; bi taybetî jî erkên dewletî û desthilatî ne.

Laîktî mezhebek (Masonîk) e, ku ji alî avasazên Cihû ve di çaxa navîn de hate pêşxistin, ji bo şikandina serweriya cîhana Katolîk. Her çiqas çavdêriya wê te kirin ku bi zanistên pozîtîv re di nava hev de pêş ketiye, bê gûman e ku darêj (muştaq)ekê hêmana Rebanî ya bîrdoziya Cihû ye. Eger ev mijar baş neyê têgihîştin, wê nikaribe ne laîktî û ne jî pirsgirêkên ku bûye sedema wan, were têgihîştin. Hêmana Rebanî (Xwedayî; tê wateya ‘efendî’di zimanê Cihûtî de), herî kêm bi qasî kevneşopên din ên olî, di xwe de werdigire. Lê, xwe neçar dibîne ku vê rastiya xwe bi rengekî pirr

vaşartî û pirr bi embalajan ava bike. Zordestiyên bêeman ên Katolîktiya Çaxa Navîn, wan neçar kirine ku rêbazên bi vî rengî bikar bînin. Laîk, ku bi şoreşên burjuwa yên Holanda û Îngilîs pêngav avêtin, ji Şoreşa Frensî qezencên pirr mezintir bidest xistine. Bi avakirina dewlet-netew re xwe birêxistin kirine weke beşa dendika dewletê, ya ku xwe gihandina wê, nasîna wê û xistina wê ya ji desthilatiyê herî zor e. Vê serweriya xwe, ji vê heyamê heya roja me ya îro, didomînin. Ew diyardeya 'dewleta kûr', hinekî jî vê rastiyê derdibirre. Her dewlet-netewek, ku hejmara wan li cîhanê di roja îro de du sedî derbas dike, çawa ku laîk e, ewqas jî Masonîk e. Hêza bingehîn a serweriya bîrdozî ya modernîteya kapîtalîst in. Bandora wan kûrewî ye. Vê şûngeha xwe hîn jî xurt dikin û didomînin. Nîvendên din ku di wan de bibandor in, gelek saziyên civaka sivîl, di serî de yekdesteyên medya û mamosteyên zanîngehan in, ku di rêveçûna stratejîk a cîhanê de xwedî para girîng in. Di şûngeha venêr û aqilmendên modernîteyê de ne, ku jê re dibêjin 'cîhana laîk'. Erka wan a ku jê re dibêjin 'cîhanî'(dinyawî) û 'sekular' di vê wergiriyê de ye.

Herku Îslama Sunî û kevneşopên din ên olî yên sext di serî de Katolîktî, bi bandora modernîteyê dimehin, laîktî weke bîrdozî û bernameyeke siyasî girîngiya xwe wenda dike. Ji nû ve zindîbûna ola kevneşopî û bi taybetî gotûbêjên li ser laîktî û ol di civakên ku bandora kevneşopa Îslamî hîn jî bi awayekî xurt dijîn de, geş dibin. Ne rast e ku wan pêşketinan, ku di cewher de pêwendîdar in bi şerê ji bo desthilatiya bîrdozî û siyasî ya di navbera dewlet-netew û feraseta umetgerî de, werin teyisandin weke ku tenê bi şêwaza jiyana nûjen re têkildar bin. Dirûvekê têkoşîna di navbera Xirîstiyanî û Mûsawîtî de, êdî di navbera cîhana Îslam û Mûsawîtî de tê jiyîn. Di bin pevçûnên mezin ên li Rojhilata Navîn de van rastiyan hene. Tê xwestin ku lihevhatineke Mûsawî-Îslam a wek cûreya Ewrûpa û DYE were pêkanîn. Dema hêmanên radîkal, ji hêmanên dijberî lihevhatinê û pevçûner pêk tên; hêmanên nerme, wer xuya ye ku, bêhtir nêzî lehevhatinê ne.

Lê dîsa jî girîng e ku zindîbûna çanda kevneşopî ya olî, bi tevahî weke cebanîbûna paşverûtiyê neyê dîtin. Di rêjeya ku serî rakin li hemberî modernîte û dewletperestiya-netew de, naveroka demokratîk di xwe de werdigirin. Wekî din, nikare were paşçavkirin ku damarên xurt ên exlaqî jî dinimînin. Di hêla modernîteya demokratîk de girîng e ku pêwendî ji nêz ve were danîn bi van pêşketinan re, weke yek ji çandên ku modernîte pirr pê leyistiye û wan kiriye mêtingeh. Zindîbûna dirûv di her kevneşopên olî û çandên tepisandî de tê dîtin. Vê mijarê kûrewî ye. Lewre ne tenê pevçûna di navbera Îslam û Cihû de ye, lê pêwendîdar e bi bûyerên ku di rehenda kûrewî de rû didin.

Çawa ku gengaz e pirsgirêkên çandên cewaz ên etnîkî, di wergiriya netewa-demokratîk de bêne çareserkirin, her wisa xeylî girîng e ku naveroka demokratîk a çanda olî jî, weke yek ji hêmanên wekhev, azad û demokratîk, di nava netewa-demokratîk de were nirxandin û di çareseriyê de cî jê re bê dayîn. Di wergiriya erkekê din a girîng de ye, ku di hêla xebatên ji nû ve avabûnê de girîngiya jiyanî di xwede werdigire, ku modernîteya demokratîk feraseta xwe ya peymanên lihevhêner, ku ji bo tevahiya tevgerên dijberî sîstemê pêş dixe (bixe), ji bo çandên olî yên bi naveroka demokratîk jî, pêş bixe.

### 3- Tevgerên Xweserî Yên Bajarî, Navçeyî û Herêmî

Rêveberiyên xweser ên bajar, navçe û herêman, ku herdem giraniya wan a mezin di dîrokê de heye, di nava kevneşopên din ên çandî yên pirr girîng de ne, ku dewletperestiya-netew wan kiriye qurban. Xweserî û rêveberiyên xweser ên bajar, navçe û herêman her hebûne di hemû rêveberiyên civakî û dewletî de ku hatine sepandin. Ji xwe bi cûreyek dîtir nikare gengaz bibe ku bi taybetî dewlet û împaratoriyên çapmezin bêne rêvebirin. Navendîperestiya sext, weke karakterê yekdestîperest ê moderníteyê, di bingeh de nexweşiyeke dewlet-netewê ye. Hatiye ferzkirin weke pêdiviyeke zagona kara mezintirîn. Her wisa, hatiye rêkûpêkkirin, ji bo ku demokratên burjuwa yên çîna navên ku weke gireyek (ûr) mezin bûne, bibin desthilatdar. Dîsa, hatiye pêşxistin wek modêlek ku ancax bi faşîzmê ve dimeşe, ji bo ku ne yek pergaleke qraltî, lê bi hezaran pergalên qraltî werin sazkirin.

Herku jihevketina moderníteya klasîk bilez dibe û tevgerên çandî yên bi rengê postmodernîte, tevî ku pirraniya wan bi wesfa liberal in û ku hinek ji wana jî tên wateya qutbûna radîkal, pêş dikevin, di vê de para herî mezin tevgerên xweserî yên bajaran, naçeyan û herêman girtine ser milên xwe. Di rastî de vegera bo çandên xwe û ji nû ve zindîkirina wan mijara gotinê ye, ku rehendên siyasî, aborî û civakî jî di xwe de werdigirin, ku bi dirêjiya hemû çaxan wan bi awayekî xurt jiyane. Di serê wan tevgeran de tên, ku wateya wan a pirr girîng a civaka-dîrokî heye û pêwîst e hebe. Eger bajar, navçe û herêm rizgar nebin, genzgaz nabe ku mirov ji nexweşiya dewlet-netewê rizgar bibe. Pêkhateya ku vêya herî baş têdigihîje û wê derbasî sepanê dike, endamên YE ne. Hem barbariyên çarsed salî, ku wan di bin navê moderníte de jiyan, û hem Yekemîn û Duyemîn Şerên Cîhanî, waneyên têr dane çanda Ewrûpa. Ne rasthatinî (tsadufî) ye ku pêngavên peşin ên xistine sepanê, zagonên xweserî yên di derbarê bajaran, navçeyan û herêman de ne. Ev jî bi wê yekê re pêwendîdar e ku têgihane bê ka dewletperestiya-netew, ji bo tevahiya hebûnên çandî, çi cûre nijadkujiyek e, di serî de nijadkujî!

Xebatên herî guzîde li nava Yekîtiya Ewrûpa di roja îro de di wergiriya çandên bajaran, navçeyan û herêman de tenê pêkanîn; vê yekê di çareseriya hemû pirsgirekên kûrewî de yek jî hêmanên herî girîng e. Tevî ku zêde radikal nebe jî, tevgereke çandî ya girîng û pêwîst e. Ji xwe, ji ber ku homojeniya rêveberiya navendî nedikarî li hemû parzemînen cîhanê bihata ferzkirin û pêşxistin, xweseriya gelek bajaran, navçeyan û herêman zindîtiya xwe diparastin. Şûngehên xweser û xebatên xweserî, ji Federasyona Rusya heya Çîn û Hîndistanê û ji tevahiya parzemînê Emerîka (DYE federal e, li Kanada xweserî belave ye û Emerîkaya Latîn ji xwe di şûngeha xweseriya herêmî de ye) heya Afrîka (eger rêveberiyên kevneşopî yên eşîret û herêman li Afrîka nebin, nikare dewlet çêbibin û îdare bikin), mijarên herî çalak û rojaneyî ne. Nexweşiya navendîperest û sext a dewletperestiya-netew, tenê li hin dewletên Rojhilata Navîn ên bi hêjmara sînordar û li dîktadoriyên din tê şopandin.

Hewl tê dayîn ku ji hevketinên ku pêkhateyên navendîperest ên sext ên dewlet-netew, ku rehendên herî girîng ên moderníteya klasîk in, ji ber tengavkirina sermayeya kurewî ji jor ve û ya tevgerên çandî ji jêr ve dijîn, herî zêde bi rêveberiyên bajarî, navçeyî û herêmî ve werin dagirtin. Vê meyla roja me ya îro ku her diçe xurt dibe, divê bi tevgera netewa-demokratîk re di nava hev de pêş bikeve. Netewa demokratîk, weke şêweyeke rêveberî, pirr nêzî konfederalîzmê ye. Konfederalîzm, wek cûreyek şêweya rêveberiya siyasî ya netewên demokratîk e. Bajarên xurt, dikarin ancax bi rêveriyên xweser ên navçeyî û herêmî hebûna xwe pêk bînin. Divê herdu tevger jî, di warê şêweya rêveberî de wekhev bin û li hev rast werin. Netewbûna demokratîk û netew, bêyî hebûna

xweseriyên bajarî, navçeyî û herêmî, nikarin bibin hêza rêveberiyê. Yan wê têkevin nava aloziyê û belav bibin, yan jî wê bi modêleke nû ya dewletperestiya-netew benê derbaskirin. Tevgera netewa demokratîk, ji bo nekeve nava van herdu rewşan, neçar e ku xweseriyên bajarî, navçeyî û herêmî têqez pêş bixe. Li beramberî vê, rêveberiyên xweser ên bajarî, navçeyî û herêmî, ji bo bi temamî neyên daqurdadin û karibin hêzên xwe yên aborî, civakî û siyasî tam bikar binin, pêdiviya wan bi wê yekê heye ku bi tevgera netewa demokratîk re, weke netewa demokratîk, bibin yekpare. Tenê bi peymanên saxlem ên di navbera xwe de dikarin derbas bikin wan yekdestiyên hêza navendîperest a pirole, ku dewletperestiya-netew wan ji bo herdu hêzan jî bi berdewamî li ber derî radigire û wan ferz dike. Nexwe, herdu tevger, heta weke diyarde, di bin gefa ji nû ve homojenkirinê de, wê nikaribin xwe ji tesfiyebûn û helînê rizgar bikin, mîna ku pirrî caran di paşerojê de hate serê wan. Çawa ku mercên dîrokî di sedsala 19. de bêhtir li aliyê dewletperestiya-netew bûn, mercên roja me ya îro, anku rastiyên sedsala 21. jî li aliyê netewên demokratîk in û li aliyê rêveberiyên xweser ên bihêzbûyî di her astê de yên bajarî, navçeyî û herêmî ne.

Eşkere ye ku pêwîst e mirov pirr bi diqet be ji bo ku lîberalîzm van meylên demokratîkbûnê di bin serweriya xwe ya bîrdozî û daringî/madî de dejenere neke û wan nehelîne, weke ku di dîroka xwe de pirrî caran wisa kiriye. Erka herî girîng a stratejîk a modernîteya demokratîk ew e ku hem tevahiya dijberên sîstemê û hem herikîna bi pêkateyên siyasî yên civaka-dîrokî yên bajarî, navçeyî û herêmî, bi pêkhateyeke nû ya bîrdozî û çalakî bi xebatên berfireh ên teorîk di nava hev de pêş bixe. Merc xeylî destdayî ne, ji bo ku aqûbeta pêkhateyên konfederal, ku ji alî dewletperestiya-netew ve di nîvên sedsala 19. de hatin tesfiyekirin neyê dubarekirin, careke din di sedsala 21. de, lê berevajî, were veguharandin bo serkeftina konfederalîzma demokratîk. Girîngiya jiyanî wergirtiye pêkanîna bi rengekî serkeftî erkên rewşenbîrî, siyasî û exlaqî di xebatên ji nû ve avabûnê de, ji bo ku modernîteya demokratîk bi serkeftî were derxistin ji aloziya modernîte ya herî kûr a di heyama kapîtal a finans de, ku bûye berdewamî û ancax bi rêveberiya qeyranê li piyan (ser lingan) tê hêştin û tê domandin.

### 10-ERKÊN JI NÛ VE AVAKIRINA MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK

Mijara ku ez hewl didim şîrove bikin, ne zindîkirina bîranînên çaxa zêrîn ên paşerojê ye û ne jî xeyalkirina ji bo ‘utopyayekê’ nû ya pêşerojê ye. Ez watedar nabînim ku di derbarê herdu mijaran de jî hêza sêwiranê pêşane bikim. Her çend heşmendiyên civakî bi dahuranên bi vî rengî barkirî bin jî, vana zêde ne di nirxa daxuyanî û vebêjeyan de ne ku tevkarî bikin li rastiya civaka exlaqî û polîtîk, ku di rastî de ez hewl didim wê şîrove bikim. Her çend em tevkariyên wan bi tevahî înkar nekin jî, pêwîst e mirov zanibe ku dibin sedema fikareyan jî û li ser vê bingehê mirov li ser wan raweste û wan bike mijara hin vebêjeyan.

Têgîna modernîteya demokratîk, di van hêlan de, ne hewldaneke ji bo dayîna agahî ji ‘çaxa zerîn’e û ne jî ‘utopyayeke li ser bihuştê’ye. Divê herî kêm ez di hêla xwe de diyar bikim ku çawa ku ez vegotinên bi vî rengî yên yên li ser dîrok û civakê, di xwazî bi rêbazên metafizîk, yan jî bi yên pozîtîvîst li ser wan bêne xebitîn, weke rêbaz pesend nakim, her wisa encamên dirûvî hevdu hildiberînin û şîroveyên wan ên li ser rastî û heqîqetê, berevajiyê ku pirr îdea dikin, ne durust in. Ez misoger pêwîst dibînim ji bo mirov ezmûnên malzeme yên dîrokê bihizire. Ez ne tenê malzemeya dîrokî, lê malzeme û ezmûnên xwezayê jî pêwîst dibînim. Ez di vê mijarê de ne di nava nêzîkatiyekê wisa de me weke kesekî ampîrîst (ezmûner) ê tîpîk. Her wisa ez di nava nêzîkatiyeke îdealperest

(ramanperestiya teqez) de jî nînim, ku weke dijberî wê, îdea dike mirov dikare ramanê serbixwe ji malzeme û ezmûnên xwezayî û dîrokî hilberînê. Ez dizanim ku bi van rêbazan, bi dirêjiya hemû dîroka şaristaniyê giştîkirin (kuliyat)ên dêwane hatine çêkirin. Digel  ku ez bawer dikim ku pêwîst e mirov ji vana haydar (agahdar) be, lê ez di wê baweriyê de me ku, di hêla şîrovekirina rastiyê de, ne jêveneger in. Ez dixwazim diyar bikim ku bêyî vana jî gengaz e mirov heqîqetê şîrove bike. Bi taybetî, ez bizava pozîtîvîst a lêgerîner, ku di pirrbûna malzeme yên dîrokê de fetisiye, di rewşeke belengaz û reben de dibînim. Ez rewêj (texmîn) nakim ku têkiliya şêxen ku ji wendayiyê agahiyê didin, bi heqîqetê re hebe, ku bi heman şêweyê bêmalzeme ne û kerameta wan tenê ji wan re ye. Ew jî rewşeke rebenî û belengaziyê dijîn.

Wê kêm bimîne ku mirov tenê nêzîkatiyên ampîrîk û îdealîstperest rexne bike. Her wisa, girîng e mirov li rêbazên pêşveçûneriya gerdûnewer a xêzikiya dûz û yên dîmanewerî jî, bi rengekî rexnegir nêzîk bibe, ku şêweyên cewaztir ên van herdu rêbazan in. Rastî bi gelemperî, ne dikare bi rêbaza pêşveçûner a xêzikî û ne jî bi rêbaza dîmanewer were avakirin, yan jî vedîtin. Bê gûman asta zekaya bilind a nerme ya xwezaya civakî, bijareyeke fireh a azadiyê pêşkêş dike ji bo avakirina rastiya civakî. Lê, ev rewş nayê wateya “Herkes dikare, li gorî dile xwe, rastiya xwe ava bike” weke ku rêbaza dîmanewer (îzafîgerî) wê îdea dike. Heman rastî, her wisa neyê wateya “Kînga dema wê bê, mîna ku di Levhî Mehfûz de nivîsandî ye, wê pêk were” ku yên îdealîst wê wisa dizanin (jê bawer dikin). Avakirina rastiyên civakî (xwezayên civakî ji klan heya netew, çîn, dewlet û wekî vana), weke rastiyên nû bi ramanên nû, ku bêne çêkirin bi malzemeya civakî ya di nava mercên dem û cî yên daneyî de, weke rêya heşmendî û rêbaza herî rasteqîn dixuye, yan jî dikare wisa were pêjirandin.

A ku, bi dubareyî be jî, ez hewl didim rave bikim ew e ku pêwîst e rêbaz teqez xwe bispêre xwezaya civakî, anku civaka exlaqî û polîtîk bi taybetî, ku awayê wê yê bingehîn ê heyînê ye, ez pê bawer im ku wisa ye û ez pê ewle me. Ez hewl didim diyar bikim ku tevahiya bizavên ramanî û berhemên zanistî, felsefî û hunerî yên ku girêdana wan bi civaka exlaqî û polîtîk re tinebin, zayînên seqet dikin û wê zû yan dereng bibin sedemên fikareyan. Ez weke mercê yekemîn destnîşan dikim ku tevahiya pirsgirêkên li ser rêbazê û berhemên zanîn, etîk û estetîk ên ku pêwîst e girêdayî wan bimînin, ew e ku teqez civaka exlaqî û polîtîk esas bigirin. Ez dixwazim balê bikşînim ser wê yekê ku tevahiya rêbaz, zanîn, etîk û estetîkên ku li derveyî vî mercê yekemîn çêbibin, wê bi seqetî û şaşîtiyan barkirî bin û bi kirêtî û xirabiyan dagirtî bin. Ez bi pêdagerî (israr) rave dikim ku van mijaran, ne tenê bawerî û ramanên kesî yên di derbarê min de ne, lê di rêya heqîqetê de di nirxa asaya (norma) bingehîn de ne.

Piştî ku min rêbaza xwe ya nêzîkatiya di derbarê moderniteya demokratîk de bi dubareyî diyar kir, wê bê têgihîştin ku ez bi tehlîlên heya niha ve hewl didim nêzikatiya bi du awayî pêş bixim. Mijara yekemîn a ku tehlîl hewl didin bi pêdagerî (israr) destnîşan bikin, di derbarê wê yekê de ye ku sîstema şaristaniyê civaka bi wesfa exlaqî û polîtîk, ku awayê daneyî yê civaka xwezayî ye, bi berdewamî mehandiye, kedxwarî (îstîsmar) li ser wê kiriye, her wisa li ser wê yekdestiyên mêtin û desthilatiyê ava kiriye û bi vî rengî pêş ketiye. Ev mijar pirr girîng e û pêwîst dike ku teqez were têgihîştin û ji bo vê, tehlîlên pêwîst werin pêşkêşkirin. Min hewl da ez wisa bikim. Li gorî pêdiviya mercên ez têde me, malzemeya di dest de herçend sînordar be jî, min ew bi kar anî, lê di bingeh de min jiyanê, anku jiyan xwe, ku rêya ‘neba nabe’ ya heqîqetê ye, bi vê malzemeyê ve di  nava hev de şîrove kir û bi vî rengî min hewl da ez sîstema şaristaniyê şîrove bikim. Bi raya min, pêşkêşiya

malzemeya pîrole, zêde pêwîst nebû. Ew xeterî hebû ku di nava hûrgilî (detay) de bihata fetisandin. Lê bi daneyên ku hatine pêşkêşkirin, min hewlda ez bi eşkereyî raxim ber çavan ku mirov nikare bi tevahî bêmalzame be.

Encam ev bû: Gelo çaxên şaristanî yên dêwane, li gorî pêdiviya diyalektîkê, li hemberî kê hatibûn pêşxistin? Têkilî û nakokiyên xwe bi kê re, li ku derê û çawa pevbestibû? Her çend bi malzeme û hêza şîrove ya hindiktirîn be jî, min xwe dûr neda ku ez jî peyvên tên zanîn ên ’demos’ weke yekûna têkîlî û dijberiyên wan, û ‘kratya’ jî di wateya xwe rêvebirinê de, ji ber ku pirrî caran tenê bikaranîn û ji alî cîhana rewşenbîrî ve bi belaveyî têne zanîn, bikim yek û bi vî rengî wan pêşkêş bikim. Bê gûman Demoskratiya tevahiya yekeyên civaka exlaqî û polîtîk nagire nava xwe. Belkî jî, tam denk tê li gel ‘Konfederasyona Eşîretan’, mîna ku di çaxekê de li Îonya hate jiyîn. Lewre dibe ku yekeyên civaka exlaqî û polîtîk, ên jêrtir, jortir û cewaztir ên din, negirtibe nava xwe. Hîn rastir, ne ku dibe ku negirtibe nawa xwe, lê ji vê jî wêdetir, nagire nava xwe. Lê ji ber ku ez di wê baweriyê de me ku ev peyv, dîsa jî di nava yên heyî de ji bo niha, ya herî guncav e, min xwe ji bikaranîna wê dûr neda. Eger dema pêş termînolojiyeke guncavtir were bikaranîn, bê gûman wê di mijara pêwîstiya bikaranîna wê de dudiliyên min çênebin. A girîng, naveroka ku di xwe de werbigire û di derbarê we yekê de ye bê ka mebesta me ji naverokê çi ye.

Û, zêde pêwîst nake ku ‘madernîte’, ku peyva duyemîn e, were ravekirin. Çawa ku pirrî caran tê parverkirin, heyaman, çaxan û demajoyan, ku hatibin jiyîn û asa (norm)yên wan ên diyar hebin, vedibije. Wê demê, tê wateya ku çiqas çaxên şaristaniyê hebin, bi qasî wan, heta ji wan qat bi qat zêdetir Demoskratiya û modermîteyên demokratîk jî hene. Ji ber (zîra), gelek yekeyên civaka exlaqî û polîtîk weke modernîteya demokratîk hene, ku sîstemên şaristaniyê nekarîne xwe bi tevahî bigihînin wan û wan têxin bin yekdestiyên xwe yên mêtîn û desthilatiyê. Dîrok di vê mijarê de gelek malzemeyan pêşkêş dike. Min jî hewl da, weke nimûne, qala pirr hindikên wan bikim.

Duyemîn mijara girîng a di derbarê modernîteya demokratîk de ew bû ku, bi qasî sîstemên şaristaniyê û, weke çanda daringî, xwe bi rêxistin nekirine yan jî nekarîne xwe bi rêxistin bikin. Pêwîst dike ku şaristanî, hem weke bîrdozî ta radêya dawî rapêçayî (mucehez) û rêxistî bin û hem weke pêkhateya daringî (madî) di nava yekîtî û çalakiyê de bin. Ji ber neçar in ku bi awayê rojane emrazên xwe yên yekdestîperest ên mêtin û desthilatiyê bixebitînin. Malzemeya dîrokê di vê mijarê de pirr e. Kî çiqas bixwaze, dikare bidoze/bibîne. Lê, yekeyên modernîteya demokratîk, ne di heman şûngehê de ne. Hîn rasttir, ji ber ku tim di navbera şûngeha berxwedan û şûngeha mêtingehbûnê de diçin û tên; her wisa ji ber ku yekeyên wê yên serbixwe yên ku bêhtir li koşe û kuncikan, li serê çiyan û li nava çolan dimînin zêde pêşketî nînin, nikarin bibin xwedî heman sîstematîka pêkhateya bîrdozî û daringî (madî). Ez naxwazim bêjim ku qet nikarin sîstem, bîrdozî û pêkhate pêş bixin. Bê gûman dîrok tijî ye bi çandên pêkhate yên pirr zengîntir ên bîrdozî û daringî (madî), ku ji alî wan ve jî hatine pêşkêşkirin. Tevî ku ji ber sedema serweriya bîrdozî ya şaristaniyê zêde nehatine diyarkirin, pêwîst e mirov qet jê gûman neke ku dîrok di vê hêlê de daneyên pirr zengîn pêşkêş dike.

Min hewl da ez herdu seriyên şaristanî yên heya roja me ya îro bi xetên wan ên giştî bişopînim. Tevî hemû rêkûpêkkirina min a çors, ez di wê baweriyê de me ku her çend nebes be jî min meylên wan ên serekîn teyisandiye. Bi taybetî, wê bê têderxistin (ferqkirin) ku min hewl daye modernîteya ku weke kapîtalîst tê binavkirin, bi berfirehî tehlîl bikim. Her wisa dikare têrbaş bê şopandin ku min li beramberî vê, dijberên heman heyama modernîteyê jî bi awayekî hîn berfirehtir û

tevlî rexneyên diyar pêşkêş kiriye. Encama ku pêwîst e ji van rexneyan bê derxistin, eşkere ye di derbarê wê yekê de ye bê ka modernîteya demokratîk çawa bi erkên xwe ji nû ve avakirinê re rûbirû ye. Em dizanin ku hêzên fermî yên modernîteya kapîtalîst, di bin pêşengiya lîberalîzmê de, bi hemû hêzên xwe û derfetên xwe ve di her dilq (kiras)î de, dixwazî têkçûyî bin an nebin, di mijara xwe pêşkêşkirinê de xeylî şiyandar û ezmûndar in. Lê, em nikarin heman mijaran ji bo hêzên modernîteya demokratîk diyar bikin. Mirov dikare li ser bingeha ezmûnên wan ên hem dîrokê û hem paşeroja nêzîk di helwestên wan ên li hemberî lîberalîzmê de bi eşkereyî bişopîne bê ka çawa di warê bîrdozî de hatine helandin û zelaliya xwe wenda kirine. Ji bo, bi qasî gengaz be, mirov nekeve nava van rewşan û herî kêm firset nede şûngehên trajîk ên paşeroja nêzîk ku gelek bi êş in, pirr girîng e ku erkên ji nû ve avakirinê yên yekeyên medernîteya demokratîk werin zelalkirin.

Dema ez dibêjim ‘yeke’ mebesta min tevahî komcivak, takekes û tevger in, ên ku rewşa dijberî sîstemê pirr yan hindik dizanin û dijîn. Her yek ji van heyînan, ku pirraniya raser a xwezaya civakî pêk tînin, mixabin bi awayê hêza wesfî ya pirr pirr li pey hejmarên xwe ne. Divê armanca ji nû ve avakirinê ew be ku berî her tiştî pirrbûnên çendanî bigihîne hêzeke wesfînî. Dema em tenê yek kêliyekê jî jibîr nekin ku şebekeyên di asta kûrewî de, yên bazirganî, sanayî, malî, bîrdozî, desthilatî û dewlet-netewî, çiqas bi berfirehî, di nava hev de, her wisa li hemberî hedefên xwe çiqas şaşwazker û tuneker tevdigerin; herî kêm di hêla derbaskirina bêdengetiya mezintirîn a di navbera wan de, erkekê pirr eşkere ye û ku nikare were paşvexistin ku pêwîst e yekeyên modernîteya demokratîk, ji nû ve werin avakirin û werin gihandin hêzeke rêjedar a bi pirrbûnên wan re. Mirov dikare van erkan, bi awayê sê sernivîsên serekîn diyar bike. Van hersê erkan, ku bi hev re bi rengekî xurt pêwendîdar in, di rehendên rewşenbîrî (entelektuel), exlaqî (etîk) û siyasî (polîtîk) de ne. Lê, pêwendiya xurt û berhemberî ya di navbera wan de, ji holê ranake wê pêwîstiya ku divê weke saziyane misoger serbixwe bin. Berevajî, divê her qad, weke sazî, mîna ku di dîrokê de, di roja me ya îro û pêşerojê de jî, serxwebûna xwe biparêze. Nexwe, wê nikaribin erkên xwe bi mafdarî [şayanî] pêk bînin. Mijarên pêwîst e bêne tehlîlkirin, ew in ku sazîbûn û erkên di derbarê van qadên erkan de, ku di dîrokê de pirr di nava hev de jiyane, werin zelalkirin û her wisa were rêkûpêkkirin bê ka dikarin hevkariyeke çawa bi hevdu re bikin.

Wê ronakker be ku mirov pêvajoya dîrokî di vê hêlê de bi rêya hin mînakan rave bike. Erkên rewşênbîrî, exlaqî û polîtîk di yekeyên qebîleyan de bi gelemperî di nava hev de têne pêkanîn. Veqetîn û pisporbûn, zêde pêş neketine. Konfederasyonên eşîretan, bi giranî têkildar in bi erkên polîtîk re. Dema ku kevneşopa exlaqî, bi ezmûna kolan tê nimandin; ronakbûn û ramîn, bêhtir bi mekanîzma/sazgerînên şaman, şêx yan jî keşîşan tê nimandin. Di serdemên dirêj ên dîrokê de, ku têde olên Îbrahîmî, rehendên exlaqî û polîtîk jî werdigirin, hersê erk hinekî bi sazî dibin. Di îslamê de, dema ku medrese bêhtir rola saziya rewşenbîrî dileyêze; mizgeft rola saziya exlaqî û saltanat jî rola saziya polîtîk pêk tîne. Navheviya wan a zêdeyî, pêşî li pêşketina wan a afirîner girtiye. Sedama ku nekarîne herî kêm bi qasî Xirîstiyanî û Mûsawîtiyê pêş bikevin, bi vê rastyê re pêwendîdar e. Şûngeha ekumenîk yan jî umet, şêweyeke serwerî ya pêwendîdariya di navbera wan de ye û cûreyek enternasyonalîzmên wan dinimîne.

Rewşenbîrî (Entelektualîzm) di şaristaniya Greko-Romen de serxwebûna xwe hinekî zêdetir bi dest dixe. Ekol/bizavên felsefeyê, bêhtir saziyên rewşenbîrî ne. Serxwebûna wan xeylî pêşketî bûn. Exlaq li perestgehê û polîtîka pêşî li meclîsê û li senatoya komarê bi sazî bûn; lê, bi pêşketina împaratoriyê re, derbeyên mezin xwerîne. Împaratorî di asta navendî de wek cûreyek înkara bûyina

saziya polîtîk e. Ew reşkujiya ku li hemberî J. Sezar hate kirin, bi vê rastiyê re ji nêz ve pêwendîdar e.

Dema ku rewşenbîrî di modernîteya çaxa nêzîk de li zanîngehê dikeve faqê, exlaq derbeyeke mezin dixwe û bi jêçûnê (bi rabûna ji holê) re rûbirû dimîne. Li şûna wî, huqûqa pozîtîv tê danîn û bi vî rengî hewl tê dayîn ku rola wî ji nava civakê were tesfiyekirin. Û polîtîka di bin qilfa parlamentarîzmê de her diçe qada wê teng dibe û di bin rêveberiya burokrasiya dewlet-netewê de hema hema tê anîn rewşeke nesazbar. Wer lê tê ku, ew jî mîna exlaq, nikare rola xwe di wateya rasteqîn de bilîze. Lê, di yekeyên modernîteya demokratîk de pêşketinên saziyane yên cûrbecûr û girîft (tevlîhev) têne jiyîn. Rêxistinên xuşk û biratî di kesayetiyên xwe de wek cûreyek hersê erkan jî dikin yek. Utopîk, bi şêweya wek cûreyek terîqatê, li derdora heman kes sazbar dibin û têne bicîanîn. Bi taybetî Lîga Komunîstan, Manîfesto û Enternasyonala I., II. û III., di pêvajoya sosyalîzma pêkhatî de, weke saziyên ku hersê sazîbûn di nava hev de dijîn, xwe diteyisînin. Meyla dirûv a asîmîlasyonîst a modernîteya kapîtalîst a di derbarê hersê qadên erkan de perve kirine. Dema ku polîtîka, weke sazî, ji sazgerîn/mekanîzmayên îdarî (rêveberî) yên dewlet-netewa xweda re hetiye qurbankirin; exlaq ji huqûqa pozîtîv a heman sazgerîn/mekanîzmayê re, ku dîliya hemwelatiyan rêkûpêk dike, hatiye qurbankirin. Û erka rewşenbîrî hatiye fedakirin ji dumendiya sermaydar û barkêş -hemal- (kera/ê ku agahiyê dikşîne) re, yên rewşenbîrî yên zanîngehên ku rola perestgehên nû yên dewlet-netewê dilîzîn; yan jî [vê erkê] bi wan ve dane înkarkirin.

Tew van bibîranînên kurt jî yên di derbarê dîrokê de, bi rengekî eşkere û tevlî hemû girîngiyên xwe ve nîşan didin ku pêwîst e yekeyên mederniyeya demokratîk, eger naxwazin weke civak bi tevahî belav bibin, xwebûnên xwe bi şêweya şebekeyên-dijber, bê hersê erkan bar bikin. Beriya ku em li ser erkan rawestin, wê fêrkar be ku em bi kurtasî qala mijarên yeke û şebekeyan jî bikin. Yeke tê wateya her komcivaka ku dijberê yekdestiyan be. Her komcivak, ji neteweke demokratîk heya komeleyeke gund û ji konfederasyoneke nawnetewî heya şaxekî taxan, yekeyek e. Her wisa, her organa rêveberiyê jî, ji qebileyan heya bajaran û ji navçeyî heya netewî, yekeyek e. Yekeyên ku nûneriya bi milyaran mirovan bikin, weke yekeyên du-kesî, heta yên yek-kesî jî, dikarin bibin mijara gotinê. Wê mirov fêrkar bike ku di nava vê zengîniyê de li vê têgînê were nêrîn. Lê, ya girîng li vê derê, ew e ku her yek ji hemû yekeyan, weke civaka exlaqî û polîtîk werin nirxandin. Lewre, di nirxa rêgezî de ye ku her yeke di erkên rewşenbîrî, exlaqî û polîtîk de pardar be. Çawa ku bûyîna yeke, bûyîna civaka exlaqî û polîtîk pêwîst dike; bûyîna civaka exlaqî û polîtîk jî pewîst dike ku mirov dilsozî erkên rewşenbîrî, exlaqî û polîtîk be. Û awayê bûyîna tor, yan jî şebeke, pêwendîdar e bi rêvebirin û pêkhateya rêxistinî ya cemsera dijber. Wekî din, pevretiyên navxwayî dikarin herî baş bi awayê şebekeyan bi hevdu re werin rêxistinkirin (honandin). Rêxistingerî û rêveberiya ferman-komûta ya xerarşîk û navendîperestiya sext, bi temamî dijraberî rêgezên rêxistingerî û rêveberiya yekeyên modernîteya demokratîk in.

### A- Erkên Rewşenbîrî

Divê ez pêşîn diyar bikim ku ez ê erkên rewşenbîrî, weke bi seranserî çêkirina zanînê û veguhastina wê bo yekeyan, destnîşan nekim. Yekemîn karê ku pêwîst e bê kirin, ew e ku rewşenbîrîtî bi xwe were nirxandin. Pirrî caran tê gotin ku modernîteji alî çaxa Ronakbîrî (ya Ewrûpaya sadsala 18.) ve hatiye destnîşankirin. Nijadkujiyên bêhejmar ên fizîkî û çandî, di serî de nijadkujiya Cihû, ku ji alî dewlet-netewê ve weke sîstematîk hatine sapandin, derbeyên mirinane li

îdeaya ronakbîrî ya moderníteyê didin. Ev kêlî, ew kêlî ye ku Adorno dibêje pêwîst e êdî tevahiya xwedayîtiyan bedeng bibin. Di heman demê de qonaxa dawî ye ku şaristanî xwe gihandinê. Ev kêlî, kêliyeke girîng e; eger tehlîla wê neyê kirin, mirov nikare tew yek gavek jî pêş ve bavêje. Em qala kêliya têkçîneke dîrokî, her wisa em qala kêliya derewan û nijadkujiyan dikin. Rewşenbîrîtî, weke çalakiyeke ronakbûn, zanabûn û zanistbûnê; nabe ku xwe ji vê kêliyê razber bike. Divê weke yek ji tewanbarên sereke were darizandin. Arastekirina vê tewanê (vî sûcî) li çend heb Hîtleran, propagandaya herî kerax a lîberalîzmê ye. Eger ew sîstema ku Hîtler ji landikê heya gorê xwedî kiriye neyê ravekirin, wê rastî/heqîqet nekaribe hatibe ravekirin; lê herî zêde wê xiyanet li rastiyê hatibe kirin. Dema ku xiyanet hatiye kirin li gerîna li pey rastiyê, ku erka binehîn a rewşenbîrî ye, û hem jî ev xiyanet, ji alî sermayedar û barkêş (hemal)ên rewşenbîrî ve bi belaveyî tê pêkanîn, vê yekê tê wateya ku mijarên pêwîst e ji kokê ve di ber çavan re werin derbaskirin hene. Heya ku mijarên pêwîst e di qada rewşenbîrî de ji kokê ve di ber çavan re bêne derbaskirin neyên tehlîlkirin, şûngeha ku mirov têkevê, wê ji bûyîna sermayedar û barkêşên nû yên rewşenbîriyê wêdetir encam nezayîne.

Eger qeyrana kûrewî ya sîstemîk, ancax bi rêveberiya awarte ya qeyranê tê domandin, di vê rewşê de nekirina qala qeyrana rewşenbîrî, yan ji ber sedema korîtiyê ye û yan ji bi wê yekê gengaz dibe ku mirov bibe sermayedar û barkêşek îflehnebûyî yê rewşenbîrî yê sîstemê. Rewşenbîrek ji rêzê ya/yê xwedî anûr/rûmet, zoriyê nakşîne têbigihîje ku qeyran di bingeh de pêwendîdar e bi xitimana di qada rewşenbîrî de. Bi ser de di navbera pêkhate û heşmendiyên sîstemê de girêdaneke dirûvê têkîliya beden û giyan (ruh) heye. Qeyrana bedenê, weke pêkhateyî, ne tenê qeyrana heşmendî, weke giyan pêwîst dike; lê ew dike pêşengê wê. Pêşekî, ne di bedenê de ye; lê di qeyrana giyanî de ye. Çawa k mirina mejî delîla misoger a mirina bedenê ye; qeyrana heşmendî jî ancax dikare bibe delîla qeyrana pêkheteyî. Bi eşkereyî misoger e ku qeyraneke kûr a rewşenbîrî tê jiyîn. Bersiva ku bê dayîn, kûraniyek wisa dixwaze bi qasî ku nikaribe bi nûbûnên di hin qadan de were derbaskirin; her wisa, pêwîst dike ku bi veguherana sîstemê re pêwendîdar be. Çareseriya qeyrana rewşenbîrî ya sîstemê, ancax bi derbaskirina wê ve, anku bi 'şoreşa rewşenbîrî' gengaz dibe. Berî gotûbêjkirina li ser şoreşa rewşenbîrî ya roja me ya îro, wê di vê mijarê de ta radeya dawî ronakker be ku mirov qala hin nimûneyên dîrokî bike.

Yekemîn şoreşa mezin a rewşenbîrî ya di dîrokê de, bi qasî ku karibe were şîrovekirin, di heyama 6000-4000 B.Z. de li Mezopotamya hat jiyîn. Serdemek e ku hêza civakê û hêzên xwezayî, yekem car bi berfirehî têne çavdêrîkirin û encamên pratîkî, yên bi rehendên dêwane, ji wan têne derxistin. Ev, heyamekê wisa ye ku Gordon Childe ji bo wê dibêje mirov dikare ancax berawiriya wê bi Ewrûpaya piştî sedsala 16. re bike. Beşeke mezin a destketiyên civakî, ku hîn jî weke hem heşmendî (zîhnî) û hem amûrî têne jiyîn, ji wê serdemê mayî ne. Duyemîn şoreşa mezin, heyamên damezrîna şaristaniyên Sumer û Misirê ne. Dê heyama yekemîn wê şiyanê nîşan bide ku destketiyên şoreşê, weke hem heşmendî û hem amûrî, veguherîne bo sîstema şaristaniyê. Gelek vedîtin (keşf), di serî de nivîs, bîrkarî/matematîk, wêje, bijîşkî (tip), astronomî, teolojî û biyolojî, pêşketinên şoreşane yên rewşenbîrî ne ku di vê heyamê de hatine bidestxistin. Dîrok pişt re wê bi fêrbûn û dubarekirina van pêşketinan derbas bibe, heya şoreşa Grek-Îonya.

Şoreşa rewşenbîrî ya Grek-Îonya sêyemîn gava mezin pêk tîne. Heyama 600 B.Z., serdemeke din e ku di hêla hem heşmendiya felsefî û hem zanistîtî de pirr zengîn derbas bûye. Derbaseya ji olên bi têkeliya mîtolojî bo şoreşa felsefî, bê gûman şoreşeke mezin a rewşenbîrî ye. Wekî din, di qadên mîna nivîs, wêje, fizîk, biyolojî, mantiq, matematîk, dîrok, huner û polîtîka de jî

pêşketinên şoreşane hatin jiyîn.  Dîrok heya sedsala 16. ancax bi veguhastin û dubarekirina berhemên van şoreşan hate jiyîn. Bê gûman, gelek pêşketinên rewşenbîrî li cî û demên dîtir çêbûne. Lê mirov nikare vana weke şoreşên mezin bihesibîne. Mirov dikare pêngavên olî yên yek-xwedayî weke şoreşên girîng ên heşmendî şîrove bike. Wekî din, şoreşa exlaqî ya Zerdeştî şoreşeke mezin a rewşenbîrî ye. Konfuçyûs li Çînê û Bûda li Hindê  nirxên girîng ên rewşenbîrî ne. Birqên rewşenbîrî yên di navbera sedsalên 8. û 12. ên Îslamê de jî girîng in.  Wendabûneke mezin e ku nehatibin veguherandin bo şoreşê.

Şoreşa rewşenbîrî ya Ewrûpa, bê gûman bikok û berfireh e. Lê, bê nîqaş e ku çavkaniyên xwe ji birq û şoreşên ku me qala wan kir girtiye. Divê ez yekser diyar bikim ku pêwendiyên tevahiya van şoreşên rewşenbîrî bi tekdestiyên mêtin û desthilatiyê re tine ne. Berevajî, ji rûyê van yekdestiyan, nekarîne bi şayanî pêş bikevin, her wisa hatine paşevajkirin, kokirin û bi pirranî wan bi xwe ve girêdane û wan kirine sermaye. Ev rastî di şoreşa mezin a rewşenbîrî ya Ewrûpa de bêhtir eşkere û kartêker e. Sîstemên dewlet-netew û mutlaqiyetê,  weke yekdestiyên kapîtalîst û yekdestiyên dewlet-netew û mutlaqiyetê, xebatên mezin kirine û vêya weke ji karên xwe yên sereke hesibandine. Têkoşînên mezîn di vê mijarê de hatine dayin. Ji bo ku rûmet û serxwebûna xwe ya rewşenbîrî wenda nekin, li hemberî zordariya bêeman a desthilatiyan, ji engîzîsyonê heya dadgehên şoreşê yên Frensî, li ber xwe dane û kesên weke Brûno, Erasmûs, Galîleo, Thomas Moore û wekî vana karîne bidin ber çavan ku werin şewitandin jî.

Serweriya dewlet-netew û sermayeya yekdestîperest, mîna ku di her qad û yekeyên civakê de, di qad û yekeyên rewşenbîrî de jî, di sedsalên 19. û 20. de bi awayekî xurt teyisîn. Zanist, felsefe, hûner û heta ol bi desthilatiyan re û bi taybetî bi pêkhateyên dewlet-netewê re di rêjeya mezin de hatin yekpare/entegrekirin. Yekdestiperestiya di herdu qadan de derbeya mezin li serxwebûna rewşenbîrî xist. Rewşenbîrê di bin rajêriyê de, yan veguherî bo sermayedarekî rewşenbîrî, yan jî bi pirranî di sîstemên zanîngehan û yên din ên dibistanan de veguherî bo barkêşekî zanîne (agahiyê). Perestgehên nû yên her dewlet-netewê, bûn pêkhateyên dibistanan, di serî de jî yên zanîngehan. Mejî û giyana nifşên nû, li van deran têne şûştin û vana têne kirin hemwelatiyên bende, ku bi xwedayên xwe yên dewlet-netewê diperizin, bi qasî ku bi ti serdeman re neyê berawirkirin. Mamosteyên di her astê de, weke xwezayî, di şûngeha çîna keşîşên nû de ne. Bê gûman, tek-tûk rewşenbîr û ronakbirên ku rûmeta xwe ya rewşenbîrî diparêzin hene.  Lê,  ewqas vejartî (îstîsnayî) ne ku rêsaya gelemperî xira nakin.

A hîn girîngtir, bi pêşketinên di naveroka şoreşa rewşenbîrî ya Ewrûpa re pêwandîdar e. Pêwîst e mirov diyar bike ku berî her tiştî ol, zanist, felsefe û hunerê, yên çaxên beriya xwe, baş hezm kirine.  Eşkere ye ku tevkariyên xwe dispêrin vê hezmkirinê. Divê were pejirandin ku rewşenbîrên Ewrûpî di warê xwe nêzîkkirina li rastiyê/heqîqetê de qonaxeke mezin pêş de çûne. Serkeftina wan, weke rêbaz û sepan, misoger e. Bi taybetî serkeftina wan a di derbarê xwezaya yekemîn (qadên fizîk, kîmya, biyolojî û astronomî) de bi vî rengî ye. Lê, ne gengaz e ku mirov heman mijaran ji bo nêzîkatiya wan a zanistî,  felsefî, hunerî û exlaqî yên di derbarê civakê de, ku xwezaya duyemîn in, destnîşan bike. Danezanan (manîfestoyan), dîsîplînên zanistî, bizavên felsefî, meylên hunerî û doktrînên etîkî (exlaqî), yên mezin û watedar, pêş xistin. Lê nekarîn ewqas serkeftî bin, bi qasî ku [karibin] karakterê exlaqî û polîtîk ê civakê biparêzin. Berevajî, herku bi yekdestiyên sermaye û desthilatî ve hatin girêdan, di kirina civaka exlaqî û polîtîk hedef de, ku gihîştin heya

tunekirinan, ewqas hemtewanî kirin ku mirov nikare wan tenê bi nebesî, kêmasî û şaşîtiyan rave bike. Wate ku qeyrana rewşenbîrî bi vî awayî destpê kir.

Bê gûman, ne tenê civak, lê di bûyîna jîngeh jî hedefa tunebûnê de beşa rewşenbîr berpirsyar e. Ji xwe sedema ku ji qeyrana kûrewî bi hevbeşî berpirsyar tênê girtin, ji ber wê yekê ye ku qeyran [bi xwe jî] hevbeş e. Li vê derê mijara herî girîng ku pêwîst e were ronîkirin, ew e bê ka têkçûn, xirabûn û şewşbûna rewşenbîrî, weke stratejîk û taktîk, çawa pêşketiye. Divê em çi û kê berpirsyar bigirin, bi taybetî ji pêşketina gengeşî, têkçûn û xiyaneta mezin a di qada zanistên civakê de (divê berî her tiştî ez baweriya xwe diyar bikim ku zanistên di derbarê Xwezaya Yekemîn de jî di wesfa civakî de ne, yan jî pêwîst e wisa bin)? Gelo, nexweşiyek bi tevahî pêwendîdar bi paradîgmaya zanistî re mijara gotinê ye? Gelo, pêwîst e mirov para herî mezin di hin dîsîplînan de bibîne? Gelo nexweşî bunyewî ye, yan arizî ye? Gelo dermankirina wê gengaz e? Divê çawa rê û rêbazên dermankirinê werin pêşxistin? Çi dikarin bibin nîşanderên serekîn ên paradîgma, yan jî şoreşa zanistî ya nû? Divê, weke stratejîk, em ji ku derê ve destpê bikin? Ancax dema bersivên me yên cewherî ji van pirsan û yên dirûvên wan re hebin, hingê em ê karibin hem derketina ji qeyrana rewşenbîrî û hem erkên xwe yên nû yên paradîgmatîk û zanistî destnîşan bikin.

Qeyrana zanista bi navenda şaristaniya Ewrûpa bunyewî ye. Bi pêşketinên di heyamên destpêkê yên şaristanî re pêwendîdar e. Navendîbûna zanistê li perestgehê, tê wateya yekparebûna wê bi desthilatiyê re. Bi hejmareke zêde nimûne hene ku îspat dikin ku zanistên di şaristaniyên Misir û Sumer de bûne perçeyên jêveneqetîn ên desthilatiyê. Keşîşî, ku zanistê berhev dikir, ji xwe di şûngeha hevparê tewrî girîng ê desthilatiyê de bû. Lê di rastî de pêkhateya zanista di serdema neolîtîkê de cewaz bû. Zanîna jinê ya li ser nebat an, belkî jî hîmê biyolojî û bijîşkiyê (tibê) bû. Wekî din, çavnêriyên wê yên li ser demsalan û mehan, hesabê derdixist holê. Dikare pirr bi hêsanî were şîrovekirin ku pratîkên jiyanê yên bi hezaran salan ên komcivakên çandinî û gundan, gencîne (xezîne)yeke mezin a zanînê (agahiyê) derxistiye holê. Lê heyama şaristaniyê van zanînan komî ser hev kir û wan kir perçeyekê desthilayiyê. Li vê derê veguheraneke wesfînî di wateya neyînî de hetiye jiyîn.

Zanîn û zanist di cavakên dijber ên berî û heyama şaristaniyê de perçeyek ji civaka exlaqî û polîtîk bûn. Ta ku berjewendiyên jiyanî yên civakê pêwîst nedikir, gengaz nedibû ku zanist bi cûreyek dîtir bihata bikaranîn. Yekane armanca zanîn û zanistê, tenê dikarîbû ew bûya ku heyina civakê bihata domandin, parastin û xwedîkirin. Mirov nedikarî hizirîba ku armancekê wan a dîtir hebûya. Lê şaristanî vê rewşê ji kokê ve guherand. Yekdestiya xwe li ser zanîn û zanistê saz kir û bi vî rengî wan ji civakê qut kir. Dema civak ji zanîn û zanistê bêpar hate hêştin, hêzên desthilatî û dewletê, bi zanîn û zanistê, heya bêjî bihêz bûn. Wan kesên ku zanînê hildiberandin û diguhastin, bi xanedaniyan û serayan girê dan û bi vî rengî yekdestiya xwe saxlem kirin. Bi vî awayî qutkirina bikok a zanist ji civakê û bi taybetî ji jinê, dihat wateya qutkirina her wisa girêdana wê ya bi jiyanê û jîngehê re jî. Di heman demê de qutbûna bikok a girêdana zekaya analîtîk bi zekaya hestî re û mezinbûna berdewamî ya mesafeya di navbera wan de jî bi hev re pêş diket.

Wateya zanistê di xwezaya civakî de xwedayîtî bû. Civak asta xwe ya zanîn û zanebûna di derbarê xwezaya xwe de, weke derbirrana/îfadeya nasnameya xwe, dikir xwezayî û wê wekhev didît li gel xwedayîtiyê. Lê şaristanî vê rewşê jî guhrand. Dema zanist derbasî xanedan û hevparên wan bû, xwedayîtî jî şûngeh/pozîsyon guherand. Êdî dema payeya bendetî û ya ne-xwedayî ji civakê re

hate dayîn, dihat wateya ku xanedan û derdorên wan ên nêzîk, weke ji nijada xweda, dihatin derbaskirin nava mîtolojî û olê. Qralên-xweda û yên ji nijada xweda berhemên pêvajoyeke bi vî rengî bûn. Qutkirina bi vî awayî girêdana hilberîner û guhastiner a zanist û zanînê ji cavakê, bi dirêjiya hemû çaxên şaristaniyê dewam kir. Tevî ku yên li hemberî vê yekê li ber xwe dan hebûn jî, bi hêsanî hatin tesfiyekirin. Zanîn û zanist hema hema qestekê çêkirin. Girêdayî bi şaristaniya Ewrûpa; hilberînerên zanîn û zaniste, bi taybetî ji ber sedema pevçûna di navbera dêrê û qraltiyê de û hewaya xweser a qismî ya manastiran, heyameka serbixwe ya sînordar jiyan. Şerên mezin ên ji bo desthilatiyê, bêyî ku zerar bidin lêkolînên wan, firset pêşkêşî wan dikirin ji bo bi hêsanî piştevanî bibînin. Ronesans, Reform û Ronakbîrî ji nêz ve pêwendîdar bûn bi dorhêla xweser a ku van şerên ji bo desthilatiyê rê li ber wan vekirin. Nebûyîna mûtlaqiyetek wek şêwaza Çîn û [Împ.] Osmanî, tevkarî li xweseriyê dikir. Encam bû şoreşa felsefî û zanistî. Lê hilhatina serweriya kapîtalîzmê li milekî û çêbîna dewlet-netewê li milê din, di sedsalên 19. û 20. de, damezrîna yekdestiya sermaye û desthilatî li ser zanistê bi xwe re anî. Zanist êdî perçeyek jêneveqetîn a sermaye û desthilatiyê bû. Ev rewş, ku ji xwe li hemberî civaka exlaqî û polîtîk bi dirêjiya dîroka şaristaniyê pêşket, bi modernîteya Ewrûpa re gihîşt lûtkeyê.

Ev tê wateya ku paradîgmayên zanistî yên binavenda Ewrûpa pirr ji mêj ve ji civakê qut bûbûn. Ên ku bi zanîn û zanistê re mijûl dibûn, bi giranî di nava perspektîva sermaye û desthilatiyê de bûn. Civaka exlaqî û polîtîk zû ve ji ber çavan ketibû. Ev pêvajo bi têkçûna dêrê re zêdetir bilez bû. Zanista ku endîşeya wê ya bingehîn ne civaka exlaqî û polîtîk bû, êdî nedikarî qadeke dîtir a mijûliyê bidîta, ji bilî xwe kilîtkirina li hedefên sermaye û dewletê. Êdî dema ku zanist desthilatî û sermayeyê hildiberand, sermaye û desthilatî jî zanistê bi têra xwe dikirin malê xwe. Qutbûna heya dawî girêdana zanistê bi exlaq û polîtîka re, derî heya dawî ji şeran, pêkdadanan, pevçûnan û her cûre kedxwariyan re vedikir. Ji xwe dîroka şaristaniya Ewrûpa di heman demê de bû dîroka ku şer herî zêde têde çêbûn. Rola ku ji zanistê re hate dayîn ew bû ku êdî lêhûr bibe li nûvedan/îcada emûrên şerên biheybet û ku serkeftinan bînin. Encam ew bû ku ev rewş gihîşt heya çekên nuklearî. Di civakek de ku têde rêsayên civaka exlaqî û polîtîk zal bin, ne ku çekên nukleerî, lê tew nedîkarî patpatkek jî bihata nûvedan. Her çend hatiba nûvedan jî, qet nebe, nedikarî li hemberî civakê bihata bikaranîn.

Şerên rûxîna exlaqî pêker/faktora herî girîng a destpêkê ye. Û qutbûna têkiliya zanist û exlaq, bingeha her cûre nûvedana amûrên rûxîner e. Nedikarî bihata hizirîn ku vê têkiliya di navbera zanist û desthilatî û cavakê de, neteyisîba li paradîgma û rêbaza bingehîn. Derxistina civakê ji dewrê, dihat wateya heyber/objekirina wê jî; heman weke obje/heyberkirina jin û kolayan di dema berê de. Paşê veqetînên obje-subje, ku bi Bakon û Dêkax (Descartes) destpê kir, hate guhastin bo tevahiya zanistan. Pirr pesna wê tê dayîn ku mirov di zanistê de objektîv be. Lê di rastî de deriyê felaketa herî bingehîn bi tûjbûna veqetîna objektîvîzm û subjektîbîzm re vebû. Pişt re bi veqetîna ez-a/ê dîtir re kûr bû. Pê re, veguherî bos eriyên diyalektîk ên hevdu tune dikin. Van dubendiyan misoger teyisîna veqetîn û nakokiya di navbera civaka exlaqî û polîtîk û sermaye û desthilatî de ye. Daxistina xwezayê, paşê jinan û koleyan û herî dawî jî tevahiya civakê bo şûngeha heyber/obje, derket pêşiya me weke ‘rêsaya objektîvîzmê’ ya pirr navdar, ku hîn jî di zanistê de tê bikaranîn. Têkiliya berê ya xweda-bende veguherî bo têkiliya subje-obje. Feraseta kevntir a li ser xwezaya zindî, ciyê xwe ji xwezaya mirî ya heyber/obje û mirovê xwedayî yê kirde/subje yê li ser wê re, hêşt.

Bandora van nêzîkatiyên paradîgmatîk li ser zanistê, bi taybetî li ser zanistên civakî, rûxîner bûye. Ji bo mînak, zanista fizîkê, ku xwezeya fizîkê esas digire, ku bi temamî heyber/obje ye, bawer dike ku xwedî wê azadiyê ye ku li ser xwezayê bi rengekî bêsînor ceribandinan û tesarûfan bike. Ji ceribandina nuklearî heya têxistina nava liv û tevgerê her cûre otodînamîkan, xwe azad dihesebîne. Dema vêya dike, ti endîşeyeke exlaqî hîs nake. Dema feraseta li ser xwezaya heyber/obje tesarûfa bê sînor li ser daringê (madeyê) bizayîne, encam diçe heya bombeya atomî. Dema zanista xwedayî veguhere bo zanista amûrî, girêdana wê bi civakê re namîne. Her wisa amurîtiyeke girêdayî zagona kara mezintirîn a di destê desthilatî û sermaye de werdigire. Fizîk di dîmen de zanistek e ku bi temamî bêalî ye û bi xwezaya objektîv re mijûl dibe. Lê eşkere ye ku di cewher de yek ji çavkariyên bingehîn a hêzê ya desthilatî û sermayeyê ye. Nexwe, wê zanista fizîkê nekarîbûya awayê xwe yê heyî parastiba. Veguherana wê bo rewşa hêzeke dijberî-civakê, nîşan dide ku zanisteke wisa objektîv a bêalî tine ye. Têkiliyên hêzê jî, ku ji wan re tê gotin zagonên fizîkê, di tehlîla dawî de nayên wayeteke dîtir, ji bilî teyisanên hêza mirov û em dizanin ku mirov jî di wateya teqez de hebûneke civakî ye.

Eger em felsefeya pozîtîvîst şîrove bikin, ku mora xwe li tevahiya pêkhateya zanistî ya modernîteyê daye, em ê karibin rûyê fasteqîn ê têkiliya şaristanî-desthilatî-zanist baştir ronî bikin. Em dizanin ku felsefeya pozîtîvîst ji diyardeyên misoger ên objektîv bi rê dikeve û, ji bilî vê, cî nade ti nêzîkatiyeke zanistî. Dema ji nêz ve li bê nêrîn, wê bê têgihin ku zanist, weke têkiliya objeyan, ji hemû perestinên berê yên pûtan û hêzên berê yên metafizîk zêdetir pûtperest û metafizîkperest e. Eger em di vê mijarê de diyalektîka dîrokî bi kurtasî bi bîr bînin, em ê bêtir ronî bibin. Çawa ku olên yekxwedayî û razber, li ser bingeha rexnekirina paganîzmê (pûtperestî, wek cûreyek ola xwedayîkirina diyardeyan) derketine holê û bi vî awayî xwe şêwandine; pozîtîvîzm jî, wek cûreyek êrîşa dijber, bi şêweya pûtperestiya nû derketiye holê. Rexyeya wê ya li ser ol û metafizîkê, weke pûtperestiya nû (Rastîperestiya spartî bi diyardeyan, misoger neo-paganîzm e), anku weke neo-metafizîk şêwe girtiye. Ta radeya dawî girîng e ku F. Nietzche, ku yek ji wan fîlozofan e, vê rastiyê yekem car tespît kiriye û nirxandinên wî di lêgerînên li ser rastiyê/heqîqetê de di wesfa tevkariyê de ne. Pirr girîng e destnîşankirina têgîna jê re tê gotin ‘diyardeya objektîv’, ji rastiyê dûr e. Diyarde bi tena serê xwe di derbarê rastiyê de yan ti agahiyeke watedar pêşkêş nakin, yan jî, bi qasî ku pêşkêş bikin, encamên per şaş bi xwe re tînin.

Me gotibû ku eger diyarde nikaribin di wergiriya girêdaniyên xwe yên girîft de wate wergirin, yan qet agahî pêşkêş nakin, yan jî dibe rê li ber encamên herî şaş vekin. Em diyardeyên fizîk, kîmya û biyolojî li milekî bihêlin. Em tenê li ser mînaka diyardeyeke civakî rawestin û bi vî rengî ji nêz ve bibînin encamên dibe sedemên ku rê li ber wan vedike. Dewlet-netew li gorî pozîvîzmê, diyardeyek e. Her wisa tevahiya her yek hêmanên ku wê pêk tînin jî diyarde ne. Her yek ji bi hezaran sazî û bi milyonan mirov, anku hemûyên wan, diyarde ne. Dema em têkiliyên di navbera wan de tevlî bikin, em ê wêne (tablo)yê temam bikin. Li gorî pozîtîvîzmê, tê wateya ku me têgîna zanistî saz kir. Êdî em bi rastiyeke teqez -heqîqeteke mûtlaq- re rûbirû ne: Rastiya dewlet-netewê. Pozîtîvîm wek şîroveyek li vê pênaseyê nanêre; lê wek diyardeyeke rastiya teqez lê dinêre. Her wisa, li tevahiya diyardeyên din ên li ser zanista civakê jî, bi vê ferasete dinêre. Her yek ji vana jî, heman weke her yek ji diyareyên fizîk, kîmya û biyolojî, diyarde ne. Pênaseya wê ya li ser rastiyê wisa ye. Bi taybetî me di tevgerên paqijî-nijadkujiyên etnîkî de bi hemû sawnakiyê dest bi têderxistinê kir ku ev nêzîkatî, ku di xuyanî de êrî ye û qet xeterî di di xwe de wernagire, ji bin (qet)

ne wisa ye. Hemûyên wan, em ji Hîtler bigirin heya sarokên qaşo ‘nerme’ yên dewlet-netewan, wê gotibana ku tiştên dikin, ta radeya dawî rast in li gorî zanistê  (li gorî zanistên pozîtîv); her wisa ku rastiyên netewa xwe pal dikin û ku avakirina netewek hîn homojentir, ne tenê mafekî ye, lê pêşketineke guncav e li gel zagona xwezayî ya peresanê. Li gorî zanista ku wê esas digirin, rast dibêjin. Felsefe û zanistên pozîtîv vê hêzê didin wan. Ji xwe tevahiya heyama moernîteyê, li gorî pêdiviya vê feraseta pozîtîvîst, kete nava şerên bêsînor ên welat, milet, dewlet, etnîsîte, bîrdozî û sîsteman. Çimkî (ji ber ku)  tevahiya van têgînan pîroz bûn û di oxira wan de heya dawî şer pêwîst dikir. Weke tê zanîn,  dîrok di encama vê ferasete de veguherî bo gola xwînê. Pozîtîvîzm, ku di xuyanî de êrî ye,  lê di cewher de rûyê wê yê bi xwîn, wisa dilenciya (diranê xwe qîç dikir).

Eger nehatibe têgihîştin, em hinekî din rave bikin. Nêzî dused dewlet-netew di roja me ya îro de li cîhanê hene. Eger hemûyên wan bi sazî û girseya ku me li jor qala wan kir û bi yekûna têkiliyan werin hemberî hevdu, wê bibe tişekî jênerevîn ku pergaleke herî kêm bi dused xweda, bi hezaran perestgeh û bi terîqatên bêsînor, yan jî rewşeke geremolî rû bide. Çimkî tevahiya diyardeyên ku dinimînin pîroz in û hêja ne ku mirov di oxira wan de bimire. Em bala xwe bidinê, li pêşberî me, tew di asta nav de jî nayê kirin qala civaka exlaqî û polîtîk, ku xwezaya rasteqîn a civakê diteyisîne. Lê bi rastî jî eger rastiyek hebe ku,  dema rastî êrîşê were, mirov di oxira wê de bimire, ew jî rastiya civaka exlaqî û polîtîk e. Lê di dewlet-netewê de herkes şer dike bi navê pûtên diyardeyan, ku wan ji xwe re çêdike, her wisa têne çêkirin û ji herkesî re têne pêşkeşkirin. Em bi serdemek wisa re rûbirû ne ku şerên di oxira pûtan de, yên hezar qat zêdetir harbûyî ji şerên berê yên di oxira pûtan de, çêdibin. Encam, pêkhatina zagona kara mezintirîn a yekdestiyên sermaye û dewlet-netewê ye; her wisa pêşkêşkirina ji hindikahiya dilşad re jiyanên ku tew fîrewn jî ew nejiyane. Ya ku jê re tê gotin jiyana nûjen/modern, ne tiştekî din e ji bilî encamên ku pozîtîvîzm vê rastiyê, hîn rasttir van rastiyan kuştiye. Di roja îro de em gihîştine çaxa civaka hêmayî (xeyalî). Ti rastî nikare diyardetiyê bi qasî civaka hêmayî rave bike. Civaka diyardeperest civaka hêmayî ye. Civaka hîmayî rûyê rasteqîn ê civakê ye; ji rû jî wêdetir, rastî bi xwe ye. Bêwatetiya diyardeyan (divê bêwatetî, hîn rasttir di wateya gola xwînê, civaka xeyalî û civaka mezaxê de were têgihîştin), bi civaka hêmayî re digihîje lûtkeyê. Civaka medyatîk, civaka şovê û civaka magazînel tim rastiya feraseta objektîvîst û diyardeperest e, anku rastiya pozîtîvîzmê ye ku derketiye holê. Ev jî, di rastî de, înkara rastiyê -heqîqetê- ye.

Li gorî pêdiviya mijara me, bêyî ku ez pêwîstî bi zêdetir lêkolînê bibînim, ez dikarim encamên dirûv hîn zêdetir rêz bikim. Têgînên civaka Îslam, Xirîstiyan, Mûsawî, Bûdîst, kapîtalîst, sosyalîst, feodal û koledar rastiyên heman nêzîkatiyê ne. Rûyê pozîtîvîzmê yê metafizîk li vê derê jî derdikeve pêşiya me.  Belê, ’civaka îslamî’ û ‘civaka kapîtalîst’ encama heman nêzîketeyê ne. Anku, vana têgînên diyardeyê ne; bi gotineke din, têgînên pêvekirî û dîmenî ne. Mirov dikare heman tişt ji bo xwemaliyên (aîdiyetên)  netewan re jî bêje. Her yek jî têgînên netewa Kurd, Ereb, Tirk, Frensî û Alman di karakterê pozîtîvîst de rastî ne. Lê di cewher de dîmenên jêbirî yên rastiyê ne. Dibe ku mirov bipirse û bêje ‘‘ey rastî/heqîqet çi ye?’’. Li gorî min bersiv basît e. Rastiya civaka exlaqî û polîtîk, ku di rastiya civakê de xwezayî ye,  û rastiya şaristaniyê, ku dixwaze vêya bi berdewamî bimehîne, heye. Ez nabêjim ku rengdêr û navên li derveyî vêya rastiyê qet nanimînin; ez dibêjîm ku, ne cewhera wê, lê xuyaniya wê û forma wê ya basît û tim guherbar, dinimînin.

Ji bo mînak, em rastiya netewa Ereb bigirin dest: erebtî pirr hindik tişt derdibirre, ji bîlî civakek ku taybetmendiyên wê yên exlaqî û polîtîk hene, li wî ciyê ku jê re tê gotin Erebistan, û

rastiya desthilatiyê ku li ser pişta vê civakê bi dirêjiya bi hezaran salan serweriya xwe domandiye û di roja me ya îro de wê aniye ber xala rizînê. Bi hezaran erebên cewaz, binakok û heta yên dijminê canê mirov hene. Anku, rastiya bi hezaran nakokî! Li gorî pozîtîvîzmê, pêwîst e wîsa be. Mînakek ku karibe bêhtir bê têgihîştin, mînaka daran e. Wekî din, bi hezaran guliyên darê û gelek pelên wê, weke diyarde, ku nikarin bêne jmartin, hene. Eger darek wisa be ku berhema wê bê zanîn û bi nirx be, li gorî wê yekê wate werdigire, lê ne li gorî gulî û pelên xwe. Pozîtîvîzm, ew harîtî ye ku heman giraniyê dide hemûyan. Belê, gulî û pel jî rastî ne; lê ne rastiyên watedar in. Nirxa mêwek û ya kîloyekê tirî heye; lê ancax dîmena pelekê wê û rastiyeke wê ya diyardeyî, ku cewhera wê nateyisîne û nêrîneke şêweyî dide mirov, hene.

Sedema serekîn a qeyrana zanistî, ew e ku zanist di nava diyardeyan de difetisin, her wisa her roj dîsîplîneke nû ya zanistî çêdibe û hemû xwe di heman giraniyê de, weke rastî, dihesibînin. Me girêdana wê ya bi sîstemê re di destpêkê de jî destnîşan kir. Perçebûyîna rastiyê bi awayê dubendiyên dijber ên bi şêweya berdewamî û ku herku çûye kûr bûne, bi awayê subje-obje, em- a/ê dîtir, beden-giyan, ol-zanist, mîtolojî-felsefe, xweda-bende, serdest-bindest, hakîm-mehkûm û wekî vana, di cewher de encama çalakiya mehandin û mêtîngehkirinê ye, ku ji alî şebekeyên yekdestî yên şaristanîperest ve, yên sazbûyî li ser civaka exlaqî û politik, hatine pêkanîn. Moderrnîteya kapîtalîst vê dubendiya şaristaniyê bi rengekî bê sînor pirr kiriye, kûr kiriye û civakê aniye xala îroyîn a belavbûn û rizînê. Para mezin a zanista hevxabatkar a sîstemê jî di vê yekê de heye. Dema ku qeyran di navbera cewhera bîrdozî û pêkhateya amûrî de bigihîje xala cankêşanê, dibe rewşa ku mirov wê têderdixe. Wisa dibe ku bi bêkarî, şer, birçîtî û hejarî, bi zordestî û qirkirinê, her wîsa bi newekhevî û bê azadî, xwe ji goşt û giyana pirraniyên raser vediguherîne feryadan (qîjînan).

Dema ez pozîvîtîzmê rexne dikim, pêwîst dibînim hişyarî bikim ji bo mirov nekeve nava hin têgihîştinên şaş. A yekemîn; ez ne di nava nêzîkatiyeke wisa de me weke ku ti nirxeke diyardeyan û girêdana wan bi rastiyê re tinebin; lê, tenê dibêjim ku xeylî sînordar in. Ez diyar dikim ku dema diyardetî were guhastin bo asteke felsefî, wê rê li ber fikareyên mezin veke. Ez dikirpînim ku ev rewş di sîstema raman a Ewrupa de bi zêdeyî derketiye holê. Mijara dûyemîn, ew e ku belkî rexneyek were di derbarê wê yekê de ku ez şemitîbim nava cûreyek Eflatunperestiyê. Dema ez dibêjim cewher destnîşankar e, bi taybetî di mînaka darê de, ev rexne tê payîn. Lê, ya ku ez dixwazim diyar bikim, ne raman û îdeaya “dar”ê ye. Ez dixazim rastiya ku dar di hêla civakê de di xwe de werdigire, diyar bikim. Ez nêzîkatiyeke sûdperestîgir jî pêşkêş nakim. Tenê, dibêjim ku pêwîst e rastiya wê ancax ji alî civaka exlaqî û polîtîk ve were destnîşankirin. Dibe ku ji takekesek yan jî komek re pirr sûdmend be; lê, ez dixwazim bêjim ku eger ji alî civaka exlaqî û polîtîk ve bi heman şêweyê neyê şîrovekirin, nirxa wê ya sûdê ya rasteqîn tine ye.

Ez felsefeya “wê takekes derkevin û weke fîlozof, zanyar, leşker, siyasetmedar, sermayedar û wekî vana, her çi ya rast be, wê bibînin û bijîn”, ku lîberalîzm dixwaze wê bide pesendkirin, misoger wek dere-exlaqî û dere-civakîtiya polîtîk rexne dikim. Ez dixwazim bêjim ku ev, bîrdoziya bêexlaqkirin û bêpolîtîkkirina herî mezin e, hîn rasttir, vegotineke mîtolojîk a hemdem e ku bi propagandayê hatiye pesendkirin û qilfa nûjeniyê lê hatiye kirin, ku dîroka şaristaniyê bûye sedema wê û serdema kapîtalîst jî hewl daye wê bi tevahiya civakê bide daqurtandin.

Wê demê, pirsa ku hîn zêdetir girîngî werdigire, wê ev be: Divê em rastiyê li ku derê û çawa bibînin? Bi rêya bi bîranîna rêsayeke pirr basit, ez dixwazim bersiva xwe bidim: Te tiştekê/î li ku

derê wenda kiribe, ancax tu dikarî wê/î li wê derê bidozî/bibînî. Nexwe, tu tevahiya cîhanê jî lêbikolî, tu nikarî wê/wî li deverên dîtir bibînî. Ji ber ku rêbaza wê şaş e. Rêbaza gerînê ya li ciyekî dîtir, û ne li ciyê ku te wê/wî wenda kiribe, tenê dem û enerjî bi mirov dide wendakirin. Ez lêgerînên li rastiyê yên çaxa me jî, didirûvînim(dişibînim) vê mînakê. Rastiyên ku hatine gihandin, tevî hemû laboratuwar û fonên lêgerînê yên tirsnak, weke min diyar kir, bi qeyran û êşan barkirî ne. Eşkere ye ku rastiya mirovahî li pey wê bibeze, nikare ev be. Bersiva min, wê tim bibe dubareya dubareya min. Rastî, dikare ancax bibe civakî. Herku pêvajoya şaristaniyê civaka exlaqî û polîtîk bimehîne û wê di bin yekdestiya xwe ya metin û desthilatiyê de ragire, tê wateya ku rastiya civakî hatiye wendakirin. Eger tu bixwazî wê dîsa bibînî, tu yê li ciyê ku te ew wenda kiriye, lê bigerî. Anku, tu yê li hemberî şaristanî û modernîteyê, li civaka exlaqî û polîtîk û li rastiya wê bigerî û wê bibînî (bidozî). Her wisa, tu yê qîma xwe bi vê jî nehînî; tu yê heyîna wê, ku hatiye anîn rewşek ku nayê naskirin, ji nû ve ava bikî. Wê demê, tu yê bibînî ku tu tevahiya rastiyên di nirxa zêrîn de, ku bi dirêjiya dîrokê te wan wenda kiriye, yek bi yek dibînî. Tu yê li ser vê bingehê bêhtir dilşad bibî. Û tu yê têbigihîjî ku rêya vê jî di civaka exlaqî û polîtîk re derbas dibe.

Dema em qada rewşenbîriyê ji nû ve rêkûpêk dikin, ez ê hewl bidim di wergiriya erkan de hin pêşniyarên xwe pêş bixim, ku divê ez wan li sêr bingeha rexneyan û di asta rêgezan de pêşkêş bikim:

**1-** Hewldanên rewşenbîrî û xebatên li ser zanîn û zanistê, divê di wergiriya civaka exlaqî û polîtîk de bêne pêşxistin, ku awayê heyîna bingehîn a xwezaya civakî ye. Vê rastiya civakê, ku bi dirêjiya dîroka şaristaniyê hatiye qutkirin û herku çûye hatiye mehandin, tevlî çaxa modern a ku kapîtalîst mora xwe lê daye, bi temamî hatiye perçekirin, terki rizînê hatiye kirin û hatiye anîn ber şêmûqa tunebûnê.

**2-** Wê demê, neçar e ku armanca xebatên rewşenbîrî yên hewldan, zanîn û zanistê, ew bin ku berî her tiştî vê rêveçûnê bidin rawestandin. Ji ber ku nikare zanista tiştekî ku hatibe tunekirin, hebe. Dibe ku bîranîna wê hebe. Lê, bîranîn, ne zanist e. Zanist, bi ya bijî û hebe re pêwendîdar e. Civakek di vê rewşê de, eger nexwaze bi tevahî tune bibe, neçare ku li ber xwe bide li hemberî modernîteya kapîtalîstî (tevlî hemû hêmanên wê ve). Berxwedan êdî di heman lêlatê de ye li gel heyînê û pê re wekhev e. Eger bê xwestin were jiyîn û rawestîn li ser piyan, ne weke sermaye û barkêşiya rewşenbîrî, lê bi anûr/rûmeta lêgerînerê rasteqîn, tiştekî jênerevîn e ku rewşenbîr di hemû hewldanên xwe de hem berxwedanvan be û hem jî hêmanên wê/wî yên lêgerînê, bi rehenda berxwedanê bin. Hem rewşenbîriya wê/wî û hem jî znista wê/wî di vê wateyê de berxwedanvan e. Eger bi cûreyek dîtir be, yan wê bibe xwe xapandinek, yan jî wê bibe veşartina nasnameya xwe ya sermayeyî yan jî barkêşiyê.

**3-** Neçar e ku zanista were pêşxistin, berî her tiştî weke “zanista civakî” were rêkûpêkkirin. Divê zanista civakî, weka banû (qralçe)ya dayîk a tevahiya zanistan, were pejirandin. Ne zanistên din ên di derbarê Xwezaya Yekemîn de (fizîk, astronomî, kimya û biyolojî) û ne jî zanîn û zanistên din ên beşerî (wêje, felsefe, huner, aborî û wekî vana), qet nikarin pêşengî bikin û girêdana watedar bi rastiyê re çêbikin. Ev herdu qad, tenê dema girêdana xwe bi zanista civakî re bi rengekî serkefti çêbikin, wê demê dikarin para xwe ji rastiyê bigirin.

**4-** Divê ya gingehîn ew be ku zanista civakî, weke mijara xwe ya serekîn, civaka exlaqî û polîtîk, ne weke heybereke objektîv û her wîsa ne weke dubendiyên mîna kirde(subje)- heyber(obje), em-ê dîtir, beden-giyan, xweda-bende û mirî-zindî, ku di têgîhana mirov de hatine kûrkirin û kendal hatine danîn navbera wan; lê, bi rêbazek ku van dubendiyan derbas bike lêbikole. Cewazbûn, şêwazeke jiyana gerdûnê ye û wesfandinek e ku derbasdariya wê di xwezaya civakê de jî, bêhtir bi awayê nerme, azad û kûrbûyî, heye. Lê belê veguhastina vê cewazbûnê bo asta kirde (subje)-heyber(obje), ku hatine kirin hîmê tevahiya pêkhatiya bîrdozî ya şaristanî û modernîteyê, misoger wê bê wateya wendabûyîn û perçebûyîna rastiya hem gerdûnî û hem jî ya civakî.

**5-** Pozîtîvîzm, ku di modernîteya Ewrûpa de gihîşt lûtkeya xwe; her wisa, ku felsefeya giştî ya vê objektîvîzmê ye, ku zanist bi giştî û zanista civakî bi taybetî li ser wê hilhatin, û ku hîn jî bi hemû dijwariya xwe didome, eger li ser bingeha rexneyên berfireh neyê avêtin çopa dîrokê, nikare paradîgmayeke watedar a zanista civakî (felsefeya zanistê ya bikok a dij-şaristanî) were pêşxistin. Her çiqas zanista binavenda Ewrûpa, bi taybetî zanista wê ya civakî, pirr perçe bûbe û xeteriya ku rastiyê wenda bike hebe jî, şert e ku destketiyên wê yên erênî û parên wê yên rastiyê bêne girtin û hezmkirin. Çiqas pêwîst be ku pozîtîvîzm were rexnekirin û derbaskirin, ewqas jî pêwîst e ku hezmkirina parên wê yên rastiyê ku derketine holê bêne pesendkirin. Dij-Ewrûpagiriya tevdeyî, herî kêm bi qasî Ewrûpagiriya tevdeyî dikare di lêgerînên li rastiyê de rê li ber encamên neyînî veke.

**6-** Herçend van lêkolînên li ser rastiyê, ku ji wan re tê gotin “potmodernîzm”, pozîtîvîzmê rexne dikin û zanista civakî ya bi navenda Ewrûpa red dikin jî, dibe ku bi hêsanî bêne lîberalîzekirin û weke dij- Ewrûpagiriyek, ku bêhtir dij-rastîparêz e, şêwe bigirin. Her çiqas mirov bi tevdeyî wan red neke jî, girîng e ku mirov ta radeya dawî rexnegir nêzî van lêkolînên postmodern bibe, ku ji awayê biqeyran ê zanista civakî sûd werdigirin. Rêbaz û perspektîva gerdûnewer, pêşveçûner û xêzikî ya pozîtîvîzma modernîst çiqas paşevajker be, rêbaza çerxî ya dîmenewer (îzafî) a pirole ya gelek postmodernîstan jî ji paşevajbûnên dirûv re vekirî ye. Ji bo mirov li van seriyan berba nebe, şert e ku rêgezên bingehîn (ên em niha hewl didin wan rêz bikin), ên ku pêwîst e mirov girêdayî wan bimîne, baş bêne hezmkirin. Dorhêla biqeyran guncav e ku hema hema herkes li gorî xwe li rêyeke rastiyê bigere û tew ev mijar bi şerê xwe lêgerînên li rastiyê ji gelek aliyan ve paşevaj bike û wan vala derxîne.

**7-** Rêbaza me ya serekîn a di lêgerîna li rastiyê de nikare ne objektîvîzma pozîtîvîst be û ne jî subjektîvîzma dîmanewer be. Herdu jî di cewher de du rûyên lîberalîzmê ne û enflasyona rêbazê ne, ku di hilberrandina sermaye û barkêşiya rewşenbîrî de wan bikar tine, bi rêya têkelkirina wan nava hevdu bi zêdeyî, wan pêşkêşî piyaseyê dike. Aliyê herî bandorker ê negengazkirina rastiyê, vê eflasyona rêbazê ye. Ev jî tê wateya pirrbûna rêbazan bi qasî hema hema hejmara kesan, bi têkelkirina nava hevdu rêbazan, weke çalakiya xistina rastiyê ji nirxa wê, mîna pereyê hûr. Bê gûman aliyên objektîv û subjektîv ên rastiyê hene. Zanatî û rastî di tehlîla dawî de tê wateya li hev rasthatina dumendiya çavdêrbûyî-çavdêr (mebesta min ne hemanbûna wan e; dibe ku erênî be ku bêhtir weke wekheviya wan were tegihîn). Çiqas kûrbûn û lêhûrbûn di vê mijarê de were jiyîn, wê ew qas bêhtir parên rastiyê derkevin holê. Di vê rewşê de di şûngeha, ne kirde/subjeya çavdêr de ye û ne jî di ya heyber/objeya çavdêrbûyî de ye. Dema herdu bêhtir nêzî hev bibin, tevî ku mirov nikaribe

bêje ku dibin heman, lê tê wateya ku şûngeha wekhevbûnê bi dest dixin. Pêvajoya ku têde rastî zêdetirîn bibe, bidestxistina derfeta wekhevbuna bi vî rengi ye. Divê ez mijara rêbazê wisa pênase bikim, bêyî ku pêwîst bibînim ku ji bo niha navekî lê deynim. Bê gûman, em di ti dem û cî de paşçav nakin ku yekeya serekîn a çavdêr û çavdêrbûyî civaka exlaqî û polîtîk e.

**8-** Nabe ku ciyên bingehîn ên lêkolînê saziyên fermî, di serî de zanîngeh, ên şaristanî û modernîteyê bin. Desthilatkirina zanistê û hilberandina wê di saziyên fermî yên dewletê de, hem di paşerojê de û hem jî diroja me ya îro de, tê wateya wendabûyîna girêdana wê bi rastiyê re. Qutkirina girêdana zanistê bi civaka exlaqî û polîtîk re û derxistina wê ji bûyîna kêrhatî bo civakê, tê wateya ku berevajî alîkarî dike ku yekdestiyên zordestî û mêtinê li ser civakê bêne pêşxistin. Çawa ku jina li xaniyên taybet yan jî giştî were ragirtin, çiqas rastiya xwe ya azad û heqîqeta xwe wenda bike, zanist û rewşenbîrên ku li saziyên fermî jî bêne ragirtin, ewqas azadiya xwe û nasnameya xwe ya rastîn wenda dikin. Bê gûman ev nayê wetaya ku di van saziyan de qet rewşenbîr nayên gihandin û zanist nayê hilberandin. A pêwîst e bê têgihîştin ew e ku zanist û rewşenbîrên ku bibin desthilat, wê ji armanca xwe ya vedîtin û lêkolîna li ser rastiya civakî qut bibin. Weke îstîsnayî, bûyîna rewşenbîr û çêkirina berhemên ku nirxa wan a zanistî hebin, rastiya serekîn naguherînin.

**9-** Ji bo zanista civakî şoreşa saziyane, bi gotineke din ji nû ve avabûn, şert e. Çawa ku di ronakbîriya Îonyaya Grekî de akademiyên serbixwe yên felsefe û zanistê çêbûn; her wisa, di çaxa navîn de tekya, dergah û manastir di kevneşopên hem Îslamî û hem Xirîstiyanî de roleke dirûv leyîstin û rastiyek e ku her yek ji tevgerên Ronesans, Reform û Ronakbîrî yên Ewrûpa di heman demê de şoreşa rewşenbîrî û zanistê bûn, di roja me ya îro de jî ji bo derketina ji qeyrana heyî, pêdivî bi şoreşên dirûv heye. Serweriya bîrdozî ya çarsed salî ya modernîteyê, ne di wê şiyanê de ye ku qeyrana xwe ya kûr, bi qasî herî kêm serweriya wê ya çanda daringî û ku dibe berdewamî, derbas bike. Eger destêwerdana modernîteya demokratîk weke naverok û şêwe çênebe, tiştekî jênerevîn e ku qeyran roleke zêdetir rizîner û belavker bilîze. Mîraseke zengîn a rewşenbîrî û zanistî ya pêngaveke bi vî rengi heye, ji sosyalîstên utopîk heya sosyalîstên zanistî, ji anarşîstan heya Dibistana Frankfûrtê; ji pengava felsefî ya Frensî ya di nîv-duyemîn sedsala 20. de heya şoreşa çandî ya ciwantî û herî dawî, heya pêngavên postmodernîst, femînîst û ekolojîk ên pişti salên 1990an. Divê modernîteya demokratîk şoreşa xwe ya rewşenbîrî û zanistî çêbike, li ser bingeha hezmkirina hem birq û şoreşên rewşenbîrî yên heyama şaristaniyê û hem taybetmendiyên erênî yen pêngavên rewşenbîrî yên dijberî modêrnîteyê.

Sazîbûn yek ji mercên vê şoreşê ye. Ji bo serkeftina şoreşa rewşenbîrî di asta kûrewî de pêdivî bi navendeke nû ya sazî ya cîhanê heye, li ser bingeha waneyên ku bêne derxistin ji ezmûnên ku di dîrokê de navên wan derbas dibin. Ji bo dabînkirina vê pêdiviyê, dikare Konfederasyona Cîhanî ya Çand û Akademiyan were avakirin. Ev konfederasyon, ku li erdnîgariyeke azad were awakirin, çawa ku divê ne girêdayî ti hêza dewlet-netew û desthilatiyê be, her wisa divê li ser bingeha dijberiya yekdestiyên sermayeyê çêbibe. Serxwebûna wê û xweseriya wê esas e. Dikare tevlîbûn çêbibin ji her çandên navçeyî û akademiyên herêmî, li ser bingeha dilxwaziyê, guncav li gel rêgezên bernameyî, rexistinî û çalakî. Konfederasyon dikare di astên navçeyî, heremî, netewî û parzemînî de sazîbûnên erkdar ava bike.

**10-** Dibe ku siyaseta demokratîk û akademiyên çandî ji bo vê erkê bibin sazîbûnên guncav. Van akademiyan dikarin desteka rewşenbîrî û zanistî ya pêwîst bidin ji bo pediviyên ji nû ve avabûna yekîneyên civaka exlaqî û polîtîk. Di şûna ku saziyên yekdestiya fermî û teybet ji xwe re mînak bigirin, a guncavtir ew e ku xwe weke pêngavên resen/orîjînal ava bikin. Bi zarî/teqlîdkirina saziyên modernîteyê, dibe ku bidawîbûna wan a neserkeftî bi xwe re bîne. Dikare ji bo destpêkê were pêşdîtin ku xweser û demokratîk bin; ew bi xwe bername û kadroyên xwe çêbikin; xwendekarî û mamostetiya dilxwaz esas bigirin; karibe tim xwendekar têkevin şûngeha mamosteyan û mamoste jî têkevin şûngeha xwendekaran; her wisa her kesên ku îdea û armanca wan hebin, ji şivanên serê çiyan heya profesoran, karibin tevlî bibin. Dibe ku guncav be ku akademiyên di giraniya jinan de, di gel bi heman naverokê, lê her wisa ji bo aliyên xwe yên xweser bikin zanistî, çêbibin. Yek ji wesfên ku lê tê gerin ji bo tenê teorik nemînin, ew e ku bi rengekî piralî tevlî pratîkê bibin. Akademî di hêla cî û dem de bi rêya li ber çavgirtina pêdiviyên pratîk, têne damezrandin û xebitandin. Saziyên xwerû (sade) û dilxwaz in, çawa ku mirov di dîrokê de pirrî caran rastî wan tê (Agirgehên Zerdeşt li serê çiyan; bexçeyên Eflatûn û Arîsto; peyarêyên papûran ên Sokrates û Stoagiran; her wisa manastir û tekyayên çaxa navîn û wekî vana). Mirov dikare cî û deveran ji serê çiyan heya kuncikên taxan bibijêre. Bê gûman divê neyê gerîn li avahiyên ku delîlên desthilatiyan in. Demajoya perwerdeyan, mîna ya manastir û medreseyên sivil, dikare li gorî rewşa beşdarvanan û pirrbûna herikîna xwendekaran were destnîşankirin. Mercên sext en demê, weke saziyên fermî, ne pêwîst in. Lê nikare were hizirîn ku bi tevahî bêpar bin ji şêwe û rêsayan.

Tevkariya rewşenbîrî û zanistî di xebatên ji nû ve avabûna yekîneyên modernîteya demokratîk de şert e. Eşkere ye ku ev şert/merc nikare bi sermayeya rewşenbîrî ve, ya di piyaseyê de, were dabînkirin. Tenê kadro û zanista bi çavkaniya akademiyên nû, dikarin vê pêdiviyê dabîn bikin. Van rêgezên çareseriyê û vê nirxandina kurt, ku min hewl da ez wan di wergiriya erken rewşenbîrî de pêş bixim, bê gûman di wesfa pêşniyran de ne û gotûbêj li ser wan pêwîst dikin. Mercên qeyranê, dikarin ancax bi pêngavên nû yên rewşenbîrî û zanistî bi rengekî erênî benê derbaskirin. Dema mirov bide ber çavan ku qeyrana mijara gotinê kûrewî, sîstêmatîk û pekhateyî ye, eşkere ye ku ji bo derketina ji qeyranê jî, destêwerdanên kûrewî, sîstematîk û pêkhateyî pêwîst dikin. Mirov dikare ji waneyên ezmûnên bêhêjmar ên şoreşger ku hatine jiyîn fêr bibe ku bi zarîkirin yan jî eklektîkkirina qalib, sazî û zanistên berê, mirov nikare xwe bigihîne ti deveran.

Yek ji waneyên sereke ku pêwîst e mirov ji paşeroje fêr bibe, ew e ku modernîteya demokratîk, bi şoreşeke bikok a ronakbîrî re din ava hev de, xwe ava bike. Bi vê re, divê ez yekser bikirpînim ku paşeroj niha ye. Her çend em qala tevahiya paşeroja civaka exlaqî û polîtîk nekin jî, ku şêweya bingehîn a xwezaya civakî ye (lê, divê em paşçav nekin ku bi taybetî civaka neolîtîk, civaka çandinî û gund, koçerî, qebîle û eşîr û civakên olî jiyanîbûna xwe hîn jî birik didomînin), wê hilberandina rewşenbîr û zanista di wesfa şoreşane de heybera ku herî zêde pêdivî pê heye pêk bine, ji bo ji nû ve bidestxistina nirxên xwe yên ku ji alî yekdestiyên desthilatî û daneheva sermaye yên pênc hezar salên dawî ve hatine wendakirin. Hewldanên me yên lêhûrbûn, tehlîlkirin û çareserkirinê, yên li ser erkên me yên rewşenbîrî

yên ji bo vê pêdiviya di wesfa ‘‘nebe nabe’’ de, ji her demê behtir girîngiya jiyanî di xwe de werdigirin.

**B- Erkên Exlaqî**

Exlaq, tevî ku li ser wî pirr tê axaftin, di seriyê saziyên civakî de tê , ku nekariye tehlîla wî were kirin. Tevî hemû hewldanên teorîkkirinê yên di bin navê ‘etîk’ de, pêşketinên di pratîkê de hatine bidestxistin, pirr zêde hêviya mirov dişkînin. Tespîteke hevbeş e ku ji alî zanistê ve çavdêriya wê tê kirin ku heyîna civakî her diçe ji exlaq bêpar dimîne. Lê sedem û encaamên vê yekê têr baş nehatine ravekirin. Wesfa şûngeh û saziyek, ku her diçe ji ber çavan tê xistin, lê hatiye kirmişandin. Lê exlaq weke mijar û sazî, ji ya tê rawej/texmînkirin jî wêdetir pirr girînge. Mirov dikare bihizire ku hem qeyranên bi dirêjiya dîrokê hatine jiyîn û hem qeyrana kûrewî ya roja me ya îro di rêjeya mezin de weke encama bêpariya ji exlaq çêbûne. Di dîrokê de dema wijdana civakî rave dike ku sedema sergirtina Sodom (bajarekî nêzî Gola Lûtê di çaxa yekemîn de) û Pompeî bi lav(agir)ên ku ji çiyayê agirîn (volkan) pijiqîne, ketîbûna exlaqî ye, weke ku agahî di derbarê rastiyekê de bide! Ketîbûna exlaqî civakan dirûxîne. Ew tişta ku jê re tê gotin “naleta xwedayan”, di cewher de şêweya teyisîna bo ezmanan çalakiya wijdana (exlaqa) civakî ya cezakirina bêexlaqiyê ye. Eger em xweda weke pênaseya hêrî bilind û pîroz a nasnameya civakî şîrove bikin, naletkirin jî dibe çalakiya cezakirina xweser a civakê.

Hêsan e ku mirov exlaq weke têgînî pênase bike. Dema mirov zanibe bijî li gorî tore (gerdîş), xûy û rêsayên civakî, dibe ku vê yekê bibe pênaseya exlaq. Lê vê ravekirinê xeylî şêweyî (şeklî) dimîne. Tehlîlên ku fîlozofên çaxa kevn û çaxa nû (di serî de Eflatûn, Arîsto û Kant) di bin navê “etîk” de kirine, bêhtir ji derbase bo teoriya dewletê wêdetir, ti tevkarî pêşkêş nekirine. Hîn rasttir, weke pêş-amadekariyên qutkirina takekes ji endamtiya civakê û kirina wê ya endamtiya dewletê ne. Eşkere ye ku nêzîkatiyeke wisa pêşkêş dikin weke ku erka exlaq ew be ka wê takekes çawa bike ya/yê herî kêrhatî ji bo dewleta wê/wî. Bi kurtasî, şîroveyên wan ên li ser exlaq alîgirên şaristaniyê ne.

Serlêdana li dîrokê, weke di hemû mijarên civakî de, di derbarê exlaq de jî wê zêdetir fêrkar be. Em dizanin ku di serdemeke dirêj a weke ji sedî 98ê çaxên civakî de, rêsayên exlaqî û ne yên huqûqî, derbasdar bûne. Ji ber vê sedemê jî em dibêjin civaka exlaqî. Lewre eger pirr baş neyê zanîn ka exlaqê vê serdema dirêj tê çi wateyê, wê şînoveya li ser exlaq kêm bimîne. Eger em xwezaya civakî weke xwezaya herî barkirî bi zekaya nerme pênase bikin, dibe ku vêya mijarê ronî bike. Mebest ji zekaya nerme ew e ku mirov bêhtir bi ramîn/hizirînê kar bike. Têkiliya di navbera ramîn û kar de wê bi rengekî neçarî rêsayê bigire nava xwe. Ji ber ku pêwîstiya çawaniya kirina kar, ji xwe tê wateya rêsa. Em dikarin vê yekemîn çalakiya di derbarê kar de weke yekemîn rêsaya exlaq jî destnîşan biknin. Û dema em dibêjin ‘kar’, em qala her cûre xebat û çalakiya civakî dikim. Her çalakî kar e, ji xwarinê heya razanê, ji meşê heya xwarina zad, heya bûyîna dost bi lawiran re yan jî pevçûna bi wan re, û ji bûyîna pêwendîdar bi nebatan re heya nêçîrkirina masiyan. Û ev kar, eger rêsa nebin, nikare werin biserxistin. Bisernexistin jî tê wateya mirina civakê.

Di vê xalê de têgînên dabeşkirina civakê weke bingeha aborî û seresaziya exlaqî, bêbingeh in. Mirov dikare exlaq weke rêya herî baş a bidestxistina aboriyê, hîn rasttir, weke

rêya her baş a bidestxistina pêdiviyên bingehîn ên jiyanê, pênase bike. Exlaq, weke tore û şêwaz, awayê bidestxisina aborî, yan jî, ya pêdiviyên bingehîn e. Lewre veqetînên binesazî-seresazî dûr in ji bûyîna tegînên ravekar. Exlaq tê wateya pêkanîna bi şêwaza baş a hemû çalakbaziyên civakî, di serî de ya hewldanên ji bo aboriyê, lewre her tiştê ku civakî be, exlaqî ye jî. Her wisa, her tiştê ku exlaqî be, civakî yê jî. Ji bo mînak, çawa ku aborî exlaqî ye, ol jî exlaqî ye, û siyaset weke demokrasiya rasterast, exlaq bi xwe ye.

We demê, yekemîn rêsa, anku exlaqê kar, ji bo civakê hîn ji destpêkan ve, mijareke jiyanî ye. Kar, çawa bi awayê herî baş were kirin, ew çawanî, weke rêsaya herî baş a exlaq, li mejiyan bicî dibe. Vê yekê bi demê re bêhtir bihêz dibe û, weke kevneşopeke saxlem, dibe malê bireweri ya civakê. Tê wateya ku exlaq êdî çêbûye. Ev e, ew bûyera ku jê re tê gotin tore û kevneşop. Li vê derê mijara herî hêrî girîng ku pêwîst e were tehlîlkirin ew e ku, exlaq çawa ku çalakiyeke mejî ye, ewqas jî pêwendîdar e bi karê civakî re. Hem hewldana mejî û hem çalakbaziya civakê pêwîst dike. Ez weke kes dibijêrim (tercîh dikim) ku ji vê rewşê re bêjim yekemîn awayê resen ê demokrasiyê. Di vê rewşê de demokrasiya resen û exlaq wekhevî werdigirin. Li gorî ku civak zêdetir li pey karûbarên jiyanî hingî dibeze, tiştekî jênerevîn e ku li ser kar pirr bihizire û gotûbejan bike. Têra xwe bi vê jî nahîne; pêdiviya jêneger a jiyanê ye ku pirr raweste li ser ka wê kar çawa bi awayê herî baş were biserxistin, anku rêvebirin. Eşkere ye ku di herdu rewşan de jî, anku hem hizirîn û kirina gotûbêjan û dayîna biryaran, hem jî rêvebirina biryaran û veguherandina wan bo serkeftina kar, şêweya herî neyekser a demokrasiyê ye (ew tişta ku jê re tê gotin demokrasiya beşdarvan, anku rasterast) û ev di heman demê de tê wateya rêvebirina exlaqî ya civakê û jiyana wê ya exlaqî. Wate ku çavkaniya exlaq û demokrasî heman e. Ew jî şiyana mejiyê kolektîv û kirina kar a pratîka civakî ye. Ev tê wateya ku ne tenê beşa ji sedî 98ê jiyana civakî bi exlaq û demokrasiya resen derbas bûye; lê di heman demê de di yekeyên civakî de jî, ku heya roja me ya îro pirr hatine perçekirin û bi tena serê xwe hatine hêştin, ya ku bi pirraniya raser tê sepandin, ne huquq e, lê exlaq e. Pêwîst e mirov pirr baş zanibe ku eger exlaq nebe, wê jiyan nikaribe bimeşe, tevî ku exlaq pirr xira bûbe jî, lê tê sepandin ji malbatê heya etnîsîteyê, heta heya kirina karê di gelek qadên saziyane de, yên ku têde huqûq heya hûrgilî (detay)yên herî zirav tê rêkûpêkkirin. Huqûq rûberek e. Ez pê ewle me ku ya hêza karê bingehîn dimeşîne hîn jî exlaq e.

Dema em li pêvajoya şaristaniyê binerîn, yekemîn tespîta ku di hêla vê mijarê de bê kirin, ew e ku hewl hatiye dayin ku asayên dewletê li hemberî exlaq bi berdewamî bêne derbasdarkirin. Rêkûpêkkirina rêsayên huqûqê di yekemîn stel [çikilandinên nivîskî yên ji tehtan]ên Hamûrabî yên di civaka Sumer de vê rewşê gelek baş vedibêje. Belkî wê bê gotin ku exlaq têrê nekiriye, loma huqûq derbasdar bûye; lê, nêzîkatiyeke wisa şaş e. Pirsgirêk ne nebesiya exlaqe, lê, mehandina civaka exlaqî ye. Me pirr caran destnîşan kir bê ka exlaq çawa hatiye mehandin. Destpê bûye ku yekdestiyên qatbiqat ên sermaye û desthilatî li ser civakê bêne damezrandin. Nirxên civakî, ku tênê hilberandin, têne xespkirin. Di vê rewşê de em nikarin qala nebesiya exlaq bikin, lê em dekarin qala wê yekê bikin ku civak hatiye girtin bin zordestiyê; her wisa bin zordarî û mêtinê, ku têde rêsayên huqûqê tenê sepandin, ku ji wan re tê gotin “rêsayên rêveberî yên dewletê”. Lewre qada exlaq û, pê ve girêdayî, qada rêveberî û huqûqa dewletê fireh dibe. Ya ku aliyekî wenda dike, aliyê din qezenc dike. Hîn rasttir, bi zora dewletê, bi exlaq tê wendakirin. Ev rewş bi rêya tengkirina qada wî [exlaq] û

dijwarkirina sepandina wî tê pekanîn. Wê tengkirina qada exlaq (ya demokrasiya rasterast jî) di hemû civakên medenî yên pişt re de were dewamkirin û para huqûqê bi berdewamî were zêdekirin. Ji xwe şaristaniya Roma, ku wek cureyek kurtasî û dawiya şaristaniyên çaxa yekemîn e, rêveberiya dewletek wisa bû ku huqûqa hêrî zêde sepand; ev jî vê rastiyê piştrast dike. Huqûqa Roma hîn jî yek ji kevirên bingehîn ên huqûqê ye. Civak di şaristaniya Ewrûpa de, bi gotineke din di modernîzmê de, wê hema hema rastî tarûmariya huqûqê were. Wek cûreyek mêtingeriya huqûqê mijara gotinê ye. Dema ku qada exlaq li kuncikên herî tenha tê tengezarkirin, wê huqûq li hemû koşeyên sereke were kirin mêvan.

Ev rastî çi diteyisîne? Nîşan dide ku yekdestiya sermaye û giraniya desthilatiyê li ser civakê zêde bûne. Dema em li modernîteya çarsed salên dawî binêrin, a ku pêk hatiye, mezintîrîn daneheva sermaye û pirrbûna desthilatiyê ye. Hîn rasttir, daneheva lodane ya herduyan di nava hev de ye. Û mijara ku di hêla exlaq de were diyarkirin ew e ku, ne ku bêerk maye, lê ji destê civakê hatiye girtin. Civaka ku têde exlaq were sepandin, hatiye qutkirin û girtin. Lewre, vegotina bi awayê ku ji ber sedema ku civak, a rengekî girîft (tevlihev) werdigire, êdî nema dikare bi exlaq were rêvebirin, loma pêdivî bi huquqê çêdibe, ku pirrî caran tê gotin, dereweke mezin e û, bi qasî wê, darazeke bêexlaqî ye. Misoger, ne mijara gotinê ye ku exlaq têre neke, neserkeftî be û, ji ber girîftiya civakê, nikaribe erka xwe pêk bîne. Li vê derê jî rêsayeke basît a serweriya bîrdozî ya lîberal tê xebitandin: Rêsaya hincirandina têrbaş hevrika/ê xwe bi propagandayê, ji bo têkbirina wê/wî. Rola serweriya bîrdozî ya lîberalîzmê di çêbûna nêzîkatiya hemdem a di derbarê exlaq de pirr eşkere ye. Ma kî nizane ku huqûq, ku li şûna exlaq hatiye danîn, bi rastî jî, bi rêsayên ku herî zêde nikarin rêve bibin û bi yên derveyî exlaq û wijdan barkirî ne! Tewş nehatiye gotin, wê bêjeya “yên ku têne serê kesên ku yekemîn car dikevin dadgehan, nayên serê mirîşka pijandî!” Çiqas pirr rêsayên huqûqê li ciyekî yan jî li derekê hebin, tê wateya ku li wê derê ewqas yekdestiyeke bandorker a zordestî û mêtinê heye. Rastiyên civakî, di her saziya ku di roja me ya îro de gav lê bêne avêtin, vê mijarê piştrast dikin.

Pirsekek girîng jî, ku pêwîst e di derbarê vê mijarê de were pirsîn, ev e: gelo kîjan ji vana baştir rêve dibe: exlaq, an huqûq? Herçend vegotina me di naveroka xwe de bersiva pirsê dide jî, tew bûyîna huqûqê rêveberiyeke bizorê, vê rastiyê pirr baş rave dike. Weke tê zanîn, pênaseya huqûqê tê kirin bi şêweya “meşandina zagonan bi zora dewletê”. Li di exlaq de meşandina bi zorê tine ye. Ji xwe mirov nikare bêje rêsaya exlaq, ji rêsayek re ku jidil neyê pesendkirin. Eşkere ye ku di berawirkirina rêveberiya huqûqa spartî bi zorê û rêveberiya exlaqî de, wê ya ‘baş’ di giraniyê de be, anku wê kefe, misoger li aliyê kefeya exlaq be.

Têkiliya exlaq û ol, pirsgirêkek girîng e ku pêwîst e were tehlîlkirin. Çawa ku gengaz e ku mirov di navbera exlaq û demokrasiya rasterast de wekheviyekê deyne (ji bo civakên derveyî û dijberî şaristaniyê), her wisa mirov dikare wekheviyeke dirûv, di navbera ol û exlaq de jî deyne. Di mercên ku ol henûz mora şaristaniyê nexwaribû de exlaq, ol, û demokrasiya rasterast di nava hev de têne jiyîn. Exlaq saziyek e ku li gorî olê, bêhtir pêşikî çêbûye [exlaq beriya olê çêbûye]. Ol, wer tê têgihîştin ku, pêwendîdar e bêhtir bi rehendên exlaq ên tabû, pîrozî, sêhrkarî, kişandina zorî di dayîna wate de û hest û ramanên nekarîna kontrolkirina hêzên xwezayê. Têgihîna civakê ya nasîn û pejirandina xwezaya li derveyî xwezaya xwe jî, hestên hem tirsê û hem dilşewatiyê bi xwe re dertîne. Ramana xwe dûrdayîna ji neyîniyên xwezayê û hêzên wê, ku pêderdixe ku jiyana wê pirr

girêdayî wan e, û sûdwergirtina ji erêniyên wê, weke çavkaniya sazî û kevneşopa ola seretayî û resen (orîjînal) dixuye.

Bênîqaş e ku ol saziyek berî şaristaniyê ye. Mijarên exlaq ên bêhtir qedexeker û ku pêwîst e mirov xwe ji wan dûr bide; her wisa hêmanên wî yên dilşewatî û bexşendetiyê digire wergiriya xwe. Lê bi demê re dibe kevneşopekê pirr zêdetir sext. Di vê wateyê de rêkûpêkkariya rêsa û fermana sext û pîroz a exlaq olê pêk tîne. Ol, tevî ku ji nava exlaq zaye û di destpêkê de perçeyeke wî pêk tîne, bi guherana mercên dem û cî re xurt dibe, her wisa sazî û rêsayên xwe dike zagonên pirr zêdetir sext û ku şert e li wan were guncîn (pergala tîpîk a Mûsa ya Deh Fermanan) û bi vî rengî serxwebûn û serekîniya xwe radigihîne. Mirov  dikare berawir bike bi wê yekê re ku huqûq jî derketineke dirûv e. Rêsayên huqûqê, ku berê beşek ji rêsayên exlaqî bûn, bi dewletbûnê re veguherîn zagonên ku bi zorê têne bicîanîn û bi vî rengî huqûqa ku em dizanin pêk anîn. Ol, tevlî pêşketina pêvajoya şaristaniyê, cewazbûneke din jiya; wate ku hate kirin ku têne veguherandin bo berjewendiyên hêzên mêtin û desthilatiyê. Berjewendiyên yekdestiya ku huqûq wan bi destê dewletê dide meşandin, ola bi şaristaniya nû, hewl da ku wan bi destê xweda bide meşandin.

Herdu veguheran jî girîng in. Du kêliyên şkestinê yên herî girîng ên dîrokê dinimînin. Rêsaya bingehîn a serweriya bîrdozî ye ku otorîteya desthilatî û qraltî ku hil tê, xwe bi têgînên xwedayî diwesfine û xurt dike. Mirov herku têgîna ‘xweda’ vede, wê her carê di bin de hêza xebitandina wek koleyan, her wisa talan û zordariya yekdestiyên zordestî û mêtinê û yên emrazên dewlet û deshilatiyê derkevin holê. Lê, mijareke pirr girîng e mirov tespît bike ku hêmanên demokratîk ên olê, anku beşa wê ya bi rehenda civakî, ku wekhev in li gel exlaq, herku çûye veguherîne bo yekeyên xweza û civakî. Bi vî awayî, mirov dikarê watedar bike ku ol bi dirêjiya dîroka şaristaniyê weke çand, kevneşop û nasnameya bi du karakterî pêş ketiye. Ol û xweda, weke nasnameya hêzên şaristaniyê, çiqas barkirî bin bi tegînên tirs, ceza, avêtina dojehê, birçîhêştin, tunekirin, nedilşewatî, şer, zordarî, serwerî, xwedî, perestiş (Divê neyê jibîrkirin ku van têgînan herî zêde hêz û kesayetiyên şaristaniyê diwesfînin); nasnameya ol û xweda ya hêzên exlaqî û polîtîk barkirî ye bi têgînên wêrekî, efû, bexşendetî, hêvî, nêhêştina bêrizq, hebûnkirin, dilşewatî, heskirin, aştî, di cewher de helîn, xwe gihandin û wekî vana.

Wê demê, ta radeya dawî fêrkar e ku mirov olê bi dirêjiya dîroka şaristaniyê, di nava van herdu nasnameyên wê de pênase bike. Olên Îbrahîmî di wê taybetmendiyê de ne ku, bi rengêkî tîpîk, van herdu meylan jî di xwe de werdigirin. Nûnerên wan ên olî yên asta jorîn (keşîş, haham, şêxulîslam, Ayetullah û wekî vana) çiqas meyla şaristaniyê diteyisînin, ehlê umet ê asta jêrîn jî meyla şaristaniya demokratîk diteyisîne. Meyl, li gorî cî û deman, dibe ku bibin denk û serekîn. Olên Îbrahîmî, bi vê şûngeha xwe ve, demokratên sosyal ên modernîteyê tînin bîra mirov. Çawa ku demokratên sosyal di heyama modernîteyê de lihevhatina burjuwazî û çîna karker (elbet di bin serweriya yekdestiyên sermaye û desthilatî de) dinimînin. Olên Îbrahîmî jî, bi dirêjiya dîroka şaristaniyê, lihevhatina hêzên sermaye û desthilatî yên şaristaniyê û hêzên şaristaniya demokratîk (dîsa serweriya hêzên desthilatî di giraniyê de ye) dinimînin.

Em di dîrokê de Zerdeştîzmê û Zerdeşt dibînin, ku di têkiliya ol û exlaq de doktrîn û kesayeteke biheybet e. Lêkolîn Zerdeşt û doktrîna ku ew girêdayî wî ye, weke şoreşeke mezin a exlaqî pênase dikin. Her çend, girêdayî bi navê Zerdeşt, were gotin Zerdeştîzm ji vê şoreşa exlaqî re, ku pêşket weke meylek ku, bêhtir ji pîroziyê, exlaqê sekular-dunyewî diparêze li hemberî serweriya

mîtolojîk û olî ya şaristaniya Sumer (3000 B.Z. û vir ve), di dorhêlek çandî ya civakî de ku debara xwe li qûntarên çiyayên Zagrosê bi çandinî û ajelvaniyê dikin (çanda ku şêwegirt ji şoreşa neolîtîkê 12.000 B.Z. û vir ve heta ji salên 20.000 B.Z. û vir ve, ku dîroka helîna qeşaya serdema çaremîn e), tê zanîn ku xwedî kokên pirr kevntir e. Eşkere ye ku Zerdeşt, bi xîtaba xwe ya "ka bêje, tu kî yî?", ku gotina wî ya navdar e, xwedayîtiya mîtolojîk û olî ya şaristaniya Sumer darizandiye. Lewre, vê yekêmîn rexneya li ser ol û xwedayên şaristaniyê, xwedî girîngeyeke pirr mezin e. Tiştekî tewş nîne ku filozof F. Nietzche navê 'Wisa Got Zerdeşt' li wê berhema xwe ya navdar danî û naveroka wê bi darazên exlaqî yên Zerdeştwarî dagirt. Ew bi xwe, di vê hêlê de, weke şîrovegerê herî xurt ê li ser şaristaniyê tê nasîn. Mirov dide hizrandin ku heta, carna weke leqab, Peyvên 'Şagirtê Zerdeşt' û 'Şagirtê Dionysos' ji bo xwe bikar aniye.

Di Zerdeştiyê de hêmanên şaristaniya demokratîk di giraniyê de ne. Di malbatê de nêzîkî wekheviya ji û meran e. Êş bi lawiran nayê kişandin; goştê wan bi pirranî nayê xwarin, ya bingehîn ew e ku ji berhemên wan sûd tê wergirtin. Nirxeke mezin a çandiniyê heye. Têgînên başî-xirabî, yên pakbûyî ji pîroziyê, derdikevin pêş. Şêwaza ramana bi dubendî (hêzên ronîtî û tarîtiyê), ku yekemîn torên diyalektîkê tîne bîra mirov, pirr diyarker in. Hewl tê dayîn ku gerdûn, weke diyalektîkî, were têgihîştin. A bingehîn ew e ku civak bi rêgezên xurt ên exlaqî were rêvebirin. Pirr eşkere ye ku, bi hemû van milên xwe ve, şoreşeke xurt a exlaqî diteyisîne li hemberî Sumeriyan û şaristaniyên ku koka xwe ji wê derê digirin. Weke tê zanîn, berhema herî mezin a vê şoreşê, herçend hatibe paşevajkirin jî, Konfederasyona Med û Împaratoriya Pers e ku ew dewr girt (mixabin wê pirr were şewşandin). Her çend Manî (salên 250 P.Z.) dixwaze duyemîn şoreşek di vê doktrîna exlaqî de çêbike, lê Împaratorên Sasanî yên xeylî dejenerebûyî, wê vêya asteng bikin. Manî bi xwe, wê bi tundî were cezakirin. Pevçûna du nasnameyên olî û exlaqî mijara gotinê ye.

Şopên berdewamî yên kevneşopa exlaqî (Mecûsî, Êzidî) ya Zerdeşt û Manî ji Rojhilata Navîn heya Hindistan û Ewrûpa hene. Binekoka peyva 'zendik', Zerdeştî ye û her wisa binekoka peyva 'science' e jî. Pêwîst e mirov diyar bike ku hem pêxemberên Cihû di heyama koçberî/sirgûna (600-546 B.Z.) bo Babîlê de, hem fîlozofên Grek-Îon di heyama Împaratoriya Med-Pers de û rojhilatnasên Ewrûpî yekser li gel van herdu şaxan wê ji kevneşopa Zerdeştî xwedî kirine. Pêwîst e mirov di heman girîngiyê de diyar bike ku Konfuçyus, Sokrates û Bûda jî, ku bi Zerdeşt re di heman heyamê de jiyane (sedsalên 6. û 5. B.Z.), dokrtînên xwe di bingeh de spartine civaka exlaqî û li hemberî gefxwarina şaristanî li dijî exlaq, parastineke pirr xurt a exlaqî nimandine. Hêmana exlaqî di doktrînên Îslam û Xiristiyanî di Çaxa Navîn de ciyekî xeylî girîng digire. Lê di heyama şaristanî, anku moderníteya Ewrûpa de, exlaq erozyoneke mezin dijî. Me sedemên vê bi berfirehî anîbû ziman.

Tew van bibîranînên kurt jî yên dîrokî nîşan didin ku civaka exlaqî berxwedanvaniyeke mezin nîşan daye. Exlaq, herku weke exlaq maye, radestî hêzên şaristaniyê nebûye. Ti caran kêm nebûye pêdageriya exlaqî ya Demos li hemberî ol û huqûqa şaristaniyê ku hatine ferzkirin. Di roja me ya îro de pirsgirêk û erkên bingehîn ên di derbarê exlaq de di wê naverokê de ne bê ka wê çawa werin şûngehkirin. Etîk (teoriya exlaq) weke şaxekî zanista civakî, bê gûman erkek e di derbarê qada rewşenbîrî de, ku pêwîst e bi girîngî were pêxistin. A girîng ew e bê ka wê etîk çawa bi civakê re bibe yekpare; her wisa wê civaka exlaqî ku hatiye mehandin, çawa xwe ji nû ve û li ser bingehên hîn xurttir, bi exlaq rapêçîne. Erka ji nû ve avakirina exlaq, ne tenê pirsgirêka sedsalê û moderníteyê ye, lê ew pirsgirêk e bê ka wê civak were berdewamkirin an nikaribe were berdewamkirin.

Derketiye holê ku qeyrana kûrewî nikare bi zorê û bi hêza zorê ya huqûqê were derbaskirin. Ji nû ve veger bo olîtiyê jî, bûyereke bêhêvî ye. Pêwîst e mirov baş têbigihîje ku heya tevna exlaqî ya xurt a xwezaya civakî dîsa neyê sazbarkirin, wê modernîte nikaribe bi ti rêyan ji qeyrana kûrewî derbikeve. Qeyrana tê jiyîn, qeyranek e ku tevahiya hêzên dijberî civakê yên sîstema şaristanî ya pênc hezar salî, li hemberî civaka exlaqî ew afirandine. Lewre, pêdiviya diyalektîkê ye ku çareya wê jî di civaka exlaqî de (ji ber sedema wekheviya exlaq bi demokrasiya rasterast re, di civaka polîtîk de) were gerîn. Eger weke rêgezî li ser vê tepîtê yekbûn çênebe, wê nikaribe ti erkekê exlaqî bi rengekî rast were destnîşankirin. Wê demê, eger di xebatên ji nû ve avabûnê yên exlaq de, weke çeka çareserî ya herî mezin a modernîteya demokratîk li hemberî qeyrana kûrewî ya modernîteyê, em hewl bidin ku erkên exlaqî careke din bi awayê rêgezan destnîşan bikin;

**1-** Qeyrana kûrewî ya modernîteyê (qeyrana sîstemîk û pêkhateyî ya roja me ya îro), encama rûxana ku hêzên şaristaniya pênc hezar salî li hemberî civaka exlaqî dane meşandin e û her wisa rast e ku derketina ji qeyranê, weke pêdiviya diyalektikê, di ji nû ve avakirina civaka exlaqî de were gerîn û ev, di rewşa bijareya serekîn de ye.

**2-** Civaka exlaqî û polîtîk, ku yekeya bingehîn a modernîteya demokratîk e, tevî hemû hewldanên mehandin, pûçkirin û tunekirinê (ji alî hêzên şaristanî û modernîte ve), hebûna xwe weke xwezaya civakî, bi mezintirîn şêweyê didomîne. Hêzên şaristaniyê şebekeyeke teng a bijarte ne (belkî jî qet nebûne  zêdetirî ji sedî dehê xwezaya civakî) û giraniya bingehîn hîn jî tevahiya netew, gel, etnisîte, jin, civakên gund û çandinî, bêkar, koçber, ciwantî, komên marjinal û wekî vana, ku bindest in û têne mêtin pêk tînin.

**3-** A ku di bingeh de civakê li ser piyan dihêle û wê didomîne, ne pergala huqûqê ya dewletê ye, lê tevî hemû hewldanên wê yên razberkirina ji civakê, herçend lewaz jî mabe, hêmana exlaqî ye. Ta ku civak neyê tunekirin, exlaq jî nikare were tunekirin. Kûraniya qeyrana di nava civakek de, pêwendîdar e bi ketîbûna di exlaq de. Exlaq, divê zû yan dereng ne tenê ji bo derketina ji qeyranê, lê di bûyîna dombariya civakan di nava dilşadiyê de jî, weke tevn û saziya bingehîn a civakî, rola xwe bilîze.

**4-** Digel ku xebatên etîk erkên di derbarê qada rewşenbîrî de ne û xebatên siyaseta demokratîk erkên di derbarê qada polîtîk de ne, eger vana bi civaka exlaqî re nebin yekpare, wê nikaribin rola xwe bilîzin. Exlaq tê wateya rastiya civakê, ku têde erkên herdu qadan dikevin pratîkê. Di navbera ol û exlaq de, di nava wergiriya wan a demokratîk de, wekhevî heye. Lewre, ciyên ayîn/îbadetê, divê bibin saziyên ku di wan de herî zêde exlaqê civakî were xebitandin. A herî rast ew e ku her yek ji ayîn/îbadetxane, di serî de her yek ji dêr û mizgeft, weke saziyên pratîk ên exlaqî bêne nirxandin û di avakirina civaka exlaqî de bêne bikaranîn. Girîng e bi taybetî mizgeft ji nû ve bêne gihandin erkên wan ên ku weke navendên belave yên exlaqî yên di dema Hz. Miheme de dihatin pêkanîn. Mizgeft ne tenê ciyên ayînekê ta radeya dawî basît, weke nimêjê, ne (mizgeft, di dema Hz. Miheme de navendên wisa bûn ku di bingeh de di wan de civaka exlaqî û polîtîk ji nû ve dihat avakirin. Nimêj hatibûn hizirîn tenê weke ayîna pesendkirina vî karî. Paşê ayîn bû ya bingehîn. Lê avakirina bingehîn a civaka exlaqî û polîtîk ji bîr bû û hate jibîrkirin).

Divê modernîteya demokratîk, weke saziyên exlaqî yên ku têde civaka exlaqî û polîtîk ji nû ve bên avakirin, eger pêwîst bike weke şêwaza bername, rêxistingerî û xebatê di asta pêşeng de di reformê re were derbaskirin û were gihandin rêkûpêkkirinên nû. Digel ku Dergehên Cem ên Elewî

bêhtir rola saziyên civaka exlaq û polîtîk dilîzin, lê divê ew jî di xebatên ji nû ve avakirinê de di asta pêşeng de werin gihandin rêkûpêkkirinên nû. Mafê berxwedanê yê pîroz û exlaqî yê yekeyên civaka exlaqî û polîtîk heye li hemberî ferzkirinên dijber ên dewlet û desthilatî. Eger pêwîst bike, divê mirov vî mafî bi kar bîne. Bi ser de azadiya ol û wijdan (exlaq) vê yekê pêwîst dike.

**5-** Ne ferzkirinên laîsîzmê yên bi qilfên nûjen/modern û ne jî ferzkirinên olperestiya nû ya radîkal yan jî nerme bi navê kevneşopê, mîna ku tê texmînkirin, ne du meylên dijberî hevdu ne, lê weke versiyona du bîrdoziyên eklektîk ên lîberalîzmê, nikarin rola xwe ya exlaqî û polîtîk bilîzin. Ji bo mirov nekeve kemînên bi vî rengî, girîng e ku naveroka demokratîk a olê û hêmanên azad û sekular ku di laîktî de biqismî diteyisîn, bêne pesendkirin û bi vî rengî nêzîkatî were pêşxistin. Ev herdu hêman dikarin di ji nû ve avakirina modernîteya demokratîk de ancax di vê wergireyê de rola xwe bilîzin. Bi qasî ku pêwîst e mirov nebe alî di lîstok û pevçûnên sedsalî yên di navbera wan de, pêwîst e mirov zanibe vala derxîne wan hewldanên dejenerekirina ol û exlaq, her wisa yên vala derxistina wan û yên ji nû ve yekparekirina wan li ser bingeha berjewendiyan bi modernîteyê re.

**6-** Pêwîst e mirov nexape bi terora ku huqûq bi zora dewletê li ser civakê dimeşîne. Exlaq bingehî (esas) ye, lê huqûq duyemînî (talî) ye. Ta ku dadwer be, mirov ji huqûqê re rêz nîşan dide. Nexwe, şert e ku mirov heya dawî di civaka exlaqî û polîtîk de pêdagerî bike. Divê tew yek kêliyek jî neyê jibîrkirin ku rêya bingehîn a parastina civakê û demboriya wê, di helwesta exlaqî re derbas dibe.

**7-** Di nûneriya kûrewî ya exlaq weke sazî de, ji nû ve sazîbûnên ekumenîk ên Katolîk wek cûreya Vatîkan, her wisa saziya xelîfetiya berê ku umet (ekumen)a Îslamê dinimîne (di vê navberê de bi rêya tevlîkirina kevneşopên exlaqî û olî jî, yên weke Mûsawîtî, Bûdîzm û wekî vana) û yên dirûv/hempayên wan di bin sîwaneke hevbeş de û lêhûrbûnên wan li ser, bêhtir ji teolojiyê, sepanên etîk, dibe ku bi navê tevahiya mirovahiyê di ji nû ve avakirina civaka exlaqî û polîtîk de rola mezin bilîze. Wek cûreyek hatina ber/cem hev a dewlet-netewan di bin sîwana NY de, hatina ber/cem hev a doktrînên bingehîn ên exlaqî li hemberî êrîşên modernîteyê û sazîbûna wan şert e ji bo serkeftina wan. Divê konfederasyona hîndekariya exlaqî û pîroziyên kûrewî, weke pêdiviya vî şertî, werin damezrandin li hemberî cinawir (Levîathan)ên şaristanî û modernîteyê, ku hewl didin hemû pîroziyan û doktrînên exlaqî daqurtînin.

**8-** Hêzên modernîteya demokratîk, divê zanibin ku heya erkên xwe yên di derbarê qada exlaqî de pesend nekin û wan nekin jiyanî, wê nikaribin yekeyên civaka demokratîk bi serkeftî biparêzin û wan bidin berdewamkirin li hemberî êrîşên ku hêzên şaristanî û modernîteyê bi çeken berfireh ên çanda bîrdozî û daringî didin meşandin.

Van nirxandinên kurt, ên li ser mijar û sazî yên di derbarê exlaq de, di wesfa pêşniyarên çareseriyê de ne û pêwîst dike ku li ser wan bi berfirehî gotubêj bêne kirin. Çawa ku civaka exlaqî hilnayê li şemayên sazkirinên jêrîn û jorîn, xwezaya civakê jî li şemayên bi vî rengî hilnayê. Divê her yekeya civakî û heta her takekes zanibin ku, eger para xwe ji exlaq negirin, wê nikaribin bijîn. A girîng ew e ku civak û takekes xwe bi exlaqekî baş rapêçin. Tevî ku cinawirî (Levîathan)yên şaristanî û modernîteyê çiqas êrîş dibin ser civaka exlaqî û hewl didin wê tune bikin, em jî neçar in wê ewqas biparêzin. A/Ê ku nikaribe civaka xwe biparêze, nikare mafê wê/wî yê jiyana birûmet hebe. Lê eger exlaq nebe, mirov nikare parastina civakê jî bike. Serkeftina ku hemû yekeyên civakê

di xebatên ji nû ve avabûna moderrnîteya demokratîk de nîşan bidin, dibe pîvana bingehîn a derketina bi serkeftî ji qeyrana kûrewî ya sîstemê.

### C- Erkên Polîtîk

Têgîna polîtîka jî,  mîna exlaq, peyvek e ku li ser wê herî zêde geremolî û tevlîheviya têgînê tê pêşxistin. Wateya wê ya peyvê basît e. Koka wê Yunaniya kevn e û eger em jê re bêjin hunerê rêvebirina bajêr, wê bê têgihîştin. Lê, gerîna li rastiyê bi rêya peyvan, rêbazek e ku pirr kêm e û mirov di nivê rê de dihêle. Têgînên di derbarê xwezaya civakî de bi gelemperî pirr nediyar in. Dibe ku balê bikşînin ser rastiyê, lê nikarin bi anîna wan a cem hev ve, wê pêk bînin. Pêwîst e mirov hinekî jî li derveyî têgînan li rastiyê bigere. Mixabin ev kar dîsa jî bi saya têgînan gengaz e. Wê demê, tê wateya ku, jê pê ve, hêza şîroveyê dimîne. Eger wateya cewherîn a polîtîka, weke hunerê azadî, were destnîşankirin, dibe ku armancê bêhtir derbibirre. Û azadî bi xwe nêzîkiya li rastiyê tîne bîra mirov. Bê gûman, dema em têgînên mîna polîtîka, azadî û rastî bikar tînin, yekeya me ya bingehîn a lêkolînê, dîsa civaka exlaqî û polîtîk e. Bi rastî jî ez xwe dûr didim ji ravekirinên bi bingeha takekesî yan jî yên bi yekeyek dîtir a bingehîn, ku navberê bi ya civakî re vedikin. Dema ez têgînên mîna şer, pevçûn û mêtin, ku hema hema bûne wekhev bi navê polîtîkayê re, dihizirim, endîşeya min bêhtir zêde dibe. Ya ku reşbîniyê hîn bêhtir zêde dike ew e ku polîtîka û polis (dewlet) jî weke wekhev têne hesibandin.

Ne ewqas hêsan e bi qasî ku dixuye ku mirov di mijarek bi îdea mîna erka polîtîk de bi serkeftî pêngav bavêje. Di şûna ku mirov qet xwe nexe navê, ceribandinek hîn baştir e, herî kêm ji bo pêşxistina nîqaşê, lewre [ji bo pêşxistina] lêkolînê. Ez di wê baweriyê de me ku pêwîst e berî her tiştî hin karên ku ez wan weke polîtîka nahesibînim, werin destnîşankirin. A yekemîn; pêwîst e were têgihîn ku karûbarên dewlêtê, ne karên polîtîk in, lê karên îdarî (rêveberî) ne. Bi rêya xwe spartina dewletê, polîtîka nayê kirin, lê tê îdarekirin (rêvebirin). A duyemîn; karên ku têkildar nebin bi berjewendiyên jiyanî yên civakî re, polîtîkaya bingehîn pêk nahînin  û di asta karên rûtîn de ne, ku ji alî saziyên din ên civakî ve têne biciânîn. A sêyemîn; karên ku girêdana wan bi azadî, wekhevî û demokratî re nebe, di bingeh de polîtîkayê pêwendîdar dikin: [ew jî ev in] berjewendiyên jiyanî yên civakê, jîndariya wê, ewlekariya wê, xwe xwedîkirina wê; her wisa, demokrasî, azadî û wekhevî ne ku ji alî desthilatî û dewletê ve têne astengkirin. Weke tê dîtin, karên polîtîk û karên dewletê, ne heman in, heta bi hev re pirr binakok in. Di vê rewşê de, dewlet çiqas fire bibe û kûr bibe, polîtîka jî ewqas teng dibe û sist dibe. Dewlet tê wateya rêsayan, lê polîtîka afirînerî ye. dewlet, a/ê amade îdare dike, lê polîtîka çêdike û rêvedibe. Dewlet zenaet e, polîtîka seneat e.

Têkiliya desthilatî û polîtîka zêdetir ne diyar e. Belkî jî desthilatî ji dewletê zêdetir înkara polîtîkayê ye. Desthilatî herdem ji dewletê pirr zêdetir da nava civakê de bi cî bûye. Ev jî tê wateya bê ka kirina polîtîka di nava civakê de çiqas zor û sînordar e. Di encam de têkiliya polîtîka û desthilatî tim vekêşayî û biçalakî derbas dibe.

Çareyekê me ya dîtir nîne, ji bilî ku em bi rengekî hîn şênbertir nêzî vê mijarê bibin. Ji ber ku eger polîtîka nekeve pratîkê, wateya wê namîne. Me hewl da em civaka exlaqî û polîtîk di gelek mijarên pêwendîdar de tehlîl bikin. Her çend em lê dixebitin ku nekevin nava dubareya pirole, lê dîsa jî em neçar dimînin. Civak, heman weke di exlaq de, diyarde yan jî xwezayeke polîtîk e. Wisa weke tê texmînkirin, ne di wateya xebatên fermî yên dewletê de, lê weke xwezaya civakî, polîtîk e. Eger erka exlaq ew e ku karên jiyanî bi awayê herî baş bike, erka polîtîka ew e ku karên herî baş

peyda bike. Eger bê dîqetkirin, polîtîka hem rehenda exlaqî di xwe de werdigire û hem jî zêdetirî wê [di xwe de werdigire]. Peydakirina karên baş ne hêsan e. Pêwîst dike ku mirov karan pirr baş nas bike, anku zanîn û zanistê, wekî din peydekirinê, anku lêkolînê pêwîst dike. Dema têgîna 'baş' jî têkeve navê, zanîna exlaqî jî pêwîst dike. Weke dîtin, polîtîka hunerekê pirr zor e. Şaşitiyeke girîng ku mirov dikeve navê, ew e ku polîtîka tê hizirîn di nava hev de bi têgînên qebaredar ên mezin mîna dewlet, împaratorî, xanedan, netew, hevparî (şîrket), çîn û wekî vana. Eger polîtîka were hizirîn di nava hev de bi vana re û bi diyarde û têgînên dirûv/hempa re, dibe ku ji wateya xwe bikeve. Polîtîkaya rasteqîn di pênaseya wê de veşartî ye. Ti komeke dîtir a têgînan, ji bilî azadî, wekhevî û demokrasî, nikare berjewendiyên jiyanî yên civakê rave bike. Wê demê, polîtîka di bingeh de çalakbaziya azadî, wekhevî û demokratîkbûyînê ye, ku tê kirin ji bo ku civaka exlaqî û polîtîk karibe vê wesfa xwe yan jî heyîna xwe di bin her mercan de bide berdewamkirin.

Dema em dibêjin civaka exlaqî û polîtîk, em qala beriya dîrokê nakin. Lê, em qala awayê xwezayî yê xwezaya civakî dikin, ku bi berdewamî tê jiyîn û, heya ku heyîna wê bidawî nebe, wê hebûna xwe tim bidomîne. Civaka exlaqî û polîtîk, her çiqas hatibe mehandin, rizandin û perçekirin jî, wê tim her hebe. Heya ku xwezaya civakî hebe, wê ew jî hebe. Rola polîtîkayê ew e ku vê heyînê bike demokratîk, azad û wekhev, ji bo zêdetir were pêşxistin, bêyî ku bihêle ku vê heyîne were mehandin, rizandin û perçekirin. Û her civaka exlaqî û polîtîk, ku rewşeke wisa bijî, tê wateya ku civaka herî baş e; her wisa tê wateya pêkanîna civaka ku tê hedefkirin.

Divê em careke din serî li dîrokê bidin ji bo naveroka vê têgînê baştir were têgihîştin. Wê şaristanî dîsa bibe têgîna me ya sereke ji bo vî karî. Şebekeyên çanda bîrdozî û daringî ne tenê ji ber ku desthilatî û dewletê di xwe de werdigirin, lê ku di wateya çînîtî û bajarîtî de jî li ser civakê bi berdewamî fire dibin û kûr dibin, herku civaka exlaqî û polîtîk dorpêç dikin, rola polîtîkayê teng dibe. Tengbûna rola polîtîkayê, wê paşketin yan jî înkarkirina azadî, wekhevî û demokratîkbûna civakê bi xwe re bîne. Dîroka şaristaniyê bi pêşketinên bi vî rengî tijî ye. Dema civaka di bin serweriyê de her diçe zêdetir tê kolekirin, serfkirin û proletarkirin, wê we yekê ber bi derve ve veguhere pêvajoya ketina bin zordestî û mêtingehbûyîna civakên bêhtir azad, wekhev û demokratîk, û wê bi vî rengî dewam bike. Zagona kara mezintirîn a yekdestiyên sermaye û desthilatî vê yekê pêwîst dike. Polîtîka di vê rewşê de wê weke berxwedana yekeyên şaristaniya demokratîk wate wergire. Ji ber, çawa ku eger mirov li ber xwe nede, ti pêngava ji bo azadî, wekhevî û demokratîkbûnê nikare were bi serxistin, her wisa nikare pêşî lê bê girtin ku asta exlaqî û polîtîk a heyî, zêdetir were mehandin, perçekirin û pûçkirin, her wisa nikare pêşî li mêtina yekdestiyan were girtin. Pênasebûyîna polîtîka weke hunerê azadiyê, ji ber vê rola wê ye ku di dîrokê de leyîstiye. Her çîn, bajar, gel, qebîle, civatên olî, her wisa qewm û netew, ên ku nikaribin polîtîka bikin û neyê hêştin ku bikin, tê wateya ku hêza wan a gotin û vînê, derbeya herî mezin xwariye. Li ciyê ku gotin û îrade/vîna kolektîv nebe, li wê derê bêdengiya mirinê heye.

Atîna û Romaya çaxa antîk, navdariya xwe ji hêza xwe ya polîtîk digirtin. Eger Komara Roma û Demokrasiya Atîna, tevî hemû sînordariyên xwe, hîn jî bi xwezyarî (heyranî) têne bibîranîn, pêkera bingehîn a vê yekê ew e ku polîtîkaya bajêr bi pisporiyeke mezin dane berdewamkirin. Atîna, bi polîtîkaya xwe ya bajêr, çawa ku Împaratoriya Pers a dêwane daye rawestandin, têkçûna wê jî amade kiriye. Û Roma, bi polîtîkaya xwe ya komargir, kariye bibe navenda cîhanê. Ya hîn girîngtir, siyasetmedarî (polîtîkvanî)ya herdu bajaran di pêşketina çanda Greko-Raman de rola destnîşankar leyîstiye.

Mînaka Babîlê bêhtir kartêker e. Belkî jî mirov karibe wê weke yekemîn nimûneya mezin a serxwebûn û xweseriya bajêr pêşkêş bike. Hemû pisporî û westatiya polîtîkaya serxwebûn û xweseriyê nîşan daye ji bo nekeve bin nîrê hêzên desthilatî û dewlet ên xurttir ên li derdora xwe. Kariye li ser piyan bimîne bi van polîtîkayên xwe yên westatî li hemberî hemû împaratoriyên navdar ên dîrokê yên di serdemên xwe de, ji Asûriyan heya Hîtîtiyan, ji Qasîtiyan heya Mîtaniyan û ji Persan heya Îskender. Her wisa bi zanist, huner û sanayiya ku pêş xistiye, kariye bibe navenda vekêşanê ya şaristanî ya herî demdirêj a wê serdemê (2000 B.Z.- Heya salên zayinê). Bê gûman di vê de para diyarker a polîtîkaya bajêr heye, ku şopandiye. Yek ji wan mînakên sereke yên kartêker e ku îspat dike ku polîtîka azadî û afirînerî ye. Em dikarin Kartaca û Palmyrayê jî ji van mînakên sereke bihesibînin. Kartaca, çawa ku bi polîtîkaya berxwedanê li hemberî serweriya Roma demeke dirêj li ser piyan ma, pêşketina xwe ya afirîner ji domandiye. Lê, kînga mîna Roma dil berda împaratoriyê,, wê demê nekarî xwe ji wendakirinê rizgar bikira. Ji ber ku bûyîna împaratorî dijraberî polîtîkaya berxwedanê ye. Heta, înkara polîtîkayê ye. Encam, wendakirina trajîk e. Palmyra jî pêvajoyeke dirûvê wê, jiyaye. Palmyraya navdar, ku li herêmê belkî jî, piştî Babîlê, herî zêde derbasî hilhatinê bûye, kariye bi awayekî demdirêj (300 B.Z.-salên 270 P.Z.) xweser û serbixwe bimîne û hema hema bihuştê li çolê afirandiye, dema dev ji polîtîkaya xwe ya xweserî û denge li hemberî Împaratoriyên Roma û Pers-Sasanî berdaye û hewl daye ku bi tena serê xwe bibe împaratorî (salên 270 P.Z. di dema Zenûbeya navdar de, ku banû ya wê bû), nekariye xwe ji rûbirûmayîna bi dawiya trajîk rizgar bike. Trajediya Palmyra jî yek ji wan nimûneyên kartêker pêşkêş dike, ku ji bo azadiyê berxwedan, mirov dibe serkeftinê; lê desthilatperestî, mirov dibe felaketê.

Polîtîkayên dirûv ên xweserî yên bajaran di çaxa navîn de karine hîn belavetir bêne sepandin. Hema weke em rûbirû bin bi cîhana bajarên stêrk ku li hemberî împaratoriyên mezin li ber xwe didin. Bi sedan bajar (ji Okyanûsa Mezin heya Okyanûsa Atlas, heta heya Parzemîna Emerîka û ji Çola Mezin a Sahra heya Sîbîrya) li hemberî împaratoriyên Îslamî (Emewî, Ebasî, Selçûkî, Tîmûr, Babûr, Osmanî), Împaratoriya Cengiz Xan, Împaratoriyên Xiristiyan (Bîzans, Îspanya, Awusturya, Rûsyaya Çarîtî, Brîtanya) û Împaratoriyên Çînê, karine li ber xwe bidin bi navê polîtîkaya xweseriyê, eger pêwîst kiribe heya ku ji dîrokê tune bibin. Nimûneya ku didirûve Kartaca ku wer lê hate kirin ku bû zevî, bajarê Otrar e ku li hemberî Cengîz Xan li ber xwe da. Ew jî hate kirin zevî. Mirov dikare bi sedan nimûne pêşkêş bike ji berxwedanwaniya bajarên Ewrûpa re ku bi sedan salan ajot li hemberî hem hêzên împaratoriyê û hem navendîperestiya dewletperestiya-netew. Pirr baş tê zanîn ku bi taybetî bajarên Îtalya û Almanya, ji bo ku pêkhateyên xwe yên xweser biparêzin, heya nîvên sedsala 19. berxwedanên mezin pêş xistine. Venedîk û Amsterdam nimûneyên navdar ên ji vana ne.

Dema dewlet-netew di sedsala 19. de li her alî serkeftin bidest xist, ev bû derbeyeke mezin li xweseriyên bajaran ku di dîrokê de bi hezaran salan domiyan. Lê xweseriyên bajaran bi postmodernîteyê re ji nû ve belave dibin. Her wisa siyasetmedariya bajêr derdikeve pêş.

Ne tenê siyasetmedariya bajêr li hemberî hêzên şaristaniyê di dîrokê de, lê belkî jî ji wê bêhtir berxwedanên bêhejmar hene, yên ku komên civakî yên serekîn, mîna qebîle, eşîret, civatên olî, bizavên felsefî û wekî wana, bi armanca ku bi awayê hêza xweser bimînin [van berxwedanan] pêş xistine. Çîroka xweserî ya sê hezar û pênc sedsalî (1600 B.Z.-heya roja me ya îro) ya qebîleya Îbranî belkî jî nimûneya herî navdar e. Cihû hem di dîrokê de û bêhtir jî di roja me ya îro de pirr zengîn û afirîner in; di vê de polîtîkaya xweserî ya qebîleya Îbranî rola destnîşankar leyîstiye. Her

wisa, li hemberî veguherandina ola Îslamê bo navgîna împaratorî û desthilatiyê, gelek mezhebên mezin ên berxwedanê derketine holê. Mezhebên Elewîtî û Xaricîtî polîtîkaya jiyîna xweser a qebîle û eşîretan diteyisînin. Pêngavên belave yên mezhebên dijber ku têne dîtin di nava her qewman de li hemberî kevneşopa serwerî û sultaniya Sûnî, di cewher de encama polîtîkayên berxwedanvan û azadîxwaz ên gelên eşîret û qebîleyan e. Wek cûreyek yekemîn tevgerên gelan ên ji bo azadî û serxwebûnê ne li hemberî mêtingeriya Îslama Sûnî. Mezhebên berxwedanê yên dirûv/hempa bi hejmareke zêde di Xiristiyanî û Mûsawîtî de jî hene. Çaxa navîn sertaserî bi ev cûre têkoşînên ji bo polîtîkaya azadî û xweserî yên civatên olî, qebîleyî, navçeyî û bajarî dagirtî derbas bûye. Jiyana li manastiran a nîv-veşartî ya berxwedanvan a yekemîn civatên Xiristiyan, rola sereke di amadebûyîna şaristaniya hemdem de leyîstiye. Dîsa, polîtîkayên xweser ên bizavên felsefî yên Yunan ên çaxa berê, rola amadekar a bingehîn a zanistê leyîstine. Gel û netewên ku gihîştine heya roja me ya îro, vê rastiyê herî zêde deyndarên dapîr û bapîrên xwe yên qebîle û eşîretan in, ku li serê çiyan û li nava çolan bi dirêjiya bi sedan û bi hezaran salan li ber xwe dane.

Tevgerên rizgariya netewî yên çaxa nûjen, dewama van kevneşopan in. Armanca ku tevahiya wan li pey wê beziyane, herçend weke dewleta serbixwe hatibe paşevajkirin jî, serxwebûna polîtîk e. Herçend veguherandina serxwebûna polîtîk ji alî lîberalîzmê ve bo serxwebûna sexte ya dewlet-netew, polîtîkayê ji erka wê ya rasteqîn asteng kiriye, lê dîsa jî tê wateya domandina kevneşopeke pirr girîng a berxwedana polîtîk.

Polîtîkayên xweserî yên navçeyî û herêmî di dîrokê de her hebûne û rola girîng leyîstine ji bo civaka exlaqî û polîtîk hebûna xwe bidomîne. Gel û netewên ku di erdnigariyeke pirr fireh a rûyê erdê de, di serî de li çiyan, çolan û qadên daristanan, bi awayê civakên qebîle, eşîret, gund û bajaran dijîn, bi polîtîkayên xwe yên berdewamî yên xweserî û serxwebûnê, li hemberî hêzên şaristaniyê li ber xwe dane. Loma em dibêjim ku di dîrokê de bêhtir kevneşopa konfederal a demokratîk di giraniyê de ye. Her wisa em dibêjin ku meyla zal bi dirêjiya dîroka şaristaniyê, ne stûxwarî ye, lê berxwedan e. Eger wisa nebûya, wê cîhan bûbûya wek Misira Fîrewnan. Eger em nizanibin ku ti yek navçe û herêma mirov nemaye ku têde berxwedan û polîtîka çênebûbe, em ê nikaribin dîrokê bi awayekî rast şîrove bikin. Eger gelên Emerîkaya Latîn, Afrîka û Asya hîn jî bi hemû rengên xwe û çandên xwe ve li ber xwe didin, ev tê wateya ku dîroka wan jî wisa ye. Ji ber ku dîrok 'niha' ye.

Mirovahî di dîrokê de ne tenê di asta civak û herêma erdnîgarî de berxwedana polîtîk kiriye û bi vî rengî hebûna xwe û rûmeta xwe parastiye; lê di heman demê de di asta takekesî de jî kesayetiyên polîtîk ên berxwedanvan nas kiriye, ku carna bi qasî netewek giraniya wan hebûye. Dîrok bi nimûneyên bi vî rengî dagirtî ye. Mirov, weke takekes, bi qasî ku nikaribin bêne hejmartin, ji Bûda heya Sokrates, ji Zerdeşt heya Konfuçyûs û heya hemû pêxemberan, ku ji Hz. Adem destpê dikin heya Nûh û Eyûb û ji Îbrahîm heya Mûsa, Îsa û Miheme, ku bi awayê xelekên serekîn didomin û hejmara wan di Pirtûka Pîroz de weke zêdetirî ji 120 hezar tê dayîn; her wisa ji Înanaya Xwedavend heya Hz. Eyşe, ji Zenûbe heya Hypatîa, ji Kîbele heya Meyrem û ji jinên Cedû heya Zeyneb û Rosa, dîsa ji Brûno heya Erasmûs, karine bi bûhaya mirinê li ber xwe bidin ji bo karibin azad û birûmet bimînin. Civak, eger di roja me ya îro de hîn jî weke exlaqî û polîtîk didome, diyar e pirr nirx deyndarê van takekesan e. Nexwe, wê cewaziya wê ji keriyên koleyan nemana.

Bê gûman, pirr zêdetir girîng e ku mirov polîtîkayê di roja me ya îro de şîrove bike. Lê dîsa jî, bêyî diyarkirina ku dîrok hebûna xwe di roja me ya îro de bi giranî didomîne, em nikarin

polîtîkayê şîrove bikin. Em bi pêdagerî dewam dikin diyar bikin ku şaristanî di mijara tengkirina polîtîkayê de yekê kiriye, modernîte wê yekê kiriye hezar û wê berdewam kiriye. Eger em tehlîla xwe ya li ser dewlet-netewê bi bîr bînin, min kirpandibû ku civaka nûjen, ne tenê serweriya dewletê ji jor ve jiyaye, lê di heman demê de ji dagirî, mêtingerî û bandorên emrazên desthilatî re, heya hemû çavikên xwe yên jiyanî hatiye vekirin. Girîng e were têgihîn ku civak di asta kûrewî de bi vê rastiyê ve hatiye dorpêçkirin, fetihkirin û mêtingehkirin. Ez ê qîma xwe bi bibîrxistinê bînim bê ka şebekeyên serwerî yên çanda bîrdozî û daringî çawa belav bûne. Ev, rewşeke nû ye. Dixwazî em navê ‘serweriya super a kûrewî’ lê deynin û dixwazî em jê re bêjin ‘împaratorî’ yan jî pergala NY; di cewher de guheranekê nîşan nade. Wekî din, me kirpandibû ku sermayeya finans mora xwe li serweriya kûrewî daye û di heman demê de qeyrana kûrewî ya sîstemîk û pêkhateyê tê jiyîn û bûye berdewamî.

Dema em bipirsin ka çi maye li dû civaka exlaqî û polîtîk di bin van mercan de, em neçar in jêpirsîn bikin bê ka hêza polîtîka ya lîstina ti rolekê heye yan na. Em dibînin ku rewşek wisa tê jiyîn ku dema li tabloya heyî tê nêrîn, pirrî caran tê ketin nava neyînîtî û bêhêvîtiyê. Vayê, tam jî di vê xalê de, em dikarin ji jêpirsîna polîtîk a kûranî ya rewşê têderxin ku ne tenê ne di cî de ye ku mirov têkeve nava neyînîtî û bêhêvîtiyê, lê di heman demê de, vê yekê bêwate ye. Weke gelek tê zanîn, xalên maksîmûm û mînîmûm ên trendan, meylan û jiyên pêlan (rastiya gerdûnî ye) hene. Hemû nîşander didin xuyanîkirin ku awayê heyî yê desthilatiya modernîte û şaristanî, zû ve, ji maksîmûmê derbasî daketinê bûye. Desthilatî, ku di civakê de belav bûye, heman weke pêlek ku giraniya xwe wenda bike, hêza xwe wenda dike. Çawa ku kevirekî mezin ku ji tepeyek bikeve, li binke perçe dibe û giraniya xwe wenda dike; desthilatî jî, ku ketiye heya çavikên civakê û perçe bûye, giraniya xwe ewqas wenda dike.

Mirov dikare wateya civaknasî ya vê rastiyê tehlîl bike. Desthilatî çiqas xwe li tevahiya yeke û takekesên civakê belav bike, ewqas ji alî yeke û takekesên ku xwe li wan belav dike, weke pêdiviya diyalektikê berxwedan di wan de diafirîne. Ji ber ku dema weke barkirî bi zordestî, mêtin û êşkence ve tê û xwe li her yeke û takekesan ferz dike, dijraberî rastiya herikîna gerdûnî ya xwezayê ye ku rastî, berxwedanê neyê. Rastiya desthilatî ya nûjen, gelek cewaz bûye ji rastiya desthilatî ya her kîjan çaxekê dîrokî. Şebekeyên kapîtalîzmê yên li ser tevahiya aboriya cîhanê, weke yekdestiyên sermaye, belavbûna xwe di asta ku kara mezintirîn bîne de temam kirine û tew yek goşeyek jî nemaye ku xwe lê belav bikin. Wekî din, eger em qeyrana ekolojîk jî bidin ber çavan, tew yek malbat û klan jî nehêştine ku xwe bi kûranî negihandibin wan. Rûxana ku encamên zagonên kapîtalîstîk ên sanayîgerî di pêkhateya hundirîn û jîngeha civakê de afirandine, veguhastine asta felakete. Dewlet-netew, weke hêza xwedayî ya herî xurt a dîrokê, ti yek hemwelatî nehêştiye ku lê neçirpîbe û serweriya xwe li ser wê/wî ava nekiribe. Heyameke dîtir a bi vî rengî di dîrokê de tine ye. Anthony Gîddens dema dibêje ‘bêhempatî/nedirûvî’ di vê xalê de mafdar e!

Polîtîka jî li hemberî vê rastiya desthilatiyê (kapîtalîzm, sanayîgerî û dewlet netew) neçar e ku weke cemsera dijber cewaziyekê bijî, ku bi ti serdemekê dîrokê re neyê berawirkirin. Li gorî ku em heyama berî û piştî şaristaniyê najîn, divê pêkhateya polîtîka jî, ya xweser bo modernîteyê, cewazîtî wergire. Eger em bi kurtasî formule bikin; li gorî ku şebekeyên desthilatî li her derê ne, polîtîka jî neçar e li her derê be. Her wisa, li gorî ku desthilatî xwe dispêre her takekes û yekeya civakî, divê polîtîka jî xwe bispêre her takekes û yekeyê.

Mijareke têgihîner e çêbûn û belavbûna şebekeyên polîtîk, ku bibin beranberiya şebekeyên desthilatî yên di tevahiya lêlata civakê de. Eşkere ye ku vê yekê nikare bi pêkhateyên rêxistinî yên bi cûreya kevn were dabînkirin. Bi ser de, modêlên berê yên rêxistingerî bi nîvenda dewlêtê bûn. Polîtîka berî her tiştî li hemberî desthilatiyê weke berxwedan destpê kiriye. Li gorî ku desthilatî hewl dide her yeke û takekesa/ê civakî, ku çavê xwe li wan bibirre, feth bike û wan bike mêtingeh, polîtîka jî hewl dide ku her yeke û takekesa/ê ku xwe dispêre wan, gezenc bike û wan azad bike. Li gorî ku her têkilî, ya ku hem yekeyî û hem takekesî be, desthilatiyane ye, di wateya dijber de polîtîk e jî. Li gorî ku desthilatî bîrdoziya lîberal, sanayîgerî û dewlet-netewî dizayîne, divê polîtîka jî bîrdoziya azadî, sanayiya-eko (eko-endustrî), civaka komunal û konfederalîzma demokratîk hilberîne û wan ava bike. Li gorî ku desthilatî di asta her takekes, her yeke, bajar, gund, navçeyî, herêmî, netewî, parzemînî û kûrewî de xwe birêxistin dike, polîtîka jî neçar e xwe di asta takekesî, yekeyi, bajêrî, navçeyî, herêmî, netewî, parzemînî û kûrewî de birêxistin bike. Dîsa li gorî ku desthilatî propaganda û her cûre şêweyên çalakiyan (şer jî têde) di van hemû astan de, ferz dike; polîtîka jî neçar e propaganda û şêweyên çalakiyan, di van hemû astan de, ferz bike.

Ta ku em bi rengekî rast nas nekin vê rastiya deshilatî ya modernîteyê, ku me hewl da em wê bi xetên serekîn pênase bikin, em ê nikaribin li ser ti erkek polîtîk, bi awayekî rast bixebitin. Em ceribandina Sovyetê û heta qonaxên sosyalîzma pêkhatî yên beriya wê bînin bîra xwe: Sendîkalîzma karkeran (parsekiya mize) li hemberî kapîtalîzmê, endustiryalîzma bêhtir pêşxistî li hemberî endustriyalîzmê û dewletperestiya-netew a navendî zêdetir pêşxistî li hemberî dewletperestiya-netew a navendî. Kurt û cewherî, rûxana ji hundirin ve çêbûye di bin emraza desthilatî ya dêwane de, ku di encam de mirov nikare ji binî derkeve, her wekî desthilatî li hemberî desthilatî, agir li hemberî agir, dîktadorî li hemberî dîktadorî û kapîtalîzma dewletê li hemberî kapîtalîzma taybet. Mezheba sosyalîst a pêkhatî (kapîtalîzma çep), bi vê rêyê, ne tenê polîtîka li hemberî desthilatiyê kir, lê her wisa desthilatiyê jî li hemberî polîtîkayê sepand. Ji bo vê, têrê dike ku mirov dîroka partiya wan bixwîne. Mezheba demokrat a civakî (kapîtalîzma rêya navîn) desthilatiyê reforme kir û wê bêhtir kir mayînde, ku ji bo vê tenê dike ku mirov dîrokên partî yên nimûneyên Ewrûpa bixwîne. Mezheba tevgerên rizgariya netewî (kapîtalîzma rast) tavilê bû dewlet-netew û di belavbûna kapîtalîzm li cîhanê de bû lîstikvanê rola sereke. Min dijberên din ên sîstemê, yên ku li derveyî van hersê mezheban dimînin, şîrove kiribû. Kêmasî û nebesiyên wan ên herî cidî ew in ku, yan li hemberî desthilatiyê bi perçeyekê desthilatiyê (dewlet-netewê) digirin, yan li hemberî desthilatiyê meydanê bi temamî vala dihêlin (bi taybetî anarşîst) û yan jî xwe bi rêxistinên sivîl en civakê diewiqînin. Di ti yek ji wana de şiyana têgihana sîstematîk li ser desthilatî û hilberandina polîtîka weke alternatîv, tine ne; her wisa pêwîstiya wan nayê hîskirin. Dema polîtîkayê ji her cûre taşeronên desthilatiyê re dihêlin, tew haya wan jî jê tine ku ji duaya ku nîne re dibêjin 'amîn'. Jê pê ve, kirina sîmsariya qeyranê ya kapîtalîzm û kûrewîperestiyê dimîne, ku eşkere ye ku vêya jî nabe û nikare bibe derman ji ti derdekî re.

Zimanê modernîteya demokratîk polîtîk e. Hemû pêkhateya xwe ya sîstematîk bi hunerê polîtîk disêwirîne û ava dike. Wesfa zanistên bingehîn a civaka exlaqî û polîtîk ne desthilatiyê, lê polîtîkayê tîne bîra mirov. Rastiya ku civaka exlaqî û polîtîk di roja me ya îro de dijî, anku pirsgirêka wê ya pêşikî, tew beriya azadî, wekhevî û demokratîkbûnê, hebûnîtî ye. Çimkî hebûna wê di bin xeteriyê de ye. Êrîşên piralî yên modernîteyê, dikin pêşikî ku civak berî her tiştî hebûna xwe biparêze. Bersiva modernîteya demokratîk li hemberî van êrîşan, di wateya parastina cewherîn de,

berxwedan e. Mirov nikare polîtîka, bêyî parastina civakê, bike. Divê ez dîsa bikirpînim ku civak tek e û ew jî civaka exlaqî û polîtîk e. Pirsgirêk ew e ku civak, di mercên bêhtir pêşketî yên modernîteyê de berî her tiştî, ji nû ve were avakirin, ku ji alî şaristanî ve gelek hatiye mehandin; her wisa, rastî dagirî û mêtingeriya desthilatî û dewletê hatiye. Siyaseta demokratîk, tevlî parastina cewherîn ve, cewhera siyasetmedariya heyamê ye. Dema ku siyaseta demokratîk civaka exlaqî û polîtîk pêk tîne, parastina cewherîn wê diparêze li hemberî êrîşên desthilatî yên arastebûyî li hebûna wê, azadiya wê û pêkhateya wê ya wekhevxwaz û demokratîk. Em qala ne cûreyek nû ya şerê rizgariya netevî û ne jî ya şerê civakî dikin; lê em qala parastina nasnameya wê, azadiya wê, her wisa wekheviya wê ya li ser bingeha cewaziyan û demokratîkbûna wê dikin. Eger êrîş çênebin, pêwîstî bi parastinê jî namîne.

Şêweya jiyana polîtîk a hêzên dijberî sîstemê konfederal e, ku di dîrokê de meyla serekîn e.

Hemû yekeyên civakî girêdana bi hev re ya bi girêyên sîst dipejirînin, tenê bi mercê ku rêz ji xweseriyên wan re were nîşandan. Tew ji hêzên desthilatî û dewletperest ên şaristaniyê re jî, ancax bi vî mercî rîza nîşan didin. Mercên ku têde rîza nebe, awayê herdemî yê şer e. Lê dema riza hebe, ya ku pêk tê, aştî ye. Rêgeza rêveberî ya civakî, ya ku bersiv bide pêkhateya dewlet-netew û diyardeya desthilatî ya çaxa nûjen, ku tevahiya civakê vegirtine, polîtîka û konfederalîzma demokratîk e. Dema ku polîtîka, weke siyaseta demokratîk tê sepandin; hemû yekeyên civakî, weke hêzekê federe, tevlî pêvajoya konfederal dibin. Ev sîstem cîhaneke nû ya polîtîk e. Dema ku şaristanî û modernîte tim bi fermanan îdare dikin; şaristaniya demokratîk û modernîte bi gotûbêj û lihevhatinan, bi rastî jî polîtîka dikin û bi vî rengî rêve dibin. Pêşketinên bingehîn ên civakî, dîrok û rastiyên roja me ya îro, tevî hemû şewşandin û dapaçînan, di bin pêşengiya hunerê polîtîka de hatine bidestxistin. Dema ku kapîtalîzm di mercên qeyrana kûrewî de hewl dide ku desthilatiya xwe li ser bingeha ji nû ve avakirina dewlet-netewê biparêze, erkên bingehîn ên tevahiya hêzên modernîteya demokratîk ew e ku bersiv bidin qeyranê, bi rêya pêşxistina sîstema konfederal a demokratîk, ku armanca wê parastin û pêşxistina civaka exlaqî û polîtîk e.

Mirov dikare rêgezên giştî yên di derbarê erkên polîtîk ên hêzên modernîteya demokratîk de, li derdora mijarên li jêr, di bin ronahiya van ravekirinan de, bi awayê kurtekirinê pêşkêş bike:

**1-** Xwezaya civakî di bingeh de çêbûn û heyîneke exlaqî û polîtîk e. Ta ku civak hebûna xwe bidomînin, wesfa wan a exlaqî û polîtîk dewam dike. Civakên ku wesfa xwe ya exlaqî û polîtîk wenda kiribin, mehkûmê belavbûn, rizîn û tunebûnê ne.

**2-** Sêwirandina civakan di bin şêweyên ku di xetekê dûz de bi berdewamî pêş ve biçin, mîna hoveber, koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst, ji pêşkeşkirina tevkarî li têgihandina rastiya wan, bêhtir xizmet dike ji şewşandin û dapaçîna wan re. Ravekirinên bi vî rengî bi propagandayê barkirî ne. Wesfa exlaqî û polîtîk karakterê serekîn ê civakê ye û ya herî rast ew e ku mirov civakan biwesfîne li gorî radeya hebûna van wesfan. Hem wesfên çîn û dewletê û hem astên pêşketina sanayî û çandinî karakterê bingehîn ê civakê pêk nahînin û diyardeyên demborî ne.

**3-** Pirsgirêka civakî, girêdayî bi zordarî û mêtina desthilatiyê, dize (çêdibe). Herku desthilatî û mêtin pêş dikevin, pê re pirsgirêkên civakî jî pêş dikevin. Dewletên bi bingeha çînî, ku weke navgînên çareseriyê têne ferzkirin, li gel kapasîteyên xwe yên sînordar ên çareseriyê, di bingeh de vediguherin çavkaniya pirsgirêkên nû.

**4-** Polîtîka, ne tenê di çareseriya pirsgirêkên civakî de, lê di heman demê de di destnîşankirin, parastin û domandina tevahiya berjewendiyên wê [civakê] yên jiyanî de navgîna bingehîn a çareserî ya civakî ye. Parastina cewherîn di parastina civakê de pêwîst e û weke hêza leşkerî di wesfa berdewamkirina polîtîkayê de ye.

**5-** Herku şaristanî bi dirêjiya dîrokê hewl didin civakan bi îderaya dewletê rêve bibin, erka polîtîka di nava civakê de teng dibe. Civak, ta ku hebûna wan bidome, bi berxwedanê bersiv didin vê tengkirina erkê. Dîrok, di bin van herdu pêkerên serekîn de, ne tam îdareya şaristaniyê ye û ne jî tam rêveberiya polîtîk a demokratîk e. Pevçûnên di dîrokê de çavkaniya xwe ji karakterên binakok ên van herdu pêkerên serekîn digirin.

**6-** Heyamên aştiyê di dîrokê de têne bidestxistin, dema hêzên şaristaniyê û hêzên demokratîk hevdu bipejirînin û rêzdar bin ji nasname û berjêwendiyên hev re. Ti pêwendiya pevçûn û agirbestên ku bi armancên desthilatî çêdibin, bi aştiyê re tine ye.

**7-** Desthilatî di heyama modernîteya kapîtalîst de tevahiya civakê ji hundir û derve ve dorpêç dike û wê vediguherîne bo cûreyek mêtingeha navxweyî. Desthilatî û dewlet-netew weke şêweya bingehîn a dewletê, li hemberî civakê di nava şerê berdewamî de ne. Polîtîkaya berxwedanê, çavkaniya xwe ji vê rastiyê digire.

**8-** Ev awayê şerê sertaserî yê modernîteya kapîtalîst li hemberî civakê, alternatîva modernîteya demokratîk zêdetir dike lezgînî û neçarî. Modernîteya demokratîk, weke hebûna hêzên şaristaniya demokratîk a di roja me ya îro de, ne bîranîneke çaxa zêrîn e ku di paşerojê de hatibe jiyîn û ne jî utopyayek e di derbarê pêşerojê de; lê, hebûn û helwesta hemû yeke û takekesên civakê ye, yên ku hebûn û berjewendiyên wan bi sîstema kapîtalîst re binakok bin.

**9-** Têkoşînên dused salên dawî yên hêzên dijberî sîstemê, bêçare mane û bi ser neketine, ji ber sedema perspektîva wan a li ser desthilatiyê, yan jî ji ber ku qada polîtîk vala hêştine. Tevî ku mîraseke hêja hêştine, nikarin bi heşmendî û pêkhateyên kevn alternatîvekê çêbikin li hemberî ne modernîteyê bi xwe û ne jî li hemberî qeyrana sîstemîk.

**10-** Bûyîna alternatîv, gengaz dibe tenê bi pêşxistina sîstema xwe bi xwe li hemberî kapîtalîzm, sanayîgerî û dewlet-netewê, ku hersê lingên modernîteyê ne. Civakgiriya demokratîk, eko-sanayî û konfederalîzma demokratîk, dikare bi navê modernîteya demokratîk weke sîstema dijber werin pêşniyarkirin. Eger dijberên sîstemê bi mîrasa şaristaniya demokratîk di sîstema nû de werin cem hev, wê vê yekê şansê serkeftinê zêde bike.

**11-** Konfederalîzma demokratîk şêweya bingehîn a polîtîk a modernîteya demokratîk e û roleke jiyanî di xebatên ji nû ve avabûnê de derdibirre. Konfederalîzma demokratîk navgîna herî guncav a hilberandina çareserî ya siyaseta demokratîk e, weke şêweya bingehîn a polîtîk a modernîteya demokratîk ku, bêhtir ji bûyîna navgîna çareserî ya modernîteya kapîtalîst, dibe bijare li hemberî dewlet-netewê ku forma bingehîn a dewletê ye ku bi berdewamî pirsgirêkan dizayîne.

**12-** Azadî, wekheviya li ser bingeha cewaziyan û pêşketinên demokratîk bi rêyên herî bijûndar têne bidestxistin di civakên exlaqî û polîtîk de, ku têde siyaseta demokratîk di meriyete de be. Azadî, wekhevî û demokrasî gengaz in tenê bi hêza gotûbêj, biryar û çalakiya civakê, ku bi hêza

xwe ya heşmendî û wijdana xwe ya cewherîn wan pêş bixe. Ne gengaz e ku bi ti hêza endazyariya civakî vê yekê were pêkanîn.

**13-** Konfederalîzma demokratîk bijareya netewa demokratîk pêşkêş dike weke navgîna bingehîn a çareserî li hemberî pirsgirêkên etnîkî, olî, bajêrî, navçeyî, herêmî û netewî ku çavkaniya xwe digirin ji modêla civaka faşîst a monolîtîk, homojen û tek-rengî ku ji alî moderníteyê vê bi destê dewlet-netewê tê meşandin. Her etnîsîte, feraseta olî û rastiya bajêrî, navçeyî, herêmî û netevî, xwedî wî mafê ne ku bi nasnameyên xwe yên cewherîn û bi pêkhateyên xwe yên federe yên demokratîk di nava netewa-demokratîk de ciyê xwe bigirin.

**14-** Alternatîva yekîtiya kûrewî ya netewên demokratîk li hemberî Netewên Yekbûyî (NY), Konfederasyona Cîhanî ya Netewên Demokratîk e. Perçeyên parzemînî û qadên mezin ên çandî dikarin di asta jêrtir de Konfederasyonên xwe yên Netewên Demokratîk çêbikin. Yekîtiya Ewrûpa (YE), eger bi serwerî tevnegere, dikare di vê rasterê de weke gava pêşîn were hesibandin. Pêngavên li hemberî desthilatiya serwerî ya kûrewî û herêmî di vê wergiriyê de têne girtin dest.

**15-** Hêzên moderníteya kapîtalîst û hêzên moderníteya demokratîk dikarin bi hevdu re di nava aştî de bijîn, li ser bingeha pejirandina heyîn û nasnameyên hevdu û venasîna rêveberiyên xwe yên xweser ên demokratîk, çawa ku vê yekê di navbera hêzên şaristanî û hêzên demokratîk de di dîrokê de pirrî caran pêk hatiye. Pêkhateyên siyasî yên konfederal ên demokratîk û pêkhateyên dewlet-netewê dikarin di bin van mercan û wergiriyê de di nava û li derveyî sînorên dewlet-netewê de bi hevdu re  di nava aştiyê de bijîn.

Tespîtên rêgezî yên di derbarê erkên qada polîtîk ên moderníteya demokratîk de dikare were kêmkirin û zêdekirin. A girîng ew e ku hîmên wergirî û sepanê werin destnîşankirin. Ez di wê baweriyê de me ku rêzkirineke bi vî rengî ya rêgezan, armancê pêşwazî dike. Wê gotûbêj û rastiyên azadî yên jiyanê, encamê destnîşan bikin.

Heman mijar ji bo rêgezên di derbarê hersê qadên moderníteya demokratîk de jî, ku min hewl da ez wan tespît bikim, derbasdar in. Divê ez bi girîngî diyar bikim ku xebatên ji nû ve avakirinê, weke rêgez û sepan mîna ne projeyeke komara nû ya ku di Şoreşa Frensî de timi dihate gotûbêjkirin û ne jî weke planeke dewleta Sovyetîk a di Şoreşa Rûsya de ye. Heta ne mîna Projeya Civakî ya Medîne ya Hz. Miheme ye jî. Tekane endîşeya min û mijara ez hewl didim bigihînim zelaliyê ew e ku tehlîlên li ser rastiyê yên di derbarê xwezaya civakî de û hîmên rêbaz û sepanê yên di derbarê çareseriya azadiya civakî de, bibin sedema çewtiyên kûr û bi xwe re rê li ber gelek şaşîtiyan û encamên dapaçîner vekin.

A ku bi ji nû ve avakirinê tê hedefkirin ew e ku mirov bi hîmên feraseta sîsematîk (paradîgma) û sepanê nêzî tevahiya yeke û takekesên civakî bibe û bi vî rengî wan birêxistin bike û wan têxe nava çalakiyê, bêyî înkarkirina mîrasên dîrokî yên hêzên ku li gorî pêdiviya berjewendiyên xwe dijberî sîstemê ne û pêwîst e dijber bin; her wisa bêyî ketina kemînên lîberalîzmê bi zanebûn û bê zanebûn. Dibe ku têde yên weke şoreşgeran jî bixebitin hebin û yên li pey reforman jî bibezin hebin. Hemû xebatên hêja ne. Moderníteya kapîtalîst bi xwe heyama herî biqeyran a sîstema medenî dinimîne. Wekî din, çaxa serwerî ya kûrewî ya herî pêşketî ya sermayeya finans, heyama pêkhateyî ya sîstematîk e, ku têde qeyran bûye berdewamî. Sîstem li pey proje û sepanên kûr e bi awayekî rojaneyî ji bo ku bi wendabûnên sîstematîk ji qeyranê dernekeve. Bi bîrdoziyeke lîberal a eklektîk a

pirr fireh tevdigere. Mîraseke mezin a dîrokî li pey wê heye. Bi ser de, şebekeyên elektronik ên rêxistingeriyê weke kêliyî hilkişandiye bilindtirîn astê. Dikare taktîkên ku bixwaze weke kêliyî bisepîne. Heta dikare tew dewlet-netewê jî, ku navgîna wê ya rêveberî ya stratejîk e, rexne bike û berê xwe di gelek qadan de bide ji nû ve avakirina wê. Şîrket bi xwe di wê şûngehê de ne ku hêzên dewlet-netewê derbas kirine. Her wisa, li gorî kêfa dilê xwe araste dike wan saziyên sivîl ên civakî, ku rêxistinên moda ne.

Çareyek dîtir a dijberên sîstemê di bin van mercan de tine ye, ji bilî pêxistina feraset û sepanên xwe yên sîstemê. Şoreşên Frensî û Rûs (her wisa şoreş û tevgerên dîtir ên bêhejmar ku di rêçên wan de diçûn), bi tevahî di wergirî û armanca modernîteya kapîtalîst de nebûn. Heta pê re gelek binakok bûn û di nava îdeaya sîstemeke nû de bûn. Gelek sepanên heyamî derbas kirin, ku têde yên awarte yên di derbarê van îdeayên wan de jî hebûn. Lê belê kapîtalîzm kariye di encam de van şoreşan di nava feraset û sepanên xwe yên nûjen de di demên kurt û dirêj de bihelîne. Bê gûman erka pêşikî ew e ku mirov xwedî derkeve li mîrasa azadî, wekhevî û demokratîk a şoreşên hemdem, di serî de li van şoreşên mezin, her wisa li tevahiya mîrasa dîrokî. Lê pirr eşkere ye ku her wisa pêwîst e ji çewtiyan jî wane bêne derxistin. Wê bê dîtin ku min di vê xebatê de bi taybetî pirr giranî daye ser vê mijarê.

Erkên bingehîn ji bo herdem derbasdar in, ferq nake ku qeyran bidome yan nedome. Erkên rewşenbîrî, exlaqî û polîtîk pêwîst dikin ku herdem werin bicîanîn. Elbet wê cewaziyan demî biteyisin li nêzîkatiyên cewaz ên taktîk û stratejîk. Lê wesfa serekîn a erkan naguhere. Ez di wê baweriyê de me ku mijarên ku min hewl da ji bo ravekirin û rêgezên di derbarê erkên di hersê qadan de destnîşan bikim, girîng in. Di heman demê de derbirrana rexne û rexnedanek e li beranberî her bûyer, têkilî, kesayetî û sazî yên ku ez ji wan berpirsyar im. Ez pê dizanim ku eger tehlîl û rexneyên berfireh li ser çaxa me, heta li ser şaristaniyê çênebin, wê rexne û rexnedana takekesî nikaribe ti nirx di xwe de wergire. Min hewl da ez li ser vê bingehê nêzîk bibim.

Tevî ku ez neçar dimînim pirr dubare bikim, navheviya xebatên di derbarê erkên rewşenbîrî, exlaqî û siyasî de esas in. Qad di navbera xwe de, çiqas serbixwe jî bixebitin, berhemên ku derxin holê, dikarin ancax di wesfa temamkariya xizmetên hevdu de bin. Eger ronakbîriya rewşenbîrî nebe, wê sepana exlaqî çawa ku nikaribe ya baş pêş bixe, her wisa wê nikaribe xwe rizgar bike ji vekirina rê li xirabiyê jî. Li dema û ciyê ku têde exlaqê baş nebe, li wê derê exlaqê xirab heye. Qada polîtîk awayê sepîna ronakbûna rojaneyî û ya exlaqîbûnê derdibirre. Polîtîka di vê wateyê de rastiya ronakkirina rojane û tevgerîna biexlaqî ye; her wisa ronakkirin û exlaqîkirin bi xwe ye. Wekî din, li ciyê ku polîtîka û exlaq nebin, ne gengaz e ku mirov bi rengekî cidî qala ronakkirinê, lewre qala hebûna xebata rewşenbîrî bike. Rewşenbîrîtî (entelektualîzm) ya ku girêdana xwe bi polîtîka û exlaq re wenda bike, ji bo mînak, çawa ku sermayeya rewşenbîrî ye, dikare bibe tiştekî dîtir jî. Lê vê şûngehê nikare weke erka rewşenbîrî were nirxandin.

Dema ku erkên rewşenbîrî, exlaqî û polîtîk, ji bo civaka exlaqî û polîtîk, werin bicîanîn, wê demê wê azadî, wekhevî û demokratî bi awayê mezintirîn hatibe bidestxistin. Ji ber vê sedemê, pîvana serkeftina rêxistin û takekesên dijberî sîstemê pêwendîdar e bi bicîhanîna erkên di hersê qadan de di nava hev de.

## 11- ENCAM

Zanatî, bi heyîna gerdûnî re pêwendîdar e. Rêkûpêkiya heyî ya gerdûnî dikare ancax bi têgîna zanatî were ravekirin. A balkêş, şêwaza zanatî ya xwe anîna ziman e. Wer tê têgihîştin ku hemû cîhêrengiya gerdûnî encama bengiya zanatî ya xwe anîna ziman e. Em nikarin ti tiştek zanibin di derbarê pir-zanayiya zanatî de. Lêgerîna wê ya hema hema di cîhêrengiya bêdawî de, pirsekê 'gelo çima?' bi mirov dide hizirîn. Pirsa 'gelo çima?', bêhtir nediyar dimîne. Fîlozofên navdar û heta hin ji Pirtûkên Pîroz, van pirsan girê didin bi daxwaziya gerdûnê ya xwe bibîranîne, yan jî bi arzûya xweda ya ku ji alî bendeyên xwe ve were zanîn. Gotina 'ferqkirin', ji min re bêhtir efsûnker û vebêjer xuya dike. Ferqkirin, ji piçika xwe ya herî piçûk heya heyîna xwe ya herî kozmîk, dibe ku bibe bersiva pirsên 'çima?' û 'ji bo çi?' Wateya em li ferqkirinê bar bikin, nikare bi têgînên dîtir, ji bili jiyanê, were pênasekirin. Pênaseya jiyanê ya herî nêzî rastiyê, dikare were diyarkirin weke 'ferqkirin'. A hîn girîngtir jî ew e ku gelo 'ferqkirin' çima ewqas girîng dibe? Em dizanin ku jiyan bêyî ferqkirinê jî gengaz dibe. Lê dema em hewl didin ku bi kûranî biponijin, em têdigihîjin ku vê gengazbûyînê zêde ne gengaz e. Mirov dikare bêje ku nirxa jiyanê ya demajoya ku demekê dirêj bêyî ferqkirinê bibihûre, dadikeve û heta tew dihele. Tew diyardeya mirinê jî, ji mirov re xuya dike weke misoger ferqkirina jiyanê, anku weke lîstok yan jî hostatiyeke xwezayê, ji bo ku jiyanê gengaz bike. Ji bo mînak, gelo wê cewaziya hebûnek cezakirî bi jiyana bêdawî, ji trajediya Sisyphos (kesê ku ji alî xwedayan ve hatiye cezakirin bi xistina berdewamî û ji nû ve gêrkirina kevirê ku hema hindik dimîne  bigihîne tepe) bimîne? Berketina bi mirinê, tenê nirxa jiyanê zêde dike û wê bibîr tîne.

Zanîn nayê wateyek dîtir, ji bili ferqkirinên di derbarê jiyanê de. Tiştê tê zanîn, ew tişt e ku hatiye ferqkirin. Ne gengaz e mirov hîs neke ku di hebûnên biyolojîk de mîna ku evîneke ber bi zanînê ve were jiyîn, tevî ku em nikarin tiştekî di derbarê hebûnên fizîkî de bêjin. Ev evîn, dema em ber bi cûreya mirov ve werin, weke ku pêk hatibe. Awayê herî pêşketî yê zanînê, dikare herî baş bi peyva 'evîn'ê were pênasekirin. Lê mirov hebûneke wisa sosret e ku em dikarin bi taybetmendiyên wê/wî yên wisa re jî rûbirû bên ku di derbarê zanînê de xwe dûr nade ji kirina şewşandin û xiyaneta herî mezin. Zêdetir rast dixuye ku vê rastiya mirov were ravekirin bêhtir bi yên rû didin di nava xwezaya civakî de, ku em jê re dibêjin Xwezaya Duyemîn.

Zanista civakî weke têgîn, tevlî şaristaniya binavenda Ewrûpa re pêş ket. Bê gûman, dîsîplînek ku em ê karibin jê re bêjin cûreyek zanista civakî, bi dirêjiya xwezaya civakî her hebûye. Em pirr bi hêsanî dikarin bêjin 'anîmîzm' [candarî/zîndewarî], ji zanista civakî ya berî dîrokê re. Gelo anîmîzm, ku têgîneke zanista civakî ya bi navenda Ewrûpa ye, dibe zanatiya hoveber a mirovên kovî bi qasî ku tê gotin? Ma kî wê fetwayê dide ku pêkhateya spartî bi veqetîna subje-obje ya zanista civakî ya binavenda Ewrûpa ji anîmîzmê rasertir e? Dîsa heman zanistgirên civakî [wê fetwayê] didin! Lê, her diçe tê têgihîştin ku bizava zîndewarî paradîgmayek e ku ji perçebûyîna subje-obje, lewre ji bêcandarkirina objeyê zêdetir hêja ye. Eşkere ye ku pênaseya gerdûnê ya bi zîndewarî, encamên rasttir dide ji pênaseya bêcardarkirinê. Tevahiya pêşketinên zanistî, vê mijarê piştrast dikin. Gelo, eger tevgerên bi heybet û ku henûz nepenî ne, yên livikên jêr-atomî nebin, ew rastiya ku wê nikaribe tenê yek cîherengî jî çêbibe, çawa dikare were ravekirin, ji bili candariyê (anîmîzm)? Pozîtîvîzm (zanistperestiya diyardeyan), wek cûreyek metafîzîk a pirr xeternak (çiqas dijî vê yekê îdea bike jî), zanistên civakî bi kûranî birîndar kiriye.

Pêvajoya şaristaniyê ku em jê re dibêjin çaxên dîrokê, şêwazeke zanistê ji anîmîzm ber bi mîtolojiyê ve bi xwe re aniye. Mîtolojî, tevî ku bi temamî neyê kirin malê şaristaniyê, bi gelek aliyê

xwe ve mora şaristaniyê di xwe de werdigire. Yekemîn çirpandina xiyanet û çirpandina zanatî li zanistên civakî, pêwendîdar e bi serweriya bîrdozî ya pêvajoyên şaristaniyê. Yekdestiya desthilatî û sermaye ya li ser xwezaya civakî tê pêkanîn, bê derew, bê şewşandin û bêxiyanet li gotinê, nabe. Mîtolojî bi beşa xwe ya mezin, bi anîmîzmê dagirtî ye û hêja ye, lê dema wan çîrokên qehremankirin (nîv-xwedakirin) û xwedakirinan, weke teyisana mîtolojîk a sîstema xerarşîk û pergala ku ji sêmendiya keşîş+rêveber+fermandar pêk tê, ketin dewrê, şewşandin û dejenerekirin bûn tiştekî jênerevîn. Lê dîsa jî mîtolojî, bi mercê ku vê wesfa wê ya dumend were girtin ber çavan, zanisteke civakî ya xeylî fêrkar e. Ez di wê baweriyê de me ku her biçe wê girîngî wergire. Her wisa wê di fêrbûyîna dîrokê de hîn zêdetir rol bilîze.

Sextbûyîna mîtolojî weke ol, rê li ber duyemîn cûreyek zanista civakî vekiriye. Ol, bê gûman ne tenê mîtolojiyê weke mîras werdigire, lê dogmayên wê bi xwe jî hene. Şîroveyên olî yên hêzên dijberî sîstemê, tevî ku bi giranî mora hêzên şaristaniyê di xwe de werdigirin, bêhtir xwerû ne; lewre, bêhtir rasteqîn in. Mirov dikare di olên yek-xwedayî de jî teyisanên herdu hêzên dijber bişopîne. Dema ku rehenda teolojîk, ku fermanan dide, ceza dide mirovan û mirovan dike bende, hêzên şaristaniyê diteyisîne; rehenda ku beşdarvan e, xelat dide mirovan û mirovan azad dike, bawerî û ramanên hêzên dijberî şaristaniyê diteyisîne. Çaxa navîn tijî bi pevçûnên olan û mezheban ên di navbera van herdu ferasetan de derbas bûye. Eger van pevçûnên olan û mezheban nebûna, zanista civakî ya Ewrûpa, misoger nedikarî çêbûbûya. Eger em tenê tew bandora Îslamê jî bihizirin, wê misoger bibe ku em vê rastiyê çêtir têbigihîjin. Bi ser de, pirzanî û birqên fîlozofîk bi dirêjiya çaxan hene. Gûman jê nîne ku vana çavkaniyên binirx ên zanistên civakî pêk tînin.

Çawa ku zanista civakî ya çax (modernîte)a şaristaniya Ewrûpa, çavkaniya xwe ji berhemên vê mîrasa dîrokî digire, her wisa weke pêdiviyeke têkoşîna xwe ya mezin a civakî ya ku jiya, za/derket. Di bingeh de weke dîsîplînek û navgîneke çareserker a pirsgirêkan hate hizirîn. Sîstema zordestî û kedxwariya bêsînor, ku kapîtalîzm rê li ber wê vekir, modernîteyê ji destpêkê ve neçar kir ku weke barkirî bi qeyranan çêbibe. Dema ku tevahiya zanistan bi gelemperî û zanista civakî bi taybetî, ji aliyekî ve hatin xistin xizmeta kedxwarî û zordestiyê; ji aliyê din ve, bi ser de, rol li zanistên civakî hate barkirin da ku sîstemê weke erênî rave bikin, anku wê rewa bikin. Retorîka yekdestiyên nû yên desthilatî û sermaye, mora xwe li zanistên civakî jî dan.

Sosyolojiya pozîtîvîst bû sedem ku zanista civakî hîn jî destpêk ve seqet bize/çêbe. Endîşeya wê ya bingehîn ew bû ku komarekê ji Şoreşa Frensî deranîba ku berjewendiyên burjûwazî parastiba. Siyasetmedarên aborî yên Îngilîs ketibûn pey rasyonalkirin û rewakirina kapîtal. Bîrdozgerên Alman pêwendîdar bûn li her alî bi çêbûna dewlet-netewa Alman a dêwane re. Ya ku K. Marks û F. Engels, damezrînerên sosyalîzma zanistî, ku serkêşiya dijberên sîstemê dikirin, dixwestin bikin ew bû ku zanistek bi mora proletarya ji sê retorîkên sermayeyê biafirînin. Dijberiya kapîtalîzmê û tehlîlên Kapîtal ên li ser vê bingehê, dikarîbûn bûbûna tevkarî li zanista civakî. Lê çavkaniyên wan ên hilhatinê û sînordarkirina wan a dijberiya sîstemê bi Kapîtal, tevahiya pêkhateyên sîstemê li hemberî modernîteyê bêparastin dihêşt. Anarşist, tevî ku tehlîlên wan ên li ser desthilatiyê gaveke pêşve bûn, qada polîtîk hema hem vala hêştibûn. Zanista civakî ya Ewrûpa di hêla herdu baskan de jî, bêhtir ji lêkolîna li ser xwezaya civakî, bi pirsgirêkên ku sîstem rê li ber wan vekiribûn re pevdiçûn. Xwe amade kiribûn ji bo cûre pisporiya çareseriya qeyranan. Cîhan û dîrok di rêza duyemîn de bûn. Pêwîst e mirov şaşwaz nemîne ku zanista civakî bi navenda Ewrûpa ye. Nedikarî bihata payîn ku daneheva bi sedan salan, ji nîşka ve hatiba derbaskirin. Îdeolojiya lîberal, bû ya herî zîrek a di nava

wan de. Wê rêyê dît ku hemûyan bi sîstemê re bike yekpare. Bi ser ket ku, ne tenê Şoreşa Frensî, lê tevahiya şoreşên serdemê û dijberên sîstemê, Şoreşa Rûsya jî têde, bêbandor bike, her wisa zanistê bi rengekî serkeftî veguherand bo zanista desthilatî û sermayeyê.

Lê nedikarî bihata hizirîn ku, weke sîstema herî kedxwar û desthilatperest a pêvajoya şaristaniyê, dijberên modernîteya Ewrûpa bi temamî tune bikira û wan bêdeng bikira. Ev modernîte, bi pêşketina xwe re, ne di eniya bîrdozî de, lê di eniyên polîtîk û exlaqî de jî rastî berxwedanên mezin hat. Dijberiya sîstemê jî, herî kêm bi qasî sîstemê, xwe nû dikir. Herku sîstem dibû kûrewî, sîstema dijber jî dibû kûrewî. Serweriya wê ya li ser zanistê herku diçû dişkiya. Dest bi têgihîştinê hatibû kirin ku dîrok dikaribû ancax bûbûya dîroka cîhanê û serweriya demkurt a Ewrûpa dikaribû ancax perçeyekê piçûk a vê dîrokê pêk anîba.

Fîlozofiya Frensî ya piştî Duyemîn Şerê Cîhanî, Şoreşa Çandî ya Cîwantî ya 1968, hilweşîna navxweyî ya sîstema Sovyetîk, îflasbûyîna dewleta geşdarî, lêgerînên postmodernîst û tesfiyebûyîna mêtingeriya klasîk zemîn pêşkêş kirin ku di zanista civakî de heyameke nû destpê bike. Lêgerînên li ser rastiyê, weke rizgarbûyî ji astengiya pozîtîvîzm û navendperestiya Ewrûpa, di rêveçûneke hîn erênîtir de ne. Pêwîst e zanista civakî qîma xwe tenê bi çareserkirina qeyran û pirsgirêkan nehîne, lê xwezaya civakî weke yekpareyî di hemû cî û deman de bike mijara xwe ya lêkolînê; her wisa pêşengî bike li milekî ji fîzîk, kîmya, biyolojî û kozmolojiyê re û li milê din, ji zanistên beşerî re, her wekî felsefe, wêje û huner, ku di bingeh de pêwendîdar in bi civakê re; her wisa rola zanista banû/qralçe bilîze. Secereya zanistê dikare ancax di jêderkiya zanista civakî de were şêwandin. [Bi vî rengî] hem wê mirov ji perçebûyîna pirole rizgar bibe û hem jî wê fikareya ku mirov pirr razber bimîne, were derbaskirin. A pêşikî ew e ku, tevlî qeyrana gelemperî, qeyrana di warê zanista civakî de jî were derbaskirin. Zanisteke civakî ya ku ferqkirina jiyanê weke azadî û rastiyê mîna lêkolîna li ser azadiyê şîrove bike, rêbera ronakbûyîn û pêşketinê ya jêveneger a civaka exlaqî û polîtîk e.

Nirxandina min a li ser zanista civakî di vê xebatê de weke pêşikî, pêwendîdar e bi wergiriya wê re. Retorîka sosyalîzma pêkhatî, ku min demeke dirêj ew ceriband, êdî ji min re teng dihat. Û ez bi temamî li hemberî retorîka lîberal im. Nasîna min a ji nêz ve anarşîzmê, bandoreke erênî li ser min hêşt, lê dûr bû ji tehlîlkirina pirsgirêkên li pêşiya min. Girîng bûn tevkariyên hin civaknasan, ku min di serî de diyar kir ku ez wan hêja dibînim. Lê dîsa jî, diviyabû min bi xwe rêya xwe bidîta. Rast nedibû ku, bêyî rûniştandina feraseta xwe ya li ser zanista civakî, ez derbasî mijarên din ên biîdea bibûma. Ya ku ez dikim, weke min di destpêkê de diyar kir, ceribandinek e û ancax wê bi rexneyan ciyê xwe yê rastîn bibîne. Ez bawer im ku ez ne ji wan dogmatîkên metafîzîk û pozîtîvîst im, ku her tiştî ji zanista civakî dipên. Sedema ku min zanista civakî bi rengekî piralî pênase kir, ew bû ku ji bo hem nekevim nava vê xeteriyê û hem şiyar û durust bim li pêşberî yên pêwendîdar. Piştî pêkanîna vê, beşa din a xebata serekîn, bû şaristanî û modernîteya demokratîk. Sedema ku min pêşîkiyê da pirsgirêka civakî, ew bû ku ez sîstema şaristaniyê baştir nas bikim û dijberên wê bi rengekî rast bibingeh bikim. Ez di wê bawariyê de me ku min bi berfirehî qala wan kir. Sedema ku min dijberên din ên sîstemê rexne kir, ji bo xwe gihandina nirxandineke yekparegir bû. Digel ku ez bi temamî red nakim rêbaza spartina dijberiya sîstemê ya sosyalîzma zanistî bi herdu çînan, ku di dîrokê de ciyê pirr teng digirin û ji tehlîlkirina civakê pirr dûr in, min hewl da ez wê derbas bikim bi şaristaniyê, ku pêşketina çemê dayik ê pênc hezar salî ye.

Eger li dijberiyeke diyalektîk bihata gerîn -ku ez di wê baweriyê de me ku pêwîst bû lê hatiba gerîn-, tiştekî jêneverîn bû ku vê yekê di wergiriya sîstema şaristanyê de bihata pêşxistin. Ez dizanim ku mijara şaristaniyan, mijara lêkolînê ya gelek fîlozof û civaknasên hêja ye. Ya ku min dixwest bikim, ne ew bû ku ez yeka nû li vana zêde bikim, lê ew bû ku ya nekirî û yan jî destavêtî bi rengekî pirr perçeyî, bi şêweyeke bisîstem û berfireh pêşkêşî gotûbêjê bikim. Divê ez bibayex diyar bikim ku di vê mijarê de rêbaza, anku diyalektîka ku K. Marks ji bo 'Kapîtal' bikar aniye, min wê ji bo şaristaniyê bikar anî. Min pirr xweziya xwe pê anî û got ku xwezika Marks vê mijarê pêk anîba û me jî jê sûd wergirta. Lê diyar e desteka herî baş ku ji westayek bihata girtin, ew bû ku ji rêbaza wê/wî re wate hatiba dayîn. Wê rexneyên pêwendîdaran û pratîka civakî destnîşan bikin bê ka min vê yekê çiqas bi ser xistiye. Bi rastî jî şaristanî, mîna di 'Kapîtal' de tê diyarkirin, kom û komên pirole û dijber diafirîne. Tew dijberiya burjuva-proletar dikaribû bibûya ancax yek ji dijberiyên bi hejmareke zêde, ku şaristanî rê li ber wan vekiriye. Ez wisa dihizirim ku di vê wateyê de wê rasttir be ku xebata min were şîrovekirin, ne weke dijberiya Karl Marks, lê weke lê xebitîna temamkirin û pêşxistina wî li ser bingeha rexneyên cidî. Divê weke dijberî neyê şîrovekirin diyarkirina min a şaşîtî û kêmasiyên wî ji gelek aliyan ve (analîzên wî yên li ser sermaye-yekdestî, kapîtal, dewlet, bîrdozî, pozîtîvîzm, dîrok, şaristanî, bazar, aborî, demokrasî, şoreş, zanista civakî û bi taybetî desthilatî, dewlet-netew, serwerî, sîstem û wekî vana). Ez di wê baweriyê de me ku wê rasttir be ku were şîrovekirin weke dayîna nirxa ku ew û bizavên din ên dijberî sîstemê heq dikin û weke kirina tevkarî li wan ji bo vê yekê.

Di beşên xebatê yên berî vê de min hewl dabû ez basken zordar û kedxwar (mijokdar û mêtinger) ên şaristaniyê bi çorsî tehlîl bikim. Lê di beşên niha yên di dest de min xwest ku, bi qasî gengaz be, bi awayê kêm, dîsa qala wan bikim û giraniya serekîn bidim 'demos' weke cemsera dijber, anku hêzên şaristaniya demokratîk. Min hewl da ez bi hemû hêza xwe vê cemsera dîrokî vekim. Bi raya min, dîrok herî zêde di vê mijarê de bi kêmasî û şaşîtiyan tijî ye. Lê dîsa jî girîng bû ku bi xeteke stûr û sor bal hatiba kişandin ser wê. Pevçûna bingehîn di dîrokê de, ne di navbera komên zal ên şaristaniyan de bû, weke gelek tê pêşkêşkirin (mînaka wê ya dawî Samûel P. Huntington e), li di navbera herdu cemserên wê yên dijber de bû. Elbet, di navbera komên zal bi xwe de jî nakokî û pevçûn hene. Yekdestî di navbera xwe de herdem li ser 'paste'yê pevdiçin. Lê ya girîng ew bû bê ka vê pasteyê ji kê û çawa hatibû xesp/desteserkirin. Li gorî pêdiviya diyalektîkê ye ku nakokî û pevçûna rasteqîn di navbera yên vê pasteyê hildiberrînin û yên dixwezin wê desteser (xesp) bikin de be. Min dikaribû tenê bi xeteke sor bal kşandiba ser vê mijarê, ku divê bi lêkolînên pirr berfireh bi kûranî were dîrokkirin. Û min wisa jî kir. Kî çiqas bixwaze, dikare lê bigere. Ez bawer dikim ku wê xeyalên mirov neşkîn ji encamên ku werin bidestxistin.

Min hewl da ez ciyekî berfireh bidim dijberên modernîteyê jî. Min vê yekê kir ji bo ku di xebatên sîstema nû de ciyên xwe bi rengekî rast bigirin. Pêwîst bû ew gengeşiya ku bi hilweşîna Sovyetê re bilez bû, li ciyekî watedar hatiba rûniştandin. Û bêhêvîtî ne pêwîst bû. Divê sosyalîstên real û anarşist zanibin xwe nû bikin. Û femînîst û ekolojist diviyabû zanîbûna ku, bêyî çêkirina sîstemê, wê nekarîbûya mesafe bihata girtin û wê nekarîbûna xwe rizgar bikirana ji guhastina av bo aşa lîberalîzmê. Nedikarî armancekê xwe gihandinê hebûya, bêyî misogerkirina bûyîna polîtîk û bûyîna bisîstem. Ya ku herî zêde li benda wan bû, aqûbeta tevgerên sosyalîsta real û ya anarşîstan bû. Ez di wê baweriyê de me ku ez bi rengekî çareserker nêzî tevgerên çandî bûme. Girîng bû

naveroka demokratîk a van tevgeran, ku hewl didin xwe rizgar bikin ji penceyên cinawirê dewlet-netewê. Dîkarîbûn rola dîrokî di wergiriya modernîteya demokratîk de bilîstana.

Min hewl da ez bi bayex nêzî erk û pirsgirêkên ji nû ve avabûna modernîteya demokratîk bibim, bi awayê hem tehlîlker û hem çareserker, anku di hêla teorî û pratîk de. Ez di wê baweriyê de me ku min encamên bidestxistî, bi awayê rêgezên kartêker, bi serkeftî pêşkêş kiriye. Eşkere ye ku modernîteya demokratîk, ne weke lêgerîna li çaxa zêrîn a paşerojê û ne jî weke projeyeke utopîk a pêşerojê, hatiye pêşkêşkirin. Malzemeyên dijberî sîstemê bi zêdeyî hebûn, li sîstem bi xwe tine bû. Min bawer dikir ku pêwîst bû mijar teqez bihata gihandin bo vebêjanên têr. Modernîteya demokratîk weke nav girîng nebû. Lê wergiriya wê pirr girîng bû. Û neçariyek bû ku vêya bihata sîstematîzekirin. Nexwe, wê mirov nekarîbûya biçûya wêdetir ji jiyîna felsefeya belengaziyê û belengaziya felsefeyê. Armanca tehlîlan ew bû ku vê rewşê bigihandana ronahiyê û wê derbas bikirana. Hewl hat dayîn ku erkên qadî yên rewşenbîrî, exlaqî û polîtîk ji bo çareseriyên pratîk werin destnîşankirin. Geremoliya dihat jiyîn, di van qadan de jî xeylî berfireh bû. Ez di wê baweriyê de me ku hatiye gihandin zelaliyê pêwîstiya bê ka mirov çawa here ser pratîkê. Ez bawer dikim ku wê rêzkirinên rêgezî, di pratîkê de rê li ber xebatên afirîner û nû vekin.

Mijareke din a girîng a vê xebatê, di derbarê wesfên yekeya bingehîn a lêkolînê de bû. Zanista civakî ya pozîtîvîst di vê mijarê de di we şûngehê de bû ku civakê, weke objeyên din ên li xwezayê, dikir objektîv û bi vî rengî wê bi bersiveke gelemperî dibersivand. Sosyalîzma zanistî weke teyisîna çep a vê feraseta li ser zanistê şêwe girtibû û bêhtir sext û diyardeperest bû. Civakê, li gorî şêwazên hilberrînê, di wesfa tevkariyê de di tesnîfkirinê re derbas kir. Pozîtîvîzma pêşveçûner a xêzikî ya dûz a gerdûnewer, weke ku rastiyên teqez bin, hatin têgihîn û sepandin. Şêwegirtinên hoveber, koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst-komunîst bi vî rengî derketin holê. Di vê de hinekî jî qederperestî heye. Çawa be, wê zû yan dereng, dor bihata ser sosyalîzmê. Ev, nêzîkatiyek bû, ku aliyê wê yê dogmatik eşkere bû. Encamên nêzîkatiya bi vê heşmendiyê li tevahiya çalakbaziya civakî, ji yên tên rawêj/texmînkirin pirr zêdetir giran bûne. Ya ku pêk hat, ne sosyalîzm, lê kapîtalîzma kûrewî bû, ku wê pirr rexne dikirin, lê di wê şûngehê de man ku, bêyî têderbixin, jê re xizmeta herî zêde kirin. Kapîtalîzma dewletê ya Rûs, herî kêm temenê sed salî bi sîstemê da qezenckirin, ku diyar e vê yekê de wesfa piştrastkirina vê rastiyê de ye.

Min bi dirêjiya tevahiya vê xebatê civaka exlaqî û polîtîk, weke bijare girt, ku ez bawer dikim awayê heyîna bingehîn a xwezaya civakî (xwezaya duyemîn) ye, ku yekeya bingehîn a lêkolînê ye, û ku min hewl da ez wê bipeyitînim (tespît bikim) û pênase bikim.

Delil(argûman)ên min di derbarê wê yekê de bûn ku herçend tew hebe jî para rastiyê ya diyardeyên mîna şêwaza hilberînê, çîn, dewlet, bîrdozî û teknîk, ku bi berdewamî diguherin û di her civakek de bi rengekî cewaz pêk tên, vana ne di wê giraniyê de ne ku bibin mijara bingehîn a lêkolînê.

Û min analîzên wan ên li ser sîstem û şaristaniya cîhanê, weke şîroveyên çembera girtî ya yek-alî, rexne kir. Min hewl da nîşan bidim û tehlîl bikim ku xwezaya civakî ku wê tim wesfên wê bijî û neçar e bijî, ta ku cûreya mirov hebûna xwe bidomîne, civaka exlaqî û polîtîk e; mirovahî nikare dev jê berde û eger dev jê berde wê vê yekê bê wateya perçebûn û belavbûna civakê. Min hewl da, tevlî lîsteyekê fireh a ji nimûneyan, îspat bikim ku civakên exlaqî û polîtîk, her çend bi dirêjiya dîroka şaristaniyê di dorpêça şebekeyên sermaye û desthilatî de pirr hatine mehandin û

hatine terikandin bo belavbûn û rizînê, herdem hewl dane rêyekê bibînin û wesfên xwe yên exlaqî û polîtîk bi rengekî lewaz be jî biparêzin û bi vî rengî bibin bersiv, yan jî bi awayê berxwedanê bijîn. Min hewl da bi berfirehî tehlîl bikim ku li hemberî belavbûna şebekeyên sermaye û desthilatî yên kapîtalîzm (modernîte)ê (dewlet-netew, sanayîgerî, bi taybetî amûrên medya, bîrdoziya eklektîk, rêxistinên ewlekarî, mêtingeriya hundirîn, zordestiya pirole ya li ser jinê û wekî vana), ku civakê heya çavikên wê yên herî zirav dinuxêvin, dibin sedema bertekekê dijber a di heman rêjeyê de; her wisa, di her yeke û takekesên civakî de rê li ber derfetên berxwedanê û alternatîvên jiyanê vedikin û neçar in vekin. Min raxist ber çavan ku civaka exlaqî û polîtîk, elbet ne sabît e û pêşketina xwe ji beriya dîrokê û vir ve didomîne. Van pêşketinan bêqutbûn pêk hatine, bi awayê klan, qebîle, malbat, konfederasyonên eşîretan, derbasbûyîna di xerarşî de, jiyîna dabeşbûna bo dewlet, derbase ji civaka çandinî û gund bo civaka bajêr û civaka sanayî ya netewî û cemserbûnên hindik yan pir. Her wisa min hewl da ez tevlî wan nêrînan jî bibim, yên ku dibêjin pêvajoya şaristaniyê pêş dikeve bi şêweya navend-derdor, serwerî-hemberî û hilhatin-daketin. Min hewl da (weke teorîk û pratîk) tehlîl bikim û ji hev derxînim ku civaka exlaqî û polîtîk, tevî van hemû pêşketinan, wê nikaribe ji holê were rakirin; wê meyla xwe ya ji bo azadî, wekhevî û demokratî tim biparêze; her wisa, bi têgihîna di nava hev de erkên rewşenbîrî, exlaqî û polîtîk û bi bicîanîna wan, wê van wesfan mezintirîn jîndarî wergirin.

Dîsa, min hewl da ku bi berfirehî tehlîl bikim û ji hev derxînim ku, li hemberî wergirtina heyîna li ser bingeha sermayeperestî, sanayîperestî û dewletperestiya-netew a modernîteya kapîtalîst; modernîteya demokratîk dikare weke komunalîteya demokratîk, netewa demokratîk û eko-endustriyel, heyîna xwe wergire. Min hewl da ez komunalîteya demokratîk pênase bikim ne weke wekhevxwaziya civakek homojen, lê weke her cûre komcivak (her cûre civak ji jinan heya komcivakên zilaman; ji werziş/spor û huner heya sanayî; ji rewşenbîran heya şivanan, ji qebîleyan heya şîrketan; ji malbatan heya netewan; ji navçeyî heya kûrewîtî û ji klanan heya civaka kûrewî), ku ji yek kesek heya bi mîlyonan kesan çendîtî wergirin û wesfa civaka exlaqî û polîtîk di xwe de wergirin. Min rastiya civaka eko-endustriyel pênase kir weke komcivakên eko-endustriyel, ku têde civaka çandinî û gund û civaka sanayî ya bajêr hevdu xwedî bikin û misoger guncandî bin li ekolojiyê. Min hewl da ez netewa demokratîk pênase bikim, tehîl bikim û ji hev derxînim weke cûreyek netewa nû, ku bi sepanên konfederalîsta demokratîk ku şêweya bingehîn a polîtîk e, ji alî her cûre heyînên çandî, ji etnîsîte heya olê û heya komcivakên bajêrî, navçeyî, herêmî û netewî ve bi awayê pêkhateyên siyasî yên xweser ên demokratîk; hîn rasttir weke netewek bi pir-nasnameyî, bi pir-çandî û bi pêkhateya pir-siyasî li hemberî cinawirên dewletperestiya netew, were pêkanîn.

Min hewl da bi kûranî û bi awayê dubareker bikirpînim û pêşkêş bikim ku modernîteya demokratîk bijareyek e ku hêza wê ya çareseriyê mezin e ku mîrasa xwe ya di dîrokê de bi ezmûnên dijberên sîstemê re di yên heyama modernîte de li ser bingeha van saziyên pêkhateyî dike yek, her wisa, wê zêdetir pêş bikeve û bibe serekîn.

Min hewl da cemserbûna şaristanî û modernîteyê, ji bilî di hêla pevçûn û kedxwarî (mêtin û mêtingerî) de, her wisa di hêla şîmaneya nepevçûnî û aştî de jî bi girîngî tehlîl bikim. Nirxandina derfet û mercên aştiyeke dombar, mijareke girîng pêk tîne û hestyariyeke mezin jê re tê xwestin. Tê zanîn ku pêvajoya şaristanî di vî milî de xwedî mîraseke zengîn e. Heyam û sepanên wisa jî pirr çêbûne ku ji şer pirr zêdetir li aştiyê pîrozî û zadeganî hatiye arastekirin. Şer û aştî di heyama modernîteyê de jî, di asta sepanên rojaneyî ku hema hema di nava hev de hatine jiyîn, pêk hatine.

Bûye weke feraset û hêmanek ku tevkarî li pêvajoyê bike, ku dikare gengaz be ku bi taybetî di şûna feraseta diyalektîka tuneker de diyalektîkek ku bi berhemberî hevdu xwedî bike; herî kêm pêvajoyên diyalektîkî, ne bi tena serê xwe tunekerî ne û ne jî tenê bi rengekî berhember xwedîkirina hevdu ne; her wisa, dikare di navbera herdu feraset yan jî rastî de baweşîneke fireh û girîft were jiyîn. Bi saya zanistê jî ku pêş dikeve, dikare bi rengekî baştir û rasttir bê têgihîştin ku rastiya xwezayî, ne bi felsefeya jiyanê ya bihêz a Darwînîst, mayî ji kapîtalîzma hov, û ne jî bi qalibên metafîzîk ên derbarê ku bênakokî tê jiyîn, dixebite; berevajî, naverokekê pirr zengîn, vekêşayî û avaker, pêşkêş dike.

Şîrovekirina pêvajoyên aştiyê weke bi temamî peresanerî, çiqas şaşbe; şîrovekirina pêvajoyên şer, weke dadikên ku ya/yê nû diafirînin, ewqas şaş e. Şerên di navbera yekdestiyên sermayê û desthilatî de pêwendîdar e bi mezinkirin û piçûkkirina pasteya di bin destên wan de. Pêwendiya wan zêde bi aştiyê re tine ye. Aştiya rasteqîn di navbera herdu hêzên dijber ên şaristaniyê ( baweşîneke pirr fireh digire nave xwe, bi destpêkirina ji nava van herdu çînan heya qebîle, eşîret, qewm, netew, tebeqe, civatên olî, bizavên çandî û komên aborî, yên cûrbecûr) de xwe dispêre pejirandina heyînên hevdu, nasnameyên hevdu û mafên hevdu yên rêveberiya xweser. Dema bê pejirandina ku pevçûn zêdetir zerar dide aliyan, hingê şîmaneya aştiyê xuya dibe. Di vê rewşê de hewl tê dayîn ku bi niyetên lihevhatin û diyalogê encam were girtin. Tê zanîn ku bi hejmareke zêde pêvçûn bi aştiyê bi dawî bûne, hem di asta navçeyî û kûrewî de û hem di nava netew û navbera netewan de. Ya girîng lihevhatinek e di mercên ku nasname û rûmeta aliyan gengaz bike. Piştî ku vê yekê pêk were, aştî gengaz dibe di her astê de û di navbera civak, kom û heta takekesan de, yên di her qebareyê de.

Dema em hewl didin dîroka şaristaniya pênc hezar salî, weke cemserên dijber tehlîl bikin, em têdigihîjin ku wê hîn demekê dirêj bi awayê ducemserî bi hev re were jiyîn. Gengaz xuya nake ku alî di demekê kurt de hevdu tune bikin. Wekî din, vê yekê weke diyalektîkî jî rasteqîn xuya nake. Lezdariya sosyalîzma pêkhatî ya di vî milî de, anku ceribandina wê ya sîstemê, bêyî tehlîlkirina şaristanî û moderniteyê, bi hêlweşîna wê bidawî bûye. Ya girîng ew e ku mirov cemserîtiya du-alî di hemû xebatên teorîk û pratîk de bigire ber çavan, di nava cemsera kedxwar a zal de nehele û têde modernîte û şaristaniya demokratîk gav bi gav, her wisa bi xebata avakariya nû bi berdewamî pêş bixe. Em sîstema xwe, bi tevahî rêbazên şoreşî û peresanî, çiqas pêş bixin, em ê karibin pirsgirêkên ‘demajo’ û ‘cî’ jî ewqas bi rengekî erênî çareser bikin û wan bikin mayînde.

Modernîteya demokratîk sîstemek e ku hêmanên wê yên bingehîn meyldarên aştiya rasteqîn in. Feraseta netewa demokratîk, bi çareserkeriya xwe ya zelal, ji komcivakek netewî ya herî piçûk heya neteweke cîhanê di heman demê de bijareyeke aştî ya nirxa wê pirr mezin, pêk tîne. Bi hêmana wê ya eko-endustrî, hem bikaranîna berdar a sanayiya nava civakê û pirsgirêkên giran ên civakî, di serî de bêkarî, hejarî û birçîtî, ku cûreyek encamên şerê modernîte yê li hemberî civakê ne, dikevin rêya çareseriyê û hem jî [bi vê hêmana xwe]wî şerê ku sanayîgerî/endustriyalîzm li hemberî jîngehê daye destpêkirin bi dawî dike û bi vî rengî aştiya civak û jîngehê pêk tîne. Û hêmana komunalîteya demokratîk bijare pêşkêş dike bo her yeke û takekesên civakê ku karibin bibin civaka exlaqî û polîtîk û bi vî rengî dikare nêzîkatiya herî radîkal a aştîxwaz pêşkêş bike. Eşkere ye ku herku modernîteya demokratîk weke sîstem pêş bikeve, derfeta aştiyeke birûmet jî dikare pirr zêdetir pêş bikeve.

Divê ez di vê xalê de hem hişyariyekê û hem lêborînekê careke din diyar bikim: Ez têgînên civaka exlaqî û polîtîk, komunaliteya demokratîk û civaka demokratîk weke hemnirx û wekhev digirim dest. Ji bo zengîniya wate, min xwe neda dûr ku, dema pêwîst kir, serî li hersê têgînan jî bidim. Eşkere ye ku civaka exlaqî û polîtîk, bi komunalîteya demokratîk ve, bêhtir sosyalîzma demokratîk û wekheviya civakî, lê wekheviya li ser bingeha cewaziyan, tîne bîra mirov. Feraseta wekhevî ya li ser bingeha cewaziyan, cewaz e ji wateya sosyalîst a real ku tê wateya homojeniyê. Ji bo bal bikşînim ser, min pêwîst dît ku jê re bêjim 'Sosyalîzma Fîrewnan'. Bi têgîna civaka demokratîk ve, min hewl da karakterê civaka exlaqî û polîtîk bikirpînim, ê ku hem wekheviyê û hem azadiyê di xwe de werdigire. Bê gûman, van têgînan wekhev in, pêwîst e mirov wan neke heman. Mebesta min ji vê, zengînî ye. Hemankirin hejarkirin e. Digel ku ez hişyar dikim ewên pêwendîdar ji bo ku derbarê bikaranîna van têgînan de nekevin nakokiyê, ez hêvî dikim ku wê daxwaziya min a lêborînê bi feraset pêşwazî bikin, ji ber min nekarî bi cûreyekê dîtir termînolojî pêş bixim.

Min ne tenê qîma xwe pê neanî bi wesfandina modernîteya demokratîk, weke civaka exlaqî û polîtîk, komunalîteya demokratîk, sosyalîzma demokratîk, civaka demokratîk, civaka eko-endustriyel û civaka konfederal a demokratîk, ku sê hêmanên bingehîn in, li beramberî hersê hêmanên bingehîn (kapîtalîzm, sanayîgerî û dewlet-netew) ên modernîteya kapîtalîst, her wisa çawa ku min hewl da di beşa pêwendîdar de wê raxim ber çavan, min hewl da ku ez wê bi desteyeke pirr zengîntir a wesfan jî pênase bikim. Hêmanên dozdeh pirsgirêkên bingehîn, ku min wan di derbarê pirsgirêka civakî de hejmart, di heman demê de dozdeh wesfên çareserî yên modernîteya demokratîk rave dikin.

Min timî kirpandibû ku vê xebata min dikare bi navê Sosyolojiya Azadiyê bê weşandin. Di dema hewldana pênasekirina zanista civakî de, min bi girîngî diyar kir ku pêwîst e armanca wê ya bingehîn, pêşxistina bijareya azadiyê be. Ji xwe, dema lê were veserkirin ku çareserkirina pirsgirêkan, di wateyek de wê bibe bidestxistina azadiyê, ez bawer im ti fikareya wê tine ye ku mirov ji zanista civakî re di wergiriya armanca wê de bêje 'Sosyolojiya Azadiyê'. Eşkere ye ku wê di cî de be ku herî kêm beşekê wê ya girîng, anku xebatên sosyolojîk/civaknasî yên bi rehenda çareserkirina pirsgirêkan û pêşxistina ferqkirina jiyanê, bi vî navî were weşandin. Bê gûman, wergiriya sosyolojî bi azadîyê re sînordar nîne. Tê zanîn ku pêwîst e bi baweşîneke girîft a civakî (civaka berî dîrokê, xerarşî, çîn, dewlet, bajêr, şaristanî, sermaye, aborî, desthilatî, demokrasî, huner, ol, felsefe, zanist, polîtîka, şer, strateji, rêxistingerî, sazîbûyîn, bîrdozî, ekolojî, jîneolojî, teolojî, eskatolojî û wekî vana) re mijûl bibe. Lê weke mijara ku min bi vê xebatê hewl da bi girîngî bikirpînim, min baweriya xwe di derbarê wê yekê de diyar kiribû ku dema civaka exlaqî û polîtîk were veqetandin bo pirr perçeyan û were kirin mijara lêkolîn û lêgerînan, vê yekê fikareyan di xwe de werdigire û dibe ku karibe rê li ber encamên neyînî, bêhtir ji erênî veke. Min diyar kiribû ku ez bi rengekî xurt tevlî dibim ku rêbaza herî rast ew e ku xwezaya civakî, di nava dîrokîtî û yekparetî de were lêkolîn û lêgerîn.

Dema dawî li vê beşa parêznameya xwe tînim, ez dixwazim wê, bi du şîroveyên ji Sokrates û Zerdeşt, temam bikim. Weke tê zanîn, bêjeya ku Sokrates tîmî ew bikardianî "Xwe bizane!" bû. Diyar e xwestiye bikirpîne ku kesên xwe nizanibin, wê nikaribin zêde tişt fêr bibin û zanibin. Ez bawer dikim ku mirov yekûna rastiya ku li tevahiya gerdûnê belav bûye, ji teqîna mezin (bîg-bang) û vir ve, ku tê îdeakirin, bi qasî ku ji alî zanistê ve tê ravekirin di hêla dem de herî kêm panzdeh milyar sal berê pêk hatiye. Ez wêya hîs dikim û dizanim. Di vê wateyê de xwe zanîn wekhev e li gel

tevahiya dem û gerdûnê. Sokrates, wekî din, di parastina xwe ya navdar de, ne qala xwedayan (ku tê îdeakirin ku wan înkar kiriye), lê qala periyên îlhamê, anku 'daîmonan', ku yekcarna dihatin wî, kiribû. Ev dibe xwe zanîn bi rêya têgihîştin û lêhûrbûna hundirîn. Wek cûreyek fêrbûyîn û dayîna agahî bi şêwaza pêxemberî ye. Eşkere ye ku vê yekê şêwazeke fêrbûnê ya pêşdetir ji pûtperestiyê ye. Piştî ku min girt ew hişyarî 'tu li çi bigerî, di xwe de bibîne!' ya hêza min a têgihîn, yan jî ya 'daîmon'ên min, min nekarî xwe jê dûr bidim ku giraniya bi vî rengî li van risteyan araste nekim.

Şîroveya Zerdeşt bêhtir bandorker bû. Tê rîwayetkirin ku Zerdeşt, dema ku roj bi hemû biriqîna xwe hiltê li çiyayên Zagrosê, ku dildarê wan e, dengekî dibihîse. Û bi vî rengî li wî dengî diqîre: "Ka bêje, tu kî yî?" Ev, şîroveyek e bi şêweya ku wisa rastî xweda hatiye û hesab jê pirsiye. Lê ez di wê baweriyê de me ku ketiye nava hesabpirsîneke di derbarê hebûna qral-xwedayên Sumerîk de ku bi hezaran sal in êrîş dibin ser azadiya gelê Zagrosê. Pîroziyên qral-xwedayan, ku wek cûreyek şaristanî bi xwe ne, di jêpirsînê re derbas dike û bi vî rengî şoreşa exlaqî ya Zerdeştî pêk tîne. Ev şoreş şoreşekê bi awayê dubendiya ronîtî-tarîtî û qencî-xirabî ye.

Ez misoger nefret dikim ji nitranên di derbarê xwe de. Dildariyek e ji bo min ku bi hemû xwerûtî/sadetiya xwe bême têgihîştin û bibime dost. Her roja ku çû ez baştir têgihîştim ku kesayetiya min, ku jiyanê di nava hemû xwerûtî/sadetiya wê de weke merasîm û dîlaneke dostaniyê bi bengî pêşwazî dike, kî bi ser de hat, li hember derket. Dema bi ser min de dihatin, min hinekî jî bi Zerdeştwarî wan di jêpirsînê re derbas dikir: "Hûn kî ne?" Wate ku van risteyan, li milekî fêrbûyînên min ên bi rêya xwe zanîna min û li milê din, kombûna zanatiya min a ku çêbû bi jêpirsîna kesên ku bi ser min de tên bi pirsa "Hûn kî ne?"

Dema ez hem xwe û hem jî pîroziyên bi hezar û yek qilfan ên şaristaniyê tehlîl dikim, ev tê wateya tehlîlkirina mercên dijwar jî. Dema pîroziyên şaristaniyê, ti sînoreke exlaqî û polîtîk nas nakin û bi vî rengî hewl didin di ser min re derbas bibin, ez bi van risteyan wan di jêpirsînê de derbas dikim; vê yekê di nava hewaya dîlaneke bengînî de min bi kesayetiya min, kevneşopên min, gelê min, herêma min, mirovahiya min û bi gerdûna min re da naskirin. Hevnasîn, tê wateya ferqkirinê. Û ev tê wateya ku mirov jiyanê di nava hemû zengîniya wê de bi rengekî bêtirs bijî û wê bi awayekî xurt biparêze**!**